

DÎROK NIHA YE

Bi Nêrînek Cewherî Dîroka Kurdistanê

Kasim Engîn

Weşanên Ocaxa PKK'ê ya Sakîne Cansiz - 31

*Ji bo tevahî lêgerînavên edalet û azadiyê yê xwedî ked;
ku wek xencerê li singa îxanetê ketine*

DÎROK NIHA YE

Bi Nêrînek Cewherî Dîroka Kurdistanê

Kasim Engîn

Cihê Çapê: Çapxaneya Azadî

Sala Çapê: 2018

Weşanên Ocaxa PKK'ê ya Sakîne Cansiz

PÊŞEK	7
MIROV DÎROKÊ BI AWAYEK ZINDÎ BIJÎ	11

Çend Gotinên Li Ser Nêzîkbûna Dîrok û Civaka Kurdistanê	11
Şertên Civak û Erdnigariya Kurdistanê	24
Nirxandinek Kurt Têkildarî Dayik'ên Kurdan	28
“Gelê bi qasî Xakê Kevnar, Kurd” û “Sêgoşeya Zêrîn”	41

DU XETÊN MOHRA XWE LI DÎROKÊ DANE: ÎXANET Û BERXWEDAN	63

Felsefeya Zerdeştîyê	63
Qralê Dawî yê Medan Astiyag û Îxaneta Harpagos	67
Magamoniya Persan û li Kurdistanê Pêvajoya Dagirkeriyê	71
Jiyana ne li gor Herikîna Pêşketina Dîrokê û Encamên wê	85

EREBKIRIN: SEDSALA 10'EMÎN BÊGÎTIYÊN KURDAN Û TÊKILIYÊN KURD-OSMANIYAN	87

Li Kurdistanê Hevkariya di Encama Dagirkeriya Ereban de Pêş ket û Berxwedanên li Dijî vê	87
Çînîbûyîna li ser Esasê Hevkariyê Pêş ket û Avabûna Tebeqeya Jor	99
Li Kurdistanê Sed sala 9. û Rewşa Piştî wê Pêşketina Kurdan a di vê Merheleyê de	102

EZÎDÎ Û FERMAN-QIRQIRINÊN LI HEMBER ÊZÎDIYAN HATINE KIRIN	115

Hatina Tirkan a Anatolyayê û Şerê Melazgirê	124
Mîna Kulîyan Dagirkeriya Moxolan a li ser Herêmên Kurdan ...	128
Di Sed salên 15-16'an de Pêwendiyên Osmaniyan û Kurdan	132

DI SEDSALA 19. DE KURDISTAN Û BERXWEDAN..... 159

Rewşa Osmaniyan	159
Li Rohhilata Navîn Siyaseta Îngilîzan.....	161
Berxwedan û Îsyânên di Sed sala 19. de Pêş Ketin û	
Karakterên Serwerên Kurd	163
Berxwedana Mîrtiya Baban	167
Berxwedana Rewandûzê	169
Berxwedana Botanê ya Bedirxanan.....	175
Berxwedana Îzzeddîn Yezdanşêr.....	184
Serhildana Şêx Ubeydullahê Nehrî.....	187
Di salên 1800'an de li Kurdistanê Derketina Neqşîbendîtiyê	191
Li Kurdistanê Avakirina Saziya Axatîyê ya Lihevçêkirî ye	198
Alayên Hemîdiyê û Mangurtkirin.....	203
Bi Dibistanên Eşîran Projeya Avakirina Mejiyên Pêşerojê	208
Li ser Sabetayîti, Cihûtî û Tirkîtiyê Çend Gotinên Balkêş	213
Li Ser Îttîhad û Teraqiyê Nirxandinek Kurt	224
Di Salên 1900'an de Cemiyetên Kurd.....	229
Beriya Şerê Yekemîn ê Cihanê, Dîsa di Pêvajoya vî Şerî	
û Piştî Şer Rewşa li Kurdistanê	233
Têkildarî Têkiliyên Kurd û Ermenan Çend Gotin	248

TEXRÎBATÊN KAPÎTALÎZMÊ Û DI SEDSALA 20'EMÎN DE BERXWEDAN Û ÎSYÂNÊN LI KURDISTANÊ..... 261

Sykes-Pîcot, Osmaniya Belavbûyî, Rewşa Kurdistanê ya Piştî	
Peymanên Sevr û Lozanê	261
Têkildarî Nêzîkatiya Mustafa Kemal a di Salên	
1919-1923'yan de li Hember Pîrsgirêka Kurd.....	271
Berxwedan, Îxanet û Sedemên Nerserketînê	276
Cemiyeta Azadî	276
Îsyana Şêx Seîd.....	277
Têkildarî Plana Islahkirina Şerqê Çend Gotin	286

Têkildarî Berxwedanên Piştî Îsyana Şêx Seîd Agahiyên Kurt	299
Cemiyeta Xoybûnê	308
Berxwedana Agiriyê û Îhsan Nûrî Paşa	310
Berxwedana Dêrsimê, Rapora Kurdan a Înonu, Îxanet û Qirkirin	318
Têkildarî Tîpên Îxanetê Hewl Daye Biafirîne Mînakên Balkêş; Enkîdû, Mattîzawa, Harpagos	336

KURDISTANA PIŞTÎ BERXWEDANÊN HATIN TEPISANDIN 348

Piştî Berxwedanan Li Beramberî Rewşa Cîhanê Rastiya Kurdan	348
Meyl û Tevgerên Curbicur ên li Bakurê Kurdistanê Derketin Holê	355
Li Rojhilatê Kurdistanê Rewşa Pêşketin û Têkoşînê	364
Li Başûrê Kurdistanê Rewşa Pêşketin û Têkoşînê	383
Li Rojavayê Kurdistanê Rewşa Kurdan	409
Li Qafkasyayê Rewşa Kurdan	416
Pêşketina Îxaneta li Hemberî Xwe û Welatê Xwe	418

HIŞYARBÛYÎNA NETEWYÎ Û ŞERT Û MERCÊN AVABÛNA PKK'Ê 423

Ezmûnên Rizgariya Neteweyî	423
Tevgera Şoreşgerî ya Tirkiyeyê	426
Tevgerên Çepgir û Reformîst ên Kurd	428
Rewşa li Parçeyên din ên Kurdistanê	429
Hewcedariya Bi Tevgera Neteweya Demokratîk	434
Wek Parastina Rewa ya Gelekî Avabûna PKK'ê	435
Li Kurdistanê Parastina Rewa ango Şertê Hebûnê Li Kurdistanê Kevneşopiya Berxwedanê	438
Li Kurdistanê Karaktera Serweriyê	445

Mafdarî û Neçariya Hebûnê	448
Bingeh û Ferasetên Civakî yên li dijî	
Têkoşîna Azadiyê tî Danîn.....	452
Feraset û Kesayetên Feodal Komprador.....	452
Feraset û Kesayetên Tevgerên Reformîst û Teslîmkar	455
Rêxistinên Dijber ên Fêrî Îxanetê Bûne	458
Berxwedana Hîlwan-Siwêregê û Şemaqa Yekemîn a	
li Feodalîzma Hevkar hat Xistin.....	465
Paşdevekişîn, Faşîzma 12'ê Îlonê,	
Amadekariyên li Derveyî Welat û Biryara Vegera Welêt	472
Rojîya Mirinê ya Mezin a 14'ê Tîrmehê	
Xencera li Dilê Îxanetê Ketiye!	488
Li Şûna Encamê.....	499
ÇAVKANÎ.....	508

PÊŞEK

Rastiya “**Dîrok, Niha ye**” an jî “Bi Nêrînek Cewherî Dîroka Kurdistanê” bi îlhamgirtina ji gotina “**Dîrok di roja me de veşartî ye û em di destpêka dîrokê de veşartî ne**” hatiye nivîsandin. Ev gotina Rêberê Gelê Abdullah Ocalan, her tim bandor kiriye. Abdullah Ocalan ku paşê di parêznameyên xwe de tespîta “**Civak ji mîna hebûnên organîk ji avabûnên genan pêk tên**” jî tesîra xwe çekiriye.

Di nirxandina dîrokê de; bi gotina wêjevanê bi nav û deng Charles Dickens, “*ez çawa cilên xwe bi bizmarekî dadiliqînim, bûyerên dîrokî jî ji bo ku karibim nêrînen xwe pê ve daliqînim spartekên herî saxlem in*”, hewl hatiye dayîn ku di vê pirtûkê de jî li gor bûyerên dîrokî nêrîn bên pêşxistin. Jixwe nêzîkatiya “*Nivîskarên dîrokê ne tenê çavdêr in. Bi xwe jî parçeyekî çalakiyê ne û divê di nav çalakiyê de çavdêriya xwe jî bikin*” ku ji hêla dîroknasê mezin John King Fairbank hatiye ziman, di astek bilind de van gotinên me ronî dike.

Helbet dikare bê pirsîn ku ev lêkolîn çiqasî objektîf e. Eger em bi zimanê lêkolînavanekî dîrokê bersivê bidin vê; “*Dîroknasê Objektîf*” ne ew kes e ku xwe objektîf dihesibîne yan jî wisa tercîh dike û xwe jî tevahî îdeolojî û girêdana pêvajoyê cihê dibîne. ‘*Dîroknasê Objektîf*’ ne ew kes e ku nivîsandina xwe ya dîrokê wek rastiyekek bêqisûr pêşkêş dike; lê ew kes e ku sînorên rastiyeke dîrokî û teoriyan qebûl dike, bandora wan a li ser xwe ferq dike, her wiha di kîjan rastiyan û nirxan de gihiştîye encamên dawî jî vedibêje.” (Ayşe Hur)

Ev xebat li çiyayên asê û atmosfera gerîla ku bûne karakter û sembola Kurdistanê, hatiye nivîsandin. Bi qasî ku avantajên nivîsandina li vê qadê hene, hin dezavantajên wê jî hene. Avantajên wê ew in, ji tevahî zext û bandoran dûr e, bi fikrandinek azad û bêsinor çî dixwazî binivîsî dikarî binivîsî. Ji her cure zanîstperestîya demên modern a akademîzmê û ji qaşo fêrkirinên disîplînen nivîsê azad e. Her wiha bawerî û berhemdariya ku tu bi xwe dîroka azadiyê ya bi xwe di nav de yî dinivîsî. Yek ji dezavantaja wê ew e, şertên şer-demê, derfetên nivîsandinê bandor dike. Yeka din jî wisa dikare bê diyarkirin materyalên ku tu têkildarî mijarê dixwazî lêbikolî, nikarî bi hêsanî bi dest bixî. Lê, tevî van hemû rewşan jî

dema em avantaj û dezavantajên li çiyayên Kurdistanê bînin beramberî hev, tevî hin bêderfetiyan jî, bêguman nivîsandina li atmosfera gerîla hê bêhtir avantajên xwe hene. Divê bê destnîşankirin ku dema ev xebat hat kirin sûd destpêkê ji parêznameyên Abdullah Ocalan, dahûrandinên ku bi salan kirî û hin xebatên pirtûkê û her wiha ji pirtûkên cûrbicûr ên lêkolînê ku bi salan e li atmosfera gerîla hatine nivîsandin, hatiye girtin. Di destê gerîla de kuliya-tek dewlemend a lêkolînê heye. Dema me xebata vê pirtûkê plan kir û xist meriyetê, me ev rastî cara yekem ewqasî bi zelalî dît. Ev di heman de ji hêla me wek mijarek rexnegiriyê hatiye ferqkirin. Em hêvîdar in ku pirtûka di dest we de bi çavkaniyên ku wek referans dane wê karibe hinekî jî be sergîhayî bibe.

Heta em behsa mijarek din a girîng nekin, naxwazin vê derbas bikin. Ji bo dîrok-dîroka gelan- bê nivîsandin divê destpêkê em karibin derkevin derveyî sînorên daneyên heyî. Erê, ji ber vê jî heta daketina kûrahiya Dîroka Kurdistanê nebe ev ê zehmet be. Heta cih bi cih dibe ku bêimkan jî be. Ji bo Dîroka Kurdistanê -em jê re bêjin Dîroka Çandî- bi daneyên şênber bê dayîn divê destpêkê zimanê destanên devkî yek bi yek bînin çareserkerin. Çareserkerina zimanê wê tê wateya nixwandinê. Xebatek wisa niha li naverastê ye. Dîroknas, zimanzan û dibe ku wêjevan rojekê vê xebatê bikin. Lê, lêkolînanên bihîzîyar ên Kurd-Kurdistanê yê ku dîroka xwe lêdikolin û bi lêkolînan dixwazin ji bo xwe encaman bi dest bînin, eger serî li xebateke wisa bidin an jî ji vir dest pê bikin dibe ku ev ji bo wan gelekî bi watedar be.

Em dûvdirêj nekin, gelek tiştên werin nivîsandin hene. Lê ji bo em karibin nivîsandinan hê bi tenduristî binivîsin divê destpêkê destan, stran, kilamên li ser zimanên dengbêjan digerin û çîrokên ku me ji dayikên xwe û mezinên xwe bihistine ku dîroka devkî ya dîroka Kurdan e, em karibin yek bi yek hel bikin. Divê em li wan xebatên cîhangeran (seyah, gerok) ku di demên cuda de hatine Kurdistanê, binêrin. An jî mîna hevrêyekî me gotiye, “*An lawik, heyranok, lorîn, payizok, şîn, pale, destanên dengbêjên me... Govedên Botanê û muzîka Botanê ya ku mijara wê ya esasî, fîgur û giyana wê bi eksên jinê ye, îfadeyên yekser, belgeyên bêguman ên şaristaniya jinê ku bi xwezayê re hevşengiyek wê ya yekpare heye, ruh û fîgurên hariqulade yê jiyanê civakî ya ku xwe dispêre*

berhemdariya civakî vedibêje û ji hêla hêzên serwer ên rêxistinkirî hatine wêrankirin, tinekirin” em karibin safî bikin.

Dîsa rastiya ku mîna hevalekî din tîne ziman, “*Di nivîsandina dîrokê de mîna xebatên arkeolojiyê dibe ku bi tonan ax, kevir derkevin; lê tenê ji vê çend parçeyên biçûk bi kêr bên. Dibe ku wek çawa te tevkarî bi demê re nekiribe, her wiha wisa jî demek mezin xerc kiribe. Nivîsandina dîroka çandî jî ev e, wisa gav bi gav, parçe bi parçe bi serê derziyê tu rastiyan ku bûne beton dikolî û dane-yan kom dikî. Ji bilî vê ti rêyên din jî nîne. Nîrxên ku wisa parçe bi parçe derketine jî di demên pêş de kêlî bi kêlî dikare bîn hûnandin û yekparebûnek dîrokî dikare bê sazîkirin”* bê zanîn û daneyên dîrokî bîn berhevkirin. Ev mîna wezîfeyek mecbûrî ya welat-parêzî, demokratbûn heta şoreşgerî li pêş me disekine.

Û helbet mesele ye ku ji nav bi hezaran materyalên nivîskî beşên aîdî Kurdistanê bîne derxistin. Dîtina yên aîdî vê xaka ku tine hatiye hesibandin, her tim li derve hatiye hiştin û dîroka wê her tim bûye malên hinekên din, qadeke bingeîn a kedê ye. Wezîfeyek dîrokî ye ku ewil divê milên wê yên Kurdistanî yên ku di pirtûkên pîroz de tên ziman, bîn dîtî û paşê jî ji nav dîrokên Sumeran, Akadan, Asûriyan, Persan, Yewnanan, Partan, Ermenîyan, Romainyan, Sasaniyan û heta Ereban, Tirkan, Moxolan, Sefewîyan, Osmanîyan, Îngilîzan, Rûsan, Fransîyan û bi dehan rengên ku em ê li vir nikaribin navên wan bidin, yên aîdî Kurd û Kurdistanê bîn dîtî, eger hatibin berevajîkirin bîn sererastkirin û bîn ragihandin. Ango, kêmasiya materyalan nîne, lê pirsîgîrêk û wezîfeyê derxistina yên heyî heye.

Abdullah Ocalan tîkildarî nivîsandina dîrokê ya nû dibêje; **“Zanista dîrokê li ser rêya pêşketinê ye. Lê divê hê gelek qonaxan biçe. Dîroka bi hegemonya îdeolojîk a şarîstaniyê barkirî, rastiya civakî-dîrokî rohnî nake, xwedî fonksiyoneke serkorkirinê ye, bêtî ku em vê ji bîr bikin, divê em xebatên xwendin û nivîsandina dîrokê bikin.**

Ez bawer dikim ku pirtûkên dîrokê yên ji nû ve bîne nivîsandin, wê nexasim qîmetê mezin bidin pêşketina sîstemên qebîleyan. Jiyana malbatê jî di navê de, xebatên ekonomîk, civakî, siyasî û îdeolojîk (dînî, hunerî û zanistî jî di navê de) bi şeweyekî li cih û nûkirî di çarçoveya qebîleyan

(komun) de pêşketina wan, ji bo pêşketina jiyana civakî bi awayekî t êkûz wê destjênebûna xwe dewam bike. Sazîbûna şîrketkar, malbatî û xanedaniyê ya her tiştê wan ji bo karê û modernîteya bi tenê qalikê wê maye, mirovatî nikare demeke dirêj hilgire. Mirovatî nikare vê xwedatiya ‘bûyî Zeus’ dewam bike ya ku saziya saziyan a dijberê jiyanê û lihevçêkirî ya dewleta netewe ye.” Bi vê xebata xwe ya “**Dîrok, Niha ye**” (Bi Nêrînek Cewherî Dîroka Kurdistanê) me xwest em bi çavekî li dîrokê binêrin. Her çiqaşî armanca me ya esasî lêkolîna dîrokê be jî, ji kêliya ku me dest bi xebatê kir êdî bû wek neçariyekê ku em ji nêz ve li qehremantî û îxanetên li Kurdistanê binêrin. Heta em nebêjin xebateke demdirêj û bi meşaqat bû, ne rast e ku em derbas bikin. Lê, eger ev xebat ji bo bîranîna hevrêyên me yê şêhîd ku bi canê xwe, ruhê xwe û kedên xwe yê derasayî xewnên azadî û yekîtiya Kurdan berbiçav kirine, bibe bersivê mutewazî jî wê demê em ê karibin bêjin, em gihiştine armanca xwe.

Erê, me jî hewl da bi utopya û rastiyan ku em pê bawer in û di oxira wê de t êdikoşin binivîsin; bi hêviya ku yê di dîrokê de hatine pelçiqandin, biçûkkirin, li derve hatine hiştin, hatine mêtin, çîprûtan, paqrûtan û yê bi hezaran salan wek dîlgirtiyên serweran her t ên qetilkirin, yê bê ziman hatine hiştin, ciwanên ku tevî hemû jin û zarokan siberoja wan hatiye tarîkirin; ji bo karibin bigihêjin edalet, wekhevî, xwişkî, biratî, azadî, piştevanî û jiyana komunal a ku heq dikin û ew rojên ku wê li xwebûnê vegeirin.

Ev xebat beriya bi 3 salan ji bo weşanê hatibû şandin û çapkirin. Lê belê hin aliyên kêr ên vê xebatê çêbûn, ev jî bi xwezayî hatin rexnekirin. Mînak ji ber t êkildarî Êzîdiyan beşeke taybet tune bû bû mijara rexneyê. Bi heman rengî ji bo beşa Rojhilatê Kurdistan û Başûrê Kurdistan hê berfirehtir b ê destgirtin pêşniyar çêbûn. Ji aliyekî ve ku em hewl didin van rewşan bi vê çapa nû re sererast bikin, bi heman rengî rastkirina hevokên kêr ê r ê li ber t êgihiştina şaş vedikin wek hewcedariyeke derket holê.

Em hêvîdar in bi çapa nû re ji rexneyên hatine kirin re kêmek be jî wê bersiv hatibe dayîn.

Kasim Engîn
1'ê Hezîrana 2017

BEŞA YEKEMÎN: MIROV DÎROKÊ BI AWAYEK ZINDÎ BIJÎ

Çend Gotinên Li Ser Nêzîkbûna Dîrok û Civaka Kurdistanê

Di roja me de tevahî civaknas li ser hêza kevneşopîya civakî nîqaşên gelekî balkêş dimeşînin. Êdî wek rastiyeke bêguman e ku kevneşopî li ser şikildayîna zîhnîyeta mirovan bandoreke diyarker dike. Dema nirxandina teşegirtina civakbûyîna Kurd, paşguhkirina guherîna dîrokî ya kevneşopiyê ji bilî şêlûkirina mejîyan nabe ti tiştêkî din. Dahûrandinên ku Abdullah Ocalan di vê mijarê de kiri-ne gelekî balkêş in; *“Tê gotin ku, rêûresm çi be, pêşeroj jî ew e... Civakeke ku bingeha wê şaş hatibe lêkirin, eger sererastkirina hewce dike di cih û dema wê de neke, li gor naveroka xwe wê hilweşînekê bijî. Dîrok û Civakeke ku rast nehatibe terîfîkirin jî wê tu carî ji bûyîna çavkaniya tehlûke û pêxîrtengiyê nikaribe rizgar bibe.”*

Dikare bê gotin ku teşegirtina zîhnîyeta jiyana civakî bi qasî Abdullah Ocalan ti rêber û ramanmendên din tune ku ewqasî zelal û xwerû analîz kiribe. Di vê mijarê de analîzên ku sosyologan, antropologan û bi kurta hî beşek mezin a civaknasan kirine, ji bilî qutkirina civakê ji kok û çavkaniya wê ya esasî, ti wateyek xwe ya din nîne. Xwediyên van ferasetan ku xwe wek ‘Zanyarên Civakî’ bi nav dikin û mîna ekolan bi sazî dikin, dînamîkên civakî her roj ji hundir ve dihelînin. Bê zanista bûye desthilatdar çi bela anîne serê civakê jî Abdullah Ocalan di parêznameyên xwe de bi berfirehî nirxandîye: *“Di vê mijarê de dibe ku şaşîti ne di tespîtên zanîste de bin, lê bêguman e ku di rêbaz û tarzê de zehf dikeve nav şaşîtiyan, berê tevahî dînamîkên civakî dide aliyên şaş.”* Ev wek rastiyeke her roj derdikeve pêşberî me. Xwedî girîngîyek jiyana ye ku di vê mijarê de rêbazên tespît û pêkanînên zanistê ji hev bîr cudakirin û neyên tevlîhevîkirin.

Di vê serdemê de zanist mîna hebûnên organîk ji bo civakbûyîna jî behsa avabûnên (bastûr) genan dike. Bi şeweyekî nêzî rastiyeke nirxandina merheleyên pêşketina diyardeyê, ji bo fêmkirin

û çareserkirina “kaosê” ku îro civakbûyîn di nav de ye, girîng e. Li ser vî esasî, rêya analîzkirina rast a civakbûyîna Kurd, girêdayî analîzkirina rast a dîrokê ye. Abdullah Ocalan serîdan (tekâmulevrîm) mirov û civakbûyînê ji “şaneya kokê” digire, bi analîza dîroka civakî û sosyolojîk pê de çûye û perspektîfek nû daye vê mijarê. Lêgerîna ku em di vê mijarê de bikin wê ew be ku em li gor vê perspektîfê pêkhatina civakbûyîna Kurd lêbikolin. Wê zêde maneya xwe nînbe ku eger em ji aktuelê (rojane) dest pê bikin û hewl bidin formata zîhniyeta Kurd diyar bikin. Jixwe ev rêbaz jî çareseriyên rast di nav xwe de nahewîne. Her tim destnîşankirina hêza kevneşopiyê jî ji ber vê rewşê ye.

Piştî girêdan bi vî şiklî hat diyarkirin, dikare bibe nuqteyek destpêkê ku ji pêkhatina etnîseya Kurd bê nirxandin. Abdullah Ocalan dibêje **“Bi qasî ku tu dîrokî bibî, tu ewqasî dikarî bi rastiyê re bî”** û destnîşan dike ku ev halê avabûna destpêkê ya Kurdê ku heta îro jî hikmê xwe li zîhniyeta me dike, hê jî hêz û zindîbûna xwe bi rêjeyek mezin diparêze. Wê demê em dikarin avabûna xwe ya destpêkê bişibînin “şaneya kokê” ya organîzmayek zindî. Eger em bikaribin cîhana xwe ya wate û hestan ji dilopa wateya yekem heta îro bînin, dikare bibe sedema encamên mezin. Ango, **“Dîrok, Niha ye.”** Lê bi ferqekê, dema ku ji herikîna dîrokê, xelekên derew û çewt bînin derxistin, şaşî-şkestin, xapandin jî yek bi yek wê bînin dîtin!

Ji ber ku; mîna organîzmayek zindî ev avabûn jî di dîrokê de heta roja me ya îro bi awayekî bînavber hebûna xwe bi şiklekî domdar aniye. Ji ber ku dîrok ne ew diyarde ye ku tenê carekê pêk hatiye û bi dawî bûye. Dîrok, mîna çemekî şopa xwe hiştiye, ji çavkaniyên din mezin bûye û rola seraktor a cîhana wateyê listiye. Nêzîkatiya zîhniyeta sîstema hiyerarşîk e ku dema dîrok tenê bi agahiyên ziwa, kronolojîk bê nirxandin. **“Kêliyên welê hene, dîrok di şexsekî de, şexsiyet jî di dîrokekê de veşartî ye. Her wiha di asteke prensîbî de bawer dikim ku îroyîn (rewşa niha) dîrok e, dîrok jî niha ye. Rewşa niha ya xwecih, bi tenê weke dubarebûnekê, weke rêûresmekî dîrokê dubare nake. Heçku “niha” dîrok e, siberoj e.”** (Abdullah Ocalan, *Sosyolojiya Azadiyê*) Bi kurtasî, nêzîkatiya me hê afirîntir û berhemdartir e. Ji bo wateyên ku bi awayekî şaş li dîrokê hatine barkirin bînin derbaskirin

û bikeve ew bergeha pêroz a ku heq dike, girîng e ku li beramberî cewherê diyarker ê dîrokê nêzîkatiyek rast çêbibe, ji vê jî encamên pêwîst bîn derxistin. Dema tê gotin ku “*Dîrok, hafizaya gelekî ye, yê dîroka xwe nizanibe dişibe mirovekî ku hafizaya gelekî ji dest daye*” û “*Mirovekî bê dîrok, mirovekî bê kok, bê siberoj û bê hafiza ye*” herhal behsa vê rastiye tê kirin.

Dîrokek, bi qasî ku bi heybeta xwe, ewqasî jî bi nebesî û têkçûnên xwe ve îro li pêşberî me sekiniye. An biecibînin an necibînin, hez bikin an nekin, wek rastiyeke ev diyarde her roj xwe dide hîskirin. Baş e, ji vê dîrokê çi bûye para gelê Kurd ê qedîm? Vê dîrokê ji bo Kurdan rastiyeke çawa ya civak û ferd ava kiriye? An jî ev dîrok ji hêla kê û bi kîjan rêbazan hate kontrolkirin? Bêguman, bersivên rast ên van pirsan wê karibe gelek nuqteyên di tarîtiyê de mane ronî bike.

Armanca me ya ji vê xebatê, nivîsandina îxanetên neteweyî ne jî ku bi Dîroka Kurdistanê re li Kurdistanê rû dane û hê heta îro jî dewam dikin. Mexseda me bi vi şiklî ew e avabûna PKK’ê, bi şertên demê re şemûga (eşik) tinebûna civakî û asta neteweya demokratîk a ku encama şerê hesabxwestina ji dîrokê û têkoşîna xedar e, hê zelaltir bê ronîkirin. Ji bo Formê Civaka Kurd baştir bê fêmkirin, carna wê hin kirpandinên dîrokî çêbibin û cih bi cih em ê kûrtir bikin. Ev jî ji ber girîngiya mijarê ye. Zêdetirî ku em diyalektîka pêkhatina etnîsîteyê ango nîrxên civaka komunal bikin mijar, hedefa me ya destpêkê wê bandora şertên dîrokî-civakî ya li ser zîhniyeta Kurdan be. Armanca me ya esas jî ew e, em Dîroka Kurd, diyalektîka berxwedan û îxanetê di nav hev de bidin. Bi giştî dema Dîroka Kurd tê gotin, pênaseyên mîna “*gelê ku gurê xwe zêde ne*” an jî “*gelê ku îxanetkarên xwe zêde ne*” bi zêdeyî tên kirin. Esas, ev gotin xwedî wateyên kûr ên sosyolojîk in. Bêyî ku em vê sosyolojiyê hel bikin, çareserkirina Kurd hema hema bêderfet dibe. Ji bo ev pêk were jî bêguman neçarî ye ku em bikevin nav kûrahiya Dîroka Kurdistanê.

Baş e, ev erdnîgarî û civaka ku civakbûyîn afirandiye, ji bo formên herî pêşketî yên hem dewletparêz hem jî ji şaristaniya demokratîk re bûye dergûş, gelo çawa dibe esîrê paşverûtiyên mîna vê? Ne mimkun e nakokiyek wisa zor û kûr bi nêzîkatiyên wisa basît, ji rêzê û seranserê bê çareserkirin. Ji ber vê ye ku hêza kev-

neşopiyê ewqasî li ber çavan tê girtin. Kevneşopî li milekî jî vehûna çandê bi xwe ye ku jiyane watedar dike.

“Kevneşopî, bi wateyek berfireh şeweyê jiyane, zanistê, pro-jeyê, baweriyê ye ku ji nişkekê derbasî ya din dibe; bi wateyek hê berfirehtir çanda ne madî ye. Di wateya teng de jî, domahiya nîşan nêrînê civakekê yê li ser mijarên girîng in. Kevneşopî, wek devkî û nivîskî dibin du beş. Di rêkûpêkkirin û kontrolkirina hê xurtir a jiyana civakê de xwedî rolên girîng in. Kevneşopî yê li ser piranî kevneperest in, li ser saziyên civakî yê mîna malbat, hiqûq, ol û polîtîkayê xwedî bandor in. Dema takekes li dijî kevneşopiyên kom an jî civaka xwe derkeve, li gor pileya dijdêrkirinê ji aforozê heta êrîşê, ji kêmditînê heta tinazkirinê cureyên nerazîbûnê teşe digirin. Hewl dide cezayan, ji bo tevgerên li dijî wan, yasa û kevneşopiyên wan bi qeys bike. Kevneşopî, piranî qadek ji ya yasayan hê berfirehtir bi rê ve dibin.” (Abdullah Ocalan SBA. Ferheng)

Ev vehûna (raçinka) çandê ya ku rêya şaristaniyê vekir û îstîqamet dayê, ji bo karibe nîrxên civaka xwezayî li dijî koletiyê biparêze têkoşînê pîroz meşandine. Li gel vê jî di asteke kêma de be jî îxanet dawerivandiyê. Ev jî wek nakokiyek cîdî hê jî hebûna xwe didomîne.

Ji dema ku fikrandina mirov dest pê kir û şûn ve îxanet bi awayekî herî bi lanet di wijdan, bawerî û nêzikatiyan de hatiye mehkûmkirin. Di her civakeke cîhanê de tekane qaîdeyek hevpar heye. Ev jî ew e, êrîşa li dijî cewherê xwe mîna îxanetê qebûl dike û bi pêkanîna herî hişk ceza dike.

Wê demê, ev a di civaka Kurd de rastiyeke çawa ye ku ji bilî hînbûna îxaneta rojane, tevî vê ketîbûna sosret pelek jî naleqe? Heta berevajî, ferdên di asta xayintiyê de ne, mîna mîrxastî kirine jî hespên xwe li qadan dibezînin. Di beşên pêş de em ê vê bi detay bikin, lê em pêdiviyê pê dibînin ku çend mînakên bidin: Dema Harpagos îxanet li Astiyages kir û di sinîya zêr de qraltiya Medan pêşkêşî Persan kir, ewqasî xwînsar e ku canê wî jî pirçûk nade. Heta mîna me got berevajî vê, tu dibêji qey li dijî Astiyages marîfeteke baş kiriye jê re dibêje: *“Binihêre, tu duh qral bû, îro kole yî.”* Hê di demên nêz de em dikarin bi rehetî bibînin, hin kesayetên ku bi dehan salan di saziyên Dewleta KT’ê de siyaset kirine yan jî difikirin ku siyasetê dikin, çawa di carekê de li serê me

dibin Kurd. Heta ji vê hê xerabtir, bêyî rûyê wan jî sor bibe, bêyî şerm bikin bi rehetî dikarin êrîşê bibin ser zarokên gelê Kurd ku li serê çiyayan bi canfedayî têdikoşin. Vê carê bi mîna keke berevajî-kî, gelek kesên ku bi dehan salan di nav Têkoşîna Azadiyê de mane, dest jê berde tenê terikandina çiyayan, li cihên ku çûnê, li rex hevkarên û Dewleta KT êrîşî Têkoşîna Azadiyê dikin. Hin kesayet vê hê pêşdetir dibin û tevî xebatên kontrayan dibin. Heta ev nêzikî neyên çareserkerin, çareserkerina Kurd bêîmkan dibe. Heta Kurd jî neyê çareserkerin, çareserkerina vê dîrokê bêîmkan dibe.

Xusûsek din a girîng jî wê ew be ku em ê di dîroka Kurd de li rêbazên têkoşînê binêrin. Ji ber ku çanda têkoşînê an jî çanda şerkeriyê ya ku ji kûrahiya dîrokê ve tê, bi giranî bandora xwe li aktuelê jî dike. Dîroknasê Şer James Keegan dibêje; *“Çanda gelan, çanda wan a şer an jî têkoşînê yekser bandor dike.”* Esas dema Abdullah Ocalan dibêje, **“Civak jî mîna hebûnên organîk ji avabûnên genan pêk tên”** qesta vê rastiyê dike. Çanda têkoşînê, parastinê Yan jî şer a ji pêşyan maye, îro jî di Çanda Şer a Kurd de tê dîtin. Ma mimkun e em ew “pêşmergetiya” ku li ber çavên me bi salan e didome, di merheleyên herî destpêkê yê dîrokê de nebînin? Çiqasî dişibe îro ku ji bo karibe xwe bike terîka hêzek dagirker an jî mîna eşîrên dixwazin zewiyên cîranê xwe desteser bikin, derbasî cem dagirker dibe, rê û rêbazan li ber dixê, tevî dijminê xwe êrîşî gelê xwe, xwîna xwe û cîranê li ber deriyê xwe dike! Her wiha pêwîst e mirov behsa bi dehan eşîrên ku derbasî aliyê dijmin dibin û cerdevantiya çekdarî dikin jî bike. Ev rewş jî bo hafizayan ne xerîb e. Ew şerên ku rojane di nav Formê Kurd de jî bo berjewendiyên biçûk diqewimin, tew em nêzikî mijara gotinê jî.

Bi armanca fêmkirina îro, daketina nav rûpelên tijî ders ên dîrokê, ji bo destwerdana rêveçûna serberjêr a Dîroka Kurdistanê û dîsa ji bo ev dîroka jirêderketî careke din bikeve ser rêya xwe girîng e. Abdullah Ocalan girîng dibîne ku ferd xwe bigihîne rêbazên xwenasînê û analîzkirinê. Potansiyela di mirov de heye eger li ser bingehekî rast û hevgirtî bê bikaranîn, xwedî hêzek wisa ye ku dikare tevahiya civakekê bandor bike. **“Ti carî îdeolojî û projeyên azadiyê di carekê de di mejiyê avahiya civakî de şîn nabin. Ewî jî takekes dest pê dike, dûvre jî di civakê de wate-**

dar dibe.” Ocalan, vê rewşê wisa dinirxîne; “Xwezanebûn bingehê hemû zanebûnan e. Lewra zanebûnên bêyî xwe bizanibe werin bidestxistin, ji rêderketin û fikirsabitbûnê zêdetir tiştek nîne. Ji ber vê yekê, tevger û saziyên xwenizan ên di civaka mirov de derketine, bûne xwedî roleke serhişk û berevajî. Mirov dema nebe xwediyê agahî û zanebûna xwe, li derveyî vê zanebûnê hemû sistemên civakî yên tene avakirin dibin sedemên nakokiyên anormal û bûyerên xwînrij, karaktera wan a mijok jî bi sedema vê agahiya serhişk û sabit e.”

Nikare bê gotin ku di civaka Kurd de heta derketina PKK’ê ev rêgez watedar bûne. Li vir a xwedî parek mezin ew e, honandinek îdeolojîk a bi rengê xwe û li gor rola xwe ya dîrokî nehatiye bipêşxistin. Yek ji sedemên herî mezin jî ew e, avabûnên xwecih - eşîr- di avabûnek jor de nehatine komkirin. Ji ber herêmî maye yan jî giştî dinya bi cihê xwe ve sînordar hiştiye, hesta berpirsiyariyê ya li beramberî giştî jî kin maye. Bi gotinek din, xwegihandina çanda gel a giştî zeîf maye. Ev encama, bi awayekî gelekî sosret bandor li nêzikatiya civaka Kurd a li beramberî têkoşînê jî kiriye. Li ser vî esasî, wê pir girîng be ku sekna vî kesayetî di nav Têkoşîna Azadiya Kurd de jî bê nirxandin.

Divê ev xal bê fêmkirin: Kurdên bi vî şiklî, mîna paşayê nedîtî, dema bû paşa jî wek karê destpêkê wê serê bavê xwe jê bike. An jî ev ferdê Kurd, dema desthilatdarî bi dest anî jî mîna gurê çavsor wê har bibe. Gelo ev tîp çawa dibe ku bi vî şiklî bi awayekî ecêb vediguhere dijberê xwe? Hin ji xusûsên bingehîn ên divê ku em bi girîngî bala xwe bidinê jî wê ev bin.

“Gelên navdar, pêvajoyên dîrokî yên girîng ku di dîroka wan de dibin îfadeya wan, bi serbilindî bi bîr tinin. Di çaxên lehengtiya gelan de egîdiyên ku ji hêla pêşiyên wan hatine kirin, nayên jibîrkirin. Berevajî, wek efsaneyekê her sal di rojên diyar de yan jî bi aktîvîteyan tîp bibîranîn. Ne tesaduf e ku navên kesayetên wisa di nav civakê de navên herî zêde bin. Gel, bi vî awayî jî bo ew çalakî yan jî çalakvanên ku ew heta îro anîne, mohra xwe li dîrokê dane, şukranên xwe radigihîne. Ciwan bi van çîrokan tîp mezinkirin. Teşegirtin, bi van mîtan dibe. Lê di nav Kurdan de efsaneyek din jî heye. Ew jî ev rastî ye ku Kurd leşkerekî baş ê hinên din e.”

Em vê ji gelek çîrokên qehremantiyê dizanin. Ya herî aşîkar jî Rustemê Zal e. Li gel vê em dikarin gelek fermandarên Kurd ên bûne Şûrê Îslamê jî bihejmêrin. Mîna ke herî baş Sallahaddîn Eyyûbî ye.

Bi kurt û kurmancî, regekî wisa yê Kurdan di mejiyan de çêbûye ku mîna leşkerekî baş ê hinên din cih girtiye. Di ew çîrokan de ku şikil dane ruhê hevpar ên Kurdan, dîtina vê jî ne zêde zehmet e. Û mîna rewşeke normal jî li vê baniyane. Wek motîfekê wisa di seriyan de bi cih bûne ku li qadan şûrên herî li pêş in, lê ne yên xwe ne. Wek nimûne, Kurdan di nav yekîneya “Nemiran” a Artêşa Farisan de ku hêza muhafîzên taybet ên qral in, cih girtine. Gelekî êşkere ye ku vê nivandinê pir tişt ji gelê Kurd kêmkirine. Her wiha, mîna hêza nîşangir cihgirtina di nav Osmaniyan de jî gelek tişt jê birine. Herî dawî jî, di nav artêşa KT’ê de mîna sekvanekî baş cihê xwe her tim di refên pêş de girtin jî diyar e ku gelek tişt bi xwe re birine. Ev weke ‘qederekê’ hat qebûl kirin û heta roja me jî dewam kir. Wisa dixuye ku Kurdan têra xwe ev rewş nepirsîne, nikarîbûne pirsê wê bikin.

Karaktera hevkar a em ê dûvre bînin ziman, dibe ku zêde destûra vê nedabe. Jênehatin, dikare rê li ber nîrxandinên mîna qederê veke. Rastiyeke tal e ku hînbûn jî ji bilî pejirandin û radestbûnê ya mîna qederê, ne tiştêkî din e. Lê, pirsyariya rewşê jî ji bo derbaskirina rewşa negatîf rêyek e. Çalakiyek mezin e. Li vir nîrxandina diyardeya eşîrê wê di cih de be.

Destpêkê divê bê diyarkirin ku, eşîrparêzî ya nakokiya mezin a Kurdan e, nehiştiye di nav dîrokê de civaka Kurd tine bibe. Lê heman avahiya eşîrê, nehiştiye civak ne yekîtiya xwe ava bike ne jî li Rojhilata Navîn bibe “hêzek-dewletek”. Ango, li aliyekî hebûn parastîye, lê li milê din jî bûye pêbend (benpêk). Divê ev paradoksa Kurdan baş bê fêmkirin. Şerê eşîrî, dozên xwîndariyê, ji bo li dijî eşîrekî din xurttir bibe alîkarî û piştgiriya hêzên dagirker, anga gelek tevgerên eşîrtî yên ku dixin bin serweriyê; dide pirsîn ku bê Kurd ji diyardeya îxanetê çi fêm dikin. **“Eşîr, bi awayekî weke federasyona komên qebîleyan hê bêhtir girîng in. Hebûna xwe bi giranî li hemberî êrîşên şaristaniyên koledar bi dest xistine. Ji bo tinenebûnê û pêdiviya bi berxwedanê, rêxistiniya eşîrê derxistîye holê.”** Lê: *“Gund û gomên li çiyayan çiqasî bûne qadên*

azadiyê, bajar jî ewqasî bûne qadên biyanîbûnê, hevkarîyê, kolebûnê û asîmîlasyonê. Cudahiya bajar-gund, li ser vê hîmê jî bi kûrahî bandora xwe li civakê dike û cudahiye dixwe nav. Ev veqetandin, di siberojê de wê wek cudahiya herî bingeîn a Kurdan bimîne û cudabûyînek sosyal e ku heta roja me jî heye. Kurmancê azadîxwaz ê li çiyê û beşa hevkar û arîstokratên etnîk ên li bajêr, wê dubendiya gel-serwer a etnîsîteya Kurd pêk bînin.” Her wiha Abdullah Ocalan dibêje: **“Etnîsîteya Kurd çiqas azad e, arîstokrasiya wê jî ew çend hebûn û tinebûna wê diyar nîne û hevkar e. Li ser vî hîmî çînîbûyîn berevajî ye û bi înkara nijadê re di zik hev de ye. Çîneke arîstokrat a mîna Grek, Roma û Pers di civaka Kurd de dernakeve pêş. Zêdetir di nav arîstokrasiyên serdest de dilê xwe dibijîne wan û wisa şikil werdigire. Vegotina ‘ji qral zêdetir qralparêz’ ji bo hevkarên Kurd li cih e. Eger arîstokrasiyek mîna ya Roma, heta ya Sumêr û Misrê çîneke dewletê derketibûya, bêguman wê pêşketinên civakî yên li Kurdistanê cuda bûna.”** Cudabûna arîstokrasiya Kurdan ji taybetmendiye çînekê bêhtir, pêşketinek di karakterê hevkarîyê de ye.

Diyardeya îxanetê, di dîroka civaka Kurd de ne ji ber gelekî hatiye xwestin û tercîhkirin; ji ber avabûna civakî, bi şeweyekî yekser têkildarî rêxistinbûyînen xwe yên hundirîn, wek trendek pêşketina xwezayî çêbûye. Dema îxanet nebû pîrsgirêkek hîlbijartinê yan jî bijartinê, ewqasî jî nebûye zehmet ku seknek li dijî xwe, ango îxanetkirin jî derkeve holê. Wek di têkoşînen çînan de jî gelekî tê dîtin, îxanetkirin ne ew pêvajo ye ku zehf hesabkirî dest pê dike. Berevajî, karakter û taybetmendiye ferdî, wî ferdî hêdî hêdî ber bi taybetmendiye şaristaniya ku tê de ye, dikşîne. Tew îcar tenê carekê jî xwe bi van qirêjiyên şaristaniyê kiribe, wê demê ji doza xwe jî bi lezûbez dûr dikeve. Gelek caran ferdên ku di nav vê rewşê de ne, ne di ferqê de ne ku ketine nav rewşek îxanetê jî.

Her bi ecêbmayînî hatiye pêşwazîkirin, kesekî ku berjewendiyên gelê Kurd diparêze, di nav refên wê de cih digire, rojeke din di nav refên dijmin de ye. Lê tim bi tim hatiye destnîşankirin ku sedema vê jî naye fêmkirin. Sedema vê ya sereke jî; formê paşve-mayî yê eşîrtiyê, avayî û têkiliyên qebîle, malbatî ne. Dema hebûna gelek eşîran û qebîleyan (hoz) digihêje rola bi bandor a li

ser erdnîgariyê jî yekîti nehatiye sazkin. Îbn-î Haldûn di Pirtûka Mûqaddîme de dibêje, “*Li welatên ku gelek qebîle û bavik lê ne, dewletên saxlem kêmtên dîtin.*” Sedema wê eşkere ye, mîna Abdullah Ocalan jî tîne ziman: “**Şêwazekî jiyanê yê qebîleyan ê nêzî komuntiyê hebû. Şêweyê jiyanê yê qebîleyê yek ji wan şêweyên jiyanê civakî ye ku tê de civaka exlaqî û polîtîk bi hêz heye. Qebîle her tim weke dijminên herî xedar ên şaristaniyên klasîk bûn, ev jî bi xisletên civaka exlaqî û polîtîk ve têkildar e. Her wiha fetihkirina wan mimkun nebû; yan dihatin tinekirin an jî azad diman. Lê hatiye dîtin ku bi demê re riziyanê, dejenere bûne. Hevkarên di nava wê de çawa ku di nava malbatê de bi roleke neyênî rabûne di nava qebîleyê de bi heman rolê rabûne.**”

Mirovekî ‘qederparêz’ her tim bawer dike ku kesê ew têkbirî xwedî serdestiyekê ye, lewma jî divê serê xwe li ber wî bitewîne. An jî bi awayekî şaş wisa bawer dike ku serîtewandin ji ber serfiraziya wî ye û ev jî kamiliya wî tê. Dema fikir û bawerî li ser vê şaşitiyê lê dibe, êdî tevahî rê û rêbazên serkeftî qebûl dike. Hewl dide li gor wê tevbigere. Ev pejirandina rezîl a ku em dikarin mîna xûyekî serîtewandinê binirxînin, taybetmendiyekî karakterîstîk ê avahiya eşîra Kurdan e. Dema bergirtî ma, di nav sînoren teng ên malbat, qebîle û eşîrê de asê bû, serî li ber zexta derve tewand, wê demê hewl dide bi şerê navxweyî ve xwe deşarj bike. Xwekêmdîtîni û serîtewandin, nehiştine ku hestên neteweyî jî bi pêş kevin. Tenê ne ev e jî. Li milekî din jî karaktera pixûdî (kesê ku bi xwe sînordar dimîne) pêş dikeve. Ji ber tengaviyê, vê carê ferdê ku ketiye vî halî li dijî civaka xwe agresîf (silek) dibe û jiyanê xwe wisa didomîne. Nêzîkatiyên Kurd ên gelek caran mîna sekterbûn, tengbûn, hêrsbûn û li beramberî tehrîka (navtêdan) herî biçûk jî şidandina kulma xwe dikare cudatir çawa were îzahkirin? Gelek caran îfadeya “em mirovên xwînsivîk in” tê bikaranîn. Lê ev ji bo vê rewşa travmatîk ne bersivêk têrker e. Berevajî; ev tengaviya ruhî ya ku xwe di ferd û civaka navbihurî de dide der, bi rengekî hêrsbûn, dilnîbûyîn û nerazîbûnê ve wek avakirina mekanîzmeyek parastinê hewl dide xwe biparêze.

Psîkanalîstê Awûstûryayî Sigmund Freud ku bi rêbazê xwe yê psîkanalîzê ve di pêşketina sosyolojîk a ferd û civakan de analîza

ruhî û dilinî dike, têkildarî figura bavê malbatî yê ku bingehê dide desthilatdarî-despotîzm û her cure serweriyên zextker, mînakên balkêş dide.

Mînak; di nav malbatê de bavekî otorîter, zorker heye. Ev malbat ji jinek, keçek û kurekî pêk tê. Bav, her kesî ditepisîne, dipelçiqîne. Destpêkê, kurê malê bi awayekî cîdî nerehetiyên xwe nîşan dide. Bi xwişka xwe re nîqaş dike ku ev rewş ji bo wan gihîştîye qirikê. Xwişk jî di heman fikrî de ye. Biryar didin ku li bav bidin ango bikujin, lê dema fêhmî dikin ku hêza wan têrê nake, dihizirin ku dayika wan jî tê tepisandin, piştî biryarê didin ku jê re bêjin wê erênî be, mijarê ji dayika xwe re jî vedibêjin. Dayik jî ji mêrê xwe bêzar bûye. Biryarek hevpar didin û nivê şevê dema bav razayiye wî dikujin. Dema mijara ku wê êdî kî bibe sermiyanê (reîs) malê dikeve rojevê, li gor sîstema bavîksalariyê, mêrê ciwan ê malê ango nêrê malê wê wek sermiyan bê diyarkirin. Lê, ev tabloya derketî wê ji ya berê bi despotîzmekê hê zorbetir be. Bi gotinek gelemperî, ji ber bayê diçin ber barovê (an jî bagerê). Ya pêkhatî ev e; Zarokê ku bi binhişî heyranê otorîteya bav e, ji ber nikare bingehê pêkanîna vî otorîteyê bibîne, ji bav nerazî dibe. Bertekek di wê astê de ye ku digihêje kîna qetilkirinê. Lê, ev heyrantiya binhişî, dema rayeyê bi dest tîne, wê demê di warê otorîte û rayeyê de ji bav hê jî bêperwatur dibe. Sedem jî ew e, ya bav rastiyeke û orjînal e, ya kur hê xam û jiberigirtî ye. Ev rewş jî bêperwabûneke bêeman bi xwe re tîne. Ev encama jî ew gotina M. Bakunî a dibêje, *“Demaku hûn taca desthilatdariyê deynin ser serê zîlamê herî demokratîkî, wê di nav 24 saetan de bibe dîktatorekî herî ketî”* tîne bîra mirov.

Bi eynî şiklî; di pirtûka “Mûsa” a Freud de bi awayekî balkêş tê vegotin ku bê qewmê Cihû destpêkê çawa bi Mûsa ve girêdayî bû, piştî çawa wî qetil kir û dîsa di heman çarçoveyê de çawa ew pîroz kir û wek ew rêya ku xwe bidin efûkirin çawa mezin kiriye. Dema Bûyera Mûsa ronî dike, bi rêbazê psîkanalîz jî hewl dide îspat bike ku bê ferdên civakê xwedî karaktera dubendiyek çawa ne.

Dema Abdullah Ocalan jî bûyer û diyardeyên bi heman rengî dinirxîne; kesayetên ku di nav Têkoşîna Azadiyê de jiyana komunal bi nêzîkatîyên xwe yên despotane xerab dikin bi gotinên

“dewletoka di nav malê de” an jî “makêta împaratoran” pênase dike, analîz dike û vê diyardeyê ronahî dike.

Wek tê zanîn, di dîrokê de yekeyên kolektîf ên destpêkê, nîjad an jî gens, ku di peresana (evrîm) mirovahiyê de xwe dispêre xwînê û ji dayikek hevpar tê, bingeha rêxistinbûyînên klan û qebîlean e. Qebîle ew kom e ku ji çend gensan pêk tê û girêdana wan a xwînê hene. Klan jî di çarçoveya xwezaya civakî de li ser esasê têgînên çêbûn-ziman-exlaq bê yekeyek çawa diyarker e jî Abdullah Ocalan wiha tîne ziman: **“Em dizanin xwezaya civakî nêzî ji sedî 98 jiyana xwe bi yekeyên ji 25-30 kesî pêkhatî û em ji wan re civaka klan dibêjin derbas kiriye. Em dikarin klanê weke şaneya kok a civakê terîf bikin. Civaka klan bi pêvajoyê re di tevahiya civakên malbat, qebîle, eşîr, qewm û netewe yên pêkhatî de weke şeweyekî şaneyê cuda dibe hê hebûna xwe dewam dike. Klan çî di rewşa zimanê îşaretan de be, çî jî di rewşa zimanê sembolan de, li gorî terîfa me ya bingehîn a xwezaya civakî ew civakeke exlaqî û polîtîk e. Bêguman li cem klanê exlaq û polîtîkayeke gelekî basît heye. Ya girîng ew e, heye. Basîtîbûyîn girîngiyê ji holê ranake. Berevajî girîngiya wê piştrast dike. Heta mirov dikare bibêje, exlaq îfadeya xwe ya herî bi hêz di dema civaka klan de pêk aniye. Mîna ku di rola îfadeya xerîzeyên hundir de be. Li gorî wî (exlaq) jiyan şertê hebûnê yê bivê nevê ye. Klana exlaqê xwe ji dest dayî, klana ji hev belav bûyî, ji hev hatiye belavkirin an jî hatiye tinekirin. Bi rêzikên basît îfadeya wê mirov bi tenê dikare bi jiyanîbûna wê şîrove bike.”**

Qebîle jî hê bêhtir xwedî bingeheke aborî ye. Qebîle, ji ber zehmetiyên hilberînê û debarê çêbûne. Fonksiyoneke din a qebîleyê jî ku xwedî xebateke kolektîf e û di amûrên hilberînê de jî mulkiyetek sosyal heye, parastin e. Ev rexistinbûyîn, wek encamek xwezayî ya pêşketina mirovahiyê, encama pêvajoyek bi hezaran salan e. Abdullah Ocalan bi şeweyekî hê şênbertir ji bo qebîleyê dibêje, **“Yek ji hêmanên girîng ên civakê ye. Malbatan di nava xwe de dihevwîne, heman çand û zimanî parve dikin, ji civaka gund û cotkariyê pêşketîtir e. Ji bo parastin û hilberînê yekîtiyê civakî ne ku hewceyî bi wan hene. Dema ku klan û malbat di çareserkirina pîrsgirêkên hilberîn û ewlekariyê de**

kêm dimînin, hewce dîtine ber bi şêweyê qebîleyê ve veguherin. Bi tenê xwe naspêrin têkiliyên xwîn û zuriyetê, hêmanên civakê yên bingeîn in, pêdiviya bi ewlekarî û hilberînê wan ferz dikin. Civaka dendikî ye. Komunal e.” Eşîr jî ew komên bicihbûyî û koçer in ku ji gelek qebîleyan pêk tên û bawerî ew e, ji bavekî hatine, xwe dispêre biraxwetiyê û xizimtiyê. Heman zimanî diaxivin, xwedî heman kevneşopî yan jî wesfên hevpar ên çandê ne.

Ji ber nerazîbûna li dijî hêzên derve, pêdiviya yekîtiya navxweyî ya ji bo eşîr karibe hebûna xwe bidomîne, dema bi hêza girêdana xwînê re jî bûye yek, nehiştiye ku bi awayekî giran belavbûyînek navxweyî jî çêbibe. Ango, nakokiyên nav eşîrê ji ber sedemên derveyî eşîrê, pêş neketine û her ku çûye jî ev dereng maye. Ev organîzasyonên civakî yên ku nakokiyên wan ên navxweyî zelal nebûne, peresîneke (evrîm) ber bi pêş ve bi dest neaniye. Ev jî mîna li jor hate îzahkirin, bûye yek ji faktorên din ku ber bi hundir ve civandiye. Têgihiştina ku li dijî serdestiyê bindestî, li dijî mêtinkariyê mêtîngehî kamil nebûye, her endamekî eşîrê jî bi secereya xwe ya eşîrê dest bi pesindayînê kiriye. Di encam de endam hê zêdetir bi serokeşîr re hatine girêdan û bûne girseyeke civakî.

Wek mînakek aktuel; Serokkomarekî Tirkîyeyê çawa li beramberî “heqaretek” li wî, bi gotinek hê rasttir, secereya wî, çawa nîjada xwe demildest heta hezar salî bir. Ev çavkaniya serbilindiyê, ji ber eşîr-malbata xwe ye. Dema fikrandina pêşketina civakî ne berfireh be, wê demê tiştê ku derdikeve pêş û tatmînek takekesî bi mizdayîna egoyê dike, secereya malbat-eşîrê ye. Bi kurtahî Çanda Eşîrtiyê ye. Li vir rewşa ku mîna rewşa travmatîk xwe dide der ew e, di vê merheleya dîrokê de bi awayekî dogmatîk di warê zîhnî û ruhî de eliqîn heye.

Halbûkî, eşîrên ku di dîrokê de roleke di asteke bilind de listine, bi demê re ji ber têkilî û êrîşên şaristaniyê hatin helandin û ketine rewşa ku li jor hatiye ziman. Abdullah Ocalan ew rola eşîran a ku di dîrokê de listine, bi van gotinan radigihîne; **“Eşîret bi awayekî weke federasyona komên qebîleyan hê bêhtir girîng in. Hebûna xwe bi giranî li hemberî êrîşên şaristaniyên koledar bi dest xistine. Ji bo tinenebûnê û pêdiviya bi berxwedanê, rêxis-**

tiniya eşîrê derxistiye holê. Şêweyekî civakê ye, rêxistinîya wê ya eskerî û polîtîk bi lez pêk tê. Hêzeke polîtîk û artêşê ya xweber e. Yekîtiya rêxistinî û zîhnî bingehê wê ye. Çand û raboriyeke dîrokî ya dûvdirêj bi xwe re hildigirin. Çavkaniya bingehîn a çanda neteweyê ne. Mirov alîkarî û keda wan a di hilberînê de nikare biçûk bibîne. Avabûna wan a civakî ya kolektîf alîkarî û danûstendineke beramberî hev weke bingeh ferz dike. Di nava komên eşîr û qebîleyan de ruhê komunê bi hêz e. Ji hêmanên avaker ê karaktera neteweyî ye.” Bi pênasekirina eşîrê ve girêdayî, pêwîstî pê heye ku em bi kurtasî behsa diyardeyên konfederasyon û etnîsîteyên pêkhatî jî bikin.

Em dikarin bi awayekî herî berfireh konfederasyonê wisa pênase bikin: *“Ji avahiya siyasî ya pirrengî re tê gotin ku ji yekgirtina gelek avahiyên zêdetirî diduyên ku xwedî çawaniyên cuda ne, pêk tê. Her unîteyek serbixwe ye. Konfederasyon jî ew e, dema ev unîteyên serbixwe ji bo armancên hevpar û bi lihevkerinên dildar hev digirin, pêk tê. Li vir wek çawa nikare behsa unîteyekê tenê bê kirin, di çawaniyê de unîtebûyîna nikare diduyan derbas bike jî ne gengaz e. Êdî avahiyek pirrengî heye. Hevgirtin nabe sedema windabûyîna nasnameyên taybet.”* Dema mijar dibe Konfederasyona Eşîran an jî Konfederasyonên Eşîran, pênaseyek wisa jî mimkun e; yekgirtina gelek avahiyên qebîle û eşîran e ku di serî de li dijî êrişên derve, bi armanca parastinê pêk tên.

Etnîsîte jî di ferhengên sosyolojiyê de wiha tê pênasekirin: *“Şoreşa çandî ji bo etnîsîteyê şertê hebûnê ye. Bêyî vê şoreşê, klan nikare bê derbaskirin. Civaka klan jî nikare malbata mezin derbas bike. Ji ber vê jî nikare zimanekî berfireh saz bikin. Pêşketina ziman hilberînê, pêşketina hilberînê jî civakbûyînek bi pêş dixê. Etnîsîte, yekgirtina qebîleyan e ku bi şoreşa çandî derbasî jiyana xwecih a gund bûne, civakbûyînek derxistiye merheleyek jor û yekîtiya ziman û çandê ava kirine.”*

Me hewl da ku di dîroka Kurdistanê de dema nîrxandina îxanet û qehremantiyan de, girêdayî asoyê ramanî yê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bîmînin, ku bi asta teorîk a dîroka civakî û zanista rast a sosyal gihiştîyê, bi taybet jî bi pratîka Têkoşîna Azadiyê ya destanî, paradîgmayek nû daniye holê. Eger bi gotina Helbestvan û Filozofê Mezin ê Elman Goethe em bêjin, *“Mirovê ku he-*

sabê dîroka xwe ya 3 hezar salî nake, mirovekî rojane (bi rojkî) ye.” Wê demê, ji bo em nebin mirovên rojane, divê em dîroka 3 hezar salan gelekî bibihurin û di wan deman de jî li kokên xwe bigerin û bibînin. Ev, wê bibe wezîfeyek girîng a welatparêziyê û sekna mirovbûyînê. Eger em dibêjin dîrok *“ji bo mirov xwe binase û xwe bizane”* be, mehrûmiya ji têgihiştina dîrokê jî em bi gotinên R. G. Collingwood wiha bînin ziman; *“Mirov û civak neçar in ku di nav behrek demê ya nediya de biperpitin.”* Bi vê zanebûnê ve divê em karibin dîrokê hem zindî hem jî bi coş bijîn.

Sertên Civak û Erdnîgariya Kurdistanê



Dema li ser civaka Kurd nîqaşên sosyolojîk çêdibin, divê mirov erdnîgariya Kurdistanê jî li ber çavan bigire. Berekavî, wê encamek bi dest neyê xistin. Wecîzeyek zanista sosyal heye û dibêje, *“Erdnîgarî, çarçoveya dîrokê ye.”* Em ê jî di xebata xwe de Erdnîgariya Kurdistanê mîna faktorek objektîf esa wergirin.

Li gelek deveran girîngiya Erdnîgariya Kurdistanê tê destnîşankirin, lê bi bayê lezê jî ev pirs dide pey; *“Ji derveyî Kurdistanê jî*

erdnîgariyên girîng hene, lê ew azad in. Bêguman li derveyî Kurdistanê jî rêgehên girîng, çavkaniyên dewlemend ên xwezayî hene. Faktora cografî bi tenê serê xwe parçebûyîna Kurd îfade nake. Lê, rast e ku Cografyaya Kurdistanê, li xakek girîng e û xwedî çavkaniyên xwezayî yên zehf dewlemend in, li rêka derbasbûyîna parzemînên Ewropa, Asya û Afrikayê ye, her kesî jî li ser vê li hev kirine. Nayê hesabê gelek hêzan ku li ser vê erdnîgariyê tenê otorîteyek hakim be. Ji ber vê sedemê ye ku faktora cografî li Kurdistanê gelekî girîng e. Hêzên ku domahiya dîrokê li Kurdistanê serwer bûne, navendên xwe li Kurdistanê danenîne. Yên danîne jî serweriya wan temenkurtî bûye. Birêvebirin, lê ji dûranî birêvebirin û bi zanebûn birêvebirin, wek politikayek pir bi aqilî derketiye ser dika dîrokê...”

Her wiha, “*Dûrîdestbûna Erdnîgariya Kurdistanê, berxwedana dijwar a eşîrên Kurdan; ji bo împaratoriye derdorê bûye sînorekî xwezayî. Kûrkirina avahiya parçeyî, pev dana şerkirin wek encamê faktora cografî jî pêş ketiye. Bi qasî avahiya ku avahiya wan daye afirandin, ji derve jî hatine parçekirin. Di nav xwe de hevdu bandor kirine, ji dewletên dor li wan girtine jî bandor bûne.*” **(Li Kurdistanê Diyardeya Eşîretê)**

Li gor vê çarçoveyê, mîna bextreşiyek Kurdan, diyardeya mazûbantiya (malavahî) “navenda cîhanê”; dibe navekî din ê parçebûyîne, pixûditiyê û ketina nav heriya îxanetê. Hêza ku dixwaze dinyayê bi rê ve bibe, ketiye wê ferqê ku pêwîst e Kurdistanê kontrol bike. Ev rewş ji derveyî Kurdan bi pêş dikeve, ji ber taybetmendiya karakterîstîk a ernîgariya welêt e.

Sumer, dema ji çanda Aryen bandor dibin û li kûrahiyên başûrê Mezopotamyayê şaristaniyên xwe ava dikin, pêdiviyê bi hêza karkirinê ya li ber poza xwe dibînin. Ji ber çavkaniyên dewlemend ên xwezayî lê hene, gelek maden û wek sehayek vebûnê rewşa wê ya stratejîk, dilê tevahî hêzan bijiyaye Kurdistanê. Asûr jî mîna hêzeke leşkerî ya bi pêş ve dikeve, bi armanca çekirina çekan ji bo madenên hesin her roj mîna destavêjan berê xwe dide xakên Mîtaniyan.

Dema ku Pers li dijî Yewnanan îlana şer dikin û berê xwe didin wî warî, di Kurdistanê re derbas dibin. Dûvre, dema Îskender jî ji bo karibe xwe bigihîne heta Hindistanê, neçar dimîne ku di xaka

Kurdistanê re bibihure. Li gel vê, dema Helenên ku 200 sal in li ser vê axê dijîn jî li vê zêde dibin, baştir tê fêmkirin ku bê dîrokeke wê ya çawa ya dagirkerî û îstîlayê heye. Ya nehate gotin Îskît in, ew jî ji bo xwe bigihînin Ktesîphone û wan dewlemendiyên navdar ên Babilê, dixwazin di vir re derbas bibin. Di encam de Kurdistan tam vediguhere arenaya şer. Romyî, şerê li dijî Sasaniyan bi giştî li Kurdistanê dimeşînin. Berevajiya vê jî bi heman awayî rast e. Di nav hêzên dagirker de Part jî dikarin bên jimartin. Dema dem dibe P.Z. Sedsala 7'emîn, ola Îslamê ji bo karibe vebûnê bi dest bîne, ji serî heta binî Kurdistanê dagir dike. Ji bo karibe li bakur Îslamê belav bike jî dîsa sehaya polîgonê Kurdistan e. Helbet, Seferên Xaçparêzan û piştî jî Moxolon ku ji bo Misrê bi dest bixin mîna kuliyan di Kurdistanê re derbas bûn, bi ser de ye. Li pey xwe jî tenê bajarên wêrankirî, toz û dûman hiştin! Paşê jî li gel şerê Osmaniyan û Safewiyan û heta roja me jî dagirkeriya li vê xakê dewam kir. Hêzên emperyal ên Serdema Modern jî bi şerê parvekirinê yên ji bo çavkaniyên xwezayî yên mîna petrol û avê, ji vê sedsalê ve Kurdistanê dimêjin. Her çiqasî niha wek xeleda dawî dagirkirina Rojhilata Navîn tê dîtin jî, şerên ku wê siberojê jî kêmanebin li pêşiya Kurdan in. Wextê pêdiviya avê ya ku wê pêşerojê li Rojhilata Navîn xwe bide der jî were hesibandin, wisa dixuye ku piştî 20-30 salan jî dîsa wê Kurdistan di rojevê de be.

Niha planên avakirina “Îsraîlek Kurd” jî divê têkildarî van armancan be. Ji ber sedemên li jor, Kurdistan her tim bûye qada dagirkirinê û şer. Ne ji ber Kurdan xwestiye, ne ku ji ber Kurdistan bihuşta herî xweş a cîhanê ye jî! Her çiqasî Kurdistan bi gotina pirtûkên pîroz, “mabeyna du çeman, bihuşta li ser erdê” be jî, ev ne hincetên dagirkirinê ne! Sedema esas a dagirkirinê û îstîlayê ew e ku Kurdistan li dinyayê yek ji qadên serekê ya jeo-stratejîk e. Her wiha, ji ber ev welat yek ji jiyangehên yekem a cîhanê ye jî her tim ji bo hêzên emperyal bûye navenda kişandinê.

Eger em careke din li mijara xwe vegerin, erdnîgariya Kurdistanê, avabûna wê ya sosyo-kulturî jî bandor dike. Di Dîroka Kurdan de me diyar kiribû ku esasî bi şêwazê koçerî debara xwe dikin. Tarz û xebatên mîna koçerî û ajaldarî ya eşîran wek sedema parçebûyîna derdikeve pêşberî me. Koçberî û ajaldarî, ji bo şênîyên çolterî (gundewarî) di heman demê de sedema hebûnê ye. Ji ber

dema heywanên xwe xwedî bike û pê re mijûl bibe, wê jiyana xwe jî garantî bike; wisa jî wê karibe xwe bigihîne rehetîyekê. Ji ber vê ye ku jiyana tund û hişk li gor a nerm hê zêdetir tê tercîhkirin. Ango, destpêkê jiyan, dûvre jî rehetî tê. Bi gotinek din şerê jiyanê faktora esasî ye. Mîna me anî ziman, ji bo karibe hê baştir bijî divê xwedî hê zêdetir ajalî be. Ji bo karibe hê bêhtir heywanî xwedî bike jî pêwîstî bi “mergên” zêdetir hene. Ev bi tena serê xwe jî dikare bibe sedema şer.

Ji ber ku formê jiyanê koçberî ye. Pêdivî nêzî hev in. Ji ber vê ye ku piştî gihîştin nîrxên şaristaniyê li şûna beramberî hevdu xurt bikin, berevajî hewl didin cîranan hê zeftir bikin û bi vê rêkê jî mêrgan bi dest bînin. Ev nêzîkatî û zîhnîyeta esasî, li beramberî yên ji derve hatine û dixwazin dagirkerî û îstîlayê bi pêş bixin li şûna berxwedanê, berevajî lihevkerî û heta li dijî eşîra cîran jî hevkarîyê bi pêş dixê. Bi cewherî, eşîran dest dane van dagirkeran û alîkarî dane wan. Li vir pir êşkere bîngehên madî yê îxaneta Kurd a bi çavnebarî, zikreşî, parçebûyî û helbet hevkarîya dagirkeran û li rex wan êrîşa li hember ên dişibîne yan jî dema di êrîşan de bêdengmayîna eşîrên din tê dîtin.

Dema em dagirkerî û îstîlayên bênavber ên ji ber pozîsyona cografî ya Kurdistanê li ber çav bigirin, tiştê wê biqewime jî îxanetek bêdawî ye. Ev îxanet wisa ye ku gelek caran ew kesên ku wisa ketine nav jî ne di vê ferqa ketîbûna xwe de ne. Her çi diqewime bila biqewime, di encam de eşîra wî hatiye parastin. Çi bû jî bila bibe, ji bo xwe bîngehekî jiyanê dîtiye. Ev trajediyek wiha ye ku, hin piştî xwe didin dagirkeran û ji bo xwe rêka jiyanê vedikin, yên din jî xwe dikşînin qorziyên herî dûr ên welêt û hema hema derdikevin derveyî “medeniyetê”. Wek me diyar kir, ev bicîhbûna stratejîk û têkildarî vê jî avabûnek hişk a cografîk jî û her wiha taybetmendiyên eşîrên navbihurî, li ber yekgirtin û navendîbûna bênavber bûne asteng. “Bêçarebûn û Dafika Kurd” dîsa dubare bûye, pevketin, zikreşiyên eşîran ên bûne mîna jiyanekê, dema êrîşên dagirkeran jî bi ser de tê, ew helwesta tîrşîkçî, hevkar a Kurd zelal bûye. Diyardeya ku mîna **“Teşîya Kurd”** tê binavkirin jî ji bilî vê bawerî im ne tiştekî din e!

Ev jî tê wateya ku her tim destpêka ji sifirê. Dema rolek wisa li xwe girtibin, fikra mîna ku wê jiyanek hê azadtir û serbesttir

bibînin û helbet hê xurttir bibin jî tenê bûye fêmkorî. Helbet, mîna di Dîroka Kurdistanê de jî gelekî hatiye dîtîn, koçî qadên herî asê û hişk ên çiyayan kirine, jiyangeh ava kirine. Û eşkere ye ku divê ev tevger jî biçûk neyê dîtîn. Ji bilî lêgerîna jiyana azad, muheqeq e ku bi tenê serê xwe û ji bindestiyê dûr, lêgerînek jiyane jî heye. Tevgera ku bi esasî li Kurdistanê hatiye dîtîn jî ev e. Eger Kurdîtî heta roja me li dijî ewqas dagirkerî û îstîlayan hatibe, sedemek vê jî bêguman hebûna vê lêgerîna jiyana azad e. Çi heye ku li milekî ev berxwedanên bi heybet pêk tên, li milê din jî mîna her tim tê dîtîn, ji bo pariyekî biçûk; yên qaşo serwerên vî gelî ne, mîna tarzêkî jiyane, hêviyê jî hêzên derve dikin. Dema vê dikin jî ji ewqas helwest û tevgerên ku rûmeta mirovan li bin piyan didin jî xwe nedane paş. Ji bo vê jî ji her kesên hatine gotine ku *“fermo paşayê min”*. Ew rêgeza navdar a feodalîzmê ku dibêje *“destê tu nikarî gez bikî maçê bikî”* herf bi herf pêk anîne. Tenê bi pêkanîne jî sînardar nemane, ev helwesta hevkar dawerivandine, kirine xetek hevkarîya kevneşopî. Her çiqasî ev xencerek li ser cewhera xwe jî be, ya bûye ev e.

Her çiqasî piştî çend hezar salan be jî, ev rastî dîsa li ser heman xakê, bi heman rê û rêbazan xwe dubare dike! Derbasî cem dagirker dibe, rê li ber dixê, şîretan lê dike, wisa jî ji bo yên ji xwîna xwe, ji nîjada xwe bîrê vedide. Dema rêbazên dijmin ên *“parçe bike, bi rê ve bibe”* jî li ser vê zêde dibe, wê demê bi tevahî zelaliya xwe kokên vê drama qirkirin û dîrokê li ber çavan tê raxistin. Bi kurtasî, vê parçebûyîne nîrxên civaka Kurd belav kirine, hema hema qerqûdeyê (îskelet) wê jî parçe kiriye. Lê mixabin hê jî Kurd di vê rewşê de tam negihiştine.


Ev rastî li milekî, rastiyeke din jî helwest û rêbazên têkoşînê ne ku li dijî hev tên bikaranîn. Ji ber vê sedemê ye ku di nav refên dagirker de cih digirin. Hedef jî tenê parçeyek berjewendî ye. Ya dikeve para wê jî ne piranî ye, kurtêl in. Ji bo vê hedefê jî pêwîstî bi rêbazên taybet û îxaneta plankirî ya dijmin nîne. Ya pêwîst tenê xweperestî û bêhişbûnek mezin e.

Nirxandinek Kurt Têkildarî Dayik’ên Kurdan

Beriya em behsa dîroka Kurdistanê û jiyarên ku li vê erdnîgariyê pêşketî bikin, kurt jî be em meşa mirovahiyê ya heta vir bidin wê baştir bibe.

Li welatê em îro wek Kenya dizanin, fosîlên gelek dînozor û cirnîsan (tîmseh) ku ji beriya dîrokê (prehistorya) mane, hatine dîtin. Bermayînen herî kevn ên fosîlan, beriya niha 200 mîlyon salî nîşan didin. Fosîlên herî kevn ên mirovan jî “niha” li Kenyayê derdora Gola Tûrkana hatine dîtin.

Em ji fosîlan dizanin ku dînozor, 65 mîlyon sal beriya niha qelîhîne û piştî ku 5 mîlyon sal di ser vê tînebûnê re dibihure jî -ango nêzî 60 mîlyon sal berê- prîmatên destpêkê tîne dîtin. Hatiye îspatkirin ku prîmatên li Afrîkaya Rohilat ew cure ye ku dikare amûrên seretayî bigirin û li ser du lingan bimeşin. Li gor zanistê jî malbata mirovî ya ku wek Homînîd tê binavkirin jî di vê demê de derdikeve. Êdî em dizanin ku ji meymûnan ber bi malbata mirovahiye ve -bi mîlyonan salan jî dewam bike- rê girîft dibe. Li pey vê cureya wek Homînîdê Seretayî tê binavkirin jî bi rêzê Homo Habilîtis (mirovê behremend), Homo Erectûs (Mirovê ku li ser du lingên xwe tîk disekine, mabeyna 1 mîlyon sal û 220 hezar salî), beriya 220 hezar salî jî li şûna Homo Erectûs, mirovê Neanderthal (Navê xwe ji wê fosîlê digire ku sala 1856'an li nêzî bajarê Dusseldorf ê Elmanyayê, li dola Neander hatiye dîtin) cihê xwe digire. Neanderthal, her çiqasî di destpêka Serdema Paleolîtîk de hejmara wan kêmtir jî bibe, em ji daneyên ku li Ewropayê derketinê dizanin, heta beriya 35 hezar salan jî jiyanê xwe domandine. Piştî jî -her çiqasî di heman pêvajoya Neanderthal de be jî- ya bi pêş dikeve Homo Sapiens e. Destpêka cureya Homo Sapiens (mirovê difikire), beriya niha heta 300 hezar salî jî diçe. Homo Sapiens, wek pêşiyên (dê û bavên) mirovên niha tê qebûlkirin. Homo Sapiensan, Çanda Paleolîtîka Jorîn (B.Z. 60 -20 hezar) afirandine.



Heta niha amûrê herî kevn ê bi destê mirov (*Homo Rudolfensis* mabeyna 2,5 û 1,8 mîlyon salan jiyaye) hatiye çêkirin dispêrin 2,5 mîlyon sal berê. Qadên ku mirov destpêkê lê derketine, mîna me li jor jî diyar kir, derdora Gola Tûrkana ya li Kenyayê ye. Her wiha wê ne şaş be ku ji ber mercên erdnîgariyê em Tanzania û Etiyopyayê jî tevlî vê bikin. Li peravên Gola Rodolfê ye ku mabeyna Çemê Omo, Bakurê Kenyayê û Başûrrojavayê Etiyopyayê ye.

Li Afrîkayê hatiye îspatkirin ku tevgera mirovê yekemîn hê dema *Homo Erectûs* e, beriya 1-1,5 mîlyon sal berê cara yekem ji Afrîkayê ber bi Rojhilata Navîn e. Li Rojhilata Navîn jî kombûyîna herî zêde ya mirovan em mîlyonek sal beriya niha

dibînin. Ev koçkirin an jî berbelavî ya ku bi hezaran salan ajotiye, ji çend baskan ve pêk hatiye. Baskek, ji bakurrojawayê Afrîkayê derdikeve Ewrûpayê, baskek ji Geliyê Rîfta Mezin ku wek Great Rift Valley tê zanîn -erdnîgariya Etiyopya-Somaliya îro- derbasî Erebîstana Siûdî dibe, baskê din jî ji Nîlê ber bi jor ve diçe, ji Girava Sînayê derbasî Rojhilata Navîn dibe.

Wê pêla koçê bidome. Komên ku ji Rojhilata Navîn tên û digihêjin Asyayê jî hene. Mînak, fosilên mirovan ên beriya niha bi 800 salî li Çînê û yên beriya milyonek salî jî li Girava Java-Endonezyayê tên dîtin. Her wiha, li Ewrûpayê (Îspanya-Fransa), fosilên mirovan tên dîtin ku heta 700-800 hezar salî jî diçin. Fosîla Homo Ergaster a ku dîroka wê hê kevntir e jî heta 1,8 milyon salan diçe. Cihê hatî dîtin jî Gurcistan e. Bi heman şiklî ev pêl li gelek deverên cîhanê belav bûye. Her ku pêşketina mirovî çêdibe, cureyên pêşketî yên mirovan wê vê pêla koçê di demên cuda de bidomînin. Ji ber vê ye ku em dikarin hem belavbûna Homo Sapiens hem jî ya Neandertalan li parzemînen cuda bibînin.

Li gelek cihên dinyayê, mîna me diyar kir, wê Homo Sapiens berbelav bibin. Lê, wê di destpêka cihên sereke de ku ji bo mirovan cihên domdar e, Rojhilata Navîn, bi gotinekê hê rasttir, ernîgariya ku ji hêla Prof. James Henry Breasted wek Kevana Zêrîn an jî Bi bereket tê binavkirin hatiye. Nimûneya herî baş jî Şikefta Şanîdar e.


Şikefta Şanîdar, îro li Kurdistanê li herêma Mêrgesor a Hewlêrê ye. Tevî ku jiyangeheke kevnare ye jî qerqûdeyên 9 mirovên Neanderthal tê de hatine dîtin. Dîroka van bermayiyên îskeletan xwe digihîne heta 60 hezar sal beriya niha jî. Di daneyan de hatiye tespîtîkirin ku mirovên li vir ji bo miriyên xwe merasîm çêkirine, miriyên xwe bi kulîlkan xemilandine û wisa veşartine jî. Ji bo veşartina miriyan, arkeologê navdar Lewis Mumford di xebata xwe ya **Domahiya Dîrokê Bajar** de dibêje: *“Rêzgirtina miriyan a mirovê yekem, dibe ku di lêgerîna warekî lêkombûyî de û di encam de jiyangehek daîmî de ji pêdiviyên pratîk roleke hê girîngtir lîstibe.”*



ŞIKEFTA ŞANÎDAR

“Delîlên herî xurt li Şanîdarê derketine holê ku mirovê Neanderthal û cureyê Homo Sapiens 60 hezar sal beriya niha li ser vê xakê li rex hev jiyane û mirov ber bi cureyê Homo Sapiens ve peresiye Daneyên têkildarî çanda Musteriyen ku di serdema Paleolîtîka Navîn de wek ji nimûneyên yekem ên çanda cureyê Homo Sapiens tên qebûlkin, li Şanîdarê aîdî 52 hezar sal berê ne. Bi gotina S. Tebe ‘Di pêşandana şop û mînakên derbasbûna Homo Sapiensan de bi taybet şikefta Şanîdar daneyên herî fêrker dane.’”
 (Mehmet Saît Yildirim, **Di Çêbûna Şaristaniyê de Çand û Kurd**)

Bermayî yan jî keşfek din a girîng jî li nêzî Silêmaniyê, Şikefta Hazarmert e. Dîroka wê digihêje 40 hezar salan beriya niha. Dîsa şûnwarek din a girîng jî Şikefta Zerzî ya li dor Kerkûkê ye –li gor 25 hezar sal beriya niha hatiye eyarkirin.



Jiyana li şikeftan ji bilî Kurdistanê li erdnîgariyên din jî tê dîtin. Mînak, Lubnan tenê ji van yek e.

Di nav mîlyonek salê de li Kevana Zêrîn kombûyîna mirovan zêde dibe, di salên 20 hezarî de wê Serdema Qeşayiyê biqede. Piştî hewa germ dibe, avhewa û rûberka riwekî (flora) guncav dibe, pêşketinên nû jî rû didin. Ji ber li Kevana Zêrîn hem dewlemendiya riwekî heye, ajal zêde ne, demsal guncav in, çavkaniyên avê pir in, ax destdayî ye, ev pêşketin hê leztir dibe. Ev pêvajoya ku paşê wê wek civaka xwezayî di dîrokê de bê ziman, esas her ku biçe wê ber bi neolîtîkê ve veguhere.

Eger em civaka xwezayî bi civakbûyîna yekem a mirov binirxînin, dikare guncav be ku wek pêvajoyek dîrokî ya ji koma mirovên yekem a ji prîmatan qutbûyî heta civaka hiyerarşik bê diyarkirin. Formê wê yê bingehîn, komên klanan e ku ji 20-30 kesî pêk tên. Civaka Xwezayî di heman demê de merheleyên Mezeolîtîk, Paleolîtîk û Neolîtîk jî di nav xwe de dihevine. Cureyê mirov, pêşî li xwezayê debara xwe bi neçîrvantî û civyarî (komkerî) dikirin, lê her ku diçe tê wê astê ku êdî bi berhemên xwe jî jiyana xwe bidomîne. Çandek jiyana wisa ye ku neçîrvantî û kom-

kerî bandor li karaktera wê ya esasî kiriye. Taybetmendiyên wê: kevir tên bikaranîn û ji daran jî agir tê pêxistin.

Ji Serdema Paleolîtîkê re Pêvajoya Kevirê Bêteşe jî tê gotin (2 mîlyon sal û 20 hezar sal beriya niha). Çandek jiyana wisa ye ku neçîrvantî û civyariyê bandor li karaktera wê ya esasî kiriye. Taybetmendiyên wê ev in: Agir dikare bê bikaranîn, ji kevirên bêteşe, daran, diran û qiloçên heywanan –tevî tîr û rim- amûr tên çêkirin. Bi şêwazê klanê dijîn. Zarok nîrxên hevpar ên klanê ne. Sembola têgihiştina klanê totem in. Yekparebûna bi xwezayê re esas e. Klan yekîtiyek e ku li dor jina dayik ava dibe. Zarok, bi dayikê tê nasîn. Rola zîlam a parastina li dijî êrîşên derve heye. Fîkrîna sêhrî aîdî vê demê ye. Hunera şikeftan berbelav bûye.

Ji Serdema Mezeolîtîk re Pêvajoya Kevirê Şehkirî jî tê gotin (Salên mabeyna 20-15 hezarî). Di Serdema Mezeolîtîk de kevirên biçûk jî tên traştîkirin. Estetîka wê hê pêşketîtir e. Di neçîrvantiyê de pisportî çêbûye. Nîk, bivir û metran tên bikaranîn. Seg tên kedîkirin. Ajal tên kedîkirin. Li xwezayê zadên bejî tên zanîn. Fîkrîna sêhrî hê zêdetir pêşketî ye.

Ji Serdema Neolîtîk re Pêvajoya Kevirê Sîqalkirî (Cîlakirî) jî tê gotin. Lê, Neolîtîk a ku wek Şoreşa Gund-Çandiniyê jî tê zanîn, di heman demê de ew serdem e jî ku hafizaya mirovatiyê herî zêde bi pêş ketiye (B.Z. mabeyna 15-3 hezar salan). Çandini tê kirin. Cotkarî jî pêş dikeve. Kedîkirin zehf pêşketî ye. Di astek kêr de be jî çandini bi avdaniyê pêk tê. Zevî tên vekirin. Şivantî bi pêş dikeve. Ji klanê ber bi civaka gund, ji wir jî derbasbûyîna ber bi qebîle û eşîrê çêdibe. Em dibînin ku fîkrîna şîrîkatî û zîhniyeta mulkiyeta hevpar pêşketî ye. Berhême zêde ye civakî pêş dikeve. Îcadên herî mezin ên dîroka mirovahiyê di vê pêvajoya dîrokî de ne. Her wiha di vê serdemê de ji gundan derbasbûyîna ber bi bajarokan jî çêdibe.

Di serdema Neolîtîk de ya herî berbiçav Çanda Jinê ye. Êdî ev teze tî qebûlîkirin ku Neolîtîk Şoreşek Jinê ye. Civakek dayîkgir e. Jiyana li gor jinê teşe digire. Ya esas Çanda Xwedawendê ye. Têkiliyên mirovan hê bêhtir wekhev û azad in. Hê zêdetir adil û parvekar e.

Eger em îcadên Serdema Neolîtîkê bihejmêrin: Dema em digi-hêjin B.Z. 8 hezar salan, bi giranî heywan hatine kedîkirin. Ji bo çandiniyê; aş, conî, mîrkutk, madenvanî, qirik û qafik, tevnrê, tevir, hewcar û amûrên ku kevir traş dikin, hatine îcadîkirin.

Serdema Neolîtîkê di heman demê de bi temamî şoreşek ziman e jî. Eger em çêbûna ziman heta zimanê destpêkê yê îşaretan bibin, ev dikare me bigihîne beriya mîladê 40-50 hezar salî. Lê pêvajoya dîrokî ya ku ziman herî şênber pêşketiye, çaxê Neolîtîkê ye. Komên ziman ber bi dawîya Neolîtîkê ve wê cêwaz bibin. Li Kurdistanê zimanê Arî esas di vê pêvajoyê de bi pêş dikeve. Çaxê ku Gordon Childe dibêje, “*Şoreşa Neolîtîkê serdemek çandî ye. Di tevahî qadên çandinî, pîşeyî, veguhestin, vehewîn, huner, rêveberî, olê de pêşketinên di asta şoreşî de pêk hatine*” ev çax bi xwe ye. Cihê ku Porf. Dr. Hauptmann dibêje, “*Eger ev herêm li Ewropayê bûna, wê bandora wê ya li cîhanê di astên mezin de bûna*” jî dîsa Kurdistan e. Lê, pêvajoya çêbûnê jî Serdema Neolîtîk e. Cihê ku Braidwood dibêje, “*Li ti deverên cîhanê jîyan mîna ya li qûntarên bi qews a silsileya Toros-Zagrosan watedar nabe*” jî dîsa ev war in. Arkeologê Elman Klaus Schmidt kelecana ji ber tiştên dîtine bi gotinên, “*Di wan rojan de li Çayonu (Kota Berçem) dîroka zanistê dihate nivîsandin*” tîne ziman û bi vê coşê ve daneyên arkeolojîk ên ji erdê tîne derxistin pêşwazî dike. Heman Klaus Schmidt hem bi rexneyî hem jî heyfa xwe lê tîne û dibêje, “*Ji ber tê de navên Încîlê derbas nabin û daneyên sansasyonel nade*” li vê xakê qîmetê ku heq dike nabîne û nîşana gelek daneyên arkeolojîk dike.

Îro li cîhanê daneyên herî kevnar ên Neolîtîkê, li erdnîgariya ku arkeolog mîna SÊGOŞEYA ZÊRÎN, HERÊMA DENDIKÊ bi nav dikin tên dîtin. Ji hêla arkeologan ve ev Sêgoşeya Zêrîn li ser xetekê tê tarîfkirin ku ji bakurê Amedê (heta Erxenyê), rojhilat û rojavayê Firatê (derdora Xelfetiyê) û heta xeta navbeyna Êlih û Siwêregê dirêj dibe. Hin mirovên bi zanistê re mijûl in jî dibêjin ev xet dorê li Qerejdaxê digire. Lê, dema em van daneyên ku derketine û cihên lê ne li ber çavan digirin, wê bikaribe hê zêdetir di cih de be ku em lingekî vê sêgoşeyê heta Îlam û Kirmanşanê dirêj bikin, ji wir jî bi xetekê bigihînin başûrê Dîlokê.

Bi ihtîmalek gelek mezin wê li vê erdnîgariyê gelek şûnewarên din, bi gotina îro jî “bajar” bêne kifşkirin. Hê ji niha ve cihê herî kevnare Xerabreşk (Gobeklîtepe) e. Li gor B.Z. 12 hezar salan hatiye eyarkirin. Dîsa Newala Çorê ya ku li nêzî Rihayê ye, digihêje heta B.Z. 11 hezar salan. Her wiha di nav sînoren Erxenî ya Amedê de Çemê Kota Ber an jî Qote Berçem (Çayonu) û Girê Heciyân, li Êlihê jî em dikarin Çemê Xallan li vê zêde bikin. Li derdora Dîlokê, Girê Oylûm, li bakurrojawayê Semsûrê jî Tîtrîş e. Ev giştî li cografyaya Sêgoşeya Zêrîn in. Li gel vê, pêwîst dike ku em Çermok û Girêgewre yên li nêzî Silêmaniyê jî li ser zêde bikin. Kifşkirinên li Ganj Dara û Giyan jî li ber bajarên Îlam û Kirmanşan ên Rojhilatê Kurdistanê ne. Tê texmînkirin ku serjimêriyên li van jiyangehan navbeyna 1000-1500’î ne.





Ji bo em karibin jiyangehên li Sêgoşeya Zêrîn hê baştir bidin nîşandan, em karibin bişibînin lingên sêgoşeyê û ji nû ve bidin dibe ku çêtir be. Eger em li serê sêgoşeyê Çemê Kote Ber a li Erxeniyê bi cih bikin:

a) Baskê Rojhilat ê Sêgoşeyê: Girikê Heciyani-Erxenî, ma-beyna Çemê Xallan-Êlih Siwêregê, Girê Kortîk- Bismil, Nemrîk, Çemê Qermez-Başûrê Kurdistanê, Girê Gûran-Loristan, Alî Koş-

li herî başûrê silsileya çiyayên Zagrosê, Çemê Zewî-Hewlêr, Girê Gewro, Xalat Çermok-mabeyna Diyala û Zapa jêrîn, Karîm Şahr-rojhilatê Kerkûkê, Girê Serab-Ganj Dara û Giyan jî li Kirmanşanê ye...

b) Baskê Rojava yê Sêgoşeyê: Tepecîk û Tulîntepe-Elezîz, Girê Cafer-Meletî, Grîtîlle, Girê Heyaz, Samosata-Semsûr, Newala Çorê-Semsûr...

c) Baskê Navîn ê Sêgoşeyê: Xerabreşk (Gobeklî Tepe)- Riha, Girê Gurcu, Girê Sefer, Girê Hamza, Girê Karahan...


Li gel van mimkun e ku gelek şûnwarên ji Paleolîtîk û Mezolîtîkê mane jî bêne jimartin: Palanli-Semsûr-Meletî, Yazili Kaya-Qaxizman, Yedîsalkim-Wan, Geverûk û Tîrîşîn-Colemêrg, Asiyab-qûntarên Zagrosê û hwd.

Bi kurtasî; em dibînin ku dema koça ji Afrîkayê destpêkirî û mîlyonek sal beriya niha digihêje Kevana Zêrîn, li vê erdnîgariyê jiyan mirovan bênavber berdewam dike. Ber bi gelek deverên cihanê ve çûne. Lê, li Kevana Zêrîn û bi taybet jî Sêgoşeya Zêrîn delîlên jiyanê bênavber didomin. Ji cografyayên din ên cihanê jî ferqa wê ya mezin ev bi xwe ye. Ji ber vê ferqê ye ku -ji ber mercên erdnîgariyê jî guncav in- nirxên bi hafizaya çandî ya mirovatiyê berhev bûne li vê erdnîgariyê pêşengî ji formê herî pêş ê Civaka Xwezayî, Neolîtîkê re kirine. Ji ber rewş bi vê rastiye re têkildar e jî dîrokneşan vê xetê wek Kevana Zêrîn bi nav kirine û vê teyîdê dîkin.

Piştî bajarok an jî bajarên destpêkê ava dibin, wê pêşketin bi-dome. Ev seyra pêşketinê wê pêl bi pêl ji Kevana Zêrîn ber bi qadên din ên cihanê ve berbelav bibe. Divê neyê jibîrkin ku berbelavbûyî ji vê pêvajoya dîrokî û şûn ve esas berbelavbûyînek çandî ye.

Abdullah Ocalan ji bo vê berbelavbûnê dibêje; **“Civaka neolîtîkê B.Z. di navbera 6000 û 4000’î de, li naverasta Dicle û derdorên Firatê bi pêş ve çûye. Ev civaka ku di çanda Tal Khalafbûnê re derbas bûyî, B.Z. di salên 6000’î de gihaye Bakurê Afrîka -Misrê, Firata Jêrîn, Kendava Basrayê û Naverasta Anatolyayê -Çatalhöyükê, di B.Z. nêzî 5000’î de, gihaye Qafkasya, Bakurê Derya Spî, Balkanan, bakurrojhilatê Îranê,**

Hindistanê, Pencap û Peravên Îndûsê, B.Z. di salên 4000’î de, gihaye Çînê û tevahiya Ewrûpayê, B.Z. di salên 3000’î de jî, gihaye Parzemîna Amerîkayê.” (Parêznameya DMME)



Çanda Til Xelef (Tal Khalaf), mohra xwe li gelek îcadan xistiye. Eger em ji bo van çend mînakên bidin; kûzik, bivir, gîsin, rêsandina hiriye, tevn, hêrandin, teker, avahîsaziya gund, amûrên niv-madenî yên ji kevîrê sifîrê (mis).

Tespîtek hevpar a dîroknasan ev e; “Pejirandineke giştî dide nîşandan ku nûvedanên (îcad) B.Z. di navbera 6000 û 4000’î de, -çanda Til Xelef a civaka neolîtîk- tenê bi nûvedan û teknolojiyên P.Z. (Piştî Zayînê) sedsala 16’an re dikarin werin hevberkirin.”

Her wiha; “Sazîbûn û derbasbûyîna sazûmana eşîrtî: Dema ku civaka neolîtîk di Kevana Bi Bereket de, di bin çanda ‘Til Xelef’ de rê li ber sazîbûnên payîdar vekir, tê wateya merheleya şewegirtina komên eşîran jî. Ev dema ku di navbera 6000 û 4000’î de, nêzîkî du hezar salan berdewam kir, dema “dahênanên (îcad) bingeîn e ku şaristanî amade kirine.”

Çanda Til Xelefê ji ber ku bi Çanda Neolîtîkê re teşe girtiye, çandek komunal, merêba (hevbeşî) û aşîxwaz e. Ya esas çandînî ye. Çand, wisa bi şêwe bûye. Lê belê, qebîleyên şivan ên ku bi Çanda Amorît in, ji başûr tîn û gav bi gav li Kevana Zêrîn bi cih dibin. Ev qebîleyên çekdar û şerker wê dûvre çandêke ku jê re Çanda El Ûbeyd (B.Z. 4200-3200) tê gotin, bi pêş bixin. Ev çanda wê ber bi qadên ku Çanda Til Xelefê pêşketî ye biherike. Û bi demê re hê bi bandortir bibe. Navendên wê yên esasî derdora bajarên Erîdû û Ûrê ne. Çanda Til Xelef hê bêhtir xwe dispêre gund, Çanda El Ûbeyd jî bi giranî ji bajarok û bajaran re vekirî ye.



Bi heman şiklî, lê wek çandek hê “pêşketîtir,” wê Çanda Bajar a Ûrûkê be. Ev çanda bajarbûnê di B.Z. 3500-3000’î de ye. Ev çanda ku hem bandora Çanda Til Xelef hem jî Çanda El Ûbeyd lê dike, wê di demek kurt de jî vê ferqa xwe ya çandê bide pêş. Ev

dibe çaxê çandî yan jî bêçandî yê ku bingehên desthilatdariyê, dewletbûyîne herî saxlem tê danîn. Bi hemrengî, wê gelek bajar bi pêş bikevin. Lê, navenda derketina yekem, Bajarê Gilgamêş, Ûruk e.

Tabletên derketine, îro ji me re dibêjin ku çaxê Sumerê ji Ûrukê hatiye. Her çiqasî dîrok bi Sumeran dest pê nekiribe jî, Noah Kramer ê îdîa dike ku “Dîrok bi Sumeran Dest pê Dike”, dibêje Sumeran gelek îcad çêkirine. A. Ocalan jî wiha dibêje, **“Di warê pêşveçûnên dîrokî de, em dikarin rola Sumeriyan bi xalên sereke wiha bi rêz bikin: a-Îcada nivîsê, b-Matematîk û salname, c-Mîtoloji û teolojiya berfireh a seretayî, d-Saziya dewletê û siyaset, çînîbûn, e-Zagon (qanûn) û hiqûqa nivîskî, f-Bajarvanî (şaresazî), perestgeh, huner, navendîbûna bazirganiyê, g-Xwedanî (mulkiyet) ya taybet û ya pevrayî, h-Malbata pîroz û xanedanî, i-Wêjeya nivîskî û destanan, muzîk, j-Mêtingehbûna (kolonîbûn) seretayî û emperyalîzm”**

“Gelê bi qasî Xakê Kevnar, Kurd” û “Sêgoşeya Zêrîn

Di nav xakên sereke de ku Pêvajoya Neolîtîkê bi pêş ketiye, Cografyaya Kurdistanê heye. Yên pêşengiya vê demê kirine, gelên vê xakê ne. Hûrrî, Gûtî, Lûlû, Lûwî, Kassî, Mîtannî, Ûrartû, Man-naî, Naîrî, Sûbarû, Med di serî de ne. Erdnîgariya Kurdistanê bi hezaran salan pêşengî û dergûştî ji bo Neolîtîkê kiriye. Bi heman şiklî jî ev welat mabeyna B.Z. 12000-4000’î de navenda esasî ya şoreşa Neolîtîkê ye.

Tespîta Abdullah Ocalan a li ser têkiliya dîrokî-cografî ya mabeyna Şoreşa Neolîtîk û Welatê Kurdistanê de gelekî watedar e: **“Mezopotamya jorîn û ya navîn (Bi zimanê Lûwî Gondwana, bi Sumerî Horrît=welatê bilind) ku di navbera Împeratoriya Hîttîtan Anatolya û peyhatiya Sumeran Împaratoriya Asûr de cih girtî, bi kanên maden ên dewlemend, bi cihgirtina stratejîk a di navbera rojhilat û rojava de, bi erdeke ji bo çandinî û ajaldariyê û avhewayeke ji bo avdanê bikêrhatî, rola “dayika tîne dinyayê” ya dîrokê û dergûşa mezinkirinê dilîze.”**

“Tê çavdêrîkirin ku, Hûrrî berdewama civakên B.Z. salên 6000’î ne ku neolîtîk bi sazî kirine û şikil dane çanda Til Xelef. Me dabû nîşandan ku cara yekem B.Z. di salên 3000’î de, Hûrrî ji aliyê Sumeriyan ve bi navê Horrît hatine binavkirin. Vê dawiyê komên ku bi navên Gûtî, Sûbarû û Kassît têne binavkirin, bi texmînî ew kom in ku di dem û cihên cuda de heman ziman û çand bi kar anîne. Her wiha çiqas ku diçe ev yek tê çespandin. Îro jî gelek yekîtiyên eşîran ku bi navên cuda tên binavkirin, nayê wateya ku ne ji heman gelî ne. Bi sedan navan bidine van jî, ev yek rewîşt a hevpar naguherîne.”
(DMME)

Hin gelên girîng li ser vê erdnîgariyê mane ku navê xwe bi şiklekî li dîrokê nivîsî ne. Her çiqasî navên cur bi cur lê tên kirin jî, li gor lêkolînên dawî yên ku zanist gihiştîne, bi hevparî ev koka wan Aryen e. Û di heman demê de xwedî vehûnandinek hevpar a ziman in. Beriya ku em ji van binavkirinên mîna dayikên Kurdan tên zanîn rêz bikin, divê destpêkê em hinekî li ser têgîna Kurd rawestînin.

Di zaravayê Zazakî yê Kurdî de Ko-Koy tê wateya çiya, Kortî jî çiyayî ye. Gotina Kurtî jî cara yekem B.Z. 3000’î hatiye bikaranîn. Ûrartû-welatê bilind, Hûrrî-welatê bilind, Gondwana-welatê gundan, Naîrî-gelê Çem û Avê, Med-Medaîn ango welatê madenê, Komagenes-neslê Kom, Civak ango Koma Eşîran û hwd. Dema em werdigerînin zimanê xwe yê îro, wê demê di warê lînguîstîk (zanista ziman) û etîmolojîk (peyvnasî) de têkildarî dîroka koka me delîlên mezin derdikevin. Her wiha, pênasayên hêzên din jî balkêş in. Yewnanî ji Kurdan re dibêjin Kardûk, Erebb jî wek Kurd bi nav dîkin. Ev têgîn cara yekem ji hêla nivîskarekî Erebb ê bi navê Ebû Elî Hesên Medeyîmî di sedsala 8’emîn de di pirtûka Kale El Ekrat de tê ziman. Her wiha nivîskarekî din ê Erebb, Teberî jî di pirtûka Fûtûratî Îslam û Kurd de nivîsiye. Dîsa, alimekî mezin ê Kurdan Ebû Hanefî Ehmed Dîneverî (820-896), di pirtûka Ahbar el Tîva de peyva Kurdistan bi kar anîye. Ermeniyekî bi navê Mattaûs jî cara yekem di sedsala 10. de gotina “Kurdistanê” bi kar anîye. Sultan Sancar ê Tirk jî di sedsala 11’emîn de gotina Kurdistanê bi kar anîye. Dema Osmaniyan de jî hem di dema Sultan

Yavûz Selîm de hem jî sultanên din de navê “Kurdistanê” ji bo welatê ku Kurd lê dijîn pênase bike pir û pir hatiye bikaranîn.

Me gotibû ku “*Erdnîgarî, çarçoveya dîrokê ye.*” Eger baş bê mêzekirin, wê bê dîtin ku her kê hikum li vê erdnîgariyê kiribe li gor xwe gelek nav lê kirine. Her çiqasî navên cur bi cur hatibin bikaranîn jî bi ti awayî ne mimkun e navekî li derveyî rastiya vî welatî bin. Wê ji bo me sûdmend be eger em bi kurtahî be jî li dîroka gelên pêşeng ên Neolîtîka Kurdistanê binêrin.

Hûrî, Em dizanin ku Hûrriyan mabeyna B.Z. 3000-1500’î de konfederasyonek saz kirine, nîrxên diyar ên kulturî afirandine û gelek şaristanî jî bandor kirine. Lê, tê zanîn ku qasî Hîtîtan navendîbûn bi dest neanîne. Di belgeyên nû de bi awayekî hem balkêş hem jî perosîner (heyecan) tê dîtin ku Hîtîtî cureyekî zîmanê Hûrriyî diaxivin, zîmanê wan ê nivîskî Hûrriyî ye, xwedayên wan jî bi giranî xwedayên Hûrriyan e û her wiha di tabletên nû derketî de tê fêmkirin ku Hîtît û Hûrî pêşmirov (xîzmên nêz) in. Hûrriyan, her tim pêwendî li gel Hîtîtan, Lûwî û Khaldiyan danîne. Bi rêka bazirganiyê jî di berbelavbûna bandorên Sumer, Babîl û Asûran de rolek girîng li xwe girtine. Têkiliyên wan bi Sumeran re germ in. Girêdanên wan xurt in. Di zîman de jî peyvên hevpar hene. Bajarên Sumeran û qadên çandiniyê yên Hûrriyan bi xwezayî têkilî hev dibin. Navenda wê di dîrokê de wek Orrhos derbas dibe ku em dikarin bêjin Rihaya îro ye. Belgeya herî kevn a aîdî Hûrriyan, ji hêla arkeologan ve li nêzî bajarê Qamişlo yê Rojavayê Kurdistanê, li Êrkîşê hatiye dîtin.

Xwedayên Hûrriyan, Teşûp (Bahoz), Şîmegî (Roj), Kuşûh (Heyv û Stêrk), Şaûşka (Çiya) ne. Her wiha hersê xwedawendên herî bi bandor ên Rojhilata Navîn in ku wê dûvre hem cîhana rojava hem jî rojhilat bandor bike, Îndra, Mîtra, Varûna ne.

Wek agahiyeke zêde, **“Ji dîroka Kurdistanê ya 2300 salan ku heta B.Z. sedsala 7’emîn derketina Medan, pêvajoya Hûrriyan tê gotin. Di vê pêvajoyê de keyanî (qralî) û bajar-dewletên bêhejmar saz bûne.”** Mehrdad R. Izady hin keyanî û prenstiyan wiha rêz dike: “*Kummuhu, Melidi, Gurgum, Ungi-Unqi, Kaman, Kaska, Nairi, Şupria, Urkiş, Muşku, Urartu, Namar, Subaru, Mard, Lulubi, Kardû, Zamua, Elippi, Manna û Guti.*”

Dîsa dibêje ji 3'yan du navên eşîr û cihên niha yên Kurdan ji Hûrriyan mane û wiha dihejmêre, “*Melîdî-Meletî, Lûlûbî-Lor, Sûbarû-Zebarî*”. Li gel vê Mehrdad R. Izady bajarên B.Z. 2000’î jî di serî de Riha, Amed, Mêrdîn, Kerkûk-Mêrdîn, Nûzî û gelek bajarên vê navberê rêz dike.

Denîz Gul jî têkildarî Hûrriyan van agahiyên balkêş dide: “*Belgeyên ku li bajarên Nûzî, Êrkîş û Hîtîtê hatin dîtin, der barê Hûrriyan de agahiyên berfireh didin. Hin ji van belgeyan jî li paytexta Hîtîtiyan derketin; Hîtît hem di warê olî hem jî wêjeyî û çandî de di bin bandora Hûrriyan de mane. Xweda Teşûb ê li ser panteona Hîtîtan û xwedawend Hebat a li Yazilikayayê, ji Hûrriyan derbas bûne.*

Her wiha, li ser Yazilikayayê (çiyayekî nêzî paytexta Hîtîtiyan e), xwedayên radiwestin, “*Zilamên Boxeyî*” yên ku xwedê li ser serên xwe hildigirin û ber bi asîman ve radikin, *teswîrên gayên pîroz ên bi navên “Hûrîs-Serîs” jî dişibin motifên Hûrriyan.*

Ji bilî vê, di nav nivîsarên (metîn) Bogazkoyê de gelek çîrok û efsaneyên ku koka wan ji Hûrriyan e û hem bi Hîtîtê hem jî bi Hûrriyî hatine nivîsandin hatine dîtin. Serekeyên wan ev in; Efsaneya Hedammû û Kûmarbî, Çîroka Kessî, Ursu Muha-sarasi, Strana Ûllikûmmî û Destana Gûrpanzah. Tevî van, *helbestên Hûrriyî jî hene. Ev metîn xwedî karakterên wêjeyî û rîtuêl in. Di nav nivîsarên Bogazkoyê de bi sedan belgeyên Hûrriyî hene.*

Dokumana ku bi Hûrriyî hatiye nivîsandin û herî kevnare ye, tabletek e ku li perestgehek paytext Êrkîşê ya li başûrê Mêrdîna îro hatiye dîtin û ev ji hêla Keyzer (qral) Tîşatal îthafî xweda Nerîgal hatiye kirin. Tableta navbihurî li gor sala B.Z. 1970 tê nixandin.


Çend hezar tabletên (aîdî B.Z. 1550-1400’î ne) ku di salên 1920’î û 1930’î de ji Arapha (Kerkûka Antîk) û Nûzî ya nêzî wê hatin derxistin, di vehûnandina dîroka Kurdistanê Hûrriyan de bûye alîkar. Tevî ku tenê beşek biçûk a nivîsarên Arapha û Nûzî hatine tercumekirin û weşandin jî girîngiya wan a wek çavkaniyên agahiyên têkildarî kevneşopiyên Hûrriyan, dîrok û civaka wê de, ne kêmtir in. Îhtîmalek gelekî mezin e ku Arapha/Kerkûk, li qûntarên

çiyayên li beramberî Mezopotamyayê, navenda bajarê tekane û herî girîng ê Hûrriyan e.”

Têkildarî avahiya zimanê Hûrriyan jî dibêje, “1956’an hat keşfîkin. Di van kolanan de ku arkeologan girîngî didanê, “ferhengek” a Hûrriyî hat dîtin ku qiyas bi 4 zimanên cuda dikir, her wiha helbest û hê girîngtir jî “notayên muzîkê” li vê derê hatine derxistin...

Ji tabletên heta niha hatine derxistin tê fêmkirin ku Hûrriyî xwedî 2 vehûnên ziman in (nivîsa mixî). Ya yekem, ‘Hûrriya Bo-gazkoyê’, ya duyem jî di kîtabeyên Mittaniyan de ‘Hûrriya Syro’ ye.

Zimanê Hûrriyî xwedî avahiyek “Agglutine” ye ango ‘Pêvekî’ ye. Taybetmendiya wê ya sereke ew e ku vehûna ziman bi pêvekên ji pişt ve lê tîn zêdekirin, tê sazîkirin. Lê, Hûrriyî naşibe ti zimanên din ên ku wek zimanên pêvekî têne zanîn.” Bi vî awayî jî balê dîk-şîne li ser çanda Hûrriyan.



Gûfî; Komek Aryenî ye ku li qûntarên Zagrosan, li qadên çiyayî yên li bakurê Sumeriyan jiyane. Ji ber pozîsyona xwe ya cografîk, karîbûne sûdê ji şaristaniyan werbigirin. Maneya peyva Gûfî

jî Gud=ga, dewar e. Tê wê wateyê ku xwediyê garanên dêwasa yên dewaran e, bi ajaldariyê re mijûl in. Zimanê wan Hûrriyî ye. Nivîsa mixî bi kar tînin.

Em ê di demên pêş de jî bibînin ku têngînkirinên mîna vê wê her hebin. Sumeriyan, Akadiyan û paşê jî Asûriyan her tim li gor taybetmendiyên komên etnîk ên li qadê nav afirandine. Gûtiyan, B.Z. 2750-2120'î xanedaniyek ava kirine. Yê ev damezirandiye jî Keyzer (qral) Kamasî ye. Paytexta wan Kerkûk e. Ji pêkhateyên konfederal çêbûye. Di belgeyekê de dibêje, *“Keyzer ji xanedaniyê nayê, ji her 3 salan carekê bi hilbijartinê tê ser. Her eşîrek serokeşîrê xwe heye. Konseyên rûspiyan damezirandibûn.”* Li qadên nêzî Sumeriyan jiyana xwe domandine. Di dîrokê de tabletên mîna; *“Gûtiyên ejderhayên çiyayan, dijmînên xwedê; hikûmdarî ji dest birin serê çiyê. Welatê Sumeran di nav xerabiyan, êşan de hiştin. Mêr, jin, bav, kur dîl girtin û birin. Xwedayê mezin Enlîl destûr daye ku ez Ûta Khagal, hikûmdarê cîhangîr ê nizane derewan bike yê Ûrûkê, hikûmdartiya Gûtiyan ji holê rabikim û wan ji welatê Sumeran derxim”* jî hevokên Akadan ên têkildarî Gûtiyan e. Dema ew bi xwe tevahî nîrxên gelan dimêjin dibin qehreman, lê gel dihemleyekê dikin wê demê dibin “dijmînê xwedê.” Çiqasî dişibe van rojan. Dema dagirkeriyê li gelan dikin dibêjin “tevgera azadkirinê”, lê dema gel li dijî dagirkeriyan li ber xwe didin jî dibin; “terorîst, jirêderketî, xwedênenas, çete.” Herhal zimanê serdestan her bûye ev û wer jî didome.

Gûtiyan, 150 salan li van deran hikûmdariya xwe domandin, piştî gihiştin şaristaniyê jî di avahiya wan a civakî de bêteşeyîbûnên (deformasyon) cur bi cur çêbûn, dûvre jî Amorîtên bi kokê xwe Semîtîk û beşek Sumeriyan dest didin hev û Gûtî ber cihên hatine ajotine. Tê zanîn ku navê keyzerê wan ê herî dawî Tîgran e û piştî têkçûnê, xwe vekişandine qûntarên Zagrosan.

Di warê madenan de xwedî ezmûn in û di vî warî de aletên mîna şûr, mertal, rim, tîr û alavên malê dikarin çêbikin.



Lûlû: Yan jî Lûmb; Konfederasyona wan B.Z. 2800'î ji hêla Annû Banînî hatiye sazîkirin. Navên îro yên mîna Loristan, Lolan, Lûr ji Lûlûyan mane. Asûriyan navê Lûlûm bi kar anîne. Navendên wan Şehrîzor û Hûlwan e. Dema Elamiyan de, Lûlûyan wek erdnîgarî xwe ji nêzî Silêmaniyê heta Îrana îro bi cih kirine. Paytexta wan Zîmrî ye. Têgînên îro yên mîna Loristan, Lûr û Lolanê ji Lûlûyan mane. Asûriyan ji Lûlûyan re gotine Lûlûm. Lûlûyî ji koma Aryen a proto-Kurd in. Jiyangehên wan Zagros in. Zehf nêzî Gûtiyan e. Bawerî û çanda wan, şewazê wan ê hilberînê û zimanên wan dişibin hev, heta dikare bê gotin heman in jî. Nivîsê jî bi kar tînin. Di xebata Mîtannîyan de Nazim Kok dibêje, “*Lûlûyan, ji bo jinan alavên xemlê yên mîna bazin, gustilk û gerdenî yên ji zêr û zîvê çekirine. Di heman lêkolînan de alavên xemlê yên ji bo zarokan jî hatine dîtin.*” Bi berdewamî jî ji xebata Prof. Egon Von Eicksted a **Di Serdeman de Tirk, Kurd, Îranî** ev beş wergirtiye, “*Cihê navdar ê ku welatê Lûlûyan nîşan dide, bakurê Zagrosan e. Li Şarezor a îro ye ku nêzî bajarê Silêmanî ye. Li vir Keyzerê Lûlûyan Anûbanînî, Keyzerê Akadan Naran-Sîn têk dibe û piştî jî vê serkeftina xwe li îstîqameta Paya Taqê bi Sarepole, Akadî, li tehtekî kola. Kurdan, ha li vir, cara yekem ji hêla Lûlûyan navê xwe bi Lûlûyî nivîsîn.*”

Ji ber ku Lûlû li ser fetlenoka bazirganiyê bûn, ji bo wan kontrolkirina vir zêde nebûye zehmet. Îstîqametên wan ên bazirganiyê ji ber bi rehetî nedihatîn kontrolkirin ji bûne hedefa êrîşên hem Akadan hem jî Asûran. Lûlûyan, heta B.Z. 700'î jî hebûna xwe domandine. Paşê di nav Konfederasyona Medan de cihê xwe girtine.



Hîtûti: (B.Z. 800-1200) “Gelekî li cih e û rast e ku mirov Hîtûtiyan jî daxilî vî nîfşî bike. Berevajî ku tê gotin, Hîtûti ji wan koman nînin ku di derbendan re, ji Qafqasan û rojhilatê Îranê hatine. Ji ber ku di nava çanda wan de şopên hûr ên ziman û çanda Hûrriyan hene, em weke encam dikarin wan mîna komeke rêveberên esilzade yê Hûrriyan destnîşan bikin. Xwedayên wan, wêjeya wan, têkiliyên wan ên dîplomatîk û bermahiyên ji qesrên Misrê nîşan didin ku ew jî fena Mîtaniyên li Anatolya Navîn bin. Çawa ku Mîtaniyan navendên Asûr kirin kontrola xwe, Hîtûtan jî di heman demê de dawî li dema kolonî ya Asûrê anîn, di heman demê de împaratoriya Hîtûtan di salên 1600-1250 B.Z. de ava kirin û dewam kirin. Fena ku li du herêmên mezin ên navendî rêveberiyên Hûrriyan ava kiribin, lê hê jî em rastiya vê baş nizanin. Ne tenê di warê xizimîtiyê û ziman de, di her warê jiyanê de bi giranî dişibin hevdu. Xeleka windabûyî di navbera her du herêman a Mîtannî û Hîtûtan de ye. Ez yeqîn dikim ku lêkolîn çiqas xurt bibin ev yek

jî wê zelal bibe. Di serî de Hattûşaş a ji dema Hîtîtan mayî û navendên wê yên girîng, xuya ye ku di hin pêşketinên şaristanîyê de rol listine. Cih û warên wan ên pîroz ji Ziggûratan bihurî ne. Perestgehên dînî, qesrên rêveberan, cihê mayîna xebatkaran û kewarên wan gelekî ji hev cihê û diyar bûne. Bircên wan ên fireh hene. Gelek bajarên bi vî rengî li herêmê têne dîtin. Li gorî wê demê ji aliyê eskerî ve dewleta herî pêşketî ye.

Li rojava ji bajarê navdar Troya (Yan Hîtîtiyan damezrandiye, yan jî hevgirtiyên wan ên nêz in, di koma heman çandê de şaristaniyeke xweser e), Ahiyevayên pêşî (Mirov vê komê weke komeke ketiye bin bandora Anatolyayê yan jî komeke Aryen a di salên 1800'î B.Z. de koç kiriye bihesibîne wê rastir be. Dema ku mirov bibêje bi koka xwe ji bakur, ji Ewropayê ne, ev berevajî berê, belavkirina herikîna şaristaniyê ye. Heman çewtî di mijara Hîtîtiyan de jî tê kirin) bi koka xwe ji niv-girava Yewnan, li bakurê Antalyayê Aşkavayî, li bakurê wan Kaşkayî (yên ji Derya Reş) û li Çûkûrovayê Kilîkyayî (Gelê li Torosê, di heman demê de li gorî demeke dirêj Lûwî ne), li başûr bi rikeberên xwe yên navdar bi dewleta Fîrawûnên Misrê re cîrantiyê dikin û danûstendina wan heye. Gelê li devera navendî, Hattiyên xweser in. Welatê xwe weke 'welatê hezar xwedayan' bi nav dikin. Ev yek ji hevrikiya di nava xwedayan de zêdetir girîngiya bi dostaniyê didin nîşan dide ango hevgirtina begîti û mîregan îfade dike. Di dîrokê de peymana yekemîn a nivîskî piştî şerê li Qadeşê, nêzî Çemê Asî û Hamayê di navbera Firawûnê Misrê Ramsesê Duyemîn û qralê Hîtîtan Hattûşîlî yê Sêyemîn de hat mohrkirin ku yek ji bîranînên girîng ên dîrokê ye. Wer tê fêhmkirin ku bi şiklekî xwediyê meclîseke arîstokratî a bi navê Pan-kûşê ne. Mirov dikare şîrove bike ku pêşiyên begê Hatûşaşê bi şiklekî federasyonê beg û mîran ava kirine." (Abdullah Ocalan, Şaristanî)

Kassîdî: (B.Z. 1900-1207); Çiyayî ne ku ji ber sedemên cur bi cur ji bakur hatine û mîna penaberan li xakên Sumeran bi cih bûne. Dîroka wan a hilweşînê li hin deveran wek B.Z. 1157 tê dayîn. Hin dîroknas jî vê dîroka mîna dîroka ku dema Kassîdî ketine bin serweriya Elamiyan bi lêv dikin. Li xeteke ku ji bakurê Çemê

[illegible]

50

Cihê ku esas lê kom bûne jî Amed, Riha, Mêrdîn û Şengal e. Lê, tê zanîn ku di salên 1400'î de herêmek berfireh kontrol kirine. Ji tabletên derketine holê tê fêmkirin ku zimanê Hûrriyan hem di gotinî hem jî nivîskî tê bikaranîn. Bi taybet jî nivîsînên wan ên li ba Misriyan û Hîtîtiyan balkêş in. Em îro hê çêtir dizanin ku peymana destpêkê ya dirokî ne “Kadeş” e. Peymana destpêkê di destpêka salên B.Z. 1400'î de di dema Artatama yê Yekemîn de bi zimanê Hûrriyan hatiye nivîsandin û mabeyna Misrî û Mîtanniyan de ye. Li herêma maden zêde ne. Ji ber vê jî ji zû de hesinkarî bi pêş ketiye û lewre jî hêzên girîng bi dest anîne. Bi meysterê (seyîsî) tên zanîn. Mîtaniyekî bi navê “Kîkûlî” bi zimanê Hîtîti ve hûrikûr li ser perwerdekirina hespê baş radiweste. Ev jî ber asta perwerdeya hespan nişan dide, balê dikşîne. Di dokumanên dirokî de diyar dibin ku Mîtanniyan perwerdeya hespê fêrî Hîtîtiyan kirine. Çêkirina xaliyê (mefûrê), bi armanca leşkerî bikaranîna hespan jî ji aliyê dirokê ve tê destnîşankirin ku Mîtanniyan ji Misriyan re ragihandine. Belgeyên nivîskî her wiha nişan didin ku yên destpêkê mohr bi kar anîne jî Mîtannî ne.


Divê neyê jibîrkirin ku Nefertîtî wek bûk ji vê xakê diçe Misrê û navê bajarê ku ava dike jî Maranî ye. Navê Fîrawûnê ku Nefertîtî pê re zewicî ye jî Amenhotepê 4'an e. Dûvre jî Fîrawûn Amenhotepê 4'an wê wek Akhenaton bê bibîranîn. Tevahî diroknas destnîşan dikin ku li Misrê Akhenaton tevahî xwedayên Misrê rakirine û li şûna wan wek xwedayekî tenê, xwedayê rojê hiştiye. Ji ber Nefertîtî ji gel Mîtanniyan çûye, ola ku di nav de mezin bûye jî Xwedayê Rojê ye. Bajarê Maranî yê ku em behsê dikin jî di nava çolê de ji bo xwedayê rojê wek însayek nû tê avakirin. Rastiyeke din a dirokî jî ew e ku piştî mirina Akhenaton, rahîbên Misrê bi destê kurê Akhenaton ve ji nû ve xwedayên Misrê tînin.

Piştî ku Asûriyan dawî li Mîtanniyan anîn, li herêma bi navên cur bi cur hêz û tifaq çêbûn. Yek ji van jî Naîrî ne.

Naîrî; B.Z. di navbera sedsalên 13'an û 9'an de jiyane. Asûriyan, ew mîna “Gelê Avê” bi nav kirine. Naîrî, di zimanê Asûriyan de “Welatê Avê” ye. Dibe ku ji ber Naîrî li nêzî çemê Dîcleyê bûn, her wiha kaniyên wan ên avê zêde bûn, ji hêla Asûriyan ve wisa hatibin binavkirin. Naîrî, ji sedan komên eşîran pêk tê. Di tabletên keyzerên Asûran de behsa 40 keyzerên Naîriyan tê kirin ku ev jî vê

pêkhateya eşîrên navbihurî piştrast dike. Hin kes ji van re dibêjin, Konfederasyona Begîtiyên Feodal. Ji ber dijiwariya erdnîgariyê, Asûriyan nikaribûn bi rehetî kontrol bikirana. Cih bi cih îşyan kirine, xwe kişandine qadên herî dijwar û ev jî bûye sedem ku îzafî azad bijîn. Em dîsa li vir îşyankariya eşîrî ya kevneşopiya Kurdan dibînin. Piştî demek dirêj, wê Ksenophon di pirtûka Anabasis de vê xakê mîna axa Kardûkiyan bi nav bike.

Em dîsa ji tabletên Asûriyan dizanin ku Naîriyan dem bi dem xwe gihandine heta Amedê, ev der jî tevî xakên xwe kirine.



Ûrartûyî; Di salên 1000-700'î B.Z. de jiyane. Serdema wan a bi heybet jî sala 835 B.Z. ye. Wek Haldî û Bîanî jî tînen zanîn. Haldî di heman demê de navê xwedayê wan ê herî navdar e. Dîsa wê di cih de be ku em Teşûba jî bi lêv bikin. Şaristaniya Ûrartûyê ku di Sumerî de tê wateya welatê cihên bilind, hêzek girîng e ku xwe li peravên Wanê navendî kiriye. Paytexta wê Tûşpa ye. Xwe dispêre bi sedan eşîrên ku bi eslê xwe Hûrî ne. Federasyona bi tîkiliyên sist derbas kiriye û vediguhere dewleteke navendî. Wê ne şaşitî be ku em bêjin ev jî di encama tîkilî û yekgirtina Naîriyan de çêbûye. Di xebata Mîtannî de wiha tê gotin, *“Taybetmendiyeke gelekî girîng a dewleta Ûrartûyê jî ew e ku ji bajaran saz bûye. Li gor feraseta rêveberiya konfederal a ku li jor hatî diyarkirin, xwedî sistemek wisa ya rêveberiyê ye ku welat li gor sistema eyalet û bajaran di*

çarçoveya beşên îdarî de hatine diyarkirin. Hema hema dikare bê gotin ku “Kelhe-bajar” bûne sembola dewleta Ûrartûyan.” Wek nimûneya vê jî Tûşpa-li peravên gola Wanê, Sardûrîhînîlî-23 kîlometreyan dûrî Wanê, Rûsahînîlî- li nêzî Wanê, Tîtûmînîa- li nêzî Erdîşê, Argîştîhînîlî- li nêzî Erîvanê, Teîşebaînî- li nêzî Erîvanê, Îrpûnî-li xakên Ermenistanê, Tarûî-Tarmakîşa û Ûhl- li Rojhilatê Kurdistanê, Ardînî- bajarên li qada Mukriyan a Rojhilatê Kurdistanê tên nîşandan.

Ji bo çêkirina rê, bend, qenalên avê zîrek in. Wek mînak, “*Pêşiyên Kurdan Ûrartûyan, 800 salî beriya Romayîyan, sîstema veguhestinê ya ku li cîhanê herî kevnare ye, însa kirine, ji seriyekî heta seriyê din tevahî welatê Ûrartûyê bi Tûşbayê girê dane. Tora destpêkê ya rê, di nav geliyê Wanê de mabeyna Tûşpa (Wan) û Rûsahînîlî (Toprakkale) de hatiye avakirin. Rêya ku ji navendê derdikeve û ber bi rojhilat û başûrrojhilat ve diçe jî xeta bi navê “Rêya Keyzer” e; Xetek rêyê ye ku ji Tûşpayê heta Gelî Şînê 400 kîlometreyan dirêj e. Dîsa, xetek din jî ber bi milê rojhilatê Ûrmiyê ve diçe. Her wiha, xetek din jî ber bi rojava ve hatiye kişandin; rêyek bi sedan kîlometre ye ku ji Wanê derdikeve, Çiyayên Çewligê dibihure û ber bi milê Palo-Elezîz-Meletî ve dirêj dibe.”* (Mehmet Saît Yildirim- **Di Çêbûna Şaristaniyê de Kurd û Çand**)


Prof. Sevîn vê rewşê wiha vedibêje, “*Rêyên Bejahiyê yên Ûrartûyan ku ji sîstemên herî kevnare yên cîhanê ne û beriya Romayîyan bi 800 salî hatine çêkirin, di qada fen û endezyariyê de berhemek endezyariyê ya li gor dema xwe herî mukemel e. Li gor lêkolînên me, di cîhanê de yên destpêkê rêyên bejahî çêkirî ne Împaratoriya Roma ye, Ûrartû ne... Paşmayiyên herî bedew û bi bandor ên ji rêyên Ûrartûyan mane, li ser Çiyayên Çewligê ne. Ev rêya ku paralelî rêya Çewlig-Elezîzê domahiya 20 kîlometreyan ber bi dûzbûniya Depê dewam dike, îro hê jî ji hêla şênîyên herêmê tê bikaranîn. Ev rê ku ji hewzeyaya Gola Wanê ber bi herêma sînorê rojava; Palo, Xarpût û Meletiyê dirêj dibe, 5,4 metreyî fireh bû. Li ser rê jî her 25-30 kîlometreyî carekê karwanserayek hebû.”*

“*Pêşketinek şaristaniyê ya hê girîngtir jî xebatên bendavê bûn. Ûrartû yên ku wek nûnerên destpêkê yên şaristaniya hîdrolîk tên qebûlkirin, tê zanîn ku hê di wê demê de 12 bendav ava kirine.*


Ûrartû, yên ku mîna bendavên li ser çemên Firat û Dîcleyê bi hev girêdayî, bendên bi heman rengî û nimûneyên yekem jî ava kirine, bi vê rêbazê ve ava di Bendava Rûsa de ku 2540 metre ye, herikandine geliyê Wanê. Bendava Rûsa ya wek Gola Keşîş (Keşe) jî tê zanîn, B.Z. salên 685-645'an ji hêla Keyzerê Ûrartûyan Rûsayê Duyemîn, li qûntarên Çiyayên Ereke hatiye avakirin. Bendeve Rûsa ya ku tam 2544 metreyan ji sewiyeya (hîza) avê bilindtir hatiye avakirin, bi vê taybetmendiya xwe ve ne tenê li Mezopotamya û Anatolyayê, li cîhanê jî tesîsa avê ya ku bilindahiya (raqim) wê herî zêde ye. Bendava Rûsayê, nêzî 2700 salan e bi tamîrên biçûk ve hê dixebite û xizmetê dide şênîyên herêmed. Herêmed, li ser xeta erdhejê ya pileya duyemîn e, 2700 sal in bi çendan erdhejên rûxîner di ser re derbas bûne, lê bendav hê li ser piyan e û xebata xwe didomîne. Ev jî îsbata şênber e ku bê şaristaniya Ûrartûyan di asta pêşketina teknolojîk û endezyariya avê de çiqasî serkeftî ne.”

(Di Çêbûna Şaristaniyê de Kurd û Çand)

Hê îro jî qenala 56 kîlometreyî dirêj bi heybet mezin li ber çavan e. Di zêringerî, kolînerî (heqaqî), çandinî, şarab û hwd. de astek girtine. Her çiqasî destpêkê nivîsek mixî bi kar anîbin jî, bi demê re nivîsînek resen a wek cureyeke hiyeroglîfê pêş dixin. Ji ber xwediyê maden, hesp û keresteyê ne, her bi Asûriyan re hatine dijberî hev. Tabletên tijî “pesn” yên Asûriyan ku dibêjin “*min, me ji serên mirovan kelhe ava kirin*” bi giranî behsa wehşeta Nasîrpalê Duyem ê Asûrî ya li dijî Ûrartûyan dike. Di encama êrîşên Îskît û Kîmmeran de ku nîrxên komunal resen dijîn û ji qadên bakur ên derveyî şaristaniyê tîn, hilweşiyane. Bicîhbûna mirovên me yên Ermenî ya li vê xakê, piştî vê dîrokê bi pêş dikeve. Dûvre wê di nav Konfederasyona Medan de cihê xwe bigirin. Komek din a etnîk jî Mannaî ne.



Mannaî; Li herêma mabeyna Gola Ûrmiyê û Çiyayên Zagrosan jiyane. Bi eslê xwe HûrRî ne. Dîroka wan a jiyane wek a Ûrartûyan e. Şêwazê wan ê rêveberiyê, li gor dema xwe hin xweseriyên xwe hene. Mînak, hêza keyzer ji aliyê desteya rûspiyan tê sînordakirin. Cîrantiya li cem Medan ku wê dûvre çêbibe, mîna di nav hev de dijîn dixuye. Damezrînerê Medan, ji aliyê Heredot wek Deîcos, ji aliyê Kurdan wek Diyago û her wiha ji aliyê Fari-san jî wek Keaştaratî tê binavkirin. Waliyekî Mannaiyan e. Piştî Ûrartû û Mannaiyan, wê êdî Med derkevin ser dika dîrokê.




Med; B.Z. salên 900'î cara yekem behsa hebûna wan tê kirin. Keyzerê Asûran Salmanassarê Sêyemîn (855-824) dema diçe şe-rekî behsa xakên Medyayê dike. Keyzerê Yekem Diyago ango Keaştaratî ye. Keaştaratî, Deîcosê ku Herodot behsê dike, ev e. (B.Z. 727-675) Paytexta wan Hemedan ango wek Faris bi nav dikin Ekbatan e. Li dijî Asûriyan berxwedana herî xurt raber dikin û her ku diçin li herêmê berbelav dibin û dibin hêzek bi bandor. Paşê jî kurê wî Key Ferûars ango Feravertîş (B.Z. 674-653) ê ku Yewnanî jê re dibêjin Pharaortes, derbasî şûnê dibe. Kurê Key Feruars, Keyakser (625-585) li herêmê tifaqên xurt ava dikin, sala B.Z. 612'an dema Împaratoriya Asûran têk diçe, di serî de Babîlî, li gel hêzên herêmê bi hevparî tevdigere û heta pêşengtiya wan jî dike. Em diyar bikin ku rêbertiya îdeolojîk û felsefîk jî Zerdest dike. B.Z. 612'yan a hildiweşe Nînova ye, lê Împaratoriya Asûrî hewl dide hebûna xwe li Harranê bidomîne, tevî vê jî B.Z. 610'an têk diçe.

Med, pêşketina xwe didomînin. Keyakser, ji ber li dijî Împaratoriya Asûran taybetmendiyê berbiçav ê her eşîreke endamê Konfederasyonê bi rêxistin dike û li qada şer jî vê nîşan dide, wek kesê ku artêşan rêkûpêk dike tê zanîn. Lewma jî ji Anatolyaya Navîn

heta Afganîstanê xakên xwe berfireh dike. Dema berê xwe dide rojava, li dijî cîranên xwe Lîdyayiyan jî şer dike. Girtina rojê ya ku Heredot dibêje dema şerê Medan û Lîdyayiyan de pêk hatiye, B.Z. 28'ê Gulana 585'an rû daye. Ev mîna îşaretek xwedayan tê dîtîn û şer tê rawestandî. Heta, Keyzerê Lîdyayiyan Alyattes, keça xwe bi kurê Keyakser Astiyages re dizewicîne, soza biratîyê dide, Kizilirmakê wek sînorê xwe qebûl dike.

Med pêşketinek wisa bi dest tînin ku; piştî bi salan jî yên hatine Rojhilata Navîn li beramberî avahiyên Medan heyrantiya xwe ve-neşartine. Ser meselê, Heredot ji bo qesra Medan wisa dibêje; *“Sûrên kelhê wisa fikirîne ku her yek ji ya din bi qasî sehaniyek şer bi jor e. Para hunerê zêde ye. Sûre herî mezin, hema hema qasî havîrdora Atînayê ye. Zereqeyên (mazgal) diwarê yekem spî ne. Ya duyem reş; sêyem jî sorekî birqokî; çaremîn şîneke zenûn e; ya pêncan bi rengê mistek (reçîne); ji her duyên dawî jî yek tehkîma wê zîvîn e, ya din zêrîn e.”*

Med, li giştî Rojhilata Navîn bi roleke azadkirinê rabûne. Her çiqasî di dema kurê Keyakser Key Astiyages de di nav firehiyê de jiyabin jî, her ku biçe wê teng bibin û herî dawî jî bi komplooyoke di qesrê de wê desthilatdariyê ji dest bidin û Akhamenît ku xanedaniyeke Persan e, wê bibin serdest. Her çendî jiyana Medan heta demekê dewam bike jî, her ku biçe wê biheşifîn (tine bibin) û di nav Împaratoriya Persan de wê bi awayekî talî ango di rêza duyem de hebûna xwe bidomînin. Ev destguhertin, di salên B.Z. 550'î de wê bi dest neviyê Astiyages, Kîros bibe. Pers, bi gotinek hê rasttir Akhamenît her çiqasî desthilatdarî bi dest xistibin jî, di serî de Heredot, gelek dîrok nasan dema behsa Persan jî kirine dîsa jî bêfîkar wek Med îfade kirine. Wisa ye ku dîroknasê Yewnan Strabo ji bo hem Med hem jî Persan gotina Cyrîtî ango Kirdi-Kurd bi kar anîye. Di bin vê rewşê de vê çanda sereke ya Medan heye.



Li nêzî Samosata Semsûrê, piştî Îskender, wek senteza çanda Helen û Med-Persan Keyzertiya (Qraltiya) **Komagene** ava bû. “Keyzertiya Komagene; li herêmeke ku rêyên cuda yên li Çiyayên Torosan, bi daristanên erz (sedar) û maden û mîneralên dewlemend navdar e, digihêje hev; li erdnîgariyeke berfireh a ku bakurê Sûriyeyê, Hatay, Pinarbaşı (Kayserî), Bakurê Torosan, peravên jor ên Dicle-Firatê dorê lê digirin; deverên Semsûr, Meletî, Elezîz, Dîlok, Mereş û Rihayê di nav xwe de dihewîne, hatiye damezrandiye. Keyzertiya Komagene ya ku navenda wê Samsat e (bi navê wê demê Samosata), mabeyna salên B.Z. 162- P.Z. 72’yan de nêzî 230 salan jiyaye.” (Di Çêbûna Şaristaniyê de Çand û Kurd)

Otorîteyên xwecih, di astek mezin de hebûna xwe ya siyasî parastine. Keyzertiya **Abgarê** jî bi heman şeweyî hebûna xwe li nêzî Rihayê domandiye. Ziman û çanda wê ya Aramî, li seranserê Rojhilata Navîn xwedî asteke çalak e. Pêşketinek bi heman rengî, li Sûriyeya îro di salên P.Z. 300’î de Keyzertiya **Palmîrayê** nîşan daye. Keybanûya wê ya herî dawî Zennûbe, P.Z. 268’an dîl dikeve destê Împaratorê Romayê Aûrelîûs, dawî li qraltiyê tê. Û di salên P.Z. 256’an de jî bi temamî ji holê radibe. Di heman pêvajoyê de Keyzertiya Komagene jî tine dibe.



KOMAGENES-NEMRÛD

Piştî ku Îskenderê Mezin B.Z. 330'î de Împaratoriya Persan hilweşand, li herêmê pêşketinên nû û çandekê nû dest pê dike. Ev pêvajoya ku mohra Helenan li ser e, gelek çandan di nav xwe de dihelîne. Wek mînak jî şaristaniyên Troya, Frîgya û Lîdya yên li peravên rojavayê Anatolyayê dikarin bên nîşandan. Ev hilandina ku dikare wek polîtîkaya bişavtinê jî were binavkirin, li Erdnîgariya Kurdan ji ber nîrxên Neolîtîk ên bi kok û kûr, pêk nayê. An jî mirov bêje zêde bi bandor nabe wê hê di cih de be. Sedem jî ew e ku çandek bi kûrahî jiyane, ji bo şaristaniyê hucreya (şaneya) kok in, lewma jî guherandina avahiyek wisa ya civakê gelekî zehmet e. Wek nimûneya vê jî sekna xweser a Keyzertiya Komagene dikare bê nîşandan.

Abdullah Ocalan, rastiya ku li jor hat vegotin, wiha tîne ziman: **“Ravekirin û tarîfa civaka Kurd hînê hêsantir e. Gelê Kurd û heywan xwedîkirin, cotkarî û çiya heman tişt in. Bajarîti weke tîgîn ji Kurdan dûr e, belkî jî gundîti di dîrokê de rastiyeke civakî ye ku pêşiyên Kurdan pêk anîne. Kurd çendîn gundî û koçer bin, ew çend jî ji bajartiyê dûr in. Komagene pir baş rave dike ku nîv-gundîti û nîv-koçertî nîzama tevgerê û cihûwarê hezar salan ê Kurdan e. Bajarên wan jî zêdetir da-**

girkeran ava û tijî kirine. Lê ev nayê wê maneyê ku Kurdan bajar ava nekirine û nebûne xwediyên şaristaniyê. Di serî de dewletên Êrartû, Med û Mîtanî, tê zanîn ku bûne xwediyê gelek bajar û şaristaniyan. Di serdema navîn de têra xwe bajar û hukûmetên eyaletan ava kirine. Lê ji ber ku dewlet û hikûmetên ku ava kirine, temen dirêj nebûne, bajar zêdetir bûne biryargehên hêzên dagirker û ji civakên hawîrdorê pêk hatine.”

Li cihekî din jî dibêje: “Ji ber ku çiyayên bilind jî rola beden û kelhan dilîzin, pir bi awayekî xwezayî xwe avêtine bextên wan. Ji lewra mirov dikare bibêje çiya baregehên parastina etnîka Kurd in. Pêşiyên Kurdan li dijî dagirkerî, talan û xerabiyên ku ji çar aliyan ve bi ser wan de dihatin ji bo xwe biparêzin çiyayên li seranserî Kurdistanê ji xwe re mîna beden û kelheyên xwezayî kirine mesken û cihê sitarê. Dûr nêz bi sedema vê rastiya dîrokî zêde nekarîn li deştan şaristaniyê bi pêş bixînin. Ji lewra çiya û Kurd heman tiştî îfade dikin.”

Ji ber ku Kurd bi “azadiya xwe” girêdayî ne, her tim hewl dane ji van navendan dûr bisekinin. Ev dûrmayîn, derfetê jiyanê û şensê jiyanê afirandîye. Ji ber ku Kurdên li bajaran, li ser vî esasî li deştê bi cih bûne, heliyane, hatine helandin. Bajar ew cih e ku biyanî dikarin xwe rehet hîs bikin û dixwazin li vir jî bijîn. Lewma jî bajar navenda çînîbûnê, mêtinê ye. Li ser vî hîmî cih û navenda hîlandinê ye jî. Kurdên ku dixwaze nehele, bi rûmet bijî, bi bayê lezê hatine tasfiyekirin, dane ber devê şûran. Lewre jî bajar navekî din ê radestbûnê, dirûvguherînê ye. Ji ber vê yekê ye ku Kurd ji dûrahi li “bajarî” dinêrin. Bi gotinekê hê pêşdetir, gunehê xwe bi bajarî tînin. (Ji ber vê ye ku wê bi salan nêzîkatiyek tijî tinaz-henek- û liberketinê li beramberî Kurmancê ku ji eşîrê qut bûne û dûvre wisa hatiye binavkirin, nîşan bidana.) “Çanda pê radibin çandêke bajar, çîn û dewletê nîne; çandek e ku di nava xwe de rê nade otorîterbûyîn û çînîbûyînê, berevajî di demokrasîya qebîleyê de israr dike. Ji ber ku Kurd bi çandêke welê demokratîk re têkildar in, bi hêsanî kes nikare wan zeptûrept bike.” Wan, her xwe kişandine quncikên herî tenha yên çiyayan û jiyana herî zor hîlbijartine. Xweparastin, derketina lûtkeya çiyayan, bûye mîna ajoyekî hundirîn. Ji bo karîbe bijî, her tiştî mubah dibîne.

Rêbaza wan jî li gor şêweyê jiyanê teşe digire. Kesayetek wisa di Kurd de çêkiriye ku serobero, keyfî ye; ji ya xwe nayê xwar; li gor xwe ye û siberoja xwe zêde nafikire, rojane ye, bi têngîna îro ve asî-eware ye, nakeve bin zeptûreptê.

Kurdan xwe li çiyayan stirandine û wisa jî hewl dane xwe ji cinawirê yekdiran ê şaristaniyê biparêzin. Jiyana wan li ser vê diyalektîkê ye. Lê bi awayekî paradoksî; wek me got dema van dike jî, girêdayî şertên xwe yên xweser û jiyanê jî bi sekna xwe ya asî, stûyê xwe xwar nake, ji avakirina disîplînek hundirîn jî bêpar dimîne. Ew kesayetên me ne ku îro bûne elimandin; ji ya xwe nayê xwar, serîhişk, ji nermahiya polîtîk dûr, teng, xweperest (xwebîn), di oxira hesabên biçûk de nikare wêneyê mezin bibîne, parçeyî, eşîrparêz, herêmparêz, mezhebparêz, malbatparêz, bi kurtasî di mehelîparêziyê de eliqî mane.

BEŞA DUYEMÎN: XETÊN MOHRA XWE LI DÎROKÊ DANE: ÎXANET Û BERXWEDAN

Felsefeya Zerdeştîyê

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan di parêznameya Dadgeha Mafên Mirovan a Ewrûpayê (DMME) de bi berfirehî behsa Zerdeştîyê kiriye. Em ê beşek ji van nirxandinan li vir bidin, Zerdeştîyê û felsefeya wê binirxînin.

Abdullah Ocalan dibêje: “Zerdeşt, sazûmana baweriya Ar-yen a seretayî, di reformeke bingehîn re derbas kiriye. Wek rolek navgîn listiye ku sazûmana xwedayê sêmend ber bi pêvajoya sazûmanîyeke yekxwedayî peresandiye. Ji xwedawendên demê yên Aryenan, Îndra, Mîtra û Varûna, derbasî Ahûra Mazda dibe. Her wiha li Anatolya, Îran û Medyayê ber bi yek xwedatiyê ve gav avêtiye. Di warê çêbûna têgînên bihuşt-dojeh, sirat, firîşte (milyaket), tebeqeyên asîman, mehşer, dadgeha mezin û mêzîna qencî-xerabiyê de xwedî roleke mezin e. Qîmetekî mezin dide jinê, alîgirê paqijî, jiyana bi namûs, gotina xweş, karê baş e, li dijî serjêkirina heywanan e. Ji bilî xweparastinê, tundiyê red dike.

Exlaqparêzekî mezin e. Di bingeha filozofîya wî de, têkoşîna di navbera tarî û ronahî, qencî û xerabiyê de heye. Yekem car mirov azadiya vîna xwe nas kiriye. Naskirina azadiya vîna mirov, tê wateya ku heta wê rojê afirînerî tenê karê xwedê bû, êdî ev dibe karê mirovan jî. Afirînerî ya takekesî ku derûniya ramana rojava ye, aliyê felsefeya Zerdeşt a herî girîng e. Bingehgirtina vîna azad, destpêka felsefeyê û redkirina têgihîna benî (evd) ye. Doktrîna wî di vê xalê de, di navbera ol û felsefê de, di rewşeke derbasbûyînê de ye. Ev tê wateyeke mezin ku di navbera ol û felsefeyê de, duriyanê (terkarê) temsîl dike...

Nêzîkbûna herî rast ev e ku pêxemberiya ola yekxweda û filozofîya vîna azad, li erdnîgariyeke wiha derbasî nava hev

bûne. Ev jî bi saya du çandan, di dîrokê de herî kûr pêk hatiye. Ev yek ne tesaduf e ku yê herî têngihîştîyê li ser lêkolîn û sift-bûna Zerdeşt, filozofê mezin ê Elman Nîetzsche ye. Dema li çavkaniya vîna winda û nirxên mirûz (rû) yên Rojhilata Navîn û Mezopotamya were gerandin, vegera ber bi Zerdeşt ji me-reqa zanistîyê zêdetir, gihîştina çavkaniya felsefeya civakeke azad û gihîştina têngihîna exlaqê vejîner e. Ev tê wê wateyê jî ku kesayetîya xwe di dîrokê de ji nû ve kifş dike û rojaneyî dike...

Li Medya, lêgerîna rahîbên bi navê Mag jî, parçeyek ji vê nêzîkbûnê ye. Rahîbên Mag, bîrdoziyeke rizgariyê û komîkbûnê temsîl dikin. Aliyên Magan ên nû, ferasetên olî yên Aryen û Mîtolojiya Sumer sentez dikin, bêhtir ber bi rizgariyê û mirovan dibin. Zayîna mîtolojîk, ji bo pêşveçûna her şarista-niyeke cidî, pêdivî û pêşrew e.

Heger ku mîtolojiya sazûmanîya serdest û têngihîna olî neyê derbaskirin, derketineke şaristanî ya nûjen ne mimkun e. Piştî demeke qupbûnê (kurkbûn) ku domdirêj û aliyê wê yê mîtolojîk giran e, tevgera nû ya siyasî û civakî wê bi pêş ve biçe. Wekî ku rola don û benzînê pêdivî dileyîze. Erdnîgariya Med-yaya hîkarîker (bi bandor) û çanda berxwedanê ya domdirêj, çavkaniya besta (îlham) rahîbên Mag ên bîrdoziyî ne. Li gel ku ji têngihîna olên Sumer û Aryenan bandor girtine, tê çavdêrîkirin ku Medan bi xûnaftineke cidî bersivê didine wan û nûjenî-yan li cîgeyîyê tînin. Dikare bê nirxandin ku Berxwedana Kawayê Hesinkar, hê bêhtir aliyê vê nêzîkbûnê ya destanî û pratîk e.

Rahîbên Medya Mag, B.Z. ji salên 1000'î û pê de li qadeke herî stratejîk, temsîliya vê nêzîkbûna dîrokî dikin. Li gel ku di warê etnîkî de, di bin navê Kavî-Mîr de, gihane hêza otorîte-yeke di asta law mîrîtiyê de, çêbûna dewletê û civaka bi çînayê çavdêrî kirin. Ji ber ku eşîr hebûna xwe diparêzin, siyasîbûne-ke ku ji şeweya begîtiyê derbas bibe ne mimkun e. Herî zêde konfederasyonên eşîran têne pêkanîn. Li ba Medan ev wiha ye. Yên beriya wan hê bêhtir ziman û çanda heman bi kar tînin, li gel Medan jî eşîrên Persan, cih digirin."



Abdullah Ocalan dema di pirtûka xwe ya Sosyolojiya Azadiyê de Zerdeştiyê dîsa dinirxîne, van dibêje: “Di dîrokê de, di têkiliya dîn û exlaq de weke kesayet û doktrînekê em Zerdeştî û Zerdeşt bi awayekî îstîsnayî dibînin. Lêkolîn, Zerdeşt û doktrîna pê ve girêdayî weke şoreşeke exlaqî ya mezin terîf dikin. Li qûntara çiyayê Zagrosê di nava çandêke civakî ya bi heywan xwedîkirin û cotkariyê de (çanda ji neolîtîkê ve 12000 B.Z. heta rabûna dema çaremîn a qeşayî 20000 B.Z.), li

dijî hegemondariya mîtolojîk û dînî ya şarisaniya Sumer (3000 B.Z. – piştî wê) ji pîroztiyê wêdetir ev şoreşa exlaqî ya weke meyleke exlaqê sekuler û dinyewî diparêze bi pêş ket her çiqasî li ser navê Zerdeşt weke Zerdeştîzmê hatibe binavkirin jî hê bêhtir xwedî reh û kokên kevn e. Zerdeşt bi gotina xwe ya navdar a bi xîtaba “Bêje, tu kî yî?” êşkere ye ku xwedatiya dînî û mîtolojîk a şarisaniya Sumerê dixê ber lêpîrsînê. Ji lewra ev rexneya wî ya pêşî ya exlaqî li xweda û dînên şaristanîyê gelekî girîng e...

Di Zerdeştiyê de hêmanên şaristaniya demokratîk giraniya xwe hene. Di malbatê de nêzî wekheviya jin û mêr e. Ezîyetê li heywanan nake; bi piranî goştê wan nayê xwarin, ji berhemên wan sûdwergrîtin esas e. Di Zerdeştiyê de zîreat û cotkarî bi nirx û qîmet e. Têgînên qencî û xerabîyê yên ji pîroztiyê hatine şuştin derdikevin pêş. Şêwazê fikrê dualîteyê (hêzên ronî û tariyê) ku tovên pêşî yên diyalektîkê bi bîra mirov dixê di Zerdeştiyê de gelekî diyar e. Tê de hewldanek heye ku dixwaze bi awayekî diyalektîkî li gerdûnê serwest bibê. Rêvebirina civakê bi rêzik û pîvanên exlaqî yên xurt esas tê girtin. Gelekî êşkere ye ku bi van aliyên xwe hemûyan li dijî Sumeran û şaristanîyên koka xwe ji wir digirin, şoreşeke bi hêz a exlaqî nîşan dide. Çawa ku tê zanîn her çiqasî hatibe berevajîkirin jî ber-

hemê herî mezin ê vê şoreşê Konfederasyona Med (mixabin wê gelekî were berevajîkirin) û ya jê dewr girt Împaratoriya Pers e. Her çiqasî Manî (salên 250'î PZ) wê hewl bide di vê doktrîna exlaqî de şoreşeke duyemîn bike jî împaratorên Sasanî yên gelekî riziyaî û genîbûyî wê vê asteng bikin. Manî bi xwe bi dijarî tê cezakirin. Şerê du nasnameyên exlaqî û dînî mewzûbehs e...

Rîwayet tê kirin ku Zerdeşt wexta li çiyayê Zagrosan e ku gelekî aşiqê wan e, dema roj bi tevahî ronîya xwe hiltê dengêkî dibihîse. Ew deng welê diqîre: “Bêje, tu kî yî?” Ev şîrove nîşan dide ku çawa li Xwedê rast hatiye, pê re danûstendiye û hesab pirsî ye. Ez yeqîn dikim ku Ew bi hebûna qralên xwedê yên Sumerîk ên bi hezaran salan, berê xwe dane azadiya gelê Zagrosê, ketiye nava hesabpîrsînê û xwe li wan rakişandiye. Bi awayekî ev qralên xwedê yên şaristanî bi xwe ne, pîroztiya wan xistiye ber lêpîrsînê û şoreşa exlaqî ya Zerdeştî pêk tîne. Ev şoreş bi şeweyê dualîteya ronahî-tarîfî, qencî-xerabî ye.”

Têkildarî Zerdeşt em çend agahiyan parve bikin wê baş bibe. Tê gotin ku Zerdeşt bi awayekî şênber B.Z. 650-583 jiyaye. Ev dirok di heman demê de ew sal in ku Medan li Rojhilata Navîn şoreşek xurt pêk anîne. Bêguman e ku li pişt derketina mezin a Medan, zîhniyeta Zerdeşt heye. Pirtûka Avesta heye ku Zerdeşt bi şewazê Gathayan-Gotinan rêkûpêk kiriye. Ji Avestayê ku tê gotin bi giştî “ji 21 pirtûkan-72 Yasnayan” pêk tê, mixabin heta roja me beşek pir biçûk maye. Ev Gatha, 3600 – li gor hinan 12.000 lib in, li ser çermê ga hatine nivîsandin. Ev kulliyata dêwasa dema ku Îskenderê Mezin bajarê Persepolisê wêran dike, di astek mezin de tine dibe. Zehf kêr Gatha hatine rizgarkirin. Ya heta roja me jî mane 17 Yasna ne.

“Gatha, metînen pîroz in ku ji giştî mane. Zarathûştra ji hêla Xwedê Ahûra Mazda ji bo Gathayan bigihîne mirovan hatiye wezîfedarkirin. Ev dûvre di 3'yemîn kompleksa pirtûkên olên mezin de ku wek Avesta teşe digire, di beşa “Yasnayan” de hatine bicihkirin. Di Avestayê de 72 Yasna hene. Beşek ji van ji bo 72 Yasnayên Pirtûka Pîroz a Zarathûşta temam bibin, piştî li ser metînan hatine zêdekirin. Esas Yasnayên resen, ku ev ji ilahiyên lîrik ên bi navê Gatha pêk tên, Yasnayên 28-34, 43-51 û 53'yemîn in û

17 heb in. *Gathayên* ku van *Yasnayan pêk tînin*, *beşên Avesta* ne ku bi *rengê helbestî* hatine *rêkûpêkkirin*; gerek bi *sîstemên metrik*, gerek ziman, *çi felsefe û termînolojî û çi jî* bi *yekparebûna wateyê* ve hem jî *metnên Yasnayên din û hem jî jî beşên din ên Avestayê* cuda dibin...

Avesta, di dema *Sasaniyan* de cara duyem *tê berhevkin*, bi *giştî* wek du *beşan* hatine *nîzamkin*. *Beşa yekem*, ango bi gotinek *hê rasttir Avesta*, *mîna 3 pirtûkan* hatiye *birêkûpêkkirin*. Ev, *Vendîdad*, *Vîspêrad û Yasna* ne. *Vendîdad* di *Avestayê* de *navê beşa yekem* e ku *rêgezên olî û hin çîrokên mîtolojîk* bi *şiklê pirtûkekê* hatine *berhevkin*. *Navê wê* di *zimanê Pehlewî* de *Vîdevdad* an *jî mîna Jvît-dêv-dât* derbas dibe. *Vîdevdad* *tê wateya “rêgezên li dijî Dîvan (Divlere)”*. Ev bi *rengêkî pirtûka qanûnê* ye. *Beşa duyemîn jî*; *beşa têkildarî duayên lêvegeran (muqabele) û qûrbânên li perestgehên Bahdîn* in (ola ku *Zarathûştra pêşkêşî kiriye*) ku *navê wê “Vîsperad”* e. *Vîsperad*, hem di *beşa sêyemîn* de *navê 23 beşên “cuzekê”* ne, hem *jî* di dema *Sasaniyan* de *nav* e ku li *pirtûka Yaştan* hatiye *kirin*. *Beşa sêyemîn*; *jî 72 Yasnayan pêk tê*. *Tê ferzkin* ku ev *pirtûk giştî jî hêla Ahûra Mazda (Yekxweda)* *jî Zarathûştra* re *hatiye daxistin*.” (*Sîraç Bîlgîn, Zerdeşt*)

Qralê Dawî yê Medan Astiyag û Îxaneta Harpagos

Med, li herêma *Medyayê* dijîn ku em dikarin *bêjin qadên Bakurrojhilatê Kurdistana îro* ye, *cîranên Asûriyan* bûn. *Asûriyan* wek çawa li her *deverên Rojhilata Navîn* xwîn dane *verîşandin*, li ser van *xakan jî* ketine *nav heman kiryanan*. Bi *taybet jî*, dema *madenên li qada Medyayê (mîna hesin)* li *vê zêde dibe*, *wê demê êrîş domdar bûne*. Lê, *Med ên* ku *jî çavkaniya Mag û Zerdeştî* *têr û tijî* dibin, her ku *diçe –bi avantaja eraziya xwe jî–* li *cem gelên cîran* tifaqan *ava dike û dibin xwedî hêz*. Şer, bi *dehan* *salan* *dewam dike*. Şerê *yekem ê mezin*, di *sala B.Z. 625’an* de *rû dide*. Lê, *wê nikaribin Nînova bixînin*. *Medên Keyakser û Babîliyên Nabûqadnazarê* *Duyem wê vekişin*. *Ji bo vê tifaqa xwe xurttir bikin*, *Keyakser wê keça xwe bide qralê Babîliyan*. Di *encama vê tifaqê* de *wê* di *sala B.Z. 612’an* de *Nînova hilweşe û piştî* *demek*

kurt jî wê Împeratoriya Asûriyan tine bibe. Li vir guncav dibe ku ji ber dema hilweşîna Asûriyan li bakurê Kurdistanê bûn û bi salan li dijî hêzên şaristanî bi rolek berxwedana demokratîk radibûn, em Kîmmer û Îskîtan jî bi bîr bînin. Her du qewm jî bi salan li Cografyaya Kurdistanê mane. Her wiha divê bê diyarkirin ku Îskîtî tam 28 salan cih bi cih li Kurdistanê mane, heta ji xwe re navendên girîng jî ava kirine.

Dikare bê gotin ku Şahbanûya (Prensesa) Kurd Amyîtîs a ku dibe bûka Nabûqednezarê Duyemîn, bi hesreta xakên dewlemend, ava zêde, xwezaya şîn a tîjî heywan a Medyayê ye. Her roj ji bo welatê Medyayê dilorîne. Nabûqednezarê Duyem ji bo karibe van zêmaran rawestîne, bang li tevahî endezyarên herî pispor dike û dibêje; *“Hûn ê li vir cihekî wisa çêbikin ku; bila Şahbanûya Medyayê Amyîtîs careke din bêriya welatê xwe neke.”* Ha, Baxçeyên Mêwan a Babîlê ku mîna yek ji heft harîqayên (newaze) cîhanê tê zanîn, wisa hatiye avakirin. Ev wisa ye ku hê îro jî mijara nîqaşê ye bê çawa ax birine heta wê bilindahiyê.

Eger em li mijara xwe vegerin, ya derketî holê û bi pêş dikeve rastiya Împeratoriya Medan e. Çi heye ku ev împeratoriya ku li ser hîmê xwişkî û biratiya gelan rabûye, zêde domdar nabe. Her çiqasî karîbû mîna Keyakser mejiyên leşkerî yên mezin bigihîne jî, di sala B.Z. 550’î de serweriyê bi dest Akhamenîtên Persan, berdide.

Tam li vê xalê, careke din damara îxanetkar û hevkar a dîroka Kurd dikeve rojevê. Dîroknasê mezin Heredot, vê îxanetê bi awayekî balkêş îzah dike. Çîrok wiha ye: Astiyages xewnekê dibîne. Di xewnê de keça wî Madana avek wisa berdide ku, di nav vê avê de Astiyages dixeniqe. Astiyages vê jî şîrovekaran re vedibêje. Ew jî dibêjin ku *“wê kurekî Madana çêbibe û ev kur wê bikeve dewsa Astiyages.”* Ji bo pêşî li vê bigire, keça xwe dide Kambiyeses ê Persî ku wê demê xizmetkariyê dikin, lê ji dûr ve jî be têkiliyên wan ên çandî hene. Wisa jî wê bikarîba pêşî li bûyereke mezin bigire.

Di berdewama çîrokê de jî zarokekî Madana yan çêdibe yan jî dike çêbibe. Wê demê Astiyages xewnek din a bi heman rengî dibîne. Remilbaz, ango tabîrkerên xewnan dibêjin eger berê çî gotibin ev hê jî derbasdar e. Li ser vê jî Astiyages, kurê Madana

Kîros tîne ba xwe. Û ji bo bê kuştin jî, bang li Harpagos dike ku wê demê wek Serfermandarê Giştî yê Medan e. Jê dixwaze ku ev zarok bê kuştin, piştî hinavên wî (organên hundirîn) dan heywanan jî jê re bînin.

Ev çîroka dûvdirêj wisa dewam dike; Harpagos wê nikaribe vê bike, lê wê ji şivanê Astiyages vê bixwaze. Bi tesadûfî, kurekî şivan ê nû bûye jî di demek nêz de miriye. Hevjîna şivan Kîno -ev navekî Yewnanî ye, îhtîmal e ku bi xwe jî Yewnanî be- naxwaza zarok bê kuştin, li şûna vê jî pêşniyar dike ku hinavên zarokê xwe bidin ajalan û dûvre ji Harpagos re bibin. Pirsgirêk jî bi vî şiklî “tê çareserkin”.

Lê, piştî demek dirêj dema Keyzer li cem maiyeta xwe li geştê ne, zarokên wan jî ji xwe re dilîzin. Di vê listikê de rola qral jî didin kurê şivan. Kîros ê bi rola qral dilîze, maiyeta xwe diyar dike. Li vir wezîfeya parastina xwe dide kurê maqûlekî ango arîstokratekî. Lê, *“ma çawa dibe ku kurê malbatek arîstokrat bi ya kurê şivanekî bike?”* Jixwe nake jî! Li ser vê jî Kîros, cezayê qamçîkirinê dide vî zarokî. Zarok diçe cem bavê xwe, bavê wî yê arîstokrat jî diçe ba Astiyages û giliyê kurê şivan dike. Keyzer bang li Kîros dike û pê re diaxive. Kîros wiha bersivê didiyê, *“ke-sekî qral guhdar neke, ceza jî heq dike.”* Seknek wisa bi biryar a zarokekî biçûk wê bandorê li Astiyages bike. Dema Heredot çîroka xwe didomîne, radigihîne ku Astiyages di çavê Kîros de xwe dibîne û dişibîne xwe. Dûvre jî bang li şivanê xwe dike, ji şivan bûyerê guhdar dike û paşê jî gazî Harpagos dike. Û jê re dibêje ku wê Harpagos efû bike û ji ber ku neviyê wî dijî jî wê ziyafetê (çeş-ne) bide. Di vê ziyafetê de kurê Harpagos bi wî dide xwarin – Harpagos vê nizane- û pê dide xwarin. Li ser vê jî Harpagos tijî kîn dibe û di bin re jî tîkiliyên xwe bi Kîros re datîne û dibêje; *“Eger ew bixwaze, ji bo Keyzertiya Medan bide wî wê bixebite. Tekane daxwaz jî ew e ku tenê bila Kîros êrîşekê bike û bixwaze li ser textê rûnê.”* Her wiha soz jî dide ku wek serfermandarê artêşê dema şer wê Astiyages teslîmî wî bike. Kîros vê qebûl dike û êrîşî Medan dike.

Sal, B.Z. 550 ye. Bûyer bi kurt û kurmancî ev e: Keyzerê Medan Astiyages, heqaretê li serfermandarê xwe –xizmên hev ên nêz in jî- Harpagos dike. Êşandiye. Dibe ku her ku diçû tarzê wî yê

rêveberiyê jî xerab dibû. Wisa dixuye ku, qesriyên Medan jê nerehet dibûn. Harpagos pêwendiyê li cem Akhamenîtan datîne. Keça Astiyages Madana, bi yek ji navdarên Akhamenîtan Kambiyeses re zewicî ye. Kîros kurê wî ye. Harpagos ê digihêje Kîros, ber bi şer ve dehf dide, Astiyages jî îqna dike. Pîlangeriyek wisa dike ku – Harpagos serfermandarê artêşê ye- bêtî pozê kesekî jî xwîn bibe, Astiyages êsîr digire.

Pişî dîlgirtinê, Harpagos ji Astiyages re dibêje, *“binêre duh tu qral bû, lê îro kole yî. Tu çawa xwe hîs dikî?”* Bersiva Astiyages hê jî tê bibîranîn: *“Ey nemerd, te îxanet li min kir, te keyzertiya min têk bir. Qet nebûya tu bihata şûna min. Te ev jî nekir, hema te yê keyzertiya min ji Medan re bihişt. Çima te bi nemerdî bir û da xulamê me Kîros ê Persî?”* Gotinên mîna pêşdîtinek dîrokî ne. Wek li vir jî tê dîtin, “desthilatdarî” li ser sîniya zêr pêşkêşî Persan hatiye kirin. Şîroveya vê jî wisa ye: *“Em ne layiqî vê ne, em ê xwe bidin çiyayên xwe, em ji bo “desthilatdariyê” nînin!”* Ev rastiya ku esas di genên Kurdan de heyî, bi awayekî sosret her xwe dide der. Bûyerên Enkidû û Mattîzawa jî ku em ê paşê behsê bikin, xelekên berbiçav ên beriya vê bûyerê ne. Em ji bîr nekin ku Pers ji bo Astiyages dibêjin “Azhî Zahak” û Zehakê li vir jî ango Dehak, sembola xerabiyê ye. Tevahî dîroka serweran bi tahrîfatên wisa tijî ne. Lê didin, qetil dikin, ji kirinên xwe re dibêjin qehremantî, berxwedana gelan jî wek çîprûtî û eşqiyatîyê bi nav dikin. Bi balkêşî, tevî 2500 sal di ser re bihuriye jî ev çerx her wisa geriya-ye. Eger Vandalên ku ji bo nîrxên komunal li dijî Împaratoriya Romayê ya koledar şer kiribin îro wek wêrankar derbasî dîroka emperyalîstan bûne, wê demê bi xwezayî Romayî dibin hilgîrên (ragîrên) medeniyet û şaristanîyê!!!

Helbestvan û Dîroknasê Persan Fîrdewsî dema di Şahnameyê de behsa Rustemê Zal dike, balê dikşîne li ser heman tiştî. Demek tê ku êdî nîfşên Farisan ber bi tinebûnê ve diçe. Yê li welêt herî xurt jî Zal e. Malbata Zal, hêza leşkerî ya desthilatdariyê ye. Rustemê Zal li şûna ku desthilatdariyê bi dest bixe, her çiqasî wek xizimîtî dûrî malbata qral be jî, ji nav wan zarokekî herî nêzî wî nîjadî tîne û li ser texta qraltiyê dide rûniştandin. Bi salan, heta ku ev zarok dibe qralekî gihayî, wî diparêze. Her tim girêdana xwe nîşan dide. Dûvre, wê ev kevneşopî ji hêla kur Rustem dewam

bike. Fîrdewsî her çiqasî Rustemê Zal mîna Farisekî dinirxîne jî, damar damarê Kurdan e. Yê di Neolîtîkê de mayî, her tim bûye leşkerê hinekên din! Ev damarê Kurd e! Gelo çî jê re bêjin, damarê bêparmayîna ji “desthilatdariyê” yan jî damarê ji “desthilatdariyê” direve?

Magamoniya Persan û li Kurdistanê Pêvajoya Dagirkeriyê

Kurd ango Med, di pêşengiya Akhamenîtan de wek hêza duyemîn di nav sîstemê de cihên xwe digirin. Statuya taybet a Medan her tim dewam dike. Med jî xwe gelekî cihê nabînin. Hema çawa be jî ji heman malbatê ne. Mîmkun e ku em karibin van bûyeran wek destguherîna xanedanekî jî bibînin.

Bi qasî ku em ji Herodot hîn bûne, piştî ku Kambyzes di dema dagirkirina Misrê de dimire, Magên Medan -ku ev bi bandor indikevin nav liv û tevgerê mezin. Hewl didin desthilatdariyê bi dest bixin, lê çîna jorîn a Persan bi dijwarî dibersivînin. Di dîrokê de tê gotin ku Magekekî bi navê Gomata dixwaze desthilatdariyê bi xayîntî bi dest bixe. Lê, mesele tenê ne ev e. Rewşa esas ew e ku Magên di nav keyzertiyê de bi bandor in –êdî nav çî dibe bila bibe- di pêşengiya Magê herî bi bandor de dest bi berxwedanê dikin û dixwazin desthilatdariya ku ya wan bû careke din bi dest bînin.

Malbatên bi bandor ên Farisan di pêşengiya Darîûs de kom dibin, ji bo karibin bandora Magan a li qesrê bişkînin, dikevin nav tevgerê. Her çiqasî belgeyên dîrokî yê Farisan ev bûyer mîna têkoşîna li dijî komploya Magan nîrxandibin jî, gengaz e ku rûdan ne ev bin. Dema Kambiyases diçe şerê Misrê, ji ber bi Persan ne bawer e, li şûna xwe kahînê Medî Patîzetîtes dihêle. Patîzetîtes jî dibêje ku Magê bi navê Gomata Pasagarda wek qral îlan dike. Dema ku Kambiyases di vegerê de dimire, vê carê li şûna wî Gomata tam qral tê îlankirin. Li dijî vê jî di sala B.Z. 522’yan an jî 521’an de di pêşengiya Darîûs de giregirên Persan dest bi qetlîamek bêrehm dikin. Kahînen Medan, Magan, rewşenbîran, aristokratên wan û çiqas kesên ku hêviyê didin hebin, hemûyan qetil dikin. Esas ew e ku serwerên Persan ên li beramberî Magan

xwe biçûk dibînin, ji bo hêrsa xwe ya desthilatdariyê û kompleksên xwe yên cuda vê tasfiyeyê dikin. Ji bo vê kompleksê binixumînin, vê carê jî Keyzerê Persan Darîûs, di salên B.Z. 515'an de li Çiyayê Taqûstan (Çiyayê Bestûn), cihekî wisa bilind, çîroka ku dîrokê serobino dike, berevajî dike li tehtan dinivîse.

Di encam de; tevahiya Magan tîn qetilkirin. Dikare bê gotin ku tevahî mejiyên entelektuel û rewşenbîr ên ku xwedî têgihiştina Medî yan jî bireweriya Kurdî û dikare pêşengtiya wê bikin tîn qetilkirin. Yê dimînin jî tîn sirgûnkirin. Hejmareke kêma Magan jî dikarin xwe bigihînin Medyayê. Ev qetlîama B.Z. 522-21'ê, di heman demê de dîroka bipaşketina Kurdan e jî. Eger em vê qetlîamê ji bo Kurdan wek karesatekê binirxînin, wê di cih de be. Nayê daqurtandin ku mejiyên rewşenbîrî, zîhnên xwebûnê wisa bi bêrehmî bêne tasfiyekirin. Piştî vê Magamonî (Maxkujaran) an jî Magofoniyayê, -Pers, ji bo ev qetlîam her tim di mejîyan de zindî bimîne, mîna cejnekê pîroz dikin- di warê fikrî û siyasî de Med ji dika dîrokê tene xwar. Û piştî vê bûyerê jî êdî Med wek hêza nîşangir a leşkeriyê tîn bikaranîn. Ew roj ev roj e, Kurd her dibin eskerên hinekî din. Nebûne eskerên xwe. Êdî fikrîna bûyînê jî nemaye. Piştî ku mejî tînekin, tasfiyekirin, rêvebirina organên din – di dîrokê de zehf mînak hene- hê rehetir dibe.



Li vir eger em kevanekê vekin; ez wek kes her tim ketime pey gotina hevrêyekî me ya “*tu dibêji qey em Kurd ne ji Medan tîn.*” Herodot jî me re radigihîne ku Med mirovên zehf bi disîplîn, rêkûpêk, însanên mejî ne. Û gelek dîroknas dibêjin ku di dema

serweriya Medan de, hema hema tevahî erdnîgarî xweziya xwe bi Medan tînin. Baş e, gelo çawa dibe ku gelekî xwedî heman avahiya genan ewqasî tersî vehûna xwe dibe? Min ev pirs bêyî navber bi salan ji xwe pirsîye. Tersî Medan, Kurd belave, keyfî, bê disîplîn, nikare yekgirtina xwe ava bikin, her tim dibin “leşkerên” hinekên din. Gelo ev rewş çawa pêş ket? Kîjan bûyer an jî bûyeran rê li ber vê vekir? Ha, bi dîtina min bersivên van pirsan di wê Magamoniye de ne ku me li jor behsê kirê. Kurdekî ku karibe Magamoniye fehm bike, ez ji dil û can bawer im ku wê karibe li xwe vegere.

Di vê merheleyê de Med ber bi pêvajoke ku wê herî zêde bêne dagirkirin diçe. Ji B.Z. 550’î heta B.Z. 330’î ji hêla Persan; ji B.Z. 330’î heta B.Z. 64’an ji aliyê Yewnanan; ji B.Z. 250’î heta P.Z. 216’an ji milê Partan; ji B.Z. 64’an heta P.Z. 1000’î ji terefê Romayîyan û P.Z. 300’î heta salên 700’î jî ji layê Sasanîyan ve Kurdistan her di bin dagirkeriyê de ye. Kurdistan tim dibe qada şer. Wê baştir bibe ku em hinekî detayan parve bikin.

Pirtûka Anabasis a ji aliyê Ksenophon hatiye rêkûpêkkirin, ji ber belgeyek dîrokî ya girîng e û bûyereke xweser e, wê balkêş be ku em li derbasbûna Yewnanan a ji Kurdistanê û karaktera Kurd a ku di wan rojan de xwe nîşan dide, mêze bikin.

Kîrosê Ciwan ê Persî, ji bo birayê xwe Artakserkses ji textê bine xwar, bi hinceta ku wê Miletosê ji dest Tîssaphemîs bigire leşkeran, bi taybet jî leşkerên bi pere kom dike. Bira Kîros ê ku li welatê xwe ji qralê mezin aciz bûye, artêşeke bi pereyan a li ser bingehê Yewnanîyan wê bi rêxistin bike, wê vegere Îranê û bi desteka Yewnanîyan jî textê bi dest bine. Plan ev e.

Bi dûvdîrêjî dimeşin. Piştî peravên Ege, Derya Spî, heta xakên Sûriyeya îro û paşê jî digihêje Babilê, angî Iraqa îro. Di şerê Kûnaksa de Yewnanî zorê didin dijminê xwe û didin vekşandin. Lê, Kîros ê ku êrîşî qral dike, bi birînek rimê ve dimire. Û li Rojhilata Navîn, Yewnanî bi tikîserê xwe û bêpêşeng dimînin. Her çiqasî qralê Persan ji Yewnan dixwaze teslîm bibin û wê li beramberî vê jî wan efû bike, lê ji ber Yewnanî bawerîya xwe bi persan nayînin, çekên xwe danaxin. Ksenophon, her çiqasî wek nivîskarêkî tevî şer bûye jî ji nişka ve dibe fermandarê hêzên Yewnanî. Û vegera li Yewnanîstanê jî wek **“Vegera Deh Hezaran”** angî **“Anabasis”** dike pirtûk. Eger Ksenophon B.Z. 430-355’an jiya be,

wê demê ev bûyer ihtîmalek gelekî mezin di salên B.Z. 400'î de ne.

Piştî ku bi fen û fûtên şer ve Pers derbas kirin, tên heta xakên nêzî me, ango heta Kurdistanê. Eger em bi çavê îro lê temaşe bikin; ji Garê dikevinê yan jî ji Garê dibihurin, dadikevin Geliyê Zapê. Ji vir dest pê dikin û dikevin nav erdnîgariya herî dijar a Kurdistanê. Ti rê û şopên ku dizanin nîne. Kuryeyên (şandî) wan jî tineye, tekane rêyekê diceribînin; bi şerkinê ve hewl didin vege-
rin welatê xwe. Nikarin ji rêkên hatine jî vege-
rin, ji ber ku ji hêla Persan hatine girtin. Ji Kurdistanê bi şer, cengê dibihurin. Wê Ksenephon tevahî rûdanan hûrikûr binivîse. “Vegera Dehhezaran” ji bo me Kurdan ji ber gotinên Kurdîenne, Kardûk (di Sumerî de wêrek, egîd e) derbas dibe, belgeyek zehf girîng e. Ksenephon di cihekî de dibêje; *“Dema Aceman dîtin ku (Yewnani) xwarinên wan ji gundan digirin, gund dan ber agir. Ksenephon alîkarî da gundiyên ku gundên wan hatibûn şewitandin, nedihişt gund bêne şewitandin. Lê, Hîsrof wisa nedîfikirî. Yewnani jî tevî fikrê Hîsrof bûn, dest bi şewitandina gundên Kardûkan kirin.”* Ksenephon di pirtûka Anabasis de têkildarî taybetmendiyan şer ên Kardûkan jî dibêje, *“Wan di tîr û kevanê de hedefa xwe şaş nedikirin û kevana wan hema hema qasî 3, tîrên wan jî zêdetirî 2 enîşkan bû. Tîrên wan mertal û zirx kun dikirin û dibihurîn”* û nîşan dide ku bê karaktera Kurdan çiqasî baş tespît kiriye.

Mînakên vê vegotina bi belgeya yekemîn, dûvre wê di her îşyanan jî berxwedanên Kurdan de wek qederekê bin. Tevahiya hêzên biyanî yên ku li Kurdistanê şer kirine jî, gundên Kardûkan şewitandine.


Yewnaniyên ku bi taybet ji warê Persan rizgar bûn, piştî bi neçarî xwe li erdnîgariya tund a Kurdistanê dan, her tim bi eşîrên şerker re hevrû bûn. Ya balkêş jî ew e ku ev mirov danê siharê êriş nakin, bi komî nayên ser û ne bi şerekî dûz in. Yek ji rêbazên wan jî ew e ku keviran bi ser rêyan de dibarînin. Ev mirovên ku xwe li cihên dijar ên eraziye bi cih kirine, baş dizanin ku bê wê kîjan kevirî li ku derê gindor bikin. Rêbazek din jî kemîna li derbendan e. Bi gotinek din, piştî hêza esasî derbas dibe, li herî dawî yên xwedî teşhizatên (arastek) giran in ango çend laşgirên nikarin bi-meşin dikin hedefa xwe. Carina hûn dibînin di saetên herî germ ên

rojê de êrîş kirin. Dem bi dem hûn dibînin ku dema razanê de van mirovan bi dizî êrîş kirin. Tew car caran hûn dibînin, îstîqametên Yewnanan tam diterikînin, vala dikin, bîrên avê ziwa dikin, agir berdidin zad û gundan û mîna dûpişkekî bi Yewnaniyan vedidin.

Ksenephon wisa nivîsandîye; *“Di heft rojan de welatê Kardûkan bihurandin. Di nav van heft rojan de tenê kêliyêkê jî be çekên xwe danenîbûn. Ew ezeb û êşkenceya di nav van heft rojan de bi serê wan de hatibû, di şerê qralê Eceman de, dema kuştina Kîros de jî nedîtibûn.”* (Ksenephon, **Vegera Dehhezaran**)

Wê Kurdistan çawa bê wêrankirin, ev bi awayekî hê berbiçavtir wê di dema êrîşa Îskenderê Mezin a bi ser Rojhilat de bê dîtîn.

Îskenderê Mezin ê Makedonyayî (Alexander, B.Z. 20'ê Tîrme-ha 356'an-10'ê Hezîrana 323'yan), piştî sefera bi ser Îllîrya (Arnavûtlûk), bi 30 hezar piyade û 5 hezar siwarî ve heta Anatolyaya (Anatolia, di zimanê Grekî de, welatê ku roj lê tê ava ye) di dest Persan de meşiyaye û B.Z. 334-333'yan jî rojavayê Asyaya Biçûk fetih dike. Piştî, sala B.Z. 331'an li nêzî Osmaniye ya îro Artêşa Persan têk dibe, tevahî peravên Derya Spî, Misrê û Mezopotam-yayê zêft dike. Her çiqasî Keyzerê Persan hewl bide ji Îskender bireve jî, li nêzî Hewlêr- Gaûgemele (muhtemel e ku Çemçemal be) dîsa têk diçe û bajêr ji dest dide. Û piştî ku bajarên Sûsê girtin, qralê Akhemînatî herî dawî yê Persan Dariûsê Sêyemîn di-şewitîne û dîkuje. Dikeve navenda Împaratoriya Persan Perse-polîsê û qraltiya Persan ji holê radike. Tevahî belge û metînen çanda dêw a 400 salan, her tiştên têkildarî Zerdeştîyê dide ber agir û dişewitîne. Belgeyên Zerdeştî yê piştî derdikevin jî, arşîvên rizgarkirî ne ku di wan salan de digihêjin Hindistanê. Ew kesayeta Îskender a rewşenbîrî ya wisa behsa wê tê kirin, tenê ji bo wî bi xwe ye. Ev tevgerên ku mîna şewitandin û îmhakirina tevahî belgeyên bi nîrx ên bi temamî bûne malê civakeke ku li erdnîgariyekê teşe girtine, wê her tim wek taybetmendîyeke hevpar a dagirkeran bimîne. Dema Abdullah Ocalan dibêje, **“Çanda Helen ku bin-gehîn çavkaniya pêşketinê di vê çandê de peyda kiriye, bi Îskender li ser vê axê mirovan weke mîroyan perçiqandiye û sentezekî ava kiriye.”** vê rastîyê îfade dike. Ew Napolyon Bona-parte yê ku ji bo fetihkirina Misrê çibû, bê topên wî çiqasî bandor-ker in biceribîne, ma ne abîdeyên Fîrawûn kiribûn hedefa xwe?



Îskender ê ku hakimbûna xwe li ser temamî xakên Persan ava kir, ji bo karibe desthilatdariya xwe qayim bike û dewleteke yekbûyî damezrîne, deh hezar leşkerên xwe bi jinên Îranî re dizewicîne. Piştî ku Împaratoriya Akhemenî ji hêla Îskender hat têkbirin, li cihana Îranê de ku gelê Kurd an jî pêşiyên wan jî lê ne, pêvajoya rêveberiya Helenan (Grek) ya wê 260 salan dewam bike, dest pê dike. Li şûna navê Grek, Persan gotina Yewnan. Di zimanê Persan de gotina “Yewnan” tê wateya hov û barbar (çors). Û yên Grekan kirine jî bi rastî ne texrîbatên kê m in. Ji hêla tevahî nivîs-yarên dirokî hatine qeydkirin ku arşîvên dewasa yên çanda Zer-deştî ji hêla Yewnaniyan hatine şewitandin.

Wek encam; ev sefera ku di encam de Rojhilat û Rojava ji hev bandor dibin, dibe sedema hilweşîna Kurdistanê, her wiha rê vedike ku çanda Helenîstîk a wê piştî bingehe Çanda Ewropayê saz bike, ava bibe.

Îskenderê Makedonî, piştî hin welatên Asyaya Navîn, Afganîstan û Hindistanê zeft dike, vedigere Babilê û di havîna sala B.Z. 323'yan de dimire. Lê, dagirkirina Kurdistanê wê hê kûrtir bidome. Gelekî tê ziman ku Îskender li Kurdistanê berê xwe dide Katoyan, lê ne wisa ye. Her wiha xwe li çiyayên Zagrosê yên Bakurê Kurdistanê jî nedaye. Îstîqameta hatine ji Yewnanîstanê diyar e. Ji peravên Derya Spî, xwe bera jêr dide, heta Misrê tê, ji vir dîsa Babilê, Çemçemalê, Ranyayê dide ber xwe û ji vir jî Zagrosê li Rojhilatê Kurdistanê derbas dike, ji Persepolisê di ser Afganîstanê derbasî Hindistanê dibe. Eger bi baldarî em lê mêze bikin, Îskender bi xwe di rex Kurdistanê re derbas dibe.

Piştî mirina Îskender, xaka girtine di nav 4 generalan de tê parvekirin. Ev fermanarên bi navê Seleûkûs, Ptolemy, Trîparadîsûs û Perdîkas in. Ji van Seleûkûs (Seleucus) ê parêzgerê Babilê ye, piştî Mezopotamya, Filistîn, piraniya xakên Îranê û Anatolyayê desteser dike. Paytexta wan Antakya ye. Serweriya li ser Îranê ya Împaratoriya Seleûkîd ku li qadek berfireh hakim e, ji hêla aristokratên Makedonyayî yê Grekî diaxivin tê birêvebirin û li vê qada serweriyê çanda Grekî bi bandor dike; ji hêla Partan ku ji bakur-rojhilatê Îranê tê, xizmê Îskîtan e, bi zimanekî Îranî diaxive û gelekî şerker ê Îranî ye, tê bidawîkirin. Ji hêla diroknsanan tê diyarkirin ku keybanûya Misrê ya bi navê Kleopatra tê zanîn ji vê xanedaniyê tê.



Keyzerên Partan, B.Z. 247'an serî hildane û desthilatdariya binemala (sulale) xwe saz kirine. Ev di heman demê de wek Aşkanî jî tên zanîn. Cografyaya ku jê derdikevin jî Bakurrojhilatê Îranê ye. Gelekî Arî ye. Paytexta wan Ktesîphon e. Zimanê wan Aramî, olên wan jî Zerdeştî ye. *“Împaratoriya wan giştî Îranê, Ermenîstanê, Iraq, Gurcistan, Kurdistan, rojhilatê Sûriyeyê, Tirkmenîstan, Afganîstan, Azerbeycan, Tacikistan, Pakistan, Qûweyt, her wiha heta peravên li Kendava Basrayê yê Erebiştana Siûdî, Bahreyn, Qatar û Îmarê digire nav xwe.”* Ji milê rojava jî Romayî jî Împaratoriya Seleûkîdê dixwin. Bandora dawî ya ku Seleûkîdan li herêma Filistîn-Sûriyeyî ava kiribûn jî B.Z. 64'an bi serweriya

teqez a ku Romayîyan li herêmê ava kirine, bi dawî dibe. Lê, tiştê bi serê Kurd an jî Kurdistanê bibû dîsa bû; hilweşîn, dagirkirin û talan!



Di navbera sedsalên B.Z. Yekemîn û Duyemîn de li Kurdistanê têkoşîna serweriyê ya Part, Selefkosan û Romayîyan kêm nabe. Part, ji bakur ve li Kurdistanê berbelav dibin, eşîrên Kurdan jî di bin parêzgariya (sedrap) Medyayê de kom bûne. Kurdên ku li gor cihên xwe ji Partan û Romayîyan alîkarî xwestine jî bûne yên herî bi zîrar.

Dema Part ber bi Kurdistanê ve tevdigerin, Kurdên di bin kontrola Romayîyan de destpêkê bi Partan re dibin yek û li dijî Romayîyan şer dikin, dîvre jî bi Romayîyan re bûne yek. Di pêvajoya van şerên dîvdîrêj de Partan li ser Kurdistanê hakimbûyîna xwe saz kirine.

Partan, di salên B.Z. 80'yî de hikmê xwe li rojhilat ji Çemê Îndûsê heta Pakîstanê, ji Afganîstanê heta Tirkmenîstanê, Tacîkîstanê û li rojava heta Gurcîstanê, Ermenîstanê, rojhilatê Anatolyayê û ta tevahiya Rojhilata Navîn kirine. Siwarên giran ên Partan bûne “belaya serê” Romayîyan. Part, mîna hêzeke mezin a

ku Împaratoriya Roma hevseng dike, bi salên dûvdirêj hebûna xwe domandiye.

Sala B.Z. 224'an, piştî şerê Partan û Sasaniyan, wê serweriya Partan a li Kurdistanê bi dawî bibe û Kurdistan wê bikeve bin kontrola dewleta Sasaniyan.




Ermenî jî navbera salên B.Z. 190 û P.Z. 458'an wê hebûna xwe bi heman şewazî li ser vê xakê bidomînin. Kîtabeyên Taqûstan ên li Kirmanşanê ji me re dibêjin ku Ermenî xwe wek Armanîa bi nav dikin. Heman kîtabe radigihînin ku navê qralê wan ê herî bi bandor jî Tigran e. Her wiha, gelê Ermenî ji bo xwe navê Hayk an jî Hayk bi kar tînin, ji xakên xwe yê jiyanê re jî Hayistan dibêjin.



Salên desthilatdariya Sasaniyan; dema Ardaşîrê Yekemîn ê ku P.Z. 226'an bingeha Împaratoriya Sasaniyan daniye û li dijî Împaratorê dawî yê Partan Artabanosê Pêncemîn serî hildide, dest pê dike. Ardaşîr ji sulaleya “qehremanê” gel Sasan tê. Împaratoriya Sasanî jî wê navê xwe ji vî Sasanê “qehreman” ê ku îsyankerekî berê bû, bigire. Tevî ku agahiyên teqez tinene jî, Sasan li welatê Persan ku di Împaratoriya Partan de qraltiyek vassal (girêdayî, kole) e, rêveberekî xwecih e, prensêkî ne serbixwe ye. Îsyana wî dê têk biçûya, lê Ardaşîrê kurê Babak wê îsyana bidomanda. Kurê Babak Ardaşîrê Yekemîn serhildanê bi ser dixe û wek mîratgirê împaratoriya Persan, wê hîmê Împaratoriya Sasaniyan daniya. Heman hikumdarî, Zerdeştî kiriye ola dewletê yê fermî û di dema Sasaniyan de rahîbên vê olê dibin xwediyê desthilatdariyek gelekî mezin. Nivîsarên Zerdeştî ji nû ve hatin berhevkirin û bi zimanê Pehlewî hatin nivîsandin.

Şapûr (kurê Ardaşîrê Yekemîn), di salên P.Z. 241-272'yan de Împaratorî bi rê ve bir, bi xeyala ku qadên desthilatdariya binemala Akhemenîtanan ji nû ve bi dest bîne, li rojava li dijî Împaratoriya Romyê dest bi şerê bêdawî kiriye. Di vê demê de Sasaniyan li rojhilat ji Çemê Îndûsê heta li rojava herêma Firat û Dîcleyê kontrol kirine. Xakên Kurdistan û Ermenîstan a ku qraltiyek vassal (kole)

e, di nav sînorên Sasaniyan de ne. Li bakur Gurcistan, li başûr Mezopotamya û Deryaspî, heta bakurê nîvgirava Ereban di bin hikma wan de ye.



Dîsa di heman pêvajoyê de Manî bi oleke aştiyane ya nû derdi-keve holê, ku bi armanca rawestandina vî şerê bêdawî, bi xeyalê di navbera gelan de yekgirtinek aştiyane saz bike Xrîstiyantiyê, Bûdîzmê û hin mîtolojiyên kevn ên Mezopotamyayê dike yek; dostanî û hezkirina Şapûr qezenc dike, dest bi gera azad û berbelavkirina îdeolojiya xwe kiriye. Manî yê ku ji binemala zadeganekî (esilzade) navdar ê Partan tê, ji hêla Kartiran ku di esas de rahîbên xerabûyî yên Zerdeştî ne, ji bo desthilatdariya xwe tehlûke dîtin; P.Z. 272'yan piştî Şapûr dimire, destpêkê vî mirovê dilpak diavêjin hepsê û dûvre jî P.Z. 276'an ji eyar dikin, bi êşkenceyê ve dikujin û teşhîr dikin. Tevî vê jî; fikrên Manî (P.Z. 215-276) li rojava di nav Împaratoriya Roma de bi navê Neo-Manîşîzm û ji Hindistanê heta Çîne û li qadên din berbelav bûye. Xebata herî navdar a Manî **Arjange** ye, xebatek din a girîng jî **Şahpûkan** e. Ji

ber ku vê pêşketinê fikar bi gelek nûnerên olî û baweriyên serwer re çêkirin, li gelek deveran hatin qedexekirin, her wiha dijmînên wê jî ji bo biçûk bixin ji navê Manî; gotina Manyak a tê wateya “*dîne ku zêdegaviyên êrîşkar dike*” afirandine. Dibêjin, “**Rastî, ji sadebûnê hez dike.**” Her çiqasî reş kiribin bila bikin, navê Manî heta roja me ya îro wek nimûneya sadebûnê ghiştiye me. Ola Manî jî mîna ya Zerdeşt, fêkirinek dualî ye, şerê başî û nebaşiyê ye. Deh şîretên Manî yên ku ghiştine heta îro, çi di warê felsefeya exlaq de çi jî ji bo bersivdayina valatiya manewî ya ku qraltiyên despot ên demê û avahiya civakî ketiyê, pir girîng e. Bi kurtasî wisa dikare bê vegotin:

- 1- Bi dema derbasbûyî (dîrokê) bawer bin.
- 2- Bi pêvajoya pîrxwedayî bawer bin.
- 3- Ji derewê xwe biparêzin.
- 4- Nebin mirovekî nebaş.
- 5- Goşt nexwin.
- 6- Bi çavekî xerab li namûsa ti kesî nenêrin.
- 7- Diziye nekin.
- 8- Bixwînin, cewaziya sêhr û heqîqetê nas bikin, van ji hev cuda bikin.
- 9- Di nav civakê de xwedî bawerî bin.
- 10- Di kar de sist û îhmalkar nebin.

Eger em bînin bîra xwe ku deh şîretên li jor hatî ziman bi giştî têkildarî exlaq in, wê demê bi xwezayî wê were fêmkirin ku bê çima exlaqqarêzekî mîna Manî hatiye qetilkirin.

Piştî Dewleta Partan hilweşiya, vê carê Romayî û Sasanî bûn cîranên hev. Di navbera salên P.Z. 224’an û P.Z. 645’an de bi dehan şer di mabeyna Romayî û Sasaniyan de qewimîne. Tevahiya şerê ku her du dewlet ji bo serweriya herêmê dikin, li Kurdistanê bûne. Ji bajarên Kurdistanê Amed, Nisêbîn û Riha, ji ber vî şerî pir neyênî bandor bûne. Dema Sasaniyan baceya salane ji Romayîyan nedigirtin, wê demê êrîş dibirin li ser bajarên Kurdan ên di bin serweriya Romayê de yan jî li qadên mîna Harranê berê xwe didin

Kurdên cotkar, talan û qetil dikirin. Di vî şerî de her kî bi ser ketibe jî, ya ji Kurd re maye serûbinbûyîn û feqîrtiya teqez e.

Kurdên ku ji ber baweriyên xwe yên olî nêzî Sasaniyan bûn, tevî ku di şer de piranî destek didan Sasaniyan, ji her du alî jî bi zîzar rabûne. Dema şer de, yek ji çemên Firat û Dicleyê her tim bûye sînorên mabeyna Sasanî û Romayîyan. Lê, kîjan dema ku Romayî û Sasaniyan li hev nekiriban jî, şer li Kurdistanê dibû. Ji ber vê ye ku yê herî zêde bandor bûne her tim bûne Kurd.

Abdullah Ocalan, dema vê talan û kuştare ya ku li Kurdistanê bûye mîna çandekê dinirxîne, wisa dibêje: **“Li cihekî welê, talan û şîdeta di hinavê şaristaniyê de timî vedirîşe, wê çawa pêşketinê bibe. Li çiyê jîyan bi awayekî kom bi kom dewam dike, navendên bajaran jî biryargehên dagirkeriyê ne. Sînorê di navbera civaka etnîk û civaka eskerî de pir eşkere zelal dibe.**

Civaka ku mejiyê wê hatiye belavkirin û pûçkirin, di dîroka xwe de dema serberjêr diçe, xwe li çiyayan bi cih dike û berxwedana jiyana xwe didomîne. Çîna jorîn û gel qasî ku di ti demên dîrokê de nehatiye dîtîn, ji hev cuda bûne. Li beramberî êrîşan, çîna jorîn rêya xwe bi teslîmbûyîn û hevkariyê xet kiriye, vê jî bi dawerivandina çanda yê serwer dike. Gel ango tebaa jî xwe dixê qalikê xwe, di ziman û çanda xwe de îsrar dike û wisa berxwedana xwe didomîne. Di dîroka Kurdistanê de berxwedan û îxanetê wek du xetan di van salan de tovên xwe hê zêdetir ji hev cuda kirine û wisa domandine.”

Rêzên li jor çiqasî jî dişibin îro. Û çiqasî jî van rojan ronî di-kin... Beriya em derbas bibin, wê gelekî sûdmend be ku em Mazdek ê tevahî exlaqnasan, sosyalîstan, civaknasan eleqedar dike, bi kurtasî bînin ziman.

Tevî ku nayê zanîn bê Mazdek kengî jiyaye, tê diyarkirin ku di sala P.Z. 499'an de ji hêla hikumdarên Sasanî yên Îranê hatiye qetilkirin. Li vir dîsa ew Kartirên ku kevneşopiya Zerdeşt xera kirine bi bandor in. Mazdek, bi esasî felsefeya Zerdeşt a tarîti-ronahiyê berdewam dike. Baweriya bi avê, agir, axê xurt e. Li gor Mazdekiyan divê mal û serwet (saman) hevpar be, tehakum (zordarî) nebe, ji dewlemendan bîr girtin û li feqîran bîr belavkirin. *“Digot, mal di nav mirovan de hevpar e. Ji ber ku mirov evdên*

*Xwedê û zarokên Adem in. Her yek li gor pêdiviya xwe malê yê din bi kar bîne, ti kes ji vî mafê bêpar nemîne. Her kes di warê mal de wekhev be. Li ser van gotinên Mazdek, her kesî malê xwe danîbûn holê.” (Mehmet Bayrak, **Ji Serdema Navîn ber bi Serdema Modern Elewîtî**)*

“Zanyarê Elman Prof. Dr. Theodor Noldeke, hê di sala 1879’an de bi lêkolîna xwe ya li ser mijara ‘Sosyalizma Şerqê’ bi kurtasî wisa dibêje:

*‘Di dawîya sedsala 5’emîn de û destpêka sedsala şeşemîn de, ev tevgera olî-polîtîk a ku welatê Îranê hejand, bi awayekî nûjen xwedî seknek Sosyalîst bû. (...) Li gor vê fêrkirinê, tevahî mirov wekhev bûn û ji ber vê jî diviyabû ku mabeyna feqîr û dewlemendan de ti ferq nebûna. Xwedê, mirov wekî hev çêkiribûn; newekheviya milkê jî xwe dispart parvekirina neheq. Ji ber vê jî diviyabû ku ji dewlemendan ên zêde bihatana girtin, li feqîran bihata belavkirin. (...) Ev jî dihat wê maneyê ku mulkiyeta taybet, mafê mîratêyê û girêdayî vê jî hêrsa xwedîbûnê jî holê rabe. Mazdek, divê di ferqa vê encamê de be; ji ber ku ji dewlemendan dixwest ku haremên wan ên ku qasî xazîneyên wan tijî jî li hewcedaran bèn parvekirin. Mazdek digot ku tenê bi parvekirina her cure mulkiyetê ve dikare hestên biratiya rast pêş bikevin û wê ev jî kêfa Xwedê bîne...” (M. Bayrak, **Elewîtî û Kurd**)*

Bi fikra sosyalîstî û tarzê jîyanê ya navbihurî, di nav civakê de bi bandor dibin. Di demek kurt de Mazdekî dibin hedefa kevneşopên dewletê, sala 499’an bi qetilkirina Mazdek ve xwe dikşînin binê erdê. Fêrkirinên Mazdek bi veşartî kar dikin, wê dewama van fêrkirinan jî ji hêla hevjinî Mazdek, Hurrem pêk bihata. Ev tevgera ku di dîrokê de mîna Hurremî tê binavkirin, bûye yek ji çavkaniyên esasî ku hebûna bi sedan tevgerên dadxwaz, azadîxwaz, wekhevîxwaz, hevpar û sosyalîst gihandine heta roja me ya îro.

Mag ên ku çavkaniya îlhama Medan in, di pêvajoya Sasaniyan de bi şiklekî layiqî vê împaratoriye dibin dijberê cewherê xwe. Destpêkê bi xwînê-qetlîaman rewşenbîran bitepisîne, tine bike, tasfiye bike! Bila ruhê wê yê te be, lê laşê wê aîdî Medyayîyan be! Bila fikra wê ya te be, lê zimanê wê ya Medan be! Ev tarzê fikrîne ye! Ev biyanîbûna li cewherê ye! Wek me got, îro dîtina vê rastiya Kurdan a çînen jorîn, malbatên begên feodal, şêx, axa û

malbatên hevkar; mirovan dibe dîrokê, mînakên bi heman rengî zindî bi zindî tîne bîrê.

Ha ji ber vê ye ku; Magan an jî Kartiran bi dekûdolabên herî mezin ên li dijî Maniyê Mêrdînî ku nîşaneya şiyarbûna wîjdan û sekna li dijî koletiyê ye, wek nûnerên herî kûr ên îxanetê bi rola xwe rabûne. Îxanetê wisa reh dida, lê li lûtkeyên çiyayan, erdnîgaiyên talde û tenha, ji medeniyetê dûr û mîna ji wê direve li malzaroka çiyayan bi temsîlkirina nîrxên komunal ve berxwedanê jî şerê xwe yê jiyanê domandiye. Teslîmbûyîna bi îxanetê ve biriyê, berxwedanê ji biriyê jiyanê.

Jiyana ne li gor Herikîna Pêşketina Dîrokê û Encamên wê

Eger civakek çiqasî ji xwebûnê hatibe dîrxistin, pir êşkere ye ku wê ji yê din jî ewqasî dîr bikeve. Çiqasî ji xwebûnê derketibe, ewqasî nikare bi yê din re bibe yek. Ji yekparebûnê wêdetir, mîna ûrêkî, mîna pençeşêrê dibe perok (şewb). Şaneya nexweş, heta ku xwe rehet neke, sîstema xwe ya bexşandîbûnê neke şiklekî li gor xwe, nikare bi tenduristî bigihêje avahiyên din. Ango, avahiyeke ku çanda xwe baş nas neke, fêma neke, tenê wê bigihêje nelihevî û şer, serîhildanê, wê bibe xwekerkirî (bergirtî), bi bêhtengî ve wê xwe bikşîne yan jî...

Ji bo ku Kurd ji xwebûnê derkevin, gelek muamele li ser hatine kirin. Her çiqasî ev ji ber stratejîkbûyîna erdnîgariya Kurdistanê be jî, encamek ji polîtîkaya “*parve bike- bi rê ve bibe û îdare bike*” ya hêzên dagirker tê. Vehûna Kurd bi xwe jî mîna teşegirtinek şêweyê jiyanê derketiye holê.

Ji ber konfederalîzma eşîran a dema Medan nehat derbaskirin, di cihê xwe de asê ma, ji ber çîna jorîn a di encama îxanet û hevkarîya navxweyî de çêbûye, her tim xwe kiriye dûvikê hinan, kesayeteke ku bi xwe nebawer, har û qasî ku wê karibe her kêlî êriş bike, ewqasî jî ji radestiyê re vekirî afirandiye. Têkoşîna jiyanê ya li xwezayê tê meşandin, îmajê karakterekî hişk ava kiriye. Kesayeteke ku qasî ne li xwe ye, li derdora xwe jî nake, li ser vî esasî jî agresîf û xweparêz bûye. Ji ber neçariya jiyanê hişk a li tenhayên çiyayan, li dijî êrişên ku dikarin her tim ji derve werin jî amadekarî

kirine, ji bo parastinê her di tetîkê de mane. Ev jî bûye sedem ku bi xwe re sînordar bimîne û bi xwezayî jî fikrînek teng, bêaso, elimandinên jiyanî rojane çêbibin.

Beşekê, li şûna teslîm bibe xwe li bilindahiyên çiyayan strandine, ji “medeniyetê” qut bûne, beşekê jî bi gotinek gelemperî, “*Ji bo min kî be ferq nake*” bûne sedema ku tovê îxaneteke bi kok bê çandin û çanda hevkar bê avakirin.

Karaktereke ku wek kesayet tengbûyî, çewisandî û bi zoriyan hereket dike, avahiyên bê îstîqrar ên ku wê kengî çi bike nediyar afirandiye. Vê jî karaktereke wisa ava kiriye ku her tim jî bo bikanînê û berhevkirinê vekirî ye. A. Ocalan kesayetên bi vî awayî dişibîne mayinên serserî yên ku nediyar e bê wê kengî, li ku derê û bi kê de biteqe.

BEŞA SEYEMÎN:

EREBKIRIN: SEDSALA 10'EMÎN BÊGÎTIYÊN KURDAN Û TÊKILIYÊN KURD-OSMANIYAN

Li Kurdistanê Hevkariya di Encama Dagirkeriya Ereban de
Pêş ket û Berxwedanên li Dijî vê

“Bandora Îslamê li ser çanda qebîleyê ya ji rêûresmê û sîstema şaristaniyê di asta şoreşê de ye. Belkî jî ji bo krîza sed-salan a di nava çanda qebîleyê de, bersiva şoreşgerî ya herî bi bandor e. Qebîleyên Ereb ên li Nîvgirava Erebistanê ketibûn nava şerekî bi sedsalan heta bi hezar salan neqede. Di çanda qebîleyan de rizîneke mezin heye. Jin biçûk hatiye xistin, zarokên keç ewqas bêqîmet hatine hesibandin ku bi saxî hatine binaxkirin. Ev çand ji bo pîrsgirêkên civaka klasîk çareser bike ji derfet û îmkanan mehrûm e. Bi kurtî, ne dikare bi federasyonên qebîleyan ên ji rêûresmê, ne jî bi avahiyên desthilatdariyê yê koledar ên ji rêûresmê pêşî li krîzê bigirin. Pêşniyarên îdeolojîk, polîtîk û pratîk ên Hz. Muhammed weke derman li vê rewşê hatine.”

Dewleta Sasanî, sala 637'an di Şerê Kadisiye de li beramberî artêşên Ereb-Îslamê têk çû. Piştî wê jî sala 642'yan li Nehavendê li hemberî Ereban bi bin ketine. Her wiha, Ereban sala 636'an di şerê Yarmûk de Bîzansî têk birine.

Artêşên Ereb, di salên 639-640'î de dema seferên xwe yê li Mezopotamyaya Jorîn, cara yekem bi Kurdan re hevru dibin. Yê sefera yekem li dijî Kurdistanê li dar xistiye, fermanzarekî Ereb ê bi navê Saad bîn Vakkas e. Di şerê salên 637-642'yan de ku navbera Ereb û Sasaniyan de rû daye, Ereb serkeftî bûne û berbelavbûna xwe domandine. Qismek Kurdan jî piştgirî dane Ereban. Sasaniyan ji ber ku bi salan li dijî Bîzansiyan şer kirine, ji qewet ketibûn, ji ber ku ev jî dibû sedema gelek şerê navxweyî, zehf zêf bibûn. Vê rewşê jî avantajên mezin dabûn Ereban. Li bajarên mîna Şehrezor ji ber Zerdeştî hê xurt bû, berxwedan çêbûne, li beramberî vê jî Ereban qetlîam kirine. Di sala 639'an de navendên girîng

ên mîna Cizîr, Nisêbîn, Mêrdîn, Heskîf, Riha, Farqîn, Amed, Xelat, Egil ji hêla Artêşên Îslamê yên Erebbî hatin girtin. Ji van ci-han hin dever bi şer, hin jî bi lihevkerî hatine kontrolkirin. Şeh-rezor di sala 643'yan de bi awayekî bi xwîn wê bihata kontrolkirin.

Bi dagirkirina artêşên Îslamê yên Erebbî û piştî ku Kurdan Îslam qebûl kirin, di avahiya civaka Kurd de guherîna zehf mezin çêbûne. Ev bûye mîna nuqtetek werçerxê. Bi taybet jî di qada civakî de, di çand, ziman, ol û wêneyê de îstîqameta civaka Kurd bi temamî guherîye. Kevneşîpoyên rêveberiyê yên civaka Kurd -Bi dagirkeriya Tirk re jî dîsa hatiye rikibandin (anîn)- di qada civakî de li gor Îslamê, bi gotinek hê rasttir bi teşekirina Erebbî dewam kiriye. Li gel çanda Îslamî, olên wan a çanda Zerdeştî jî heta as-tekê maye û ji ber ku jiyan li qadên çiyayî û koçerî jî cudahiye çandî û olî çêbûne. Bi taybet jî cewaziyên mezhebî yekgirtina Kurdan asteng kiriye. Tenê ne astengkirin, li pêşîya her cure hewldanên yekîtiyê û yekparebûnê bûne bend.


Îslamê, xwe li her qadê bi cih kiriye. Her çiqasî gotina ummet-parêzî tê bikaranîn jî, li qadên ku Îslam bi bandor e, Erebbî bi pêş ketiye. Îslamek li ser hîmê Erebbî çêbûye. Ev rewş bûye sedem ku li kîjan civakê serwer be vehûna wê biguherîne, heta li xwe biyanî jî bibe. Eger em li ser vî esasî binirxînin, her çiqasî jî feo-dalîzm bi rêka Îslamê derbasî Kurdistanê bibe û divê ev heta as-tekê bê pejirandin jî, (pêwîst e neyê jibîrkirin ku ev rewş jî li gor teoriya seyra pêşketinê ya ne çixêza rast, mijarek nîqaşê ye) di esas de ji ber civak berevajî kiriye bi rolek neyênî rabûye.

Encamên ku Îslamê di civaka Kurd de ava kirine, ji yên civakên din cudatir in. Li gel Farsan, Îslamê hiştiye ku têgihîştina Farisî bi kok bibe û di encama vê de jî dewletên cur bi cur ên Farisan ava bibin. Farisên ku heta astekê xwedî avahiyek bi îstîqrar bûn, bi ala Îslamê ve -her çiqasî di serî de zorî kişandibin jî- xwe li qadên berfirehtir berbelav kirine. Nakokiyên di nav Îslamê de baş bi kar anîne -ev bi şiklê alîgirên Elî û Mûaviye bûye- li gor xweseriya qadê rikibandîye û derketin bi dest anîne. Ehlibeyta Îslamê esas girtine, bi pêvajoyê re bi mezheba xwe ya Şîa ferqa xwe ya li be-ramberî Îslama Erebbî daniye holê. Wisa jî wek çawa ji erozyona dîrokê rizgar bûne, her wiha di nav pêvajoyê de Îslam bi rengê Farisan jî hûndandine.

Dema ku Tirk berê xwe didin Anatolyayê, pêvajoya berbelavbûna Îslamê ye, bi gotinekê hê rasttir, demên dawî yên berbelavbûnê ne. Bi Îslambûnê ve Tirk pêdiviyê bi vebûnê dibînin. Di dest Tirkan de şûr heye. Hê li ser hespê ne, bi çanda şer tijî ne. Îslam jî xwedî alek mezin a olê ye, hem jî li ser navê ummet-parêziyê. Lê, Ereban jî zû ve dest bi zewq û sefayê kirine. *“Xwîna ku di damarên wan de diherike”* ne di asta fetihkirina xakên nû de ye. Têr bûne, bi wateyek din marjînal bûne. Êdî Ereb jî karaktera berbelavbûnê dûr ketine. Ev her du nêzîkatî hevdu dibînin. Îslam pêdiviyê bi şûr dibîne, Tirk jî muhtacên vebûnê, berbelavbûnê û welat in. Encama vê; Tirkîtiyek e ku ji Anatolyaya navîn heta nava Ewropayê ye. Lewma jî Îslamê bi Tirkan re rolek alê listine. Tev-kariyek mezin bi Tirkan re kiriye.

Belê, rewşa Kurdan çi ye? Bervajîya Fars û Tirkan e. Civaka ku di nav xwe de parçebûyî, avahiya navxweyî ji ber dagirkerî û xweseriyên xwe pûç bûye, bi Îslamê re jî erezyonek bi koktir dibîne. Îslam, em careke din diyar bikin, Erebbûn, hema hema heta şaneyên Kurdan bi cih bûye.


Ev rewş, dema rêbazên ku Ereb di têketina Kurdistanê de bi kar tînin li ber çavan bîne girtin, dikare hê rehetir bê dîtin û daneyên wê jî hene. Salên 640'î dema di pêşengiya Hz. Omer de Harran tê fetihkirin, fermanîyê wan jî Hz. Omer re dipirse, *“Ya Omer, me li vir pirtûk dîtin, em çi bikin ji wan?”* Hz. Omer ku di Îslamê de wek hêza nûnertiya edaletê tê zanîn, wisa dibersivîne; *“Eger ku yên di pirtûka pîroz de cih nagirin nivîsandibe, wê demê bi kufî ne, wê çaxê bişewitînin. Na, eger yên pirtûka pîroz nivîsandibin jî wê demê pêdivî bi wan tineye. Pêdivî nîne, ji ber ku jixwe di pirtûka pîroz de nivîsandiye, anga dîsa bişewitînin.”* Ya li vir tê hedefkirin, avahiya çandî ye, vehûna çandî ye, jiyana çandî ye. Mantîq ew e ku çi hebe tasfiye bikin. Û ji ber roja me ronî dike jî girîng e.



Abdullah Ocalan vê rewşê wisa tîne ziman: “Di demên serdestiya Ereban a herêmê de, di şaristaniya feodal de pêşveçûn pêk hatiye. Welat seranser li gor peyvnasiya Ereb tê binavkirin, yekem car Kurd wek Kurd ango Ekraîd tê binavkirin. Li gel ku Kurdan înkâr nakin jî, qulpekî bi rabirdûya wan vedikin û girêdana wan a bi xwe ve, ji siyaseta xwe re çêtir dibînin. Bi beşên Sunnî re, yekîtiyên têkilî û têgihînan gihandine asteke bilind. Li qadên berhemdar ên herêmê, bi taybetî li derên avî û peravên çeman, nifûseke Ereb a mezin tê cîwarkirin. Heta bi pesarên Torosan belav dibin, di nava ziman û çanda Ereb de, bişavtin gelekî bi pêş ve diçe. Li hember vê yekê beşên xizan û yên ku li çiyayan dimînin, berxwedanvaniya xwe diparêzin, li hinek qadan di gotinê de Îslamê dipejirînin, lê belê baweriyên xwe yên xweser û jiyana xwe parastine. Beşa ku di vê bingehe de helwesta xwe nîşan dane, herî bêhtir bi şeweya Kurdên Elewî bi temamî xwecih bûne û Îslameke bi sînor a ku li mercên wan guncandî pejirandine. Ev jî ne bi zorê, ji ber bêmafiya ku li ehlîbeytê hatî kirin, bi xwesteka xwe kirine...

Di nav Îslamê de Zerdeştî mîna çandekerê têkoşer û berxwedanê ye. Berxwedaneke resen û esîl a çanda Kurd e, li dijî biyanîbûn û xerîbketinê. Elewîtiya qels û xwe bi Îslamîyetê nixumandiye û alîgiriya Hz. Elî dike, piştî Zerdeştîyê çanda Kurd a herî têkoşer e, mîna Şîatiya Kurd be. Li beramberî vê yekê, nemaze Kurdên Başûr ên nêzî deştê bi baweriya Îslamê ya Sunnî dibin xwedî karaktereke hevkar û paşverû. Ev derdorên xwedî zîhniyeta bazirgan feodal çanda nîfşên xwe înkâr dike, nûnerên vê zîhniyetê ku li herêmen nêzî Êrfa, Mêrdîn û bajarê Sêrtê di nav îxanetêke super de ne. Pir bi awayekî seyr û ecêb, hevkar in û berjewendîperest in.” (DMME)

Li cihekî din jî dibêje: “Nexasim di dema navbera sedsalên 7. û 11. de, têkiliyên Kurd û Ereban ên di bin bandora çanda Erebi-Îslamê de, li aliyekî pêkhatinên desthilatdarî-dewletê yên bi awayên begîtiyan, li aliyê din jî pêkhatinên civaka sîvîl ên li ser bingeşê terîqetên tesewîfî kirin ku li ser rêya gelbûn, qewmbûn û milliyetbûnê (di navbera van her sê têgînan de pir kêr cudahî heye) bûyerên girîng bi serê Kurdan de bûn.” Seknên li dijî zîhniyeta Îslamê ya kevneperest, xwe bi desthilatdariyê kiriye û serdest jî mîna li jor hatî gotin her tim çêbûne. Mîna-kek herî baş jî Ebû Muslîm Xorasanî ye ku Zerdeştê Kurdan ê dema nû ye.



Ebû Muslîm Xorasanî wek jî nav jî tê fêmkirin ji Xorasanê ye. Xorasan tê maneya welatê roj tê ava. Zerdeştî li vir zehf xurt e. Bi kesên ku ji sulaleyê Hz. Elî hatine, têkilî danîne û derketina xwe jî mîna berxwedanek li dijî bêdaletiyê bi rêxistin kirine. Ebû Muslîm Xorasanî, li dijî Emewîyên ku Mûaviye ava kiriye (661-750), destek daye Abbasiyan ku navê wê ji apê Muhammed El-Abbâs tê. Fermandarekî Abbasiyan e.


Esas, wê hê rasttir be ku em bêjin yê sulteya Abbasiyan bi berxwedan û serkeftinên xwe saz kiriye ew e. Bi sekna li dijî zilmê, dadparêz û wekheviyê, bi eleqeya xizanan, bi taybetmendiyên xwe yên leşkerî berbiçav bû, her wiha wek rêberêkî jî bi bayê lezê xwe daye pêş. Diçe ser Emewiyan û sala 749'an xelîfetiye ji wan distîne û radestî malbata Hz. Muhammed Haşîmiyan dike. Wisa jî Împaratoriya Abbasiyan (750-1258) a navenda wê li Bexdayê ye, ava dibe. Beriya vê jî Dewletek Îslamê heye ku li Endulusan saz bûye û heta salên 1500'î jî hebûna xwe didomîne. Misilman êdî biadî Abbasiyan dikin. Piştî vê serkeftinê, wek berpîrs tayînî Xorasanê dibe. Lê, Abbasî jî Ebu Muslîm Xorasanî gelekî ditirsin. Wek rêberêkî ku ji hêla gel tê pejirandin, ji ber ku dikare her kêlî rê li ber rewşên cuda veke, bi komployekê ve sala 754'an qetil dikin. Ebu Muslîm Xorasanî jî bilî mezhebên fermî yên dihatin qebûlkirin, Şîatiya li ser şopa Zerdestiyê jî pêş xistiye. Şea yan jî Şîa di Erebi de tê wateya heval, hevrê. Hewl daye ku Îslamê li gor Kurdan eyar bike. Ebu Muslîm, nerazîbûna xwe ya li dijî xanedaniyek nû yan jî xîlafetê ku kiryarên wan dişibiyan hev wisa îfade dike: *“Min baweriya xwe bi zilamekî ji malbata pêxember anî. Ev kes wê di gihîştina min a xwedê de bibûya rêberê min. Min bawer dikir ku ez ê bi wî re rastiye bibînim. Lê mixabin, min ber bi şaşitiyê ve bir. Wî, Quran berevajî kir û ji bo xwe bi kar anî. Bi wan kiryarên xwe ve dixwest dewlemend û serwer bibûya.”* (Ethem Xemgîn, **Dîroka Kurdistan**)

Piştî Ebû Muslîm Xorasanî tê qetilkirin, gotinên mîna *“Te di bin hikmê Mansûr de dixwest xedariyê (neheqî, zirar, bêrehmî, bêmerhametî) bike. Erê, yên xedarî kirine bavên te yên Kurd in”* jî nîşan dide ku Ebû Muslîm Xorasanî Kurd e.

Îsyane ku bi Ebû Muslîm re dest pê kirî, di domahiya rêveberiya Abbasiyan de Kurdistanê dike qadek şer. Di vê pêvajoyê û salên din de her tim halekî berxwedan û îsyane li dijî Îslama fermî ango dewletê bi pêş ketiye. Îsyana Babek a ku nîrxên komunal gelekî li pêş in, ji bo vê mînaheke herî baş e. Ji salên 815'an dest pê dike heta salên 837'an dewam dike. Ev jî nîşane ye ku bê ev berxwedan çiqasî bi kok e. Ji ber ku îsyana hejaran û gundiyan li dijî feodalîzma Ereben dagirker rû dide, bi temamî wek serîhildanên gel, bi şiklê berxwedanên mezin çêdibin.

Îsyana Babekê, sala 837'an ji aliyê fermanbarekî Abbasiyan ê Bûdîst ê bi navê Afşînê hatiye tepeserkirin. Ew jî bi îxanetek hundirîn bi zorê bûye. Kesê îxanetker ê ku gelek fermanbarek Babek teslimî leşkerên Xelîfetiye kiriye, zengînekî bi navê Ehîl Îbn Sûnbad e. Ev kes, bi hinceta ku Babek li dijî Artêşa Xelîfe serkeftinek mezin bi dest aniye, li gel fermanbar û birayên wî qaşo dawetî xwarinê dike. Lê, Babek naçe. Fermanbar û kurên xwe dişîne. Ehîl Îbn Sûnbad ê ji berê ve ji hêla Xelîfe hatiye kirîn, bi tarzekî xayinane komployekê amade dike. Jehrê dide tevahî mewanên û radestî Xelîfeyê dike. Bi vê rêkê ve baskên çep û rast ên Babek ji hêla Xelîfê tên girtin. Kelha Bez a ku Babek lê ye jî tê dorpêçkirin. Ji bo teslim bibe, kurê wî tê şandin. Axaftinên Babek û kurê wî dirokî ne. Heta îro jî ev gotin hê derbasbûn û rêzdariya xwe diparêzin. Kurê wî ji Babek dixwaze radest bibe. Babek jî wisa dibersivîne; *“Min fêm kir ku tu ne ji min e. Ji bîr neke, li ser piyan azadiya rojekê tenê, ji koletiya çil salan hê bi qimettir e.”*

Babek li ber xwe dide. Lê, gelek fermanbarek wî êdî ne li ba wî ne. Babek ê ku hema hema bi tenê serê xwe di şer de maye, dîsa jî li ber xwe dide. Piştî berxwedanek demdirêj, bi birînek xedar dîl dikeve dest Artêşa Xelîfe. Êşkenceyek hema hema bêhempa li Babek dikin. Tê nivîsandin ku li Urmiyê hatiye qetilkirin. (Hin çavkanî jî dibêjin li bajarê Samara yê Iraqê hatiye qetilkirin.) Li



ber çavên gel -cih qadek wisa ye ku kelhek berxwedana girîng a Zerdeştîyê û li dijî Îslama fermî ye- dest û lingên wî bi hovane tên jêkirin. Lê, Babek weziyeta xwe xera nake, xwîna ku wek bilbilka misîn ji dest diherikî bi rûyê xwe dide. Xelîfeyê Abbasiyan Mûntasim li wir amade ye û dixwaze were pirsîn bê *“çima wisa dike.”* Bersiva Babek wê ev be; *“Ji laşê*

min xwîn diherike, dema rewş ev be wê rengê min zer bibe. *Û hûn ê ji derdora xwe re bibêjin ku bê çiqasî tirsiyame. Ez ê xwînê li rûyê xwe bidim û we ji vê zewqê bêpar bihêlim.*”

Û gotinên dawî wê ev bin:

“... Mîna tevahî mustebîdan (hikumdarên zalim) tu jî xwe dixapînî. Ji ber ku destana min destanek wisa ye ku ne bi Babek re dest pê kiriye ne jî wê bi Babek re biqede. Ey Evdalino (reben)! Hûn ê ti carî fêr nekin bê agirê azadiyê çi ye. Agirekî wisa ecêb e ku dilan dike xwelî. Azadî, dixwazî şîrîn be, dixwazî jî tal be; tenê ew e sujdeya min! Û mustebîd ku min dikuje, wê ti carî fêr neke ku bi kuştina wî ve fedaiyê azadiyê bi temamî tine nabe...”

Babek, bi awayekî hovane tê qetilkirin, bi rojan li sêdaran tê hiştin. Heman rewş wê li Bexdayê were serê birayê wî jî. Ya dikeve para keça biçûk a Babek jî destavêtina Xelîfe Mûntasim e. Alimên Îslamê hene ku ev bûyer di xebata Babek de kirine belge.

Erê, çîroka lehengiyê ya Babek hê jî li benda nivîsandinê ye. Qehreman û rêberekî gel ê ku bi nivîsî nebûye malê sînemayê, li bendê ye ku bi destankirinê nemir bibe. Xebateke girîng a li benda hunermendên Rojhilata Navîn jî herhalde veguheştina Babek a ji bo perdeya spî ye!

Bi giştî berxwedan ji serî heta binî komunal û çînî ye. Lê rêbazê wan bi rengê olî ye. Piştî Îsyana Babek, kevneşopiya berxwedana Rojhilata Navîn wê li dijî Abbasiyan bi îsyana koleyan dewam bike û serkeftinên mezin bi dest bîne.

Koleyên ku ji fikrên Îsyana Ebû Muslim Xorasanî û Îsyana Babekê bi bandor dibin jî rewabûna îsyana xwe dispêrin rêgeza wekhevîyê ya Quranê û Hz. Elî. Îsyana Koleyên a ku sala 869’an dest pê kir, bi lezûbez digihêje û berbelav dibe. Gelên ku li pey nîrxên komunal in, wek çawa destek dane îsyana din, li beramberî tevahî reşkirinan jî piştgiriya Îsyana Koleyên jî kirine. Îsyana Koleyên a ku domahiya 15 salan jiyana xwe ya komunal bi rêxistin dikan, bi azadî dijîn, di sala 883’yan de bi awayekî gelekî xwînxwar tê tepisandin. Lîderê wan Elî bîn Muhammed e. Navê wî yê din Al-Bûrkûî ye. Bajarekî wan ê bi navê *El Mûhtare-Bajarê Azadiyê* heye ku tevahî şervanên azadiyê lê dijîn.

Rêberê bijartî yê kevneşopiya tesewifê Hallac-i Mansûr jî wê xetek bi heman rengî. Hallac ê ku bi gotina En el Heq tê nasîn, wê bibe pêşengê berxwedaneke ku di ti demê de neyê jibîrkin. Li gor hin jêderan, dema Hallac di hepsê de ye, li navenda Bexdayê serhildana Hanbelî heye. Li vir yekser bandora xwe li vê serhildanê dike. Li ser vê rewşê, bi fetwaya qadiyê Malîkî Ebû Omer û fermana xelîfeyê Abbasiyan Mûktedîr, 26'ê Adara 922'yan li Bexdayê tê îdamkirin. Dema îdamê de, heta çermê wî radibe bi qemçiyên lê didin, dûvre kevîran pê de didin werkirin, paşê dest û lingên wî têne jêkirin û herî dawî jî cenazeyê wî tê şewitandin. Xwelîyên laşê wî jî li ber ava Dîcleyê tên berdan. Berxwedana wî ewqasî bi heybet û bandor e ku piştî salan jî yên ev zilm -wek Xazalî -li ser heq dîtin wê bibêjin, *“di gotinên wî de şaşitî nînbû, cih û dema axaftinên wî şaş bûn.”* Wek her em dibêjin, rastî jî sadebûnê hez dikin. Ti kes nikare bi şebê ve rastiya binixumîne.

Tevgera Karmatî, wê hê demdirêjtir bijî û bandora xwe li teva-hiya Rojhilata Navîn bike. Yê ku ev tevger damezrandiye, Hamdan bîn Es'as al Karmat e ku tê gotin bi eslê xwe Kurd e. Karmatî ku xwedî rêxistinbûyînek xurt in, li gelek qadan xwe bi rêxistin kirine. Karmatî her çiqasî beriya hezar salan xwe wek tevgerekê bi rêxistin kiribin jî, mîna tevgereke ku bi temamî xwe dispêre kadroyan, perwerdeyê girîng dibînin û dikevin nav girseyan, ne mîmkun e ku îro jî xwezî pê neyên. Demekê ewqasî bi hêz dibin ku Hacer el Esvedê -kevîrê reş ê li Mekkeyê- tînin navenda xwe. Wek şêwazê jiyanê jî mîna Mazdekan ku ji heman kokê hatine, hedefa wan ew e ku civakeke komunal, hevpar, adil û azadîxwaz ava bikin. Domahiya 200 salan, ji salên 890'î heta salên 1070'yî, li qadên cuda hebûnên xwe bi awayekî bi bandor domandine.



Bi kurtasî, “*Kurdan, bêguman ew rêgeza Harîciyan a ku dibêje tevahî Misilman wek komek olî xwedî heqên wekhev in, parve dikirin.*” (**Dîroka Kurdan**) Eger em ji vê tespîtê pê dakevin, em dikarin bi rehetî vê bibêjin; yên ku li dijî hewldanên Îslamîkirina bi darê zorê ya Ereban temsîla jiyana komunal dikirin, alaya antî Erebiyê li ba dane, pêlpêlandine.

Abdullah Ocalan, der barê îsyana û berxwedanên ku piştî Ebû Muslîm Xorasanî rû dane wiha dibêje; “**Weke tevgerên beşên xizan û bindestan, Xaricî, Hurremî, Babekî, Karmatî, Haşîşînî û Smayîliyan ên batinî ku derketin holê, hem pratîk û hem bîrdoziyî têkoşîneke mezin dane. Şeweyek sosyalîzma seratayî temsîl kirine û jiyane. Lê belê şeweya feodal a ku pêwîst bû hêzên hilberîn û têkiliyên wê werin jiyandin, ji ber ku rola xwe bi temamî nalîze, serfiraziya van tevgeran gengaz nebûye. Lê belê dîsa jî di dîroka têkoşîna wekhevî û azadî de, cîhekî wan ê mezin heye.**” (DMME)

“Hurmuzgah ruman

Atiran kujan

Hosan şarave gewre gewrekan

Zorkeri Erebiyê kirdine xabûr

*Gihane pale peşe Şarizor
Jin û kenikan ve dîl beşinan...*

Ango:

*Hurmuzgan rûxandin
Agir vemirandin
Mezinên mezinan xwe veşartin
Erebên zorker wêran kirin
Gîhan heta Şarezorê
Jin û keç dîl girtin..."*

Erê, “Şiklê hebûna eşîrê jî ku di Îsyânên Kurdan de hîmê esas e, wek rewşek nerazîbûnê dikare bê nîrxandin. Li gor rêxis-tinbûyîna xwe, wek nerazîbûnek li dijî çînîbûn û dewletbûyîna bajêr a ku têkiliyên hê tevlîhev serwer in, ber xwe girtine û wisa dane jiyandin. Li dijî çînîbûna serdest her li ber xwe dane. Li gor vê avahiyê jî jixwe xwedî pozîsyonek îsyankarê objektîf e. Bi taybet jî nakokiyên eşîrên koçer ên ku her tim bi dewleta navendî re pev-dikevin, wek nakokiyên mabeyna deştiyan û çiyayîyan, an jî çandi-yarî û ajaldaran her dewam kiriye. Ev nakokî di esas de nakokiya mabeyna dewlet û eşîrê ye. Û ji çînîbûna destpêkê heta roja me jî hatiye. Bi qismî jî be xwe adapte kiriye, lê dema zext û zora hêza dagirker digihêje asta ku jiyan a eşîrê asteng bike jî serî hildane.

Piştî pêvajoya van îsyânên ku li dijî sazîbûna sîstema feodal in, ji sedsala 10'emîn û şûn ve li Kurdistanê begîtiyên xurt hatine avakirin. Faktora herî girîng a xweseriya Feodalîzma Kurdan diyar kiriye jî ew îsyân in ku 300 salan dewam kirine. Di encam de Îsyânên Kurdan ên mabeyna sedsalên 7'emîn û 10'emîn de li dijî çînîbûniya ku bi Îslamê re dest pê kiriye, nerazîbûn e. Dişibe pêva-joya piraniya gelan a ku dema ji koçertiyê an jî eşîrê derbasî ava-hiyek hê pêşketîtir, begîtiyên feodal an jî dewletên feodal ên na-vendî, dibin. Lê, feodalîzma ku vê demê li Kurdistanê pêşketî, di kontrol û pêşengiya serweriya Ereban de bûye. Piranî begê feodal, nûnerê dewleta feodal a navendî ji Ereban e. Bi vî şiklî jî mêtina feodal hê girantir dibe. Li milekî begên feodal ên xwecih ku nû pêş dikevin ji xakê parê digirin, li milê din jî Dewleta Îslamê ya na-

vendî parê digire. Ev rewş bûye sedema îsyanan. Her wiha, ji ber xakên gundiyan dihatin desteserkirin û ji hêla serwerên Erebb wek xaka dewletê dihatin ragihandin, gundî nerazî kirine. Sedemên din ên îsyane ji ev pêkanînin. Mezheban ji rewatiya wê ya olî saz dikir, rolek yekgirtinê dilîst.” (Li Kurdistanê Diyardeya Îsyane)

Abdullah Ocalan vê pêvajoya dîrokî wisa dinirxîne: “**Kurd piştî berxwedaneke berbiçav bûn misilman, tebeqeya jor a qebileyên Kurd ji asîmîlasyona Erebb-Îslamê qebûl kirin, tebeqeya jêr ji civakên sîvîl ên tesawîfî pêk anîn û çawa ku timî bi awayekî rêûresmî hatiye kirin derketin serê çiyayan û xwe vekîşandin deverên jor û bi vî awayî stratejiya bergiriya hebûna xwe bi pêş xistin. Çawa ku behsa wan tê kirin, bi aliyê erênî û neyênî yê van stratejiyan karîbûn bergiriya hebûna xwe bikin û pêşde bibin. Tebeqeya jor a hevkar, milliyekbûyîneke Sunnî ya aliyê wê yê neyênî xurtir (bi giranî xwe ji milliyeta Erebb dihesibandin û kengî ji li hesabê wan hat Kurdîti bi kar anîn) kir sedema hebûna xwe, tebeqeyên jêr ji li ser bingeha terîqetên tesawîfî yên bi karaktera civakên sîvîl ên aliyê wan ê erênî xurtir (nexasim bi rêya medreseyan) li ser rêya gelbûnê bi pêş de çûn û bi awayekî girîng bi kêra rastiya Kurd a sedema navîn hatin.**”

Wek agahiyek zêde: Tevî van hemû taybetmendiyên neyênî yên berbelavbûna Erebban jî, gelek dîroknas tînin ziman ku ji bo Erebban Îslam Serdemeke Zêrîn e. Bi taybet ji mîna El Kîndî, Farabî, Îbn-î Sîna, Îbn Ruşt, Fûzûlî, Hallac, Suhreverdî, Mûtezîle, Îhvani Sefa gelek zaniyar û filozof derxistine. Ev pêşketina ku di dema îçti-hadê (têgihîştin) de çêdibe, ji sedsala 12’emîn û şûn ve bi paş di-keve. Ji vê Serdemê re ji Serdema Tarî ya Erebban tê gotin. Sedema vê ji feraseta Îslamê ye ku alimên Îslamê yên mîna Îmam Gazalî û Eşarî rêya îçti-hadê digirin û dispêrin dogmayên kûr û mezin. Thomas Arîstoteles ê ji Aqûînoyê, qîlifekî zanistî li Xrîstîyaniyê dike û pêşiyê li ronakî û zanista siberojê vedike, Gazalî jî tersê vê dike û pêşiya pêşketinê digire.

Çînîbûyîna li ser Esasê Hevkariyê Pêş ket û Avabûna Tebeqeya Jor

Îslam xwe li ser bingeha Erebkirinê bi bandor dike, berdêla vê ji bo civaka Kurd bûye sedema şikandinê û biyanîkirinê.

Kurd wek gel di vê pêvajoyê de texrîbat û hilweşînan ji kûr de dibînin. Saziyên serokeşîrtî, begîtî û şêxîtiyê li gor pêdiviya karaktera xwe, ji ber bandora Ereban xwedî asoyekî wisa ne ku bi berjewendiyên teng ên malbatê re sînordar e. Îslamê, çîna serwer a Kurd li dijî gelê Xrîstîyan aniye asteke xurt. Bi saya Dewleta Îslamê, di aleyhê van gelan de bûne xwedî gelek derfetan. Berevajîya fikra gîştî, ev ne ji ber ku zehf baweriya xwe bi dogmayên dîn anîne û bûne Misilman. Ji ber ku dizanin di atmosfereke wisa de ku dogmatîzm û baweriya hişk zêde ye, wê karibin berjewendiyên xwe yên madî û hêza siyasî bi dest binin, bi çar lepan xwe avêtine Îslamê. Çawa ku di demên berê de ew beşên ku îro em jê re dibêjin Kurd, Sumerî dawerivandibin, dîsa di dema Asûran de û helbet dema Helenan de jî çînen jorîn ziman û çanda dagirker yekser girtine. Li beramberî vê jî çînen jêrîn, endamên eşîrê, yên wek tebaa tînan zanîn, yên di nav jiyanê de wek gel tînan binavkirin, çawa ku di ziman û çanda xwe de bi îsrar bûn; bi heman şiklî, lê bi awayekî dijber jî yê xwe li Erebbûnê kirine xwedî jî çînen jorîn û serwer in.

Çîna jorîn li gor berjewendiyên xwe binemala xwe gihandine heta malbateke Ereban. Heta hinan xwe kirine endamên sulaleya Hz. Muhammed û hewl daye vê jî bi Seyîdbûnê nîşan bidin! Mînak, Bedirxan Beg, binemala xwe digihîne heta Halîd Bîn Velîd. Bi heman şiklî hin eşîrên li derdora Cîlmergê jî heman rêyê hildibijêrin û dibêjin ku ji Halîd Bîn Velîd hatine. Îro li gelek deverên Kurdistanê, wek mînak behsa hespê Hz. Elî, Duldul tînan kirin ku bê çawa şopa wê maye. Ji vê hê wêdetir, eger li dergehên cur bi cur, Pîr binemala xwe digihînin heta Hz. Elî, li wir esas biyanîbûnek mezin, ji xwe şermkirin û ji xwe revîn heye. Lê, Elewîtî jî mîna Abdullah Ocalan dibêje: **“Qebîleyên ku li dijî derbeyên yekem ên fethê teslîm nebûne, li ba oldarên Zerdeştî wek her tim di dîrokê de bûne, xwe didin bilindahî û kûrahiyên çiyayan û berxwedanên xwe bi demdirêjî domandine. Beşên serekê yên**

ku berxwedanên wan radîkal û bênavber e, wek Elewî û Zer-deştî, an Îslamek zindî tercîh kirine yan jî Îslamîbûn qet tercîh nekirine. Ji warên wan ên li çiyayan jî tê fêmkirin ku Elewîfî çanda baweriya beşa radîkal e ku berxwedêrên kevneşop in, hebûna xwe ya çandî parastine, asîmîlasyon wek kufrê hesi-bandine û Îslam jî qasî ku li hebûna wan a çandî hatiye, qebûl kirine.” Tevî vê jî eger hewldana ku xwe bi hinên din bide îzahkirin hebe, wê demê eşkere ye ku ev xisûseke pir cîdî ye û divê li ser were ponijandin.

Eger em dewam bikin; bişavtin û biyanîbûn tenê bi vê rewşê sînordar nemaye. Ji navan heta nasnavan û heta cil û bergan hema hema her tiştên jiyanê hatine Erebkirin. Çavkaniya şêxan, mîran, seyidan, her wiha navên mîna Hesên, Husên, Eli, Osman, Îsmail, Omer, Bekir her ji vê çandê ne. Gel, helbet dikarin ji hev bandor bibin. Li vir ti tiştêkî biyanî nîne. Lê, bi nêzîkatiyeke ji keyzer bêhtir keyzerparêztîyê, hewldana ku rastiyeke ne aîdî civakêkê empozekirina giştî civakê, tenê û tenê îxanet û hevkarî ye. Dema bi malbatên van çînan hatin lîstin, wê demê ji her cure destavêtinan re vekirîne, ji îşyan û teslîmbûyînen di zik hev de xwe nadin paş an jî nikarin xwe rizgar bikin. Têkiliyên ku bi dest van serweran tên danîn esas ji bo encamên bi heman rengî ên di vî tarzî de çêbibin, ji xwe re kiriye qaîde ku li ser gel ferz bikin, gel biçûk bixînin. Wisa ye ku, tevî Kurd xwe wek Kurd îfade dikin jî, di cewher de tehrîfatek hemreng heye ku ji Kurdan re tenê bi pênaseya Erebi ‘Kurd ango Ektrat’ bê gotin.

Kurdên ku bi giştî di bin bandora çanda Serdema Navîn de mane, di rêjeya çînîbûna feodal de ji jiyana azad dûr ketine. Koletiya feodal, bênavber di aleyhê azadiya eşîran de pêş ketiye, di biyanîbûna zîhnî de jî li cihekî girîng rûniştiye. Her çiqasî gelek rewşenbîrên Kurd derketibin jî ji ber meylên hevkarîya dewletê, bandorek mayinde nehiştine.

Bi kurtasî, tebeqeya jorîn a bi feodalîzmê çêbûyî, bi gotinek gelemperî tam bûye xulamek. Ji ber di haveynê wê yê bûyîne de xulamtî û hevkarî heye, wek karakter jî çerexok e, avdêtî ye û ji tewîşînê re jî vekirî ye. Ji cewherê xwe dûr e û lê xerîb bûye. Xweziya xwe bi hinên din tîne, ji xwe nefret dike, ji nixrên xwe direve. Ev giştî her ji vê çavkaniyê çêdibin. Ji ber ku her tim ji bo

hinên din heye, her tim ji bo bikaranînê jî guncav e. Ewqasî li xwe biyanî bûye ku berjewendiyên xwe nafikire. Bixwaze jî nikare bifikire. Nayê bîrê jî. Tu dibêjî qey mejî bi tevnepirê hatiye hûnan-din.

Îdrîsî Bedlîsî yê ku em ê dûvre binirxînin, ji bo vê mînakê baş e. Pesndayîna sultanan ewqasî bi pêş dixe ku 8 împaratorê ku ji damezrandina Osmaniyan ve hatine wek “Heşt Bihuştan” teswîr dike. Ê helbet li beramberî daxwaza Yavûz Sultan Selîm a “*begên xwe tayîn bikin an jî diyar bikin*”, bersiva “*em nikarin, hûn diyar bikin*” dide. Ev bersiva jî tenê avahiya kesayetêke ku xwedî vê karakterê ye, dikare bide.

Mijar ne başbûn an jî xerabûna Îdrîsî Bedlîsî ye. Wek em ê dûvre jî bibînin, dibe ku li gor serdemê ya pêwîst bi şiklekî erênî jî kiribe. Lê ya pîrsgirêk ew karaktera serwer hevkar e. Ê cihê ku karaktera hevkar bigihêjê jî îxanet e.

Eger em qewimînan wek sosyo-psîko-kulturî binirxînin, wê demê encamên pir balkêş dikarin derkevin. Eger wek ruhî Osmanî dijî, wek sosyal û kulturî bûye Ereb û em sultaniya Osmaniyan a ku navenda Sunîtîyê ye jî li vê zêde bikin wê demê dê tablo hê baştir bê fêmkirin. Bi zimanê welatekî yan jî wê demê, nêzîkatiye-ke ku avakirina dewletê ji bo hinên din dihêle esas hatiye girtin. Tiştê ku li gor rêzdariya mezinan diviyabû bihatana kirin hatine kirin. Hem jî bi awayekî herî baş! Ji ber ku 23 Begên Kurdan- li hin cihan ev hejmar 25, li hinan jî wek 28 tê dayîn- ji dest Şah Îsmâîl hatine rizgarkirin, pêşî li Şîabûnê hatiye girtin û xeta Sunnî serwer kirine. Li vir hestên îxanetê gelekî zêde ne. Ew nerazîbûn û helwesta ku divê li dijî hevkarîyê bê nîşandan nîne. Bervajîya wê heye. Ha ev e, karaktera îxanetkar, hevkar ewqasî xwe kûr berdaye û kesayetêk wisa jî ava kiriye.

Abdullah Ocalan ev rewş wisa îfade kiriye: “**Ev hersê ezmûnên ku Kurdan li hember Îslamê bi dest anîne, ji bo pêş-neçûna yekîtiyeke neteweyî, bûne faktorên herî girîng. Dema li ser dabeşbûna etnîk û hevkarîyê ya ku ji Serdema Serateyî maye, nirxên feodal ên biyanî jî zêde dibin, hê bêhtir rê li ber dabeşbûneke kûr û biyanîbûnê vedike.**”

Li cihekî din jî Abdullah Ocalan wisa dewam dike; **“Hevkarên serdest, ziman û çanda dagirkeran li nava malbatên xwe bi kar tînin û gelê ku çand û zimanê xwe dihewîne jî biçûk dibînin û weke kûsiyê ku qalikê xwe naecibîne, ziman û çanda xwe naecibînin.**

Li gel vê helîneriya demê jî, zaravayên Kurdî ku bi awayekî bi hêz li ser lingan dijîn, bi saya komên gelên berxwedanvan rola xwe bi serbilindî lîstine. Her çiqasî çîna wan a serdest bêesil û bêkesayetî bûye jî, ev rastiyeke din e ku gelê Kurd azad û esîl maye.” (DMME)

Li Kurdistanê Sedsala 9. û Rewşa Piştî wê Pêşketina Kurdan a di vê Merheleyê de

Ji vê û şûn ve li Kurdistanê di sedsala 9'emîn de valatiyek girîng a otorîteyê çêdibe. Şerê mabeyna Împaratoriya Tirk a Selçûkiyên Mezin a ku di bin sêwana Xelîfetiya Sunnî ya Bexdayê de ye û Xelîfetiya Fatimiyên Şîa ku ji Okyanûsa Atlantîk heta Behra Sor serweriyê li ser giştî Bakurê Afrikayê dike, atmosferê hev-sengiyê ava dike. Ev atmosfera hevsengiyê rê li ber aramiyekê vedike. Ev rewşa objektîf, tê wê wateyê ku yan li Kurdistanê hêzên mezin tinene yan jî nikarin xwe bidin hîskirin. Ji ber ku Kurdistan tim bi tim bûye qada şer, ev jî bûye sedem ku texrîbat, hilweşîn û paşdemayîn hebe. Ya derdikeve holê ew e ku yan wê bi teslîmbûnê li xwe biyanî bibe- ev tê wateya domandina îxaneta hê bi koktir-, an jî wê kokên xwe hembêz bike û xwe biavêje çiyayên ku kes nikare xwe bigihîne –ev jî tê wateya dûrketina ji “medeniyetê”-. Kurd li ser vê xakê her tim neçarî van her du rewşan hatine kirin. Şerê desthilatdariyê yê mabeyna xanedanên Kurdan de, bi vî şiklî bûye sedem ku desthilatdarî her di nav xwe de biguhere. Li gel fenûfûtan, hebûna alîgirên Bîzansiyan, Ereban, Selçûkiyan an jî beşên ku ji bo têkoşîna wan a desthilatdariyê piştgiriya dixwazin, li pêşiya îstîqrarê bûne asteng. Tevî vê jî ji ber Bîzansê xwe ber bi rojava ve kişand û serwerên Ereb ji ber nakokiyên hundirîn zêf bûn, li Kurdistanê desthilatdariya xwecih pêş dikeve.

Tevî van hemû rewşên neyênî jî, di sedsala 9'emîn de ji ber şer kêr dibe û zêrî dibe, pêşketinên nû çêdibin. Gelek begîtiyên Kurdan berê xwe didin qadên he firehtir, rêxistinên ji begîtiyê wêdetir ava kirine. Her wiha, gelek rewşên jî gihane. Çend ji rewşên jî û hunermendên Kurd ên gihane roja me ev in; Elî Harîrî, Baba Tahîrî Hemedanî, navekî din e girîng jî Nîzamî Gencevî ye ku li paytexta Şeddadiyan Genceyê hatiye dinyayê. Li Azerbeycana îro ye. Nîzamî Gencevî wek damezrînerê Felsefeya Rasyonalîst tê naskirin. Xebatek wî ya bi navê Xemse ango “Pênc Berhem” heye. Tê gotin ku Hegel wisa axiviye; *“Fikrên me ji bêrîka Nîzamî Gencevî derketine.”*

Di vê sedsalê de civakên li Kurdistanê, pêşketinekê he zêdetir li ser esasê dînamîkên hundirîn bi dest tînin, Kurdên ku li qadên çiyayî bi cih bûne jî bi avahiyên xwe yên eşîrî ve xwedî rewşek bi avantaj bûne. Ji ber ku di wê demê de zextên hêzên dagirker û hegemon li ser Kurdistanê kêr bûne, Kurdan bi saya van dînamîkên xwe yên hundirîn xwe gihandin pêşketinek bi lez. Eger em begîti yan jî formên he jortir rêz bikin:

Begîtiya Şeddadiyan (951-1164): Ji hêla lîderê Eşîra Revadî Muhammed Şeddad hatiye damezrandin. Di vê demê de dewleta Kurdan a yekem, dewleta Şeddadiyan a li bakurê Azerbeycanê ye. Paytexta wan destpêkê li herêma Erîvanê, Dabîl (Dvîn) bû. Dûvre Gence kirin paytext. Herêma Gence, Berba, Dubeyl, Beylekan û Aran qadek hakim bû. Em bi bîr bixin ku Aran, herêma Azerbeycan û Ermenîstana îro ye. Xanedaniya Kurd a Şeddadê, di sala 1164'an de ji hêla qralê Selçûkiyan Melîk Şah hatiye bidawîkirin.

Dewleta Hasnaviyan (Hasanveyh) (959-1015): Xanedanekî duyem e Kurd jî sala 959'an li Cîbalê xwe diyar kir. Damezrînerê wê Serokeşîrê Barzîkanî Hasanveyh bîn Huseyîn e. Hasanveyh, serokê eşîra Barzîkanî ye. Ev dewleta Kurdan heta sala 1015'an li ser piyan maye. Hasanveyh bi esaleta xwe, rêveberiya baş û exlaqê xwe tê methkirin. Li ser Dînever (Îran, herêma Kirmanşan), Hemedan, Nîhavend û Şehrezorê hikum kiriye. Paytexta wan Sermac e.

Xanedaniya Fedlavî (LOR) (913-1424): “*Herêma Loristanê ji hêla birayên hev Bedîr û Mansûr dihat birêvebirin. Piştî eşîrên Kurd ên ji herêma çiyayê Şîmak ê Şamê koçî vir kirin jî hê xurttir bû. 1248’an û beriya wê di dema Hezer Esef de gelekî bi hêz dibe û ji Xelîfe jî diyariyan digire. Hulagu Xan sala 1258’an Bexdayê digire, li dijî vê xanedaniyê şer dike û begên wan Tekle dikuje. Ji vê demê û şûn ve xanedanî girêdayî Hulagu ma. Sala 1393’yan dema Tîmûr tê vê herêmê, serweriya xwe saz dike û xanedaniyê kontrol dike. Çend begên din jî heta sala 1424’an ev rêveberî domandin. Herî dawî neviyê Tîmûr Mîrza Îbrahîm tevahî Loristan kir bin serweriya xwe.*” (Cemal Reşîd Ehmed, **Rûbirûhatina Kalikan**)

Pêşketina herî girîng jî Dewleta Merwaniyan e ku paytexta wan Farqîn e (985-1096). Damezrînerê vê dewletê ji eşîra Humeydî Bad e. Vê dewletê Meya Farqîn (Farqîn) û Amed kiriye navenda xwe. Di şerê Hemdaniyan de, Bad tê kuştin û li şûna wî xwarziyê wî Ebû Elî Huseyîn bîn Merwan rûdinê (991). Ev xanedanî sala 1085/1096 ji hêla Selçûkiyan ve tê bidawîkirin.

Dewleta Merwaniyan, giştî herêma Amed, Nisêbîn û Cizîrê kontrol kirine. Dewleta Merwaniyan bi qasî sedsalan hebûna xwe domandiyê. Ji derveyî avakirina sûran, av anîne Farqînê û binesaziyek bi şîklê şebekeya avê saz kirine. Merwaniyan, li herêmê pêşî li berbelavbûna Harîciyan girtiye, ji mezhebên Sunnîtiyê Şafîtiî ku li gor Hanefîtiî û Malîkîtiyê hê muhafazakartir e, li herêmê berbelav kirine û di mezinkirina bandora wê de rêbertî kirine. Wisa jî karaktera hevkarîyê ya di ruhê serweran de bicihbûyî domandine.

Beriya em derbasî Begîtiyên din ên Kurdan bibin, em behsa çîrokek mîtolojîk a têkildarî damezrandina Farqînê –Ermenî dibêjin Tigranokerta- bikin wê baştir bibe.

Cemal Reşîd Ehmed, di xebata **Rûbirûhatina Kalikan** de beşekê ji Seyahatnameya Ewliya Çelebî dide û têkildarî Farqînê vegotinek mîtolojîk a gelekî balkêş radigihîne.


“*Çîroka Xuliqandina Kurdan: Li gor Dîroknivîs (weqanivîs) Migdîsî, piştî Tofana Nûh, bajarokê ku cara yekem hat avakirin bajarokê Jûdî ye ku li nêzî kelheyên Şengal û Farqînê ye. Bajarokê Jûdî, di rêveberiya Melîk Kurdim de bû ku ji koma Pêxemberê Nûh*

e, zêdetirî 600 salî jiyaye û her deverên Kurdistanê bihost bi bihost dizane. Ev Melîk Kurdîm dema tê Meyyafarqînê, ji hewayê wê gelekî hez dike. Û li vir bi cih dibe. Gelek zarok û neviyên wî çêdibin. Bi serê xwe, zimanekî jî derveyî Îbrânî îcad dike. Ev ziman ne Îbrânî, ne Erebi, ne Farisî ne Darayî ne jî Pehlewî bû. Jê re hê jî zimanê Kurdîm tê gotin. Wisa jî Zimanê Kurd ê ku li Meyyafarqînê hat afirandin, niha li tevahî Kurdistanê tê axaftin. Kurdistan a ku navê xwe bi saya Melîk Kurdîm e ku jî koma Pêxemberê Nûh tê, ji ber ku jî serî heta binî çiyayî ye, xwediyê zêdetirî 12 zaravayên Kurdî ye ku bi peyv û bilêvkirinê jî hev cuda ne. Ji ber vê yekê jî bo jî hev fêr bikin wergêran bi kar tînin.” Bi vê yekê ve, pirsgerêka ku wê piştî sedan salan jî dewam bike beriya 500 salan tespît kiriye.

Annazî (991-1118): Ji aliyê Muhammed bîn Annaz di sala 991’an de hatiye damezrandin. Vê xanedaniyê heta sala 1117’an hikum kiriye.

Begîtiya Bûweyhî (934-1062): “Ebû Şuca Bûweyhê ku ji nîşên melîkê berê yê Sasaniyan Behram Gorûn e, reîsê qebîleya Kurdan a Bercenkîaver e û li çiyayên Deylemê ye. Kurê Ebû Suca, destpêkê li bajarê KERÇ ê li başûrê Hemedanê bû walî. Dûvre jî gelek bajarên li başûr û derdorê kir bin kontrola xwe. (Salên 932-933’yan) Elî yê xurtbûyî, bi alîkariya birayên xwe Hesên û Ehmed, bajarên Karzû û Şîraz jî girtin. Xelîfeyê Bexdayê Kahir Bîlal ji neçarî ve xanedaniya ku sê birayan damezrandine, qebûl kir. Bajarên Ahvaz û Hûzîstan jî di salên 940’î de hatin girtin. Wek mezheb Şîî bûn.

Bûweyhî, ji ber pevketinên ji bo textê zeîf bûn. Sultanê Selçûkiyan Tûgrûl Bey, li DANDANAKAN’ê li dijî wan şer kir. Di vî şerî de piştî wî şikest. Paşê, di sala 1041’an de careke din şer kir û wan têk bir. Tûgrûl, 1055’an bi ser Bexdayê de meşiya. Bûweyhiyên ku Xelîfe jî textê dûr xistibûn, li Bexdayê jî têk bir, Xelîfeyê ku xwe avêtibû bextê Merwaniyan anîn û li ser textê dan rûniştandin. Xwişka xwe bi xelîfe re zewicand. Di 1062’yan de jî Bûweyhiyên li Mûsilê Ebûl Nasir Husrev Fîroz, girêdana xwe ji Tûgrûl re ragihand û ket bin serweriya wan. Wisa jî dawî li Bûweyhiyan hat.” (Cemal Reşîd Ehmed, **Rûbirûhatina Kalikan**)



Di Sedsala 10. û 11. de Begtiyên Kurdan

Cihên ku Şerefxan mîna **Lorên Mezin û Biçûk** pênase dike, Loristan e ku li rojhilatê Îranê ye. Ji van Loristana Mezin, di salên Fedlawî (Fadlawayh, Fazlaveye) de (1060-1124) ku ji waliyên eyaletê ye, serbixwe ye.

Xanedaniya Hûrşîtan (LOR, 1156-1534): “*Gelek eşîrên Kurdan heta 1156’an yekser girêdayî xelîfeyê ne. Rêveberên Erebi ji bo herêmê dihatin tayînkirin. Di dema Husameddîn Şûhlû de ku di emrê Selçûkiyan de ye, ji eşîra Cengreviyên Kurd du kurên Hûrşîd li herêmê hakîm bûn. Gelek begên Tirk ji bo vê herêmê bigirin, şer dan pêş. Herî dawî, Husameddîn Halîl (Tirk), herêmê desteser dike. Di 1243’yan de Şah Silêmanê li Bexdayê bi alîkariya xelîfê ji Husameddîn (Begê Tirk) têk dibe, dîsa Hûrşîtî serwer dibin. Di 1258’an de cardin bi êrîşa Moxolan ve desthilatdariyê dest guhert. Bi gelek şerên navxweyî ve begîtiyê her dest guherî.*” (Cemal Reşîd Ehmed, **Rûbirûhatina Kalikan**)

Eyyûbî (1175-1250): Xanedaniyek navdar a Kurdan e. Ji eşîra Rewadî ye. Navê esas ê Sallahaddîn, Yûsûf e. Beriya ku em bi berfirehî behsa Sallahaddîn bikin, destpêkê em notekî biçûk bidin. Li jor, dema navên Begîtiyên Kurdan û serwerên Kurd ên lîdertî ji wan re kirine hatin dayîn, nuqteya hevpar ew e ku di giştî de “bîn”

ango kurê wî (bîn di Erebi de kur e) hatiye bikaranîn. Dema serwerên Kurdan navên xwe dibêjin, hewl didin navekî Erebi li xwe bikin. Dibêjin qey vê nebêjin wê “sêhr” xera bibe. Malbata Eyyubî, li herêma Dvin a Azerbaycanê, endamê baskê Rewadî ya Hîzbaniye, Yekîtiya Eşîrên Kurdan e. Şîrkuh, birayê biçûk ê Eyyub û apê Sallahaddîn (Yûsûf) e. Mîna yek ji şervanên herî bi lez ê dirokê tê zanîn. Şîrkuh, wek şervanekî heqîqî yê Kurd li xakên Kurdistanê mezin bûye, belkî jî şervan û fermandarê Kurd ê herî girîng e ku herî zêde nêzî pêşiyên xwe Medan bûye.



Şîrkûh an jî Şêrgo, tê wateya ŞÊR-KOY ango şêrê çiya. Yê ku Sallahaddîn Eyyûbî kiriye Sallahaddîn Eyyûbî ev fermandar e û apê wî yê heq e. Û dikare bê gotin ku; yê ku ji bo sefera Kahîre, li vir Sallahaddîn navdar dibe, bi patika Sallahaddîn girt û ew bi darê zorê bir, ew bi xwe ye. Şîrkuh piştî ku di sala 1169'an de Kahîre girt, wê 23'yê Adara

1169'an biçê ser dilovaniya xwe. Wê Sallahaddîn derbasî şûna wî bibe. Lê, beriya ku em behsa Sallahaddîn bikin, ji bo di dirokê de cihê ku heq kiriye bigire, divê çend gotin li ser Şîrkuh werin gotin.

Şîrkuh ê taktîsyenekî hoste bû, mirovekî wisa bi aqlê selîm bû ku ti tişt li hêviya tesadufan nedihîştin. Wisa bû ku eger di çalakiyekê de nediyarî di encamê de hebûya, wê demê xwe nêz nedikirê. Ew kes e ku yê encama wê zelal bûya qebûl dikir. Ew li her derê nayê beramberî dijmin. Bi xwe kengî bixwesta şer li wê derê diqewimî. Bi kurtasî, taktîka lê bide- bireve ya ku parçeyekî diroka Kurdan e, bi pisporî pêk dianî. Lê, dema pêwîst kir, êdî kêr ghihiştibe hestî jî, wê demê çav lê ewqasî reş û tarî dibûn ku xwe ji ti rîskan nedida paş.


Û piştî ku hêzên dijmin dixê xwe, li kûrahiya çolê di nav bêrehmiya çolê de dihêle, bi meşa herî lezûbez a dîrokê ve fetha herî zû bêyî li ti astengiyê bieliqê, wê pêk bîne. Rêya 1500-2000 kîlometreyan bi hespan ve bi lezek nayê payin wê ji başûr ber bi bakur ve hem jî bi hezaran siwaran ve di ber Îskenderiyeyê re derkeve û bajêr fetih bike. Dema tîrsa gelê Îskenderiyeyê ya li beramberî xaçperestan jî li vê zêde dibe, wê demê Şîrkûh wek fatîhekî bi heybet tê pêşwazîkirin.

Şaver û Xaçperest li beramberî vê rewşê şok dibin. Ew, dema ku bi giştî hêzên xwe li başûrê Misrê lê digeriyan, wê di carekê de bibînin ku Şîrkûh li bakur Îskenderiye fetih jî kiriye. Ev çalakiyeke bi leza brûskê ye ku bi dest dehayekî şer pêk hatiye. Hem jî ev çalakiyek wisa ye ku tenê kuştîyekî wan jî çenebûye!

Wek qasidekî şervanê Kurd ê ciwan Nasir ku li cem wî gihaye, ji Misriyan re dişîne, lê Misrî serê şervanê Kurd ê ciwan Nasir jê dikin û ji Şîrkûh re dişînin. Wê demê gotinên wî gelekî watedar in: *“Ez li ser serê vî zarokê ku mîna min jî çiyayan hatî, sond dixwim. Ez sond dixwim ku serê Şaver jê bikim. Wê ti tişt nikaribe wî zindî bihêle. Ne Frankên wî, ne xesandiyên wî, ne jî Xelîfeyê wî. Li ber we hemûyan sond dixwim. Eger bi ser nekevim, bila ruhê min di dojhê de birize.”* Û Şîrkûh sala 1169’an dikeve bajarê Qahîrê, wê derê fetih dike û wek karê yekem jî li ber çavên gel, bi destê xwe serê Şaver- wezîrê Misrê û kesê ku Nasir qetil kiriye- jê dike. Û dibêje, *“Tola Nasirê me niha hatiye hilanîn!”* Erê, ev e Şîrkûh!

Sallahaddîn, 4’ê Tîrmeha 1187’an li nêzî Gola Galîleî (Gola Nazaret, li bakurê Îsraîla îro, li başûrê Lubnanê, li sêgoşeya ku Sûriye, Urdin-Îsraîl digihêjin hev, li qûntarê Girên Golanê, gola ku Çemê Urdin Şerîa jê tî) ya bakurê Filistînê, li Hattînê, artêşek mezin a Xaçperestan îhma kiriye.

Sallahaddîn 2’yê Cotmeha 1187’an, dor li Qudisê girtiye û di demek kurt de, piştî 88 salan, bajar careke din ketiye destê misilmanan. Şûrê Îslamê Sallahaddîn wisa bûye. Her çiqasî Xanedaniya Eyyûbî demek dirêj li ser piyan mabe jî, Sallahaddîn -her bi tayê diket- 4’ê Adara 1193’yan li paytext Şamê bêpere, lê welatekî mezin li pey xwe dihêle û diçe ser dilovaniya xwe.



Di çarçoveya welatparêziya Kurd de bi awayekî zêde rexnekirina Sallahaddîn dibe ku ne di cih de be. Her çawa be jî her pêvajoyek rastiye xwe yê xweser hene. Lê, cardin tevî hemû hincetên mafdar jî ku Sallahaddîn dikarîbû ji bo gelê Kurd zehf tiştan bike, lê tenê bi pratîkên li gor umetparêziyê ma. Ev jî wî dike hedefa rexneyan. Îro qasî ku em dikarin bixwînin, Sallahaddîn zêde jî ji rastiya gelê xwe û zimanê wê yê Kurdî dûr nemaye. Li qesrê bi

Erebî, di nav jiyanê de jî bi Kurdî diaxive. Ev jî têgihîştinek girîng a nasnameyê îfade dike. Di şer de girîngiyê bi Kurdan dide, muhafîzên xwe yê taybet tenê ji Kurdan hildibijêre. Ev jî bi heman şiklî teblîxa nasnameyê ye. Lê, di jiyanê xwe de ji bo Kurdan dikarîbû rolek hê zêdetir yekgirtinê bilîsta, ziman û çandek hevpar biafiranda. Ji ber ev nekiriye, diyar e ku rexneyên werin jî wê her mafdar bin. Abdullah Ocalan di vê mijarê de dibêje, **“Eger Sallahaddîn Eyyûbî wek Kurd, lê damezrînerekî xanedaniya ku Ereban bi rê ve dibe bê nîrxandin, wê li cih be. Ne ji bo biçûkxistinê dibêjim, nikarîbû bi awayekî din bikira. Berxwedana wî li ser navê malbatê zêf, li ser navê Îslamê xurt e.”** Her wiha, ji bo em karibin heqê Sallahaddîn Eyyûbî baş bidinê jî pêwîst e em bizanin bê Rojavayîyan bi Seferên Xaçperestan ve dixwestin çi bikin. Êrîşeke mezin a emperyalîzmê heye. Em dikarin vê di “Sefera Xaçperestan” a Bûsh de ku li dijî Iraqê pêk anî, bibînin. Tiştên ku Bûsh di sedsala 21’emîn de kirine, hezar sal berê ji hêla Sallahaddîn hatine astengkirin. Dema Împaratorê Romaya Pîroz Frîedrich Barbarosa dibêje, *“Nêzî Qudsê nebe, an em ê werin û wan deran bi erdê re bikin yek”*, kesayetekî mîna Sallahaddîn sekan û maqûl bersîvek wisa hişk vala vala nedayiyê:

“Eger hûn şer dixwazin, ka de werin em li benda we ne. Heta berbanga roja qiyametê jî em ê we tîk bibin. Eger tiştêkî wisa jî

bibe, em nema qîma xwe bi van deran tînin, em ê behran jî derbas bikin. Kontrolkirina wan xakan jî wê Xwedê razî bike. Jixwe ti şervanên we yên ku li dijî me şer bikin jî nemane. Bi giştî şervanên we yên li vir, niha di bin qûmê de veşartîne.” Sallahaddîn Quds girtiye. Lê em dizanin ku; 9’ê Kanûna 1917’an dema Fermandarê Artêşên Îngilîzan Orgeneral Edmûnd Henry Hynman Allanby dikeve Qudsê, piştê jî dema heman fermandar dikeve bajarê Şamê, diçe ser gora Sallahaddîn. Û li gora Sallahaddîn Eyyûbî dide û dibêje, **“Rabe Sallahaddîn, em dîsa hatin.”** Ev ne gotinên wisa vala ne ku nameya Frîedrîch Barbarosa ya ku beriya hezar salan jî Sallahaddîn re hatibû nivîsandin jî gora Sallahaddîn re dixwîne û pehinê li gorê dide.

Piştî mirina wî wê Xanedaniya Eyyûbiyan parçe bibe, tevî salên dûvdirêj dimîne jî sala 1250 têk diçe. Dewleta Eyyûbiyan, ji hêla Kolemenên Tirkên (leşkerên kole) yên ku di artêşê de leşkerên bi pere bûn, di sala 1250 de tê bidawîkirin û li şûna wê jî Dewleta Memlûkan (Kolemen) a ku hikumdarên wê Tirk in, tê dameziran-din.

Beriya em vê beşê biqedînin, bi kurtahî em bibêjin ku, Xanedaniya Alamût Ziyar (870-1011), Xanedaniya Hamdanî (944-1039) û Begîtiyên Kakuveyh (1008-1119) û Kengarî (916-1090) ku agahiyên bi detay di dest me de nînin, di vê pêvajoyê de jiyane û heta astekê bandora wan jî çêbûye û her wiha di nav avahiyên proto-dewlet de cih digirin.


Dîsa kêm be jî em karibin navê çend wêjevanên Kurd ên ku di van sedsalan û beriya wê de jiyane bidin, dibe ku baştir bibe.

Behsa yekî tê kirin ku navê wî Anû Şîrvan Nûşîrvan e, P.Z. 400’î jiyaye û helbestên Kurdî nivîsiye. Helbestvanê bi navê Bas-samî Kurdî, bi zaravayê Goranî yê Kurdî nivîsiye. Salên 800’î jiyaye. Behlûle Mahî, tê gotin ku Hemedanî ye. Di salên 800’î de jiyaye. Pîr Şarîar jî di salên 900’î de jiyaye, hozanek e ku ji aliyê gel tê qebûlîkirin. Gilanî jî di heman sedsalê de jiyaye, ji ber ku xwendevanê Pîr Şarîar e, li hin deveran wek Pîr Şarîarê Duyemîn tê nasîn. Her wiha, Elî Herîrî yê Şemzînî (1009-1078), Baba Tahîrê Uryanî Hemedanî yê Hemedanî (935-1010), nivîskarê Ley-la û Mecnûn Nîzamî Gencevî (1141-1209), Şêx Hadî (1071-1162), nivîsînerê Gramera yekem a Kurdî (Kurmançî) Elî Teremokî

(1000-1056), Baba Bûzûrgî, Qazî Nebî, Ehmedê Caf, Kake Rida, helbestvan û wêjevanê herî mezin ê Kurdan Feqiyê Teyran (1303-1373) dikarin bêne rêzkirin. Li gel van, eger em navê hin rewşenbîrên Kurdan ên bi dîrokê re mijûl bûne jî bidin; Dawûd kurê Dawûd (mirina wî 896) ku wek Ebû Hanefî Ehmed Dîneverî tê nasîn, Ebûl Hesen Îzzeddîn Elî (sala 1160 hatiye dinyayê) ku wek Îbn El Esîr tê zanîn, Ebûl Bereket El Mubarek (sala 1169'an li Hewlêrê ji dayik bûye) ku bi navê Şerefeddîn Îbn El Mûstavfî Erbîlî tê nasîn, Îbn Halakan (1211'an li Hewlêrê bûye).

Di dîroka Kurdan de -wek yek ji qewmên ku neolîtîk bi kûrahî jiyaye- bandora jinê her tim pir zêde bûye. Pêşketina çanda feodalî, pêşketina Îslamê, her çiqaşî hewl dabe vê sekna xurt a jinê talî bike jî, jin li Kurdistanê her tim bûye xwedî seknek xurt. Minak, sedsalên 10. û 11. Dayê Tewrêze Hewramî ya ku li Loris-tanê jiyaye, jinên bi navê Celale Xanim û Reyhan, di wê sedsalê de rêveberên eşîr û begîtiyên xwe ne, bi taybet Dayê Tewrêze di nav nivîskarên jin de bûye jina yekem a ku bi zimanê Kurdî dinivîse. Dayê Hezanî Sergetî, di destpêka sedsala 11. de li başûrê Hewre-

manê jiyaye. Her wiha, Nergîz Xanim Şehrîzorî (Caf) a ku di sedsala 13. de jiyaye, Şemîne Xanim Caf, Fatma Lorî Goran (hevjîna Baba Tahir Hemedanî) û Mîladî di destpêka sala 1000'î de li Hemedanê jiyane. Her wiha Şeceret al Durr a ku di nav Eyyûbiyan de rolek girîng listiye jî divê were bibîranîn. Û helbet ji lîderên Tevgera Babaiyan Tahirê Qurretu-l Ayn jî em bi bîr bin. Di van sedsalan de Xatûn Meyzêrd û Dayê Xêzan navên nivîskarên girîng in.



Piraniya jinên ku navên wan li jor hatin hejmartin, di baweriya Yarsan de bûne xwedî rolên girîng. Bi vê wesîleyê ve bi kurtasî be jî em li vir behsa Yarsan an jî Kakayîtiyê bikin û daketina bi mijara xwe bidomînin.

Felekeddîn Kakayî, di xebata xwe ya **Ola Kakayî (Yarsan)** de wiha tîne ziman:

“Cewherê baweriya Kakayî ew e ku tevahî olan, çandan, neteweyan, ziman û rengan wek heyî qebûl dike, ji bo ti kesî, civakê, baweriyê nabêje nebaş e. Damezrînerên vê olê wisa ferman dane; ‘xwe nebaş û kêr, gel jî baş bibîne’; ‘gel’ dikare Kakayî be, komêk din a civakî jî... Ev şîret ji bawerî, dîtî û felsefeya Kakayîyan a ‘Donawdon’ (Kiras gorîn, Reenkarnasyon, ji nû ve hatine din-yayê) bi bingeş dibe.

Peyva ‘Kakayî’ hem kes hem jî komê îfade dike, ango ji bo Kakayîyan jî tenê gotina ‘Kakayî’ tê bikaranîn. Peyva Kakayî piranî li Iraqê tê ziman, yê li Îranê wek ‘Ehlê Heq tîn naskirin, li hin welatên din jî bi gotinên din tîn binavkirin. Wek nimûne li Afganîstan û Pakîstanê di wateya derwêştiyê de ‘Zikrî’ tê gotin.

Gotina Yarsan, Yaristan ji du beşan pêk tê. Ji van **“Yar”** yek ji navên Kakayîyan e, di heman demê de bernavkê (leqeb) Sultan Şahak e. Her wiha peyva **“Yanî”** ya tê wateya “hezkirin”, “dilovan”; di zaravayê Goranî (Hewramiya kevn) de yek ji navên xwedayan e. Ango, tê wateya “hogir” û “alîkar”. Wek tê dîtî “rehm” (dilovan) jî yek ji wateyên gotina “Yar” e. Ev giştî, nîşan didin ku baweriya Yarsan (Kakayî) xwe digihîne heta ji baweriyên herî kevnare Mehrperwerî-Mîtra (Perestiya Ronahiyê) û Zerdestiyê.

“Mehr” tê wateya roj, ronahî, hezkirin, xwişkî û biratiyê. Mîtra jî rastî ye, pêkanîna soza xwe ye û girêdayîmana rêzik û rêzan e.

Ev tişt me ber bi felsefeya Zerdest a ku qîmetek mezin dide ‘rastî’, ‘karê rast’, ‘gotina rast’, dibe. Ev felsefe dibêje ‘rastî, aşî yasaya cewherê cihanê ye.’

Kakayî, ji pirtûka xwe ya pîroz re dibêjin ‘Spî’. Em dibînin ku spiyên Yarsaniyan her vê dubare dikin: ‘Çar tiştan ji bîr nekin. Ev paqijî, rastî, dîlnizm û camêrî ye.’ Paqijî di her warî de di ziman,

fikrandin, tevger, cil û bergan, laş de paqijî ye. Camêrî û dilnizmî, fermanên mîna diloanî, xizmeta ji bo ol, welat û xwezayê, felsefeya Zerdeşt a ku dibêje 'fikrandina paqij, gotina paqij, karê paqij' îtîne bîra mirov. Li şûna gotina 'paqij' em dikarin peyva 'baş' bi kar binin ku wê di vê rewşê de jî ti guherînên wateyî nebe.

“San” beşa duyem a gotina **“Yarsan”** e. Wateya xwe **“sultan”**, **“mezin”**, **“pîroz”**, **“herêm”** e. Ji bo **Yaranî Sultan Îshak (Sehak)**, ku beriya 700 salan derketiye holê û baweriya Yarsan nû kiriye, **“San Sahak”** jî tê gotin.

“Yarsan”, **“Yaristan”** e. Ango, **“Herêma Yaranan”**.

Gotina Kakayî jî tê wateya **“xwişkî, biratî û alîkariyê”**. Erebiya wê jî **“Ahî”** ye.

Wateya gotina **“Ahî-Kakayî”** gelekî nêzî wateya peyva Yarsan e. Tevgera **“Ahî- Xwişkî û Biratîyê”**, tevgera li Hindistanê, Çînê û Rojhilata Navîn berbelav e ku kokê wê heta hezaran salan diçe. **“Ewaran”** ê ku nêzî **“Yaranan”** in, nimûneyek vê tevgera civakî ye.

Ji du milan ve ji Kakayîyan re **“Ehlê Heq”** tê gotin. Yek ji van gotina **“Heq”** a tê wateya Xwedê ye ku di pirtûkên wan ên pîroz Spiyan de her hatiye bikaranîn. **“Heq”** asta herî jor a îrfanê ye: **“Xwezanîn, zanîna Xwedê ye.”** Ya din jî ew e ku Kakayî şopdarên sofîtiyê ne ku dibêjin **“însan, ji çar merheleyên mîna şerîet, terîqet, marîfet û heqîqetê derbas dibe.”**

Felsefeya Yarsan an jî nêrîna wê ya cîhanê xwe dispêre du bingehên serekê. Yek ji van Donawdon (Reenkarnasyon), ya din jî di ronahiya Reenkarnasyonê de xuliqandina dinyayê, gerdûnê ye.

Li gor Reenkarnasyonê, ruh ji qalibekî derdikeve û derbasî yekî din dibe. Mirina zindiyekî, rêwîtiyeke ji alemekê ber bi alemeke din e. Ji ber ku dema zindî dimire, ruhê wî derbasî yan cinsê wî, yan nîjada wî yan jî qalibekî din dibe.

Kakayî, ji roja xilûqandina gerdûnî ve Reenkarnasyonê didin destpêkirin. Gerdûn ji roja ku afiriye, bi pêvajoya **“Donawdonê”** ve ango merhele bi merhele heta îro hatiye.

Kakayî wisa radigihînin; **“Ji ti kesî re nebêje nebaş. Ji ber ku em tenê dikarin rûyê mirov ê dîtayîse bibînin. Lê em nizanin ku bê**

*ruhê wî paqij e yan na, em nizanin bê ka ruhê wî di kîjan merhele-
ya paqijiyê de ye.”*


Yarsan ku me girtin dest, Ezîdîtiya di dîroka Kurdistanê de
xwedî cihekî girîng in û fermanên li hember Êzîdîtiyê hatine
pêşxistin girtina dest dibe ku di cih de be.

BEŞA ÇAREMÎN: EZÎDÎ Û FERMAN-QIRQIRINÊN LI HEMBER ÊZÎDIYAN HATINE KIRIN

Dîroka Êzîdiyan ji aliyekî ve jî dîroka komkujî û sirgûnan e. Kesê Êzîdîtî bi awayê olekê formule û reforme kiriye jî Şêx Hadî ye.

“Şêx Hadî bîn Mûsafîr ê sala 1075’an li Lubnanê gundê Betil Far (di roja me de Hirbet Kanafar e) hatiye dinyayê, di ciwantiya xwe de li cem Îmam Xezalî yê di mîstîzma Sofîtiyê de xwedî cihekî girîng e perwerde dîtiye. Abdulqadirê Geylanî yê bi eslê xwe Kurd e û damezrînerê terîqeta Qadîrî ye nas kiriye. Paşê bi xwarziyê xwe Şêx Hesên re ji Bexdayê li Geliyê Laleşê yê li derdora Mûsilê ye û di bin kontrola êlên Kurd ên Colemêrgî de bû bi cih bûye. Li gor hin çavkaniyan kalikên Şêx Hadî ji ber komkujiyên Îslamî yên li herêma Colemêrgê reviyane û çûne Lubnanê. Şêx Hadî paşê careke din vegeriyaye warên bav û kalên xwe, sentezeke mîtraîzm û Zerdeştîyê çêkiriye û Êzîdî li derdora xwe kom kiriye... (Zarokên Rojê Êzîdî, Mehmet Ozcan)

Şêx Hadî, hat herêma Laleşê zerdeştî di asteke girîng de bi awayê girêdayî cewhera wê nû kir û bi navê Êzîdîtiyê bi şewazê bîrdoziyeke berxwedanê ya nû bi pergal kir. Şêx Hadî û hevalên wî demeke dirêj li herêma çiyayî ya di navbera Colemêrg û Sincarê de man, hewl didan di nav civakên Kurd de Êzîdîtiyê belav bikin. Şêx Hadî bi têkoşîna xwe ya li hember dagirkeriyan, lehengtî û berxwedana xwe bû bi nav û deng. Ev bû sedem ku ji herêmê gelek mirovên muxalîf xwe bispêrinê û wî wek rizgarker bibînin. Ji ber bi xweşbînî nêzî mirovên xwe dispêrinê dibû Şêx Hadî ji aliyê van mirovan ve bi sîfetên wek “Mucahidê demê” hat binavkirin û sala 1162’yan li Laleşê wefat kir...” (Zarokên Rojê Ezîdî, Mehmet Ozcan)



Ola Îslamê di destê Abbasiyan de dema ket Sedsala 10. 11. gav bi gav hişk bû. Îslama bû desthilatdar û dewlet tevî ket rewşeke nikarîbû xwe nû bike rêya îçtîhatê girt û xwe ji nîqaşê re girt.

Abdullah Ocalan di xebata xwe ya Pirsgirêka Kurd û Çareseriya Neteweya Demokratîk de vê tespîtê dike: “Em dibînin ku beşê Kurdan ê li deştê li dijî asîmîlasyonê weke meyleke berxwedanê bi terîqetên tesewîfî radibe. Tesewîf bi şaxên xwe yên li derveyî dewlet û silteya Îslamî, bi aliyên xwe yên exlaq û wijdanê civakî, serwextbûneke kûrtir a Îslamê (Îslama Batînî) îfade dike. Bi awayekî giştî, civakparêziyeke Îslamî ye ku bi dewletê re nabe yek, ji desthilatdariyê ne xweş e, dixwaze bi wijdan, serwextî û hestiyarî Îslamê pêk bîne. Eger mirov Îslamê weke civakparêz û dewletdar-desthilatdar dabeşî du kategoriyên bingehîn bike, ev yek li gorî rastiya civaka dîrokî di cih de ye. Îslama civakparêz bi tenê bi tesewîfê dikare bê bicihanîn, jixwe bi awayekî berfireh rêxistîniya wê ya di çarçoveya terîqetên gelêrî de jî vê rastiye nîşan dide. Îslama civakparêz bi demokrasiyê re têkildar e. Li dijî Îslama bi lez dibe desthilatdar (mirov dikare ji vê re antî-Îslam jî bibêje),

rêxistiniya Îslamî ya civakparêz tesewif e; şêweyekî piştgiriya gel û penageha wî ye.”

Eger mirov bala xwe bidîyê li hemberî Îslama dewletê ya muhafizekar dibe, hem gel hem jî civakên cuda rêyek dîtin û hewl dan bijîn. Di vê çarçoveyê de di Îslamê de pêşketina mezheban bi mane ye. Dike asteke ku bi awayekî xwe îfade bikin. Mîna wê pêşketina terîqetan jî girîng e. “Tariq” di Erebi de tê maneya “Rê”. Terîqet jî pirjimariya vê peyvê ye û tê maneya “rêyan”. Peyva Mezheb ji fiîla “Zehebe” (Çûyîn) hatiye û di aliyê maneyê de dişibiyê. Terîqet ji bo tesewifê rê, mezhep jî ji bo şerîetê tê maneya rê. Terîqet ku xwe dispêre keşf û îlhamê, mezheb jî xwe dispêre “naqle” (pirtûkên pîroz û pêxemberan). Abdullah Ocalan di xebata xwe ya bi navê Pirsgirêka Kurd û Çareseriya Neteweya Demokratîk de wiha dibêje: **“Di civaka Kurd de êkolên tesewifi bi awayekî kûr û pir zêde pêk tên. Ev bi xwe nîşan dide ku navbera wan bi desthilatdariyê re xweş nîne. Damezrênerên gelek terîqetên tesewifê bi eslê xwe Kurd in, û ev jî têkiliya xwe bi rastiya wan a civakî re heye. Terîqet bi awayekî rêxistinên xweparastinê yên gel in. Sendîkayên çîna karker li dijî desthilatdariya kapîtalîst bi kîjan rolê radibin, di serdema navîn de bi heman awayî li cem civakên Rojhilata Navîn terîqetên tesewifi jî bi wê rolê radibin. Hem bi rola fikir û baweriyê, hem jî bi rola rêxistinên ekonomîk û rêxistinên parastinê rabûne.”**

Li ser esasê vê rastiya terîqetan eger em bêjin terîqet di demokratîkkirina civakê û heta nermkirina dewletê de rolekî girîng lîstine wê di cihê xwe de be. Lê belê kengî terîqet bi dewletê re bûn yek, xwe kirin nav desthilatdariyê yan jî dewletê destê xwe kir nav terîqetan, eger mirov bêje li wir jirêderketinek heta entegrekirina civakê ya bi dewlet û desthilatdariyê dest pê kir di cih de ye, bi heman awayî terîqet û mezhebên xwe kirine nav desthilatdariyê jî ji civakê dûr ketine jî wê ne şaş be.

Dema em wan tînin ber çavan wê bi hêsaniyê bê dîtin ku li Rojhilata Navîn bi taybet jî li Kurdistanê gelek terîqet pêş ketine. Mîna Qadîrîti, Neqşîbendîti, Refahîti, Nûhbagşîti, ku mirov dikare gelek terîqetan bîne ziman, eger mirov bêje Êzîdîti, Yarsantî û Elewîti yên xweserî Kurdan in jî pêş ketine wê ne şaş be. Civak ji bo li dijî zîlm û zextan li ser piyan bimînin, an wê eşkere li ber xwe bidin,

Li dijî zilm û zextan civak ji bo li ser piyan bimînin an wê eşkere li ber xwe bidin, -ev gelek caran hatiye maneya bi komî tunekirinê jî-, an jî bi awayekî rêyek peyda kirine hem xwe îfade kirine, hem jî bi pergala zorbekekar a heyî re bi awayê ku ne bi temamî di nav nakokiyên de bin rêyeke bijîn dîtine.

Heke em Êzîdîtiyê bi vî çavî bigirin dest û li tiştên rû dane binêrin dikare nêrînekê bi me bide qezenckirin. Helbet kokên Êzîdîtiyê heta dirokê diçe û dibe ku bi qasî Kurdan kokên wê yên dirokî yên kevin û kûr hene.

Du metnên pîroz ên Şêx Hadî pêş xistine hene. Yek ji wan El Celwe ye ya sala 1161'ê ku hatiye nivîsandin, pirtûka îzahatên xwedayî ye. Behsa “ol, terîqet, rê, rêbaz û toreyan dike”. Pirtûka din jî Mushefa Reş e ya sala 1342'yan hatiye nivîsandin. Di vê pirtûkê de behsa “çêbûna Cîhanê û Êzîdiyan” dike. Her du pirtûk jî bi zaravayê Kurmancî yê Kurdî hatiye nivîsandin.

“Wek kok Êzîdî; di pirtûka pîroz a Zerdeştîyê de bi heman maneya peyva di Avesta de ya Yazata, Yazdan, Yezdan (xweda, melek, tişt a mirov îbadetê jêre dike) de ye. Û Kurd jî vê peyvê di roja me de pir bi kar tînin. Êzîdî, di maneya Ezda (Ez-da) ango ez dam, ez afirandim de bi kar tînin.

Peyva Xwedêda di roja me de di nav Êzîdiyan de wek navê mêran jî pir tê bikaranîn. Dîsa di Dimilkî de Mazda (Maz-da)= yê em dan= di maneya Xwedê da de ku tê bikaranîn, di Kurmancî de Xweda (Xwe-da)= tê maneya Xwedê da. Ezda = yê em dan= Navê Xwedê yê herî mezin ku di Êzîdîtiyê de xwedî hezar û yek navî ye, Xweda ye.” “Êzîdîtî; oleke qedîm a Mezopotamyayê ye. Em dikarin bêjin oleke ku Mîtraîzm, Mazdaîzm û Zerdeştîyê jî di nav xwe de dihevin û sentez dike, ji olên yekxwedayî yên Îbrahîmî jî tesîr bûye...

Êzîdîtî mîna Yahûdîtiyê tenê ne malê neteweyekê ye. Ango Êzîdîtî ola qedîm a Kurdan e û ji derveyî Kurdan nebûye ola gelekî din...

Êzîdîtiyê dualîzma di Zerdeştîyê de heye bi yekxwedayetiye re sentez kiriye. Êzîdîtî oleke yekxwedayî ye. Xweda 7 melek afirandine û ev 7 melekên ku Tawisî Melek sermelekê wan e, wezîfeya afirandina cîhanê girtine ser xwe...

Di Êzîdîtiyê de sîstema kast heye. Li herî jora vê pîramîdê mîrtî heye. Bi rêzê; Mîrtiya Bavê Şêx, Şêx, Pîr, Feqîr, Mûrîd dişopîne.”
(Zarokên Rojê Êzîdî, Mehmet Ozcan)

Hinek kes ku radibin Êzîdîtiyê bi Yezîdîtiyê ve girê bidin, ev ji derveyî hewldaneke pûç û vala ne tiştêkî din e. Tu eleqeya Êzîdîtiyê ku bi Yezîdan re nîne, Êzîdî herî zêde ji aliyê van avahiyên ku Îslameke wer pêk tînin rastî komkujiyan hatine.

Damezrînerê Êzîdîtiyê Şêx Hadî ye, yê Êzîdîti pêş xistiye û belav kiriye jî Şêx Hesên e. Şêx Hesên ê Êzîdîti jî derveyî Îslamê terîf dikir, ji ber ji aliyê hêzên desthilatdar ên demê ve wek tehlûke hat dîtin sala 1221’ê li Mûsilê hat qetilkirin. Şerfeddîn ê kurê Şêx Hesên e û li ser bi dehan stran hatine gotin, jî di nav Êzîdiyan de xwedî bandor e. Şerfeddîn di êrîşên Mogolan ên li hember Êzîdiyan de tevî şer bûye û jiyan xwe ji dest daye.

Şêwazê qetilkirina Êzîdiyan di rastiye de heta roja me tê. 3’yê Tebaxa 2014’an qirkirina ku wek fermana 74’emîn tê terîfkirin di rastiye de ji aliyê hêzên desthilatdar ên jirêderketî ku Êzîdîtiyê wek ol qebûl nakin, wek derveyî ol hatine dîtin û hedefgirtin. Her çî qasî bi êş jî be em diyar bikin ku di gelek fermanên li hemberî Êzîdiyan de mirov hêzên serwer ên Kurdên Sûnnî dikare bibîne. Dîsa em destnîşan bikin ku li hemberî Êzîdiyan tunekirina herî berfireh û sîstematîk jî Osmanîyan pêk anîye. Fermanên li hember Êzîdiyan pêk hatine mirov yek bi yek bi rêz bike, tevî ku wê tiştên rû dane li ber çavan raxe, êşên rû dane kêm be jî ku wê veguhezîne roja me, mimkun e empatî çêbike.

“906: Waliyê Mûsilê Hamadanî hezar malbatên Êzîdî yên Îslamiyet qebûl nekirin qetil kir.

980: Hêzên desthilatdar ên li Mûsilê êrîşî Kurdên nemisilman ên li Colemêrgê kirine. Kurdên nemisilman an bi daran ve hatine daliqandin an jî serê wan hatine jêkirin û kirine qazoxan.

1107: Nêzî 500 hezar kes ji aliyê artêşên Îslamê ve hatine qetilkirin.

1245: Mogolî ketine Şehrezor, hilweşandine û bi hezaran Êzîdî qetil kirine.

1254: Begê Mûsilê Bedreddîn Lûlû, êrîşî herêma Şêxan kiriye û bi hezaran Êzîdî hatine qetilkirin.

1221: Şêx Hesên hat revandin û darvekirin. Dema Êzîdiyan xwe spartin herêmen çiyayî cihên wan ên pîroz hatin wêrankirin.

1415: Êzîdî ji aliyê misilmanên derdorê ve hatin qetilkirin.

1640-1641: Artêşeke ji 70 hezar kesî di bin femandariya Melik Paşa yê Waliyê Amedê yê Dewleta Osmanî bû, êrîşî Şengalê kir û li hember Êzîdiyan komkujî pêk anî.

1647-1648: Artêşa di bin emrê Waliyê Wanê yê Osmaniyan de êrîşî Şêxan kir û li hember Êzîdiyan komkujî pêk anî. Şêx Mîrza esîr hat girtin û hat darvekirin. **1715:** Waliyê Bexda yê dewleta Osmanî Hesên Paşa êrîşî Şengalê kir, Êzîdî qetil kirin û rêveberiya herême da Ereben Bedewî.

1733-34: Paşayê Osmaniyan Ehmed Paşa li hember Êzîdiyan li herêma Şengalê komkujî pêk anî.

1752-1753: Hêzên di bin femandariya paşayê Osmanî Silêman Paşa de êrîşî Şengalê kirin, gelek Êzîdî qetil kirin. Hêzên Osmanî yên gund û cihên pîroz ên Êzîdiyan texrîb kirin nêzî 2 salan li Şengalê man.

1767-68: Emîn Paşa yê Waliyê Mûsilê yê Osmaniyan artêşek ku kir bin emrê kurê xwe li Şengalê komkujî pêk anî.

1770-71: Dema Emîrê Şêxan Bedag li hember rêveberiya Osmaniyan li ber xwe da li Şêxan komkujî hat kirin.

1773-74: Waliyê Mûsilê Emîn Paşa, herêma Şengalê xera kir, hilweşand û komkujî hat kirin.

1779: Vê carê birayê heman waliyê êrîşî Şengalê kir û gelek Êzîdî qetil kirine.

1785: Waliyê Mûsilê yê Osmaniyan Ebd El Baqî êrîşî Êzîdiyan li Denenedî yê li Rojhilatê çemê Dicle ye kirin.

1786-87: Emîrê Şêxan Çolo li hember Waliyê Amediyê li ber xwe da, dema Çolo di berxwedanê de têk çû Êzîdî rastî komkujiyê hatin.

1789-90: Eşîra Tayy a Ereben Bedewî êrîşî Şengalê kir û komkujî pêk anî.

1790-92: Eşîra Tayy êrîşî herêma Şengalê kir.

1792-93: Waliyê Mûsilê Muhammed, 8 gundên Êzîdî yên li herêma Şengalê wêran kir.

1793-94: Waliyê Mûsilê Muhammed careke din êrîşî Şengal û Mîhîrîkan kir.

1794-95: Hêzên bi emrê Silêman Paşa ji Bexdayê hatin şandin, herêma Şengalê hilweşandin û talan kirin.

1799-1800: Ebd el Ezîz Tayy ê ji Bexdayê hat şandin tevî Bedewiyên xwe bi alîkariya eşîrên Erebiyê weke Obeyd û Hamdan li Şêxan 25 gundên Êzîdiyan şewitand û wêran kir.

1802-1803: Waliyê Mûsilê Elî Paşa êrîşî Şengalê kir. Di vê dorpêç û êrîşa bi mehan berdewam kir de bi dehan Êzîdî hatin qetilkirin, erdên wan ên çandî hatin texrîbkirin, dar hatin jêkirin an jî şewitandin.

1809-1810: Waliyê Bexda Silêman Qatîl bi hêzeke di bin emrê efser Husên Dublayîn de êrîşî Şengalê kir, Balad, Şengal, Mîhîrîkan û gelek gundên li Bakur ku talan kir komkujiyeke mezin li hember Êzîdiyan pêk anî.

1832: Emîrê Botanê Bedîrxan Beg êrîşî herêma Şêxan kir. Elî Beg esîr hat girtin û bi êşkenceyê hat qetilkirin. Gelek Êzîdî hatin qetilkirin. Li nêzî ava Dicle rêya Êzîdiyên ji Şêxan direviyan çiyayê Şengalê hat girtin û hatin qetilkirin. Gelek Êzîdiyên xwe avêtin ava Dicle da ku derbasî aliyê din bibin li ber avê çûn û fetîsîn. Heman Bedîrxanî piştî 12 salan vê carê êrîşî Êzîdiyên Tûrabdîn ango yên Midyadê kirin û misilmantî li ser wan ferz kir.

1832-33: Mîr Muhammed Rewanduzî êrîşî Êzîdiyên li herêma Akra kir. Her wiha Êzîdiyên li herêma Zapê jî qetil kir. Paşê sala 1834'an êrîşî herêma Şengalê kir û komkujiyê pêk anî û Mîr Elî Beg ê misilmantî qebûl nekir bi êşkenceyê qetil kir. **1836:** Waliyê Amedê Reşîd Paşa bi artêşeke 40 hezar kesî ku Kurdên Misilman jî di nav wan de bûn li hemberî Êzîdiyên li Rojhilatê Amedê û yên li Xerzanê êrîşî pêk anî. Li dû wê êrîşî Cizîrê, Telafer û Şengalê kir. Di wan êrîşan de bi hezaran Êzîdî hatin qetilkirin, bi sedan esîr hatin girtin û weke koleyan hatin xebitandin. **1838:** Vê carê Hafîz Paşayê hat şûna Reşîd Paşa bi armanca bidestxistina Şengalê êrîş kir. Zilam û xortên Êzîdiyan hatin qetilkirin, jin û zarokên wan esîr hatin girtin û birin Amedê.

1846: Waliyê Mûsilê Tayyar Paşa meha Cotmehê êrîşek bir ser Şengalê, gelek gund şewitand û wêran kir.

1853-1856: Di dema şerê Osmanî-Qırım de Yezdan Şer ê xwarziyê Bedirxan beg ku serhildan da destpêkirin, Êzîdiyên li Sêrt û Serhedê piştgirî danê. Ji wan Êzîdîyan bi sedan kes hatin qetilkirin, piraniya wan bi qebûlkirina misilmantiyê re canê xwe xelas kirin. Beşek ji wan jî li ser bakurê Îranê re xwe spartin Ermenîstanê.

1856: Êzîdiyên bi hin eşîrên li herêma Çiyayê Dêrsimê re li hember serweriya Osmanî serî rakirin, piştî serhildan bi ser neket, bi Kurdên Dêrsimê re rastî komkujiyê hatin.

1872: Waliyê Bexda Mîthat Paşa ji bo Êzîdî leşkeriyê ji dewleta Osmanî re bikin biryarek derxist. Êzîdiyên li Başûrê Kurdistanê li hember vê biryarê derketin û gotin ku qebûl nakin. Rêveberiya Şêxan a ev weke sedema îsyaneke dît êrîşî ser Şêxan kir, gundên Êzîdîyan hlweşand û şewitand.

1877: Dema li hemberî Êzîdiyên li Amed û Xerzanê êrîşeke nû pêk hat, 3 hezar Êzîdiyên di bin berpirsariya Elî Beg de koç kirin û li Alexsandropolê bi cih bûn. Elî Beg xwarziyê Mîrza Beg ê serokê Eşîra Anqosî bû û hatibû qetilkirin e.

1879: Eşîra Sîpka ya di bin berpirsartiya Emer Axade sirgûnî Qersê hatin kirin. Heta sala 1897'an zêdetirî 15 hezar Êzîdî yan koç yan jî sirgûnî Qafqasya hatine kirin. Ev hejmar di nîvê Şerê Yekemîn ê Cîhanê sala 1916'an de zêde bûye û gihiştiye 40 hezarî.

1890: Li hemberî Êzîdiyên Başûrê Kurdistanê yên li dijî politikayên zext û zilmê yên Osmanî disekinîn, tevgereke îmhayê hat lidarxistin. Bi sedan Êzîdî hatin qetilkirin, bi sedan malbat neçar man koç bikin.

1892: General Emer Wehbî Paşa, biryarek derxist ku hewce ye Êzîdî hemû yan bibin misilman an jî oleke ku di Quranê de heq e hîlbijêrin û bi vî awayî zemîna komkujîyeke nû li hember Êzîdîyan amade kir. Dema li hember Êzîdiyên misilmantî qebûl nekirin rastî komkujiyê hatin hin Êzîdî bi zorê be jî neçar man misilmantiyê qebûl bikin. Li hember Şêxan û Şengalê êrîş hatin lidarxistin. Li dû van komkujîyan 14 hezar Êzîdî neçar man misilmantiyê qebûl

bikin. Alavên wan ên pîroz birin Mûsilê. Yekîneyên girêdayî Emer Wehbî Paşa êrîşî Laleşa li Şêxan kirin, cihên pîroz û gorên li wir texrîb kirin. Tevî senceqa Êzîdiyan a li Laleşê dest danîn ser gelek alavên pîroz ên olî û dîrokî û birin Mûsilê. Li aliyê din li Laleşa cihê pîroz ê Êzîdiyan medreseyên Îslamî hatin vekirin. Îbadetên Êzîdiyan û peyva Êzîdî hat qedexekirin.

Paşê General Emer Wehbî Paşa senceqa biribûn Mûsilê bir Stenbolê. Ev senceq (Îkona Tawisî Melek) dema ji aliyê Tahir Ozçelik ê yek ji neviyên General Emer Wehbî Paşa ye, 18.10.1967'an li muzeyedeyê ji bo firotinê hat nîşandan dewleta Iraqê bi gotina “Ev berhema dîrokî aîdî me ye” protesto kir.



Senceq (Tawis) a biribûn Mûsilê

1911: Osmaniyan bi destê General Farûq Paşa tevî li hember Êzîdiyan li ser Ermenî, Nastûrî û Qizilbaşan jî komkujî pêk anîn.

1914-1918: Di Şerê Yekemîn ê Cîhanê de dema komkujîya li hember Ermeniyan hat destpêkirin, 20 hezar Ermenî ji komkujiyê revîyan û xwe spartin

Êzîdiyên li Şengalê. Ji ber Êzîdiyan ev Ermenî radestî leşkerên Osmanî nekirin, artêşa Osmanî Sibata 1918'an bi eşîrên Bedewî yên Ereb û eşîrên Kurd ên Misilman re êrîşî Şengalê kirin. Û li hember Êzîdiyan komkujîyeke nû pêk anîn.

Di vir de mirov vê xisûsê jî diyar bike wê bi feyde be; **piştî mirina Elî beg Meyan Xatûn a wezîfeya mîrtîyê ji neçarî nêzî 40 salan bi rê ve bir, sala 1914'an li Mûsilê di encama hin hevdiştinên zor û zehmet de bi ser xist ku Êzîdîtî bi fermî wek olekê bê qebûlkin.**

1918: Êzîdiyên ji ber komkujiyên dewleta Osmanî revîyan Ermenîstanê li wir jî rastî êrîşa Osmaniyan hatin.

1940: Leşkerên girtin ser gundê Kiwexe yê girêdayî navçeya Hezex a Mêrdînê (di roja me de girêdayî Şirnexê ye) 29 Êzîdî kirin

şıkeftêkê û ew bi zindî şewitandin. Ev gund paşê 3 carên din jî rastî serdegirtina leşkeran hat û di her serdegirtinê de gelek Êzîdî hatin qetilkirin.

2007: Di meha Tebaxê de di komkujiya li Siba Şêx Xidir û Tiplezer de li gor hejmara fermî nêzî 500 Êzîdî hatin qetilkirin.

2014: 3'yê Tebaxê ku êrişên DAİŞ'ê dest pê kirin û Êzîdiyên ji aliyê hin kesên digotin Kurd in û hêza parastinê ne hatin terkkirin, rastî komkujiyê hatin. Bi hezaran hatin qetilkirin, bi hezaran jin hatin desteser kirin û li bazaran wek kole hat firotin. Bi sedhezaran Êzîdî neçar man Şengalê terk bikin. Ev qirkirina ku wek Fermana 74. hat terîfkirin di asta fermana herî mezin e ya hatiye serê Êzîdiyan. (**Zarokên Rojê** Ezîdî, Mehmet Ozcan)

Mehrdad Îzady, îdîa dike ku ku hê berî niha bi 150-200 salî bi giranî bi ola Êzîdîtiyê ve girêdayî ne, lê ji ber komkuji, qirkirin, sirgûn û bi darê zorê ku dikirin misilman di asteke zêde de hatin tesfîyekirin. Li jor hin fermanên hatine serê Êzîdiyan hatine destnîşankirin. Ev fermanên bi qismî be jî hatine destnîşankirin nêzî rastiya îdîaya Mehrdad Îzady e.

a) Hatina Tirkan a Anatolyayê û Şerê Melazgirê

Bavikên Tirkan ji sedsala 7'emîn û şûn ve ji ber hişkayî, zêdebûna serjimêriyê û hwd. ên li Asyaya Navîn, dest bi koçkirinê kirine. *“Tirk bi rengê belavkarê Îslamê xwe xistin nav rastiya herêmê. Bavikên Tirkan ên nikaribûn bi avahiyên xwe yên paşve-mayî ti tişteki bikin, li ser bingeha tundiyê cih ji xwe re vekirin. Û bi tundiya xwe roleke hilweşîner listin. Ji bo feodalîzmê ku di demek kurt de ketibû nabosê (rê û kuçeya ku dawîya wê girtî ye), bûn xwîna nû.”* (**Tevgera Gel-Serhildan**, Weşanên P.M.O)

Abdullah Ocalan wiha dinirxîne: **“Di sedsala 7'emîn de êdî civaka komunal a seretayî derbas dikan. Xwe digihînin nîzamek eşîrê ya pêşketî, federasyonê û ji bo civaka çînî bibihurin jî di her warî de merheleyek diyar temam dikan. Ha, tam li vir wek tê gotin, hişkayî, zêdebûna nifûsê, lê li gor min jî herî diyarker, êdî ji ber xwe gihandine gelek erkên ku dikarin xwe mîna dewletê bi rêxistin bikin, nema li vir (Asya Navîn) hiltên... Dema Îran û her ku biçe Rojhilata Navîn tê gotin, wek dengê**

welatê çîrokan ê xweyî tevahî dewlemendiyan tê fêmkirin, ji ber vê jî aliyekî wê ye mûazzam ê kêşîner heye. Tew îcar em vê bi neçariyên wan ên erdnîgarî û demografîk re bikin yek, eşkere ye ku wê koçên di vê seferê de muthîş bin. Û jixwe koç pêl bi pêl dest pê dikin.” (A. Ocalan-Mihri Bellî, **Veguhertina Mezin**)

Wek me li jor behsê kir, her çiqasî sedema êrîşên împaratoriyan xurt ên li ser Kurdistanê cur bi cur bin jî, ji ber bi bandor nebûn, li Kurdistanê bêgîtiyên xwecih, heta di asta hê jortir de avahiyên ku teqabulî dewletê dikin, derketine holê.

Tirk, dema ku rîyê ji bo xwe li rojhilat vedikin, bi taybet jî ji Xorasanê ber bi hundirê Îranê ve berbelav dibin û berê xwe didin rojava, cih bi cih hatine dijberî Kurdan. Kurdên ku di esas de xwedî tîkiliyên hê xurttir ên civakî ne, di heman demê de di warê leşkerî de xwedî bandoreke berbiçav in. Lê, piştî periyodeke ne dûvdirêj, tîkiliyên Kurd û Selçûkiyan –bi gotinek hê rasttir hevkarî- germ dibe. Lê, ji ber van tîkiliyan di merheleya destpêkê de bi temamî destûra mayindebûnê nedidan û dema Selçûkiyan jî fêm kirin ku wê nikaribin li ser Kurdistanê tam hakim bibin, herêmen ku destpêkê hilibijartin, qadên li derveyî Kurdistanê bûn. Di destpêka van qadan de ku Tirk dikevinê û desteser dikin, Xorasan, Îran, Azerbaycan û bi qismî jî beşên jêr ên Başûrê Kurdistanê tên. Li vir cihê ku yekem digirin jî Mûsil e. Her çiqasî di hundirê Kurdistanê de hin cihên din jî kiribin hedef, di encam de tîk diçin. Di demên pêş de, wê Împaratoriya Selçûkiyên Mezin (1055-1194) bi pêşengiya Tûgrûl Beg de ji hêla bavikên koçer ên Ogûzên Tirk ên şerker bê damezrandin.

Sala 1070'an, Alparslan artêşek mezin berhev dike. Hedef jî Bîzansî ne. Di nav vê artêşê de wê Kurd, Azerî û gelên herêmê, li gel nijdevanên hatine Anatolyayê cih digirin. Sirê serkeftina Alparslan ê ji ber nêzîkatiyên pêşdîtî û bihizyar ew e ku dizane eger dixwaze li dijî Bîzansiyan şerekî serkeftî pêş bixe, ev girêdayî desteka Begên Kurd ên xwecih in ku li herêmê gelekî çalak in. Û bi nêzîkatiyek polîtîk a li gor vê, di serî de Farqîn, piştgiriya begên Amedê digire. Û êdî dibe xwedî artêşek ji 40-50 hezar kesî. Herî kêr nîvê van Kurd in. Merwanî, tevî Melîkê Cizîrê Abdûl Xan û birayê wî Îskender jî bi giştî nêzî 30.000 hezar kesî ji bo vî

şerî dişînin. Alparslan ê ku destpêkê xwe li beramberî Bîzansiyan dida paş, êdî ji bo şer amade ye.

Bijartiye rêveberiya Bîzansê, generalekî xwe yê serkeftî yê bi navê Romanos Dîogenes ê Kapadokyayî, di sala 1068'an de bi jinebî qralîçe Eûdokîa Macrembolîtîssa re dizewicînin, dikin Împarator û dişînin bi ser koçberan de ku piraniya xwe Tirkmen in. 26'ê Tebaxa 1071'an, artêşên Bîzansiyan û artêşa Alparslan ku ji Kurd û Tirkan pêk tê, tên beramberî hev. (Alp tê wateya şervanê siwar, şovalye). Fermandarê Bîzansiyan jî Dîogenes e. Cihê ku tên beramberî hev jî Geliyê Melazgirê ye ku li bakurê Gola Wanê û Çiyayê Sîpanê ye. Tifaqa Kurd-Tirkan, wê rêya Tirkan veke ku bikevin Anatolyayê û bibin xwedî warekî. Wê demê, li cihên ku Misilman lê dijîn ji bo xwebicîhkirinê gelek eraziye vala jî nînin. Tirkên ku Îslam qebûl kirine, pêwîst e bi alîkariya qewmên misilman ên li herêmê –eger bixwazin bijîn- berê xwe bidin rojava. Ev ji bo li vir bimînin, mîna têkoşînek man û nemanê ye. Ha, di van demên man û nemanê de Kurdan dest dane Tirkan, ji bo bibin xwedî war jî bûne alîkar. Wek çawa cîhana Îslamê ji xeteriyek mezin rizgar dibe, tîkiliyên Kurd û Tirkan jî hê bêhtir germ dibin. Eger em bi vegotînek din a Abdullah Ocalan bînin ziman; **“Nave-roka tîkiliyên Kurdan bi qewm, begîtî, sultantî û ezbetên Tirkan re rast neyê fêhmîkirin, dîroka heyîna her du civakan wê rast neyê nivîsandin. Divê mirov baş fêhm bike ku Kurdan bi Tirkan re tîkilî danîn, ne ku ji bo hebûna wan bê asîmîlekirin an jî bi zora eskerî bikevin tehlûkeyê, berevajî ji bo bi hev re bergirî û pêşdebirina hebûna xwe bikin ev stratejiya hanê qebûl kirin.”**

Navenda Dewleta Selçûkiyên Anatolyayê ya ku wê dûvre pêş bikeve, dê bibe Konya. Di vê fetlanoka dîrokê de, bi taybet jî piştî 1240'î û şûn ve em dizanin ku berxwedanên zehf mezin çêbûne. Yek ji van navendên berxwedanê jî Semsûra îro ye. Berxwedana Baba Îlyas wê wek Îsyane Babaî di dîrokê de cih bigire. Berxwedanên Baba Îshak û Celalî bi giştî wê bibin îsyane li dijî Dewleta Selçûkiyên Anatolyayê ya zextker û zorbe. Berxwedan, di cewher de wê bibin berxwedanên li dijî bêdaletiyê, zorbetiyê û dewleteke her ku diçe dibe çîna jorîn, serdest û di warê exlaqî de hilweşiyayî. Pir eşkere ye ku ev çanda berxwedanê ji kevneşopîya

Mazdekan, Hurremian, Ebû Musluman, Babekan, Zencan heta Karmatiyan e. Gotina Baba Îlyas a “**Mulkê dinyayê yê gel e**” vê rastiye datîne ber çavan. Dema tê gotin Baba Îlyas ji Xorasanê hatiye û Elewiyekî Tirkmen e, rastiya fena vê jî ew e ku di nav eniya berxwedanê de ku ji Semsûrê heta Amasyayê berfireh dibe, her cure avahiyên demokratîk û komunal di nav xwe de dihevin. Em vê jî lê zêde bikin ku ji nimûneyên herî baş a hevpariya gelan e.



BABA İSHAK

Komunalîstekî din ê ji heman xetê, lê vê carê xeta çalakiyê jî bi pêş xistiye, Şêx Bedrettîn e. Şêx Bedrettîn ê ku mabeyna salên 1357 û 1420'an de jiyaye û têkoşîna xwe ya bêhempa li bajarokê Ortaklar ê nêzî Aydinê û derdorê Îzmîrê nişan daye. Jiyanek hevpar a wê bi salan dewam bike saz kiriye. Bi gotina, “**Ji bo ku em bibêjin ji bilî hinarikên yarê li her derê, di her tiştî de, bi hev re**” pir eşkere ye ku maneya jiyana hevpar, komun bi awayekî herî baş formule kiriye. Mîlekî wî Borkluce Mûstafa, yê din jî Torlakekî wêrek ê bi navê Torlak Kemal e. Ji bo xetek komunal, jiyanek xwişkî û biratî, jiyana bi hev re ya gel û mezhebên cuda, tecrube-yeke wisa ye ku îro jî dikare bibe minak.

b) Mîna Kuliyan Dagirkeriya Moxolan a li ser Herêmên Kurdan (1206-1404)

Moxol, wek hêza herî bêrehm a dirokê têne zanîn. Eger em bibêjin ji rêbazên ku Asûriyan pêk anîne ne kêmtir in, wê ne mu-balexe be. Mîna komên kuliyan, di ku derê re bihurîne ew der xwarine-pelçiqandine û derbas bûne.

Beriya ku ev hêza nû bigihêje Kurdistanê, navê hêzek din a ku li vê erdnîgariyê dibe sedema texrîbatên mezin jî Harzemî ne. Di sedsala 12'emîn de bi giranî li ser erdnîgariya Tirkistan û Îranê serwer dibin. Sala 1217'an êrîşê Bexdayê kirin. Şerê Kurdan kirin. Hin caran bi ser ketin, hin caran têk çûn. Zerarên pir mezin dan Mûş û Xelatê. Sala 1230'an bi berxwedana hevpar a Eyyûbî û Selçûkiyan ji holê rabûn.

Di vê demê de ku Kurdistan hê nû bi nû Tirkan dinase û li ser Anatolyayê êrîşên Tirkan dewam dike, li qada Rojhilata Navîn hêzek nû diyar dibe. Ev hêza nû ya dagirker ku feodalîzma koçberiyê bi xurtî dijî, wê her derê mehf bikin. Piştî ku ji van xakan çûn bi sedan salan jî, wê ji fermanدارên qetlîamker Hulagû bi xof were ser zimanan. Heta neyê bilêvkirin nayê derbaskirin; Heman Hulagûyî dema Kelha Alamûtê bi erdê re kiribû yek, pirtûkxaneya dirokî jî şewitandibû. Navê hêza ku wisa tirs kiribû mejiyê gelan, Moxol in. Hêza ku heta roja me jî bi dehan eşîrên Kurd ji xakên wan kiriye û bi hezaran kîlometre dûr ajotine, diya Moxol in. Mînak, eşîrên Levan û Baben ên li Cezayîrê dijîn, tenê du eşîrên Kurd in ku neçar mane ji dora Şehrezorê birevin. Her wiha eşîrên Kûs û Mabîr ên li Şehrezorê dijiyane jî neçar mane bi Sûriye û Mîsrê ve birevin. Bi kurtasî, Moxolan tenê li Kurdistanê qetlîam nekirine, her wiha li van xakan jiyan jî li Kurdan herimandine.

Dema Moxol dikevin Rojhilata Navîn, destpêka salên 1200'î ne. Hatina wan a Kurdistanê jî di sala 1231'an de ye. Navê din ê vî Hulagûyê dagirker ê bêrehm Cengîz Xan e. Di demek kurt de li her derê belav dibin, desteseriyê dikin. Hulagû wê sala 1257'an Kirmanşanê dagir bike. Fetha wî ya herî girîng jî sala 1258'an dagirkirina Bexdayê ye. Tê gotin, dema pirtûkên li pirtûkxaneya Bexdayê ku ji pirtûkxaneyên mezintirîn ên cîhanê ye, diavêjin ava Dîcleyê, bi hefteyan ava Dîcleyê reş diherike. Mîna li her derê, dema bajarên dorpêçkirî li ber xwe didin, qetlîamên herî hov bi ser

de anîne. Di nav bajarên Kurdan de ku wê piştî fetha Bexdayê bi erdê re bikin yek; Colemêrg, Cizîr, Farqîn, Amed û Mêrdîn hene. Hin dever ne tenê carekê, çend caran hatine wêrankirin.

Karesatek hemreng bi serê malbata Xelîfeyê Abbasiyan de jî tê. Gelek endamên malbatê têne kuştin. Yên mane jî hewl didin li Misrê xelîfetiye bidomînin. Piştî bajarê Bexdayê digirin, dor tê bajarên mezin û bi heybet ên hawîrdorê. Di nav van bajarên Kurdistanê de, bajarên mîna Hewlêr, Farqîn, Mêrdîn, Bedlisê jî hene. Hin deveran bi erdê re dikin yek –Amed, Xelat, Şehrezor-, hin deveran jî bi lihevkinê desteser dikin. Cih bi cih li deverên fetihkirî rêveberên xwecih tayîn kirine. Her wiha, carinna ferdên ji heman malbatê wek parêzgerên girêdayî xwe li pey xwe hiştine. Wezîfeya van ew e ku wê ji bo Moxolan bacê kom bikin û nixên nû li ser zêde bikin. Ev bûye rêyek her dagirkerî ku ji mêj ve li ser Kurdistanê pêk tînin. Û wek her dagirkerekî kiriye jî li pey xwe kole yan jî kesekî heman ên ku qencî bi wan kiriye, mîna parêzger hêlane. Wek mînakên wê yên pratîk jî em dikarin bêjin li Farqînê seyîsê emîr, li Cizîrê jî yekî kole wek rêveber hatine tayînkirin. Helbet ev her tim wisa nebûye. Eger li cihekî berxwedan çêbibe, li wir bi awayekî xwînwarî şewitandin, hilweşandin û hovîti pêk hatine. Wehşetek wisa bi ser de tê ku, li gelek deverên ku Moxol nêz dibin, Tirkmen jî, Mîrîtiyên Kurdan jî bi diyariyên biha û kelûpelên din ên bi nîrx wan pêşwazî dikin û hewl didin ji vê aqûbetê rizgar bibin.

Avahiya Kurd a dîrokî wê di pêvajoya Moxolan de jî bixebite. Ji bo rewşa xwe ya otonom biparêzin, gelek caran xwe dane milê Moxolan, li dijî nîjada xwe sîxurî kirine, heta seknek wisa ya îxanetê raber kirine ku ji bo dijmin nîjada wan îmha bike jî pêşengî kirine. Berjewendiyên wan, her tim hema her tim wek lêgerînek sereke ya jiyanê mîna karakterekî serwerên Kurd ketiye nav xwîna wan, bûye gen. Her ku îxanet û hevkarî bûye jiyanek, her çiqaşî nixên exlaqî bên ziman jî, lê wisa veguheriye ku her kêlî dikarin bêne terikandin. Ya girîng ew e ku tenê bila karibin xwe bidin jiyandin, hew bila wek rêveber bimînin, bi kê ve girêdayî ne, çawa girêdayî ne, qet ne xem e. Ya girîng wek me got berjewendiyên serwerên Kurd bi xwe ne. Abdullah Ocalan wiha behsa vê rastiye dike: **“Encama jidestdana zîhniyet, estetîk û maneya civakî**


bêhtir xeternak e. Di rewşeke wisa de mirov dikare behsa rewşa zindiyên serê wan hatine firandin û bi tenê di cihê xwe de dipêrîtîn bike. Civakeke ku cîhana xwe ya estetîk û zîhnîyetê ji dest daye, dişibe berateyekê ku ji rizînê re, bi awayekî hovane ji parçebûn û xwarînê re hatiye terikandin.” (A. Ocalan, Pîrgîrêka Kurd û Çareserîya Neteweya Demokratîk)



Ber bi salên 1400’î ve wê carê jî wê Tîmûrlenk (1370-1405) derkeve ser dikê. Tiştên ku pêşiyên Moxolan kirine wê carê jî wê Tîmûr bike. Kurdistan wê ji serî heta binî bê dagirkirin. Wê hinan bipelçiqîne, hinan li cem xwe bigire û xwe li vir xurt bike. Bi taybet jî di sala 1394’an de bi dagirkirina Bexdayê ve wê xwe li teva-hiya qadê berbelav bike. Wê

tenê Kurdistanê dagir neke, berê xwe bide Dewleta Osmaniyan jî ku wê demê hêdî bi hêdî mezin dibe. Di sala 1402’yan de wê li Enqereyê Padişahê Osmaniyan Beyazîd dîl bigire û nav û dengê xwe belav bike.

Meylên Bêgîtiyên Kurdan ku wek behsa wê hat kirin, mîna elimandinê û di genan de bi cih bûye xwe dide rexê dijmin, di van salan de jî ne kêm in.



Ecêb e, lê îro rewşa li Başûrê Kurdistanê jî karaktereke ji heman vehûnê ye. Wek marîfeteke mezin dîtine ku dema Iraq tê dagirkirin, li rex emparyalîstan cih digirin, heta wek lejyonerên wan êrîşî gelên cîran ên li ser heman xakê jiyane, dikin. Nêzîkatiyek bi heman rengî jî li beramberî dewleta Îsrâîlê ya li herêmê hêzek madî û leşkerî ye, tê kirin. Avahiyek eynî ye ku pêkûtiyên li ser gelê Filistînê nabîne, lê pêwendiyên li ba Îsrâîlê pîroz dike. Ev avahî esas karakterek wisa ye ku her tim li cem ê xurt cih digire yan jî hewl dide wisa bi cih bibe. Ew diyardeya ku em dibêjin dema ku hêza wî têrê kirê dipelçiqîne, diqedîne; têrê nake jî destan radimûse, ji vê avahiya dîrokî xwedî dibe. Ji ber vê ye ku destpêkê divê ev vehûna dîrokî bê helkîrin.

Gelek ronakbîrên cîhanê ji me re dibêjin ku êrîşên Moxolan paşketina Rojhilata Navîn dilezîne, her wiha Ewropa jî ji vê firsendê sûdê werdigere, kapîtalîzmê dide destpêkirin û gav bi gav li cîhanê dibe hêza herî mezin a zilmê.

Di Sedsalên 15-16'an de Pêwendiyên Osmaniyan û Kurdan

Di vê demê de, bi taybet jî pêvajoya piştî sedsala 10'emîn, Konfederasyonên mabeyna eşîran, organîzasyonên karakterîstîk ên demê ne. Ji ber sedemên ewlehî û aborî, bi şertê ku eşîr avahiyên xwe yên hundirîn biparêzin, tên ba hev û konfederasyonan saz dikin. Mîrîtî, dema ku konfederasyon tên cem hev, ava dibin. Mîrîtî, ne tenê yekîtiya çend konfederasyonan e, di nav xwe de rêxistinbûyînek tevdeyî ye. Rêxistinek proto-dewletê ye ku çînen wê yên xwedî saziyên jorîn ên taybet, xweser hene. Mîrîtiyek, çiqas konfederasyonan di nav xwe de vehewîne, ewqasî bi bandor e. Eşîrên koçer, di nav mîrîtiyan de di warê hejmar, ast û tevlibûna rêveberiyê de ji hev cuda ne. Ji ber ku ev eşîr li gor tarzê jiyana xwe xwedî taybetmendiyan leşkerî ne, piranî bûne hêza leşkerî ya Mîrîtiyan.

Pêvajoya 1514-1516'an, ji bo Kurdan bûne salên nûbûnan. Di van salan de serûbinbûyîn çêdibin û gelek elimandin diguherin. Em van salan wisa dizanin ku Osmanî û Kurd nêzî hev dibin. Yavûz Sultan Selîm û Şêx Îdrîsî Bedlîsî tifaqê îmze dikin. Osmaniyan di rêjeyek mezin de berê xwe dane Rojava. Lê, Safewiyên ku li rojhilat xwe bi hêz kirine, tirs û xof kirine nav dilên Osmaniyan.

Ji bo bigihêje asta hêzek cîhangîr, wê demê pêwîstiyek e ku ew xakên ku her tim dikare nerehetiyê çêbikin jî karibe kontrol bike. Û em dizanin ku bi lihevkerin û tifaqên van salan wê Osmanî bibe hêzeke cîhanê. Piştî Kurdistanê, Bexda û dûvre jî heta Kahîreyê wê xwe berfireh bike.

Rêbertiya (Şêxîtiya) Şîayan ku ji ber serpûşê (kum) sor didan serê xwe wek Qizilbaş (Kumsor) dihatin nasîn, derbasî destê bavê Şah Îsmâîl (1487-1524) ku wê di demên pêş de hîmê Xanedaniya Safewiyan daye, dibe. Hê Îsmâîl yek salî bû, bavê wî di şerekî de ku li dijî kesên xweyî baweriya Sunnî pêk tê, dimire. Dema ku Îsmâîl dibe 14 salî, di nav koma Qizilbaş de şûna bavê xwe digire. Îsmâîlê ku di heman demê de rêberê olî, Şêx e, sala 1501'an berê xwe dide Tebrîzê, paytexta Konfederasyona Eşîrên Akkoyûniyan ku ji yekîtiya eşîrên Tirkmen û Ozbekan saz bibû. Vê derê bi dest

tîne û xwe wek Şahê Tebrîzê îlan dike. Şah Îsmâîl sala din, di 1502'yan de giştî Azerbaycanê kontrol dike û bingeha Dewleta Safewiyan a Îranê ku wê heta sala 1736'an dewam bike, datîne. Beriya ku em bidomînin têkildarî Kurdbûyîna Safewiyan em çend hevokan lê zêde bikin:

“Binemala Safewiyan ku kok, kevneşopiyên wan ên siyasî û pozîsyona wan nehatîyê fêmkirin, wek tê zanîn li kevneşopiya qedîm a Persan zehf biyanî ne. Ji bo Îraniyan, li gor rola wan a “neteweyî” ti bîranînên siyasî nehiştine. Malbata Safewiyan, ji çaxê Moxolan ve dihatin zanîn. Bavikê ku navê wî li binemalê hatîye kirin, Şêx Safiuddîn Îshak Erdebîlî ye û ji nivîsyarên terîqeta bi navê “Safvat al-Safa” tê fêmkirin ku Kurd e.

Tirkbûyîna Safewiyan:

Ji nîşşa çaremîn cîgirê Şêx Safiuddînê ku bavikê Safewiyan e, Şêx Cuneyt e. Şêx Cuneyt di wê demê de dibe hevjinê xwişka Hesenê Dirêj ê Akkoyûnî ku li Amedê serwer in. Navê xwişka Hesenê Dirêj, Hadîce Begîm e. Bi vê zewacê ve binemala Safewiyan û Akkoyûnî dibin xizmên hev. Piştî ku Cuneyt jiyana xwe ji dest dide, kurê wî Şêx Haydar cihê wî digire. Şêx Haydar, keça xalê xwe Hesenê Dirêj, Halîme Begîm-Alemşah ji xwe re tîne. Di vê zewacê de Şah Îsmâîl tê dinê. Ev xizimtiya ku bi Şêx Cuneyt re dest pê kir, bi Şêx Haydar re kûrtir dibe. Bavikê binemala Safewiyan Şêxê Kurd Safiuddîn di sala 1234'an de miribû. Şêx Safiuddîn ji Şengalê çibû Helebê.”


Eger em hinekî din bi detay bikin; Dema Şah Îsmâîl Împaratoriya Safewiyan saz dike, 23 (an jî 25) begên Kurdan li hev kom dibin û ji bo biadî Şah Îsmâîl bikin, tên Erdebîlê û dilsoziya xwe radigihînin. Eger em navê van hinan bidin: *“Mîrê Heskîfê Melîk Xelîl Eyyûbî, Mîrê Bedlîsê Şeref Xan, Mîrê Xîzanê Dawîd, Begê Sasonê Elî, Mîrê Mekkî Sarîm, Mîrê Bradostê Gazî, Mîrê Cizîrê Şeref, Mîrê Egîlê Qasîm, Mîrê Îmadiyeyê Hesen, Mîrê Mahmûdiyeyê Îvan û hin begîtiyên din...”* Lê, ji fermandarên Şah Îsmâîl, Ûlema nêzîkatîyên wisa nîşan dide: *“jixwe em ê wan xakan bistînin, jixwe ew der ên me ne, pêwîstî bi lihevkirinek wisa nîne.”* Piştî begên ku ji bo biadê diçin davêjin hepsan, digirin. Yê hepsî rêyekê dibînin û li xakên xwe vedigerin.

Wek karê yekem jî civînan kom dikin. Gelek bêgîtî tevî van civînan dibin. Ji ber ku êdî naqosên tehlûkeyê lê didin. Li rojhilat, hêzeke nû xwe nîşan dide. Ev jî dikare pozîsyona wan a otonom ji dest wan bigire. Di wê demê de pêşengên herî navdar ên Kurdistanê bangên yekîtiyê dikin. Hikumdarên Amediye, Begên Heskîfê, Begên Bedlîsê, Begên Colemêrgê mînakên van e. Tiştê dibe ew e ku cara yekem hevdişînek wisa berfireh hatiye lidarxistin! Yekîtiyan jî kombûyîn ne bi dînamîzma hundirîn, berevajî çavkaniya xwe ji spartinên derveyî digire. Dema ku wisa dibe jî yekîti ji bo armancên bi kok nayê sazîkirin. Yekîtiya demkî, bi gotînek din, yekîtiyek li ser esasê neçariyan tê sazîkirin. Yekîtiyek wisa jî her tim ji bo belavbûyîna vekirî ye û yekîtiyek sist e.

Safewiyên di pêşengiya Şah Îsmail de, di wan salan de Sêwasê digirin. Sala 1507'an Amedê bi dest tînin, sala 1508'an jî dawiyê li serweriya Dewleta Akkoyûniyan tînin. Û gelek bajarên Kurdistanê hatine fetihîkirin. Riha, Heleb, Mêrdîn, Mûsil girtine. Tehlûke her ku diçe xwe bi awayekî hê lezgîntir dide hîskirin.

Zilma ku Şah Îsmail jî li Kurdistanê dike, wê ne kêmiya Akkoyûniyan (1378-1508) û Karakoyûniyan (1380-1468) be. Li vir rola herî mezin aîdî cewaziya mezheban e. Rastiya *“Derî vebîn, em biçin cem Şah”* ji bo Tirk û Kurdên ku li Bakurê Kurdistanê alîgirên Şah in, derbasdar e. Li qadên din ên Kurdistanê, ji ber şerê Şîî-Sunnîtiyê, Şahîtiyê pir xwîn rijandiye. Di demek kurt de tema-

miya Kurdistanê dikeve bin hikmê Safewiyan û sînorên wê digihêjin sînorên Osmaniyan.



Ha, di demek wisa krîtîk de wê rewşenbîrê bi navê Îdrîsî Bedlîsî jî di van civînan de amade be. Îdrîsî Bedlîsî, berê li gel Sultanê Osmaniyan Beyazîdê Duyem wek katibekî maye û xebitî ye. Civînen heyî wek me got, di demeke gelekî nazenîn de têne lidarxistin. Di van civînan de li şûna ku rabin û yekîtiya xwe ya berfireh saz bikin, wisa jî li dijî Safewiyan rawestin, diçin ji Qesra Osmaniyan re nameyên dilsoziyê dinivîsin. Navê tevahî began di nameyan de tên nivîsandin. Bi giştî bîadî Osmaniyan dîkin. Îdrîsî Bedlîsî û Mehmet Axa Kelhokî radibin û van nameyan ji qesrê re dibin.

Eger em kevanekekê vekin û têkildarî Îdrîsî Bedlîsî hin agahiyên kurt bidin, sala 1520'an, li gor hin çavkaniyan jî di sala 1521'an de miriye. Bedlîsî, perwerdeya xwe li Îranê dibîne û tevî Kurdî, zimanên Erebi û Farisî jî dizane. Bedlîsî, destpêkê bûye katibê taybet ê Sultan Yakûb ê kurê Hesenê Dirêj. Dûvre jî xwe li qesra Sultanê Osmaniyan Beyazîdê Duyemîn (salên rêveberiyê, 1481-1512) bi cih kiriye.

Li gor Mehmet Emîn Zekî Beg, Bedlîsî li ser navê Sultanê Akkoyûniyan Yakûb ji Sultanê Osmaniyan Beyazîd re sala 1484'an peyamek pîrozkirinê dinivîse. Sultanê Osmaniyan heyranî uslûbê wî dibe û wî digire li gel xwe. Li ser daxwaza Sultan Beyazîd, Bedlîsî bi navê Heşt Bihuşî dîrokek Osmaniyan dinivîse. Ev pirtûk ji 80 hezar beytan pêk tê. Û ji serî heta binî pesnê padîşahên Osmaniyan dide, bê padîşahên çiqasî bihuştî ne tîne ziman, heta dibêje 8 qatên li bihuştê her yek li ser navê van hatine veqetandin û hema methê Osmaniyan dide. Perestîna tenê heta vê astê dibe. Em kevanekekê digirin û bi mijara xwe dadikevin.

Împaratorê Osmaniyan Yavûz Sûltan Selîm e ku mîna gur e. Firsendek li ser sîniya zêr e, firsendek wisa ye ku Yavûz bi salan li pey digere. Divê ev firsend wî nebe. Li beramberî nameya girêdaniyê, wê bersiva ji aliyê Yavûz Sultan Selîm tê dayîn ji bi rêzdarîyek mezin bûya. Dixwaze ku Kurd di nav xwe de mîrêmîran hilbijêrin. Û her wiha, daxwaz dike ku Kurd bi xwe begên di nav vê mîrêmîrantîyê de diyar bikin. Û tenê ne ev, cureyekî senedan dişîne ku nivîs li ser nîne, lê mohra împarator li ser e.

Ango, Kurd wê navê begekî diyarkirî binivîsin û Osmanî jî wê wek begê xwe vî qebûl bikin.

Em bersiva ku Yavûz Sultan Selîm ji Îdrîsî Bedlîsî re şandiye li vir bidin. Em niha li vê fermana bi dîroka 1515'an mêze bikin:

“Hêjayê Hêjan, Nişana Qencan, Rêwiyê Rêya rast, Rêberê Kaniyên Ayînê, Bidîtinvânê dijiwariyên Oldariyê, Berê Av û Axê, Högirê Şah û Sultan, Nişana Xelkên Xwedanê Yektayî û Perestên wî, Mewlana Şehrezayê Oldariyê Idrîs, Xwedê hêjabûnên we bêhtir bike!

Gava ku ev Fermana Bilindî ya Sultaniyê bigihêje we, hûn ê fêr bibin ku Nameya we gihiştiye ber destên min ê bextiyar. Ew, mizgîniya vekirina tevahiya Wilayeta Diyarbekirê dide. Vê ya jî giştî başbûna Oldariya we, pêspartîna we, dilsoziya we û rastiya we dide derxistin, mîna ku ev tevde ji we tê hêvîkirin. Xwedê rûyê we bide spîkirin. Ger Xwedayê Bilind xwest, hûn ê bi hoyê (wesîle) vekirina tevahiya Wilayetan rabibin. Tevaya guhpêdanên min ê bilindî Padîşahî ber bi we ve tê vekirin û ew ji bona we likarin.

Li gel manganeyên we yên taybet hetanî Meha Şewala pîroz ez du hezar Zêrê Filorî, Kurkekî Simore û yekî Weşeq, du bergên Hirî, du bergên Çox, Kurkekî Hirî bi Kurkekî Simore betankirî, Kurkekî Hirî bi Kurkekî Weşeq betankirî û Şûrekî Zêrkirî bi kalenekî pêcayî bi coxekî firengî bi rê dikim. Gava ku ew bigihêjin we, ger ku Xwedayê Merd xwest, hûn ê wan bi xweşî û bextiyarî bigirin û ji bona xwe bidin xerckirin. Hûn bi Xweşî bijîn; ji ber hûn bi hêjayî bi van rengên pir ji dilovaniyên min ê Padîşahiya bi nîrx tê derketin. Ev jî tevde ji bona karên we diyarî ne, ji bona rastî û dilsoziya we ji we re tên pêşkeşkirin.

Ji ber Mîrên ku ji Diyarbekir hatin û bi dûv te dan, tu li ser zînetê wan, li ser Nav û Nişanên wan, li ser Sencaqên Wilayetê, yên ku ew ji bona wan divê bîn nîşankirin, li ser dostanî, dilsoziya, karnasî û karûbarên wan agahdar e; ji ber vê jî min ji te re Fermanên Bilind ê Padîşahiya yên Spî bi Mohra min a Bilind hatiye mohrkirin û ew ji bona Rûmetvanên Mîrên Mezin, Pîştî Serbilindên Gewre, Xwediyê karî û rêzlêgirtinê, Xwediyê Nav û Nişanan, Piştigirtvanê bi rengên pir ji layê Xwedayê mayînê, Mîrê Mîrên Diyarbekir Mohemed Xwedê ber wî xweş bike. Divê hûn

belgeyên Sultanî li ser zîneta Senceqan, yên ku hûn wan ji bona her Mîrekî didin nîşankirin, bidin nivîsandin. Her wiha jî Nav û Nîşanên wan jî, erdên bi wan dayî bi rengekî baş û bi tomarkirina wêneyên wan belgeyên Sultanî bi dûr û dirêjî û perên ji bona wan nîşankirî di Deftereke taybetî de bê nivîsandin û ew ji bona min bîn şandin. Da ku ew li vê derê bîn hîlanîn û her tişt diyar û liber- ketî be. Her wiha li gel jî bîrxistinek dûr û dirêj li ser senceqan- melbendan, yên ku te ew ji bona Mîran dane pêşkeşkirin û çawabûna dana wan, şeweyê nivîsandina nav û nîşanên wan û diyariyên wan bi mercekî ev parvekirin û danên hanê bi kokê nedin kêrkin, da ku ew pêwendiyên di nava wan de lewaz nebin û neyên lerizandin.

Her wiha jî min ji te re pelên Spî yên mohrkirî bi nîşana Bilindî Sultanî da birêkirin, da ku tu wan ji bona wan Mîran bide nivîsan- din, yên ku tu nivîsandina wan baş dibîne. Tu li gora kêfa xwe dikare wan bide nivîsandin û wan li gel diyariyên Padişahî bide rêkirin. Di pişt re tu dikare wêneyên wan belgeyên Sultanî, çawabûna diyariyên wan û şeweyê reftarkirina li gel wan di defte- reke taybet de bide tomarkirin û wê ji bona nik cihê min bide rêki- rin, ya ku ew penahiya dinyayê ye. Da ku her tiştek bi dûr û dirêjî diyar be.

Guhpêdana Sultanî di vî warê hanê de li ser mebesta min a qenc bû. Ger ku Xwedayê Bilind xwest, dê meyldariya min li ser wî warî bê girêdan. Bawer bike, ku Meyldariya min li ser wan Mîran pir ji hêviya wan mezintir e.

Niha Ismaîl El-Delalî Kurê Şêxê Erdebîlî Hesên Beg û Behram Axa ji Peyên xwe bi Peyamberî ji bona nik cihê min dane rêkirin. Wan kaxezeke nivîsandî bi xwe re anîne, ku ew tê de pir rengên jêrbûnê, berdestiyê, xwebiavêtine, şelaftiyê û donkirinê ji bona bigirêdana Lihevhatinê û Aştiyê didin derxistin. Ew dibêjin, ku ew bi tevaya daxwaz û xwestiyên me bê qeyd û şert razî ne. Lê belê divê bawerî bi peyvên wî û nêta wî neyê kirin; ji ber vê jî min fer- mana zindankirina her du Peyamberan di keheha Dîmotqe de û Peyên wan di keheha Kilîd El-Behir de dan. Divê li ser te, tu jî ji aliyê xwe de li beramberî yê binavkirî tevdirên baştirîn bi cih bîne, da ku ew pir bi pêgîrî ji bona karûbar û berjewendiya dewleta min a hermayî di dirêjbûna rojan de bi kêr bin.

Di dawî de ez hêviya karûbarên bilind û bi şop ji te dikim.

Vê bizanibe û pişt a xwe bide Nîşana min a pak.

Di Navîna Meha Şewala Pîrozî sala Nehsed û Bîst û Yekê Koci de di cihê Meqamê Xilafetê de hatiye nivîsandin. Edîrne."

"Ez hêviya karûbarên bilind û bi şop ji te dikim" divê maneya van gotinan hebe. Divê bersivê wan hebe. Eger îro li Kurdistanê bi dehan qaşo reîsên terîqet û eşîran destekê didin Padişahê nû yê Osmaniyan Recep Yavuz Sultanê Yekemîn, herhal berjewendiyên heman di bin vê de hene...

Ka em îcar bala xwe bidin nêzikatiya avahiya serwerên Kurd ên bi xwe nebawer! Bi kurtasî bersiva Begên Kurdan ên di pêşengiya Îdrîsî Bedlîsî de wiha ye: *"Em ê nikaribin lihevkirinek navxweyî saz bikin, nikaribin yekîtiyekê ava bikin, em ê nikaribin mîrê mîran derxin. Hûn ji bo me mîrê mîran bişînin."* Tiştên ku Îdrîsî Bedlîsî ji Yavûz Sultan Selîm re dişînin hê sosrettir in: *"Me ji dil û can bîadî Sultanê Îslamê kir, me Qizilbaşên ku rêya wan diyar in, paqij kirin. Me şop û xebatên Qizilbaşan ji holê rakirin û me mezheba Sunnîtiyê û rêola Şafîtiyê çalak kir. Navê Sultanê Îslamê ji bo me bûye şeref û di xutbeyan de me dest bi bîranîna navên çar xelîfeyan kiriye. Me hewla Cîhadê da û çavê me her li rêya Padişahê Îslamê bû."*

Hûn alîkariyê bidin van koleyên dilsoj û îteatî we dikin. Diyar û meskenên me li nêzî diyarên Qizilbaşan e, heta pê ve ne. Ji ber ku ew di navbera Diyarbekirê, Azerbaycanê û Bexdayê de mane. Bi salan e ku vê taifeya bi şîara îlhade, kok û reha Kurdan bi şûrê zilmê biriye. Ev çardeh sal in di jîminayetiyeke wan a dînî û dinyewî li hemberî vê taifeya xwedan îtîqada pak heye. Qizilbaş, wek mezintirîn sedemê berxwedana ber bi vir ve ku Sultanê Îslamê pêk aniye, bang û gaziya Kurdan nîşan didin. Eger Sultanê Mucahîdan (Sultan Selîm), merhameteke padişahî nîşan bide ji bo bihêz kirina gelê van diyaran, gihandina wan a refahê. Ev taifeya ku bi salan e ji ber zilm û çewisandinê jar û bêhêz ketiye, bi tena serê xwe nikare li hemberî vê civak û ordûya jirêderketî raweste. Ne mimkun e ku em karibin di xîsusên din de li hev bikin. Xwedê wisa li me ferz kiriye."



Û Osmanî, li ser daxwaza serwerên Kurdan ji bo Kurdan mîrêmîran dişîne. Mehmet Paşayê Bisimbêl wek mîrêmîran tê şandin. Ev bûyer di sala 1597'an de ji hêla Şerefexan di Şerefnameyê de bi

berfirehî cih digire. Dîroknasê Kurd Şerefexan dibêje, “Çawîş Mehmet axa yê ku wek Mehmetê Bisimbêl dihat nasîn, şand.”

Piştî vê lihevkerinê, sala 1514'an li Ebexê (Çaldiran) wê Osmanî û Safewî bihatana beramberî hev. Erazî Kurdistan e. Kurd li ser erdnîgariyê serwer in. Û wê Kurd bi hêzên mezin ve li gel Osmaniyan li dijî Safewiyan şer bikirana. Encam; ê serkeftî Osmanî ye. Artêşa Osmaniyan roja 23'yê Tebaxa 1514'an di Şerê Ebexê de serkeftinê bi dest tîne. Heman sal, roja 7'ê Îlonê jî bêtî ku li dijî xwe ti berxwedanan bibîne, dikeve Tebrîzê. Şah Îsmâil di şer de birîndar bûye û bi zorê reviyaye. Texta Şah Îsmâil dikeve dest Osmaniyan. Encam; Osmaniyeke ku li rojhilat vebûye û Împaratoriyeke Safewiyan a ji hal ketiye.

Suleymanê Yekemîn (Kanûnî), di sala 1534'an de Bexdayê ku ji sala 1508'an ve di dest Xanedaniya Safewiyan de bû, fetih dike. Osmanî, sala 1538'an jî dikeve Basrayê. Pîrî Reîs sala 1547'an dibe Amîralê Stolên (donanma) Behra Sor û Okyanûsa Hindê. Pîrî Reîs wê pêşî Adenê ji hêzên Portûgalê “paqij bike” û wê li deriyê ku ji Behra Sor li Okyanûsa Hindê vedibe jî Osmanî bi cih bibin. Piştî, wê Yekîneyên Portûgalê yên ku xwe li Mûscat a li goşeya rojhilatê Nîvgirava Erebb û Derbenda (Gewriya) Hurmuz a ku ji Kendava Basrayê bi ser Deryaya Erebb de vedibe, bi cih bûne ji cihên wan bikin û Osmanî wê li Okyanûsa Hindê ji bo demeke kurt serweriya xwe ava bikin.

Dema Abdullah Ocalan vê pêvajoya dîrokî dinirxîne wisa diniwîse; “**Di şerê Çaldiranê de ku sala 1514'an li dijî Împaratoriya Xanedaniya Safewî ya Îranê pêk hat, ji yenîçeriyên artêşa**

Yavûz Selîm zehf bêhtir hêzên begîtî û eşîrên Kurdan hebûn. Şer hem ji aliyê deverê ve, hem jî ji aliyê eskerî ve bi hevgiirtina Kurd-Osmaniyan (Li Amasyayê di navbera 28 Begên Kurdan û Yavûz Selîm de protokolek hatiye mohrkirin) bi ser ketiye. Dema ku mirov serdestiya Memlûkiyan li Riha-Mêrdîn li ber çavan bigire, mirov wê bibîne ku Şerê Mercîdabîqê jî (li Bakurê Sûriyeyê li devereke nêzî Helebê ye) xwedî heman karakterî ye. Gelekî hewce û rast e ku mirov diyar bike, her du şer jî weke stratejî di heyîn û serxwebûna Kurdan de bi roleke girîng rabûne. Dîroka şoven timî ser rastiyan giirtiye. Ya herî rast, mirov bi giranî şerên li ser cografya Kurdistanê yên ku di demên Selçûkî, Eyyûbî û Osmaniyan de pêk hatiye, weke şerên Kurdan li dijî hêzên dagirker binirxîne. Şerê Rizgariya Neteweyî, di salên 1920-1922'yan de jî bi vî rengî ye. Ji van şeran qezenca Tirkên ew e ku li Anatolyayê ku bêyî Kurdan nikarin lê bimînin, welatekî mayînde bi dest anîne.”

Osmanî tenê tîkiliyan danayne. Wê pêwendiyên xwe di astek fermî de bimeşîne. Bi îmzekirina peymanan ve wê serweran bi xwe ve tam bide girêdan. Hin xalên peymanên ku bi Kurdan re hatî kirin wisa dikare bêne rêzê kirin:

- a) Begên Kurd wê serbixwe bin.
- b) Li Begîtiyan wê rêveberî bi şertê pejirandina Sultan, li gor kevneşopîya Kurdan ji binemalê derbas bibe.
- c) Kurd wê li gel Osmaniyan bikevin nav şer.
- d) Kurd berpirs bin ku diyariya xelîfetiye bidin.
- e) Tevî ku Kurd wê li cem Sultan bikeve nav şer jî, wê sînoren xwe berfireh nekin.

Di encama lihevkerinê de wê herêma bi navê Kurdistanê wek 3 kategoriyan bê nirxandin: Osmanî, wê xwe nexin nav karên navxweyî yên Hikûmetên Kurd. Yûrtlûk (araziye ku dahata wê bi şertê ku ew kes heta li jîyanê be, jê re hatiye terxankirin), ocaklik (mulkê ku ji bav derbasî kur dibe) û begên xwedî xweseriya hê sinordartir, bi şiklê senceqê bûn ku li gor hikûmetan biçûk in. Rêveberî ji bav derbasî kur dibû. Beg wê xwediyê hiqûqî yên herêmên xwe bûna. Senceq jî wê begîti bûna ku ji hêla begên senceqê yên ji navendê hatine tayînkirin bihatana birêvebirin.

Ev peyman mabeyna Osmanî û Kurdan, federasyonek e. Begîtiyên Kurd wê bi serê xwe bihata birêvebirin. Ango wê xweser bûna. Dikare bê gotin ku, her çiqasî bi formên ji eşîran hê mezintir jî be, di esas de li ser heman avahiyê her kes bi dîtinekê serbixwe ne. Avahiya Kurd a ji dîrokê tê wê dewam bikira. Wek me got, avahiyên jora eşîran be jî mentiq xwe diparêze. Yê din wê “xeter” bûna. Em ê piştî çend sedsalan bibînin ku wê xeter bin. Em ê bibin şahid ku bê begîtiyên piştî salan gelekî mezin bûne çawa sînorên Îran û Osmaniyan ava dikin.

Amed (Amid) wek navendê tê qebûlkirin, mîna eyaleteke ku Bedlîs, Mêrdîn û Xarpûtê di nav de ne, tê avakirin. Wîlayeta Amedê (Amid) a ku di dema Selîmê Yekemîn de ji 12 senceqan pêk dihat, di dema serweriya Suleymanê Yekemîn de (Kanûnî Suleyman, salên sultaniyê 1520-66) sala 1526’an Mûsila li Bakurê Iraqê lê hatiye zêdekirin û hatiye parçekirin, sînorên wê hatine biçûkkirin, hejmara senceqên girêdayî Amedê bûye 23. Her wiha sala 1515’an Eyaleta Erzînganê ya bi 8 senceqan hatiye avakirin. Trabzon destpêkê bi Erzînganê hatiye girêdan, dûvre hatiye veqetandin. Di dema Suleymanê Yekemîn anga Kanûnî Sultan Suleyman de Eyaleta Erzînganê hatiye betalkirin û li şûna wê Eyaleta Erzîromê hatiye damezrandin. Eyaleta girîng a sînor Wan e ku di wextê Kanûnî Suleyman de ji Împaratoriya Safewiyan tê girtin, ji 38 senceqan pêk tê ku 21’ê wê yekser girêdayî Osmanî (navendê) ye û 17’ên wê jî girêdayî Begîtiyên Kurd ên otonom (xweser) in. Eyalêtên ku di nexşeyên Osmaniyan de wek herêma “Kurdistan” tê diyarkirin, wek sê grûbên esasî hatine dabeşkirin anga bi 3 sîstemên cuda hatine birêxistinîkirin. Esas, *“Senceqên otonom (xweser) û nîv xweser ên di nav rêxistinbûyîna Kurdistanê de bi temamî li derveyî sîstema bikaranîna axê ya bi navê timar e ku Sultan bi navê Xwedê xwediyê tevahî xakan e, tenê ji bo bikaranîna, leşkeran xwedî bikin û baceyê bidin, li beramberî xizmetdayîna li zîlamên xwe belav dike û bi rêka werasetê derbasî nîşên din nabin, di nav yekparebûna Osmaniyan de îstîsnayek girîng e. Ev li beramberî Kurdan nêzikatiyek taybet û xweser e.”* Û esas ev belgeyeke fermî ye ku bê Kurd rolên çiqasî girîng dilîzin û di demên pêş de jî wê bilîzin.

Abdullah Ocalan dema ku salên 1500'î dinirxîne, wisa radigihîne: “Di serê sed sala 16. de hem li qesrên Safewî û hem jî li qesrên Osmaniyan bi tesîr bûye, figura polîtîk a desthilatparêz a wê demê temsîl dike. Begîtiyên Kurdan ên nikarin rejîma qraltiyên xwe yê serbixwe damezrînin, li qesrên hêzên hegemonîk li rêyekê digerin. Begîtiyên Kurd ên pêşî di damezrandina Xanedaniya Safewî de rola wan hebû, piştî ku Şîatî bû mezhebê fermî, xwe di tehlûkeyê de hîs kirin. Ji ber ku ji mezhebê Sunnî bûn, xwe li hev kartiya bi Xanedaniya Osmanî girtin. Di vê de berjewendiyên wan ên girîng hebûn. Îdrîsî Bedlîsî di vê gera nû ya xanedaniyê de mîmarê polîtîk û îdeolojîk e. Piraniya Begîtiyên Kurdistanê li ser bingeha hevgirtina hêzên wekhev razî bûn ku bi Xanedaniya Osmanî re desthilatdariyê parve bikin. Ev hevgirtinek bû ku li gorî şert û mercên xwecih bi rîza dil pêk hatibû. Di nava sistema desthilatdariyê ya Osmanî de bicihbûneke wan a xweser hebû. Begîtiyên Kurdan belkî ji nava xwe begekî began derxistana wê bêhtir serbixwe bibûna û pêşarojê karîbûn sultanateke bêhtir navendî pêk baniyana. Lê divê mirov ji bîr neke ku şert û mercên wê demê ji rejîmên ku ji gelek sultanatan pêk hatiye wêdetir, sistêmên desthilatdariyan ên ku xwe bisipartina çend hêzên hegemonîk, bêhtir di cih de didîtin. Statukoya wê demê xwe bi vî şêwazî ava dike. Qraltiyên serbixwe ne pîvanek in, îstîsna ne. Lewma xebatên hevgirtinê yê bi pêşengiya Îdrîsî Bedlîsî li gorî dema xwe di cih de ne û serketî ne. Aliyê mirov jê fikaran bike ew e, şert û mercên erênî û neyînî yê paşê derkevin holê nehesibandine, konjonktûrel mane. Mirov nikare rewşa wî bi hev kartiya bi tehlûke ya ku di sed sala 19. de piştî hilweşîna sistema begîtiyê derket holê, bide ber hev. Bi vî şêwazî liberhevgirtin û daneberhev, şert û mercên demê li ber çavan nagire, dema tevîhev dike û xwe dispêre wekhev kirin û analojîyeke şaş.”

Di nexşeyên Osmanî de herêma wek “Kurdistan” tê binavkirin, navê van sînoran teqez ne ji bo nîşandana yekîtiyek siyasî ya diyar û serbixwe ye, bi armanca destnîşankirina herêmekê ye ku komek gel bi giranî lê dijî.

Bersiva pirs, Mîrîtiyên Kurdan çima nebûn yek û dewletek navendî ava nekirin jî, encama avahiya dîrokî ya Kurd e: Ew jî bêguman parçeyî ye!

Kurdên Şîî îtaatî Dewleta Îranê, Kurdên Sunnî jî îtaatî dewleta Osmaniyan dikin. Ji ber ku li sînoran jî hevkarî hê zêdetir bi kok e. Dema ku em nêzikatiyên li beramberî komê cuda ya ola Êzîdîyan li ber çavan bigirin ku li derve tîni hiştin û cih bi cih rastî qetliaman tîni, wê ev sekna parçeyî hê bêhtir bê fêmkirin. Şer û rikeberî di hundir de berdewam e. Gefa derveyî ji rojhilat û rojava ye, jiyana gundewarî û koçerî dewam dike. Dema karakter û teşegirtina civakî ya Kurdan li ber çavan bê girtin, ev pirs berevajî bê pirsîn wê hê rasttir be.

Çima bibin yek?

Abdullah Ocalan di pirtûka *Li ser Dîrokê Guftûgo* de ji bo bersiva vê pirsê dibêje; **“Di nav Kurdan de jî mîna Ewropayê sîstema begîtiyê heye. Begîtiyên gelekî xurt ên Kurdan hene. Lê, di nav van de ti yê ku ketine rêza yekemîn nîne. Duyemîn heye, sêyemîn heye. Çaremîn heye. Yekemîn tineye. Pirsgirêka Kurdan hê jî ev e”** û balê dîkşîne ser pirsgirêka Rêbertî ya di dîroka Kurdistanê de.

Em diyar bikin ku her çiqasî têkiliyên Osmaniyan û Begên Kurd pêş ketibin jî, li dijî begên din ên Kurdan ên nêzî Osmaniyan neseke jî Osmaniyan nêzikatiyek gelekî bêrehm nîşan dane. Ji bo van mînakê baş jî Berxwedana Kurên Canpolat e ku sala 1607’an bi pêş ketiye. Canpolat, li Heleb û Kîlîsê serwer bûn. Ji ber ku li dijî Safewiyan li rex Osmaniyan cihê xwe negirtin, bang li lîderê wan Caxal paşa tê kirin ku were navenda Padîşah lê ye û li wir qetil dikin. Li hemberî vê bûyerê jî birayê wî Elî, ala berxwedanê li ba dide. Heta Şamê tevahî qadan desteser dike. Lê çî heye ku sala 1607’an dema li dijî artêşa di bin fermandariya Kûyûcû Mûrat Paşa de ku Elewî zindî bi zindî diavêtin bîran û qetil dikirin, şer dikir, derbên giran jî lê xist, lê dema tengav bû jî xwe diavêje bextê Padîşahê Osmaniyan. Padîşahê Osmaniyan jî wek diyariya ji bo Elî û ji bo ji her kesî re bibe mînakê baş, wî li Bexdayê qetil dike.

Dema qetlîamên Elewîyan tê gotin; di van sedsalan de bi hezaran Elewîyên-Kurd têne qetilkirin. Kurdê Elewî yê bi navê Mehmet Bayrak ku dîrokna û lêkolînerê Elewîyan e, di xebata bi navê **Wek Şêweyekî Siyasetê Komkujiyên li hember Elewîyan** de bi awayekî berfireh qetlîamên ku bi Yavûz dest pê kirin û bi Kanûnî re dewam kirin, radigihîne û wek polîtîkayek fermî ya Osmanî jî belge dike.

Em vê ragihînin:

“Yavûz Selîm bi rêya memûrên xwe yên şand Anatolyayê, Qizilbaşên çalak, ‘ji heft heta heftê salî kiriye defterê’, û bi fetwayên ku bi Miftî Hamza Efendî û Şeyhu-l Îslam Îbn-i Kemal dane amadekirin, zêdetirî 50 hezar Elewî qetil kirine û bi hezaran xanî texrîb kiribû.

Her çiqasî ev qetlîam bi awayekî sînordar di helbestê de diyar bin jî, di dîrokên Osmaniyan de dibû îfadeyek eşkere. Jixwe, ji dîroknasên navdar ên Osmaniyan di sedsala 16’emîn de Xoce Saadeddîn, mîna heqdayîna qetlîama Padişah van gotinan bi lêv dike:

Dema Sultan Selîm bi wezîr û ûlemayê re civiyabû: Madem ku teqez e tahrîkata serdarên Qizilbaşan tê astengkirin, di heqê wan de tê derketin, zirar tên domandin. Jixwe Qizilbaşên li wîlayeta Anatolyayê, hevkarîya Şah Îsmail dîkin, desthilatdariya xwe û mal û milkê xwe di vê rêya pîrsgirêk de feda dîkin û yên desthilatdar bi fedakarî û diyariyan diçin serdanê û bi xelîfeyên xwe re her sal nezîran (alîkarî, qurbanan) dişînin. (...) Li ser vê Padişah jî bo kontrolkirina Qizilbaşên ku li Anatolyayê rûdinin ji rêveberên xwecih re hikum şandine, ferman daye ku ji heft heta heftê salî navê tevahî Qizilbaşan li defterê bêne qeydkirin û ji wî re bêne şandin. Li ser fermana Padişah, çil hezar kes di encama rapirsîn û kontrolan de hatin girtin, hin hatin qetilkirin û hin jî ketin hepsan.” (Tacu’t-tevarîh, Cild-2,r. 245. Em demildest diyar bikin ku di xebata Îdrîsî Bedlîsî de ku bi Farîsî jî bo Yavûz Selîm veqetan-dibû, tê gotin ev hejmar zêdetirî 50 hezarî ye.)

Di heman xebatê de: Şeyhulîslam Ebussuud Efendî, dibêje: “Yên ji koma Qizilbaş bikujin dibe gazî, yên bi destê koma Qizilbaş bêne kuştin dibin şehîd? Li ser vê pîrsê jî fetwayek wisa dide:

“Erê dibe, di rêya olê de şerê herî mezin e, di rêya Xwedê de şehadetek mezin e...” Ji van gotinan hê zêdetir jî gotinên mîna, *“qetilkirina vê komê, ji ya kafirên din hê girîngtir e”* di esas de nêzîkatiya fermî ya Osmaniyan e. Û eşkere ye ku ev nêzîkatiya fermî bûye sedema jiyana bi sed hezaran Elewîyan.

Tevî hemû tiştî jî hesreta yekîtiya Kurdan heye. Helbestvan û ronakbîrên ku di sedsala 17'emîn de hesreta yekîtiyê anîne ziman hene. Herî baş jî Ehmedê Xanî vê hesretê tîne ziman. Helbestvanê mezin ê Kurd Ehmedê Xanî, di navbera salên 1651 û 1707'an de jiyaye. Xebata wî ya herî navdar Mem û Zîn di sala 1695'an hatiye nivîsandin. Ev helbesta xwe ya li jêr, divê di dawîya sedsala 17'emîn de nivîsî be. Ji ber rêzdariya me ya Ehmedê Xanî, em ê helbestê bi berfirehî bidin. Di helbesta bi navê 'Derdê me' de Ehmedê Xanî wê derdê xwe wisa rêz bike:

“Derdê me...

"Ez mam di hikumete xwedê de Kurmanc di dewleta dinê de"

Emma ji ezel Xwidê wisa kir

Ev rûm û 'ecem li ser me rakir

Tebe 'iyyet wan egerçî 'ar e

Ew 'ar li xelqê namidar e

Namûs e li hakim û emîran

Tawan çî ye Şa'ir û feqîran

Ez mame di hikmeta Xwidê da

Kurmanc di dewleta dinê da

Aya bi çî wechî mane mehrûm

Bi l-cumle ji bo çî bûne mehkûm

Wan girt bi şîrî sehrê Şuhret

Tesxîr kirin biladê himmet

Her mîrekê wan bi bezlê Hatem

Her mêrekê wan bi remzê Ristem

Bif'kir ji 'ereb heta ve gurcan

Kurmancî ye bûye Şubhê burcan

Ev rûm û 'ecem bi wan hisar in

*Kirmanc hemî li çar kinar in
Her du terefan qebîlê kirmanc
Bo tîrê qeda kirîne amanc
Goya ko li serhedan kilîd in
Her ta 'îfe seddek in Şedîd in*

*Ev qulzimê rûm û behrê tacîk
Hindî ko bikin xurûc û tehrîk
Kirmanc dibin bi xwîn mulettex
Wan jêk ve dikin misalê berzex
Cwamêrî û himmet û sexawet
Mêrîni û xîret û celadet
Ew xetm e ji bo qebîlê ekrad
Wan dane bi Şîr û himmetê dad*

*Hindî ji seca 'etê xeyûr in
Ewçend ji minnetê nefûr in
Ev xîret û ev 'uluwwê himmet
Bû mani 'ê hemlê barê minnet
Lew pêk ve hemîşe bêtîfaq in
Da 'im bi temerrud û siqaq in*

*Ger dê hebûya me ittifaqek
Vêk ra bikira me inqiyadek*


*Rûm û 'ereb û 'ecem temamî
Hemîyan ji me ra dikir xulamî
Tekmîl dikir me dîn û dewlet
Tehsîl dikir me 'ilm û hikmet
Temyîz dibûn ji hev meqalat
Mumtaz dibûn xwidankemalat*

*Enwa 'ê millet xwidankitêb in
Kirmanc-i tenê di bêhesêb in
Hem ehlê nezer nebên ko kirmanc
'Îşq-i nekirin ji bo xwe amanc
Têk da ne di talib in, ne metlûb
Vêk ra ne muhibb in ew, ne mehbûb*

*Bêbehre ne ew ji 'îşqibazî
Farix ji heqîqî û mecazî*

*Kirmanc ne pir di bêkermal in
Emma di yetîm û bêmecal in
Fî l-cumle ne cahil û nezan in
Belkî di sefîl û bêxwidan in
Bêhîle û xurde û tamam in
Meqbûlê mu'amela 'ewam in*

*Kirmancî ye sirf e, bêguman e
Zêr nîne bibîn sipîdeman e
Sifrê me yê sor e, aşîkar e
Zîv nîne bibîn ko kem'eyar e
Neqdê me mebêje kembêha ye
Bê Şikkeyê Şahê sehrewa ye..."*



Di van rêzan de ya xwe dide der hesreta ji bo azadî û xwebûnê ye. Her çiqasî lewaz dixuye jî ev hesret her dewam kiriye. Di civaka Kurd de tevî hemû tiştî jî kesera yekîtî û bihevrebûnê pêş ketiye. Wek di helbestê de jî tê ziman, “Ew ‘ar li xelqê namidar e.” Bi zimanek din: “*Lê ev şerm ji navdaran re ye*” îşaretê bi serwerên Kurd dike. Serwer di nav hevkarî û îxanetê de dijîn, li hemberî serwerên ku vê nabînin jî Ehmedê Xanî sîtem û gazincên xwe bi lêv dike. Ew parçebûyî, nê,

pêşnedîtî û lewaziya tifaqbûnê tenê ev gotin herî xweş tînin ziman. Û misrayên, “*Goya ko li serhedan kilîd in.*” Ango: “***Tu dibêjî qey Kurd li ser sînoran kilît in***” jî ev nerazîbûn û refleks in ku li dijî wek nobedarên sînorên mabeyna Osmanî û Safewîyan de bikaranîna Kurdan hatine gotin.

Di xîtabek din de ku Ehmedê Xanî bi şeweyekî din tîne ziman jî, cengawerekî leheng ê Kurd Derwêşê Evdî ye ku navê wî bûye destan. Gengaz e ku bûyereke di salên 1700'î de be. Wê demê liderê Konfederasyona Eşîra Mîlan a li derdora Riha-Wêranşarê bi bandor e, Temîr axa ye. Eşîra Şarq a ku eşîrek Êzîdî ye jî endamêkî vê konfederasyonê ye. Wê demê her çiqasî gelek Kurdan ji vê eşîrê re gotibin Kerdiz jî, ev gotineke vederkirinê ye. Berevajî, eşîreke çavnetirs e ku xwedî şervanên egîd e. Di van salan de êdî Erebb û Tirk gav bi gav berê xwe didin avahiya xweser a ku beriya salan li Kurdistanê hatî avakirin û dest lê werdidin. Ev rewş bi xwezayî van salan dike salên şer. Di destanê de destnîşana esasî li şûna li ser berxwedana li dijî dagirkeran bûya, lê hê zêdetir ew piraniya ku xwe ji berxwedanê dane paş derdikevin pêş. Lê, Derwêşê ku kurê liderê Eşîra Şarqê Evdî ye, xwe di vî şerî de nade paş û ji bo Kurdistanê bi çavsorî dadikeve meydana. Di destanê de keça Temîr Axa Edûlê ya ku bi bedewiya xwe navdar bûye, esas Kurdistanê temsîl dike, Derwêş jî nûnertiya berxwedêriya welatparêzî ya welêt dike. Çawa ku beriya sedsalan Ehmedê Xanî di destana xwe ya “Derdê me” de nêzîkatîyên guhnedêrî yên serweran ku li beramberî bangên yekîtiya neteweyî kirine rexne kiriye, Derwêşê Evdî jî bi heman şiklî li hemberî nêzîkatîyên guhnedêrî û berjewendîparêz ên serwerên Kurdan li dijî dagirkeran daketiye meydana û bi komêk biçûk a şervanan ve bi şerekî lehengî şehîd dibe.

Eger em kevanekekê vekin, hejmara Begîtiyên Kurdan ê demê gelekî zêde ne. Hin begîtiyên ku heta dawîya sedsala 16'emîn li ser piyan mane wiha ne: Begîtiya Erdalan, Begîtiya Hakkarî, Begîtiya Imadiye (Behdînan), Begîtiya Cîzîrê, Begîtiya Bedlîs, Begîtiya Mîdrasî, Begîtiya Palû, Begîtiya Çermûg, Begîtiya Çemîşgezêk, Begîtiya Sason, Begîtiya Xîzan, Begîtiya Kîlîs, Begîtiya Şîrwan, Begîtiya Zîrkan, Begîtiya Sîvîdî, Begîtiya Silêmaniyê, Begîtiya Sohran, Begîtiya Baban, Begîtiya Mûkrî, Begîtiya Bradost, Begîtiya Mahmûdiyan, Begîtiya Dimbilî, Begîtiya Kelhûr, Begîtiya Bane, Begîtiya Zergîne û Begîtiya Pazûkî ne.

Ev sal, ji bo begên Kurdan li gor salên din salên hinekî din serbestiyê ne. Daxwaza Osmaniyan a bi dest herêmê domandina îdarêyê, pêşiya pêşketina Kurdan vedike. Her çawa bibe jî, Osmanî bi

tevkariya mezin a Kurdan ve bûye împaratorê cîhanê. Wek berdêla vê jî di nav împaratoriye de bûne xwedî cihekî xweser.

Di salên tifaqa Osmaniyan de begên Kurd herî zêde pêş dikevin û feodalîteyên wan zêde dibin. Em ê malbat û begîtiyên mezin, navdar ên Kurdan piştî van salan bibînin. Di dîroka Kurdan de bêguman e ku Begîtî û Konfederasyon ji mêj ve hebûn. Konfederasyona Medan dibe ku ji bo vê mînakê herî baş be. Lê, derketina wek qewmekî jî taybetmendiye van salan e. Ew kesera ku Ehmedê Xanî tîne ziman, di van salan de bi pêş dikeve. Têgînên Kurdistanîkirinê di van salan de berbelav dibe. Wek me got, Osmanî jî di van salên têkiliyên germ de wê Kurdan gelekî bixebitîne. Bi gotine hin dîroknasan ve, ev dem ango navbera sedsalên 16. û 19. **“Ser-dema Navîn a Kurdan”** e.

Lê di wan salan de jî Kurdistan dîsa qada şer e. Artêşên Osmaniyan di salên 1534-35/1548-53 de seferan bi ser welatê Safewiyan de dibin. Di van seferan de şer hê zêdetir li ser sînor ango li herêmên Kurdan tê kirin. Hêzên Kurd li gel her du aliyên jî şer dike. Sala 1554’an, artêşa Osmaniyan Kurdên Belkas û Şehrezorê têk dibin. Bi peymanê 1590’î, Safewiyan li gel Şehrezor û Loristanê, tevahî bajarên rojava ji Osmaniyan re hiştin. Ji bo karaktera demê bê fêmkirin, wê mînakê baş be ku em li têkiliyên Osmanî û Mîrîtiya Bedlîsê ku di van şeran de bûne xwedî roleke çalak, mêze bikin. Mîrîtiya Bedlîsê ya ku di şer de bi rolek navenda giştî ya şer rabûye; hem Safewiyan hem jî Osmaniyan xwestine serdestiya xwe li ser ava bikin. Di wê demê de yek ji seyyahên li herêmê, bê her du dewlet jî çawa neçarî hewl didin têkiliyên xwe bi Mîrîtiya Bedlîsê re baş bikin wiha vedibêje; *“Begê Bedlîsê ne mîna begên girêdayî vî yan jî wî, ne padişah ne jî Şahê Îranê dinasin. Eger têkiliyan van her du hêzan pê re baş bin, wê ji bo wan baş be. Begê Bedlîsê xwe bide kîjan alî, wê ew teref bi rehetî karibe ji bo terefê din rêya Heleb-Tebrîz bigire an jî derbasbûyîne asteng bike.”*

Mîrîtiya Bedlîsê piranî bi Dewleta Osmaniyan re tifaq daniye. Lê, cih bi cih li gel Dewleta Safewiyan jî tifaq saz kiriye, hewl daye statuya xwe ya xweser biparêze. Dema Osmanî li dijî Safewiyan şer dikin, rola navendek girîng dilîze. Di pêvajoya beriya peymanê 1639’an de hewl hatiye dayîn ku hin Mîrîtiyên Kurdan ên li ser sînorê Osmaniyan bêne kontrolkirin. Di vê de tifaqa li gel

Îranê jî bûye faktorek girîng. Mînak, Mîrîtiya Bedlîsê di Şerê 1514'an de û şerên piştî vê, piştgiriyeke mezin daye Osmaniyan, lê sala 1532'yan artêşa Osmaniyan êrîşî wan kiriye. Ji fermandarên bi bandor ên Îranê kesekî bi navê Ûlema xwe diavêje bextê Osmaniyan û ji bo Mîrîtiya Bedlîsê tê tayînkirin, ji ber bi artêşê ve berê xwe dide Begê Bedlîsê ku tê gotin tifaq bi Îranê re daniye, şer rû daye. Tevî alîkariya artêşên Şah jî, Mîrê Bedlîsê tê kuştin (1533). Kur Şemseddîn dikeve şûna bavê xwe û girêdana xwe ya Osmaniyan pêşkêş dike. Osmanî jî ji bo Mîrîtiya Bedlîsê Ûlema, ji bo Mîrîtiya Meletiyê jî Mîr Şemseddîn tayîn dikin. Mîr Şemseddîn li dijî vê şer dike, Bedlîsê vala dike û xwe diavêje bextê Şah. Wek ji vê mînakê jî tê fêmkirin, serweriya rewa ya kevneşopîya Mîrîtiyên Kurd li beramberî xurtbûna dewletên serwer kêmtir dibû. Gelek caran ev serwerî bûye wek meyleke nûnerê tayînkirî yê dewleta navendî. Mîr Şemseddîn di serî de qebûl dike ku wek nûnerê Osmanî tayîn bibe. Ev jî meyla serwerên xwecih nîşan dide ku dikarin li beramberî dewleta xurt bikevin bin kontrolê. Ji ber ku Mîr Şemseddîn destpêkê tayînkirina Meletiyê qebûl kiriye, dûvre piştî xwe daye Şah û ev red kiriye.

Dewleta Osmaniyan her ku Safewî têk birin, ji milekî jî xwesiye mîrîtiyên nêzî xwe jî sînordar kirin. Yên li sînor jî xwesiye mîrîtiyên xwe diparastin û xurttir dikirin.

Lê dîsa jî mabeyna salên 1514 û 1639'an de; têkiliyên Mîrîtiyên Kurdan û Osmaniyan piranî bêpirsgirêk bihurîne. Tifaq li pêş in. Berjewendiyên hem dewleta Osmanî hem jî Mîrîtiyên Kurdan bi vê tifaqê girêdayî bû. Şer jî hê zêdetir ne ji bo bi temami tinekirina xweseriya mîrîtiyan, lê ji bo karibin rêveberên mîrîtiyan hê zêdetir bi xwe ve girêbidin dihatin kirin. Her du hêzên serwer jî ji bo karibin ji endamên xanedaniyê yê aligirên xwe bînin ser desthilatdariyê têdikoşyan. Lê, di şer de Osmanî serkeftî bûn, rêveberiya hin begên Kurd ên xweser ên li nêzî navenda Anatolîyê berteng dikir. Hin navendên girîng jî bi xwe ve dida girêdan. Navendên mîna Erzirom, Amed, Wan, Bexda yekser bi Osmaniyan hatibûn girêdan. Bi waliyên tayînkirî hewl dihat dayîn ku Mîrîtiyên Kurd ên derdorê bêne kontrolkirin. Li van navendên ku ji milê aborî jî stratejîk in, yekîneyên artêşa nîzami hebûn. Lê ji ber kontrola waliyan a li ser herêmê girêdayî hevsengiya hêzan bû,

demek dirêj simbolîk mane. Ev rewş, hê beriya 300 sal tijî bibe, wê di pêvajoya paşketina Osmaniyan de xwe bi awayekî eşkere bide der.

Împaratoriya Safewiyan, di salên 1623-38'an de wê dîsa serweriya xwe li ser Bexdayê bida avakirin. Dema Sultan Mûradê Çaremîn de (rêveberî, 1623-1640), artêşa Osmaniyan piştî şerekî xwînrij careke din Bexdayê fetih dikin. Di nav Bexdayê de 70 hezar aligirên Şîa têne kuştin. Ya hat kirin jî di rastiye de qirkirinek e.

“Piştî ku Sultanê Osmaniyan Mûradê Çaremîn di 24'ê Kanûna 1638'an de Bexdayê ji Safewiyan digire, mabeyna Dewleta Osmanî û Safewiyan de di 14'ê Gulanê de muzakere dest pê dikin. 17'ê Gulana 1639'an di navbera Sultanê Osmanî û Şahê Îranê de Peymana Qesrî Şîrîn tê erêkirin. Li gor xalên li jêr ên peymanê Kurdistan bû du beş:

1- Bexda, Basra, Kerkûk û Rojhilatê Anatolyayê wê di dest Dewleta Osmaniyan de bimana.

2- Revan wê bibûya ya Dewleta Safewiyan.

3- Kelheyên li milên Kotor, Mokûr û Qesê wê ji aliyê her du aliyan jî bihatana xerakirin.

(Kurdistana ku cara yekemîn bû du parçe; sînorê Tirkiye-Îranê yê ji bilî Kerkûk, Basra, Bexda û Revanê, li gor vê peymanê heta îro jî wek xwe maye.)”

Beriya em bidomînin, em helbesta Ehmedê Xanî ya ku têkildarî Peymana Qesrî Şîrîn nivîsiye, li vir bidin:

“Tasek ji vê ava zelal,

Nadim bi hewza Kewserê

Levhatina Qasra Şîrîn

Lê nabînim tu meferê

Piştî roja me bû tarî

Mirin xweş e ji emberê”



Me berê jî anîbû ziman ku yê Xanedaniya Safewiyan damezrandiye Şah Îsmâil (1501-1524) e. Dûvre mîna Şah Tahmasp, Îsmâilê Duyemîn, Muhammed Hudabende, Şah Abbasê Yekemîn, bi giştî 11 Şah hatine û çûne. Şahê herî dawî jî Abbasê Sêyemîn e. Lê, wê di dema Şah Îsmâil Mîrza (Safî Mîrza, 1629-1642) de rewşên cuda xwe bidin der. Gelekî tê gotin ku piştî dor li Şah Îsmâil Mîrza hatiye pêçan û hatiye zeîfkirin, baweriya Şîa ya ku bavê wî ava kiriye û esas girtiye, terikandiye û Sunnîtî hîlbijartiye. Gotina “*Em ji Xorasanê hatine*” ya ku Elewiyên Kurd piranî tînin ziman jî girêdayî vê ye. Di dema Şah Îsmâil û Şah Abbas de, teqez e ku derbasbûyînek ji Bakurê Kurdistanê ber bi Rojhilatê Kurdistanê ve bûye. Esas sedema vê derbasbûyînê jî baweriya olî ye. Dema Şah Abbas de, ji bo tehlûkeya ji milê Rojhilat ji hêla Moxolan, Tirkên û hwd. tîne bîne beralîkirin, Elewiyên Kurd li bakurrojhilatê Îranê tîne bicihkirin. Lê kengî ku Şah Îsmâil Mîrza Sunnîtî hîlbijart û her ku çû berê xwe da baweriya Şîa ya Elewî; wê demê Kurdên Elewî yê ku beriya sedsalan ji Bakurê Kurdistanê koç kiribûn jî wê dîsa li Bakurê Kurdistanê vegehin. Dibe ku beşek dîsa li Xorasanê mabin û venegeriyabin. Ji ber vê ye ku îro li herêma Xorasan a Îranê nêzî 2 mîlyon Kurd dijîn. Dîsa rastiyeke

ku yê li wir dijîn di nav pêvajoyê de dibin SunNî, lê zaravayên xwe yê Kurdî parastine.

Nadîr Şah (1688-1747) di sala 1729'an de, Xanedaniya Safewiyan- piştî mirina Şah Abbasê Sêyemîn a sala 1736'an- dawiyê li Dewleta Safewiyan tîne û dibe Şahê Îranê. Kurd ji ber zilma li wan tê kirin nefretê jê dikin. Ji bo ev hêrs her zindî be jî divê neyê jibîrkirin ku ji hêla Osmaniyan jî hewldanek taybet heye. Nadîr Şah sala 1747'an diçe ser Kurdên Xorasanê û ji hêla wan tê kuştin.

Beşek dîroka Îranê jî ji Dewleta Zend (1750-1794) pêk tê.



Dewleta Zendê ji hêla Kerîm Xan di sala 1750'î de tê damezrandin. Paytexta qraltiyê Şîraz e. Tê gotin ku Kerîm Xan ji bo Şîrazê dibêje, *“Paytexta pîroz a edaletê”*.

Ferqa Dewleta Zendê ji dewletên din an jî qraltiyên din ew e ku xwedî avahiyek wekhevîxwaz e, rêzê dide baweriyên cuda û jin di nav artêşê de cih digirin.

Heta tê gotin ku ji bo vê rewşê Afgan ji Artêşa Zendê re û bi xwezayî ji bo Kurdan dibêjin, *“Yên xwe li pey jinên xwe ve-dişêrin”*.

Ya Dewleta Zend hildiweşîne, Kaçar ên bi eslê xwe Tirk in, di sala 1794'an de dewleta xwe damezrandine û heta sala 1925'an jî hebûna xwe domandine.

Di sedsala 19'emîn de bi destpêkirina berxwedanan an jî bi gotinek din bi hilweşîna mîrîtiyan ve serdema klasîk bi dawî dibe, dîrokek Kurdan a nû, dibe ku "modern" bê gotin, dest pê dike.

Beriya em derbas bikin, divê em berxwedana Kelha Dimdimê ya ku li Rojhilatê Kurdistanê nimûneyek lehengiya mezin û trajedî ye, bînin ziman. Ji ber ku em li vir jî dîsa îxanet û qehremaniyê di nav hev de dibînin. Her çiqasî di belgeyên nivîskî bê gotin ku ne berxwedanek Kurd e jî, dîrok şahid e ku li Rojhilatê Kurdistanê di pêşengiya Mîr Lepzerîn –li hin cihan jî wek Cengzerîn tê nivîsîn– de ya di sala 1608'an de bûye berxwedanek Kurdan e. Mîr Lepzerîn bi gotinek rasttir Xanoyê Cengzerîn, ji liderên dildar ên konfederasyona Bradost e ku li herêma Urmîyê dijî. Şervanekî egîd e. Şah Abbas ji bo li dijî Moxolan şer bike wî îqna dike. Jixwe Xanoyê Cengzerîn jî li dijî Moxolan li cem Şah Abbas cih digire, "şer!" dike. Xanoyê Cengzerîn di gelek şerî de ku bi eşîra xwe dikevê, bi ser dikeve. Di hin belgeyan de tê gotin ku di şerekî de milê xwe wînda kiriye, Şah Abbas jê re milekî ji zêr çêkiriye, lê ya esas ew e ku ji ber Cengzerîn destvekirî ye, angî ji ber camêriya wî gelê Kurd jê re di wateya "dest vekirî" de nav an jî pêşnavê Cengzerîn lê kirine. Dîsa di hin cihan de navî wî wek Xan Lepzerîn tê gotin. Halbûkî navê Cengzerîn, Xano ye. Angî, pêşnavêkî Xan ê ku Safewîyan lê kirî nîne.

Wek di dîroka Kurdistanê de her tim tê dîtin, Kurd alîkariyê didin Safewîyan û yên êrîşî Îranê kirine jî mîna Moxolan her şikandine. Lê çî heye ku her çiqasî Kurdan destek dabin jî, Safewîyên ku her tim li ser Kurdistanê armancên xwe yên cuda hene, vê carê jî berê xwe didin cihê ku Bradost lê serwer in.

Heta tê gotin ku Şah Abbas ev bi lêv kirine:

"Ku te bêaqilî kiriye,

Min bihîstiye te navê şah ser xwe daniye.

Lo-lo Xano tu kurmancî

Qebûl bike tu vî tacî

Qebûl nakî te dikujim

Lê bersiva Xano Cengzer jî ji bo Şah zelal e:

*Tacê te ser serê te be,
Gû nav mesebê te be,
Kuştina mêra wê hebe,
Kurdistan bênav nabe.*

(Ordixanê Celîl-**Destana**
Qehremantiya Kurdan:
Dimdim)



Safewiyan her tim xwestine bibin xwedî erdnîgariyek stratejîk. Jixwe gelek caran Şah Abbas berê artêşên xwe dide ser Xano. Her carê jî Safewî ji hêla Kurdan tèn şikandin. Li dijî Artêşa Şah a mezin û nîzamî, Kurd bi giranî bi tarzê lê bide û bireve angoyê bi tarzê gerîla yê ji pêşiyên xwe fêr bûne dibersivînin. Bi vê rêbazê ve bi salan xwe diparêzin. Lê, Şah Abbas hêzên mezin amade dîkin û bi niyet e ku Bradostan têk bibe. Li gor vê rewşê jî Xanoyê Cengzerîn dest bi amadekariyên parastinê dîkin. Û Kelheyê ku bi hezaran mirovî digire, ava dike. Kelhe, li sêgoşeya Bradost, Mergever û Tergeverê ku ji eraziyên herî tund ên Kurdistanê ne, tê avakirin. Piştî hewldanên demdirêj, kelheyê xurt ava dike. Wisa ye ku derbasbûna wan û qenalên avê yê tînin kelheyê veşartî ne. Ango, ji derve, deverên gelekî dûr hem ketin hem jî derketinê kelhê hatine çêkirin, hem jî ji kûrahiyan av kişandine.

Çawa ku tevahî êrîşên Şah pûç dîkin, wisa jî berxwedan li ser piyan dimîne. Gelek kuştî û birîndarên Şah çêdibin. Domahiya 18 mehan artêşa Şah Abbas her têk diçe. Êdî Şah dike bişkê. Di nav Artêşa Şah de ji ber windahiyên mezin çêdibin, îşaretên belavbûnê xwe didin der. Dema Şah Abbas fêm dike ku bi vî şiklî nikare Xanoyê Cengzerîn têk bibe, vê carê jî serî li fenûfûtan dide. Yek ji hileyên herî navdar ên serwerên Persan jî ew e ku eniya dijber ji hev dîkin, yekî an jî hinan li gel xwe digirin û kelheyê ji hundir fetih dîkin.

Şervan û fermandarê bi navê Mahmût ku berê li Kelha Dimdimê şervanekî xurt bû, ji ber zor daye rêgezên exlaqî li derveyî civakê hatiye hiştin. Xanoyê gelek caran xweşbinî bû, her carê rêyek didît û ev kes di nav gel de dixist xizmeta Kurdan jî, ji ber kirinê wî yê vê carê ne li gor ti pîvanekî exlaqî ye û ne di wê astê de ye ku ji hêla civaka Kurd bê qebûlîkirin, - di nav şerê herî

dijwar de bin jî- ji bo şer gazî nakinê. Her ku berxwedan dom dike, Kurd li ber xwe didin, kesayetê bi navê Mahmût ê nerazî û li derveyî civakê hatî hîştin pêwendîyan li gel Safewîyan datîne. Kesê bi navê Mahmût ê îxanet dike, qenala veşartî ya avê nişanî Safewîyan dike. Safewî jî cihê herî xurt ê kelhê ku di heman demê de xelesa herî zêf e jî- keşif dikin û dûvre jî xwîna heywanan bi ser ava ku tê kelheyê berdidin, avê jehrî dikin. Di vê rewşê de, Kelha Dimdimê û Xanoyê Cengzerîn çend hefteyan bi ava depokirî li ber xwe didin, lê piştî av namîne jî tên kerteyê herî dawî ya berxwedanê. Êdî derfetên domandina berxwedanê nemane. Û rewşek wisa çêdibe ku di dîrokê de kêm tê dîtin. Li tevahî stûnên (şeql) kelhê, barûd tê bicihkirin. Di serî de Xano, li gel dayika wî Guhar Xanim, bi hev re agir berdidin fitîlan, tevahî kelhê bi hezaran berxwedêrên Kurd ve diteqînin. Li Kelha Dimdimê tenê kesek jî teslîm nabin û digihêjin şêhadetek bêdawî.

Di dîrokê de bi taybet jî di dîroka Kurdistanê de berxwedanên di asta lehengiyê de her tim çêbûne. Dibe ku di dîroka Kurdistanê de nimûye yekem a bêhemta be ku li şûna radestiyê, bi komî bi şiklekî wisa dawî li jiyana xwe anîn.

Li beramberî berxwedana wisa bi heybet, îxanet jî wê rewşa herî nemerdî be. Mahmût ji ber vê îxanetê ji canê xwe dibe. Şah Abbas ji bo xelata wî bidîyê bang lê dikê. Dûvre wî dixê devê topê û agir berdide barûdê. Mîna topek agir li Mahmût dike. Mîna gelek caran di dîrokê de tê dîtin, yên xêra wan li gelê xwe û xwe tinebin, wê li kesî din jî nebin. Lewma jî li beramberî kirinên wan jî xelatên wan her tim bûne mirinek rezîl û bi îbret.

Li Rojhilatê Kurdistanê wê demê du begîtiyên din ên bi bandor jî Begîtiyên Erdalan û Mukriyan in. Paytexta Mukriyan Mahabad e. Tê zanîn ku dîroka Begîtiya Erdalan jî hê kevntir e û diçe heta sedsala 13' emîn. Erdnîgariyên ku Hemedan bi bandor bûn jî Mûsil û Kirmanşan in. Goristanên Darîûs ên wek Kîtabeyên Taqûstan di dîrokê de derbas dibe, li vê qadê ne. Begîtiya Erdalan a ku demek dirêj li ser piyan maye; di şerê mabeyna Zendan û Kacaran de, dikare ecêb were, lê li gel Kacaran cihê xwe digirin.

Di vê demê de ku wek Serdema Navîn tê binavkirin, Mîrîtiyên Kurdan bi awayekî pratîkî serbixwe ne. Ji milê avahiya aborî, çînîbûn û sazîbûnên siyasî jî feodalîzm serwer bû. Beriya sedsala

16'emîn, Begîtiyên Kurd dîsa serbixwe bûn. Osmaniyan berê xwe dabûn rojava. Li sînor nakokî zêde bûn. Lê, bi tifaqa Osmanî û êrîşên Osmanî yên li ser rojhilat, her çiqasî serxwebûna wan dewam bike jî, di esas de dibû destpêkirina tasfiyeyê. Mantiqê damezrîner a rêxistinbûyîna îdarî û siyasî ya Osmaniyan ew bû ku li qadên dagirkirî îdareyên nerm û xwe dispêrin xwecih bêne avakirin. Ji ber ku Begîtiyên Kurd li pêşiya Dewleta Safewî ya Îranê dibû bendek, serxwebûna pratîkî ya Begîtiyên Kurdan pêkan dibû. Her wiha, lihevkerina Osmanî û Kurdan, berê Osmaniyan dida rojhilat û ew dikir hêzek mezin, li gel vê jî tehlûkeyên ji rojhilat dihat jî berteref dikirin.

Li vir wê baş be ku em navên hin wêjevan û helbestvanên Kurd ên di sedsalên mabeyna 15'an û 19'an de jiyane bînin ziman. Ji helbestvanên herî mezin ê dîroka Kurdistanê Ehmedê Xanî (1651-1707) ku bi eslê xwe ji Colemêrgê ye, Mele Ehmedê Batê yê Colemêrgî (1417-1491), ji Cizîrê Melayê Cizîrî (1407-1481), Selîm Suleyman (sedsala 16.- sedsala 17.), Îsmail Beyazidî (1645-1709), Xaris Bedlîsî (1758-). Xanayê Qubadî yê Hewremanî (1759), Mele Muhammedê Qutub, Ehmed Begê Zengene, Mîrza Şafî Kûlyayî (1763) ku bi zimanê Hewreman dinivîse, Mûrad Xan ê Beyazidî (1737-1785), Welî Dêwane (1747-1798) ku bi zimanê Hewreman dinivîse, Melayê Jaba, Hana Qubadî (1700-1759) ku bi Goranî dinivîse û hwd.

Nivîskarê pirtûka Şerefname ya ku di dîroka Kurdistanê de ji bo kûrkirina xebatên dîrokê bûye çavkaniya îlhamê, Şerefhan Bedlîsî ye (1543-1604).

Me diyar kiribû ku di Dîroka Kurdistanê de jin her tim bûne xwedî cihê xweser. Ji bo van mînakê baş jî Dayika Lepzerîn Gewher Xatûn (li hin cihan wek Guhar derbas dibe) û hevjîna wî Zadîre Xanim e. Her wiha Xanzade Sultan e ku mabeyna 1623-1640'an li Herêma Herîr-Soran femandariya leşkerî kiriye.

BEŞA PÊNCÊMÎN: DI SEDSALA 19. DE KURDISTAN Û BERXWEDAN

Rewşa Osmaniyan

Wek me li jor jî diyar kir, Osmanî bi ferasetêke federatîf nêzî Kurdan dibû. Osmaniyan li şûna helandinê, yekparebûn esas girt. Li gor rêveberiya xwecih tevdigeriya. Sedemek din a vê nêzîkatiya li beramberî Kurdan jî ew bû ku nedixwest Kurd ber bi Safewiyan ve bişemitin.

Van her du mekanîzmayan, heta çend sedsalan jî çawahiya têkiliyên Begîtiyên Kurd û Dewleta Osmaniyan diyar kirin. Û begîtiyên xwecih ên Kurd jî li gor statuyek xweser a ku ev têkiliyên sist ên li gel desthilatdariya navendî îmkân dide; ji hêla malbatên Kurd hatin birêvebirin. Ev malbatên Kurd ji hêla Dewleta Osmaniyan bi payeyên îdarî û siyasî hatine xelatkirin û payekirin.

Dewleta Osmaniyan her ku li Ewrûpayê berteng bû û xak ji dest dida, berê xwe dida rojhilat. Pêvajoya ku bi têkçûna li ber Vîyana-Karlsberg dest pê kir, di sala 1699'an de bi peymanê Karlofça û sala 1718'an jî bi peymanê Pasarofçayê, êdî wisa li Osmaniyan hatibû ku nema dikarîbû li rojava bisekine. Ev rewş jî dihat wateya ku her roj wê xakên nû ji dest bide. Lewma jî, dema Osmaniyan hêdî hêdî berê xwe didan rojhilat; li rojhilat bac zêde dikir û hê bêhtir leşker dixwestin. Di nav xwe de jî pêdivî bi nûbûnê didît. Wê ji vê lêgerîna nûbûnê re "Pêvajoya Islahat-Reforman" bihata gotin. Pêşî, ev reform bi taybet li ser artêşê xistin meriyetê. Êdî hilgirtina vî barê gelekî bi mesrefê artêşê, zehf giran bû. Pêdivî bû ku hin guhertin di artêşê de bibin. Di salên 1792-93'yan de ji hêla Sultan Selîmê Sêyemîn pêkanîna Nîzam-i Cedîd ket dewrê. Vebûn; ji bo qadên aborî û îdarî jî dihatin fikrandin. Lê, Ocaxa Yenîçerîyan di sala 1807'an de serî rakirin û dawî li rêveberiya Selîmê Sêyemîn anîn.

Em demildest vê diyar bikin ku; Yewnanî serî hildidin, li rojava xak ji dest diçin, li rojhilat, Misr jî dikele. Hikûmeta Osmaniyan a

Navendî lewaz dibû, rêveberiyên xwecih ji ber rêxistinbûyîna siyasî-îdarî ya Osmaniyan xurt dibûn û her ku diçûn jî ji bo Osmaniyan wek gef dihatin dîtin.

Humayûna Xeta Gulhane di sala 1839'an de pêk hat û wek Fermana Tanzîmatê tê zanîn. Vê Fermanê, ev rewş hê bêhtir kûr kir. Guhertin, ji ber pîrsgirêkên heyî ketibû rojevê. Piştî ku Ocaxa Yenîçeriyên hat rakirin, li şûna wê bi navê "*Asakîr-î Mansûre-î Muhammediye*" artêşek nû hat avakirin. Ev artêşa ku bingeha artêşên roja me daniye, li gor usûla Ewrûpayê hat rêkûpêkkirin. Li gor tumen, tabûr û bolukan hat dabeşkirin. Her çiqasî Yenîçerî li dijî vê jî derketibin, îşyana vê carê tê tepeserkirin. Ji vê bûyerê re Vaka-î Hayriye hat gotin. Ango ev bûyer wek waqayek bi xêr derbasî dîrokê dibe. Bi vê jî yenîçerîti tê rakirin. Li şûna Ocaxên Yenîçeriyên ku ji kesên berhevkerî pêk dihat; di artêşa nû de yekîneyên leşkerî yên bi taybet ji misilmanan pêk dihat û xwedî taybetmendiyên nêzî herêmê bûn, hat avakirin.

Her wiha; şerê li dijî Rûsan jî giran bibû. Rûsên ku hewl didan ji bakur dakevin Derya Spî, Osmanî tengav dikirin. Li beramberî vê jî rojava, ji bo karibe "*Zîlamê nexweş ê li Bosporûsê (Derbenda Stenbolê)*" li ser piyan bigire, destek dida.

Ji destpêka 1800'î ve Osmanî ketibû nav derdê jiyana xwe. Mahmûdê Duyemîn sala 1808'an li ser textê rûnişt. Di pêvajoya Mahmûdê Duyemîn de wê dîsa li Kurdistanê gelek tişt bihatana guhertin. Bi temamî dagirkirina erdnîgariya Kurdistanê wê ji van salan û şûn ve bi pêş bikeve. Di pêvajoya tifaqê de ku bi Yavûz Sûltan Selîm re dest pê kiribû, rewşek dagirkirin an jî mêtîngerîya Kurdistanê nînbû. Mimkun e ew derfetên ku Osmaniyan li qadên din pêşkêşî tebaayên xwe nekirine, pêşkêşî Kurdan hatine kirin. Osmanî, ew êşa xwe ya windakirina şer û xakên li rojava, ji rojhilat derdixe. Wê hewl bê dayîn ku baceyên daketî û leşkerên kêmbûyî ji vir werin temînkirin. Ji bilî sînardarkirina rayeyên begîtiyên ku serbixwe bûn, rewşek dorpêçê çêbûye. Wê tifaq, lihevketin, peyman werin betalkirin, dest li erdnîgarî û karên navxweyî yên Kurdan bê werdan, wezîfeyên ku zêdetirî hêza Kurdan li ser wan bîne ferzkirin û bi ser Mîrîtiyên Kurdan de biçin. Di vê rewşê de wê Mîrîtiyên Kurdan di astek pir cidî de tengav bibin. Her çiqasî ev aloziya di nav Osmaniyan de hûrikûr neyê dîtin jî,

zordayinên ji bakur Rûs, ji rojava jî Yewnanî didin, wê berbiçavtir bibin. Li başûr, serhildana Mehmet Elî Paşayê Misrî heye û ber bi navenda Osmaniyan dimeşe. Li ber pozê wan, Bulgarîstanê, şerê azadiyê heye. Di vê atmosfera tengizî de wê li dijî Osmaniyan berxwedan û îsyar xwe bidin der. Bi vî şiklî jî pêvajoyek nû dest pê dike.

Bûyer û diyardeyên dirokî bi vî şiklî bi pêş dikevin; her wiha divê bê destnîşankirin ku li Ewrûpayê jî modernîteya kapîtalîst desthilatdariyek navendî bi xurtî saz kiriye, xwe li hawîrdorê berbelav dike û hedef dike ku çerxên xwe yên mêtinê pêş bixe. Kapîtalîzm; bi rejîma piyasayên sermayeyê û kara herî zêde û netewe dewletokên ku homojentiyê bi pêş dixin jî li cem şoreşa karxaneyan ve bi endustriyalîzm, nîjadperestiyê ve; ji Hegemonyaya Navendî ya Rojavayê Ewrûpayê ber bi derdorê ve berbelav dibe. Ewîl Rojhilatê Ewrûpayê, di destpêka hedefan de Rojhilata Navîn, Afrîka, Qafkasya û Asya hene. Pêşengî ji hêla Îngilîzan tê kirin. Rêya ku ji bo Împaratoriya Osmaniyan bi awayekî tendurist karibe tevî sîstema kapîtalîst a nû bibe, wê bi dest Sultan bi îqnakirina eyalet û tebaayê pêk bihata. Ew jî nebûya, wê rêbaza zorê ya herî dijwar bihata bikaranîn, sîstema hegemonîk a nû bidana qebûlkin. Lewma jî, derengxistina hilweşîna Osmaniyan wê li gor berjewendiyên Îngilîzan bûya. Çi heye ku wê ev pêvajo li Kurdistanê wek tê hesibandin pêk nehata û giştî sedsal wê tijî îsyar û berxwedan bûna.

Li Rojhilata Navîn Siyaseta Îngilîzan

Îsyar û berxwedanên ku wê tevahî sed salekê bidomiya, wê parçe parçe li qadên cuda yên Kurdistanê jî rû bidana. Osmanî ya ku li rojava û başûr tengav bibû, dema hewl dide li ser Kurdistanê serweriya xwe ava bike, tiştê diqewime jî tevgereke dagirkirinê ye. Begîtî û Mîrîtiyên Kurdan ên ku bi sedan salan serbixwe û xweser mabûn, êşkere ye ku wê li dijî vê hewldana serweriyê rabin. Em vê jî bêjin; di warê îdeolojîk de ti dijberiya Mîrîtiyên Kurdan bi Osmaniyan re tineye. Li ser vî esasî jî eger em bêjin beriya vê ti derdekî wan ê Kurd û Kurdistanê nîne jî wê nebe tespîtek nepixandî.

Ya bûyî, bi temamî berxwedana ji bo berjewendiyên mîrîtiyên xwe ne.

Destpêka 1800'î, salên çalakbûna Emperyalîzma Îngilîzan e ku li sehayên cuda yên Rojhilata Navîn pêk tînin. Bi gotinek rasttir, wê gav bi gav bi bandor bibin. Ji bo ku karibin li ser mîrateya Osmaniyên nexweş a hildiweşe rûnên, hesabên cur bi cur tên kirin. Fransî jî xwe kêmi van nahêle, her kes li gor xwe mîsyonerên girêdayî xwe dişînin û hewl didin rêxistinbûyîna xwe saz bikin.

Di pirtûka **Zinarên Tanîos** a Amîn Maaloûf de bûyereke têkil-darî tarzê xebitîna mîsyoneran û armancên wan ev tên gotin:

Kurekî biçûk ê liderê eşîrek Lubnanê heye. Li gel kurê kehyayê wî ku çend salan jê mezintir e, diçin dibistaneke dûr. Dibistan a mîsyonerên Îngilîzan e. Kurê malbateke bi bandor li cem xwe girtine. Karê yekem ew e ku wê vê ji Îngilîstanê ragihînin. Bersiva ku ji Îngilîstanê tê jî wiha ye; *“çi dibe bila bibe, teqez van zarokan li ba xwe bigirin û qezenc bikin!”*

Mîsyoner û jina wî piştî vê fermanê, wê hê baldartir nêz bibin. Lê, kurê liderê eşîrê yekî nesekîni ye. Zehf zorê dide rêgezên exlaqî yên civakê. Destdirêjiyan li hevîna mîsyoner dike. Ji hed derketiye û vê carê mîsyoner tevî kurê kehya vî ciwanî ji dibistanê diqewirîne. Vê rewşê ji Îngilîstanê re rapor dike. Bersiva ji Îngilîstanê jî wê wiha be; *“hûn çi dikin bikin, lê wan ciwanan dîsa li dibistanê vegehin.”* Mîsyoner, berdêla wê şer jî be, destdirêjî jî be, wê biçe û zarokan bîne. Her çi dibe bila bibe, ji bo siberojê ne.

Ev xebatek mîsyoneran e. Bêyî hayê ti kesî jê çêbikin, tovên siberojê di bin kontrola xwe de diçînin û li ser esasê bibe belaya serê gelên Rojhilata Navîn jî digihînin. Her çawa bibe jî, wê ev kesayetên dewşîrme, sibe li Rojhilata Navîn bibin hevkar û sîxurên Îngilîzan. Pirsgerêk li vir ne ew e ku hin bibin sîxurên sêbjektîf. Yên mejî û dilên wan hatine qezenckirin, siberojê jî wê dilsozên wan bin. Abdullah Ocalan tovên wisa tên mezinkirin mîna **“gi-handî”** û **“spartî”** bi nav dike. Ev tîp wisa ne ku bi spartinê li ser civakê tene ferzîkirin û qaşo fetihkarên bi rola Hespa Trûvayê gi-hayî ne!

Ji bo dîtina encamgiriya vê rastiye, mêzekirina li Rojhilata Navîn a îro wê têrker be. Gelek malik, beg û qral li dibistanên

Îngilîz-Fransiyan gihane. Ji vê hê wêdetir, dayika piraniyên wan bi eslê xwe biyanî ne. Ev jî kûrahiya gotinên me nîşan dide. Helbet, em zewacên derve rexne nakin. Lê, diyardeya li vir tê ziman ev e; bê hêzên emperyalîst bi kîjan rê û rêbazan mirovên Rojhilata Navîn bi xwe ve didin girêdan û wan li dijî civakên wan dixin nav îxanetê.

Îngilîzan, bi taybet û xwecih hewl dane bi komên Xrîstîyan ên mîna Asûrî, Keldanî, Suryanî û Ermenîyan têkiliyan deynin, sozên cur bi cur dane wan û xwestine bi xwe ve bidin girêdan. Di heman çarçoveyê de pêwendî li cem gelek Mîrîtiyên Kurda jî danîne. Armanca esas jî ew e Osmaniyan lewaz bikin, hê zêdetir kapîtu-lasyonan jê bistînin û helbet bi kîjan cihê ve dixwazin karibin ber bi wir ve bikşînin. Îngilîzan hem karta Osmaniyan hem karta Kurda hem jî yên kêmnetewe û li xwecih bi awayekî serkeftî bi kar tanîn. Dema pêwîst dibû jî bi hev ve didan şikandin.

Berxwedan û Îşyanên di Sedsala 19. de Pêş Ketin û Karakterên Serwerên Kurd



Kurdish Independent Kingdoms and Autonomous Principalities circa 1835:

BABAN - Independent kingdom or principality and its approximate domain

ARDALAN - Autonomous vassal principalities and khanates


Starburst - Capital

Star - A major populous city

— - International boundaries

— - Boundaries of autonomous principality

Di atmosferek wi-
sa tevlîhev de gelek
îşyan û berxwedan
çêdibin. Wê di cih de
be ku em bi dehan
îşyan û berxwedanên
ku domahiya 1800'î
rû dane, wiha rêz
bikin:



1- 1805, 1806, 1808 Îsyana Babanan; mabeyna salên 1789-1813 li vê mîrîtiyê “şex şerên mezin diqewimin. Ev şer, şerên parastina qedere û sexwebûna mîrîtiyê ne.”

2- Sala 1812 Îsyana Babanzade Ehmed Paşa. Ev raperîna li Silêmaniyê wek Raperîna Babanzadeyê Duyem jî tê binavkirin. Bi darvekirina Ehmed Paşa bi encam bûye.

3-1815 berxwedanên gundiyan:

Di heman demê de ev berxwedan li dijî serokeşîrên zorbe jî çêdibin. Qada berxwedanê qadên Bazid, Wan, Xoy, Erîvan û Ma-ku ne. Her çiqasî li qadek berfireh belav bûye jî ji ber ne bi rêxistinî bûn û pêşengê wan tinebûn, zû hatine tasfiyekirin.

4-1818 Berxwedana Bîlbasan; Salên 1818-20-22 hem li dijî Osmaniyan, hem jî Îranê bi pêş dikeve. Eşîra Bîlbasa her çiqasî li dijî zexta her du dewletan rabibe jî zû hatiye tasfiyekirin.

5-1820 li Sêwasê Berxwedana Eşîrên Zaza. Li Dêrsim û dora wê bi bandor bûye. Her çiqasî israra Osmaniyan hebû jî heta nîvê sedsalê nikarîbû li ser herêmê serweriya xwe saz bike.

6-1820-1829 Berxwedana Emîr Paşa:

Li dijî komkirina bacê û zexta Osmaniyan, eşîrên Serhedê nerehetiyên xwe tînin ziman. Dema şerê Osmanî-Rûsan, Kurdên di pêşengiya Emîr Paşa de dixwazin ji vê sûdê wergirin, alîkariyê ji Rûsan jî bigirin û li dijî Osmaniyan têbikoşin. Lê ji ber ku Rûsan xwe wisa nêz nekir, zû hat tepisandin.

7-Mabeyna salên 1820-37'an de Îsyana hakimê Mîrîtiya Soran Mîr Muhammed.

8-1830-33 li dora Çiyayê Sîncar Berxwedana Kurdên Êzîdî û Tirkmenan.

9-Piştî 1832'yan Berxwedana Mêrdînê; Piştî ku artêşa Osmanî li beramberî artêşa Misrê têk diçe derdikeve.

10- Di 1834'an de piştî Konfederasyona Eşîra Milî belav dibe, di eynî salê de li dijî Reşîd Paşa li dora Hezro-Farqînê di pêşengi-ya Mîrza Axa de berxwedan rû dide.

11-1834 berxwedana li dor Bedlîsê, lê 1849'an tê pelçiqandin.

12-1838'an Berxwedana yek ji begên Botanê Seîd Beg û desteserkirina kelheyê.

13-1839 Berxwedana Xerzanê. Li dora Amed, Mêrdîn û Sêrtê bi bandor dibe. Ji hêla eşîrên Xerzanê yên ku dayina leşker û bacan red dikin, dest pê dike. Berxwedana ku ji hêla Hafîz Paşa bi xwînrijî tê pelçiqandin, 214 rojan dewam dike.

14-1840-1842 Raperînên Gundîyan, (Rojhilatê Kurdistanê): Di salên 1840'î de gundiyên li herêma Xoyê li dijî hem Îranê hem jî begên Kurd ên nerehetiyê ava dikin, serî hildidin. Dewleta Îranê bi taktîka pevşikandina gelan ve Asûriyên ku li dora Urmiyê dijîn li ba xwe digire û bi destên wan dipelçiqîne.

15-1842-47 Îsyana Bedirxan Beg. Bidawîbûna Mîrîtiya Cizîr-Botanê.

16-1846, Îsyana Resûl Paşa: Birayê Mîr Muhammed Resûl Paşa, piştî ku Mîr Muhammed tê qetilkirin, dibe lîderê Mîrîtiya Soran. Lê êdî mîrîtî ne wek berê xweser e, Osmanî hê zêdetir li ser serwer in. Ev jî rê li ber nerehetîyan vedike. Dîsa, xurtbûyîna Resûl Paşa jî dibe sedema nerehetîya Osmaniyan. Dema lêgerînên lihevkerîne nebûn çare, Kurdan li ber xwe dane. Li ser vê jî artêşeke di bin femandariya Waliyê Bexdayê yê Osmaniyan Ragîp Paşa

de berê xwe dide Resûl Paşa, têk dibe, tevahî heyinên wî desteser dikin û dawiyê li Mîrîtiya Soran tînin.

17-1847 Îsyana Babanzade Ehmed Paşa: Ji Babanan Ehmed Paşa, tasfiyeya Mîrîtiya Soranan wek firsendê bi kar aniye, hewl daye bigihêje hedefa Mîrîtiya berê, lê ji ber ku Bedirxanan li Kurdistanê Mîrîti bi dest anîne, ev nebûye. Piştî Bedirxan û Mîrê Soranan Resûl Paşa têk diçin, ji bo Babanzade Ehmed Paşa hêvî û firsendên nû çêdibin, hewl dide sinorên begîtiya xwe firehtir bike. Ji ber Osmaniyan dizanibûn ku bê pêşketina Babanzadeyan tê çî wateyê, bi bayê lezê hereket kirin û bi destê waliyên xwe yên Bexdayê dawî li Mîrîtiya Babanan anîn.

18-1853-56 Berxwedana Îzzeddîn Yezdanşêr.

19-1856, li wîlayeta Amedê Reşkotaniyan (li dora Sason û Êlihê) dest bi îsyane kirin.

20-1860, Artêşên Osmaniyan dîsa berê artêşên xwe dan Dêrsimê.

21-1870 Berxwedana Celalî: Osmanî hatin û çûyina Rojhilatê Kurdistanê li eşîra Celaliyan a koçer qedexe dike û êrîşê dibe ser eşîrên koçer ên ku hewl didin ji Rojhilatê Kurdistanê derbasî Bakur bibin. Wê demê jî berxwedanên bi salan dest pê dikin.

22-1875 Berxwedana Dêrsimê: Dewleta Osmanî ji bo karibe Dêrsimê kontrol bike, biryar da ku rêyekê ava bike. Dema hewl dan mesrefên vê rêyê jî bide ser milên gelê Dêrsimê, wê demê gelê Dêrsimê bi seknek hişk bersiv dan û şerekî giran rû da. Osmaniyan bi femandariya Îsmail Hakki Paşa artêşek mezin şandin Dêrsimê û serhildan pelçiqandin.

23-Sala 1877'an Kurdên li Dêrsimê careke din rabûn ser piyan.

24-1878 Îsyana Duyemîn a Kurên Bedirxan Beg.

25-1879, li dijî memûrên darayî yên ku ji bo komkirina bacê çûn Şemrexê, Kurdan serî rakirin.

26-1879, li herêma mabeyna Wan, Agiriyê eşîra Haydaran serî hilda.

27-1880-82 Îsyana Ubeydullah Nehrî

28-1887 Raperîna eşîrên Geverîkî û Deştî: Dema lîderê eşîra Deştiyan Huseyîn ê ku li beramberî zexta ku li Urmiyê bi ser eşîran de hatî serî hildabû, li zindanê tê qetilkirin, serhildan li qadek berfireh belav dibe. Navbeynkar dikevin nav, Waliyên ku li Urmiyê û Serdeştê zorbetî li gel kirine ji wezîfeyê tên kirin û li şûna wan serokeşîrên Kurdan tên tayînkirin. Piştî vê jî serhildan bi dawî dibe.

29-Hewldana Sêyemîn û Dawiyê ya Bedirxaniyan- (1889)

Berxwedana Mîrtiya Baban

Mîrtiya Babanan a ku li Şehrezor û dora wê serwer bû, yek ji Mîrtiyên kevn û xurt ên Başûrê Kurdistanê ye. Sala 1786'an, navenda wan bajarê Silêmaniyê ji hêla Îbrahîm Baban Paşa hatiye avakirin. Girîngiya Mîrtiya Babanan ew bû ku li herêma sînora mabeyna Osmanî û Îranê cih digirt. Ji ber vê jî her tim di navbera Osmanî û Îranê de ji qewet diket. Artêşek bi qewet, çalak û baş a Mîrtiya Babanan hebû.

Di pirtûka **“Eşîretî û Milliyetgeriyê”** de têkildarî Babanan ev tîn nivîsandin;

“Mîrtiya Babanan, li Başûrê Kurdistanê li dora Silêmaniyê bûye, bi taybet jî di salên 1550-1850'î de bûne xwedî rolek berbiçav. Girêdayî Împaratoriya Osmaniyan bûn. Li dijî Mîrtiya Kurd Erdalan a alîgirê Persan, li ba Dewleta Osmaniyan tevî hareketa dagirkirinê bû. Ji ber li sînoren Dewleta Îranê jî bû, dem bi dem alî guheriye û hewl daye hêza xwe zêde bike. Bûye xwedî karakterek dualî. Di sedsala 17'emîn de girêdana xwe ya Dewleta Osmaniyan pêş xistin, paşnavê Paşa stendin. Di nav sînoren Begîtiyê de nîfûsek qelebalix hebû. Yên xwedî eşîr, bi rêka reîsan dihatin birêvebirin. Yên eşîran wan nîne jî bi rêya waliyên ku Mîr tayîn dike, dihatin birêvebirin. Rêveberî tim bi tim diguherî. Yê dibû rêveber, bi kadroyên xwe dest bi kar dikir û li gor wê jî dihatin peywidarkirin. Ji ber guhertin li ser hev dibû, rayedarên dihatin wezîfedarkirin jî ji bo hêza xwe ya madî zêde bikin mêtingeriyek hişkî dimeşandin. Burokrasî bi sîstem nebû, tim bi tim guherî. Yên bijartî, li ser gundiyên bêeşîr tahakumek giran dikirin. Dema Ja-

mes C. Rich ê ku 1820'an serdana vê mîrîtiyê kiribû, çavdêriyên xwe vedibêje, diyar dike ku rêxistinbûyîna nav qesrê wek taklîdek Dewleta Osmaniyan e."

Abdûrrahman Paşa sala 1789'an dibe Mîrê Babanan. Waliyê Bexdayê yê ku Mîrîtiya Babanan pê girêdayî ye, nedixwest Abdûrrahman Paşa bibe serokê Mîrîtiyê. Li beramberî vê helwesta Waliyê Bexdayê jî Abdûrrahman Paşa hêz bi kar anî û bû serokê mîrîtiyê. Abdûrrahman Paşa hê ji roja yekem ve dixwest ji sultaya Waliyê Bexdayê rizgar bibe. Dema tê ser mîrîtiyê jî, ragihand ku Bexda nikare têkilî karên hundirê mîrîtiyê bibe. Di dema Abdûrrahman Paşa de hêz û bandora mîrîtiyê hê zêdetir bûye û Abdûrrahman Paşa dibe hikumdarê herî bi bandor ê tevahî Kurdistanê.

Li ser van jî, fikirên Împaratoriya Osmaniyan a li beramberî xurtbûyîna Abdûrrahman Paşa hê zêdetir dibe û ji bo karibe hev-sengiyê ava bike jî serokeşîrekî hevrik tayînî Mîrîtiya Silêmaniyê dike. Li hemberî vê rewşê jî sala 1806'an Begîtiya Babanan serî hildide. Domahiya desthilatdariya 24 salan a Abdûrrahman Paşa de şeş şerên mezin di binyeya mîrîtiyê de rû dane. Lê, ev berxwedana 1806'an, hê berfirehtir û berbelavtir e. Abdûrrahman Paşa yê serhildêr, Mîrê Silêmaniyê yê nû hatî tayînkirin dukuje û li dijî Osmaniyan serkeftinek mezin bi dest tîne. Lê, Osmanî bi hêzeke mezin diçin ser vê berxwedanê. Şer carinan vediguheze Kurdistana Îranê. Di vî şerî de ku nêzî 3 salan dewam dike, hêzên Abdûrrahman Paşa serkeftinek mezin bi dest tînin û tam dike berxwedanê serkeftî bike, birayê Abdûrrahman Paşa Xalid Paşa û hin xizmên wî îxanetê lê dikin, derbasî refên Osmaniyan dibin. Ji ber vê sedemê, di sala 1808'an de tevger tê pelçiqandin. Her çiqasî di sala 1812'an de kurê Abdûrrahman Paşa Ehmed Beg dest bi berxwedanê bike jî wê zû bê tepeserkirin. Berxwedanên parçe parçe mîna mîrîtiyên din wê li vir jî her bidome.

Teşîya Kurdan dişa zivîrî ye. Yên ku herî nêzî serhildêr in an jî divê nêz bin, ji bo rant û berjewendiyên biçûk derbasî aliyê dijmin dibin û rola xwe ya xencera ji pişt ve mîna Enkîdûyê beriya bi hezaran salan bi cih tînin.

Berxwedana duyemîn jî sala 1818'an, berxwedana Bîlbasan e. Ev berxwedan, bi giranî li qadên ku îro em wek Rojhilatê Kurdistanê dizanin, pêk tê. Her ku diçe li derdorê berbelav dibe. Kurên

koçer ên li Nahçivan, Erîvan û Xoyê jî tevî dibin. Di esas de karakterek cuda ya vê berxwedanê heye. Zêdetirî serhildanek serweran ango çîna jorîn a Kurdan, berxwedanek gundiyan û koçeran e. Her çiqasî Osmaniyan bi alîkariya Îraniyan hewl dabîn bitepîşîn jî, cih bi cih wê berbelav bibe û veguheze qadên cudatir. Lê ji ber ne bi rêxistinî bû, wê bê pelçiqandin. Ji ber karaktera xwe ya çînî jî, teqez e ku divê bi girîngiyekê bîn nirxandin. Her wiha em diyar bikin ku di heman sedsalê de li dijî Osmanî û Îraniyan gelek berxwedanên din jî pêş ketine.

Salên 1830-33'yan, li dora çiyayê Şengalê Berxwedana Kurdên Êzîdî û Tirkmenan pêş dikeve, lê bêtirî serkeftinekê bi dest bînin wê bêne pelçiqandin. Mîr Muhammed Paşa yê ku niha em ê behsê bikin, wê vê îşyanê bipelçiqîne û qetlîaman bike.

Berxwedana Rewandûzê

Mîr Muhammed, di 1788'an de li Rewandûzê hatiye dinyayê. Mîr Muhammed di wê demê de li medreseyê perwerdeya xwe dibîne, kesayetek oldar e. Di sala 1814'an de li şûna bavê wî yê ji eşîra Revadî Sarim Beg, dibe lîderê Begîtiya Soran. Kesayetek wisa ye ku li oldarên mîna Mele Muhammedê Xatê, Mele Yehyayî Mizorî guhdar dike.

Mîr, bi baldarî nêzî saxlemkirina hêza parastinê dibe. Tê gotin ku Mîr Muhammed çeksazan û hosteyên îşeatê dawetî welêt dike, li Rewandûzê çek û cebîlxane kom dike, li gor hin rîwayetan li 10.000 kesên artêşê, li gor hinekan jî li 40.000 kesî çek û unîformayan belav dike. Mîr, sûtê ji nakokî û şerê mabeyna Osmanî û Îranê werdigire û hîmekî ku dikare sînorên xwe gelekî berfireh bike ava dike. Di sala 1827'an de Mîrîtiya Babanan kontrol dike. Dûvre berê xwe dide Behdînanê û wan deran desteser dike. Û di sala 1832'yan de jî Behdînanê bi temamî kontrol dike. Heta, dewleta Osmaniyan ji bo nekevin pozîsyonek dijber, yek ji payeyên herî bilind, "Mîrêmîran" didinê. Her wiha, Îranê jî serxwebûna mîrîtiyê qebûl kiriye.

Mîr, li gel Mehmet Elî Paşayê Kavalayî yê ku li Misrê li dijî Osmaniyan serî rakirîye, pêwendiyê datîne, peymana dostaniyê

îmze kiriye. Di destpêka salên 30'î de desthilatdariya Mîr êdî ji Mûsilê heya sînorê Îranê, heta xwe digihîne sînorên Azerbaycanê yê li bakurê Îranê, berfireh bûye. Di sala 1830'î de Mîr serxwebûna xwe radigihîne.

Di vê navê de, wek me li jor jî diyar kir koma Êzîdiyên Kurd ên ku ji têkiliyên eşîrî yên şaristaniyê û dejenerebûyî dûr ketine, wek alternatîfa formata Îslama desthilat, baweriyên Zerdeştîya kevn û Îslamê sentez kirine û hebûna xwe saz kirine; ji hêla her cure desthilatdarî û hêzên hegemonyayê bi hincetên cur bi cur hatine hedefkirin. Mîr Muhammed jî xwe ji vê kevnêsopiya desthilatparêz nedaye paş. Sala 1831'an, dema Êzîdiyên li dora Mûsilê axeyekî Kurdê Sunnî dikujin, tê gotin ku xizmên vî axeyî tîr û alîkariyê ji Mîr dixwazin. Li ser vê jî Mîr berê xwe dide Êzîdîyan. Civaka Êzîdî nikare xwe li ber vê êrîşê bigire, li derdorê belav dibe. Gelek Êzîdî tîr ketilkin. Gelek cemaetên Êzîdî tîr tinekin.

Her wiha, salên 1833-34'an, Mîr êrîşê dibe ser Mîrîtiya Botanê û Behdînanê. Piştî ku Mîr Behdînanê kontrol dike, vê carê jî diçe ser Begîtiya Botanê. Lê Begê Botanê Mîr Bedirxan, hêzên xwe vedikişîne û nakeve şer, bi gotinek hê rasttir, li derveyî xakên xwe şer didomîne. Li Behdînanê piştî berxwedana ku piştî derketî, Mîr Muhammed herêma Behdînanê bi temamî dagir dike û begîtiya Behdînanê ya ku bi sedan salan hebû, bi dawî dike.

Osmanî ya ku dengê xwe li fetihkirinên Mîr Muhammed nedikir, êdî serkeftin û hêrsên wî ji bo xwe xeter dîtin, ketin nav fikaran. Li gor berjewendiyên wan ên polîtîk, diviyabû ku xurtbûyîna wî bihata astengkirin, serweriya bihata bidawîkirin. Êdî li pêşîya wan astengiya Mehmet Elî Paşa yê Kavalayî jî tineye.

Beriya em çîroka vê serhildanê bi encam bikin, ji ber tîkildarî mijara me ye divê bi kurtasî be jî em behsa Îsyana Mehmet Elî Paşa yê Kavalayî bikin.

Artêşa Misrê ya di femandariya Îbrahîm Paşayê kurê Mehmet Elî Paşa de Akkayê digire û berê xwe dide Şamê. Artêşa Misrê ya ku Şamê distîne, li Neqeba Belenê artêşek Osmanîyan tîk dibe û dikeve Edeneyê (1833). Dûvre jî berê xwe dide Stenbolê. Piştî hêzên Osmanîyan ên di femandariya Sadrazam Reşîd Paşa de li Konyayê tîk diçin, êdî rêya Stenbolê ji artêşa Misrê re vedibe.

Mahmûdê Duyemîn ji ber van serkeftinên Îbrahîm Paşa, bi neçarî alîkariya Rûsan dixwaze. Çarê Rûs Nikolayê Yekemîn vê daxwazê qebûl dike, bi stola Derya Reş re Artêşek Rûs dişîne Stenbolê. Piştî ku stola Rûsan tê heta Stenbolê, wê demê pirsgirêka Misrê dibe pirsgirêkek Ewrûpayê. Îngilîstan û Fransaya ku berjewendiyên wan dikevin xeteriyê, navbeynkariyê ji Mahmûtê Duyemîn û Mehmet Elî Paşayê Kavalayî re dikin, bi peymanekê digihînin encamê. Mabeyna Osmaniyan û Mehmet Elî Paşa de Peymana Kutahyayê (1833) tê kirin. Eger em bi baldarî binirxînin, li vir Îngilîz, Rûs û Fransîz ên ku gav bi gav Osmaniyan lewaz dikin, di heman demê de jî dixwazin “*Zilamê Nexweş ê li Derbendê*” li ser piyan bimîne. Ji bo hegemonya nû heta bingeh tam amade bibe, divê zilamê nexweş li ser piyan be, lê divê ti desthilatdariyên alternatîf ên şûna vî nexweşî bigirin an jî dema mir bikevin şûnê nîn bin. Armanca van her sêyan ev e. Wek her tim, vê carê jî emperyalîst hespên xwe li singê saxlem girê didin.

Ji ber vê jî Îngilîz ji ber pêşketina Mîrîtiya Soranan bi fikar bûn û dixwestin demildest bêne tinekirin. Ji ber ku Dewletek Kurd an jî hêzek bi bandor a Kurd li vê herêmê ava bibûya, li gor fikrên wan wê tersî berjewendiyên Îngilîzan a li Kendava Basra û Hindistanê bibûya, begîtiyek Kurd a mezin û xurt wê zirar bida menfeetên wan. Dema êrîşên Rûsan ên ji bakur jî li ser vê zêde dibin, berjewendiyên Îngilîzan ên li herêmê wê bi temamî biketa tehlûkeyê. Îngilîz li herêmê rêveberiyek Osmanî ya zêf û girêdayî xwe, ji bo xwe hê sûdmend dibînin. Ji ber vê jî li dijî serhildana Mehmet Elî Paşayê Kavalayî, alîkarî dane Osmaniyan. Eger alîkariya Îngilîzan nebûya, wê Osmaniyan nikaribûya pêşî li Kavalayî bigirtana. Dora Emîrtiya Soran bû. Wezîfeya nû ya Îngilîzan jî ew bû ku ji bo ev mîrîtî bê tinekirin wê alîkarî bidana Osmaniyan.

Eger em bi rewşa xwe ya niha wisa qiyas bikin, wê gelekî ecêb be ku em di pelçiqandina Kurdan de dîsa destên Îngilîzan dibînin! Di van du sedsalên dawî de her li kû derê têkçûnek Kurdan hebe, li ku derê neheqiyek li Kurdan hatibe kirin û li ku derê plangeriyek bibe, di bin vê de destên Îngilîzan heye. Ev mijareke ku divê bi kûrahî bê nirxandin û lêkolînkirin.

Wezîfeya hilweşîna Soran, wê ji bo Waliyê Sêwasê û Sadrazamê berê Reşîd Paşa bûya. Ber bi nivê sala 1830’î ve, bi artêşek

çil hezar kesî ve berê xwe dide Soranê. Leşkerên Osmanî yê di bin fermandariya Reşîd Paşa de, di nav Kurdistanê de bi pêş ve diçin û piştî çend mehan digihêjin nêzî Rewandûzê. Heta ew cihên li ser rêya xwe jî wêran û talan nakin jî nabihurin. Reşîd Paşa, jiyan-gehên Kurdan ên serî natewînin jî ditepisîne. Wê xwe bigihîne du hêzên di bin fermandariya waliyên Mûsil û Bexdayê de jî û ber bi Soranê rêya xwe bidomîne. Jixwe ji bo pelçiqandina Soranê derke-tiye rê.

Mîr Muhammed, bêxeber e ku Reşîd Paşa bi ser wî de tê, êrîşî Rojhilatê Kurdistanê dike. Dubendiya li gel Îranê, hê xerabtir bûye. Îran, ji bo Kurdên ku Mîr ew li Rojhilatê Kurdistanê bi cih kirine derxe, artêşekê dişîne, lê bêencam dimîne. Mîr ê ku Reşîd Paşa li beramberî xwe dibîne, fêr dike ku xeta kiriye û ji Îranê re dibêje ku wê Îranê binase, bacê bidiyê û hewl dide tevgerek hevpar a her du dewletan asteng bike. Lê ji bo vê pir dereng e. Rûsya û Îngilîstanê jî ji bo êrîşî Soranê bike, alîkariya madî û polîtîk daye Îranê. Heta, konsolosxaneyê Îngilîz a li Tebrîzê, trafîkek diplo-matîk di navbera Îran û Osmaniyan de ava dike, planê jî çêdikin ku wê çawa Mîr Muhammed bînin xwar. Di demek wisa dorpêçkirî de ev êrîşa li ser Îranê bûye yek ji xetayên herî mezin ên Mîr. Li dijî wî du enî pevra vebûne.

Artêşa Osmaniyan di sala 1837'an de dorê li Rewandûzê digi-rin. Û heta Herîrê pêş diçin. Hêzên Kurd ên ku xwe kişandin qadên çiyayî, neqeban digirin û qadek berfireh kontrol dikin. Artêşa Kurd a ji çil hezar kesî, bi berxwedanê ve Osmaniyan dide vekişandin. Reşîd Paşa piştî vê serneketîbûnê, serî li qurnaziyê dide, pêşniyara aştiyê dike. Reşîd Paşa dibêje wê Mîr Muhammed bê efûkirin û dîsa li ser rêveberiya xwe be. Wek misilmanekî 'rast' xîtabî wî dike û bang lê dike ku xwîna misilmanan nerijê. Reşîd Paşa bi taybet jî Meleyan dixê dewrê. Mele, ji bo karibin Mîr îqna bikin dikevin nav hewldanek zêde. Her wiha fetwayan didin gel ku şerê li dijî xelîfeyê Îslamê haram e, yên li dijî Artêşa Xelîfe çekê radi-kin kafir in û wê ji jina xwe berdayî be. Bi van ve gel bandor dikin. Divê em diyar bikin ku yên di dema xwe de fetwaya qetilkirina Êzîdiyên li Şengalê dane jî heman kes bûn.

Ev rewşa tê zanîn her tim dubare dubare tê pêşiya Kurdan. Lê, her çiqaşî dubare be jî, dema mijar serwerên Kurd ên navbihurî

bin, wê ji bo berjewendiyên xwe her bikevin vê xafîkê. Ma îro ji heman bijartiyên Kurd ne wisa ne?

Mîr ê ku dibîne şert ne baş in, bi sozên hatî dayîn jî dixape, diçe cem Reşîd Paşa, girêdana xwe ya xelîfe radigihîne û aştîyê qebûl dike. Jixwe ti pîrsgirêka îdeolojîk a Mîr bi Osmaniyan re nîne. Tenê derdekî Mîr heye, ew jî serxwebûna begîtiya wî ye û wek Mîr nasîna wî ye. Dijberiya Osmaniyan ne li ser fikran e jî. Di asta gotinê de dikare Kurdbûyîn hatibe ziman, lê di esas de bi pratîkên xwe ve nîşan daye ku her kêlî dikare bi Osmanî yan jî Îranê re be.

Mîr Muhammed dişînin Stenbolê. Der barê wî de biryara îdamê hatiye dayîn, lê veşartî dihêlin. Mîr ê ku dibêje qey hatiye efûkirin û wê vegere welatê xwe, sala 1837'an, li gor hinan Sêwas, li gor hinên din Trabzon, lê li gor belgeyan jî li Amasyayê, tê qetilkirin.

Pîştî Mîr Muhammed Paşa, birayê wî Resûl Paşa tê ser Mîrîtiyê. Heta 1847'an jî Mîrê nû wê Begîtiya Soran bi rê ve bibe. Piştî Osmaniyan rewş kontrol kirin, vê gavê jî birayê Mîr Muhammed sirgûn dikin. Wisa jî, waliyekî Osmaniyan tayîn dikin û bi temamî dawiyê li Mîrîtiya Soran tînin. Bi giştî jî, piştî serîhildan tê tepeserkirin, qetlîamek mezin li Kurdistanê tê kirin. Gelek begîtî tînin tasfiyekirin.

Em li vir careke din dibînin ku ew girêka kor a Kurd dîsa xwe dubare dike. Li şûna ku ji bo berjewendiyên gel xwe bi rêxistin bike û ji bo gel tiştêkî bike, ji bo berjewendiyên xwe û malbata xwe dest bi berxwedanê dikin û rê li ber qetilkirina deh hezaran kesî vedikin. Her wiha wek her tim em dibînin, li şûna ku nakokiyên serweran bi hêzên dagirker re hebin, her di nav yekîtî û yekgirtinê de ne. Dema rewş wisa dibe jî gelekî zehmet nabe ku hêzên dagirker kengî bixwazin dawiyê lê bînin. Li vir taktîk wisa ye ku dagirker xwe didin benda demek rast, dûvre bi hemleyekê ve kelhê ji hundir pûç dike. Jixwe ya dikin jî ev e.

Ji fermandarên leşkerî yê Osmaniyan Reşîd Paşa, piştî xistina Rewandûzê vê carê jî berê xwe dide begîtiyên hê biçûktir û kêmtir xetertir. Sedem êşkere ye; dibêjim hirç va ye, tu dibêji rêç va ye. Hema teqez e ku wê Kurd ji Osmaniya lewazbûyî dûr bikevin. Ji bo vê jî beriya ku berê xwe bidin tehlûkeya mezin Bedirxaniyan,

wê wek stratejî destpêkê hedefên ku wek stratejîk xeter in, lê wek taktîk jî zû dikarin bên tinekirin bêne hilbijartin.

Mînak, sala 1838'an wê ji fermandarên mezin ên Osmaniyan Reşîd Paşa, bi ser Mehmet Seîd Paşa de biçê. Beriya vê, jixwe çibû ser Şengalê û qetlîamên mezin kiribûn. Moltke yê ku piştî wê bibe Fermandarê Giştî yê Prûsyayê, di xebata xwe ya **Nameyên Tirkiyeyê** de dibêje; *“Operasyona Mehmet Paşayê Kurd gelekî guncav pêk hatibû. Piştî top gihîştin bi 5 rojan, kelhe mecbûrî Teslîmbûyîne hatibû hiştin. Tenduristiya yekîneyan tîkûz bû (mukemmel), birîndar zehf kêr bûn û hema hema giştî ji Kurdên hevalbend bûn, ev jî ji windahiyan nedihatîn hesibandin.”* Li gel Reşîd Paşa yê ku çibû ser Mehmet Seîd Paşa, Bedirxanî jî bûn û yên ku gotine, *“birîndar zehf kêr bûn û hema hema giştî ji Kurdên hevalbend bûn, ev jî ji windahiyan nedihatîn hesibandin”* jî mimkun e ku leşkerên Bedirxan bin.

Têkildarî vê rewşa trajedîk, Moltke hin hevokên balkêştir jî dinivîse: *“Roja 12'ê Gulana 1838'an, Reşîd Paşa topên xwe li hêstiran dike, van danê êvarî di jora çem, di nav avê re daye meşandin, piştî bi meyl û ji gelekî dûr ve domahiya çil rojan kelhe daye ber topan. Herî dawî, beg bi êrîşa hevrêyê xwe Seîd Beg ê daxwaza “Raî” angoyê rîcaya dostaniyê kiriye, kelhe zeft kiriye, wek xelata vê jî albaytiya Alaya Asakîr-î Redîfe ya îro jî nav heye cism tineye, didiyê.”* Alaya Redîf, alayek leşkerî ye ku ne nîzamî ye, ji mirovên wir hatiye berhevkirin. Em vê jî bibêjin ku Seîd Paşa apê Bedirxan e.

Dema Reşîd Paşa wisa ji serî heta binî Kurdistanê dide ber xwe û dipelçiqîne, li ba xwe her begên wisa dîtiye. Vê carê jî dor tê sefera fetihkirina Xerzanê. Fermandarê vê carê yê Osmaniyan jî Hafîz Paşa ye. Qetlîamên zehf mezin dike. Mîna jî nû ve dagirkirina Kurdistanê, ev qetlîam bi şîklekî bêeman pêk tên.

Ji bo sefera Xerzanê, Moltke di bendek pirtûka xwe de dibêje, *“19. Alaya Piyadeyan, 2 alayên siwaran, çend sed spahî, bi sedan bêserûber û sê top, angoyê giştî 3000 kes deketin rê”,* bi berdewamî jî ji bo vê seferê navê Begê Şîrwanê Mût Paşa lê zêde dike. Îxanet, wisa dubare dubare dikeve jiyana Kurdan. Ji bo heman seferê dibêje; *“Ganîmet û êsîr tanîn wir. Di nav xwîne de zîlam û jin, ji pêşîrê ve zarokên ji her temenî, serî û guhên jêkirî.*

Yên van bianiyan jî bi bexşîşek 50-100 qirûşî dihatin xelatkirin” û asta qetlîaman radixe ber çavan. Gelek qetlîamên mîna vê jî ji hêla Moltke tîn rêzkerin. Di êrîşeke din de ku meha Tîrmehê pêk tê, wer dibêje; *“Leşkerên çavsor ên gihîştin jor, kî yên li ber xwe didan digirtin, mehf dikirin. 400-500 Kurd hatibûn kuştin. Dema nêzî 50 jin dihatin birin, li çemê çiya yê rabûye fetisîn.”* Bila neyê jibîrkerin ku yê hatine qetilkirin gundî ne. Li dijî gundên Kurdan, Osmanî di çarçoveya planek mezin de êrîşan li dar dixe. Li dijî van êrîşan tiştên ku Kurd dikin tenê berxwedan e. Asta qetlîaman ewqasî bilind e ku leşkerê Prûsyayê dem bi dem ji ber tevî van operasyonan nebûye, pêdiviyê dibîne ku keyfxweşiya xwe bîne ziman.

Piştî vê, li Hoşapê diçin ser Xan Mahmût ê Muksî û ditepisînin. Rewşa ku divê bê dîqetkirin jî ev e, berxwedan ji hêla Mîrê Colemêrgê Nûrûllah ê ku wê piştîre bibe yek ji fermandarên sereke yê Bedirxanan, tê tepisandin.

Her wiha, rastiyeke din a dîrokî jî ew e ku diçin ser Îsmail Paşa yê Amediyeyê û qetlîamên mezin tîn kirin.

Erê, Osmanî beriya ku li dijî Bedirxanan bikevin nav liv û tevgerê, li gor xwe rêya xwe paqij kirine. Lê çawa ecêb e ku yê ku vê paqijkirina rê nîşanî Osmaniyan dane jî Ewrûpayî ne ku îro qaşo parêzvanên mafên mirovan in û avakarên netewe dewletê ne.

Berxwedana Botanê ya Bedirxanan

Êdî dor hatiye Bedirxanan. Bedirxan, di sala 1821'an de hê di 18 saliya xwe de tî ser serê Mîrîtiya ku ji bavê wî maye. Li hinek cihan tî gotin ku Mîrîtî ji mamê wî derbasî wî bûye. Berxwedana Bedirxan a ku yek ji berxwedanên herî xurt e, sala 1842'yan rû dide, heta 20'ê Tîrmeha 1847'an dewam dike. Berxwedana Bedirxan a ku li sehayek berfireh belav dibe, pereyan çap dike, çekan saz dike, tî gotin ku ji bo çekirina keştiyan li Tetwanê hewl dide tersaneyê ava bike, ji bo ciwanên Kurd di çekan de pispor bibin bi armanca xwendinê dişînin Ewrûpayê û li ser navê xwe xutbeyê didin xwendin. Artêşa xwe nîzamî dike. Dibe xwedî artêşek nêzî 20 hezar kesî. Ji van 12 hezar kes, ji eşîrên koçer pêk tî.

Bedirxan Beg ê ku pozîsyona xwe ya leşkerî, polîtîk û sosyo-ekonomîk xurt kiriye, di sala 1842'yan de serxwebûna xwe radigihîne. Piştî demekê sîkeyên (polik) ku li pêşiyê “*Mîrê Botanê Bedirxan*” û li paşiyê jî “*Sal 1258 hîcrî*” dinivîse çap dike. Li bircên kelhê alayan dadiliqîne. Difikire ku wisa ji ew serweriya fermî ya Osmaniyan ji holê rakiriyê.

Digihêje Cizîr, Amediye, Mûsil, cih bi cih heta xeta Silêmaniyê û Wanê. Xwe digihîne Şengalê, dema li wir bi berxwedana Êzidiyan re rûbirû tê, bi hezaran Êzîdî qetil dike. Pêwendiyên li cem begên din datîne. Li gor ragihandinên **Malmisanîj** ku di xebata **Bedirxaniyên Cizîra Botanê** de vedibêje; “*Di artêşê de Ermenîyan hêzek girîng pêk dianîn, di nav şewirmend û fermandarên artêşa wî de Ermeniyên wek Stephan Manoglyan, Oganeg Çalktryan û Mir Marto hebûn ku ji van Manoglyan li dibistana Îtalyan a li Stenbolê perwerde dîtibû. Fransî, Îtalyanî û Tirkî dizanî.*”


“Ev derketina mîna derketinek bi îdîa, bi xweşbinî nêzî ol û kêmeteweyan dibû. Hin fermandarên Bedirxan Ermenî ne. Hin Asûrî ne. Dema ku Bedirxan Beg dibe hêz û sînorên xwe baş berfireh dike, bi tehrîkkirina mîsyoner û ajanên Îngilîz û DYA, Suryanî ji bo îsyana li dijî Bedirxan Beg tîrî teşwîqkirin.”

Piştî jî, ji ber Bedirxan li dijî Suryaniyan dikeve nav hewldana qetilkirina Suryaniyan, bi boneya li dijî gelên Xristiyan qetlîamek pêk tê, Ewrûpî dibin xwedî derfet ku dest li Osmaniyan werdin. Her çiqasî Bedirxan Beg, nûnerek ji bo lîderê Nastûrî Mar Şamûn şandibe û daxwaza lihevhatinê kiribe jî, Mar Şamûn ev nûner qebûl nekiriye û ev hewldan jî serneketiye. Ji 8 eşîrên Nastûrî yê di senceqa Colemêrgê de 11 hezar kesên çekdar ji hêla Fransîz û Îngilîzan tîrî sorkirin, berê xwe didin gundên Kurdan. Bi awayekî hê şênbertir, dema bi tehrîka Îngilîzan ve Nastûrî 2 zilamên oldar ên nêzî Bedirxan qetil dikin, her tişt qut dibin û du gelên ku bi hezaran salan bi hev re jiyane jî dikin dijminên hevûdu. De îcar li ser vê jî xebatên taybet ên mîsyoneran zêde dibin, rewşa jixwe hesas bû, vê carê diteqe.

Li ser vê, hêzên Kurd ên girêdayî Bedirxan Beg û Nûrûllah Beg, li dijî Nastûriyan dikevin nav liv û tevgerê. Nastûrî, her çiqasî

di kelheyên xwe de li ber xwe dabin jî, ji têkçûnê rizgar nabin. Piştî vê li ser herêma Tihoma jî êrîşek duyemîn pêk tê. Nastûriyên ku li vê qadê îsyar kirine, belav dibin û Mar Şamûn xwe diavêje Urmiyê. Em li vir dîsa dibin şahidê politîkayên tehrîka Îngilîzan ku bê çawa gelan bi hev ve didin şikandin. Bedirxan ê ku berê bi rêzdarî nêzî gel û komên baweriyên olî dibû, dikeve nav listoka Îngilîzan û li dijî gelan çalakiyên di asta qetlîaman de pêk tîne. Pirsgrêk helbet ne tenê listoka Îngilîzan e. Faktoreke din a girîng jî ew e ku serwerên Kurd li dijî gel û rengên cuda hêza rewakirina diyardeya “kafirîyê” jî bi kar tînin û dikevin nav helwesteke êrîşkar.

Tevî ku Mîr Bedirxan li cem Îngilîzan pêwendî danîbe jî, pêwîst e em destnîşan bikin ku li dijî Osmaniyan ti cêwaziya wî ya îdeolojîk nîne.



Wek encam, zêde dereng nabe ku li dijî Osmaniyan şer dest pê dike. Li herêmen ku li jor navên wan hatin gotin, berxwedan çêdibin û Osmanî di nav zor û zehmetiyan de tê hiştin. Artêşek mezin a

Osmaniyan ji Bedlîs û Wanê tê, bi ser Cizîrê de dimeşe. Bedirxan, li nêzî Miksê ji bo Artêşa Osmanî pêşwazî bike tevahî hêza xwe kom dike û wê hewl bide dihemleyekê bike.

Li dijî êrîşên Artêşa Osman Paşa; fermandarê herêma Miksê Abdullah Beg, fermandarê herêma Westanê Mahmût Xan, Mûstafa Paşayê Kor ê Wan diparast, bêyî berxwedanek pêwîst bikin, teslim dibin. Divê îxaneta Mîrza Begê Modîkanî jî li wê were zêdekirin. Artêşa Osmaniyan piştî ku bêyî zehmetî ev der kontrol kir, berê xwe dide herêma çiyayî ya sêgoşeya Colemêrg, Botan û Wanê ku hêzên esas ên Bedirxan Beg lê ne. Osmanî li vir berxwedanek mezin dibînin, ji ber vê jî 2 caran neçar dimînin ku vekişin. Piştî Artêşa Osmanî li gel hêzên yedek, bi taybet jî bi topan hatiye xurtkirin, dîsa êrîş dike. Lê dîsa nikare encamgir bin. Osmanê Kulek, tevî ku vê bexwedana têkneçûyî ya Bedirxanan dibîne, dîsa jî şer didomîne, lê serî li fenûfûtên Osmaniyan a bi sedan salan dide; bi sozên bertîl û rayeyên bêsînor ve kurê Mîr Sûdiyê apê Bedirxan Beg û di heman demê de fermandarê hêzên leşkerî yên Botanê Yezdanşêr dixapîne.

Osmanî bi soza text an jî begîtiyê ve Yezdanşêrê kurapê Bedirxan ku wek fermandarê Cizîrê li dewsa xwe dihêle, dikşînin aliyê xwe. Ji bilî ketina vê eniya li pişt, eniya piştê li dijî Bedirxan dibe eniyeke din a dijber. Gelek begên ku ev rewş bihîstin, wê alîkariyên xwe yên ji bo Bedirxan qut bikin, vekişînin. Bedirxan têk diçe, xwe vedikişîne kelha Ewrexê û herî dawî jî li ser esasê hin wehdên Osmaniyan radest dibe.

Dewleta Osmaniyan vî şerê ku Bedirxan Beg têk biriye ewqasî girîng dihesibîne ku; li aliyekî wê kelha Erûh a Bedirxan Beg e, rûyê din jî *“Nîşaneyê Kurdistanê”* têkçûyî ye, çap dike û li leşkerên xwe belav dike.

Em dixwazin tespîten berfireh ên Abdullah Ocalan ku hem Bedirxanan dinirxîne hem jî vê pêvajoya dîrokî bi berfirehî îzah dike, li vir bidin.

Ocalan dibêje: **“Bedirxan Beg nexasim ji mînaka Misrê ders girtibû û lewma ji salên 1820’an ve begtiya xwe timî berfireh kir; ber bi pergala dewleteke modern ve bir. Xwedî xisletên tevgerike millî ya zû destpêkirî bû. Eger nehata tepisandin,**

heye ku ber bi dewleteke netewe ve biberidiya. Tevgera ku herî zêde nêzî navlêkirina modern, bêguman tevgera bi pêşengiya Bedirxan Beg e. Lewma bûyer û polîtîkayên li dora vê tevgerê pêk hatin, mirov dikare ji bo roja me ya îro jî dersan ji wan bigire. Ingilîz bêhtir li pey pêkhatineke tampon a bisîpêrin Suryaniyan bûn. Tercîha wan di vî warî de bû. Li aliyê Bakur jî Çartiya Rûsyayê mekanîzmeyeke tampon a bi heman rengî dixwest bisîpêre Ermenîyan. Împaratoriya Osmanî û heta ya Îranê dixwestin otorîteya xwe ya navendî berfireh bikin. Ji çar aliyan ve dor li Kurdan hatibû girtin. Vê carê cudahiya vê dorgirtinê hebû, yên dihatin dor li Kurdan digirtin bi amûr û motîvasyonên modern gurçûpêçkirî bûn. Tevî ku rê li pêşiya Bedirxan Beg hebûn jî rêyên pêde biçûya bi sînor bûn. Suryanî kirin hedefa xwe û ev şasiyeke stratejîk bû. Tevî ku têkiliyên wî bi Ermenîyan re baş bûn jî ji stratejîkbûnê dûr bûn. Ya herî girîng, ji hêzeke hegemon a xwe bisîpêrê mehrûm bû. Mînaka Misrê xwe sipartibû Ingilîstanê û ber bi dewleteke netewe ya nû ve diberidî, lê Ingilîstan û Împaratoriya Rûs li beramberî Begtiya Botanê destek didan Sultaniya Osmanî. Helwesta Îranê jî neyênî bû. Her wiha di nava xwe de ji artêşeke bi şewazê gerîla ava nekiribû, rêxistîniya wî ya eskerî ji artêşên nîzamî nebihurî bû. Ji bo berxwedaneke demdirêj niyet û amadekariyên wî tinebûn. Bi rêxistin û îdeolojiyên ji rêûresmî tevdirgeriya. Ji nîzameke qanûnî wêdetir bi fermanan rêveberiya xwe dimeşand. Di nava binemalê de jî (Yezdan Şêr) li ser begtiyê xwelîhevra kişandin hebû û ev jî dibû ku weke xiyamet derkeve pêşiya wî. Tevî van xusûsan hemûyan, ji ber ku di dema xwe ya herî baş de neket nava tevgerê û bi taktîkên sultan re mijûl bû, dawî li xwe anî. Ji Bihara 1847'an ve şer dijar bû û bi xiyaneta Yezdan Beg heman salê hat tepisandin. Bi desteka hêzên Rojava ev tevgera Kurd a herî nêzî modernbûnê hat tepisandin û bi awayekî neyênî rê li ber encamên stratejîk vekir.

Bi şewazekî rêûresmî be jî saziyên çandê yên Kurdan ku xwedî xweseriyeke berfireh bûn êdî wê weke berê nikaribûna zindîbûna xwe dewam bikin. Burokrasiya navendî hewl dide gav bi gav otorîteya xwe li her goşê û quncikê belav û bi cih bike. Statuya Kurdistanê ya eyaletê her diçe teng dibe; di salên

1860'î de bi dawî kirin û navê Kurdistanê weke gotineke cografî ma. Belkî jî nîzama begtiyê ya Kurdan a ji Mîtanî û Hîtîtan ve (1600-1200 B.Z.) xwedî rêûresmeke bi kok bû êdî bi dawî dibû. Bermahiyên Begîtiyên Kurdan wê ji bo modernbûnê kabên xwe biavêjin û li metropolên mêtîngeran wê hewl bidin weke hevkarên Kurd hebûna xwe dewam bikin. Di vê babetê de çîrok û serhatiyên hem Babanzadeyan hem jî Bedirxaniyan gelekî balkêş in. Li aliyekî, kengî keysa xwe lê anîn û firsend dîtin di binî re isyan û serîrakerîyan tevdan, li aliyê din jî di avakirina dewletên netewe yên serdest de weke kadroyên herî bi tesîr rol girtin. Çi di Împaratoriye de, çi jî di damezrandina Komarê de gelek kadroyên di vê çarçoveyê de rol girtine û endamên van malbatan in, hene. Her wiha jî bi rola bavê milliyetgeriya Kurd a pêşî radibin."

Em bi şiklekî hê şênbertir behsa detayên aqûbeta Bedirxaniyan bikin wê baştir bibe. Eger em hinekî asta dijberiya Bedirxan Beg a li hemberî Osmaniyan binirxîn; jixwe me li jor jî diyar kiribû ku nakokiyek wî ya îdeolojîk bi Osmaniyan re nîne. Lê, nakokiya esasî têkildarî begîti û desthilatdariya wan e ku her diçû dihat sînordarkirin. Piştî hatin teslîmgirtin, malbata Bedirxan ji Kurdistanê sirgûnî Stenbolê tê kirin. Divê ev sirgûn wek sirgûna ku tê zanîn neyê nirxandin. Wê zarokên malbata Bedirxan biçin dibistanan û di meqamên girîng ên Osmaniyan de bibin xweyî wezîfe. Mînak, Mîr Emîn li Stenbolê bi Şefîtiya Polîsan tê wezîfedarkirin. Mîr Bedirxan ê ku li bajarê Kandiye yê Gîrîtê li sirgûnê ye, bi awayekî îronîk; dema Yewnanî dest bi îsyane dikan, bi payeya paşayê Osmaniyan ve hem jî tevî ku ne peywîrdar e, wê îsyane li Makedonya û Gîrîtê bi awayekî dijwar tepeser bike û bipelçiqîne. Bi gotinek din eger em bibêjin, Bedîrxanê ku îsyane kiribû, wek femandarekî Osmaniyan ji bo tepisandina gelên din ji hêla Osmaniyan tê wezîfedarkirin. Ev jî nîşan dide ku bê Bedîrxanî bi têgînên azadiya Kurd û Kurdistanê û bi dijbertiya Osmaniyan re çiqasî eleqeder in.

Bedirxan piştî 14 salên li Gîrîtê, di sala 1860'î de wek xelata xebatên wî yên ji bo Osmaniyan vedigere Stenbolê. 1866'an diçe Şamê. Bedirxan Beg, di sala 1868'an de li sirgûnê jiyana xwe ji dest dide. Piştî dimire, mûçeyê ku bi awayekî rêkûpêk ji aliyê Os-

maniyan dihat dayîn, heta nîfşek din jî ji bo malbata wî tê dayîn. Ji kurên wî heft heb, bi payeya paşa di Artêşa Osmaniyan de cih digirin. Ji ber Bedirxan Beg îsyana li Gîrîtê tepisandîye, destûra hatina wî ya Stenbolê tê dayîn. Di vê navê de Bedirxan ji bo mûçeya wî bê zêdekirin ji wezîrê Osmaniyan re daxwaznameyekê dişîne. Ev ji bo fêmkirina çawahiya têkiliyên wan wê gelekî fêrker be. Daxwazname; ji milekî bi zimanê sultanekî têkçûyî hatiye nivîsandin ku li ser milkê xwe daxwaza maf dike, li milê din jî daxwazên rêveberekî –evdekî- kedkar û kevn ê Osmaniyan nîşan dide. Di daxwaznameyê de daxwaz ew e ku mûçe bê zêdekirin an jî heqê ji bo bikaranîna xakên ku li Kurdistanê destûra bikaranînê nayê dayîn, dixwaze. Li gel van jî rîca dike ku qîdemên xizmên wî yên wek memûrê dewletê dixebitin bên zêdekirin. Ji baştir bê fêmkirin, em giştî nameyê li vir bidin:

“Daxwaza evdên te yên bêçare ne,

Tevî li meydanê ye, bi mûçeya 19 hezar qirûşî ya mehane ku bi saya Padîşahê me hatiye bexşandin, ez di îdareya zarûzêçên xwe de tengazer im, hatiye fêmkirin ku bi tamîma Tebaxê ve çawa mehîf bûye, her wiha ji ber vê kêmkirina ku wê bê kirin jî dê 3470 qirûşê mûçeya min jî kêm bibe. Lewma jî ez şaşwaz mame ku bê çawa û bi kîjan sermayeyê îdare bikim. Ji ber ku nîfûsa qelebalix a li mala min ne kole û carîye ne ku bi fîrotinê kêr bikim. Ne suxrevan (xizmetkar) e ku biqewitînim. Bi giştî zarûzêçên min in û zêdetirî sed û deh kesan e. Ez di nav fikar û taswasê de me ku bi vî mûçeyî ve çawa debara wan bikin. Di sala bihurî ya 1275'an de jî ji sedî deh kêmkirinek çêbûye û li ser daxwaza min meqamê dewletê vî evdê we ji kêmkirinê cuda girtine, tevî yên bihurî jî mûçeyê min tam hatiye dayîn. Her çendî vê carê jî kêmkirin gelemperî be jî, dîsa ji piyarî (şefqet) û mihrîvana (merhemet) we lavahî dikim ku careke din koleyên xwe di nav vê gelemperiyê de negirin û efûr bikin. Wek nimûneyê ne li welatê me, ji ber wê li warên biyanî jî ti kes tinebin, ez hêvî û lavahî dikim ku wê ev koleyê we ji bo kesekî nebe nimûne.

Debara me yan wê bi mûçeyê keremkirî yan jî dema ji 9 gundên vî koleyê we yên li eyaleta Kurdistanê, 6 dîsa wek malê dewletê bimîne û 3'yên mane hûn bi fermanê û bexşandinê bidin vî koleyê xwe dibe. Di vê rewşê de ez ê karibim piraniya endamên malbata

xwe bişînim van gundan û bihêlim debara xwe bi cot û cobar bikin, yên mane jî bi mûçeyê bexşandî ve li vir xwedî bikim.

Kurê min evd Necîp Beg, çar sal in li qelema girtekê ya Meclîs-î Vala dixebite û heta astekê zana bûye. Eger koleyê we kurê min ê bi saya we ya mezin bûye xwedî rutbeya sêyemîn, bi mûçeyekî qasî ku jî yê min hatî xwar an wek azayekî li yek ji meclîsên gumrik an jî dîwana muhasebatê ronî bibe wê dîsa fêda wê li me bibe.

Bi kurtasî ji bilî merhemeta padişahê me ti cihên ku vî evdê we yê tengazer xwe lê bistrîne tineye. Ji ber ku ji bilî şexsê dewleta we ti stargehên min ê ku tevahî derdên min bi qebûl û lutfê guhdar bike tineye, bi tevahî fikir û azarên xwe ve min cesaret kir ku halê xwe li çavên we yên bi rehm raxim.

*Destê min ê armancên min radike, xwe avêtine tor û bextê we yê bi îhsan. Bila bêparmayîna ji camêriya we ya mezin, Xwedê neke. Ji bo li gor halê min tiştê bi navûdengê we dikeve pêk were, vî evdê xwe piştî vî emrî li ber zarûzêçên min nexin şermê, min cesareta pêşkêşkirinê dît ku ji bo di her şert û mercî de der heqê xwediyê me padişahê me de duayên bi xêr û hêviyên ku şeref û navê dewleta şexsê we bilindtir bibe bênavber bidome îmkân bê bexşkirin.. (Malmîsanîj, **Bedirxaniyên Cizîra Botan**)*

Encama ji vir derdikeve ew e; rêberên “îsyane” her çiqasî berbiçav bi girêdanek sist be jî, ji ser têkiliyên dîrokî zehf sadiqî avahiya kevneşopîya dewleta serwer in. Lewma tevî ku yên “îsyane” kirine bi awayekî dijwar hatibin tepeserkirin, piştî “îsyane” piraniya wan bi piştgiriya dewleta jiyana xwe bi refahê domandine. Yên îsyankar, ji aliyê dewleta serwer careke din aîdî xwe hatine dîtin. Carinan hatine efûkirin û dîsa hatine wezîfedarkirin.

Bêguman, gelek sedemên vê nêzîkatîyê hene. Di serî de ji ber ew bandora ku rêberên berxwedanê li ser civakê hiştine, dewletê bi zanebûn polîtîka meşandiye. Lê, li cem vê xwedîderketina van kesan, sedema ku hê zêdetir nîşên din ên van malbatan xistina xizmeta dewletê ew e vê beşa her tim wek parçeyekî ji xwe qebûl dike.

Nameya Mîr Bedirxan a ku me li jor dît, esas îfadeya seknek ruhî ye. Belgeyeke girîng e ku girêdana dewletê, nêzîkbûn wê nîşan dide. Dikare bê gotin ku ev haletê ruhekî têkçûyî ye ku bi

awayekî eşkere xwe daye der. Helbet, ji bo yên t êkçûyî, şikandina di warê ruhî de t ê fêmkirin. Lê, pirsgirêk ne wisa ye. Ya esasî, tarza t êkiliya li ba Osmaniyan nêzikatiyek wisa çêkiriye. Di ferasetan de hestê aîdbûna Osmaniyan heye. Mijar ew e ku xwe wek tebaa wan qebûl kirine. Rewşa derketî jî ev e, ji ber poşmantiya li beramberî mezinê xwe, mîna mikurhatin û lêborînê ye. Serwerên Kurd her tim li hemberî hêzên derve hinekî wisa girêdayî mane û bûne xwedî hestên sadiqbûnê. Her çawa be jî yên ji wan re hîmê jiyanê pêşkêş kirine ev hêzên derve ne. Gelek caran bi dest wan hatine ser desthilatdariyê. Wek mînak, beriya ku Bedirxanî li dijî Osmaniyan dest bi berxwedanê bikin, Seîd Beg ê ku li gel Osmaniyan bi hevparî tasfiye kirin —ev bûyer di salên 1838'an de rû daye— xetên karakterek heman nîşan dide. Ya balkêş jî ew e ku Seîd Beg xizmê Bedirxan e. Yezdansêr e ku dûvre îxanetê li Bedirxan dike.

Wisa dixuye ku, ev diyardeya îxaneta bijartiyên Kurdan, tenê li me ecêb nayê. Pir mirovên ji gelên din jî şaşwaz dike. Ji ber ku di nav gelên din de îxanet mîna ya serwerên Kurd nayê nixwindin. Îxanet, di wateyek rast de îxanet e. Û eger li cihekî îxanet hebe, li beramberî vê jî seknek bêtawîz t nîşandan. Yê îxanetkîrî jî ji ber îxaneta xwe dizane wisa bi bêarî nagere. Moltke yê ku me berê behsê kiribû, di tepisandina gelek berxwedanan de şîret li Osmaniyan kirine. Moltke di bîranînên xwe de t êkildarî Seîd Beg vê dini-vîse: *“Dema ber bi Paşa ve dimeşîya û bi rengê ku destê wî radimûse sekinî, ji dest min nehat ku ez heyranî sekna wî ya bêxem û ji xwe bawer nehim. Paşa û em hemû rabûn ser piyan. Seîd, ji bo efûxwestinê nehatibû. Ji ber ku t êkçûyî efû nedixwestin. Bervajî, ji bo pêşniyara ray ango dostaniyê hatibû. Ev pêşniyar, eger ji ew kesên ku hê xwedî hêza dijminatiyê ne bihata, dihat qebûl kirin. Seîd Beg, di navbera min û paşa de rûnişt. Qehwe hatin. Mîna tenê lihevnekirinek biçûk bûye, hevdiîtinên bi Kurdî dest pê kirin.”* (Malmîsanîj)

Bêguman ev sekna hewadar a Seîd Beg ne ji ber hêza leşkerî bû. Hatina û rûniştina bi hewa, di esas de encama feraseta t êkiliyên li cem Osmaniyan bû. Ji bo ev hewldana wî ya îşyanê bihata paşguhkirin, mîna kapasîteyek wisa ya îxanetê nîşan dide ku dikare bi rehetî begîtiyek Kurd a îşyan dike yan jî xwedî potansiyela îşyanê

ye tasfiye bike. Biçûkekî li dijî mezinekî şaşitîyek kiriye. Birayê mezin careke din bang li birayê biçûk dike, ji bo careke din vê neke wê dengê xwe lê bike û têkiliya birayan wê li ser hîmê dilsoziyê dewam bike. Wek me got ev çandek e. Çanda jiyane ye ku serwerên Kurd li beramberî dagirkeran nîşan didin!

Halbûkî her ku diçe rêkûpêkkirinên gelekî cidî çêdibin. Osmanî êdî têkiliyên xwe yên kevn nadomînin. Her roj, Mîrîtiyek nû tasfiye dikin. Lê çi heye ku çanda alûdetiyê-pîs, bi kûrahî dewam dike. Ev çanda ku di ruhan de bi cih bûye, ji genan derbasî hev dibin. Wisa ye ku; dema li dijî Osmaniyan têkçûyînek jî çêdibe, tu dibêjî qey tiştekî wisa nebûye û ev rewş dewam dike. Kelha begê Kurd dikeve, lê ev çanda dike dûvik dîsa jî didome. Ha ev rastî, generalekî Elman ê ji derve hatî ecêb dihêle. Ew, ango ev ên îxanet dîtî çima şaşwazî bimînin? Osmanî ango hêza dagirker di ruhê wan de alûdetiyek wisa saz kiriye ku; jêkirin û avêtin gelekî zehmet e. Yê îsyankar dizanin ku, ew bi xwe evd û tebaa Osmaniyan e. Osmanî jî dizane ku; garantiya jiyana van ango van began di dest wan de ye. Ji ber vê jî sûcdar xwe sûcdar nabînin, yê serkeftî jî xwe înfazkar nabîne. Her çi bibe jî wê girêdan û sadeqeta bêdawî bidome. Û ev wek karakterekê bûye rewşek têkilî û alûdetiyê ku di ruhê tevahî serweran de bi cih bûye.

Berxwedana Îzzeddîn Yezdanşêr

Yezdanşêr ê ku derbasî şûna Bedirxan bû, 1856'an her çiqasî rastiyan bibîne jî êdî kar diçe diqede. Ew jî berdêla îxanetê bi pelçiqandinê dide.

Yezdanşêr, ji bo îxaneta xwe ya di tepeserkirina Bedirxan Beg de, li şûna Bedirxan Beg wek Begê Cizîrê hatibû tayînkirin. Lê, ti niyetek Osmaniyan a wisa nînbû ku careke din Begîtiya Cizîrê zindî bikin.

Ji ber ku Osmaniyan di sala 1847'an de Eyaleteke Kurdistanê ava kiribûn ku vê sebceqên Mûş, Colemêrgê û Cizîr, Botan û Mêrdîn di nav xwe de dihawandin. Wek rêveberiya Kurdistanê jî Esat Mûhlîs Paşa tayîn kiribû.

Li gor hedefên Osmaniyan diviyabû ku sîstema Mîrîtiyê ji holê bêne rakirin. Dûvre wê vê bi Qanûnnameya Erazî ya sala 1856'an bi fermî bikiran. Dema bûyer hatin tepeserkirin û tehlûke hat beralîkirin, wê pêdivî bi Yezdanşêr jî nemaya. Êdî dem hatibû ku wî dûr bixistana, li şûna wî paşayekî Osmaniyan bi cih bikirana û ji bo tevahî bêgîtiyên Kurd ên li herêmê ji holê rabikin bikevin nav hewldanên rêkûpêkiyên nû. Yezdanşêr ê ku negihîşt hêviyên xwe, ji bo li dijî Osmaniyan eniyekê veke û hewl dide ji pozîsyona wê ya Şerê Kirimê sûdê wergire. Îsyana bi şiklekî lezûbez mezin dibe û berfireh dibe. Wisa ku, kêmeteweyên cuda yên li Kurdistanê jî, Suryanî, Ermenî û Rûm jî tevî dibin. Di vê demê de, gel ji bo rizgariyê li pey xelaskerekî ne û vê carê vê rolê Yezdanşêr dilîze.

Îngilîz ên ku rewş ji bo xwe xetere dîtin, dîsa ketin dewrê. Konsolosê Îngilîzan ê li Mûsilê, dubendiyê bera nav eşîrên Kurdan dide, ji bo Yezdanşêr li Osmaniyan were, hewlek mezin raber dike. Yezdanşêr, ji ber di warê polîtîk de hevnegirtî bû û xwe li sozên Osmaniyan kir xwedî, hevdîtîna ku Osmaniyan xwestibûn qebûl kir. Bi qaşo garantiya ferdî ya konsolosê Îngilîzan ê li Mûsilê Rîsam, bi wehda hevdîtîna diçe Stenbolê û li wir tê girtin. Berxwedana ku wisa jî bê lîder dimîne, di demeke kurt de belav dibe.

Em li vir careke din heman avahiya dîrokî dibînin. Kesê îsyana dike, Yezdanşêr e ku beriya çend salan ew berxwedana herî mezin a demê ji bo raye, pozîsyon û berjewendiyên xwe yên takekesî firotibû û ketibû bazara wê. Vê carê jî wê bi xwe îsyana bike. Ji ber ku dem di ser berjewendiyên wî yên şexsî bihuriye. Osmaniyan xwe gihandine wê hêza têrker. Pêdiviya wan bi hevkarî nîne. Bi kurt û kurmancî, êdî pêwîstî bi Yezdanşêr nemaye. Tebîniyeke din jî ev e, dubare dubare lîstoka Îngilîzan kar dike. Bi werîsê Îngilîzan daketin, herhal ji bilî dîtina binê bîrê wê ti encamên din bi xwe re neanîbûya.

Îsyaneke din jî wê piştî salan pêk bihata. Di sala 1878'an de ji Bedirxaniyan paşayên Artêşa Osmaniyan; Paşa Osman û Huseyîn (ev kurên Bedirxan in) dema ji şerê Rûsa vedigerin, li Kurdistanê dest bi îsyaneke dikin. Ji bo îsyane, destêkek mezin a eşîr û gundiyên Kurd heye. Nêzî neh mehan Botanê di kontrola xwe de dihêlin. Tevî ku nêzî çil salan Bedirxaniyan nikarîbûn herêm di

kontrola xwe de bihiştana jî, eşîrên li herêmê demildest destekê didin îsyana malbata Mîrê kevn, heta teşwîq dikin. Bi tenê serê xwe ev rastî jî, bê li herêmê nerehetiya li beramberiya Osmaniya di çî astê de ye nîşan dide. Tekane diyardeya kêmmayî jî nebûna rêberêkî ye ku karibe nerehetiyên gel li ser esasên rast bi rêxistin bike. Ya tê kirin ne rêbertiya gel e, ji bilî fikrandina berjewendiyên malbatî ne tiştêkî din e. Ev rewş jî tevî berxwedanên bênavber jî ji bilî tefandina hêviyên gelekî ti wateyek xwe ya din tineye.

Di Parêznameyên DMME de dema Abdullah Ocalan bi giştî van mîran, began, şêxan û tevahî serwerên Kurdistan analîz dike, vê nîrxandina dîrokî dike: **“Dahûrandina feodalîteya Kurd a ku ji serdema navîn heta bi roja me hatiye çêkirin û timî hîkarîker bûye, ji aliyê qewimîn û bûyeran ve, girîngiyeke mezin bi xwe re tîne. Li qasî rewîştên wî ya gelemper aliyên wî yên resen e, rêbazên çêbûn û meşandina wî, ji kê re û çawa berjewendiyan pêk tîne, ji gel çî dibe, çawa bandorê li bîrûbawerî û jiyana giyanî dike, viyan û sinc çawa rajêr dike, di nasnameya gel a dîrokî û çanda wê de rê li ber kîjan rûxandî û nûhandînan vekirîye, biyanîbûn çiqasî kûr kiriye, ji aliyê siyasî û civakî ve derfetên dewlemend û pêşketî çawa asteng kirine, heger bi hemû aliyan ve werin dahûrandî, yê ronakbûneke mezin were pêkanîn. Her wiha yê rê li ber polîtîkbûneke rast û ber bi pêş ve û şêwegirtineke demokratîk vebe. Divê were nîşandan ku ev peywir qet nehatiye cih. Tebeqeya Kurd a raser (serdest), zemîna xwe ya polîtîk qet nîqaş nekirîye û ji rexneyan re ne vekirîye. Di bin vê de, cîhanê berjewendiyên bi lanet ku hezar salan domandî veşartîye. Ji ber ku dizane, dema ev yek derkeve holê wê bibe mijara xiyamet û tawanbariyeke mezin, ku ji berjewendiyên wan re bi kêrhatî be, bêtî ku hêmanên mirovatiyê bîne ber çavan, pêdivî be bi yên herî faşîst, bi yên herî tarî û hêzên tineker re hevîrtînan pêk tîne, gel di tarîtiyê de dihele û heyînen pêşverû tine dike, çavneşandî bi cîhanîna van yekan polîtîkayeke herî bi kêrhatî dibîne, ji berdewamkirina vê dîroka bi lanet qet naqere.**

Serhildana Şêx Ubeydullahê Nehrî

Îsyana Şêx Ubeydullah Nehrî ya di 1881'an de pêşketî, xwedî hin cudahiyan e. Îsyana Şêx Ubeydullah, xwedî nirxên neteweyî ne. Abdullah Ocalan ji bo Şêx Ubeydullah vê dibêje: **“Dema Şêx Ubeydullah, nêzî modernê ye; bi gotinek hê rasttir, ev serhildana yekem a şêxan di wê demê de pêk tê ku dema proto-netewperweriya Kurd e. Dikare bê gotin ku Şêx Ubeydullah temsîla vê dike.”** (Abdullah Ocalan, **Li ser Dîroka Guftûgo**)

Şêx Ubeydullah, nirxên neteweyî bi nirxên olî re giHANDINE hev, hevpariya gelek eşîr û konfederasyonên Kurd ava kirine. Şêx Ubeydullah, Nastûrî û Asûriyan jî li ba xwe digire. Ev jî kûrahiya berxwedan û îsyane nîşan dide. Beriya derbasî îsyane bibe, pêwendî li cem gelek Mîrên Kurdan danîne. Di heman demê de pêwendî li gel hêzên derve jî danîne. Ji Şemzînanê heta Urmiyê bi lezûbez berbelav bûye. Ji ber zêde xurt bûye, xof dikeve dilê Rûsan. Her wiha, belgeyên daxuyaniyên wî hene ku ji mîsyonerên Amerîkayî re behsa dewleta neteweyî dike. Ji nameya Şêx Ubeydullah a ku ji mîsyonerê Amerîkayî Dr. Cohran re nivîsiye, fîkrên wî bi zelalî têne fêmkirin. Di nameyê de wiha tê gotin; *“Gelê Kurd, gelekî cuda ye ku xwediyê zêdetirî 500 hezar malbatî ye. Ol û zimanên wê li gor ên din cuda ye. Yasa û kevneşopiyên wê cuda ne... Em dixwazin karên xwe bi xwe bi rê ve bibin. Wisa jî li gel cezakirina sûcdarên xwe, em ê xurt û serbixwe bin. Mîna neteweyên din wê îmtiyazên me jî hebin. Em amade ne soz bidin ku wê têkildarî sûcdarên me ti zirar negihêje neteweyên din.”* (**Waide Jwaideh**) Ubeydullah wê di heman nameyên xwe de têkildarî sedema berxwedan û îsyane jî, *“neheqiyên ku rûmet û selameta gele Kurd dipelçiqînin rû dane”* nîşan bide. Nêrîn û fîkrên di vê derbarê de xwedî girîngiyek mezin in, wê bibe sedem ku tevahî hêz bi awayekî giştî wî bikin hedef.

Şêx Ubeydullah Nehrî, di sala 1878'an de tevli şerê mabeyna Osmanî û Rûsan de dibe. Osmanî di vî şerî de têk diçin. Osmanî ya li rojava her roj xakan ji dest dide, li rojhilat jî ji dest dide. Şêx vê rewşê bi çavên xwe dibîne. Li ser vê jî Şêx ji bo vê rewşê binirxîne li gel rojavayîyan têkiliyan datîne, ji wan re plana xwe radigihîne. Çi heye ku Osmanî sala 1878'an li Berlînê peymanê datîne, bi vê

re jî gelek tawîzan dide gelê nemisilman, bi taybet jî Ermeniyên. Di vê nîvekê de, xisûsên mîna Ermenîstanê têne nîqaşkirin. Ev rewş, bandora xwe li ser Şêx dike. Jixwe, têkiliyên pozîtîf ên li ba gelên nemisilman, ji bo hêzên derve xwedî peyama bûn. Şêx ji bo karibe tevahî eşîr û begên Kurd ên ji vê rewşê ne rehet in kom bike jî dest bi xebatê dike. Lê, li şûna nerehetiyên heyî di aleyhê Ermeniyên de pêş bixe, xwedî wê helwestê ye ku jiyanek hevpar saz bike. Dewletên rojavayî di wê demê ji bo Kurdistanê reformên nû difikirin, Kurd jî amadekariyên îsyanê dikin. Şêx, beriya ji Stenbolê derbasî Kurdistanê bibe ji bo giştî reîs, beg û şêxan telgrafê dişîne û banga civînê dike. Wisa ye ku; dema li Şemzînanê dicivin, gelek beg, serokeşîr û rûspî di vê civînê de amade ne. Mîna li jor hat ziman, Ermenî û Suryan-Asûriyên li herêmê jî pêwendî li gel Şêx danîne. Ji milekî bawerîya xwe bi samîmbûna Şêx anîne, li milê din jî bi tevgera hevpar a li dijî Osmaniyan ve, wê pêşî li bi-jartiyên Kurdan bigirin ku êdî wek piyonê Sultan her tim êrîşî wan nekin. Em diyar bikin ku Ubeydullah di nava şer de fetwa daye û wek ferman ragihandiye ku ti kes bi ti awayî destên xwe nedin Ermenî û Asûriyan.

Şêx Ubeydullah destpêkê berê xwe dide Rojhilat. Li Rojhilatê Kurdistanê beşek girîng a Kurmancan bi dest tîne. Mahabadê digire. Di rêzê de Urmîyê heye. Urmîyê jî tê kontrolkirin. Ji van pêşketinan nerehetiyên Rûs, Îngilîz û Osmaniyan çêdibe. Osmanî, bi ser Şêx de dimeşin. Şêx neçar dimîne ku ji rojhilat derkeve. Hema hema ti hevalbend û pêkhatiyên îsyanê, nabînin ku di van pêşketinan de berjewendiyên wan ên esasî tînin parastin. Helbet, îxanet jî bi ser vê fêmkirinê de ye. Tîmûr Xan ê Celalî li qada xwe navekî zehf bi bandor e. Dema ev nav tevî Artêşa Şah dibe wê demê hevsengî diguherin û ya diqewime jî wek encam têkçûn e. Dîsa, Dewleta Kacarî a Îranê jî serî li gelek dekûdolaban dide. Mînak, agahiyê ji Hamzeye Mengur re ku yek ji fermanîyê bi bandor e Şêx Ubeydullah e dişînin, dibêjin li hev kirine, bi komployekê dikşînin gel xwe û qetil dikin.

Piştî ku Îsyana Şêx Ubeydullah tê pelçiqandin, Dewleta Kaçar a Îranê li dijî gelê Kurd qetlîamên mezin pêk tînin. Kurdên ku bi saxî digirin, qetil dikin û malên wan desteser dikin. Asta qetlîaman ewqasî bilind in ku, Îngilîz û Rûsên ku destûra vê qetlîamê dane jî

nerehet dibin. Sefîrê Rûsan ê li Tehranê dibêje, “*Polîtîkaya Rûsyayê, bi serîhildanek li Kurdistanê wê zîrarê bibîne. Ji ber vê ye ku, pêwîst e Îran dest ji wê tevgera xwe ya hovane ya li dijî Kurdan rewa dîtî berde.*” Her wiha di rojnameya Vakîf a Osmaniyan de jî bi gotina, “*Sîpah Salar ji leşkerên xwe re dibêje bila rehmê li Kurdan nekin, gundên wan bişewitînin, berhemên wan îmhî bikin*” (Osman Akbaş, **Îsyana Dîrokê**) hovîtiya di meriyetê de tê ragihandin.

Şêx, xwe vedîkşîne Stenbolê. Bi gotinekê hê rasttir, dikşînin Stenbolê. Şêx Ubeydullah Nehrî di sala 1882’yan de dîsa vedigere Şemzînanê û vê carê îsyane li dijî Osmaniyan dide destpêkirin. Lê îsyane careke din tê pelçiqandin. Di encama vê de Şêx dibin Mûsilê û davêjin hepsê. Li, di heman demê de yek ji fermandarên Şêx û kurê wî Seyîd Abdulqadir berê xwe dide bajarê Mûsilê û bavê xwe rizgar dike. Şêx her çiqasî xwestibe îsyaneke din geş bike jî, dîsa tê dîlgirtin û têk diçe. Şêx Ubeydullah sirgûnî Mekkeyê tê kirin. Li sirgûnê sala 1883’yan diçe ser dîlovaniya xwe. Ya dimîne dîsa gelekî stûxwar, tepisî û bêhêvî ye.

Abdullah Ocalan ji bo Îsyana Şêx Ubeydullah dibêje: “**Em bi bûyereke mînak bêhtir dikarin di vê mijarê de merama xwe rave bikin. Tevgera Şêx Ubeydullah, bi Şerê Osmanî û Rûsan ve (1877-1878) girêdayî qewimiye. Osmanî li hemberî Rûsan ketine tengasiyê, ji vê yekê sûd hatiye wergirtin. Hewl daye ji nakokiyên bi hêzên derve re sûdê wergire. Her wiha ketiye bin bandora tevgerên millî yên di nava împaratoriye de. Bendewariyên nû yên di nava civaka Kurd de derdikevin holê li ber çav hatine girtin. Tevger bi tenê ji kesayetên dînî pêk nayê, derdorên din ên bi bandor jî destekê didin û bi vî awayî di demeke kin de tevger mezin bûye. Gilî û gazinc ji burokasiya navendî hatine kirin û daxwazên millî zêde bûne. Ev di civînan de hatine guftûgokirin û di nava armancan de hatine bicihkirin. Tevger hem di nava Împaratoriya Osmanî de hem jî li Rojhilatê Kurdistanê li beşên berfireh bi bandor bûye û xwe gihandiye forma eskerî. Ji bo bibe dewleteke fermî desteka hêzek an jî çend hêzên hegemonîk ên wê demê têrê dike. Lê ev destek nehatiye dîtin. Ji ber ku dewletên Osmanî û Îranê bi tevahî xwestekên hêzên hegemon ên Rojava qebûl kirin û ev**

sedema bingehîn bû ku destek nedan tevgerê. Kengî destek ji bo dewletên Osmanî û Îranê hat nîşandan, ev tevgera mezin a serîrakinê ji bi hêsanî hat tesfîyekirin.”

Bi berdewamî jî li ser tarzê têkilî û stratejiya rêveberiyê ya sul-teya Osmaniyan balê dikşîne ser vê rastiye: **“Ev tevger di dema Sultan Ebdulhemîdê Duyemîn de pêk hat û sultantiyê ji vê bûyerê gelek ders girtin. Rêbaza li dijî malbata Bedirxan Beg bi heman awayî li dijî malbata Ubeydullahê Nehrî jî hatiye ceribandin. Ew birin Stenbolê û bi rêya wan hewl dan beşekî Kurdistan kontrol bikin.”**

“Di civaka Kurd de werçerxên girîng hene. Ev werçerxên dirokî, ne bûyereke civakî ya aîdî civaka Kurd e. Her civak dema hewl dide xwe fêr bike, van werçerxan dinirxîne û wisa dikeve nav hewldanê. Ev werçerx, nû ya ku li ser xerabûna kevnê pêşketî îfade dike. Rêxistinbûyînên civakî bi guherînên cuda yên tarzê aborî, siyasî dibe. Di qada çandî de guherîn çêdibin. Ev guhertin di carêkê de pêk nayên. Ya kevn, ya nû di nav xwe de dihevin. Ya nû, ya kevn ava dike. Dawiya dawîn, bûyerên civakî xetere şoreşî dişopînin. Guhertinên civakî piranî ji aliyê hêzên derve hatine diyarkirin. Gelek biyanî ketine nav jiyana civaka Kurd. Ji van her yekî jî guhertinek kirine û îfadeya demekê kirine. Yek ji van werçerxan jî; di sedsala 19’emîn de bi hilweşîna Mîrîtiyan û tepeserkirina îsyana derketiye. Vê rewşê hin taybetmendiyên Kurd bi paş xistiye, hin jî kirine sereke. Nuqtayên sêdaqata civakî guherîne, têgîna herî pîroz a civakî guheriye. Di vê tebeqebûnê û çînîbûnê de guhertin bûne.” (Eşîretî û Milliyetgerî)

Em ê niha behsê bikin, bi tasfîyekirina mîrîtiyan ve 2 kategoriyan elîtistîk ên hê sextetir û sînî pêş ketine. Yek ji van kahyayên li ba Mîran, yên ji Osmaniyan re sîxurî kirine û yên li civakî ne xwedî qîmet in, wek axa derdikevin holê. Ya din jî, bi rakirina Mîran a ku di hafizaya civakê de wek hêza çareseriyê tên dîtin, li vê atmosfera aloz derketina lîderên olî ne.

Di salên 1800'an de li Kurdistanê Derketina Neqşîbendîtiyê

Di salên 1800'î de piştî tepisandina Berxwedan û Îsyanên Kurd, Mîrîtiyên ku saziya rêbertiya kevneşopî ya bijartiyên Kurd bûn, hatin tasfiyekirin. Mîr, di nav civakê de bi rêzdarî dihatin pêşwazîkirin û pozîsyona wan ne tenê birêvebirina çend eşîran bû, kesayetên wisa ne ku cih bi cih li qadên erdnîgariyek berfireh dihatin qebûlkirin. Dikare bê gotin ku nûnertiya feodalîteya Kurd dikiirin. Ev bandor û rêzdariya li qada berfireh, ji bo Osmaniyên ku tengezar dibûn û hildiweşîyan, mîna xeteriyeke mezin bû.

Li şûna Mîran gelek axa û axakok hatin bicihkirin, her wiha Saziya Şêxîtiyê jî didan pêş. Beriya vê, şêxîti wek saziyek olî ji aliyê manewî bi rêzdarî dihat pêşwazîkirin, lê di warê madî de jî di bin sêwana Mîrîtiyan de bûn.

Di pêvajoya destpêka 1800'î de ku Îngilîz diketin Rojhilata Navîn, Terîqeta Neqşîbendî derbasî Rojhilata Navîn bibû. Dîroka damezrandina Terîqeta Neqşîbendî, ber bi taliya sedsala 14'emîn e. Li Bûharayê ji aliyê Bahaûtîn Neqşîbendî (1318 û 1389) hat avakirin, nêrînên xwe yê esasî dispêre Abdûlhalûk Gondjûvanî ku di sedsala 11'emîn de jiyaye. Eger em têkildarî naverok û disîplîna wê ya îbadetê hin agahiyan bidin, bi kurtahî em dikarin wisa rêz bikin.

“Neqşîbendîtî, terîqetek e ku li ser esasên tesawûfê hatiye birêxistinkirin û bi giştî jî mîna terîqetên din xwedî hin rêgezan e. Nêzîkatiya wê ya esasî ew rêgeza wê ye ku dibêje “her mirov pêwîst e girêdayî murşîdekî be.” Ev murşî jî şêxekî terîqetê ye. Ev rêgezek wisa bingeîn e ku neçariya vê bi şiklê “yê şêxê wî nînbe, rêberê wî şeytan e” tê îzahkirin.

Di bin venêrîna Şêx de piştî pêvajoyek perwerdeya taybet a ku wek Seyr-u Suluk tê binavkirin û ji 3 merheleyan ava dibe; hewl tê dayîn ku endamê terîqetê bigihînin Xwedê. Ev jî mîna terîqetên cuda, esasên Neqşîbendîtiyê jî diyar dike.

Ev merhele wiha ne;

1- Bîat; Murîd qebûl dike ku şêx ji bo ku di navbera wî û Xwedê de navbeynkariyê bike têr û tijî ye.

2- *Kelîmat-i Semaniye; Ev îfadeya 11 têgehan e . Ev têgeh pêş dibînin ku li ser esasên terîqetê şiklekî bide murîd û wateyên taybet li wan hatine barkirin. Ev jî;*

Hûş Der Dem, Nazar Ber Kadem, Sefer Der Vatan, Halvet Der Encumen, Yâd Kerd, Bâz Geşt, Nigâh Dâşt, Yâd Daşt, Vukûf-i Zamânî, Vukûf-î Adedî, Vukuf-î Kalb in.

3- *Zîkir; Di mejiyê xwe de dubarekirina navê Xwedê, ji Quranê xwendina ayetên biçûk, her tim sûretê şêx bi bîr anîn û alîkarî jê xwestin. Ji vê re Rabita tê gotin û di Neqşîbendîtiyê de ji şêweyên din ên zîkrê xwedî nirxekî hê mezintir e.” (Erdal Ergîn, **Neqşîbendîtî Rol û Girîngiya wê ya di Siyaseta Rojhilata Navîn de**)*

Milê vê terîqetê yê Halîdiye, di çaryeka yekem a sedsala 19’emîn de ji aliyê Kurdekî bi navê Diyaeddîn Xalid hatiye avakirin. Navî wî yê tam Eb-ul-Baha Eşşeyh Diyaeddîn Mevlana Xalid bin Ehmed bin Huseyin eş-Şehrîzûrî el-Kurdî ye. Xalid, di 16’ê Hezîrana 1826’an de li Şamê ji ber nexweşiya webayê di 49 saliya xwe de jiyana xwe ji dest daye. Endamêkî eşîra Cafê ye û piranî jî wek Mewlana Xalid tê nasîn. Di 1778’an de li Karadag a girêdayî Begîtiya Babanan ku navenda wê Silêmaniyê ye, hatiye dinyayê. Dikeve terîqeta Qadîrîtiyê û ji xoçeyên herî pêş ên demê Abdûrrahîm Berzencî, Seyid Abdulkerîm Berzencî, Mele Salih Necmar, Şêx Muhammed Qasim Senandec dersan dibîne. Diçe Hindistanê û di sala 1808’an de (li hin cihan wek 1811 tê îfadekirin) vedigere Kurdistanê. Ev pêvajoya pêşketina terîqeta Neqşîbendîtiyê ya li Kurdistanê ye. Di demek kurt de ji Şêx Abdullah Dehlevî, Neqşîbendîtî, Çîstîtî, Qadîrîtî, Suhreverdtî, Kubrevîtiyê îcazeyê distîne. Mewlana Xalid ku xwe wek xelîfeyê rayedar îlan dike wê cilên van terîqetan belav bike, tefsîr, hadîs û tesawûfê bide xwendin, ji van îcazetê bide; dema tê Silêmaniyê ji hêla terîqeta Qadîrî bi nerazîbûnên mezin hevrû dibe.

Mewlana Xalid wê nikaribe xwe li Silêmaniyê bigire. Li gor hin dîroknasan, her çiqasî tê gotin ku Mewlana Xalid xwestiye Kurdperweriyek nû bi pêş bixe jî, belgeyên dîrokî vê piştrast nakin. Mînak; derheqê wî de hin gotin û îtham hene. Li gor hin îdîayan ji bo Îngilîzan dixebite. Piştî ji Hindistanê vedigere, ji ber ku dest ji Qadîrîtiyê berdide û hewl dide Neqşîbendîtiyê bi pêş bixe,

dibe hedef. Li ser vê jî diçe Bexdayê û xwe diavêje bextê Dawid Paşa. Dawid Paşa wî qebûl dike, dibistanek bi navê Bexdadiye El-Hassasiye vedike, dihêle ku li vir perwerdeyê bide. Û li ser vê jî demekê navê xwe diguhere û navê Diyaeddîn Xalid El Bexdadî bi kar tîne. Lê, wê dîsa nikaribe xwe bigire, neçar bimîne ku Iraqê biterikîne, biçe Sûriyeyê û li wir jî nêzî Şamê bi navê Salihiyeyê dibistanekê ava bike. Li herêma ku bi taybet jî ji bo terîqetên Sunnî yên bi kokê xwe Erebiyê mîna Qadirî û Rifaîyê eleqeyek mezin heye, li beramberî Neqşibendîyê di demek kurt de rêzdarî ava kiriye û bi bandor kiriye.

4- “*Milê Xalidiye ya ji hêla Mewlana Xalid hatiye avakirin û bi navê wî tê bibîranîn, bi “Rabitayê” ferqa xwe ya herî mezin a ji terîqetên din, daniye holê. Rêbaza Rabitayê ku ji bo avakirina lêhûrbûyîn û konsantrasyonê rêbazên medîtasyonê olên rojhilata dûr bi bîr tîne, wek disîplînek terîqetê ya Neqşibendîyê, wek rêya esasî ya ku murîdan digihîne Xwedê tê îzahkirin, lê rêgezek e ku ji bo murîd li beramberî şêx bibe xwedî girêdanek teqez û domdar bi pêş ketiye. Ji bo ev terîqet navendî bibe, domdar bibe û bi bandor bibe, bi rolek bingeîn rabûye. Disîplîn û girêdana rêxistinî bi pêkanînek wisa bûye xwedî îzahek teorîk û astek îdeolojîk bi dest aniye.*” (Erdal Ergîn, **Neqşibendîti Rol û Girîngiya wê ya di Siyaseta Rojhilata Navîn de**)

Mewlana Xalid ê xwe li Şamê bi cih kiriye, li vir wê tevahî xelîfeyên siberojê perwerde bike. Behsa 11 xelîfeyan tê kirin. Wê ji bo Kurdistanê ji van xelîfeyên perwerdekirî jî gelek bişîne.

5- “*Di nav rûspiyên Kurdistanê de El Seyyîd El Şêx Abdullah El Şemzînî (El Şemdinî) û birayê wî Seyyîd El Taha tînin jimartin. M. Xalid ê ku bi navbeynkariya El Hakkarî û El Seyyîd Taha de Kurdistan kontrol dikir, ji bo herêma Botan-Cizîr Şêx Xalid El Cizîrî û ji bo herêma Dagistanê jî Şêx Îsmail El Şîrwan şandin. Li peravên Derya Reş, Şêx El Hac Feyzullah El Erziromî; li Rihayê jî Hortavîzade Şêx Muhammed Hafîz El Rûhavî xelîfeyên wî bûn. Li ser navê wî jî li Erzînganê xelîfeyê wî Şêx El Bexdadî û El Erzîncanî dixebitîn.*” (Neqşibendîti Rol û Girîngiya wê ya di Siyaseta Rojhilata Navîn de)

Şêxên mezin ên Qadirî jî yek bi yek derbasî Neqşibendîtîyê bûne. Yên ji van herî navdar jî Saadete Nehrî, Arvasî, Olekî, Takhî ne.

Îsmail Beşikçi di xebata xwe ya bi navê **“Nîzama Rojhilatê Anatolyayê”** de bicihbûn û qadên van ên xebatê wiha vedibêje;

“-Seyidên ku *şêxên* wan Seyid Taha Nehrî (Taha-i Hakkarî) bû, milê yekemîn pêk dianîn û li Colemêrg, Elbak, Başûrê Kurdistanê û Rojhilatê Kurdistanê bi bandor bûne.

-Palevîyên ku *şêxên* wan Şêx Eylê Paloê ye (bapîrê Şêx Seîd), milê duyemîn pêk tîne û li dora Tatos, Xînûs, Çewlig, Licê, Amed, Palo û Gimgimê bi bandor bûne.

-Milê Kûfrewî yê ku *şêxên* wan Şêx Emînê Şerwanî û Şêx Muhammedî Kufrewî ne, milê sêyemîn pêk tîne û li herêmên Patnos, Tutax, Zêdkan, Agirî, Qaqizman, Qamuşan, Gogsî bi bandor bûne.

-Milê Tagî yê *şêxên* wan Gevsê Xîzanî ye, milê çaremîn pêk tîne, li herêmên Bedlîs, Wan, Mûş, Motkî, Şax, Misirc, Êlih, Gogsî bi bandor bûne.

-Milê Mîrî yê ku *şêxên* wan Şêx Qasimî Cizîrî ne, baskê pêncemîn pêk tîne û li Riha, Mêrdîn, Cizîr, Başûrê Kurdistanê û Başûrê Biçûk bi bandor bûne.

Hin terîqet hene ku tevî girêdayî van milan e jî, bi şiklê milên biçûk berbiçav bûne. Li Licê terîqeta Şêx Selîm, li Hezo û Xerzanê terîqeta Zogeydî ya Şêx Mahmûdê Zogeydî, li Motkî, Êlihê terîqeta Şêx Êlaeddînê Oxune, li Nisêbîn, Başûrê Biçûk û Qoserê Şêx Ehmedê Xezna xebat meşandine.”

“Xelefên Taha-î Hakkarî ya ku milê yekemîn pêk tîne, li Kurdistan û Tirkiyeyê bi bandor bûne. Taha-î Hakkarî, birayê Abdullahê Hakkarî yê ku yekemîn *şêxê* Nehrî û xelîfeyê Bexdadî ye û kurê Mele ehmed B. Salîh Geylanî ye. Li Meclîsa Osmaniyan parlamenterî kiriye. Kurê wî Şêx Ubeydullah e û 1880’î îşyanek amade kiriye ku destpêkê berê xwe daye Îranê, dûvre jî Osmaniyan. Di encama hevpariya her du hêzan de îşyan hatiye tepeserkirin, li gel Abdulqadirê kurê Ubeydullah ê rêbertiya îşyanê kirî, di 1881’an de sirgûnî Mekkeyê hatiye kirin. Ubeydullah li Mekkeyê miriye, kurê wî Abdulqadir endamtî û serokatiya Meclîsa Ayan a Osmaniyan kiriye. Lê dûvre ji ber ku ew jî bi tawanbariya destek daye îşyana

Şêx Seîd a 14'ê Sibata 1925'an, di 12'ê Nisana 1925'an de li gel kurê xwe li pêşiya Ûlûcamî ya Amedê hatiye daliqandin."

*"Di nav şêxên Neqşî de Gumuşhaneviye, ji ber ku hê bêhtir murîdên wê Kafkasî ne, ihtîmala ku ev terîqet jî wek orîjîn Qafkas-yayî ye tîne bîra mirov. Ji ber ku milên Neqşî yên cuda piranî bi tîkiliyên wisa yên nîjadî hatine avakirin. (Ferît Aydın, **Di Terîqetê de Rabita û Neqşîbendî**)*

Rewşek balkêş jî di pirtûka **Bazil Nikitin** a bi navê "**Kurdan**" de tê nirxandin. Avahiya ku Neqşî mîna hucreyên mîstîk bi nav dikin, ecêb in. Bazil Nikitin di pirtûka **Kurdan** de wisa dinivîse:

"Derwêştiya Kurdan di plana eşîran de hatiye birêxistinkirin. Şêx ê ku fêrkirina rast di bin destê xwe de hiltîne û derdora wî bi şagirtan girtiye, fêrkirinê di mala xwe de fêr dike, şîrove dike. Murîdên herî baş wê di demên pêş de li ber çavên eşîran bibin nûner (xelîfe). Wisa jî Kurdistan ji serî heta binî, li gor rewşa erdnîgarî ya eşîran bi toreke 'hucreyên mîstîk' tê girtin."

Şêxîtiya ku derbasî şûna Mîrîtiyê bûye, di nav civakê de bi roleke lihevanînê û derbaskirina kaosê rabûye û berbiçav bûye. Terîqeta Neqşîbendî, her ku diçe xurt dibe, xwe vediguhezîne derveyî sehaya manewî ya Kurdistanê, derbasî sehaya polîtîk dibe, ango di nav jiyanê de bûye hêza herî bi bandor. Prof. Dr. Mubeccel Kiray, guhertinên hêzên bi vî şilî wek '**Tampon Fonksiyon**' bi nav dike. Neqşîbendîti weke ku em ê dûvre jî bibînin, li beramberî seknên azadîxwaz wê bi rola bollwerk rabe. Ango di rola kelheyek parastinê de, wê bibe xwediyê rolek antî-azadîxwaz û pozîsyonek paşvekişandina civakê!

Li jor me behsa berxwedanên ku di destpêka 1800'î de li Kurdistanê qewimîne kirin. Me hewl da bi diyardeyên dîrokî îzah bikin ku Mîrên ev berxwedan bi rê ve birine, hema hema li gelek herêmên Kurdistanê serwer in. Vê rewşê bi awayekî cidî zor daye Osmaniyan ku li rojava xak ji dest didan. Osmaniyan ku li rojava her winda dikirin, li rojhilat ango li Kurdistanê plana telafîkirina vê dikirin. Di vê demê de ji astek azadî û xweseriyê ya dihat xwestin wê bi rehetî pêş neketiba. Ji ber vê bû ku; peymanên çend sed-salan hatibûn kirin, dihatin betalkirin û li şûna vê jî pêvajoya pel-çiqandina Mîrîtiyan û parçekirina wan dest pê kiribû. Mîrîtiyên

gelekî mezin, ji bo Osmaniyan dihatin wateya ‘belayên’ mezin. Tew îcar di pêvajoyek wisa krîtîk de, diviyabû ku Mîrîtiyên wisa xurt nebûna.

Saziya Mîrîtiyê, li Kurdistanê saziyek gelekî bi bandor û rêzdar bû. Heta îro jî hê di gelek stran, helbest, çîrokên Kurdan de gotina Mîr bi rêzdarî tê pêşwazîkirin. Kurdan ku li dijî hêzên dagirker li lûtkeyên çiyayan, deştan û zozanan wek avahiya eşîrê hebûna xwe didomandin, wek otorîteya xwezayî Saziya Mîrîtiyê bi pêş xistine. Ev saziya otorîteya xwezayî ku bi sedan salan xwedî seyrek dîrokî ya çêbûn û pêşketinê bûn; wek di îxanetên berxwedan û îşyanên Kurdan de hat dîtin her çiqasî li dor bijartiyên Kurd ên hevkar dejenere bibe jî; di nav avahiya civakî bi giranî wek saziyek rêber-tiyê ya kevneşopî û rêzdar hatiye qebûlkirin.

Parçekirin an jî bidawîkirina saziyek wisa bi bandor û rêzdar, wê valatiyên gelekî mezin ên otorîteyê ava bikin. Li şûna vê otorîteya valabûyî wê şêx bikevin dewrê. Bi taybet jî şêxên Neqşî-yan! Şêxên ku berê tenê bi karên olî re mijûl dibûn, piştî Neqşîtiyê wê li qada siyasî jî bi bandor bibin. Û weke ku em dibînin, şêxên Neqşî wê di nav civakê de wek tekane hêza otorîteyê pêş bikevin. Dema li ser vê destûra Osmaniyan jî zêde dibe, wê li pêşiya pêşketinan ti astengî nemîne. Ha, ew “*Tampon Fonksiyon*” a dihat gotin ev e. Tiştê behsa wê tê kirin, avahiyeke nû ye ku xwe berdide te-vahî şaneyên civakê!

Axatî û Şêxîti piranî bi milkên mezin ketine zik hev. “*Wek avahiyeke ku xwe dispêre malbatên bi xurtî di nav civakê de birêxistinkirî, wê li Kurdistanê bêyî destûra van saziyan pelek jî neleqe.*” Malbata Barzanî ya îro li Başûrê Kurdistanê ye, ji bo vê rewşê dikare bibe mînakê baş. Çend malbatên li Bedlîsê dikarin bên rêzkerin. Dijderketina malbatên wisa, neketina xizmeta wan, mîna dûrketina ji olê, heta derketina ji misilmantiyê tê dîtin. Civa-ka Kurd, hê jî avahiyên wisa di mejiyan de bi cih kirine, bi kûrahî dijî. Ev rewş bi taybet jî li Başûrê Kurdistanê zehf bi bandor e.

“*Neqşîbendî, li dijî Wehabiyên ku wek dijminê jiyana xwe mîm kirine, zêdetirî sed û pêncî sal in bi tevahî xîret û hêza xwe ve şe-rekî reşkirinê, didomînin.*” (Ferîd Aydin, Di Terîqetê de **Rabîta û Neqşîbendîti**)

Û divê neyê jibîrkin ku, piştî sedsalan wê Îngilîz parçekirina li Rojhilata Navîn bi destê malbata Siûdî ya Wehabî ye, pêk bînin. Abdullah Ocalan, lihevkirina mabeyna Osmanî-Neqşîyan, wek dîroka 1818 dide.

Rewşek din a balkêş jî ew e ku di sedsala 19'emîn de Kurdistan ji serî heta binî bûye qada berxwedanê, lê her ku diçe di warê siyasî de zêf û parçe dibe. Her çiqasî paşverûtiyên Mîrîtiyê hebûn jî, diyardeyek nêzî Kurdbûnê bû. Avahiyên wisa ne ku di nav gelek eşîr, pêkhatiyên jorîn ên eşîran û cih bi cih jî kêmteweyan de bi cih bûne. Lê çi heye ku piştî Mîr li Kurdistanê tene tasfiyekirin, Saziya axatiyê ya ku biçûktir e, lê wek hejmar zêdetir e, digire. Ya tê fêmkirin ev e; Neqşîbendîtiyê û Osmaniyan li hev kirine ku Kurdistanê hê zêdetir parçe bikin. Mimkun e ku ji Osmaniyan zêdetir bi daxwaza Îngilîzan a ku avahiyên hê biçûktir û parçekirî lazim dike, Neqşîbendîtiyê ev wezîfe bi dildarî pêk anîbe. Û ew roj ev roj e, parçebûyîna li Kurdistanê heta yekeya wê ya herî biçûk jî bi berbelavî hatiye kûrkin.

Eger rastiya ku Îngilîz di destpêka 1800'î de dikevin Rojhilata Navîn, li ber çavan bê girtin, dibe sedema fikara ku Mewlana Xalid jî di wê demê de li Hindistana ku koloniya Îngilîstanê bû, perwerde dîtibe û dîsa şandine naverasta Rojhilata Navîn.

Wek Abdullah Ocalan jî îfade kiriye: **“Însiyatîfên begîtiyê yên demdirêj di duyemîn nivê sedsala 19. de bi giranî hatine şikandin. Saziya şêxîtiyê ev rewşa hanê nirxandîye. Jixwe Sultan Mehmûdê Duyemîn ê derbên giran li saziya begîtiyê dan û Ocaxa Yenîçeriyê tasfiye kir, derb li terîqeta fermî Bektaşîtiyê jî da. Mehmûdê Duyemîn hewl da valatiya di warê meşrûiyetê de derket holê dîsa bi terîqeteke nû bi Neqşîbendîtiyê tijî bike. Di vê demê de şêxên Neqşî yên Kurd ên di nava terîqeta Neqşî de bi tesîr derketin pêş. Yek ji van şêxan Mewlana Xalid ê Silêmaniyê ye. Piştî ku di sala 1826'an de Yenîçerî û Bektaşîti hatine tasfiyekirin, ew bû yek ji şêxên herî bi hêz e ku sîstemê ekola wî da pêş. Şêx weke hevkarên nû yên sultaniyê li şûna began hatin bicihkirin. Li qesrê her ku çû bandora wan zêde bû. Roleke bi heman rengî ya terîqeta Qadîrî jî derket pêş. Dîsa şêxên Kurdan li pêş bûn. Rola şêxan di tevgerên Kurd ên hemdem de kêmtir hatî lêkolînkirin. Bi herhalî, piştî ku saziya**

begîtî û eşîrtiyê qels bû, saziya şêxîtiyê bi sedema hevkartiyê li qesran saziya bi însiyatîf û bi hêz bû. Di vê de rêveberiyên qesran bi zanîn tevgeriyane. Li Kurdistanê di sedsala 19. û 20. de civak li ser têgihiştina cemaetan bi pêş ket û di vê de saziya terîqetê bi roleke diyarker rabûye. Lê bi lez bi pêş ketin û di vê de hevkartiya wan a bi qesrê re ya ku bi awayekî ajantî ye, bi roleke girîng rabûye. Sîstem, weke hêza nû a xwe pê rewa bike wan bi kar tîne. Lewma nakevin kategoriya civaka sîvîl a ku ji xwe ber pêk hatiye. Ya rastî, ev aliyê wan timî qels maye. Gel ji ajantî û hevkartiya saziya şêxîtiyê hayedar nîne. Ev aliyê wan timî veşartî hatiye hiştin. Di her du sedsalan de rola bingehîn a şêxan ew e ku li şûna dilsoziya began a bi qesrê re, bi pêşengiya xwe dilsoziyeke nû û bêhtir bi hêz pêk bînin. Çawa ku arîstokrasiya begîtiyê di rewakirin û dewamkirina sîstemê de xwedî rol bû, bi awayekî bi heman rengî şêxên terîqetan di rewakirin û dewamkirina sîstemê de xwedî rol in û divê ev rola wan bi girîngî bê lêkolîn û eşkerekirin.”

Îro meqamên ku hema hema tevahî şêxên Neqşî destûrê jê digirin û tîrî pejiwandin DYA û Îngilîstan e. Wê demê li gor dîtina me wê ev fikrandina me jî zêde ne şaş be. Di salên dawî de Neqşîtiya navenda wê Hollanda ye, di asta fermî de tê parastin. Ev jî di nav xîsûsên fikarê de cihê xwe digire.

Li Kurdistanê Avakirina Saziya Axatiyê ya Lihevçêkirî ye

Di sedsala 19'emîn de li ser gelek nîrxên civakê guhertin hatiye ferzkirin. Dem êdî ne dema hegemonyaya împaratoriyan ademi merkeziyetên îzafî ne. Dem, bi lezûbez vediguhire pêvajoya netewe dewletan ku ji aliyê hegemonyaya kapîtalîst a navendî ya ber bi merheleya emperyalîst ve diçe, tîrî avakirin. Dilsoziya civakî, dilsoziya serokeşîriyê derbas dike, dikeve nav çarçoveya dilsoziya gotinên neteweyî. Li dijî êrîşeke ku berê xwe dide serxwebûna pratîkî, eşkere kiriye ku wê berxwedan bîn pêşxistin, dema pêwîst kir jî wê di oxira hin nîrxan de jiyan jî bê dayîn. Ji ber ku di encama hilweşîna kevn de ya nû nehatiye sazîkirin, di nav civakê de qeyranên cur bi cur xwe dane der. Rewşên aloz û kaotîk bi pêş

dikevin. Dema ev buhranên civakî ber bi pêş ve neçûn, ji bo hin saziyên paşverû bingehe nû û çavkaniyên hêzê derketine holê.

Hilweşîna mîrîtiyan ku xwe dispartin arîstokrasiya xakê, bi axatiyê hat dagirtin. Dûvre wê şêxîti jî wek saziyek jor a eşîran bi bandor bibe. Destpêkê axayan li ser xakên Mîran, çandinî, bazirganî û ajaldarî dikirin. Bi hilweşîna mîran ve, li van xakan mîna kuliyan axayan xwe dan der. Osmanî ji bo karibin vê pêvajoyê bilezînin, di 1858'an de Qanûna Erazîyê derxistin, wisa jî bingehe pêwîst amade kirin û di vir de kar hêsantir kirin. Rastiya ku Qanûna Erazîyê dianî ziman jî wiha ye; *“Bi rakirina rêkûpêkkirina Tîmarê û îlana Fermana Tanzîmatê ve, Dewleta Osmaniyan di îdareya xakê de dest bi mulkiyeta tam kiriye. Di sala 1847'an de mafê ku bi rêka mîrateyê ji zarokê xwe re dihêle, hatiye berfirehkirin. Di 1858'an de jî “Qanûna Erazîyê” hatiye derxistin, tevahî xakên Osmaniyan hatine birêkûpêkkirin, cureyên wan, mîrateya wan û meseleyên mulkiyeta li ser xakê hatine çareserkirin.”*

Bi vê nîzama nû ya xakê ve, bi awayekî fermî statuya xweser a Kurdistanê dihat bidawîkirin. Xakên mezin, radestî bi sedan axayên bêbandor û dûvikên wê dihatin kirin. Di esas de, otorîteya Kurd di nav otorîteya navendî ya Osmaniyan de dihate helandin. Li şûna bijartiyên Kurdan ên îzafî otantik bûn, çinek hevkar û xayîn a li gor sîstema kapîtalîst a siberojê hatibû saz kirin. Çawa ku me Neqşibendîti mîna avahiyek “Tampon Fonksiyon” nirxand, rastiyeke wek rojê li ber çavan e ku axayan jî heman rol listine. Em dikarin vê mîna, *“hewldana bendkirina hewldanên civakê ya bi ser xwe de hatinê”* bi nav bikin.

Saziya axatiyê ya ku îro hê jî li Kurdistanê bi bandor e û ji bilî parçekirina avahiya civaka Kurd ti rolek wê ya din nîne, xwedî temenekî 150-160 salan e. Di asteke hevkariyek wisa de rol listine ku ji ya dihate xwestin hê mezintir e. Di roja me de jî ji qral zêdetir qralparêz in, ev jî ji vê mîrateya dirokî tê. Bi roleke xencerê rabûne ku li ser singa civakê ketine!

Mamoste Îsmâîl Beşîkçî, di xebata xwe ya **“Nîzama Rojhilatê Anatolyayê”** de daneyên ku van gotinan piştrast dikin radixe ber çavan. *“Derketina axayan a piştî mîran, em ji Rich ê ku di dema hilweşîna mîran de Babanî lédikoliya, ragihînin; “Di 1851'an de hat îdiakirin ku tevahî erazî heta ku bi şikleki din radestî tapûyê*

nehatibe kirin, aîdî Împaratoriya Osmaniyan e (Heta wê rojê di dest malbata Babanan de bû), lê yasaya ku gund nikare bibe malê yek kesî li ber çavan nedihat girtin û nediket meriyetê. Lê, lîderên eşîran, beg bi bertîlê û çend şahidan ve gund wek milkê xwe li tapûyê dinivîsandin. Bi van fonksiyonên wan ên fermî ve, ji bo baceyên têkildar bêne komkirin, bi awayekî bi bandor bêne komkirin û birêvebirin, divê hêzek hebûna. Di encam de, komek xwediyê axa yên ku beriya wan ti pêşiyên wan ên xwedî van xakan tinebûn, derketin holê.”

Wek berhemek guherînê, ev bermahiyên feodal derketin. Bi milêkî din, eşîrên ku ji hêza yekîtiyê bêpar man, dîsa bi tena serê xwe man. Atmosfereke kaosê ya ku ji hev tecrûdkirî bi serê xwe dijî, li dijî hev şer dikin û dozên xwînê bi tundî dewam dikin, her ku çû kûrtir bû. Avahiya civakî parçe bû. Mîrîtiya ku yekîtiya eşîran saz kiribûn, di dema desthilatdariya xwe de avahiyên eşîran parçe nekirine, parastine; heta ji bo ku hevsengiyek hêzan çêbikin jî teşwîq kiribûn. Lê niha, eşîr bi rewşek hê xerabtir li halên xwe yên berê vegehiyan. Tabloyeke mîna parçebûnê, xwe vekîşandin û kêşmekêşî derket holê. Ev bêguman birînek civakî ya cidî bû.

Dema Mîr ji dika dîrokê vekîşîyan, malbatên xwe yên navdar û navên xwe li pey xwe hiştin. Helbet û wek me got kêşmekêştî! “Çawa ku di destpêka salên 1800’î de zoriyek dîtin, di dawîya sedsalê de jî zorî û tengavî dîtin. Rêyek derketinê pêwîst bû. Derketin, wê çawa bihata dîtin? Ev wê bi dîrokê diyar bibûya. Mîna destpêka sedsala 19’emîn, di nivê wê de jî ji bo rêyek derketinê zehmetî dihat kişandin. Destpêka sedsalê, îşyan wek çareserî dihatin nîrxandin. Di nîvekê de jî lêgerînek hebû. Lê niha, pêdivî bi figurek nû hebû!”

Bi berxwedan û îşyanan her çiqasî li ber çavên gel hin hestên neteweyî bi pêş ketibin jî, di dawîya sedsala 19’emîn de Kurd hê zêdetir parçe bûne. Weke ku em ê dûvre di Alayên Hemîdiyan de jî bibînin, bi awayekî cidî zêf bûne. Berxwedanên parçeyî, pêşnedîtin, xweparêzî, tenê fikrîna berjewendiyên xwe, nêzîkatîyên eznavendî û têkildarî van tengbûna lîdertiye, bûne sedem ku encamgir nebin.

Faktoreke din a diyarker jî, weke ku me her tim destnîşan kir, îxanet e ku ji dîroka Kurdan tê. Di her berxwedan û îşyanê de

teqez hatiye dîtin ku derbasbûyîna refên dijberê xwe çêbûne, li dijî berxwedêran seknên dijber derketine.

Pîştî Mîrîtiyên tasfîyekirî, hin kesayetên ku dikarin li dijî berxwedanan bibin alternatîf derketine pêş. Wek mîna li jor hat diyarkirin, ji bermahiyên şûr, saziya axatîyê ya mîna xencerê li ser dilê civakê ketiye, ava dibe. Ev saziya parçeker a ku bi nazenîn hatiye nirxandin û pêşxistin, mîna çil werîsan jî bi desthilat girêdayî ne. Osmanî ji milekî van gihandiyan derdixin pêş, li milê din jî kesayetên ku dikarin bibin tehlûke bi dar vekirine û bi rêbazên qazoxan ku xweserî Osmaniyan e, qetil kirine. Ev polîtîkayên dagirkeran ku bi sedan salan di meriyetê de ne, jiyan kirine jehr. Birêvebirina bi rêka parçekirin û zeîfkirinê, divê bi wateya xwe ya herî rast ev be. Wê tovên nîfaqê bixe nav bermahiyên şûr û beşên berxwedêr, axekokan destek bikin û wisa jî rêka kûrkirina parçekirina vê civakbûyîna bibînin.

Di pirtûka Îsmail Beşikçi ya **Metîngeha Navdewletî Kurdistan** de têkildarî vê diyardeyê wiha tê nivîsandin: *“Di dîroka neteweyekê de bûyîna hedefa polîtîkayên parçe bike-bi rê ve bibe, yek ji karesatên herî mezin e. Ji ber ku polîtîkaya parçe bike-bi rê ve bibe, belavkirina mejiyê neteweyekê ye, parçekirina qerqûdeyê (iskelet) wê ye. Gel ê ku derbeyek wisa giran xwariye, careke din nikare xwe bi hêsanî kom bike.”*

Paulo Freire, di pirtûka xwe ya **Pedagojiya Bindestan** de dibêje; *“Yek ji esasên têkiliya serdest û bindest, diyarkirina rêgezan e. Her diyarkirina rêgezan, tê wê wateyê ku mirovek li ser mirovekî din hîlbijartina xwe ferz dike, ev jî têgihiştina mirovê diyarkirî, vediguherîna têgihiştinek li gor ê diyarker. Wisa jî tevgera bindest dibe tevgerê diyarkirî, rêgezên serdest dişopîne.”* Li cihekî din jî Paulo Freire dibêje, *“Bindest, bi bandora biyanîbûnê ve çî dibe bila bibe dixwaze bişibe serdest, wî teqlît bike, wî bişopîne.”* Sedema wê êşkere ye; *“Ji bo serkeftina dagirkirina çandî, şert e ku yên hatine dagirkirin bîna îqnakirin ku bi şiklekî teqez lewaz in. Ji ber ku her tişt dijberê xwe jî di xwe de dihevine, bi qasî ku yên hatine dagirkirin xwe bêqîmet bihesibînin, bi neçarî divê serdestiya dagirkeran jî binase. Wisa jî nirxên dagirkeran ji hêla yên hatine dagirkirin wek mînak tene girtin. Eger dagirkerî çiqasî hişk bê destnîşankirin, yên hatine dagirkirin çiqasî li ruhê*

çanda xwe û xwebûna xwe biyanî bibin, ewqasî dixwazin bişibin dagirkeran, wek wan bên dîtin, wek wan biaxivin."

Albert Memmi di pirtûka xwe ya **Portreya Mêtinkar Portreya Mêtingehbûnê** de vê rewşê wiha dinirxîne; *"Ji bo ev rewatî tam çêbibe, kolekirina mirovê mêtingeh tenê ne bes e, divê vê rolê qebûl ji bike. Têkiliya mabeyna mêtinkar û mêtingehê ji ber vê wêranker û afîrîner e... Heta ku bi xweşbînî nêzî mêtingehbûnê bibe, tekane alternatîfên mirovê mêtingeh bişavtin an jî mîna kevîr qerisîn e."* Yê dibêje yek rê heye ku dikare vê derbas bike, **"Fêrî rewşa mêtingehî nabe; mîna berstûka hesin tenê dikare bişkê"** Frantz Fanon e.

Li dijî Têkoşîna Rizgariya Neteweyî ya ku PKK'ê pêş xist, çeteyên kontrabûyî û sercerdevan hatine gihandin û derketine pêş; hin malbat û endamên malbatên rêzdar û welatparêz jî hatine tasfiyekirin. Ev çeteyên ku nû gihandine, çavbirçî, di rêgezên exlaqa civakî de ketî ne, ji mirovahiyê qut bûne û bi çavreşî girêdayî dijmîn in, derxistine pêş û bûne kiryarên qetlîamên mezin.

Bi paralelî tepisandina îsyanan, terîqeta Neqşî hat pêşxistin û axatî hatin xuliqandin. Ev esas îşaret e ku li Kurdistanê serûbinbûnek cidî heye. Li şûna girêdanên kevn, têkilî û nîrxên nû bi pêş dikevin. Her tim ne rast e ku mirov bibêje her nûbûn wê encamên pozîtîf bi xwe re bîne. Kurdên ku di dema Mîrîtiyan de komî bûn, bi tepisandina Mîrîtiyan ve serberdayîti jiyane. Îngilîz û Osmanî ji bo karibin vê serberdayîtiyê ji xwe re bi kar bînin, Neqşîbendîtî û axa derxistine pêş. Lê, her tişt jî wek her tim tê plankirin bi rê ve naçe. Pêşketin ne wek çixêzek rast çêdibin. Diyardeyên civakî, rêkên xwe yê pêşketinê li gor xwezaya xwe bi xwe diyar dikin. Berevajîya daxwazên hêzên dagirker û emperyal ku nikarîbûn li Kurdistanê li şûna girêdanên kevn hêzên karibin girêdanek bi bandor ava bikin biafirînin; tîpek nû ya Kurd a wek Kurmancîbûn tê zanîn û ji girêdana hinan rizgarbûyî derdikeve holê. Ev diyarde, piştî sed- sed û pêncî sal şûn de, Kurmancîbûn e ku dema Kurdistan kapîtalîstbûyîne dinase wê hê gurtir bi pêş bi-keve.

Abdullah Ocalan têkildarî Kurmancîbûyîne di Parêznameya xwe ya DMME de wiha dibêje; **"Kurmancîtiyê, Kurdên ku ji eşîrê veqetiyayî û ketî pêvajoya gelbûnê îfade dikir. Bi berfi-**

rehî Kurmancîbûn, di dawiya sedsala 19'an de û di sedsala 20'an de bi pêş dikeve. Ev jî ji bo Kurdan tê wateya gelbûyîneke sift. Dema em bala xwe bidinê, ji bo hemû malbatên li derveyî qebîle û eşîran dimînin, Kurmanc tê gotin. Ev pêvajoya ku di dema şikandina bandora feodaliyê û pêşketina kedkarên gund û çolterê (mirêba, nîvekar) de pêş ketiye, dînamîkeke Kurd a girîng e. Weke ku ez ji vê dînamîkê hatime, PKK jî tevgerê Kurmanc e. Bingeha wê ya sosyo-ekonomîk bi giranî Kurmanc e. Kurmanc, Kurdên ku di pêvajoya gelbûyîne de ne, îfade dike. Hestên qebîle û eşîriyê tine dibin, heger ku lewaz û ji ber xwe ve be jî, bîrûbaweriyeke qewm û gel cihê vê dadigire. Li gor hişmendiya eşîriyê ve, guherîna şeweya hişmendiyeke civakî û neteweyî îfade dike.”

Her wiha Abdullah Ocalan wê têkildarî vê mijarê nixandinek hê berfirehtir di parêznameyên xwe yên dawî de wiha bîne ziman: “Li cem Kurdan, bi derketina ji çanda qebîle û eşîrê, diyardeya gelbûnê ya pêkhatî weke Kurmanc tê binavkirin. Tê maneya ‘mirovê Kurd’. Li cem Tirkan Tirkmen, li cem Ereban Bedewî, li cem Êraniyan Ecem bi heman maneyê ne. Her çiqasî Kurmanc xwe bi tevahî ji ta û benên qebîle û eşîrtiyê nekiribin jî kategoriyeke e ku ber bi roja me ya îro bi bajarbûna bi lez mezin dibe. Ji ber sedemên cihêreng malbatên ji tevahiya qebîle û eşîrên Kurdan qut dibin li gund û bajarên qelebalix, serbixwe û mezin dibin, hêza bingehîn a gelbûna Kurdan pêk tînin. Bi vî şewazî Kurd ê weke gel mezin bibin û ber bi netewebûna demokratîk a nû ve biçin, lê bi vê rêveçûnê re tebeqeya jor a eşîrê ji milliyeta qels ber bi millet û netewe ve bi heman lez û xurtiyê gav neavêtiye. Ji ber ku ev tebeqe di pêkanîna netewebûyîna dewletê de bi ser neket, ev jî bo Kurdan bûye şens ku neteweya demokratîk pêk bînin.”

Alayên Hemîdiye û Mangurtkirin

Eger em dîsa vegerin, Alayên Hemîdî ku di dema Ebdulhemîd de, tevî rexneyên cidî yên ji derdora qesrê jî di sala 1891'an de hatin avakirin û navê xwe ji Ebdulhemîd girtine, ji bo bi parçeki-

rinê ve birêvebirina Kurd û Ereban ji sêlingên polîtîk ên girîng in. Ev alayên ku ji navikê girêdayî Osmanî ne, hem wê potansiyela îsyanan bihelînin hem wê li beramberî qesrê pêwendiyên nû yên sêdaqatê saz bikin û hem jî wê li dijî gelên din ên îsyana bikin bihatana bikaranîn. Ev alay, ji axayên nûgihayî, malbat û mîrîtiyên Mîrên girêdayî-alûdeyê Osmaniyan û kur û xizmên bermayiyên “îsyane” yên li Babialî gihiştine, pêk hatine.

“Derdorên rêveberiya Osmaniyan, ji bo karibin eşîrên Kurdan bikin hêzek yedek ketibûn nav hewldanan. Bi vê rêkê ve hêvî dikirin ku Kurdan kontrol bikin, her wiha bi saya wan jî otorîteya dewletê saxlem bikin, li gel têkoşîna Kurdan jî, pêşiyê li tevgerên nîjadperwer ên komên etnîk bigirin û li herêmên sînorên Rûsyayê tevliheviyê derxînin. Ji vê zêdetir, bi taybet jî di şerekî Rûsyayê de karibe wan bi awayekî hê çalaktir tevli şer bikin. Di dawiya sedsala bihurî de ji ber vê sedemê bû ku atfî Ebdulhemîdê Duyemîn bi navê Alayên Hemîdî hewl hat dayîn ku yekîneyên leşkerî yên ji eşîrên Kurdan bînin avakirin. Ji bo van yekeyên leşkerî, eleqeyek fermî ya di asta herî jor de û bi nîzamnâmeyek hûrikûr hatiye vesazkirin, dihat nîşandan. Li gor vê jî, her eşîrên ku dixwestin tevli alayan bibûna, diviyabû ku serê malê “siwarek” bidana.

Diviyabû ku siwar di polên jêr de 23 salan eskerî bikirana.

1) *Ciwanên 17 salî yên di pola îhzariye de ku wextê wê yê xizmetê 3 sal in, li gor fermanên di pirtûkek leşkerî de ku ji bo vê armancê bi taybet hatibû amadekirin, li cihên xwe perwerdeya leşkerî didîtin.*

2) *Bi awayekî girêdayî vê, dema tevlibûna leşkeriyê, wextê xizmetê ya pola nîzamiyeyê ku kesên temenên wan mabeyna 20 û 30'î de dihatin girtin, 12 sal bûn. Endamên vê polê bi navber her tim perwerde didîtin û dema bang li wan dihat kirin, diviyabû ku di nav 12 saetan de bi hespên xwe li gel giştî alavên xwe amade bûna.*

3) *Pola îhtiyatiye ku wextê wê yê xizmetê 8 sal bûn, ji siwarên temenên wan mabeyna 33 û 40 salî de pêk dihatin ku ne pêwîst bû tevli perwerdeyê bibûna, lê di dema rewşên awarte de bi pratîkî banga xizmetê li wan dihat kirin.*

*Di hersê polan de jî diviyabû ku siwar hespê xwe bi xwe bînin, lê di dema xizmeta pratîkî de hem jî dema perwerdeyê de ku destpêkê salane 3 meh in, dûvre dibin 5-6 hefte, tevahî mesref ji hêla dewletê dihatin dayîn.” (Kemal Mazhar Ahmet, **Di Yekemîn Şerê Cîhanê de Kurdistan**)*

Polîtîkayek wan jî ew bû ku li hin deveran eşîrên lewaz, derdixistin pêş û didan ber pozê eşîrên xurt. Wisa jî, li dijî rewşên awarte emniyeta xwe saz dikirin. Îxanet dida pêş, çekdar dikir û bi hev dida şikandin. Wisa jî li bin kevneşopiyên civakî dînamît bi cih dikirin. Di avahiya civakî ya Kurd de nakokiyên navbera eşîran jixwe ji ber avabûna dîrokî ji kûrahî xwe didan der. Me yê vê rastîya ku lewaz dike û dixîne bê çawa piştî mudaxeleyek bi taybet rewşên sosret diafirîne, piştî sedsalan, li dijî Tevera Rizgariya Neteweya Kurdistanê, dema hin eşîrên ku hebûn û nebûna wan nediyar hatin biçekkirin û cerdevankirin, bê di astek çawa de exlaqê civakî tarûmar kirin, bi awayekî herî berbiçav bidîtana. Neditiyên dûvre dîtî, destpêkê serê bavê xwe jê dike. Her kesî dît ku, dema dewletê ev ên neditî bi çek kirin, berê wan da ser kesên muxalif, birînen nakewin û nexweşiyên derbas nabin bi xwe re anîn.

Mînak, sîstema cerdevantiyê ya ku li cîhanê her ku diçe pêş dikeve û tê pêşxistin, sîstemek wisa ye. Serwer, ji bo karibin xakên ku dagir kirine bi rehetî kontrol bikin û beşek ji mirovên ku mêtîngeh warên wan in bikşînin cem xwe û hevsengiya hêzan di lehê xwe de biguherin, her tim ketine nav hewldanên taybet. Ev rêbaza ku wek fetha ji hundir tê zanîn, serweran zehf bi kar anîne. Û wisa dixuye ku di cîhana modern a nû de jî yek ji çekên herî bi bandor wê dîsa ev sîstema cerdevantiyê be. Her kesî dît ku hêza herî modern a cîhanê DYA, herî dawî li Iraqê, bi gotinek din Bexdayê, tevî hemû hewldanan jî nikarîbû serweriya xwe saz bike. Lê, kengî sîstema cerdevantiyê (Sons of Iraq) ji bo xwe kir rojev û pêş xist, ha wê demê bi awayekî lezûbez hakimbûna xwe ya li ser Bexdayê bi tempoyek nedihat payin saz kir. Tê zanîn ku hewl da heman tiştî li Afganistanê jî bike.

Eşkere ye ku dema Osmanî, ango Ebdulhemîd jî Alayên Hemîdî ava dikirin, heman mantiq xebitandîye. Tiştê esas bûye jî ew bû ku girêkek nû li ser girêkên dîrokê hatiye zêdekirin. Eşîrên

Kurdan careke din, dibûn amûrên polîtîkayên derve yên bi rengê aleyhê hinan, lê di lehê xwe de dixuyan. Wek me got, piştî sedsalên jî wê dîsa ev lîstok vê carê ne wek Osmanî, lê wek Dewleta Komara Tirkîyeyê, Îran, Iraq û Sûriyeyê bi kûrahî bidomiya. Wê cerdevantî bi pêş bixistina, bizanîbûna ew hestên tolhildanê yên ku di wan salan de di kûr de hatine veşartin, tepisandin, li hundir hatine girtin; nû bikirana, vê nexweşiya xedar a wê bibe belaya serê gelê Kurd, bi awayekî sînî biafiranda.

Mîna Alayên Hemîdî, cerdevantî jî ji ber vê rola xwe ya îxanetê bi mûçeyan hatine xelatkirin. Nakokiyên mabeyna eşîran kûrtir bûne. Eşîrên bûne dijminên hev, bi hev re mijûl bûne, ji têgihîştina dijderketina dagirker dûr ketine û tam ketine dorpêçê.

Ji ber vê ye ku; hejmara van alayan di destpêkê de sala 1891'an 40 bûn, piştî sala 1893'yan wê ji 63 eşîrên mezin hejmarek di navbera 80 û 100'î de alay bihatana avakirin. Dema ku em hejmara van alayan li ber çavan bigirin, em jixweber fêm bikin ku bê polîtîkayeke çiqasî bi bandor hatiye meşandin. Dema em li hesab bixin ku her alayek jî ji 800-1000 leşkerên çekdar pêk tînin, bê çiqasî hêzek bi bandor derketiye holê ew ê bê fêmkirin. Hin eşîran 8 alay derxistine, hinan yek; lê beşek mezin a Kurdan zarokên xwe nedane van alayan. Eşîrên ku alay ava kirine: Haydaran 8, Hesenan 8, Sipkan û Zîlan her yekê 3, Celalî 2, Mîlan 5, Zîrkan 2, Karakeçî, Alîkan, Reşkotan, Botan, Cîbran, Berazan û eşîrên mîna van zarokên xwe dane van alayan.

Yên em dibêjin Alayên Hemîdî di gelek mijaran de wek emniyetê hatine bikaranîn. Li dijî tevgera Ermenî ya ku wan salan gav bi gav bi pêş diket jî bi taybet li Kurdistanê Osmaniyan wek çeka herî bi bandor van pêkhatayên di nav îxanetê de mane bi kar anîn. Cih bi cih polîtîkayên qetlîamker ên Osmaniyan pêk anîn, ji qral hê zêdetir qralparêztî kirin. Divê baş bê dîtin ku bê exlaqa civakî ya bingeha xwişkî-biratiya gelan çawa ji aliyê vê avahiya sînî ya klonî hatiye texrîbkirin.

Di vê mijarê de dîroknasê Kurd Kemal Mazhar Ahmet bi şênberî wisa dinivîse: *“Polîtîkaya navbihurî, piştî demeke kurt wek şiklê rêzeqetlîamek Ermeniyan xwe da der û ewil Tebax-Îlona 1894'an li herêma Sasonê dest pê kir. Esker û zebtiyeyan li gel hin canîyan (mirovkuj) li dijî mirovên herêmê ku bêtî temen û cinsiyet*

guhdar bikin, dest bi qetlîamekê kirin û di demek kurt de 40 gund tine kirin, nêzî 10000 mirovî kuştin. Piştî vê “serkeftina” ewil bi salekê, qetlîama duyemîn a hê xerabtir dest pê kir. Di Îlona 1895’an de zîlamên Padîşah ên li Stenbolê êrîş birin li ser Ermenîyan, gelek ji wan kuştin, yê ku ketin hepsê û ji qetlîamê rizgar bûn jî kesên “bişens” bûn. Paşê, ev qirkirin li bajarên Rojavayê Ermenîstanê û cihên wek Amed, Mûş ku şêniyên Ermenî lê dijîn û hin deverên din ên warên Kurdan jî lê ne, pêk hat. Çend mînakên ku em bidin wê karibe asta mûazzam a ku ev bûyer gihîştinê, nîşan bide. Li Stenbolê tenê di nav 2 rojan de 5500 Ermenî hatin tinekirin. Di vê nîvekê de jixwe gelek Xirîstîyan jî Ermenî hatin hesibandin û kuştin. Li gor pirtûka Fransîyan a bi navê Pirtûka Zer, Qetlîama Ermenîyan a li Amedê di 1’ê Mijdara 1895’an de dest pê kir û 3 rojan dewam kir. Li vî bajarê bi gotina “selewatê bine” nêzî 3 000 mirov hatin kuştin û 120 gundên derdor hatin hilweşandin. Tenê di nav bajêr de dest avêtin bi dehan keç û jinan; li derveyî bajêr jî bûyerên wisa terkeser bûn. Rojek ji sê rojên qetlîamê, bi wêrankirin û êrîşkirina dikanên Ermenîyan a bi dest qatil û dizan derbas bû; dilê van çawa dixwestin mirov wisa kuştin an jî birîndar kirin.” (Di Yekemîn Şerê Cîhanê de Kurdistan)

Di plana pevşikandina du gelan de ku bi hezaran salan li ser heman xakê û bi giranî jî li ser esasê aşîxwaziyê jiyane, bi awayekî herî sosret dikare bê dîtin ku bê bijartiyên hevkar ên Kurd di bêexlaqiyê de çiqasî ketine. Qirkirina yekem û herî berfireh a pêvajoya modernîteya kapîtalîst hê di salên ewil de tê gotin ku tenê mabeyna salên 1895-1896’an de tam 300 hezar Ermenî hatine qetilkirin. Û wê piraniya vê jî bi destên Alayên Hemîdî pêk were. Bi gotinek din, ev hovîtiya erjeng, ji hêla bijartiyên Kurd ên bi rêka hevkarîyê ve xwe avêtine bîrên bêbin ên îxanetê pêk hatine. Garo Sasonî, dema behsa di **Dîroka de Pêwendiyên Kurd-Ermenîyan** dike, wiha dibêje; “*Osmanî* dikujin, *lê sûcdar* her tim Kurd e. *Zextê* dike, *qebahetdar* dîsa Kurd e. *Ti xerabî* li *holê nîne* ku, *yê vê kiriye* ne Kurd be *û ti zilm nîne* ku, *yê hevrû dimîne* ne *Ermenî* be.”

Her kes dizane ku: Alayên Hemîdî bi fermanên ji Osmaniyan girtî tevgeriyane û li ser vî esasî jî di qetlîaman de cih girtine. Lê, cihê ku ev alay têrê nedikirin jî, Kurdên ku di binyadê Alayên

Hemîdî wek Kurmanc dihatin binavkirin û bêeşîr bûn, dihatin bi-
 çekkirin, rayekirin û di qirkirina Ermeniyana de hatine bikaranîn.
 Wisa jî ekîbek mayînên serserî ya nûgihayî, xwenenas, ji rêgezên
 exlaqê bêpar, ji rêkê derketî û wê kengî ji hêla kê bê bikaranîn
 nayê zanîn, hatibû afirandin. Ev di heman demê de li gel serwerên
 Kurdan, dihat wateya pêşketina beşek din a hevkar a nû û ketî.
 Heman avayî, wek me gotibû piştî 100 salan jî wê di rastiya cerde-
 vanên gundan de ku li dijî Tevgera Azadiyê tên bikaranîn, ji aliyê
 gelê Kurd bi awayekî zehf stemkar biba ezmûn. Îro jî li Kurdistanê
 her kes dikare bibîne ku beşên wisa xwînmij li serê gelê me û ge-
 lan bûne bela. Dema ku di şexsê li Qilebanê Hazim Babat, li Şaxê
 Şabo de texrîbat û zirara ku kesayetên wisa pêk anîne li ber çavan
 bê girtin, wê fikrandin ne zor be ku bê li dijî gelekî ku ji oleke din
 e, çî hatine kirin.

Van avahiyên ku civakê bi vî tarzî parçe dikin, bûn sedem ku
 civaka Kurd hê zêdetir di nav xwe de mijûl bibe û bi wan şerên
 navxweyî ve enerjî dan xerckirin. Her çiqasî dûvre mîna rola ku
 Alaya Mîr Xalidê Cîbranî di Îsyana Şêx Seîd de lîstîye, hin di
 Têkoşîna Neteweya Kurd de bi cih bibin jî, wê îstîsna qaîdeyan
 xera nekin. Di esas de Alayên Hemîdî rastiyeke wisa ye ku mîna
 xencera li ser singa civaka Kurd, avahiya civakî texrîb kirine, peri-
 tandine û bûne şerpençe!

Bi Dibistanên Eşîran Projeya Avakirina Mejiyên Pêşerojê

Piştî berxwedanên ku di sedsala 19'ê mîna de hatin tepeserkirin,
 tevahî ferdên ku malbatên wan tevî raperînan bûne, mîna di
 berxwedana Bedirxanan de jî hat dîtin, hin tên sirgûnkirin, hin
 caran jî bi zarokatî li dibistanên Babilaî ya Stenbolê dihatin
 perwerdekirin. Her çawa bibûya jî ji bo siberojê amadekarî lazim
 bû. Tam jî ji ber vê li Stenbolê dibistanên eşîran dihatin vekirin.
 Zarokên serokeşîrên hevkar û malbatên hevkar, li van dibistanan
 dihatin perwerdekirin. Li milê din jî ji bo karibin zarokên
 berxwedêran bîn selihandin û dûvre wek supaba emniyetê bîn
 bikaranîn, li van dibistanan wek rehîneyan dihatin gihandin. Ji van
 hin di nav Alayên Hemîdî hin jî di nav burokasiya Babilaî de di-

hatin wezîfedarkirin. Mînak, Şêx Abdulqadirê kurê Şêx Ubeydulahê Nehrî ku wê dûvre bihata îdamkirin, bibû Serokê Meclîsa Ayan (Senato), kurê Bedirxan Emîn Bedirxan bibû şefê îstixbarata leşkerî-polîsan, kurê Bedirxan Bahrî bibû alîkarê Ebdulhemîd, Îsmâîl Hakî yê neviyê Babanzade Abdurrahman Paşa, her wiha kesên mîna Suleyman Hikmet dikarîbûn bibûna wezîr û mebûs.

Di 4'ê Cotmeha 1892'yan de Mektebên Eşîran bi fermî hatin vekirin. Her çiqasî nivîskarekî gotûbe: *“Tim bi tim hatiye destnîşankirin ku Mektebên Eşîran ji bo zarokên eşîrên Ereban hatine vekirin. Jixwe di madeya yekemîn a nîzamnîameya ewil de ku ji bo mektebê hatiye amadekirin, îfadeya bi şiklê, ‘Mexsûsî talim û terbiyeya Eşîrên Urban (Erebên Çolê) e’ nîşanî me dide ku hedefa esas a vekirina mektebê eşîrên Ereban e. Ji bilî Amedê, eşîrên li erdnîgariya Kurdistan di nav çarçoveya vê mektebê de nehatine girtin”* jî; em bi xwe ji Nûrî Dêrsimî dizanin ku zarokên rûspiyên Kurdistan li van dibistanan dihatin perwerdekirin. Hem jî gelek rûspiyên Kurdistan ên di nav Alayên Hemîdî de cih digirtin û fermandarî jê re dikirin, di destpêkê de hema hema bi ferzîkirinê ve dixwestin zarokên xwe bişînin van dibistanên ku nû vebûne. Jixwe bi pêvajoyê re gelek bijartiyên Kurdistan zarokên xwe şandine van dibistanan.

Yek ji mamosteyên Mektebên Eşîran Selîm Sirrî Tarcan di bîranînên xwe de wiha dibêje; *“Qismetê min e ku ez bûm mamosteyê mekteba Eşîran! Ev dibistan (...) ji wargeha tahsîlê zêdetir, mîna îslahxaneyê bû. Zarokên begên eşîrên Ereb, Kurd, Durzî yên ku piranî îşyan kirine, di çarçoveya feodaliyê de jiyane wê li vir bihatana perwerdekirin û medenî bibûna. Ev xortên ku temenê wan navbera 18 û 25 salan de ne, rutbeya Tegmen girtibûn û ji bo çavên wan bîn girêdan tevli çîna ‘Yaverani hazretî şehriyarî’ hatibûn kirin. Mekteba Eşîran a li Çifte Konaklara Kabataşê, ji bilî berdevamkirina jiyana eşîran ne tiştekî din bû. Talîmatname li dîwêr mabû! Wisa bû ku rojekê yek ji mamosteyan ji ber pevçûnê miribû jî! Ha Muşîr Zekî Paşa ez kiribûm mamosteyekî saziyek (!) wisa ya tahsîl û perwerdeyê. Ti carî ji bîr nakim, gotina yekem a Kolaxeyê (rayeyek mabeyna serpel û serdar) Midûr Kamil Beg wisa bû; ‘Oxlim, ev ne eşîr in, hûrmêş in!’ Li dibistaneke (an bigo-*

ta islahxane?) ku midûrê dibistanê mîna hûrmêş li we dinêre, ma şensa fêrbûna biratiyê heye?

Gelo we yê bi yên ku îmtiyaza kokbûn û gewdebûnê ji bo vedîşêrin û wekheviya şax û pelê ji bo we pêşniyar dikin, bawer biki-ra? Ya dixuye ew e ku, xwendevanên Arnavût, Erebb û Kurd ên Mekteba Eşîran bawernekirin tercîh kirine.”

Perwerdekiriya van dibistanan, esas wê perwerdeya biyanîkirina li civaka xwe ya esasî bidîtana. Ev jî nebes e, bi destên perwerdekiriya li vir ve wê bê xwestin ku civakek bê îslehkirin. Her çawa bibe jî ev zarokên malbatên navdar in. Eger ev zarok ji bo Tirkîtiyê bêne qezenckirin, ji bo karibin civakekê ji cewherê wê dûr bixin, wê nimûneyên herî baş bihatana afirandin. Jixwe ev zewatên (şexsên) ji xwe dûrketî ziman dizanin. Nivîsê dizanin. Qelemên wan baş lê dikin. Cil û bergên wan dişibe mamosteyên wan. Wisa jî ev gihandiyana ji bo civakek bê hafize bê hiştin, di burokrasiyê de, pêwîst bike li cihên bi bandor têne wezîfedarkirin. Ji ber nivîsên wan derdikevin pêş. Ji ber xwedî hêza fikrî û axaftinê ne, li her cihên ku biçin ji ber rêzdariya dîrokê xwedî giranî ne. Gel qîmetê didiyê. Li ser serê xwe digire. Her çawa bibe jî nîfşên malbatên berxwedêr in. Paşmayiyên wan in. Kêmek ji van – ku îstîsna qaîdeyê xerab nakin- berê xwe didin gel, ji bo gel hin tiştan dikin. Lê piraniya wan ji ber li civakê biyanî dibin, dibin Mangurt in.

Çiqasî jî dişibe tabloya vê rojê...

Em diyardeya Mangurtkirinê, di pirtûka **“Carinan Rojek di Berdêla Sedsalekê de ye”** a Cengîz Aytmatov de ku li dijî sulteya desthilatdaran berxwedanê çanda gelan a demokratîk bi awayekî herî wêjeyî nivîsî ye, di şerê mabeyna eşîr û bavikên Kirgîzan de wek rêbazekê dibînin ku dijminê xwe bêhafize dihêle û vediguhêrine. Rêbaza bêhişkirinê destwerdanek hem fîzîkî hem jî ruhî ye. Destpêkê porê ew kesê ku wê bibe dewşîrme tê kurkirin. Hê dema eşên wî nû ne, çermê heywanekî –hêştir tê tercîhkirin- wisa germ germ li serê mexdûr tê kirin. Ji bo neyê derxistin jî bi ben tê girêdan. Girtî bi vî halê xwe ve, li naverasta çolê bi qazûxan tê girêdan. Di bin tava dijwar de dest û lingên wî girêdayî tê hiştin. Bi halekî birçî, bêderman, lê qasî ku wê jiyan xwe ji dest nede, av tê dayîn. Ji bo kesê ku avê dide vexwarin, axa an jî Juan tê gotin.

Tekane kesê ku wê ji hêla bêhiş bê nasîn, ev Juan e. Her ku diçe wê porên mexdûr dirêj bibin, lê porên dirêj dibin ji ber nikarin bi derve biçin, wê di serî de vegerin û wisa dirêj bibin. Wekî efekta dagerîna mû dibe. Di encama dagerîna bi hezaran mûyî de mexdûr her ku diçe hişê xwe winda dike. Ji ber ku dema ev dagerînên mû, bi tava şewat û bandora birçîbûnê re dibe yek, wê demê encamên erjeng derdikevin holê. Êşkence û birçîbûn, êşên bêdawî bi xwe re tînin. Ya “dîlxweşiyê” dide tenê çend dilopên avê ne ku ji bo mexdûr jiyana xwe ji dest nede, tê dayîn. Eger bijî- ku mirî jî çêdibin- beriya meheke wî/ê tijî bibe, bi awayekî fîzîkî û ruhî bêhiş dibe. Tekane kesê ku binase jî axa angos Juan e. Ji bilî vî ti yên din nas nake.

Cengîz Aytmatov vê rêbaza robotkirina kevnare ya di aqil de naçe, bi awayekî berfireh tîne ziman, behsa dayikekê dike ku ji bo kurê xwe yê mexdûr bibîne, lê digere. Dayik, war bi war li kurê digere, herî dawî li cihekî çolterên bêdawî dibîne. Lê mexdûrê hatiye bêhişkirin, dayika xwe nas nake. Ya herî trajîk jî ew e ku tenê bi vê namîne, dema axa ji Mangurt re dibêje jina biyanî – dayika wî- ji bo êşê bidîyê hatiye, wê demê bi tîrekê ve dibe sedema jiyana dayika xwe. Ewqasî hişê xwe winda kiriye, di vê astê de ji xwebûnê dûr ketiye, wisa bûye çekek bikaranînê, di vê rêjeyê de bûye tetîkkêş. Tenê meqemek heye ku mexdûr guh didiyê: ew jî axa ye. Ji bilî vî ti kesên ku guhdar bike, binase jî nîne.

Em ê vê êşkenceya erjeng, bê di wargehên zanistparêz ên modernîteya kapîtalîst de çawa li ser bingehekî hê sofîstîke û îdeolojîktir tê kirin, di beşên pêş de bibînin. Mîrov wisa dewşîrme dike ku êdî li gor xwe û pêşketina xwe ya xwezayî nema dikare bifikire, tenê ji bo perwerdekarên xwe diponijin, dibin objeyên wisa ku tevahî daneheva xwe ji bo wan bi kar tînin. Yenîçerî çawa ku ji malbatên xwe dihatin qutkirin, li Tekkeyên Hacı Bektaşî bi bombardûmanek îdeolojîk ji xwebûnê dûr diketin, yên Mangurt bûne jî bi heman rengî, lê bi şiklekî hê çorstir dibin robot.

Di romana (Terka Rê) ya Antônio Donçev de behsa Fermendarêkî Yenîçerîyan ê bi navê Kara İbrahîm Paşa tê kirin ku bê çawa tehde li gelê Bulgaristan an jî gelên wê kirine. Li gundekî bîryargeh ava kirine. Li mala rûspiyeke gund wê keçek gelekî bedew desteser bikirana. Piştî wê dest biavêtanê. Piştî rûspiye gund ji

bo karibe Kara Îbrahîm Paşa bibîne, wê were û jê re bêje, “*ya te dest avêtê, xwişka te bû.*” Kara Îbrahîm Paşa, beriya salan, piştî ku malbata wî li vî gundî tê qetilkirin, ji gund dibin, wek dewşîrme-yekî tê mezinkirin û herî dawî jî berê wî didin gelê wî. Xwişka wî ya mayî jî wê li mala rûspiyê gund bihata tecawizkirin. Her çendî Kara Îbrahîm Paşa nizanibe bê ew kî ye jî, rûspiyê gund baş dizane bê ew kî ye û kurê kê ye jî. Kara Îbrahîm piştî fêrî vê rastiye bû, wê guleyekê li serê xwe bixe.

Erê, Mangurtkirinek. Dewşîrmeyek. Gihandiyek. Cihekî Tovan. Spartinek. Pêkhatina îxanetekê...

Li qesrên Osmaniyan wê Mangurtên siberojê li ser vî hîmî bi-hatana amadekirin. Li Babialiyê hedef afirandina van tîpan bû ku dikarîbûn bi dehan salên xwe garantî bikin. Tê wisa biafirîne ku sedsal jî derbas bibe, van tovên îxanetê bibin şitil, zîl bidin! Mîna Bekoyê gijik ê ketiye navbera Mem û Zîn, mîna firêz şîn dibe...

Di van salan de tevî vê rewşa neyênî jî wê gelek rewşenbîrên Kurd jî bigihiyana. Eger em navê çendekan bijmêrin: Hacı Qadir Koyî, Seyid Abdulqadir, Seîd Nûrsî, Emîn Elî Bedirxan, Xelîl Xeyalî, Hamzayê Mîksî, Ehmed Ramîzê Licê, Memdûh Selîm, Abdullah Cevdet, Mehmet Şukru Sekban, Tewfîq (Pîremerd) ê Silêmaniyeyî, Mevlana Zade Rifat û gelekên ku me navên wan li vir nenivîst ne...

Piştî yê ku Cemiyeta Kurd a Teavûn û Teraqî (1908), Cemi-yeta Kurd Tealî (1914) û hwd. damezrandine û rêbertiya wê kirine, ew zarok bûn ku her li Babialî nan xwarine, li dibistanên eşîran hatine perwerdekirin û malbatên wan di berxwedanan de teslîm bûne. Ne ji bo neyînîkirina giştî, lê şert e ku di wateya rastiya objektîf de em karibin tabloya derketî û diyardeyên sosyolojîk di nav girêdanên wê de bi xurtî binirxînin. Jixwe; ew kes in ku di derxistina gelek kovarên Kurdî de jî rolên wan hene. Pîrsgirêk ji derveyî niyetên wan ên baş an jî xerab e, dema dîrok tê nirxandin divê bi encamên wê yê objektîf bêne nirxandin. Ne ku ji ber yek dixwaze îxanet tê kirin. Eger pêvajoya dîrokî neyê nirxandin û ji bo pêvajoya dîrokî bersiv neyê dayîn, diyardeya derdikeve holê yan xeflete-ke kûr e yan jî ji xafletê hinekî wirdetir rastiya îxanetê ye. Nirxandinên me, ne neyînîkîrin û bi temamî pêşkêşkirina negatîv e, bere-vajî vê, wek psîko-sosya, kulturî nirxandina Kurd e, hewldana

kûrkirina lêgerîna vehûna diyardeya hevkarîyê ye ku di dîrokê de bûye girêka kor.

Beriya ku em derbasî sedsalek nû bibin, em careke din ji bo sedsala 19'emîn helbestvanên mezin ên Kurd û jinên Kurd ên ku navên xwe bi tîpên zêrîn li dîrokê nivîsî ne, bi bîr binin.

Em dixwazin navên hin helbestvanên Kurd ên mezin ku di vê sedsalê de jiyane, parve bikin: Ji Hewremanê Mihemed Welî Kirmanşahî, Ji Hewremanê Mihemed Emîn Say'ol, Ji Siwêregê Osman Efendî, Mele Mahmûdê Beyazîdî, Ji Hewremanê M. Nûr Elî Kondolayî, Abdulrehîm Wefayî (1844-1914) ku bi Soranî dinivîsand, Abdulla Edeb (1859-1912), Mele Marîfî Kokeyî, Hecî Qadirê Koyî (1817-1897), Şêx Rîza Talabanî, Abdulrahîm Mewlewî (Mewlewî Kurd), Wasman H. Îsmail, Melay Cebârî, Mistefa Kurdî (1809-1866), Nalî (1800-1856), Qadirî Zend (1805-1851), Mele Xalîdê Sêrtî (1835) û gelek helbestvan, nivîskar, rewşenbîrên mîna van bi qîmet dikarin bêne jimartin.

Eger em navê hin jinên Kurd ên ku navê xwe bi tîpên zêrîn li dîrokê nivîsî ne jî rêz bikin:

Mensûre Erdelan a bi Goranî dinivîse (1805-1848), ji Nahçivanê Xayran Xanim, ji Amedê Sirriye Xanim, Ayşe Îsmet Teymûre (1840-1902), ji Efrînê Pessa Xatûn, Ji Bazarcixê Fatma Reş, Ji Rewanduzê Fatma Xan, ji eşîra Millî Mama, Halîme Xanim a ku sala 1845'an li eniya Elbakê tevî berxwedana Bedirxan bû, Mama Pûravan Xatûn a Fîzhdarî ku li Loristanê lîdertiya eşîrê kiriye, Mama Pêşeng Xanim a ku serokeşîrtiya Millî kiriye û serokeşîr Mama Kara Nêrgîz Şîwa Xanim.

Li ser Sabetayîti, Cihûtî û Tirkîtiyê Çend Gotinên Balkêş



Modernîte, weke gelekî tê îdîakirin ti carî nebûye demeke ku mirov azad difikire û bi îradeya xwe ya azad xwe diafirîne. Ev tenê propagandayek e. Jixwe, ji bo li beramberî pêkanînen hegemonyaya kapîtalîst a navendî ku dike robot û ji taybetmendiyên herî bingeîn ên mi-

rov razber dike, pêdivî bi retorîkên jênegar ê ji bo xwesteka civakî û rewabûnê hene. Lê berevajî, modernîte çaxa herî manipulatîf a dîrokê ye ku herî zêde dogmayên wê hene, bi rêbazên propagandîst ên zextker û teşhîrê ve herî zêde fikr û nîqaşa azad asteng û qedexe dike. Taliya beşên ku em ê li vir nîqaş bikin û di demek zû de Anatolya û Kurdistan bi rûyên neteweperest û hovane yên modernîteyê ve dane nasandin, dema di seranserî cihanê de rolên wan ên dişibin hev tîr nîrxandin, wek antî-semîtîzm tîr deximandin û mîna gunehê dogehê tîr pêşkêşkirin. Li vir wek çawa ti armancên me yên wisa tinene, yên ku em dinîrxînin jî bijartiyên Siyonîst ên gelê Cihû ne û di wateyek rast de ev di dîsîplînên sosyolojî, siyasî û dîrokê de cih negirin, nabe.

Wek tîr zanîn; Cihûyên ku ji zilma Engîzîsyona li Spanyayê re-vîyan, salên 1391, 1492 û 1550'yan pêl bi pêl xwe diavêjin bextên Osmanî û Îngilîzan. Bi taybet jî sala 1492'yan ji aliyê Osmaniyan bi awayekî fermî tîr qebûlkin. Di serî de Selanîk û Îzmîr li bajarên cur bi cur tîr bicîhkin. Cihûtî her ku diçe bi bandorî li Împaratoriya Osmaniyan bi cih dibin. Tenê bi cih nabin, bi saya daneheva çandî ya ku di encama avabûn û ezmûnên wan ên dîrokî bi dest anîne, di qesrên Osmaniyan de dibin xwedî gotin. Beriya vê, ev hêza xwe bi rêka keçan ku didan qesrê, zewicandina padîşahan ve dikirin. Di demên pêş de bi îdeolojiya Sebetayîtiyê ve hê bi bandortîr dibin. Bi taybet jî dema Îttîhad û Teraqî li ser desthilatdariyê rûnişt, wê demê bûn ew ên ku herî zêde mohra xwe li sed-salê dane. Di ser damezrandina Komara Tirkîyeyê re zêde nabihure, wê gotinên *yek dewlet, yek ziman, yek millet, yek al* wek geran (balyoz) li serê gelan û çandan biketa. Ev jî wek marîfeta Tirkên Cihû derbasî dîrokê dibe. Dikare ecêb were, lê di salên pêş de yên ku herî zêde li dijî tevgera azadiyê derdikevin û êrîş dikin jî dişa Tirkên bi koka xwe Siyonîst an jî Sabetayî ne, ango Tirkên Spî ne. Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bi komploya herî korsanî ya sed-salê dîl tîr girtin, radestî Tirkan tîr kirin. Di vir de jî dişa rola herî mezin a van “Cihûyên” çerxbûyî ye.

Dikare bê gotin ku li Kurdistanê çî eleqeya îxanetê û Cihûtî yan jî Sabetayîtiyê heye? Lê çî heye ku rewşên di dîroka nêz û rojane de ne qasî tîr hesibandin, bê guneh e. Yên ku herî zêde li Kurdistanê li dijî tevgera azadiyê radibin û pîlangeriyan dikin Siyonîst in.

Her wiha di nav Tirkiyeyê de Sabetayîst in ku Cihûyên Tirkbûyî ne. Yên yekîtiya Kurdan asteng dikin, pêşî digirin û li Rojhilata Navîn Kurdan ber bi siyaseta tenêtiyê dajon, hem Sabetayîstên li Tirkiyeyê ne, hem jî di nav Kurdan de, ew Kurdên ku derbasî Sabetayîtiyê bûne û li ser vî esasî jî di her şertî de yekîtiya qederê li gel Îsrailê saz kirine. Wê gelekî ne şaş be ku eger em vê îdiayê bikin; ev giştî gotinên li jor, toreke îxanetê ya berfireh ava kirine.

Ha, ji ber vê ye ku em dibêjin wê sûdmend be eger em ji Osmaniyan dest pê bikin û heta Komara Tirkiye û piştî wê pêşketina Cihûyan, Sîyonîstan û Sabetayîyan binirxînin.

Lê beriya nîrxandina Sabetayîtiyê, em behsa hin jinên bi koka xwe Cihû ne û bi şiklekî ketine nav qesra Osmaniyan bikin, wê li cih be:

Hurrem Sultan, (1506-1558) hevjinê Kanûnî Sultan Silêman e û sultanek wisa ye ku di dîroka Osmaniyan de rolên girîng listine. Wek tekane jina biyanî ya ku bi padîşahên Osmaniyan re mehrkirî ye, tê zanîn. Hurrem Sultan a ku li malbetek Cihû ya bi eslê xwe Leh hatiye dinê, di temenekî biçûk de sala 1520'an ji Ûkraynayê tê revandin. Dûvre bi şiklekî pêşkêşî qesra Osmaniyan tê kirin. Hurrem Sultan, li qesrê perwerdeyek taybet dibîne. Bi jinokî, jîr û hunera xwe ve bala padîşah dikşîne ser xwe. Di nav jinên haremê û giregirên qesrê de jî cihê xwe çêdike.

Dema ku Hurrem Sultan tê qesrê, ji cariyeyên Kanûnî Mahîdevran, xwedî kurekî bi navê Mûstafa ye. Bi demê re Mûstafa dibe şehzadeyekî berbiçav. Êdî teqez tê dîtin ku piştî Kanûnî wê padîşah Mûstafa be. Ev jî tê wê wateyê ku Mahîdevran Sultan wê bibe Walîde Sultan. Lê, Hurrem Sultan wê di her warî de Mahîdevran Sultan derbas bike, bawerî û hezkirina Kanûnî bi dest bîne, bibe hevjinê wî ya mehrkirî. Wê hevrikê xwe wezîrê ezem Îbrahîm Paşa tasfiye bike, li şûna wî Rustem Paşa bike wezîr û bi keça xwe Mîhrîmah Sultan re bizewicîne. Wisa jî dibin tifaqên hev. Kanûnî, bi fikra ku çav berdaye texta wî, kurê xwe Mûstafa yê ji aliyê Yenîçerîyan gelekî tê hezkirin dide kuştin. Gelekî tê gotin ku yê ev kiriye Hurrem Sultan e. Em ji bîr nekin ku tekane jina nikahkirî a biyanî ye. Gelekî eşkere ye ku li pey vê bûyerê tiştên cuda hene. Di nav Cihûyan de nijad, ji dê derbasî kur dibe. Lewma jî dayik, ango jin zehf girîng e.

Nûrbanû Sultan (1525-1587), Dayika padîşahê Osmaniyan Mûradê Sêyemîn e, Walîde Sultan û hevîna Selîmê Duyemîn e. Di 1520'an de hê nebûye deh salî jî, ji aliyê korsanên Osmaniyan tê revandin û li bazarên Stenbolê hatiye firotin. Di çavkaniyên Osmaniyan de wek zaroka malbatek Cihû derbas dibe. Ev keça biçûk a di destpêka 10 saliyên xwe de ye, ji aliyê wezîfedarekî qesrê bi armanca xizmetguzariyê tê kirîn. Keça ku hê di temenekî biçûk de derbasî qesrê dibe, mîna xizmetkarên din ên qesrê tê perwerdekirin. Û her çi hîkmet e ku Hurrem Sultan lê rast tê û jê hez dike. Hurrem Sultan, dûvre vê keçê bi kurê xwe Şehzade Selîm re dizewicîne. Tabî, êdî navê vê keçê bûye Nûrbanû sultan. Ango, “Keybanûya ku ronahiya Xwedê jê diçe”! Em bêjin tesaduf e gelo, bi mirina tevahî birayên Selîm, destpêkê Selîm dibe cîgirê Kanûnî, piştî Împaratorê Osmaniyan, Nûrbanû jî dibe keybanû. Kurê Selîm û Nûrbanûyê Mûrad, dema Selîm dimire dibe Padîşahê Osmaniyan û Nûrbanû jî wek Walîde Sultan jiyana xwe didomîne. Piştî Hurremê, bi salan li pişt deriyan rêveberiya împaratoriya Osmaniyan dike. Balkêş e ne wisa?

Beriya em dewam bikin, ji ber me got birayên bi tesadufî mirine, em bi kevanekê behsa bira, xwarzê û kurên ku li Osmaniyan bi “tesadufî” dimirin, bikin.

Mehmet Bayrak, di pirtûka **Dêrsim Koçgirî** de wek çavkanî pirtûka “Dr. Mehmet Akman: **Di Dewleta Osmanî de Qetla Bira**” nîşan dide û dibêje; “Li ba Osmaniyan meseleya qetilkirina birayan wiha ye. Osman Gazî birayê xwe Dundar Beg qetil kir, Mûradê Yekemîn birayê xwe Ahmet û kurê wî Orhan qetil kir, Beyazîdê Duyemîn Oguzê kurê birayê xwe Cem Sultan qetil kir, Yavûz Sultan Selîm bavê xwe Beyazîdê Duyemîn jehrî kir û birayên xwe Korkût û Ahmet li gel 8 birazêyên xwe qetil kir, Kanûnî Sultan Suleyman kurê Cem Sultan Mûrad û kurê wî daliqandin, kurê xwe Mûstafa û kurê xwe Mehmet qetil kir û her wiha dîsa kurê xwe Beyazîd û 5 kurên wî qetil kirin, Mûradê Sêyemîn 5 birayên xwe qetil kirin, Mehmedê Sêyemîn 19 birayên xwe û kurê xwe Mahmûd qetil kirin, Osmanê Duyemîn birayê xwe Mehmet qetil kir, Mûradê Çaremîn birayên xwe Beyazîd, Suleyman û Qasim qetil kirin, herî dawî Osmanê Sêyemîn kurapê xwe şahzade Mehmet qetil kir... Ev, birakujên ku yekem tîna bira mirov in.”

(Her wiha mîna nivîskarek tîne ziman: “Fatîh Sultan Mehmet, yekemîn sultanê Osmanî ye yê ji bo desthilatdariyê qetilkirina ewladan kiriye qanûn û qaîde. Qanûn wek, “Qanûnnameya Fatîh” tê zanîn. “Bûyera qetlê ya siyasî ya bi armanca berdewamiya Dewleta Osmanî xwe dispêre vê fermanê: Ji kîjan ewladê min re seltenet muyeser bibe, ji bo nîzam-i alem dikare hembîzeyê xwe bikuje. Ekser-î ulema jî tecvîz kiriye. Dema hevce bike tavilê amîl dibe.” Di vir de bi hêsanî mirov dikare bibîne ku qetla bira meşrû û hiqûqî kirine.

Vê rastiyê; John Keegan, di pirtûka xwe ya The Iraq War de dema di civakên misilman de pîrsgirêka desthilatdariyê digire dest wiha dibêje: “Di dema Osmanî de desthilatdariya dunyewî û olî bi rêya mîrasê dihat dewrîkirin. Kuran bi mîrasê pergala rêveberiyê ji bavên xwe digirtin. Lê belê bi piranî xanima berçav a haremê, dikaribû desthilatdariya (padîşahî, sultantî) diviyabû bidin kurê mezin (prîmogenîture) asteng bike, bi xapandinan ev qaîde xera kiriba. Bi vî awayî padîşahê nû yê li ser text rûdinişt, hemû birayên xwe qetil dikir. Dema padîşah dîmir zarokên wî yên nifşa nû diketin nav şerekî navxweyî yê bêeman. Zor û şîdeta dihat bîkaranîn hebûna împaratoriye jî tehdîd dikir. Çareserî çi ye? Çareserî zîwakirina koka malbatê ye; ji bo selameta welêt qetilkirina bira ye. Padîşah dema li ber mirinê ye bi awayekî muntezem zarokên xwe dide kuştin û li şûna wan kurekî xwe dihêle ku li dû mirina wî li ser text rûne. Ev jî têr nake; padîşahê nû yê diçe ser text vê carê birayên xwe dîkuje. Di împaratoriya Osmanî de qetla bira bibû rêûresm û rêzika saziya dewletê. Ulema û şeyhulîslamê demê jî ev pejirandibû û fetwaya pêwîst dabû.” John Keegan bi vî awayî radixe ber çavan bê Osmanî û desthilatdariya wê avabûneke çawa ya çavsor e.

Safiye Sultan (1550-1618), dayika Padîşahê Osmanî Mehmedê Sêyemîn e, Walîde Sultan û hevjinê Mûradê Sêyemîn e. Hê di 14 saliya xwe de, dema ku li Derya Spî rêwî ye, ji aliyê korsanên Osmanî tê revandin û dikeve qesra Osmaniyan. Safiye jî Cihû ye. Vê carê Nûrbânû ji bo kurê xwe Selîmê Zerik daxwaza Safiye Sultan dike. Tê kirin. Navê wê yê Sofia wek Safiye tê guhertin û di 17 saliya xwe de pêşkêşî Mûradê Sêyemîn tê kirin. Dûvre

Mehmedê Sêyemîn ê ku wê bibe împaratorê Osmaniyan, tîne dinyayê, li qesrê cihê xwe qayim dike.

Pêvajoya bi Hurrem Sultan dest pê kir, bi Safiye Sultan û hinên din re dewam kiriye. Di esas de êdî li texta Osmaniyan hem bi hêza aborî hem jî bi hevjiñtiya padîşahan li Qesrê, Cihû dibin xwedî bandorên girîng. Tê îdfakirin ku di wan salan de ew bêtehamuliya di nav sînorên Osmaniyan de li dijî hin komên Xirîstîyan pêş dikevin, wek bersivdayina pogromên li Spanyayê ne. Her wiha gelekî manîdar e ku paşê wê di qirkirina mezin a li dijî Ermenîyan de gelek Jon Tirkên Sabetayîst cih bigirin.

Lê beriya ku em bidomînin, em mijareke ku A. Ocalan behsê kiriye, ronî bikin. Safiye, sultaneke wisa ye ku dikare li qesra Osmaniyan sadrazaman jî bikuje. Yek ji van sadrazaman jî Sokullû Mehmet Paşa (1505-1579) ye.

Wek destpêka Sabetayîtiyê, yên li jor hatin gotin girîng bûn. Niha em behsa Sabetay Sevî bikin ku navê xwe daye Sabetayîtiyê. Pirtûkên dîrokê ji bo Sabetay Sevî îfadeya, *'Mesihe Sexte ye di sedsala 17'emîn derketiye'* bi kar tîne. Lê, di dema derketinê de li seranserê cihanê Cihûtiyê dike du parçe, tenê li nav Osmaniyan milyonek kesî li dor xwe kom dike, ji Ewropa, Asya, Afrîka û heta Amerîkayê berbelav dibe, mîna Cihûtiyê, bandora xwe li Îslamê û Xirîstîyanîyê jî dike. Cihûyên ji Spanya, Portekîz, Provence, Îtalya, Sicîlya, Elmanya û Avûstûryayê dihatin wek 'Sefarad'; di he-man pêvajoyê de yên ji Ewropaya Navîn û Rojhilat dihatin jî wek 'Aşkenaz' dihatin binavkirin. Ji yên çerxkirî jî bi giştî 'Avdetî' dihat gotin.

Sabetay Sevî, 1'ê Tebaxa 1626'an tê dinê. Tê destnîşankirin ku li gor kevneşopiyên Cihûtiyê eger mimkun be navê 'Sabatai' li zarokên ku roja Şemiyê hatine dinê tê kirin. Ev nav jî wisa hatiye dayîn. Di vê dîrokê de her wiha Cihû hilweşîna Perestgehên xwe yên Yekemîn û Duyemîn bi bîr tînin. Sabetay Sevî yê Îzmîrî, di 1648'an de dema 22 salî ye, Mesîhiya xwe radigihîne û tevgera herî nepenî ya dîrokê ava dike.

Sabetay Sevî, pêşî berê xwe dide Îsraîlê û ji wir jî ber bi Misrê ve dikeve ser rêyek dirêj. Di vê rêwîtiyê de Mesîhiya wî tê pejirandin. Dûvre, Sabetay Sevî dîsa vedigere Îzmîrê. Sabetay di

rojên destpêka sala 1666'an de ji Îzmîrê vediqete, ber bi Stenbolê ve dikeve rê. Murîdên wî bawer dikin ku ji bo desthilatdariyê ji Padişah Mehmedê Çaremîn bistîne diçe Stenbolê. Li ser giliyê Xaxamên Îzmîrî, qesir jî ji vê rewşê agahdar dibe. Bi fermana Sadrazam Fazil Ahmet Paşa, keştiya ku Sabetay jî tê de ye, li Derbenda Çanakkaleyê tê sekinandin. Dest û lingên Sabetay tê zincîrkirin û tê Stenbolê. Piştî li Girtîgeha Bagno ya li Halîçê ku girtiyên bêrkîşandinê (cezayê giran ê hepsê) lê ne, tê ragirtin. Sevî, piştî 3 rojan ji bo darizandinê tê pêşberî Dîwana di serokatiya Sadrazam de. Rêveberiya Osmanî ya ku naxwaze beriya Sefera Gîrîtê tevlihevî hebin, biryar dide ku Sabetay li kelheyek Gelîbolûyê ya Çanakkaleyê heps bikin. Lê her çi hîkmet be, Sabetay Sevî li vir hê bi bandortir dibe. Bi hezaran murîdên wî dê serdanê bikin û derdora wî berfirehtir bibe. Li ser giliyan, Mehmedê Çaremîn fermanê dide ku Sabetay were Edîrneyê. Li Edîrneyê, Sabetay ji pirsiyariyekê tê derbaskirin ku Padişah jî li pişt perdeyê dişopîne. Li vir du vebijêrkan didin ber Sabetay. Li beramberî Sabetay tîravêjekî datînin û dibêjin, *“Eger tu di pêxembertiyê de bi israr bî, em ê tîrekê biavêjin te. Mucîzeyî xwe nîşan bidî û rizgar bibî. Na, eger tu ne bi israr bî, wê demê wek ceza tu yê bibî Misilman.”* Dema ku Sabetay Misilmantiyê hildibijêre, nayê kuştin. Dikin serdergevanê Qesra Edîrneyê û mûçe didinê. Ji ber hîlbijartina Misilmantiyê, di nav murîdên Sabetay de çûyin û hatinek çêdibe. Hin dest ji şopanî dinê berdidin, hin jî vê wek tevgereke ‘Mesîh’ a ku bi xwe hê wateya wê nizanin bi nav dikin û girêdayî wî dimînin. Jixwe piştî demekê Sabetay jî ji derdora xwe re dibêje ev lîstokek e. Li ser vê Murîdên wî jî mîna wî ji Cihûtiyê dûr dikevin, dest bi qebûlkirina Misilmantiyê dikin. Ji vê dîrokê û şûn de wek ‘Avdetî’ yan jî ‘Çerxkirî’ tên binavkirin.

Sabetayê ku li Qesra Edîrneyê 7 salan dimîne, piştî demekê ji aliyê Padişah Mehmedê Çaremîn tê teqdirkirin. Dem bi dem diçe Stenbol û Edîrneyê. Di van serdanan de diçe sînagogan û li wir li cem murîdên xwe tevli ayînên Cihûyan dibin. Piştî demekê giliyê vê tê kirin. Dema tê fêmkirin ku xebatên xwe didomîne, vê carê bi aliyê Arnavûtlûkê tê sirgûnkirin û li wir dimire. Lê, 200 malbatên ku wî dişopîne, li Selanîkê bi cih dibin, bi rengê Misilmantiyê, lê di rastiye de wek Sabetayî-Cihû jiyan xwe didomînin.

Wek tê zanîn, Selanîk wê di Tirkîtiyê de ku piştî pêş dikeve, bibe navendek girîng. Tevahî siyasîmedarên ku wê demek dirêj mohra xwe li siyaseta Tirkîyan bidin an jî vir in an jî ji vir gihayî ne.

Tevî ku Sabetay dimire jî, murîdên wî girêdayî dimînin. Ji ber vê jî li gor şîretên wî di nav civakê de bi nasnameya Misilman dijîn, bi awayekî dizî jî baweriyên xwe yê Cihûtiyê didomînin. Ji ber ku Cihûtiyên din wan mîna Misilmanan qebûl dikin, ji cemaata xwe cuda digirin. Ev koma ku wek Sabetayî angî çerxkirî tê binavkirin, ji ber Selanîk di Yewnanîstanê de dimîne, di encama mubadeleya nifûsê ya sala 1924'an de koçî Tirkiyeyê dikin û di serî de semtên Şîşî û Nîşantaşî yê Stenbolê, li herêmên cur bi cur bi cih dibin.

Fikra Îslama Radîkal, mîna dûvikê Siyonîzmê li Sabetayîtiyê mêze dike. Di roja me de li Tirkiyeyê eleqeyek mezin ji Sabetayîtiyê re heye. Balkêş e ku ev eleqe li cihên mîna Polonya, Rûsya, Hollanda, Amerîka (Frankîstên li Polonyayê, Cihû ne ku sala 1759'an bi komî Xirîstîyanî qebûl kirine) û welatên Deryasî jî heye.

Sabetayiyên ku bi damezrandina Îttîhad-Teraqî bûn xwedî rolek berbiçav a siyasî, li beramberî Masontî û Melamîtiyê jî (terîqeta ku Niyazî Misrî ava kiriye) bûne xwedî eleqeyek taybet. Ser meselê, di heyeta Îttîhad û Teraqî de ku biryara daxistina Abdulhemîd a jî textê teblîx dike, endamê cemaata Cihûyên Selanîkê Emanuel Karasû jî heye. Têkildarî vê bûyerê, dîroknas di vê nuqteyê de dibin yek:

Tê zanîn ku Abdulhemîd û Siyonîst zehf daxwaza hevdiîtinê dikin. Heta tê zanîn ku di destpêka salên 1900'î de yek ji navên herî bi bandor ê tevgera Siyonîst Herzl, carekê Abdulhemîd dibîne. Di vê hevdiîtinê de ku bi awayekî hevrû pêk hatiye û di hevdiîtinên din de hatiye gotin ku beriya Abdulhemîd jî biryarek Siyonîstan heye ku li Filistinê dewletek Cihûyan ava bibe, ji bo vê jî wê Cihû pereyên mezin bidin, heta dikarin deynên Osmanîyan jî bidin. Li gor belgeyan, çî heye ku Abdulhemîd bi neyînî nêzî van pêşniyaran dibe, heta bersivên hişk dide.

Wisa dixuye ku gotinên Abdulhemîd ên mîna, *“Ez bihostek vê xakê jî nafirosim, ji ber ev xak ne ya min e, ya gelê min e. Gelê min*

ji bo her bihostek vê xakê canê xwe feda kiriye... Împaratoriya Tirk ne aîdî mîn, lê aîdî gelê Tirk e. Ji ber vê jî ez ti parçeyên wê nika-rim bidim. Bihêlin bila Cihû pereyên xwe ji xwe re veşêrin” ji aliyê Siyonîstan ve nehatine jibîrkirin. Vê jibîrnekirinê em ji bûyerên ku bi serê Abdulhemîd de hatine fêhmî dikin.

Her wiha piraniya rewşenbîrên bi nasnameyên Tirk û Misilman ên ku di wê demê de li Selanîkê di komikên masonan û terîqetan de bi bandor in jî Sabetayî ne. Mînak, di destpêka 1908'an de Dumont Veritas wek endamên Misilman ên girêdayî locayê navên Osman Adil, Faîk Nuzhet (paşê wê bibe wezîr), Talat Îsmâîl, Fazlî Necîp û Mehmet Servet Beg pêşkêş dike. Dûvre tê fêmkirin ku ev bi koka xwe Sebatayî ne. Sebatayî di encama şîroveyan cuda yên olî de wek Yakûbî, Kapanî û Karkaşî dibin 3 baskan.

Êdî ne sir e ku ji damezrandina Masontiyê ve di bin bandora Cihûyan de bû û Masonî ji aliyê Cihûyan dihat birêvebirin. Baweriya Cihûyan a ku nîjada ji aliyê Xwedê hatiye hîlbijartin û wezîfeya wan birêvebirina tevahî mirovên din e, divê baş bê zanîn. Masonî rêxistinek veşartî ye ku xizmetê ji fikrên birêvebirina cihanê ya Cihûyan re dike û di kontrola Cihûtiyê de ye.

Dema hêza aborî ya Sabetayîyan, asta bilind a çandî û hêza masoniyê li ber çav bê girtin, wê demê jixweber derdikeve holê ku bê ev kom bûye hêzek çiqasî girîng. Wê ne şaş be ku eger em bêjin Sebatayî bi Îttîhad Teraqî re di nav siyaseta de bi bandor bûne. Jixwe, di kabîneya yekem a Îttîhad Teraqî de Wezîrê Darayî Cavîd Beg, siyaseta medarekî Sebatayî ye. Cavîd Begê ku di dema Komarê de jî di kabîneya yekem de wek Wekîlê Darayî cih girtiye, bi hinceta ku tevî sûfîqesta Îzmîrê ya li dijî Atatürk bûye, tê îdamkirin.

Yên îro xwe di vê mijarê de pîspûr dibînin, dibêjin ku Îsmâîl Cem, Rahşan Ecevît, Tansû û Ozer Çiller, Coşkûn Kirca, Yılmaz Erdogan, Gulben Ergen, Suleyman Demirel û gelekên mîna van Sabetayîst in.

Tê fêmkirin ku, di dîroka Osmanî û Tirkiyeyê de Sabetayîyan mohrek erênî-neyênî ya berbiçav li pêşketinên siyasî, sosyo-ekonomîk û çandî dane. Divê bê diyarkirin ku Sabetayî, li dijî pêvajoya hewldana demokratîkkirin û sazkirina aştiya navxweyî ya Tirkiyeyê bûne xwedî helwest û xebatên gelekî neyînî.

Weke ku me di destpêka mijarê de jî got, pêşxistina Tirkîtiyê jî marîfeta Cihûyan e. Cihûtî bi rengê “*Tirk*”, Tirkîtiyê bi pêş dixê. Nîjadperestiya Tirk, beriya Tirkan ji aliyê Cihûyan tê pêşxistin û vê jî mîna parçeyekî armancên xwe yê dîrokî yê li Rojhilata Navîn nîrxandine. Tirkîtiya ku di rêveberiya Osmaniyan de bêqîmet û sedema biçûkketîna bû, di dema dawî ya vê dewletê de ji hêla Cihûyan derketiye pêş, kirine wek hevbierekî stratejiya xwe. Bi vî milî ve Tirkîtiya fermî yan jî dewletbûyî di esase xwe de îcadek Cihû-Siyonîst e.

Tevgerên “*Rojavayîbûnê*” yê di nav Osmaniyan de ji destpêka sedsala 19’emîn ve di serî de Îngilîz, bi ferzkirina ji aliyê hêzên derve dest pê kir, dema sal dibe 1865, bi Cemiyeta Osmaniyan Nû (Osmaniyan Ciwan) rêxistinbûyîna xwe ya yekem saz dikin. Yek ji endamên herî çalak ê van rêxistinbûyînan jî hemwelatiyê Fransî Leon Kahûn ê Cihû ye. Ji sala 1867’an ve êdî ev tevger wek Jon Tirk (Tirkên Ciwan) hatiye binavkirin. Dûvre, Leon Kahûn xwe li teorîsyenbûna Tirkîtiyê radikişîne. Destpêkê sala 1869’an pirtûka “*Asya Tarihine Giriş; Türkler ve Moğollar*” (*Destpêka Dîroka Asyayê: Tirk û Moxol*)” nivîsandîye. Ev pirtûka ku têkildarî Tirkan agahiyên fişalkirî dide, dûvre dibe yek ji çavkaniyan esase yê nîjadperestiya Tirk. Ev xebata ku yek ji çavkaniya esase ya Ziya Gokalp e, ku pirtûka “*Türkçülüğün Esasları*” (*Esasên Tirkîtiyê*) nivîsî ye, gelek caran ji bo Mûstafa Kemal jî dibe pirtûka serlêdanê. Nivîskar Cemîl Merîç ji bo pirtûkê dibêje, “*Qurana Kerîm a Nîjadperestiya Tirk e.*” Leon Kahûn, di 1876’an de vê carê bi heman şiklî romana (*Ala Asîman*) dinivîse.

Cihûyekî din ê afirînerê Nîjadperestiya Tirk jî Armîn Herman Vambery ye. Vambery, li Zanîngeha Bûdapeşte ya li paytexta Macarîstanê yekem Kursiya Tirkolojîyê ava kiriye. Her wiha, Vambery, serokê rûmetê yê Komaleya yekem a Tirk e jî ku sala 1908’an li Bûdapeşteyê hatiye vekirin. Li gel vê, ji bo “*Cemiyeta Tûran*” a ku di sala 1910’an de hatiye vekirin, bûye serokê rûmetê.

Di Dewleta Osmaniyan de çi Tevgera Jon Tirk çi jî wek berdewamiya wê Partiya Îttîhad Teraqî, girêdayî rêxistin û locayên Cihû-Masonan e ku li Rojava dixebitîn û ji aliyê wan dihatin finansekirin. Îngilîz jî di pêşketina van tevgeran de bûye xwedî rolek diyarker. Dîroka darbeya yekem a ku Jon Tirkan bi destê

Cihûyan li dijî rêveberiya Osmaniyan kiriye, 1876 e. Partiya Îttîhad Teraqî jî ku di nav damezrînerên wê de Kurdên mîna Abdûllah Cevdet û Îshak Sukûtî jî hene û mîrateya Jon Tirkan dewr digire, piştî ku di 1908'an de desthilatdariyê desteser dike, domahiya 10 salan welêt bi darbe û krîzan ve bi rê ve dibe. Partiya Îttîhad Teraqî, ji xwe re rêxistina Mason Karboranî ya Îtalyan kiriye mînak û li gor esasên nependîtiya vê hatiye vesazkirin.

Wek tê zanîn, dîroka rêxistina Mason Karboranî heta destpêka 1800'î jî diçe. *“Karbonariyan ji tevahî çînên sosyeteyê endamên xwe kom kir û di nav dewletê de bûne dewlet. Fermanên leşkerî didan endamên xwe, daraza sûcên wan jî li dadgehên veşartî dikiirin, bi destûra dadgehên xwe yên veşartî ve dikarîbûn serî li dadgeha gelemperî bidana.”*

Wek li jor jî tê dîtin, rêbaza wan a esasî ew e ku bi veşartî dixebitin û ji hundir fetih dikin. Tê zanîn ku rêbazek hemreng ji aliyê Îttîhadiyên wê rojê hatine bikaranîn û hê jî li Tirkiyeyê Îttîhadî, Ergenekonî, JÎTEM'î, Tîmên Taybet ên îro bi kar tînin.

Piştî Osmaniyan, di dema Komarê de jî destwerdana Cihûyan tê dîtin. Di vê demê de navê derdikeve pêş Avram Galantî ye (paşê li gor Qanûna Paşnavan, paşnavê Bodrûmlû digire). Xebatên Tirkîtiyê yên Galantî li gor ên Kahûn û Vambery hê sistematîk û kûrtir e. Galantî ku li zanîngehan profesortiyê dike, di demên ewil ên Komarê de carekê ji CHP'ê, carekê jî serbixwe, bi giştî 2 caran bûye parlamenter. Galantî yê ku ji nîjadperestên Tirkan hê zêdetir bûye xwedî *“xeteke nîjadperest”*, bişavtina tevahî gelên li Tirkiyeyê parastiyê, bûye teorîsyenê feraseta *“yekperest”* a îro. Ev Cihûyê ku nêrînen xwe di gelek pirtûkan de tîne ziman, derheqê Mûstafa Kemal de nivîsî ye û ew rakiriyê asîmanan. Galantî di nivîseke xwe de nikare xwe bigire, ji Tewratê dikeve rê û diyar dike ku Togarma yê kurê Yasef, Tirk e û wisa jî li gor xwe hewl dide Tirkîtiyê û Cihûtiyê bigihîne hev. Ew şîara; *“Ne mutlu Turkum diyene (Yê Dibêje Ez Tirk im Çi Bextewar e)”* aîdî vî kesî ye. Dikare balkêş were, sonda faşîst a wek Sonda Tirkan tê nasîn ku di 23'yê Nisana 1933'yan de hatiye nivîsandin û ji 6 saliyê ve her roja dibistanê bi zarokan didin xwendin, ji aliyê Sebateyîstekî bi navê Dr. Raşîf Galîp hatiye nivîsandin.

Milekî balkêş ê meseleyê jî, ev karaktera Cihûtî-Siyonîst a Tirkîtiyê domahiya dîroka Komarê hatiye veşartin. Di pirtûkên dîrokê û weşanên din de ku li dibistanan didin xwendin, kok û damezrînerên Nijadperestiya Tirk wek sirekî tê veşartin, mîna ne berhemek bernameya stratejîk a Siyonîstan e, lê bi dînamîkên xwe yên hundirîn derketiye tê nirxandin. Ev nêzikatî bi xwe jî tarzekî Siyonîst e.

Mîna Tirkîtiya ku li navendên wek London, Selanîk, Bûdapeşte, Parîs û Stenbolê bi tarzekî Siyonîst-Mason hatiye amadekirin, Nijadperestiya Kurd û Kurdperestî jî, bi kontrola hin navendên Fîrans Kapîtalê ve li Başûrê Kurdistanê bi destê malbata ku tê zanîn û xwedîkirin hatiye bipêşxistin, tê bipêşxistin. Dîroka vê projeyê heta 150 sal beriya niha jî diçe. Niha navendên wan ên esasî Hewlêr e. Tarz heman e. Reng Kurd e, lê cewher rêxistinbûyîna Siyonîzmê ye.

Li Ser Îttîhad û Teraqiyê Nirxandinek Kurt

Ramangêrê navdar Şerîf Mêrdîn ê ku bi xebatên xwe yên dîrokî, civakî û siyasî yên li ser dîroka Tirkîyeya Modern tê zanîn, ji bo Teverga Îttîhad û Teraqî dibêje; *“Ya em dibêjin Osmaniye Nû Tevergereke Cûnta ye ku ji rêxistin û zîlamên dewletê yên darbe-
kar, burokrat û ûlemaya leşkerî pêk tê.”*

Cemiyeta Îttîhad-î Osmani, di sala 1889'an de li tibbiyeya eskerî tê damezrandin. Piştî, rêxistinên cur bi cur ên bi navên cuda tên ba hev, destpêkê navê Teraqî û Îttîhad, paşê jî Îttîhad û Teraqî li xwe dikin. Her çiqasî bi pêşengiya navên mîna Ahmet Riza, Prens Sabahattîn, Bahaddîn Şakîr, İbrahim Temo (Arnavût), İshak Sûkûfî (Amedî, ji Sukutzadeyan, Kurd), Mehmet Reşid Beg (Çerkez), Huseyinzade Elî (Azerî) û Abdûllah Cevdet (Meletî-Erebîgir), Mahîr Seîd hatibe damezrandin jî, yên wê piştî derkevin pêş û mohra xwe li tevgerê bidin Talat Paşa, Enver Paşa, Cemal Paşa, Dr. Nazim, Cavîr Beg û Abdûllah Cevdet in. Ziya Gokalp ê ku tevî Kurd jî dibe yek ji bavên ewil ên Tirkîtiyê ye, dûvre wê di nav kadroyên lîder ên vê tevgerê de cihê xwe bigire. Ev kes wisa Tirk-parêz û dijminê gelê xwe ye ku dibêje *“Welat ne Tirkîye ye ji bo*

Tirkan, ne Tirkistan! Welat, welatekî mezin ê hetahetayê ye, Tûran.” Di Kongreya Îttîhad Teraqî de ku sala 1902’yan li Parîsê tê lidarxistin, Abdurrahman Bedirxan û Hikmet Baban jî amade ne. Ev jî ji bo eleqeya vê avahiyê balkêş e. Mirovên ji gelên cuda yên mîna Ermenî, Arnavût û Yewnanî di demekê de bi awayekî herî çalak di vê avahiyê de cihê xwe girtine.

Wek Şerîf Mêrdîn jî îfade dike, bi giranî ji yên ku bi eslê xwe leşker in pêk tê. Navenda wan a rêxistinbûyîne Selanîk e. Di heman demê de Selanîk di nav Osmaniyan de navenda herî xurt a Sebatayîti û Masonî ye jî. Gelek Îttîhadî, di heman wextê de wek endamê Locayên Masonan cih digirin. Taybetmendiya wan a hevpar ew e ku ji rêveçûna Osmaniyan ne rehet in. Her çiqaşî cih bi cih rengên wan cuda bibin jî, di esas de împaratorparêz in. Taybetmendiyeke wan a din jî, di şerê çeteyan de ku wek komîtayî tê zanîn, pîspor in. Tiştên ku dewletê nikarîbû li Balkanan bikirana, ev komîtayî bi serê xwe xwîn bi gelan dane verişandin. Ya balkêş jî ew e ku di nav vê hereketê de Ermenî û Kurd jî zêde ne. Heta, Abdûllah Cevdetê ku yek ji mejiyên rêxistinê ye, Ramangêrekî navdar ê Kurd e.

Abdullah Ocalan, di pirtûka xwe ya **Rastiya Komara Oligarşik** de wiha pênaseya vê rêxistinê dike: **“Di nav Îttîhad û Teraqiyê de şexsiyetên ji neteweyên cuda hebûn. Pir êşkere ye ku wê berjewendiyên van li hev neyên! Dibe sedemek hebe ku yên xwedî berjewendiyên cuda karibin di nav komîteyekê de bibin yek. Tevî hemû cêwaziyên wan jî, giştî li dijî rejîma zextker a Ebdulhemîd bûn, her wiha heyranên mezin ên rojava bûn. Pan-Îslamiya Ebdulhemîd, ji bo rewşenbîrên heyranê rojava, dibû pîrsgirêk. Guhertina vê rejîmê wê xizmeta armancên wan ên Hevpar bikira. Di serî de îdealek Miletperaziya Tirk tineye. Bi qasî parastina berjewendiyên Milliyetgiriya Tirk, ewqasî berjewendiyên Milliyetgiriya Kurd jî tîna parastin. Di encama vê de divê hinekî bibin Îttîhatparêz. Ha hinekî ji ber vê ye ku Abdûllah Cevdet, Îshak Sukûtî li ba Îttîhadiyan tevdigerin... Ev dihesibînin ku bi beşdariya Îttîhad û Teraqiyê wê herhalde karibin Kurdîniyên xwe bi zindî bimeşînin. Îttîhad Teraqî esas Milliyetgirîyek Kurd a neyekser jî temsîl dike. Ewîl ne tenê rêxistineke Milliyetgiriya Tirk e. Bi qasî Milliyetgiriya Tirk,**

hinekî jî rêxistinek Milliyetgiriya Kurd e jî. Hin tiştên din jî hene; Erebi jî esas kulubên xwe yên yekem ên milliyetgiriye di nav Îttîhad û Teraqiyê de digihînin. Heta Ermenî jî kêr zêde jê bandor dibin. Jixwe Ermenî wek neteweyî xurt in. Partiya Hinçak-Taşnak di 1890'î de saz dibe. Lê dîsa jî eleqe û tifaqên wan hene. Di rastiya Îttîhad Teraqî de ev derdikeve pêşberî me: rêxistinbûyînek bûrjûva ye ku avahiyek wê ya kozmopolît heye û bi bandora yên Masonbûyî ku ji Îslama Abdulhemîd aciz in û piranî di Locayên Masonan de gihayî ne, pêş ketiye. Lê armanca her kesî hinekî cuda ye. Mînak, Arnavût Milliyetgiriya Arnavûtan dikan, Kurd Milliyetgiriya Kurdistan dikan, Erebi Milliyetgiriya Ereban dikan û ya dawî, ya divê herî şoven be, Milliyetgiriya Paşayê Osmaniyan e.”

Ev nijadperestên paşayên Osmaniyan, di 23'yê Tîrmeha 1908'an de li dijî Abdulhemîd ragihandina azadiyê dikan. Dirûşma wan jî wiha bû, *“Ji Bo Her Kesî Wekhevî, Azadî û Biratî”*. Lê ya rast ew e ku; Îttîhad Teraqî navê xwe bi xwînê li rûpelên herî tarî yên Dîroka Tirkiyeyê dinivîse. Mînak, darbeya di sala 1909'an de ku wek Weqaya 31'ê Adarê tê zanîn, wisa bi pisporî amade dikan ku, tevî ku gelek sal jî di ser re dibihurin ti kes nikare tê de destên wan bibîne. Di vê amadekariyê de bûyereke di 13'ê Nîsana 1909'an de wek hincetê tê nîşandan, Abdulhemîd ji textê tînin xwar û li şûna wî Mehmet Reşat Paşayê Pêncemîn bi cih dikan. Dûvre, di 23'yê Çileyê 1913'an de çalakiya wek *“Serdegirtina Babialî”* pêk tînin, Sadrazam neçarî îstîfayê dikan. Di vê çalakiyê yan jî serdegirtinê de ewqasî çavsor dibin ku Wezîrê Parastinê dikuji. Dijberên xwe yên siyasî bi kompoyên herî ziraf dikarin bikujin. Mînak, li kolanan di nava rojê de bi dehan rojnamevan bi daban- ceyan ve qetil kirine. Hesen Fehmî, Sernivîskarê Rojnameya Serbestî, Zekî Beg, Sernivîskarê Rojnameya Şehrah, Hesen Tahsîn, Samîm Beg, Rojnameya Sadayî Millet û gelek mîna van. Her tişt jî *“ji ber dijminên welêt in, ji ber endamên rêxistinên paşverû, yafta ne, ji ber tovên nîfaqê dixin nav yekîti û yekparebûna welêt, hatine qetilkirin.”* Berê xwe bidin vê îroniya dîrokî! Îro jî bi heman rêbazan, bi heman polîtîkayên kirêt tînin domandin.

Endamên Îttîhad û Teraqiyê wê êdî rûyên xwe yên esasî nîşan bidin. Yê berê qaşo hevpar û nûjenîxwaz bûn, wê nîşan bidin ku

bê di cewher de çiqasî milîtarîst û dijminê gelan e. Wê demildest derbasî Qirkirina Ermeniyan bibin. Wek hincet wê “*di dema şer de hevkarîya dijmin kirine*” bidin pêş û 1,5 mîlyon Ermeniyan qetil bikin. Piştî Ermeniyan wê dor were Kurdistan. Di 1916’an de Kurdên ku berê wan dabûn Anatolyayê, wê li gor planek ji mêj ve hatî amadekirin, ji hêla şênîyên li wir bi nêzîkatîyên nîjadperest bihatana pêşwazîkirin. Wê serjimêriya wan ne zêdeyî ji sedî pêncan be, zimanê wan ê dayikê qedexa be, rewşenbîr û rûspîyên wan ji zarokan bîr qutkirin û wê neçarî fêrbûyîna Tirkî bihatana kirin. Ew gotina bi nav û deng a “*Zo çû, lo ma*”, aîdî vê demê ye. Ango ‘*Ermenî hatin qetilkirin, dor hatiye Kurdistan!*’ Enver Paşa, di dema şer de, piştî Sefera Qamûşanê ku 90 hezar leşker ji ber şertên zivistanê mirine, vala vala ev gotin negotîne: “*Eger em ji derve li Lêkdana Qamûşanê (Sarıkamış) mîzê bikin, em dikarin têkçûnê bihesibînin. Lê bi rastî jî em serkeftî ne. Ji ber ku li ser rêkên ji Daristanên Qamûşanê heta Erziromê me bi deh hezaran cenazeyên Ciwanên Kurd hiştin.*” Ewqasî angajeyî Qirkirina Kurd bûye.

Wek tê dîtin, Cemiyeta Îttîhad û Teraqî berê xwe ne tenê dane Ermenî û Yewnan, ji bo tepisandinê, kar jî li hev parve kirine. Wê Talat; Ermeniyan, Enver; Kurdistan û Cemal Paşa jî; Ereban hel bikin. Hêrsa di nav Ereban de ku li dijî zext û zilma rêveberîya Cemiyeta Îttîhad û Teraqî bi pêş ket, veguherî bangên têkoşîna aktif. Ev gotinên ku di danezanek wê rojê de hatiye weşandin, vê hêrsê diyar dike: “*...Ev kesên ku dijminatîya te û zimanê te dîkin, ji welatê xwe paqîj bikî. Ereben Misilman û Xirîstîyan, li dijî dijminê xwe bibin yek, qet nebêjin ev Erebe Misilman e, ev Erebe Xirîstîyan e. Hûn hemû girêdayî Xwedêyekî ne û ol ê Xwedê ye. Ji ber vê bibin yek... Ey Ereben Misilman, eger hûn bifikirin ku ev îdareya zalim îdareyek Îslamî ye, hûn ê şaşîtiyek mezin bikin. Lewma di pirtûka Xwedê de dibêje, ‘zalim, kafîr bi xwe ne’.*”

Li dijî rewşenbîrên Erebe ên ji bo berxwedanê xwe bi rêxistin dîkin, pêla girtinê dest pê dike. Paşê jî êvara 20’ê Tebaxa 1915’an rewşenbîrên ku ji girtîgehê derdixin ji saet 04.00’ê sibehê ve înfaz dîkin. Rûspî ku 10 Misilman, 1 Xirîstîyan, 11 Erebe in, li meydana mezin a Beyrûdê, El-Bûrcê tên daliqandin. Koma duyem ku bi giştî 21 kes in, 17 Misilman û 4 jî Xirîstîyan in, 6’ê Gulana 1916’an bi berbangê re tene îdamkirin. Dîsa 14 li El-Bûrcê, 7’ên

din jî li Şamê, meydana al-Marjen tên înfazkirin. Yê biryarê dide û vê biryarê li dadgehê ferz dike, Cemal Paşa ye. Di roja me de Ermenî çawa roja **24'ê Nîsanê wek MEDZ YEGHERN (KARE-SAT, CÎNAYETA MEZÎN)** wek rojek qirkirinê fêm dikin, Erebi jî roja 6'ê Gulanê wek **Roja Şehîdan** bi bîr tînin.

Helbet, Îttîhad û Teraqî wê rûyê xwe yê herî xwînrij bi damezrandina rêxistina Teşkilat-î Maxsûsa nişan bidin. Milê wê yê herî balkêş û ecêb ew e ku heta îro jî hê ti belgeyek jî nehatiye dîtin ku nişan bidin bê Teşkilat-î Maxsûsa bi kîjan yasayê hatiye damezrandin. Ev rêxistin xwedî yekeyên jêrîn ên cur bi cur in. Mîna Tabûrên Bektaşîyan, Mewlewîyan! Piraniya xwe ji Dildarên Balakanan e. Serokên wan Suleyman Askerî Beg, Halîl Beg û herî dawî jî Cevat Beg in. Zêde zêde tetîkkêşên wê hene. Cinawirên wê yên wisa hene ku bêyî çavên xwe biniqînin mirovan dikujin. Bi vegotînen xwe yên bê çawa êsîrên Xirîstîyan sinet kirine, navdar in. Yakûp Cemîl, Husamettîn Erturk Beg, birayên Eşref û Hacı Samî, ji Sapançayê Hakî, Omer Nacî Beg, Nûrî Paşa, Eyup Sabrî û yên wek van. Her yek jî tetîkkêş in ku hiqûq ji wan re ne xem e, bi dehan qetlîam bi xwe kirine. Û piraniya van jî piştî di gelek cinayetên hov de hatine bikaranîn, wêrîsên wan hatine kişandin. Mînak, Yakûp Cemîl, di 11'ê Îlona 1916'an de dema 42 salî bû hatiye îdamkirin. Tetîkkêşên wisa bi rayeyan hatine tijîkirin û di karên kirêt de bi bêrehmî hatine bikaranîn, wek her tim bûye, ji rê derketine û serî li ber birayên xwe yên mezin rakirine. Di rewşên wisa de jî ku wek em di van rojan de jî dibînin, yek bi yek an ji holê hatine rakirin, an jî bi hinceta ku rêxistinên çete ava kirine, hatine darizandin. Şaxên jêrîn ên rêxistinê hene. Piranî jî dezgehên paramîlîter in; Mûdafaa-i Milliye Cemiyeti, Türk Gücü Cemiyeti, Osmanlı Güç Dernekleri, Osmanlı Genç Dernekleri, Türk Yurdu Derneği, Türk Yurdu Cemiyeti, Türk Ocağı, Milli Türk Cemiyeti, İstiklal ve İktisadî Milli Cemiyeti û gelek rêxistinên ku me navên wan li vir neanîne ziman hene.

Em vê beşê bi nixxandinek Abdullah Ocalan bi dawî bikin: **“Qirkirina Ermeniyan di nava vê tabloya giştî de beşê herî trajîk e. Kengî ji bo dewleta netewe rabûn (beriya 1914'an û salên destpêkê yên şer), di çarçoveya biryara rêveberiya Îttîhad û Teraqîyê ya 24'ê Nîsana 1915'an de bi êrîşekê ji**

welatê xwe yê hezarê salan hatin derxistin û li ser rêyan hatin kuştin, yên mayî jî bûn mehkûmê jiyanê dîasporayê ya demdirêj. Dîaspora ji bo Ermenîyan rastiyeke e, lê rastiyeke gelekî bêkêf, şikesî û hilweşiyayî ye. Bi dewleta netewe ya biçûk a Ermenî belkî dilê xwe xweş kirin. Di qirkirinê de ji bilî bûrjûwaziya Tirk, mirov dikare behsa para feodalên Kurd jî bike. Ev kesên ku gunehkarên rastî ne, bi tenê di qirkirina Ermenîyan de cih negirtin, di heman wextî de bi gelek awayên cuda, nexasim bi Alayên Hemîdiye di qirkirina Kurdan de jî cih girtin. Di qirkirina Kurdan de ya ku hê dewam dike weke ‘cerdevanên gundan’ di berdêla înkara Kurdîtiyê de milk û sermayeya xwe zêde dikin û kengî pêdivî pê dibinin Kurdîtiyê jî dikin û bi vî awayî rola xwe ya bi lanet dewam dikin.”

Sedema bi berfirehî danasîna Îttîhad û Teraqî ew e ku; ev zîh-niyeta ku wek maşîneyek qirkirinê li dijî gelan xebitiye, îro jî bi heman rengî di dewrê de ye. Rêbazên wan, îro jî hêla gelek sazî û dezgehên veşartî yên Dewleta KT tînin bikaranîn. JÎTEM, tenê yek ji van e. Gelek rêxistinên ku di bin navê Saziyên Civaka Sivîl de derketine, di esas de rêxistinên paramîlîter in. Û çavkaniyên ku xwe jê xwedî dikin jî eynê mîna wan rojan, Locayên Sabetayîti û Masonî ne.

Di Salên 1900'an de Cemiyetên Kurd

1) Cemiyeta Azmî Kawr: Di sala 1900'î de ji aliyê Fîkrî Efendiyê Amedî li Stenbolê tê damezrandin. Bi qasî tê zanîn, yekemîn rêxistina Kurdan e.

2) Cemiyeta Kurd a Teavûn û Teraqî (Piştevani û Pêşketin): 19'ê Îlona 1908'an li Stenbolê tê damezrandin. Hedef dike ku di nav sînorên yasayî de bixebite. Xwe nêzî Cemiyeta Îttîhad û Teraqî dike. Endamên wê yên tînin nasîn wîha ne; Emîn Elî Bedirxan, Şêx Abdulqadir, Şerîf Paşa, Ehmed Zulfik. Rojnameyek bi navê Kurd a Teavûn ve Teraqî derdixe.

3) 25'ê Îlona 1908'an li Stenbolê Lokalek Kurd bi awayekî fermî tê vekirin.

4) Cemiyeta Kurd a Neşrî Maarîf: Armanc, xebatên perwerdehiyê ne. Li ser vî esasî jî ji bo zarokên Kurd li Stenbolê dibistanek tê vekirin. Ji endamên damezrîner ên Cemiyetê Abdurrahman Bedirxan, Xelîl Xeyalî, Katîpzade Cemîl û Ehmed Ramîz piştî di bin sîwana cemiyetê de çapxaneyekê ava dikin. Cemiyetê hê zêdetir dixwest ku di bin banê Osmaniyan de gel li ser esasê wekheviyê bi hev re bijîn. Ev cemiyeta ku wek “Dibistana Meşrûiyetê” dihat zanîn, di heman demê de çapxaneyên Kurd jî ava kirin. Di 1909’an de hat girtin.

5) Sala 1910’an Cemiyeta Teşkilatî Îştîmaiye

6) Cemiyeta Mûhîpên (Hezkiriyên) Kurdistan: 1912’an li Stenbolê tê avakirin. Komaleya ku Mele Xidirê Dêrsimî pêşengtiya wê dike û Nûrî Dêrsimî jî bi awayekî çalak tevî xebatên wê dibe, pêşdibîne ku di nav Kurdên Stenbolê de piştevaniyekê saz bikin.

7) Civata Talebeyî Kurda (Hêvî): 1912’an li Stenbolê tê damezrandin. Damezrînerên wê, Zinar Silopî, Omer Cemîl, Fûat Temo yê Kurê Cemîl Beg ê Parlamenerê Wanê, Memdûh Selîm Beg in. Dezgeha wê ya weşanê Yekbûn e. Her wiha bi navê Hatewî Kurd ango Siberoja Kurdan, kovarek wan jî heye. Ev kovar hem Kurmancî, hem Soranî, hem jî Tirkî weşana xwe dike. Li gel vê, rojnameyek a cemiyetê bi navê Kurd Teavûn û Teraqî jî heye.

Abdulkerîm Beg ê ji Silêmaniyê, di 1913’an de di bin sîwana vê cemiyetê de Roja Kurd û kovara Jin a niv Tirkî jî derdixe. Yê di beşa Tirkî ya Kovara Jinê de dinivîsin, Profesore Destûra Bîngehî Î. Hakî, Memdûh Selîm ê ji Wanê, Ziya Beg ê ji Bedlîsê ne.

8) Firqeya Milet a Kurd, Teşkilat-i Îctimaiye ya Kurd: Ev komale jî armanc dike ku qasî destûra Osmaniyan, xebatên çandî bimeşîne.

9) Cemiyeta Tealî ya Kurdistan (Komaleya Pêşketina Kurdistanê): 1918’an tê damezrandin. Serokê wê Abdulqadir e. Bi giştî 19 şaxên Komaleyê tên vekirin. Dûvre dibin du mil. Serekeyê milekî Abdulrezzak Bedirxan e, alîgirên serxwebûnê ne. Serekeyê milê din jî Abdulqadir e, ev jî otonomiyê diparêzin.

10) Cemiyeta Tealî ya Jinan a Kurd: 1919’an tê damezrandin. Lê zêde wext di ser re nabihure tê girtin.

11) Sala 1919'an Cemiyeta **Tamîmî Maarîfe û Neşriyat a Kurd**, girêdayî Cemiyeta Tealî ya Kurdistan hat damezrandin.

12) **Partiya Ameleyan a Kurd**

13) **Cemiyeta Teşrîmî Mesaî ya Kurdistan**

14) **Cemiyeta Cîhanzanî**, 1912'an li Îranê tê damezrandin. (Rojhilatê Kurdistanê)

15) **Îstîhlasî Kurdistan (Rizgariya Kurdistanê)**, sala 1912'an hat damezrandin. Azadiya Kurdistanê diparêze. (Rojhilatê Kurdistanê)

16) **Firqeya Têkoşînê - Lutfî Fîkrî**, li dijî Îttihatê damezrandiye.

Em diyar bikin ku Dibistana Kurd a Yekem ji hêla cemiyetên li jor di 4'ê Mijdara 1913'an de li bajarê Xoyê hat damezirandin. Bi 29 xwendekaran dest pê kirine û Kurdî bi Alfabe ya Kîrîlê nivîsandine.

Di nav van cemiyetan de ya herî girîng Cemiyeta Tealî ya Kurd e ku 1914'an hatiye damezrandin. Rêgeza wan a esasî ev mantiq e; *“eger em dixwazin armancên xwe bi dest binin, pêwendîya li gel dewletên mezin neçarî ye. Her çawa be ev dewlet jî li gor Prensîbên Wilson tevdiqerin. Divê em jî bi hişkî xwe bi van prensîban girê bidin.”* Ev rewşa ku rûspiyên Kurd di nav bendewariyê de hiştin; gotinên Serokê DYA Wilson in ku di xala pêncemîn a deklarasyonê de dibêje, *“Divê mêtîngeh bi nêzîkatiyek azad, vekirî û teqezî bi bêalî bê nîrxandin, di çareserîya pîrs-girêkên serweriyên wisa de berjewendiyên gelan û daxwazên adil ên dewleta ku serweriya wê tê nîqaşkirin, divê teqez li gor rêgeza giraniya wekhevîyê bin.”* Ev, di gelek warî de bibû hêvî. Wisa bû ku di salên pêş de Lenîn, van gotinên deklarasyona Wilson hê zêdetir dibe pêş û dibêje, *“Mafê Tayînkirina Qederên Gelan”* û anîbû ziman ku Netewe Dewlet ji bo her gelekî neçarî ye.

Serdar Noel, dema vî halê ruh ê ku bendewar e û piştî xwe bi derve girê dide dinirxîne, wiha dibêje; *“Prensîba Serok Wilson a ku veguherîye ‘her kes çi dixwaze bike’ û hêviyên vala dide, bi giştî şewqên xwe li aso bilind dibe. Kurdên Osmaniyan difikirin ku*

eger qasî ji dest wan tê qîr bikin, wê Wîlson bibîhîze û destûr bide ku Amedê bi serê xwe yan jî bi nebaşî bi rê ve bibin, bêyî bi Tirkan re parve bikin, wê bihêle ku qelewbûna xwe bidomînin.”

Em kevanekekê vekin û têkildarî Wilson çend xisûsan bînin ziman. Daneyek din a ku gotinên li jor ên Noel rewa dike jî ev gotin in; *“Mîna Sekreterê Dewletê yê Wilson, Robert Lansing jî pêş dibîne ku ‘rêgeza tayînkirina qedera xwe wê hêviyên şaş bida gelean.’ Feraseta netewe ya Wilson taybet bû. Bi awayekî hê zelaltir, feraseta wî ya neteweya Amerîka, Amerîkiyên Resen (Çermsork) û Afrikayiyên Amerîkî li derve dihiştin û tenê Amerîkayiyên bi koka xwe Ewropayî di nav xwe de dihewandin. (Ambrosius 2002) Ferasetên netew û demokrasî yên xweserî Wilson, pênasêya wî ya serweriyê nîşan dide. Wilson, serweriyê mîna, ‘ne tevahî hemwelatîyên, lê xwe dispêre lîdertiya wan a siyasî’ û ‘bi ti şiklî nayê parçekirin, tiştekî teqez be, ne hêzek bêsinor be, serwerî ne heman hêzên civakê ne.”* (Robbyn Michelle Usherwood, **Mafê Netewe Çarenûsa xwe Diyar Bikin: Li Kurdistanê Nêrînek ji Nêz**) Ev gotin nîşan didin Wilson bi rastî jî hêvî daye gelan, lê nêrinên wî bi ti awayî ne ew krîterên demokratîk bûn. Ev hevok gotinên me bi awayekî hê balkêştir îfade dike; *“Wilson, nîjada ku ne Ewropayî û ne spî bû, biçûk didît. Bi heman rengî, bawer dikir ku di nav gelên Ewropî de jî hiyerarşiyek nîjadî heye.”* (Sluga 2005)

Robbyn Michelle Usherwood di destpêka teza xwe de ku têkildarî mijarê nivîsandiye, van dinivîse:

“Ev tez, piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn, wek civakek Rojhilata Navîn bi taybet Kurdan di çarçoveya rêgeza tayînkirina qedera xwe de dinirxîne. Şer, bi hilweşîna Împaratoriye Avûstûrya-Macarîstan, Osmanî û Rûs û dîvre wek encama rêgeza tayînkirina xwe jî bi damezrandin û pêşketina hebûnên bûne yekeyên serwer ên siyasî ango netewe dewletan bi encam bû. Ev rêgez ku dibêje mirov ji hêla dixwazin bîn birêvebirin divê bi xwe diyar bikin, ji aliyê 28’emîn Serokkomarê Dewletên Yekbûyî ya Amerîkayê Woodrow Wilson hat ragihandin. Piştî lêkolîna navbihurî diqede, wê bi awayekî eşkere bê dîtin ku Hêzên Mezin (Fransa, Îtalya, Qraltiya Yekbûyî û Dewletên Yekbûyî ya Amerîka) di pêkanîna rêgeza tayînkirina qedera xwe de bijêr in. Ji bo bijêriya di rêgeza

tayînkirina qedera xwe de a piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn bê nîşandan, wê têkildarî civaka Kurd a li Îran, Iraq, Sûriye û Tirkiyeyê lêkolînek qadê bê kirin. Ev tez alîgiriya nîjadî nîqaş dike ku piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn, ji bo serxwebûna Kurdan û heta xweseriya wê înkâr bikin, mabeyna yên biryarên dawî didin pêk tê. Li şûna vê, Kurd di nav çar dewletan de hatin parvekirin û di nav şewazekî zextê de hatin girtin ku serxwebûna wan a siberojê ji holê radike.”

Jixwe ji ber wisa ye, têkoşîna azadiya gelên berxwedêr bi temamî nehatine dîtin, ji nedîtîyê wîrdetir, eleqeyek jî çênebûye û li holê hatiye hiştin. Wek em ê di Şerê Parvekirinê yê Yekemîn de jî bibin, di vê mijarê de yên herî zêde dixapin Kurd in.

Eger em ji cihê mane bidomînin: sala 1898'an li Kahîreyê ji aliyê Mîthat Bedirxan Rojnameya Kurdistanê û kovarên bi navê Amîd-î Sevda û Peyam hatin derxistin. Yên di van tevahî komale û rêxistinan de cihê xwe girtin, Arîstokratên Kurd in. An kur an jî xizmên Began, Mîran, Şêxan, Axayan, lîderên berxwedanên Kurdistanê ne. Dibe ku li gor şertên wê rojê ev wisa dikare bê fêmkirin. Lê, ji aliyê me ve nîrxandina vê mijarê jî divê bê fêmkirin.

Xwendekarên li baxçeyê Babialî mezin bûne -ji derveyî niyeta wan- wê hinekî Osmanî bin. Jixwe ev beş, li gor karaktera çîna xwe wê li gor berjewendiyên xwe tevbigerê. Li gor pêdiviya karaktera xwe wê piştî xwe bi derve girê bide û wê li beramberî xwe baweriya wan kêmbê. Ji ber vê ye ku wê dûr û biyaniyê gel bin. Û ji ber vê yekê ye ku qasî destûra hatiye dayîn wê tevbigerin. Wê xwe tevî çalakî û aktîvîteyên ji derveyî vê nekin.

Beriya Yekemîn Şerê Cîhanê, Dîsa di Pêvajoya vî Şerî û Piştî Şer Rewşa li Kurdistanê

Yek ji birên herî girîng a dîroka Kurdistanê jî pêvajoya Yekemîn Şerê Cîhanê ye. Her çiqasî beşek zehf girîng a dîrokî be jî em demildest diyar bikin ku hê li benda nîrxandinek bi tendurist e. Ji ber, qasî ku Kurd ji vê pêvajoya dîrokî bi zirarên mezin derbas bûn, her wiha li beramberî gelên din jî dikeve nav nakokiyan. Piştî vê pêvajoya dîrokî, Kurd bi destê hêzên navdewletî dibin çar par-

çe, li vê erdnîgariyê bûne dijberî gelên ku bi hezaran salan hevparî jiyane.

Di beşên jorîn de me hewl da vê dijberiyê di avabûna Alayên Hemîdî de bidin. Her wiha di beşên pêş de dema nîrxandina têkiliyên Kurd û Ermenîyan de em ê hewl bidin behsê bikin. Lê, em karibin têkiliyên Kurd û Îttîhadiyan, Kurd û Îngilîzan, Kurd û Ebdulhemîd, Kurd û Rûsan, Kurd û Suryaniyan û Asûriyan; têkiliyên Kurdan û giştî gelên li vê erdnîgariyê, wê encamên girîng derxînin holê.

Me hewl da em polîtîkayên Îttîhadiyan li jor bidin. Me diyar kiribû ku di destpêka damezrandinê de siyasetmedarên Kurdan, Arnavûtan û her wiha ji gelên din jî cihê xwe tê de girtine. Cemiyeta Îttîhadî Teraqî di damezrandina xwe de xwedî avahiyek pirreng bû, lê piştî 1906'an, vî rengê xwe ji dest dide, vediguhere avahiyek leşkerî ya nîjadperest û faşîst, an jî tê veguherandin!

Nivîskarê bi navê Fûat Dundar di pirtûka xwe ya **Şîfreyên Tirkiyeya Modern** de vê mijarê dinirxîne, diyar dike ku ji pirtûka **“Du îttîhad-Teraqî: Du Zîhniyetên Cuda, Du Siyasetên Cuda”** a nivîskarê bi navê Sûavî Aydin sûd girtiye û wiha dibêje:

“Ev cudahî, dema li koka damezrîner û rêveberan bê mêzekirin jî wê bê ditin. Di Cemiyeta yekem de (1889-1896) qasî hatiye tespîtîkirin, ji 19 endaman 9 ji Balkan û Stenbolê, di ya duyemîn de (komîteya navendî ya 1908-1918) bi qasî ku hatiye tespîtîkirin, ji 25 kesan 15 Tirk bûn. Her wiha, bi qasî hat tespîtîkirin, ji 21 efseran 19 Balkanî û Stenbolî bûn.”

Piştî van diyar dike, vê jî li ser zêde dike: *“Û wek notekî girîng: di pirtûkên dîrokê yên piştî 1908'an de damezrandina Cemiyetê wek hewldanek welatparêzên li Rûmeliyê tê gotin, ji bo damezrandina Cemiyetê ne sala 1889'an li Stenbolê, bi rengê li Balkanan bûye tê nivîsandin.”* (Mehmet O. Alkan: **“Li ser Çebûn û Berfîdîna Îdeolojiya Fermî Ceribandinek”**)

Û wek encam jî dibêje:

“Esas wek Sûavî Aydin jî li cih tespît dike, 2 Cemiyetên cuda hene. Koma ku sala 1889'an li Stenbolê li hev civiyane û koma ku 1906'an li Selanîkê hatine ba hev. Di cemiyeta yekemîn de tevahî milletên Osmanî tê vehewandin, sîvîl û rewşenbîr serwer in, model

Fransa ye û Osmanîparêzî tê heye; di ya duyemîn de jî tenê Cihû, çerxkirî û Tirk cih digirin, ji efser û memûrên biçûk pêk tê, Elman-ya mînak digirin, Tirkîti wek fikra serwer e."

Dema em ji vê perspektîfê lê dinêrin, wê demê kiryarên Îttîhadada ku bi gelan re tevdigere û piştire Îttîhadiyên ku bûne bela serê gelan, baştir tê fêmkirin. Yek, Osmaniyan dike esas, ji bo rizgarkirina Osmaniyan hevpariya gelan diparêze, ya din; plan dike ku tenê ji bo "Welatekî" biçûk bi avahiyek nîjadperest, milliyetgirî, Sabetayîstên çerxkirî, faşîst ve gelan qir bike.

Wek tê zanîn, ji sala 1683'yan ve êdî Osmanî li beramberî Ewrûpayê zeîf dibe û heta Balkanan vedikişe. Rewşa li Balkanan xeter e. Yewnanîstan 1821, Bûlgarîstan 1878, Romanya 1881, Arnavûtlûk 1911-12'an ji Osmaniyan qut dibin û serxwebûnên xwe îlan dikin. Her ku diçe ber bi Trakyayê ve xakên wê biçûk dibin. Ev têkçûna li Ewrûpayê rû dide, di esas de li hemû eniyan pêk tê. Erdnîgariya Ereban, Trablûsgarp û li gelek eniyên din têkçûyîn li pey hev tên. Ji ber ku Îttîhadiyên bi eslê xwe ji leşkeran pêk tên û her wiha çerxkirî û nîjadperestên Cihû yên li Selanîkê dijîn ev rewş baş tespît kirine, berê hedefa xwe dane Anatolyayê. Gelek plan û bernameyan bi pêş dixin ku bê wê çawa li Anatolyayê bi cih bibin. Wê bi awayekî bi detay planan çêbikin ku bê wê misilmanên li xakên jidestçûyî li kû derê bi cih bikin û gelên li wan deran çawa bihelînin. Bi awayê herî vekirî, em ê kiryarên li dijî gelê Ermenî di Qirkirina 1915'an de bibînin. Li dijî Kurdan jî di sala 1916'an de bibînin. Û bi rêzê, Çerkez, Yewnanî, Suryanî...

Hey mijar hatiye ser Suryanî û Asûriyan, em vê jî bi lêv bikin: Qirkirina li dijî gelê Asûrî jî ji hêla Îttîhadiyan di Nîsana 1914'an de li Stenbolê dest pê kiriye, di mehên havînê de li Mêrdînê (Beşîrî, Midyad, Cizîr) berdewam kirine.

Piştire ev rewş hê bi sistemtir kirine û ji 8'ê Îlona 1924'an ve ew rewş bi qirkirinên mezin ve anîne asta qedandine. Kesê bi navê Albay Reşat Hallî vê qetlîamê wisa vedibêje: "...*Armanca Tirkan û sedema dijtevdîran ew bû ku Nastûriyên destikên Îngilîzan ê ku avêtine bajarê Colemêrgê, bên şikandin û di heman demê de çaxa ku "Pirsgirêka Mûsilê" li Cemiyetî Akvamê dihat nîqaşkirin, bi armanca dagirkirina van deran qewitandina Nastûriyan û di*

hevîdîtinê Mûsilê de sazkirina rewşek serwer bû.” (Ji Belgeyên Femandariya Giştî Serhildanên Kurdistan)

Asûrî vê qirkirina mezin a ku di rêjeyek mezin de gelê Asûrî tasfiye kir, wek “**SAYFO**” angî “**Dana Ber Şûr**” bi nav dîkin. Em ji kiryarên li ser gelan dizanin ku **MEDZ YEGHERN** a bi serê gelê Ermenî hatî, **TERTELE** ya li Dêrsimê bi serê Kurdistan de hatiye, şewazên pêkanîna heman zîhniyetê ne.

Îttîhadiyên ku sala 1908’an desthilatdariyê bi dest tînin, her çiqasî çûnehatek (çûyin û hatin) jiyabin jî wê rê û rêbazên xurt-bûyînê bi dest binin. Hin caran bi darbeyan, hin caran bi pîlangeriyan, hin caran bi sûîqestan wê xwe xurt bikin. Li gel van maharetên wan, wê carna taktîkên xwe yên kûr jî bixin meriyetê.

Mînak sala 1912’an dema li ser desthilatdariyê ye, ji ber dizanin wê Balkan ji dest wan biçe –heta parastina Edîrneyê jî zehmet be-, ji hikûmetê îstîfa dîkin, hikûmetê ji mûxalîfan re berdidin. Jixwe piştî Şerê Balkanan ê Cotmeha 1912’an têk dişkê, cemiyet polîtîkayek milliyetgiriya tund diyar dike; sûcê têkçûnê wê biavêje ser hikûmetê û bi demagojiyek milliyetgiriya xurt ve wê bi bayê lezê dîsa desthilatdariyê bi dest bîne.

Piştî Balkan –heta Edîrne jî- ji dest diçe, yên ku bêyî destûra Osmanîyan çûbûn Trablûsgarpê, bi lezûbez di dawîya sala 1912’an de vedigerin. Wê têkçûna li Balkanan bikin malê dijberên xwe û gel bîkşînin aliyê xwe. Û yên ku destê xwe nedane ti tiştî wê bi dihemleyek mezin, di femandariya Enver Paşa de Edîrneyê desteser bikin, qaşo Stenbolê ewle kirine jî wê dîsa baweriya gel bi xwe binin. Bi vê baweriyê ve û bi darbeya ku Enver Paşa di 23’yê Çileyê 1913’an de pêk tîne, êdî Îttîhadî dibe tekane partî, li ser Osmanîyan hakim dibe.

Ji bo fêmkirina van bûyeran, em hinekî din li dîroka wê binêrin.

Bavê fikra partiya yekane, Generalê Elman Colman Von Der Goltz e. Colman Von Der Goltz, di 1883’yan de ji aliyê Ebdulhemîd ve wek rayedarê Mekteba Harbiye ji bo du salan hatiye tayînkirin, lê domahiya 15 salan xizmeta Osmanîyan kiriye. Ji bilî sîstema perwerdeyê, di warê diyarkirina moderbûyîna artêşê û stratejiyên nû yên leşkerî, bûye yek ji leşkerên diyarker. Bi sîstema perwerdeya Goltz Paşa, nîfşek nû ya efseran teşe digire.

Heman Goltz Paşa, wezîfeya xwe tenê bi qada perwerdeyê sînordar nahêle; raporên ku wê bandora xwe li gelek mijaran siyasî û leşkerî bike jî amade dike. Ji bo karibe polîtîkayek bandor li ser Ereba û herêma bimeşîne jî pêşniyaran li Ebdulhemîd dike.

Piştî vedigere Elmanyayê jî wê eleqeya xwe ya Osmaniyan bigomîne, pêwendiyên li cem leşkeran berdewam bike. Piştî gotara xwe ya ku tevahî Îttîhadiyan bandor dike, di Kovara “Deutsch Rundschau” de Cotmeha 1897’an diweşîne. Nivîs bi zimanê Tirkî di sala 1905’an de: wek **“Zeaf û Qeweta Devlet-î Aliye”** tê weşandin.

Di gotarê de mirov dikare bêje ku tevahî dîtinên Îttîhadiyên ku hewl didin li Anatolyayê gelekî nijadperest û faşîst, esker miletekî ava bikin, tên dayîn.

Goltz wisa dibêje;

“Li Tirkiyeyê... Li şûna dewletek fireh û giran, divê dewletek medenî ya hê biçûktir, lê bihêztir ava bibe. Li rojhilat (Osmanî), ya pêk tê an jî pêwîst e pêk were, pêvajoyek wisa ye.

Bi sed hezaran penaber ji ber tevdîrên ecemî, mahf bûne. Yên hatine bicihkirin, li şênîyên herêma nekirine, minak wek Çerkez, ji bo dewletê bûne bi rengê dewletekê û heta xwe nadin ber leşkeriyê... Di vê mijarê de pêdivî bi tevdîran heye... Divê koça beşek mezin a Gîrîtîyên Misilmanan ber bi Xaka Tirkiyeyê ku dikare hê bi milyonan kesî bihewîne, bê hesibandin...

Li welatê tengbûyî ango li Anatolya û Rûmeliyê dikare hê gelek pêkanînen bi qîmet bîne kirin. Arnavûtlûka Jorîn... Herêma Ermenî ya Zeytûn... Çiyayên Durzî yên Havran... li cihên muxtelîf ên Kurdistanê bi taybet jî milên Dêrsimê, Cölemez, Mûsil, Bexda û Basrayê...

Li Nîvgirava Balkanê wê çi ji sererastkirina sînora derkeve? Li gor rewşê wê hê musaîttir e ku eger dewlet ji Dewletek Bîzansê ya zeîf veguhere Dewletek xurt a Tirk û Ereban...

Avahiya neteweyî berê xwe bide mijarên hundirîn, rola Dewleta Mezin a Ewropayê ku ya terikandina wê nayê xwestin ji seriyên bê avêtin, ji bo pêşxistina madî û manewî ya Wilayetên Anatolyayê serî bê êşandin,... ji bo xebatên zanistî bigihînin asta navendê, bi

*rêka hêzên xwecihî ve rêvebirin û parastina Eyaleta Erebaştanê,...
Yên koçber bicihkirin...*

*Paytext... veguhestina Sînorê Tirk û Erebaş, mîna Konya an jî
Kayserî an jî hê pêşdetir, ber bi başûr ve...*

*Lewaziya Dewleta Osmaniyan, ne jî ber biçûkbûna welat e, be-
revajî jî ber ku hêzên niha jî bo parastina wê heta îro jî pir berfi-
reh in...*

Xebata **“Das Volk in Waffen”** (Gel ê di Nav Çekan de) a Goltz, bi navê Millet-î Muselleha ango Esker Milet hatiye weşandin û wek me got, îşaretên ku bê dewletek yek tîp çawa çêdibe dide.

Ji navên kovarên ku Îttihadî derdixin jî mimkun e ku ev bê dîtin. Navên Silah (Çek), Sungu (Singo), Top, Tufenk (Top, Tivîng), Hançer (Xencer) û hwd. navên kovaran e; jî bo eskerkirina ciwanan jî; sala 1914'an Cemiyeta Hêzê ya Osmanî, sala 1916'an Cemiyeta Ciwan û Bihêz a Osmanî û jî hêla Kazim Karabekîr di sala 1914'an de li gor rêzîknameya Cemiyeta Hêzê ya Osmanî “Artêşa Zarokan” jî tên avakirin.

Ji ber ku li gor nêrînên Goltz “zîlam û şervan” heman tişt bûn, jî bo millet diviyabû ku tevahî zîlam biketana nav liv û tevgerê û zîlam vê wezîfeyê jî ber “eşqa hevpar a welêt” bi dildarî bikirana. Bi awayekî herî şênber dibêje; “*Êdî pêdivî bi serlêdanan biyanîyan namîne, jî ber ku wê zarokên welêt tevî artêşê bibin û wê têrî karan bikin. Êdî wê pêdiviya me bi veguhestina leşkeran nemîne, jî ber ku em ê kadroyên xwe jî neteweya xwe ya di bin alê de bûne yek, peyde bikin.* (Herhal niha baştir tê fêmkirin ku bê Hîtler faşîzmê jî kê û kîjan pêkanînan fêr bûye.)

Ehmed Riza ku yek ji van Îttihadiyên faşîst ên Goltz dişopîne, di xebata xwe ya **“Vazîfe, Mesûliyet: Esker”** de wiha dibêje:

“Li cem me hê eşîrên bicihnebûyî, cemaatên neketine daîreya aştiyê û biratiyê, Xirîstîyanên Osmanînebûyî, sînorên nehatine diyarkirin û saxlemkirin hene. Her roj êrîş li ser Hîqûqa Osmaniyan heye. Serxwebûna dewleta me di bin hezar xetereyan de ye. Ji ber vê yekê, jî her dewletê hê zêdetir pêdiviya me bi artêşên rêkûpêk û muntazam, stolek (donanma) bi tevger û saxlem heye ku bikaribe emniyet û asayîşê saz bike.”

“Di nav Xirîstiyanan de ku ji Tebaa (rajêr) Osmaniyan e, alîkariyên mîna ji bo artêşên dijmin nîşandana rê, peydekirina xurekan, hilweşandina pirên me, şewitandina depoyên me hatibûn dîtin. Li dijî van dijminên veşartî gelo di nav welêt de fikra çareyekê hatiye kirin?” Bi van gotinan ve jî îşaretê bi qirkirinên sibe-rojê dike û zihniyeta heyî di xebata sala 1907’an de datîne holê.

Beriya em bêjin bê çima me ewqasî avahiyên zihnî yên Îttîhadiyan û fikrên jê bandor bûne anîne ziman, em bi jêgirtinekê vegerin gotinên xwe:

“Talat Paşa dema ji rewşenbîrê Ermenî Vramîan re behsa projeya xwe ya bişavtina Kurdan dike, Armen Garo (Karekîn Pastirmacıyan, di pêvajoya 1908-1912’an de Parlementerê berê yê Erziromê) wisa bersivê dide Talat Paşa:

“Bi çi? Bi kîjan çandê? Eger we dîroka xwe zanîbûya we vê vegotina tewş nedikir. Ji bîr nekin ku ev 500-600 sal in hûn li ser xaka me ne û beriya we jî gelek millet di ser vê axê re derbas bûn: Fars, Romayî, Ereb, Bîzansî. Eger van nikarîbûn Kurd asîmîle bikirana, hûn ê çawa bikin?” Avagyan-Minnassian” (Ji xebata Fûat Dundar hatiye girtin)

Em kevanekê vekin, bê Îttîhadî ji bo karibin qirkirina çandî li ser gelan bimeşînin çi kirine, em bi kurtahî vebêjin. Ji bo politîkayên xwe yên bişavtinê gav bi gav bixin meriyetê, Îttîhadî serî li gelek pêkanînan didin. Mînak, dibêjin zimanê Kurdan paş-demayî ye, esas ne zimanek e, ji ber vê jî divê demildest ji holê bê rakirin. Wisa jî li dijî zimanê Kurdî ketine nav xebatên dijminane. Qaşo rewşenbîrê Îttîhadparêz ê bi navê Nacî Îsmail Peliştîr bi nasnav Adem Habîl, wiha dibêje: *“Ji bo neteweyên biçûk û paşaroja wan nediya, ti girîngiya ziman nemaye. Ferhenga Kurdî-Rûsî-Elmanî ya ji aliyê Akademiya Petersbûrgê hatiye weşandin, ji 8307 gotinan pêk tê... Tirk (Tirkmenên Kevn) 3080, Ereb (zimanê nû) 200, Farisî 1030, Kurd (resen) 300,... Lewma jî ne mimkun e ku mabeyna zimanê Kurdî û gotinên Kurdî de pêwendî bê avakirin. Di zimanê Kurdî de hevoksazî çênebûye. Gotinên Kurdî, karên Kurdî tek tûk in ku bê çi ne nediya in.”* Tenê vê îdiayê jî nake û dibêje *“tabî zimanê netewekî jî ji vê hevoksaziyê pêk tê”* û bi rêkên *“zanistî”* jî mîna Rejîma Kemalîst di 1925’an û darbeya 12’ê Îlona 1980’an kiriye, dibêje di esas de neteweyek bi navê Kurd tineye.

Eger em nikaribin behsa ziman, çanda civakekê bikin, wê demê em nikarin behsa dîroka wê jî bikin.

“Ne mimkun e ku dîrokek Kurd a mîna tê hesibandin bê dîtin... Ev dîrok, beşên aîdî dîrokên neteweyên din e... Derfet nîne ku dîrokek serbixwe ya Kurdan bê avakirin.” Piştî van gotinan, wê bi dehan pirtûk dubare dubare binivîsin ku kiryarên li ser navên Kurdan di dîrokê de hatine kirin aîdî Tirkan e, heta Eşîra Erdelan a Kurdan ji Moxolan hatiye, navên wan aîdî wir e, cewherê wan jî Tirk e. Bi dehan pirtûk hê heta sala 1916’an, ji aliyê **Heyeta Encumen-î Îlmiyye** hatiye avakirin. Ev jî nîşan dide ku di vê avahiya faşîzan, yekperest, nîjadperest, parêzvanên Sêva Sor de qirkirina gelan, qirkirina çandî çiqasî kûr e. Em bi vê wesîleyê jî fêr dibin ku “tespîtên zanistî” yên mîna ji ber ku Kurd li ser berfê dimeşin dengê mîna kart û kurt derdikevin, lewma gotina Kurd çêbûye û ev jî rastiyeke xwe nîne, digihêje heta Îttîhadiyan. Bi girtina vê kevanekê ve em navên kesên ku van xebatên asîmîlasyonîst meşandine wiha rêz bikin: Baha Seîd, Sadik Vîcdanî, Mehmed Arîf, Enver Behnan, Yûsûf Ziya, Hîlmî Ziya, Peyamî Safa, Yakûp Kadrî Karasmanoglû û hwd.

Bi kurtasî: me anîbû ziman ku di destpêka salên 1900’î de mîna gelên din, Kurd jî gelek cemiyet, partî, komaleyan ava dikin. Her wiha me gotibû ku ji bo damezrandina Osmaniyan xebat û tevgerên hevpar kirine. Lê, piştî ku Cemiyeta Îttîhadî Teraqî ket destê avahiyên nîjadperest, faşîst û paramîlîter; di nav erdnîgariya Osmaniyan de pêkanînen li diji gelan gav bi gav ketine rojevê. Jixwe gelên di bin sîwana Osmaniyan de li gel Osmaniyan hiqûqa xwe hene. Hiqûqek bi vî şiklî ya Kurdan, Ermeniyan, Çerkez, Ereban hebû û ya gel û kêmneteweyên din jî hebû.

Dema ku Îttîhadî vê avahiya ku di nav sedan salan de ava bûyî xera dikin, mînak 1908’an îlana Meşrûiyeta Duyem dikin, 13’ê Nîsana 1909’an Ebdulhemîd ji textê tînin xwar û dişînin Selanîkê û herî girîng jî di pêşengiya Enver Paşa de 23’yê Çîleya 1913’an dema komek çekdar bi ser civîna hikûmetê ya Babialî de digirin, Nazîrê Harbiyeyê Nazîm Paşa dikujin, çekê didin serê Sadrazam Kamîl Paşa û dafî îstîfayê didin û dema Îttîhad Teraqî bi darbeyek leşkerî desthilatdariyê bi dest tîne, bêguman gelek nerazîbûn hebûn

û çêdibûn. Wek hat îfadekirin, ev gelan –çawahiye wan cuda bin jî- girêdayî û dilsoziyê Padişahê Osmanîyan bûn.

Wek nimûne, dema Ebdulhemîd sirgûnî Selanîkê tê kirin, yê ku destpêkê serî rakir Serokeşîrê Milliyan Îbrahîm Paşa bû ku wê demê 6 Alayên wî yê Hemîdî hene. Wisa bû ku di demek kurt de ji Dêra Zor a îro heta Erzîngana Bakurê Kurdistanê desteser dike. Mezinahiya tehlûkeyê ne tenê mijara raperînê ye. Ji ber xeterî heye ku yê dilsozê padişah in bikevin nav liv û tevgerê, Îttîhadî tevahî hêza xwe kom dikin û berê xwe didin Îbrahîm Paşa. Herî dawî 24'ê Tebaxa 1910'an bêbandor dikin.

Dibe ku hem bi moral û hêza ji vê îsyane digirin, hem jî polîtîkayên Îttîhadiyan tê dîtin, sala 1912'an li Dêrsimê Lîderên Eşîra Koçgirî û rewşenbîr û welatparêzê nêzî wî Elîşêr îsyaneke bi pêş dixin. Ev berxwedan jî tê tepeserkirin.

Îsyaneke din a li dijî Îttîhadiyan jî Îsyana Barzan e. Di 1907'an de bi mahiyeta xwe ji Şêx Abdusselam re ji bo Stenbolê, daxwazên “1-Perwerdeya Kurdî. 2. Divê yê li îdarê Kurdî biza-nin. 3. Rêveberî wê li gor esasên şerî be. 4. Bace li gor usûlên berê bêne komkirin û li herêmê wek dibistan, razandin bêne xerckirin” pêşkêş dike. Lê, daxwaz bi cih nayên. Osmanî daxwazan red dike, li ser vê jî leşkeran bi rê dike. Piştî şerê du heman, Abdusselam xwe diavêje herêma Tiyarê. Piştî ku Îttîhadî tenê ser desthilatdariyê jî xwe li Rojhilatê Kurdistanê distrîne. Sala 1912'an jî Şêx Abdus-selam, bi komployekê ve li mala Sofî Abdûllah ê ji Eşîra Şikakan bi komployekê tê girtin, radestî Osmanîyan tê kirin û sala 1914'an jî li Mûsilê tê bidarvekirin. Ev berxwedan jî bi vî şiklî tê tepisandin.

Lê, berxwedan an jî îsyaneke din a ji van hê bi bandortir jî di 9'ê Adara 1913'an de ye ku ji aliyê Mele Selîmê tê destpêkirin. Seyid Elî jî (Ji aristokrasiya Arvasî neviyê Sebgetûllahê Neqşibendî ye) li dijî rêveberiya Îttîhad Teraqî di 1913'an de li Bedlîsê serhildane- nek berfireh a Kurdan dide destpêkirin. “Serhildana Bedlîsê, 1913-14, ji aliyê Şêx Xîzanê Şehabbedîn û Seyid Elî û Mele Selîmê Bîngolî dest pê dike. Tê gotin ku di esas de xwedî karakterek olî ye. Rêberên serhildanê yê ku dixwestin gav bi gav li herêmên din ên Kurdistanê jî agirê îsyane pêbixin, destpêkê ji bo Bedlîsê bi te-mamî kontrol bikin çî ji destên wan tê; ji gelên Ermenî û Asûrî yê

*li herêmê jî destek xwestin. Piştî ji aliyê endamên Îttîhad û Terraqiyê ve Mele Selîm tê girtin îşyan diteqe, M. Selîm tê rizgarkirin. Îşyan heta Erzînganê berbelav dibe, herî dawî têk diçe, lîderên wê tîn îdamkirin. M. Selîm dema li Konsolxaneya Rûsan şer rû dide, tê kuştin.” (Kemal Mazhar Ahmet, **Di Yekemîn Şerê Cîhanê de Kurdistan**) Seyid Elî jî dûvre dema li Erdîşê tê girtin tê sêdarkirin.*

Dikare rewşek sosret be, lê ji bo bê bibîranîn û nîşeyek ji dîrokê re be; Seyid Elî, bavê Sellahaddîn Înan e ku parlamenterê Demokrat Partî bû, bapîrê Kamûran Înan e ku ji partiyên AP, MDP û ANAP’ê bûye wekilê Bedlîsê.

Îşyan û berxwedan wê li Kurdistanê di zikhev de bidomin. Bişarê Çeto yê ku sala 1914’an li Sêrtê serî hildide, berxwedana xwe digihîne heta Amedê. Erebi jî piştgiriya vê berxwedanê dikin. Ew ê jî ji têkçûnê nikaribe xwe rizgar bike, piştî jî bi neçarî xwe li Yemenê distîne. Beriya wê jî sala 1905’an li Amed û Bedlîsê, 1907’an li Erzirom û Amedê, her wiha 1907-1908-1909’an li Dêrsimê û 1908’an li Agirî û Hemawendê, esas her berxwedan û serhildan kêman bin.

Li dijî Îttîhadiyan tenê Kurd ranabin ser piyan, tenê li dij dernamevin. Li dijî Îttîhadiyan Erebi jî li ber xwe didin. Li Yemenê, Iraqê –her du jî di nav sînorên Sûriyeyê de– li Horanê û Çiyayên Durzî, serhildanên Ereban pêk tên. Li Hîcaz, Necd, Asir û herêmên din jî giregirên vê herêmê li dijî rêveberiya Îttîhadiyan dibin xwedî helwestek tund. Dîroknas dibêjin ku di van berxwedanan de cih bi cih lîderên Erebi û Kurdan tên ba hev.

Eger em bala xwe bidinê; îşyan û berxwedanên ku me li jor anîn ziman, beriya Yekemîn Şerê Parvekerinê ye. Ne wek tê zanîn, Îttîhadî hema wisa bi rehetî nehatine qebûlkirin. Berevajî, Kurdan li her derê berxwedanên cidî nîşan dane. Lê, piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn diteqe, diyardeya olî derdikeve pêş, vê carê Kurd jî bi giranî xwe didin aliyê Osmaniyan. Her çiqasî bi giranî rewş wisa jî be, berxwedan û îşyanên cuda li ser bingehên cewaz dewam kirine. Eger em minakekê bidin; di sala 1916’an de li dijî Îttîhadiyan li Mahabadê eniyek berxwedanê tê vekirin.

Şerê Parvekirina Yekemîn ê Cîhanê ji bo Kurdistanê hilweşînek anî. Ji ber ku eger em bêjin navenda Şerê Cîhanê yê Yekemîn

Kurdistan bû wê ne şaş be. Dûvre em ê hewl bidin bi berfirehî binirxînin, li gor Sykes-Pîcotê Kurdistan esas ji bo Rûsan hatibû hiştin. Osmanî û dibe ku em karibin Elmanan jî li vê zêde bikin, diviyabû ku ji Kurdistanê bêne qewitandin. Ev jî dihat wateya şerekî gelekî mezin, lewma jî hilweşîn bû.

Dema Îttîhadî li rex Elmanan dikevin Yekemîn Şerê Parvekiri-na Cîhanê, destpêkê wê li dijî Allîanz ango yek ji endamên bibandor ên Eniya Îtîlafê, Rûsan bûna. (Rûsan demek dirêj zorî dane Osmaniyan. Niha wê bi alîkariya Elmanan ev rewş ters bibe. Jixwe dema Balkan ji dest Osmaniyan tê girtin jî rolek diyarker a Rûsan heye!) Ji ber Rûsya cîranê Osmaniyan bû, ev kar hinekî wê cidî bûya. Jixwe li rojhilatê Kurdistanê bi giranî Ermenî hebûn. Ermenî bi Konferansa Berlînê ya sala 1878'an; Îngilîz, Fransî û herî dawî jî Rûs ji bo karibin dewletek serbixwe ava bikin "piştgiri" didan. Li erdnîgariya ku wek Vîlayet-i Sîtte (6 Wîlayet) dihat binavkirin, esas wê Ermenîstaneke serbixwe bihata damezrandin! Wek tê zanîn Vîlayet-î Sîtte bajarên: Erzirom, Wan, Elezîz, Amed, Sêwas her wiha Bedlîsê digire nava xwe. Di vê rewşê de Rohrbach ê Elman ji ber Ermenî wek tehlûkeyek mezin didît, tasfiyekirina wan pêşniyar dike. Piştî diyar dike ku ji bo Tirkîyeyê Ermeniyan wek tehlûke dibîne û *"ji bo qedandina Ermeniyan Kurd dikarin bên bikaranîn"*, tê zanîn ku dibêje di pelçiqandina Ermeniyan de Kurd bên bikaranîn wê Elmanya îfraz neke. Em ji bîr nekin ku me gotibû nêrînên Goltz ê ku me behsê kiribû jî wisa bûn.

Elmanan, gav bi gav Îttîhadiyan ji bo ku karibin qetlîamên sistematîk bi serê gelê Ermenî de binin daf didan, Rûs jî wê Ermenî li Kurdistanê li dijî Tirk û Kurdan bikişkişandana. Li gel vê wê baweriyên cuda jî tehrîk bikirana, gel bikiranan dijberên hev û çanda hevpar a bi sedan salan bi feraset û avahiya dewletparêziya nîjadperest, olperest jehrî bikirana û gel bi hev bidana şikandin.

Li milekî hêzên Entente ango Îtîlaf (Elman, Osmanî, Macarîstan, Îtalya), li milê din jî hêzên Îtîlafê (Îngîltêre, Fransa, Rûsya) wê Kurdan û gelên herêmê tehrîk bikin û hewl bidin bigihêjin hedefên xwe. Her çiqasî li eniyên din jî şer qewimî be, dûvre bi giranî ji ber ku şer li Kurdistanê dimeşe, Kurdistan bi temamî wêran dibe.

Rûs, di 1915'an de dikevin Kurdistanê. Cihê ku yekem dikevinê jî Wan e. Ev berbelavbûna wan wê bi lezûbez bidome. 13'ê

Gulana 1916'an wê Rewanduzê desteser bikin û gelek deverên din jî kontrol bikin. Em li vir diyar bikin ku, Rewanduz wê demê bajarokek e ku ji 2 hezar malan pêk tê. Lê bi ketina Rûsan ve tenê wê 20 mal bimînin. Tevahî hatine şewitandin, hilweşandin. Dîroknas, ji ber qetlîamên bi ser Ermeniyên de hatî (ji ber Serwerên Kurd, Alayên Hemîdî û avahiyên çete tê de cih digirin) dibêjin ku di van hilweşîn û şewitandinan de herî çalak çeteyên Ermeniyên cih girtine. Dîroknasê Rûs Şahovskî wisa dinivîse: *“Fanatîkên nîjadperestên Ermenî, li herêmen ku dagir kirine, Misilman tine dikirin.”* Li dijî vê berxwedanên hişk bi pêş dikevin. Wisa ye ku tê gotin ji bo şikandina berxwedanê yan jî bêbandorkirinê, Rûs ji bo çend malbatan – ji bo pêdiviyên malê- tenê destûra çaqokê didin. Ji ber ku li dijî zilma heyî gel hewl dide –sivîl jî be- xwe biparêze. Û jixwe ji ber pratîkên qetlîamkar ên Rûsan, îro hê jî bi gotina “Rûs tîn”, “Ûrûs tîn” nîşandana hem tirs hem jî hêrsê kêmanabe.

Rûs dema berê xwe didin Kurdistanê tenê xwe bi Bakur û Başûrê Kurdistanê sînordar nahêlin. Li Rojhilatê Kurdistanê jî ketina wan hê bi bandortir dibe. Sala 1915'an dema Rûs û Îngilîz li ser Îranê li hev dikin, di sala 1916'an de Rûs li Rojhilatê Kurdistanê heta Kirmanşan, Sine, Sawuçê (Mahabad) diçin. Li kû derê Elman û Osmanî hebin, Rûs ji bo wan jî wir biqewitînin êrîşê wê derê dikin.

Rûs van li cihên cuda yên Kurdistanê pêk tînin, Îngilîz jî destpêkê Mintîqa Basra ya Iraqê dûvre jî ber bi Silêmanî ve li dijî Osmaniyan bi awayekî bi bandor şer dikin. Kurdan jî ber mijara olê destpêkê li cem Osmaniyan ref girtin. Osmaniyan jî hewl da ji vê rewşê sûdê wergirin. Bi gotina Dîroknasê Rûs Bazil Nîkîtîn, *“Banga Cîhadê ya ku careke din bi maskeya Îslamê hat kirin, hêza şerker a Kurdan, li milekî ku wê bi ti awayî ne li gor berjewendiyên vî gelî bûya, xist nav liv û tevgerê.”*

Lê di demeke kurt de Kurd dibînin ku kar cuda dimeşin. Dîsa jî bi temamî destên xwe ji pişt Osmaniyan nakşînin. Îngilîzên ku ev rewş baş şopandin, ji bo karibin Kurdan bîkşînin aliyê xwe, Rojnameya Kurdî jî derdixe. *“Têgihiştina Rastî”* rojnameyek e ku Îngilîzan di dema şer de li Silêmanî derxistine. Ji bo karibin gelan bera hev bidin, hema hema rojane bangên Soranî dikin. Bedela vê politikayê jî bi rastî zehf giran bûye.

Dema ku şer bi awayekî dijwar dimeşe, wek me hewl da pir caran îfade bikin, polîtîkaya pevşikandina gelan bi awayekî zêde tê teşwîqkirin. Mînak, dîroknas dibêjin li Rojhilatê Kurdistanê Simko axa yê Şîkak gelek gund şewitandine, hilweşandine, heta li dor Urmiyê 100 gund şewitandine û talan kirine. Rûs li dijî vê rewşê destpêkê Simko digirin û sirgûn dikin. Dûvre ji ber şer dewam dike û berfireh dibe, dîsa tînin Kurdistanê û vê carê ji bo bikaranînê jî mûçeyan didinê. Kemal Mazhar Ahmet dibêje; *“Wek mînak, bi giştî 14000 leşerên Artêşa Osmaniyan li Hamedanê hebûn, 10000 Kurd bûn. Lewma jî dema Rûs vedigere bajarên Azerbaycana Îranê, demildest pêwendîyan li gel serokeşîrên Kurdan datînin. Hê wîrdetir, Simko berdidin û ji bo armancên xwe yên mezintir hevkarî pê re kirin. Li ser van armancan Simko yê ku hat azadkirin û mehane 5000 rûble zêr digirt, dûvre anîn li ser rêveberîya hin herêmên Kurdan. Ev tevger, li gor mantixê Çarên ku çavên xwe berdabûn wîrdetirî çiyayên Kurdistanê Îranê, rojava û başûr, wê ne bi nakok ba.”*

Yekemîn Şerê Parvekirina Cîhanê li kû derê cîhanê pêk hatibe elbet bedelên wê zehf giran bûne. Şerekî wisa ye ku; 75 mîlyon mirov tevlî şer bûne, 10 mîlyon di şer de mirine, 20 mîlyon birîndar bûne û 10 mîlyon jî ji birçîna mirine. Hesab kîtabê yên windayan, yên nehatine dîtin, yên aqûbetên wan nediyar jî tineye.

Li Kurdistanê tenê sala 1915'an, 1,5 mîlyon Ermenî hatine qetilkirin, bi sed hezaran hatine sirgûnkirin û aqûbetên sed hezaran jî nayê zanîn.

Di Şerê Osmaniyan de ku heta 1912-1914'an dewam kir, li gor daneyên M. Zekî Paşa 300 hezar Kurd mirine. Her wiha dibêje domahiya Şerê Cîhanê yê Yekemîn 500 hezar Kurd mirine. Yên herî dawî hatin diyarkirin, ew kes in ku di şer de mirine. Her wiha di sala 1916'an de jî tenê hejmara Kurdên ku hatine sirgûnkirin û jiyan xwe ji dest dane –hê rasttir hatine qetilkirin- nêzî 700 hezarî ne. Em behsa sirgûnan nakin, yên li ser rê winda bûne nakin. Sedema van qetlîam û sirgûnan jî qaşo pêşketina hêzên Rûs û Îtîlafan e? Qaşo Kurdan êdî alîkariya Rûsan kirine û wê Tîrkiye parçe bikirana? Qaşo Kurdan wê di vê atmosfera aloz de dewleta xwe ya serbixwe ava bikirana?

Di bin van senaryoyan de ku ji serî heta binî li ser derewan hatiye avakirin, ji bilî şîretkirina Îttîhadiyan a ji aliyê Elmanan ne tiştêkî din e ku wê gelên Misilman ên ji Balkan, Kafkas û Rûsyayê anîne li Kurdistanê bi cih bikin, Kurdan û Ermeniyên bikin kêmnetew. Tehrîkkirina Ermeniyên –bi taybet Rêxistina Taşnak û derdora wê– dibe ku rast be. Dibe ku Rûsan bi polîtîkayên gelekî kirêt xwestibin Ermeniyên li dijî Osmaniyan jî rakin. Heta dibe ku Kurd ji bo eskeriyê ji Osmaniyan re nekin ji eskeriyê reviyabin, heta cih bi cih derbasî rexên Rûsan bibin, lê hem qetlîama li dijî Ermeniyên hem jî qetlîama li dijî Kurdan, teqez plana qetlîama di çarçoveya Plana Islahkirina Şarqê ye ku 24'ê Îlona 1925'an hatiye rêkûpêkkirin.

Ji ber vê ye ku şer li Kurdistanê ji aliyê Îttîhadiyan gelekî dişwar hatiye meşandin. Dema di çarçoveya van gotinên me de em li Envar Paşa ku bi zanebûn deh hezaran Ciwanên Kurd derxistine Çiyayên Allah-û Ekber dinêrin, wê hê baştir bê fêmkirin.

“Wisa jî di dawîya şer de ji bo Îttîhadî bigihêjin hedefên xwe, têkildarî belavkirina şêniyên Kurd li gundên Tirkên, rêze ferman û biryarnavê derxistin. Di vê rêkûpêkkirinê de pûte bi qadên îskanê hat dayîn ku nifûsa Kurdan ji sedî 5-10'an derbas neke. Şexsiyetên navdar ên Kurd û serokeşîr jî wê barî Bajarên Rojavayê Anatolyayê bikirina, li malên xwe bihatana şopandin û destûr nehata dayîn ku bigihîna hev an jî zîlamên xwe yên li çolteran hatine belavkirin. Îttîhadiyên ku beriya şer biqede bi demekê bi daxwazek mezin dest bi pêkanîna vê polîtîkayê kirin, ewil berê xwe dan eşîrên “bi înat” û serokeşîrên “serhişk” ên ku hikûmet nikare bîne ser rê. Bi hezaran Kurd bi zora çekê sewqî herêmên goşeyên Rojavayê Anatolyayê hatin kirin. Piraniya van sirgûnan, di rê de ji seqemê mirin an jî ji nexweşiyê ketin. Piştî şer qediya, beşek biçûk vegeriya xakên xwe. Li milekî din, piraniya yên li cihên sirgûnê mane, di encama bêkarî û nexweşiyên de mahf bûn. Wisa jî Osmaniyan trajediyên ku dîrokê beriya 350 salan mehkûm kiribûn, careke din kirin rojevê. Karesata Ermeniyên a esas bandorên wê di roja me de hê jî tê hîskirin û di çarçoveya polîtîkayên giştî de tevahî gelên di nav împaratoriye de mexdûr kiribûn, di rêjeyek biçûk de hatibû dubarekirin.” Bi van gotinên xwe ve Kemal Mazhar Ahmet gelekî mafdar e.

Pir eşkere ye ku Îttîhadiyan bi kiryarên xwe texrîbatên gelekî mezin li Kurdistanê kirine. Artêşa Osmanî bi hinceta neçariya leşkerî ve beşek mezin a şênîyên li herêmên Amed, Mûş û Bedlisê ji warên wan kirine, bêwar, biwelat hiştine, hebûna wan, xwarin, depoyan wan desteser dikin. Kurd ji ber vê yekê, birçîbûn û feqîrtiyek gelekî mezin dibîne. Zehf mirov hene ku ji ber birçîbûnê welatê xwe terikandine. Pir ji wan hewl didin xwe biavêjin bajarên mîna Heleb û Mûsilê. *“Di germahiya havînê û sermaya zivistanê de hewl didin li kolanan jiyana xwe bidomînin, nema dikarin xwe li birçîbûnê bigirin, termên heywanan û heta cenazeyên xizmên xwe yê ji birçîna mirine dixwin.”*

Di encam de deh hezaran, sed hezaran Kurd dibin qurbaniyên Yekemîn Şerê Parvekirina Cîhanê. *“Li gor agahiyên di pirtûka Dr. M. Lazarev û çavkaniyên diplomatîk ên aîdî dema Çarîtiyê, di dema şer de li herêmê gelek malbatên ku ji 20-30 kesî pêk dihatin, bûn 3 yan jî 4 kes. Hê bêhtir, şer li Kurdistanê bingehe jiyana aborî hilweşand; yek ji sedemên vê yê sereke jî kêmbûyîna di hêza kar de bû. Her kesên ku dikarîbûn bixebitîna yan bi qadên şer ve hatin ajotin an jî dest ji karên xwe berdan û berê xwe dan çiyayan. Her wiha, Artêşa Osmaniyan, gelek heywanên ku li herêmê di çandiniyê de dihatin bikaranîn, ji bo xizmetên leşkerî desteser kirin.”*

Erê, serpêhatiyên ku di Yekemîn Şerê Parvekirina Cîhanê de li Kurdistanê ketibûn meriyetê, wiha bûn. Gelekî ku ti eleqeya xwe bi şer re tinebû, wisa tê qirkirin. Tevî ku di ti deverên şer de jî cih negirtin, hem wê di şer de bihatana kuştin, hem bikuştana, hem xakên wan bihatana şewitandin, hem hilweşiyana, hem ji birçîna biketana, hem bihatana koçberkirin û hem jî bihatana qetilkirin. Û wê ev nebes bihata dîtin ku wê li dijî gelên ku bi sed salan, heta bi hezaran salan li vê xakê bi Kurdan re hevpar jiyane, bikirana dijmin!

Yek ji trajediyên ku Kurdan di dîroka xwe de zehf dîtine jî, -ev rastiya ku heta îro baş nehatiye ziman, destûra wê nedihat dayîn-rastiya di Yekemîn Şerê Parvekirina Cîhanê de ye.

Têkildarî Têkiliyên Kurd û Ermenan Çend Gotin

Têkiliyên Kurdan û Ermeniyan gelekî nabin rojev. Divê werin rojevê. Heta wisa ye ku divê ev têkilî her rojane bimînin. Ji ber ku bi hezaran salan vê erdnîgariyê parve dikin û trajediyên mezin bi serê wan de hatine. Tevî ku wisa ye jî, hê jî çawa ku eleqeya lazim nayê nîşandan, her wiha ji bo trajediyên pêkhatî lêborînek bi tendurist jî nehatiye xwestin. Rastiya du gelên ku hê jî tê wirdekirin û li derve tînin hiştin, heye. Erê, ji ber vê jî divê têkiliyên mabeyna van du gelan her roj li ser esasê xwişk, biratî û bihevrebûnê di rojevê de bin.

Dema pêwendiyên Kurd-Ermeniyan tê nixrandin, herî zêde jî ber bi dawîya sedsala 19. û destpêka sedsala 20. tê vegotin. Helbet ev pêvajoyên dîrokî girîng in. Ya hê girîngtir jî ew e ku divê pêvajoyên dîrokî yên li derveyî van jî bê lêkolandin. Dîrokên ku li jor hatine diyarkirin, ew dîrok in ku dixwestin gelên Kurd û Ermenî bînin dijberî hev. Ya rast helbet ne nixumandina ser rastiyan e. Divê qewimîn bînin nîvîsandin, ji van ders bînin girtin û destûra dubarebûnê neyê dayîn. Eşkere ye ku divê rûdanên sedsalan ên bi hevparî, xwişkî û biratî çêbûne, hê zêdetir bibin esas.

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan li ser çanda xwişkî, biratî û hevpariyê Suryaniyan jî zêde dike, di Parêznameyên xwe de wiha tîne ziman:

“Ereb, Fars, Kurd, Suryanî û Ermeniyan, pir neçû di nava demeke kin de Tirkan jî li vê qadê hêza xwe nîşan dan. Kurdistan li jortir mîna qada sereke ya şerê di navbera Bîzans û Împaratoriya Îslamê (berê jî Sasanî) de ye. Kurd li Bakur bêhtir bi Ermeniyan re, li Başûr bi Suryaniyan re, li Rojava bi Rûman re û li Rojhilat jî bi Farisan re di nava hev de bûn. Tevî ku piraniya gel pêk dianîn, bi van gelên cîran re nexasim bi hêza wan a li bajaran re timî di nava têkiliyê de bûn. Kurd weke gelekî şivan û cotkar, Ermenî û Suryanî jî weke bajarî û zenaetkar dibûn xwedî hebûn. Bi vî awayî di navbera wan de dabeşkirineke dîrokî ya kar pêk dihat. Têkiliyên wan ji nakokiyê zêdetir simbiyotîk bûn ango her du aliyan bi têkiliyên xwe hevdu xwedî dikirin. Bêguman divê mirov Cihûyan jî li

van têkiliyên bi vî rengî zêde bike. Cihûtî ji roja derket holê ve bi cografya Kurd re ji nêz ve di nava têkiliyê de bû...

Tevî hemû fetih û şeran, têkiliyên di navbera gelan û tebeqeyên jêr de bi giranî bi dostanî dewam kirine. Kurd bi qewmên Ermenî û Asûrî re di nava hev de mane û bi hev re xwe li gelek hewldanên şaristanî û çandî qewimandine. Hebûna têkiliyên bi vî rengî yê heta salên 2000'î B.Z. diçin, mirov dikare wan di dîrokê de jî tespît bike. Tevî hemû xwelî-hevrakişandina Begîtiyên qewman li ser desthilatdariyê û şerên li ser milkan, dîsa jî têkiliyên çandî yê xurt di navbera gelên Ermenî, Kurd, Tirkmen û Suryaniyan de heta serê sedsala 19. dewam kirin. Têkiliyên di navbera wan de bi giranî sîmbiyotîk bûn û hem ji aliyê maddî ve hem jî ji aliyê manewî-çandî ve pêk hatine. Bûyerên neyênî yê çarenûsa van gelan biguherînin pêk nehatine. Nakokiyên heyî zêdetir ên tebeqeyên jor ên qewman bûn û li ser bingehê berjewendiyan hatine sor-kirin û rê li ber şer-eran vekirine. Ji cudatiya dînî û mezhebî ya tebeqeyên jêr re hurmet hatiye nîşandan, li pêşiya têkiliyên xwiştî, biratî û dostîtiyê asteng nehatine dîtin. Nivîsandina dîrokê li ser bingehê hegemonya îdeolojîk û hêzê, û propagandakirina wê, nikare ser vê rastiye bigire û nikare wê ji holê rake."

Mimkun e ku van îfadeyên Abdullah Ocalan di gelek birên dîrokê de bêne dîtin. Minak, hê di 1860'an de li dijî êrîşên Osmanîyan, Ermenîyan û Kurdên ji Dêrsimê bi hevparî rêxistina, **Ji bo Rizgariya Neteweyî Komîteya Ermenî û Kurdan** ava kirine.

"Hejandinên Şoreşa Bûrjûva ya Fransî Împaratoriya Osmanîyan jî rapêça bû. Ji Welatên Rojavî dest pê kir, li ser hîmê etnikî û neteweyî tevgerên serhildanê rû dabûn. Miletên Rojhilatî û kêmneta-teweyên ku vê lêgerîna nasnameyê bandora xwe li ser kiribû, her kû diçûn dengê xwe bilind dikirin. Yek ji minakên balkêş ên vê bandorbûyîne jî li herêma Dêrsimê pêk dihat.

Di Havîna 1864'an de ji Lîderên Ermenî Atom Karapetyan, nûnerên xwe ji Dîrîcanê ber bi Dêrsima Çiya, di nivê yekemîn ê sedsala 20'emîn de dişîne cem Seyîd Îbrahîmê bavê lîderê olî-siyasî yê Dêrsimê Seyîd Rîza. Nûner, deh rojan li mala Seyîd Îbrahîm dimînin û pê re diaxivin. Seyîd Îbrahîm, herî dawî pêşni-

yar dike ku civînek bê lidarxistin ku gîştî serokeşîr tevî bibin. Civîn, 10'ê Cotmeha 1864'an li Pêrtagê dest pê dike. Di civînê de pêşniyar tê kirin ku heyetek temsîlkar ji Hikûmeta Tirk re bê şandin, daxwaza maf bi rêyên aşîxwaz bê kirin ku Dêrsim xwe bi xwe îdare bike. Hin li dijî vê pêşniyarê derdikevin, ji bo parastina statuya Dêrsimê pêşniyara rakirina çekan tînin. Ev rewş, civînê dike du beş; lê herî dawî tê qebûlkirin ku heyetek bê avakirin, ji Stenbolê re bê şandin û pîrsgirêk bi rêkên aştiyane bê çareserkirin. Lê, Dêrsimiyên Çiya ji vê biryarê kêfxweş nabin.

Qasidên Dêrsimê, sala 1865'an meha Adarê ber bi Stenbolê ve dikevin rê. Lê beriya bigihêjin wir, Jûrnalî (îhbar) sedema hatina heyetê ji Stenbolê re radigihînin. Endamên Heyetê çawa digihêjin Stenbolê, ji aliyê hikûmetê tînin girtin, diavêjin zindanê û piştî 2 salan di 2'yê Nisana 1867'an de encex tînin berdan.

Endamên hatî berdan, di serokatiya Atom Karapetyan de diçin Dêrsima Çiya. Heta demekê li wir dimînin, paşê ji bo karibin serhildanek çekdarî bidin destpêkirin diçin ba serokeşîran û ji bo serhildanê wan qeneh dikin. Derdorên hikûmetê yê hayê xwe ji rûdanan çêdibin, vegera wan a warên wan hêsantir dike.

Endamên heyetê yê ku hewldana ewil di ber wan de ma, piştî mehekê di pêşengtiya Atom Karapetyan de li gundê Xinzoreskê bi beşdariya lîderên Ermenî û Kurd civînekê li dar dixin. Di civînê de rexneyan li xwe digirin, şaşitiyên xwe qebûl dikin, biryar digirin ku êdî ti carî baweriya xwe bi hikûmetê neynin û serhildanek nû ya çekdarî bidin destpêkirin.

Ji bo vê jî, ji bo têkoşînek rêxistinkirî ya Ermenî û Kurdan pêş bikeve û mufrezeyek çekdar a êrîşê ya bi navê Xol bê sazîkirin, li ser pêdiviya damezrandina rêxistinek bi navê **“Ji bo Rizgariya Neteweyî Komîteya Ermenî û Kurdan”** radiwestin û 6'ê Çileyê 1868'an Komîteyek ji 14 kesan pêk tê ava dikin. Endamên vê Komîteyê wiha ne:

- 1-Xaçîk (Haçîk) Minasyan
- 2-Grigor Karapetyan
- 3-Seydo yê kurê Halîşe
- 4-Îsmail ê kurê Kamer Misto

- 5- Eliyê kurê Ehmedê Xelatî
- 6- Uso (Yûsûf) ê kurê Mikoyê ji Henê
- 7- Miko (Hagob) yê kurê Omerê Reyisî
- 8-Temîrê kurê Hesenê Galî
- 9-Pîgdoyê kurê Sarkîs Pagdo
- 10-Îbrahîmê kurê Suleyman Pero
- 11- Nersikê kurê Azakans Adam
- 12-Manûkê kurê Manukans Gabo
- 13-Mehmetê kurê Sulo Xudo (Suleyman Xidir).

Armancên Ji bo Rizgariya Neteweyî Komîteya Ermenî û Kurdan wek 12 xalan hatibûn diyarkirin.

Eger em hinan ji van li vir bidin:

1-Li her derê wê li dijî dagirkerên Osmaniyan şer bê kirin

2-Li Dêrsimê yekîneyên êrîşê yên çekdar bi navê Xol ji Ermenî û Kurdan bên rêxistinkirin.

3-Ermenî û Kurdên ku temenên wan navbera 18-30 salan de wê bikarîban tevî yekîneyên Xol bibûna. Diviyabû ku beşdar di he-man demê de ji aliyê komîteya fêrandariya Xolê ku ji 5 kesan pêk dihat, bihatana hîlbijartin.

4-Her yekeyek Xolê wê ji 25-50 kesî pêk bihatana.

5-Fêrandarê Xolê, wê ji nav mirovên ku divê temenê xwe gi-hayîba 30'î û di şer de 5 çaran qehremantiya xwe nîşan bidana, bihatana hîlbijartin.

6-Zimanê fermî yê Xolê wê Zazakî bûna û ancax Ermeniyên ku Kurdî dizanin wê ji bo Endamtiya Xolê bihatana hîlbijartin.

...

12- Xaçik Minasyan (Serok), Halçens Seko (nûnerê Dêrsimê) û Atom Grigor Karapetyan (Sekreter), ji bo dîwana serokatiya Komîteyê hatin hîlbijartin. Dîwana Serokatiyê xwedî raye bû ku dikarîbû ferman bida Fêrandariya Xolê û di rewşên awarte de li şûna Komîteyê kom bibûna.

Piştî bername hat diyarkirin, Komîte dest bi xebatan dike. Beri-ya her tiştî berê xwe didin axa û begên ku di dest hikûmetê de bûne maşîk, zextê li civakê dikin û karên kirêt dimeşînin.

Endamên Komîteyê, pêwendiyên li gel Şah Huseyîn Beg û Saît Beg datînin, ji bo li dijî hikûmetê bi hevparî şer bikin jî li hev di-kin.

Yekîneyên Çekdar ên Xolê, di Tebaxa 1868'an de êrîşê dibin ser Xelîl axa ku 40 gundên Ermenî û Kurdan di dest xwe de digire û bi zextan ve êşên mezin dide gundiyan. Xelîl axa yê ku piştî xwe bi dewletê germ dike, bi soz û xapandinan êrîşê radiwestîne.

*Komîte wê nikaribe xebatên xwe zêde bi pêş bixe, di nav endamên wê de dubendî çêdibin, pêwendiyên li ba gel lewaz dibin û gav bi gav belav dibe.” (Mehmet Bayrak, **Dêrsim-Koçgîrî**)*

Bi têgihîştina vê rastiye ve, em li cem beravajiyên ku li ba vê ne jî binirxînin, em ê karibin xwe bigihînin encamên rast. Me şikandina herî girîng a dirokî ya navbera Kurd û Ermenîyan de di salên 1894-1895-1896'an de dîtibû. Me nivîsibû bê Alayên Hemîdî çawa li ser navê Osmaniyan gelê Ermenî qetil kirine. Her wiha, qetlîamên ku ji aliyê Dewleta Osmaniyan li cih û demên cuda hatine kirin jî tên zanîn. Mînak li Zeytûnê, di 1862, 1878 û 1884'an de qetlîamên bi vî awayî hene. Em gotinên Generalê Elman Goltz ên, “*Li welatê tengbûyî ango li Anatolya û Rûmeliyê dikare hê gelek pêkanînen bi qîmet bêne kirin. Arnavûtlûka Jorîn... Herêma Ermenî ya Zeytûn...*” ji bîr nekin.

Rewşek hemreng, lê hê girantir jî em ê vê carê di kiryarên Îttîhadiyan de bibînin ku di Şerê Cîhanê yê Yekemîn de li dijî gelê Ermenî pêk anîn. Îttîhadiyên ku destpêkê nêzî Îngilîz û Fransîyan bûn, beriya Şerê Cîhanê yê Yekemîn xwe zêde nêzî Elmanan di-kin. Elman ji bo ku Îttîhadî karibin li Erdnîgariya Osmanî serweri-ya xwe saz bikin, pêşniyarên cur bi cur dikin.

Mînak, Dîroknasê Kurd Kemal Mazhar Ahmet di pirtûka xwe de dîsa rastiyeke ku xwedî belgeyên dirokî ne, wiha dinivîse, “*Rohrbach di konferansek din de ku di dawîya Mijdara 1913'an de li Komaleya Asya ya Elmanan tê lidarxistin, heman nêrînan tîne ziman. Û ji ber wê di xizmeta berjewendiyên Elmanan de be, îşaretê pê dike ku divê rojavayê Ermenîstanê di nav Xakên Osmani-*

yan de bimîne. Di vê konferansa duyemîn de îfaşeyek wisa dike ku di warê mijara lêkolîna me de xwedî girîngiyek mezin e û dibe ku milên sirdar, diyar ên di Qetlîama Ermenîyan de ronahî bike. Destnîşan kir ku Rojavayê Ermenîstanê li Tirkîyeyê dibe çavkaniyek aloziyê û ji ber vê jî ‘Kurd dikarin wan ji holê rabikin’. Rohrbach, dîvre, bi gotinek revokî ragihand ku Kurd di pelçiqandina Ermenîyan de bê bikaranîn wê Elmanya îtîraz neke û ev mijar hê bêhtir ronahî kir.”

Eger em bala xwe bidin çîrokê, em ê bibînin ku heman e. Alayên Hemîdî hê jî hebûna xwe didomînin. Li gor fikra Ermenîyan, wê karibin li rex Îngilîstanê cih bigirin. Wê demê tiştên ku divê were kirin jî diyar e, wê xeterbûyîna Ermenîyan bê qedandin. Rêyek beralîkirina vê tehlûkeyê jî bikaranîna Kurdan e. Dema Kurd jî tê gotin, Kurdên Alayên Hemîdî, hevkarên Îttîhadiyan, lumpenan, Feodalên Kurd ên çavên wan li malê dinê ne û çiqas tîpên ketî û hatine xistin hebin...

Hêzên behsa wê hatin kirin, ji bo qetilkirina mirovên me yê Ermenî wisa ketine nav teşwîq û tehrîkek taybet; bi heman şiklî jî vê carê di Şerê Cîhanê yê Yekemîn de Ermenîyên hemreng ji aliyê Rûsan tîna tehrîkkirin, beriya wê jî ji hêla hêzên rojavayî tîna kişîşandin û li dijî Kurdan ketine nav hewldana qetlîaman. Zelal e ku wê ev jî ji bilî avakirina dijminantiya mabeyna gelan, wê nebe sedema ti tiştêkî din. Mînak, dema Rûs di Bihara 1916’an de dikevin Rewanduzê, Ermenîyên hemreng didin pêş û ji ber vê jî li Rewanduzê komkujîyên erjeng pêk tînin. Ji ber ku hê salek tîji nebûye ku bi sed hezaran Ermenî hatibûn qetilkirin.

Erê, em diqat bikin ku girêk dîsa eynî ye. Ew girêk e ku Garo Sasonî tîne ziman. Girêka, “*Osmanî dikujin, lê sûcdar her tim Kurd e. Zextê dike, qebehetdar dîsa Kurd e. Ti xerabî li holê nîne ku, yê vê kiriye ne Kurd be û ti zilm nîne ku, yê hevrû dimîne ne Ermenî be.*”

Qetilkirina 1,5 mîlyon Ermenîyan û bi darê zorê koçberkirina bi sed hezaran, rastiyeke wisa ye. Lê divê neyê jibîrkirin, 30 hezar Ermenî hê di sala 1909’an de li Edeneyê bi nemerdî tîna qetilkirin. Sedema wê êşkere ye. Siyaseta Îttîhadî, di esas de siyasetek li ser hîmê Tirkkirinê ye. Mîna ji pisporên dîroka modern a Tirk Professor A. F. Miller jî diyar dike; “*Tiştên ku Îttîhadî bi ‘Yekîtiya Os-*

manî' tînin ziman, esas ji bilî Tirkkirina komên din ên etnîk ne tiştêkî din e." Dema nêzikatî û zihniyet wisa be û berjewendiyên mîna cemedê jî dikevin nav mijarê, wê demê tiştê xwe dide der jî qetilkirina bi mîlyonan mirovan e.

Yên li jor hatine ziman bi giştî di Parêznameyên Abdullah Ocalan de bi awayekî herî rafîne wiha tê ziman:

"Qirkirina Ermeniyan di nava vê tabloya giştî de beşê herî trajîk e. Kengî ji bo dewleta netewe rabûn (beriya 1914'an û salên destpêkê yê şer), di çarçoveya biryara rêveberiya Îttîhad û Teraqiyê ya 24'ê Nîsana 1915'an de bi êrîşkê ji welatê xwe yê hezarê salan hatin derxistin û li ser rêyan hatin kuştin, yê mayî jî bûn mehkûmê jiyanêke dîasporayê ya demdirêj. Dîaspora ji bo Ermeniyan rastiyeke e, lê rastiyeke gelekî bêkêf, şikestî û hilweşiyayî ye. Bi dewleta netewe ya biçûk a Ermenî belkî dilê xwe xweş kirin. Di qirkirinê de ji bilî bûrjûwaziya Tirk, mirov dikare behsa para feodalên Kurd jî bike. Ev kesên ku gunehkarên rastî ne, bi tenê di qirkirina Ermeniyan de cih negirtin, di heman wextî de bi gelek awayên cuda, nexasim bi Alayên Hemîdiye di qirkirina Kurdan de jî cih girtin. Di qirkirina Kurdan de ya ku hê dewam dike weke 'cerdevanên gundan' di berdêla înkara Kurdîtîyê de milk û sermayeya xwe zêde dikin û kengî pêdivî pê dibînin Kurdîtîyê jî dikin û bi vî awayî rola xwe ya bi lanet dewam dikin."



QIRKIRINA LI HEMBER ERMEYAN



Ji bo em karibin rêvebirina vê qetlîama bêrehm ji nêz ve bibînin, em çend fermanên teqez ên ku ji aliyê Îttîhadiyan hatine dayîn, li vir bidin.

Metna telgrafê ya ku yek ji mejiyên Îttîhadiyan Nazirê Dahiliye (Wezîrê Karên Hundirîn) Talat Paşa ji Waliyê Helebê re şandiye wiha ye:

“Biryara herî dawî ku li gor fermanên Cemiyetê ji bo tinekirina Ermeniyên li Tirkîyeyê dijîn hatibû girtin, beriya niha ji bo we hatibû ragihandin. Pêwîst e ku yên helwestek li derveyî vê biryarê nîşan didin li ser wezîfeyên xwe nema dewam bikin. Divê gavên ku em biavêjin, di wê astê de teqez û tûj be ku dawiyê li Ermenîyan bînin. Bi ti awayî cudahiyê nexin mabeyna temenan, wijdanan an jî jin, zilaman.”

Fermanek din jî wisa ye:

“Em fêr bûne ku hin wezîfedar bi hinceta ku li dijî milletê tê zanîn (Ermenî) serî li talan û tundiyê dane, radeştî Dîvan-i Harbê hatine kirin. Her çiqasî ji bo seroberokirina rewşê be jî, tevdîrek bi

vî awayî dibe ku cesareta wezîfedarên din jî bişkîne. Ji ber vê jî ez ferman didim ku pêşî li darazên bi vî awayî bêne girtin.”

Dîsa fermanek bi dîrokek din jî ev e:

“Eger hûn guh bidin gazincên cur bi cur ên wan kesan (Ermenîyan), wê tenê şandina wan a welatên biyanî dereng nekeve, di heman demê de wê siberojê firsendê bide avabûna hêzên cur bi cur ên siyasî. Li gor vê, pêwîst e hûn fermanên mecbûrî û teqez bidin wezîfedaran.”

Îro her kes dizane ku, Îttîhadiyan di heman dîrokê de çi xwestibûn bi serê Ermenîyan de bînin, bi heman rengî ji bo Ereban jî difikirin. Tê zanîn, di sala 1916’an de bi dehan rewşenbîrên Erebi jî hêla Cemal Paşa bi xwe hatine daliqandin. Lê, Kemal Mazhar Ahmet di heman pirtûka xwe de behsê dike ku ev plansazî ji mêj ve hatiye amadekirin û belgeyên wê jî hene.

“Di hin çavkaniyên Erebi de tê diyarkirin ku komek Efsêrên Erebi di 1912’an de belgeyek girîng bi dest xistine. Di nameyekê de ku lîderekî Îttîhadî ji bo efsêrekî payebilind dişîne, wiha tê gotin; ‘Ereban di bin gulebaranê de bihêlin û hewl bidin ji wan xelas bibin; ji ber ku kuştina wan qenciya me ye. Kurd jî divê sax bin. Ji ber ku li ser xakên Ermenîyan pêdiviya me bi wan heye.’ (Şoreşa Ereban, Destpêk, Sedem û Encamên wê, weşaneke ku ji aliyê hin rêxistinên Ereban hatiye amadekirin, Kahîre, 1916, r.146; konfêransa şehîdan, Beyrûd r. 145)”

Tevî van hemûyan jî em dibînin ku Osmanî di Yekemîn Şerê Cihanê de zeîf dibe. Di zivistanê de ku sala 1916’an digihîne ya 1917’an, bi sed hezaran Kurdan bi zorê ji Kurdistanê dişînin rojava. Di van sirgûnan de li gor hin belgeyan, 700.000 Kurdan jiyana xwe ji dest dane.

Bêyî em gotinê dûvdirêj bikin, rastiya Ermenîyan a em behsê dikin wisa ye ku di dema Osmanîyan de dest pê dike, wextê Îttîhadiyan de tê kûrkirin û her wiha di dema komarê de jî tê xwestin ku bi temamî bê qedandin. Belesebeb A. Ocalan ji bo Hrant Dînk negot, **“Ermenîyê Herî Dawî yê van xakan.”**

Xuya ye ku gelê Ermenî wek gelê herî qedîm ê van xakan, êşên zehf mezin kişandine. Ne mimkun e ku trajediya gelê Ermenî bi gotinan, jimarên bê îfadekirin. Divê neyê jibîrkirin ku hêzên kom-

kujer, qirker li rastê ne. Hê jî heta îro jî ev zîhniyeta qirker heye. Her kesên ku bi dîrokê dizanin dibêjin, Kurd û Emenî, dîsa Kurd û Asûrî, Kurd û Suryanî û tabî tevahî gelên ku li vê xakê jiyane, her tim di astek jor de li hev kirine. Di wan salên tarî de jî, Dêrsim ne li gor lîstoka Osmaniyan ne jî Îttîhadiyan tevgeriyaye. Her wiha, li gelek deverên Kurdistanê piraniya gelê Kurd jî neketine nav vê lîstokê. Berevajî, dema trajediya gelê Ermenî rû dide, Kurd bi xwe jî bi heman trajediyê hevrû dibin.

Di wan salên qirkirinê de mîna V. Gordlevskî jî mikur tê, “*di navbera Kurdên Misilman û Ermeniyên Xirîstîyan de ti roleke cudahiya olî tinebû.*” Heta nikare xwe bigire û hê wirdetir dibêje; “*Esas wek tevgerê asayî jî mêj ve Ermeniyên serdana Mizgeftên Misilmanan dikirin, Kurdan jî Dêrên Ermeniyên ziyaret dikirin.*”

Bêyî dirêjkirina gotinê eger em bi axaftinên dîroknas bînin ziman:

“*Li ser vî esasî nuqteya ku divê bê ziman ev e, piraniya Kurdên ku di qetlîama Ermeniyên de cih girtine, endamên yekîneyên leşkerî yên Alayên Hemîdî ne ku ji bo van karan bi rê ve bibin û berpirsiyariyê bidin ser milên Kurdan hatine damezrandin.*”

Hin begên eşîran û feodalên Kurd ên paşverû di van qetlîaman de cih girtine, lê ev e rastiyê neguherîne. Eger em diyar bikin wê sûdmend be ku hin axa û begên feodal ên diyar, li ba fermanîdarên Alayên Hemîdî ji bo karibin bêrika xwe tijî bikin, eraziyan qurbanîyên xwe desteser bikin û malên wan talan bikin wek firsendek baş lê mêze kirine.”

Tevî ku rastî wer in jî eger em Kurdan li dijî gelê Ermenî bi cih bikin wê ev bêînsafî be. Halbûkî em dizanin ku hêzên emperyalîst di dîrokê de ji bo van gelan bi hev bidin şikandin gelekî mijûl bûne. Me behsa Elmanan kir, ji vê hê girîngtir jî gotina Îngilîzan e ku salên 1895’an bi zanebûn berbelav kiribûn. Îngilîz dibêjin, “*Cihên mîna Sêwas, Elezîz, Wan, Bedlîs, Erzirom, Wan û Amed radestî Ermeniyên bînin kirin*” ango behsa Vilayat-i Sîtte tê kirin. Bi van gotinan ve Alayên Hemîdî – ku jixwe ji bo parastina Osmaniyan hatibû damezrandin- li dijî gelê Ermenî hê bêtir hatibû kişîşandin û me hewl da em encamên van li jor binivîsin.

Rastiyek bi heman rengî jî rastiyên Konferansa Sevrê ne ku em ê dûvre behsê bikin.

“Hedefa peymana 10’ê Tebaxa 1920’an, ne tenê formulekirina bidawîkirina Dewleta Osmaniyan bû, her wiha parçekirin û mîna nîv-mêtingehê veguherandina Tirkiyeyê bû. Di çarçoveya nîzamek wisa de ku eşkere ye ji aliyê Îngilîzan hatiye diyarkirin, di serî de Ermenî û Kurd, hin pirsgirêkên gelên herêmê jî di peymanê de hatibûn bicihkirin. Li gor hikmên peymanê, Îzmîr ji Tirkiyeyê tê qutkirin, teslîmî Yewnanîstanê tê kirin. Venêrîna Derbendên Stenbol û Çanakkale radeştî komîsyonek navneteweyî tê kirin. Sînorên xakên Tirkiyeyê yên li Ewropayê dimînin, tên diyarkirin. Tê hesibandin, tevahî giravên ku di nav avên bejahiya wê de bêne berdan, hejmara leşkerên wê dadixînin asta herî jêr. Û ji bilî hikmên din, li ser tesîsên aborî yên welêt kontrolek yekser tê avakirin. Tirkiyeyê tevahî biryarên ku Wîlayetên berê yên Osmaniyan rasterast dixist bin kontrola sîstema manda an jî dewletên mezin, qebûl dikirin.”

Her çiqasî naveroka peymanê wisa dixuye jî, rastiya wê teqez ne wiha ye. Rastiya wê, hê bêtir salek di ser re derbas bibe, encamên li Îngilîstanê ango Londonê ne. Ji ber ku li Londonê tê gotin ku eger Tirkiyeya ku wê siberojê bê avakirin, şertên wan qebûl bikin, wê demê dê biryarên peymanê ne derbasdar bin. William Eagleton têkildarî Peymana Sevrê gotinên *“hê dema înzekirinê, ji bilî metnekî mirî, ne ti tiştêkî din bû. Ji ber ku dirok ji aliyê M. Kemal ve cuda dihat nivîsandin”* bi valayî nekirine. Her wiha Dîplomatê Amerîkî George Kennan vala vala negotibû, *“trajediya mezin ên siberojê, di peymanên navbihurî de bi destê şeytan hatibû nivîsandin.”*

Pêwîstî bi dirêjkirina gotinê nîne, rastî ne mîna ya ku li ber çavan bû û hê jî wisa naqewimin. Çawa ku di paşerojê de di serî de hêzên navdewletî, zîhnîyeta faşîzan a dildarên Kizil Elmayê (Sêva Sor) ango Îttîhadiyan xwestibûn gelê Ermenî li dijî Kurdan rakin, îro jî heman zîhnîyet vê carê jî bi şiklên cuda dixwaze vê bike.

Abdullah Ocalan di sala 2014’an de bi nameyekê xîtabî gelê Ermenî kiribû. Em wê li vir bidin û dîsa li vê rastiya ku hê jî li ba vehûna dirokî hewl tê dayîn rojane jî wek pirsgirêkekê li dijî gelan bê danîn mêze bikin:

“Têkiliyên civakî yên sedan salan ên navbera gelên kevnare yên Mezopotamya û Anatolyayê, di sê sed salên dawî de serûbin bûne. Bi taybetî ji ber modernîteya kapîtalîst û jehra netewe dewlet a ku perestgeha wê ye, ev xak veguheriye goristana gelan û çandan. Projeyên afirandina neteweya monolîtîk ji Ewrûpayê heta Afrîkayê, ji Asyayê heta Awûstûralyayê û ji wir heta Amerîkayê hemû nîrxên mirovahiyê serberjêr kirine. Nirx û mîrateya çanda hezaran salan ji ser rûyê erdê birine, xalî kirine. Pêlên neteweperestî-nîjadperestî yên mîna xence-rekê xistine nava gelên me, bûne bingeha îdeolojîk a vê fela- ketê. Bi dehan çand û ziman di nava vî agirî de bûne xwelî, mîna hemanên nostaljîk jî hate roja îro nehatiye. Qederek gel bi sûcên mirovahiyê yên mîna qirkirinê ji holê hatin rakirin, gelek bawerî û çand jî di encama zextan de tinebûne. Kare- satên ku di sedsalên dawî de rû dane, karesatên mezintirîn in. Domahiya dîrokê de her tim şer û pevçûn bûne, lê ti ji wan mîna ya îro nikarîbû tinekirina mirovahî û xwezayê bikira hedef û di astek mezin de jî pêk baniya.

Ha, plana qirkirinê ya ku di destpêka sedsala bihurî de li dijî gelê Ermenî xistin meriyetê jî, ji van polîtîkayên qirêj yek ji ya herî zalim e. Rewşa ku gelê Ermenî tê de rastiya tam a qirkirinê ye. Li gel vê trajediyê jî gelê Ermenî karî xwe bigî- hêjîne roja îro, ev yek mûcîzeyeke mezin e. Bêguman ev mûcîze di encama ked û têkoşîna mezin a gelê Ermenî yê mazlûm de pêk hatiye. Di roja me ya îro de pêwîst e tevahiya cîhanê bi rastiya dîrokî ya gelê Ermenî jiyaye rû bi rû bibe, êşa gelê Ermenî parve bike û şîna wê bigire. Neçar e ku Komara Tirkîyeyê jî bi vê helwestê nêzî mijarê bibe û bi vê dîroka bi êş re hevrû bimîne.

Pêşniyara min a ji bo gelê Ermenî, ku nekeve nava feqa ne- teweperestî-nîjadperestiyê, xwe ji hêzên sermayeya nav- neteweyî ya pevçûnên sedan salan dixwaze û ji armancên zexel ên lobiyan dûr bixe û têkoşîna xwe dewam bike. Têkoşîna aza- diyê ya gelê Kurd û başkirina êşên gelê Ermenî, weke têkoşîna jiyana welatiyên xwedî mafên wekhev li vê axê di zik hev de meşiyane.. Komareke ku bi demokrasiyê ve bê tacîdarkirin, wê bibe komarek wisa ku hem bi paşaroja re hevrû dibe hem jî

tevahî nasnameyên cuda bi azadî di nav de dijîn. Dema ji vê çarçoveyê bê mêzekirin, em dikarin bêjin ku em ne tenê ji bo gelê Kurd; ji bo azadiya tevahî gel û baweriyên li vê erdnîgariya qedîm têdikoşin.

Ji ber vê ye ku ji bo Pirsgerêka Kurd çareser nebe, tevahî hêzên hundirîn û derveyî yên dijberî demokrasî di her pêvajoyê de astengî li pêş me danîne. Lê kengî me rêyên aştîyane ceribandîn, wê demê bi provokasyonên mezin pêvajoyê qut kirin. Du hêzên bingehîn hene ku ev derdor xwe dispêrê; perekapîtal û neteweperestî. Weke navgîn jî lobiyên sermaye yên mezin û di demên dawî de jî rêxistinbûyînen mîna camaetê bi kar anîn. Bi propagandaya; di navbera gelan de hê hesabên nehatine dîtin hene, hewl dane ji xwe re bingehêkî ava bikin. Halbûkî hemû gelên kevnare yên li ser vê xakê dijîn xwediyê vê xakê ne û ti tiştekî wan nîne ku parve nekin. Kurd, Tirk, Erebb, Fars, Ermenî; kîjan gel dibe bila bibe, hîqûqa navbera wan divê hîqûqa xwişkî-biratiyê ya xwe dispêre wekhevîyê be. Dijminatîya ku di nav gelan de hatiye avakirin, divê wek parçeyekî ji çanda me ya esasî neyê dîtin. Em neçar in ku em nehêlin ev bandora xwe li nîfşên siberojê bikin. Ev jî tenê bi aştîyek dîrokî dibe ku divê li ser edalet rast bê avakirin.”


BEŞA ŞEŞEMÎN: TEXRÎBATÊN KAPÎTALÎZMÊ Û DI SEDSALA 20'EMÎN DE BERXWEDAN Û ÎSYANÊN LI KURDISTANÊ

**Sykes-Pîcot, Osmaniya Belavbûyî, Rewşa Kurdistanê ya Piştî
Peymanên Sevr û Lozanê**

Peymana Sykes-Picot a ku herêma parçe kir, navê xwe ji Sir Mark Sykes û George Picot û Fransî digire. Ev peyman ku bi dîroka 9-16'ê Gulana 1916'an e, wê li Rojhilata Navîn û Kurdistanê şopên ku nayên jibîrkirin bihiştana. Esas Hevpyemana Sykes-Pîcot, eger li Rûsyayê Hikûmeta Sovyet a Sosyalîst şoreş nekiriba û desthilatdarî bi dest neanîba, tevahî peymanên veşartî yên ku ji aliyê îdareya Çarlikê hatine kirin, bi raya giştî re parve nekiriba, dibe ku ti carî nehatibûya zanîn. Li gor vê peymanê, wê Wîlayetên Erzirom, Trabzon, Wan û Bedlîsê ji Rûsan; Aladag, Kayserî, Akdag, Yildizdag, Zara, Egîn, Xarpût û peravên Edene, Dîlok, Riha, Mêrdîn, Amed, Lubnanê û Mûsilê ji Fransiyan re bima. Ji bo Îngilîstanê jî li gel Bexdayê wê Mezopotamyaya Başûr û benderên Hayfa û Akkayê bimana. Li gor peymanê, wê Fransa û Îngilîstan li xakên ji bo wan hatiye veqetandin, karîbûna îdareyeke ku *“dîlê wan dixwaze û difikirin ku wê ji bo Dewleta Ereban an jî Konfederasyona Dewletên Ereban guncav be”* saz bikin. Îskenderûn wê benderek serbest bûya, Quds û Filistîn jî wê biba xwedî statuyek navneteweyî ku detayên wê dê piştî bihatana diyarkirin. Tê fêmkirin ku peyman esas ji bo di demên pêş de Elmanya û Rûsya li ser Rêka Hindistanê nebe tehlûke hatiye amadekirin. Ji ber ku di wan salan de hebûna petrolê ya li Nîvgirava Ereban bi tevahî beşên xwe ve diyar nebibû.

Di peymanê Sykes-Picot de rewşa Kurdistanê jî wisa bi pêş di-keve. Wek tê zanîn, êdî ne sir e ku di navbera Şerîfê Mekkeyê û Siûd Huseyîn û Îngilîzan de gelek hevdiîtin û peyman hatine kirin. Wê ji bo Siûdên ku li dijî Osmaniyan şer bikin, teklîfa qraltiyan biçe. Ango wê bi destê bijartiyên Ereban ve bigihêjin statuyek

dewletî. Xwezayî ye ku dema statuyek bidin Ereban wê Kurd li derveyî vî karî bêne hiştin. Ya bûye jî ev e. Jixwe di 1921'an Konferansa Kahîre de zelal bibe ku ti statu nakeve para Kurdan. Em ê di Peymana Sevrê de bibînin ku beriya vê biryarê emperyalîstan ev mijar gelek caran nîqaş kirine, lê bi temamî negihiştine biryarekê.



Di Yekemîn Şerê Parvekirina Cîhanê de piştî ku Împaratoriya Osmaniyan li gel tifaqên xwe têkçûyî têne hesabandin, peymanên ku parçebûyî qebûl dike îmze dike, piştî vê jî êdî ji bo Kurdan pêvajoyek nû dest pê dike. Bi Mutarekeya Mondrosê ya 30'ê Cotmeha 1918'an, bê wê statuya gelên Ermenî û Kurd çî be dibe rojev. Paşê di nav bijartiyên Kurdan de zindîtî û lêgerînek cidî dest pê dike. Em ji bîr nekin ku Peymana Mutareke (Agirbestê) ya Mondrosê, di esas de heta astekê Osmanî radest girtibû. Wek çawa ku hema hema artêşa xwe bê çek kiribû, dema Osmanî li gor vê peymanê tevnegeriyaban jî jixwe her cure mafên xwe yên destwerdanê di xala 7. de veşartî hiştibûn.

Cemiyeta Kurdistan Tealî ya ku di sala 1918'an de tê damezrandin, di serî de Stenbol li Kurdistanê jî hewl dide xwe bi rêxistin bike. Li gel vê Tevgerên Kurd jî hêdî hêdî berê xwe didin Kurdistanê. Serwerên Kurd ên ku di nav Osmaniyan de bi daxwaza Kurdistanê Serbixwe derdikevin pêş, hem têkiliyên xwe li cem Osmaniyan domandine hem jî pêwendî li gel Îngilîz û Fransiyan qut nekirine. Ev beşên ku bi giranî burokratên Osmaniyan e, her du pêwendî jî li ba hev meşandine. Ji ber bi xwe ne bawer bûn, hesibandine ku dikarin piştî xwe bi derve germ bikin. Lê, tirsî ji Dewleta Ermeniyan ku di vê demê de tê gotin ku wê beşek mezin a xakên Kurdistanê bigire nava xwe, ji bo piraniya serwer û gelên Kurd dibe sedem ku destekê bidin Mûstafa Kemal ê ku dibêje *“Ez ê Osmaniyan rizgar bikim.”*

Jixwe; Osmanî li dijî Milliyetgiriya Ermeniyan, tevî Alayên Hemîdî, kişîşandinên li ser esasê polîtîkaya pevşîkandina gelan pêş xistine û qetlîam jî kirine. Ev helwesta ku di demên dawî yên Osmaniyan de wek berdewama têkiliyekê bi pêş ketiye, li ser esasê *“li dijî gawir yekgirtina Miletê Misilman”* e.

Abdullah Ocalan vê yekgirtinê wisa pênase dike: **“Dema ku li ser vê tifaqa serwerên Tirk-Kurdan, li rojava li rex êrîşên Yewnanan Rûm, li rojhilat jî îdîayên berfireh ên Ermeniyan zêde bûn, êşkere ye ku rastiya tekane, rêya rizgariyê ye. Cihêti, tew îcar dijberiya hev, wê yên di dest de mane jî bi rastî bibe.”**

Di Kongreyên Erzirom û Sêwasê de yekîtiya Kurd û Tirk tê destnîşankirin. Sedema vê ya esasî jî pêdiviya yekîtiya hêzê ya li dijî dagirkeran e. Tevgerên berxwedanê yên ku li Anatolya û Kur-

distanê li dijî dagirkeriyan di astek xwecih de ji xwe ber bi pêş ketine, piştî vê kongreyê dibin yek, li tevahî eniyan heyetên parastinê tên sazîkirin. Di vê demê de beşek ji Rêxistinên Kurdan, li ba Sultan tevdişgerin, yê din jî nebûne xwedî aktîvîteyek cidî. Meclîsa Gel a ji aliyê M. Kemal hat damezrandin, ji aliyê serwerên Kurdan jî hatiye destekkirin.

Piştî Meclîsa Stenbolê belav bû, parlamenterên revîbûn û nûnerên berxwedêrên li Anatolyayê di pêşengiya M. Kemal de li Enqereyê Buyuk Millet Meclîsî (Meclîsa Miletê Mezin) saz dikin. Meclîs, li Anatolyayê terhîsa Yekîneyên Osmaniyan radiwestîne, bi xwe ve girê dide, bi desteka Kurdan jî li Eniya Rojhilat şer bi ser dixê. Li Mereş, Dîlok û Rihayê gel bi rêxistinbûyîna xwe ve li dijî dagirkeriyê serkeftinê bi dest tîne. Paşê li rojava jî li dijî Yewnaniyan eniyek tê vekirin. Berxwedana ku li rojava hê dişewarî derbas dibe, bi desteka Kurdan ve dişewirê serkeftinê. Wisa jî Peymana Sevrê di warê pratîkî de bêbandor tê hiştin.

Mijdara 1922'yan li Lozan-Swîsreyê hevdiştin dest pê dikin. Û di heman salê de Tîrkiye wek netewe dewletek nû, sînorên Mîsaq-î Millî ya berê di 28'ê Çileyê 1920'an de ji aliyê Meclîs-î Mebûsan a Osmaniyan hatibû qebûlîkirin, di 24'ê Tîrmehê 1923'yan de tê qebûlîkirin û bi Peymana Lozanê bi encam dibe. Di vê peymanê de ku beriya ragihandina Komarê hatibû îmzekirin, ne tenê xapandinê e ku Îsmet İnönü xwe wek nûnerê hevpar ê Tîrk û Kurdan dide qebûlîkirin.



Ev gotinên ku ji devê Înonu derketine gelo dûvre hatine bîrê, nayê zanîn; *“Kurd, her daîm li Tirkîyeyê sûd ji mafê xwe yê hemwelatîbûnê wergirtine. Di warê siyasî û civakî de her tim bi hikûmeta Tirk re hevkarî kirine û ew ti carî wek hikûmetek biyanî nehesibandine. Li Meclîsa Tirkîye TBMM wekîlên wê hene. Bi awayekî çalak tevî karên hikûmet û rêveberiyê dibin... Mafên ku wê maf û rayeyên wê yên hemwelatîbûnê negire nav xwe û tê gotin ku wê mafên qaşo herêma xweser di nav xwe de vehewîne bê nasîn, ti carî nijadek bilind a mîna nijada Kurd tetmîn nekiriba...”*

(Hasan Yildiz, Konferansa Aştiyê ya Lozan)

Rastiya ku di bin vê îfadeyê de ye ew e ku meclîsa demê ya damezrîner wek Meclîsa Kurd û Tirkan dihat qebûlkirin. Di pêvajoyek wisa de ku tijî xeteriyên wilo ne, yekgirtina ku Kurd û Tirkan ji bo siberojek nû ya bi xwişkî-biratî bikaribin saz bikin xwe dabûnê, di astek stratejîk de dihat dîtin. Lê, rewşenbîrên Kurd ên li Koçgîrî ku rewşa li sehaya navneteweyî dişopandin, tehlûkeyê dibînin, ji bo pêkanîna Prensîbên Wilson, li Sêwasê bi Mustafa Kemal re dicivin. Alişan, Elişêr, Haydar Beg û Nûrî Dêrsimî bi awayekî nivîskî daxwazên Kurdan radigihînin.

Daxwazên wan:

- 1)-M. Kemal û hevalên wî dê Muxtariyetên Kurdan binasin,
- 2)- Tevahî Kurdên li girtîgehan wê bîn berdan,
- 3)-Memûrên ku ne Kurd in, wê ji Kurdistanê bêne vekişandin,
- 4)-Hêzên artêşê yên ku li herêma Koçgîrî-Dêrsimê hatine bicihkirin, bîn vekişandin,
- 5)-Di van xisûsan de bi lezgîni bersiva Dêrsimiyan bê ragihandin” ji aliyê Mustafa Kemal bi nermayî hatin pêşwazîkirin. Dema berxwedan jî dest pê dike, vê carê Ataturk bi ser Koçgîriyê de hêza leşkerî dişîne.

Di Îsyana Koçgîrî ya 1921’an de wê –ji aliyê Sakallî Nûreddîn, Nûreddînê Bîrîh- 140 gundên Kurdan bîn şewitandin, hilweşandin. Lê tevî vê jî M. Kemal di wan salan de li tevahî lîderên eşîrên Koçgîrî yên ku serî hildana, her çiqasî destpêkê gelekani jî wan dişîne sirgûnê jî, dîsa bang li wan dike û di nav avahiya nû de wezîfedar dike. Ji ber vê jî wê bê gotin ku *“di encam de rêka hatiye şopandin aşîxwaz e.”*

Lê rêbazên hatine bikaranîn gelekî hişk in. Şewitandin û hilweşandin bêyî hed û hesab in. Wisa ye ku pêkanînen li Koçgariyê li TBMM'ê dibe mijara nîqaşên zehf cidî. Eger em yek du nîqaşên li meclîsê li vir bidin wê gotinên me hê baştir bêne fêmkirin.

Ji Waliyên demê yên Sêwasê Ebûbekîr Hazim Tepeyran: *“Bûyera Umraniyeyê, di bin xirbeyên 132 gundan de beriya niha demek dirêj hatiye tepisandin. Ji bilî nifûsa nêzî 300 kesî ku hatin kuştin, bi hezaran bêsûc, gel bi birçîbûnê, tinebûnê mehkûmî mirinê hatine kirin...”* (Zekî Sarihan, **Rojaneya Şerê Rizgariyê**)

Parlamentê Erziromê Huseyîn Avnî jî dibêje; *“Behsa 180 gundên ku hatine kavilkirin, tê kirin.”* (**Zabitnameyên Celseya Veşartî ya Meclîsa Tirkîye TBMM**)

Gotinên Parlamentê Erziromê Mûstafa Dûrak hê ecêbtir in: *“Hikûmet mîna çeteyek dizan destên xwe xistine qirika gel, her tiştê wê talan dike, dibe, lê dide, dike, dûvre tine dike...”* (**Zabitnameyên Celseya Veşartî ya Meclîsa Tirkîye TBMM**)

Hevokên Parlamentê Erzînganê Emîn Beg jî di esas de asta faşîzmê, hovîtiyê hê zelaltir radixe ber çavan *“(Nûrettîn Paşa) dibêje min dor lê pêça. Û kê digire dike, dest diavêjê, êrîşî namûsan dike. Ez rîca dikim, kî jî we dikare li beramberî vê karesatê sebr bike? Zarokên sê salî jî nikarin li beramberî vê tehamul bikin. Û dema hûn bi tiştêkî wisa re hevrû bûn, ez rîca dikim, gelo hûn ê guleyan lê nebarînin? Efendîno, li kû derê cîhanê tiştêkî wisa hatiye dîtin ku di destê kurekî de werîsek, di destê kurekî din de jî werîsekî din û tam 6 saetan bav tê kaşkirin û wisa bi sosretî tê kuştin. Ez rîca dikim efendîno, hûn ê li beramberî vê rewşê nebin asî?”* (**Zabitnameyên Celseya Veşartî ya Meclîsa Tirkîye TBMM**)



SERHILDANA KOÇGIRÎ

Bi awayekî hemreng, daxuyaniyên demê jî bo nasîna Kurdan e. Tamîma Amasya, fermanên ku ji femandariya El Cezîre re hatine şandin, Daxuyaniyên Çapemeniyê yên Îzmîrê bi temamî xurtkirina jiyana Kurd û Tirkên tînin ziman. Her tim tespît jî ew e ku Tirk bêtir Kurd, Kurd jî

bêyî Tirk zeîf in û ev wê kêrî hinên din were. Di encam de ev rewş pevgirtinekê tîne.

Statuya îro ya Kurdistanê Mêtingeha Navdewletî, di encama Konferansa San Remo de ku 18-26'ê Nîsana 1920'an nîqaşên wê berdewam dikirin û bi peymanê ku di encama vê konferansê de hat îmzekirin dihat diyarkirin. Her çiqasî li ser vî esasî Konferansa San Remo nayê ziman jî, lê konferansek girîng e. Li vir esas Rojhilata Navîn di nav emperyalîstan de tê parvekirin. Li gor vê parvekirinê; wê Iraq û Filistîn ji Îngilîstanê; Sûriye ji Fransayê; Anatolya ji Îtalyayê, herêma Edene, herêma Cizîrê ji Fransayê; Kurdistanê Navîn di serweriya Îngilîzan, Herêma Wîlayetî Sîte (ango 6 wîlayetên Kurdistanê) ji Ermenîstanê; beşek mezin a Trakyayê, Îzmîr wê ji Yewnanîstanê re bihatana hiştin. Derbendên ku ji bo dewletên emperyalîst gelekî girîng bûn jî wê ji komîsyonek navneteweyî re bihatana hiştin. Ji bo vê rewşê jî ji Heyeta Tirkiye ya ku wê demê hê aîdî Dewleta Osmanî dihat hesibandin, dihat xwestin ku têkildarî van biryaran di demeke kurt de helwestên xwe ragihînin.

Sevr, dema di 10'ê Tebaxa 1920'an de hatibû îmzekirin, Ermenîstanek serbixwe, Kurdistanek Xweser û Tirkiyeyek biçûkbûyî pêş didît. Kurd jî bi fikra ku wê xakên wan biçûk bibe û her wiha li dijî Xirîstîyanan jî cihgirtina li ba Misilmanan wê pêdiviya dilsoziya xelîfetiye bûya.

Peymana Sevrê kiribû biryar ku li ser xaka Osmaniyan, Dewletek Kurdistan (û Ermenîstanê) bê damezrandin. Û tabî wê ji dagirkeran re jî xakek zehf mezin bihata hiştin. Em bibêjin ku Sevr di esas de lîstokek emperyalîstan e, wê ne zêde şaş be. Ango, mîna *"bisekinin wê helaw erzan bibe"*, wê poxên (lîstokên) emperyalîstan jî piştî 80 salan li Iraqê bihata dîtin. Nexşe wer hatiye çekirin ku her dem û her çax şer bidome! Li cihekî ku nakokî û şer zêde ne jî navbeynkar dibin xwedî rolên baş. Eynê wek îro çawa li Iraqê Îngilîz hem li ba Kurdan hem Sunîyan hem Şîîyan hem Asûriyan hem Êzidiyan hem Eşîran û her çiqasî kêmnîeteweyî û komên baweriyên olî hebin li ba wan bin, wê heman li Tirkiyeyê jî bibûya. Her tim bêistîqrarî û di encam de her tim rewşa şer...

Xalên 62, 63 û 64. ên vê peymanê, têkildarî sazkirina Dewleta Kurdistanê Serbixwe bû. Bi xala 62'yemîn a peymanê ve Kurdis-

tan wek; herêmên navbera başûrê Ermenîstanê ya li rojhilatê Firatê ye û wê sînoren wê di demên pêş de bêne tespîtkirin û bakurê Tirkîye, Sûriye û Mezopotamyayê ne û her wiha piranî jî Kurd lê serwer in, pênase dikir. Xala 64'emîn statuyek bi vî şiklî pênase dikir: *"Kurdistan wê pêşî wek avahiyek îdarî ya otonom di bin garantortiya hikûmetên Îngilîstan, Fransa û Îtalyayê de bima. Di nav salek bihurî de gelê Kurd, ango piraniya gelê li vê herêmê rûdinê, eger bixwaze bi temamî ji Tirkîyeyê veqete û bi temamî serbixwe bibe û serî li Cemiyeta Neteweyan bide û Cemiyet jî qeneet bîne ku ev gel xwedî wê kapasîteyê ye ku dikare daxwaza xwe ya serxwebûnê pêk bîne û pêşniyar bike ku vê bi cih bîne, Tirkîye garantî dike vê wer pêk bîne û dest ji tevahî mafên xwe yên li vê herêmê berde."* Beşa têkildar a beşê wiha bi dawî dibû: *"Piştî ku Dewleta Kurdistanê serxwebûna xwe pêk anî, eger Kurdên li Wilayeta Mûsilê ya parçeyekî Kurdistanê ye, bixwazin tevî vê Dewleta Kurd a serbixwe bibin, wê hêzên hevalbend bi ti şiklî îtiraz nekin."*

Sewr, wek li jor jî hat ziman, di 10'ê Tebaxa 1920'an de pêk hatibû.

Em ji Konferansa Parîsê ya ku ji sala 1919'an heta sala 1921'an dewam kiribû dizanin ku Sevr lîstokek bû. Wê ne şaş be ku eger em bêjin di meha Çileyê 1921'an de Îngilîz û Fransîzan di gelek xalan de li hev kirine. Di vê konferansê de cih bi cih 32 welat amade bûne.

Konferansek din a girîng jî Konferansa Londonê ye ku ji 21'ê Sibatê heta 14'ê Adara 1921'an dom kiribû. Di vê konferansê de qaşo mafên ku di Sevrê de ji Kurdan re hatibûn pênasekirin, hatin betalkirin. *"Dema Konferansa Londonê ji bo peymanê di ber çavan re derbas bike kom bû, dewletên îtîlafê bi ferasetê ku dijberî statukoyê bû, zûzûka ragihandin ku di mijara Kurdistanê de amade ne ku guhertinan bikin. Lêkolînanê navdar ê peymanên aştiyê Temperley, di demek pir zû de ji ber vê sedemê bû ku ji cidîbûna xalên têkildarî Kurdan ên Peymana Sevrê ket nav şik û gumanan."*

Sedemên wê hebûn ku Peymana Sevrê ji aliyê Willîam Eagle-ton bi gotinên *"hê dema înzekirinê, ji bilî metnekî mirî, ne ti tiştekî din bû"* dihat pênasekirin. Ji ber ku di vê konferansê de biryar girtin ku eger Tirkîye, di vê rewşê de Tirkîyeya ku di pêşengiya

Mustafa Kemal de tédikoşiya, Derbend û herêmên ku navên wan hatine diyarkirin ji emperyalistan re berda, wê demê dê biryarên Sevrê revîze bikirana.

Ya ku wê statuya Kurdistanê, bi gotinek hê rasttir bêstatubûyîna Kurdistanê bi encam bike jî piştî Londonê, Konferansa Kahîreyê ye ku 24'ê Kanûna 1921'an (li hinek belgeyan de ev dîrokê wek Adar derbas dibe) wê li Kahîreyê pêk bihata. Bi Konferansa Kahîreyê ve wê mijara Kurdistanê bihata taloqkirin, lê ji bo li herêmê were bikaranîn jî wê bi veşartî biryarê bigirin ku wek çoyekî Kurdistanek biçûk di bin venêrîna wan de bê damezrandin. Îmzeyên ku di vê konferansê de li bin van biryaran ketin, dibe sedema bêstatubûyîna Kurdan a sed salan û hê jî tevî ku têkoşîne dêwasa jî di sehaya navneteweyî de neyên qebûlkin. Di bin rêka Lozanê de teqez e ku ev rastî hene. Eger ne wisa bûya, wê demê çima tam 90 salan di pêkanîna biryarek wisa bêmaf, bêdalet de ku gelekî tine dihesibîne, ewqasî israr hebe?

Eger em bidomînin: Bêguman hesabên Kurdistanek serbixwe yan jî veqetiyayî jî hebûn. Jixwe kevneşopîya bijartiyên Kurd –li gor karakterên wan- a ku bi awayekî neynî pêwendiyê li ba hêzên derve datîne hebû. Li gor hesabên wan, xwe bikirana dûvikên hêzên derve, xwe li ber çavên wan şîrîn bikirana, bêbawer nêzî gelê xwe bibûna wê karîbûna bibûna hêz. Lê dema serpêhatiyên Mahmût Berzencî yên di 1919'an de li ber çavan bê girtin, ku Îngilîzan Şêx M. Berzencî di heman salê de girtin û sirgûnî Hindistanê kirin, nîşan dida ku hêzên derve her tim ne ew ûnsur in ku bawerî pê were. Di vê nîvekê de eger tehrîk û kişîşandinên ji derve tînin organîzekirin, li Kurdistanê Îsyane Asûriyan û kişîşandina li dijî Kurdan li ber çavan bê girtin, eger bi qismî jî nêzîkatîyek lihevkinin nîşanî Kurdan bê kirin, wê demê dikaribûn Kurd ber bi rexê Tirkan ve bihatana kişandin. Û herî dawî jî jixwe ev bû. Kurd, di dîroka xwe de cara sêyemîn dest da Tirkan û dibûn alîkar ku ji dîrokek tijî tehlûke derbas bibin. Ev jî wê bi Peymana Lozanê bibûya. Çi bû Lozan?

“Peymana Lozanê, peymanek wisa bû ku sînorên Tirkîyeyê xet dikirin û hebûna Dewleta Tirkîyeyê ava dikir. Heyeta ku temsîla Tirkîyeyê dikir û rêveberiya ku li Enqereyê hatibû sazkin, xwe wek rêveberiya hevpar a Tirk û Kurdan îfade dikir. Lê, di Peyma-

na Lozanê de navê Kurdan derbas nebû, cih negirt. Di hevdîtînen Lozanê de nûnerên Kurdan cih negirtin. Tevî sînorên Tirkiyeyê hatin xetkirin, tevî gotin Tirkiye xaka Tirk û Kurdan e, tevî gotin dewleta hevpar a her du civakan tê avakirin, ev ne bi fermî hatin nivîsandin ne jî ti heyetên ku nûnertiya Kurdan dike di hevdîtînen Lozanê de cih girt. Kurd tevî nebûn, di Lozanê de tine hatin hesibandin.

Esas Kurd tevî nebûn, lê ev nayê wê wateyê ku di hevdîtînen Lozanê de behsa Pîrsgirêka Kurd, Kurdistanê nehatiye kirin. Na; nîqaşên gelekî tûj, heta nîqaşên herî tûj li ser Pîrsgirêka Kurd çêbû. Nîqaşên herî hişk li ser Pîrsgirêka Kurd bûn, li ser Kurdistanê bûn. Ev bi belgeyan sabit in. Heyeta Kemalîst a di pêşengtiya Îsmet Înonu de, kengî tengav bû xwe wek nûnerê hevpar ê Kurd û Tirkan pêşkêş kir. Li dijî vê Îngilîstan û Fransa jî dem bi dem, bi daxwaznameyên ku ji aliyê nûnerên cuda yên Kurdan hatine îmzekirin, mijar anîn rojeva hevdîtîne. Mînak, di Împaratoriya Osmanîyan de ji Ataşeyên Swêdê Kurd Şerîf Paşa heye. Xwestin daxwaznameya ji wî girtine ya mîna 'em van mafan dixwazin' bi kar bînin. Dem bi dem Şerîf Paşa xistin rojeva Lozanê. Û bi vî jî hewl dan gefan li heyeta di pêşengtiya Îsmet de bixwin, hevsengiyê ava bikin. Di encam de wek çawa sînorên Tirkiyeyê yên Iraqê nehatin xêzkirin, her wiha Kurd jî tine hatin hesibandin. Li qadên din sînorên Tirkiyeyê hatin xêzkirin. Pîrsgirêka Derbendan hat çareserkirin. Civaka Tirkiyeyê hat pênasekirin. Bi taybet jî kêmetewe û mafên wan hatin diyarkirin. Navê Kurdan di yek du deverên giştî de derbas bûn.

Tevî ku ji sêşeyan yekê dewletê pêk tînin jî navê vê civakê tê de derbas nebû. Esas tine hat hesibandin. Binkulav kirin. Aliyên ku li ser Kurdistanê bi dijarî tédikoşîyan, nikaribûn li hev bikin, di encam de Kurd tine hesibandin, tékildarî Civaka Kurd ti tiştek nexistin nav metnê lihevkin û wisa li hev kirin. Înkara Kurdan wisa çêbû û dest pê kir. Dûvre, rêberên Eşîrên Kurdan û olî jî vê encamê keyfxweş nebûn. Li dijî vê îtiraz pêş xistin û îşyan kirin. Li Bakurê Kurdistanê kirin. Li Başûrê Kurdistanê îtiraz kirin. Li Rojhilatê Kurdistanê îtiraz û îşyan kirin. Lê ev îşyanan jî asta eşîrperestiya feodal nebihurîn. Nehatin ew asta tevgerek rizgariya neteweyî ya bi rêxistî û tégihîştî. Di encam de ji aliyê sistema

avabûyî hatin pelçiqandin. Hatın tepisandin. Bi Qetliaman ve Civaka Kurd hat bêdengkirin.” (Selahattîn Erdem)

Çawa ku di sala 1071’an de deriyê Anatolyayê li Melazgirê ji Alparslan re hat vekirin û çawa ku di sala 1514’an de Deriyê Rojhilat ji Yavûz Sultan Selîm re hat vekirin û xeta împaratoriya cihanê da ber, vê carê jî pêşiya tinebûyînê û herikandina ber bi nediyarî ji bo Tirkan, dîsa Kurdan girtine. Ev piştewanî û şîrîkatî heta avabûna TBMM’ê diçe. Meclîs, di destpêkê de meclîsa hevpar a Kurd û Tirkan e. Bi peymanek nû ya ku 24’ê Tîrmeha 1923’yan bi Komara Tirk re tê îmzekirin, hîmê dewleta netewe ya îro tê danîn.

Têkildarî Nêzîkatiya Mustafa Kemal a di Salên 1919-1923’yan de li Hember Pîrsgirêka Kurd

Metnê Mustafa Kemal a Civîna Çapemeniyê ya Qesra Îzmîtê ku bi dîroka 17’ê Çîleya 1923’yan e, bi salan di qaseya dewletê de hat veşartin. Heta ku herî dawî di sala 1988’an ji Arşîva Anitkabîrê hat derxistin û weşandin. M. Kemal di hevpeyvîna xwe de ku li ba rojnamegeran dike, wisa dibêje: *“Pîrsgirêka Kurd; ji bo berjewendiyên me angî Tirkan jî teqez nabe. Ji ber ku weke hûn jî dizanin, ûnsûrên Kurd ên di nav sînorekî me yên neteweyî de wer bi cih bûne ku, li cihekî sînordar hejmara wan zêde ne. Lê, bi windabûyîna zêdebûyîna wan û ketina wan a nav ûnsûrên Tirk de, eger em bixwazîn sînorekî wisa xet bikin, divê em Tirkbûyînê û Tirkiyeyê mehf bikin... Ser meselê, divê em li sînorekî wisa bigerin ku heta Erziromê biçê, heta Erzîngan Sêwasê biçê, heta Xarpûtê biçê. Û heta, divê em Eşîrên Kurdan ên li çolên Konyayê jî li ber çavan bigirin. Lewma jî li şûna ku em Kurdbûyînek bi tenê serê xwe bihizirin, jixwe li gor Destûra me ya Bingehîn wê cureyeke Xweseriya Xwecih pêk were. Wê demê gelê kîjan bajarî Kurd bin, wê karibin bi xweserî xwe bi rê ve bibin. Ji bilî vê gelê Tirkiyeyê dibe mijara gotinê, divê em wan jî (Kurdan jî) pevîre îfade bikin. Dema neyên îfadekirin, tê payîn ku her tim têkildarî vê jî bo xwe pîrsgirêkan bibînin. Niha, Meclîsa Miletê Mezin a Tirkiyeyê (TBMM) hem ji parlamenterên rayedar ên Tirkan hem jî ji yên*

Kurdan pêk tê û van her du hêmanan jî tevahî berjewendî û sibe-
rojên xwe kirine yek. Ango ew dizanin ku, ev tişteki hevpar e. Wê
ne rast be ku sînoreki cuda bê xetkirin...” (Arşîva Saziya Dîrokê
ya Tirk, Belgaya Hejmar 1089)

Ji nivîsên Gunerî Cîvaoglu ya têkildarî “**Di Zabîtnameyên
Veşartî yê Meclîsa Tirkîye TBMM’ê de Kurd**” em ragihînin:

“Heyeta Wekilan a BMM, bi îmzeyê ‘Reîsê Meclîsa Miletê Me-
zin Mustafa Kemal’ ji Femandariya Eniya El Cezîrê nivîsê dişîne
û fermanê dide ku wek ‘pêdiviya siyaseta hundir û derve’ divê
‘îdareyên xwecih’ bêne sazîkirin. Di zabîtên Meclîsê de tomarkirî
ne ku fermana di 22’yê Tîrmeha 1922’yan de di rûniştina girtî ya
TBMM’ê de hatiye xwendin, di 27’ê Hezîrana 1920’an de hatiye
şandin.

...ev pêşnûme, piştî 6 mehan dibe hikmê destûra bingeîn.
Qanûna Teşkilatî Esasiye ya 20’ê Çileyê 1921’an, sîstema îda-
reyên xwecih pêş dîtiye. Tê fêmkirin ku di Hezîrana 1920’an de ji
bo hin herêmên Kurdan îdareya xwecih bikeve meriyetê, rêkûpêk-
kirinek taybet ketiye meriyetê. Ûgûr Mûmcû jî tespît kiriye ku ev
ferman ‘biryarek veşartî’ ye ku ji aliyê hikûmetê hatiye girtin.

Femandarê Eniya El Cezîrê Nihat Paşa bi xwe diyar dike ku
biryara hikûmetê ‘fermanek taybet a derheqê Kurdistanê de ye.’

NAVEROKA XALAN

Xala yekemîn a fermana ku ji aliyê hikûmetê hatiye amadekirin,
wiha ye:

“1. Ji pêdiviya siyaseta me ya hundirîn û derveyî ye ku gav bi
gav li giştî welat îdareyên xwecih ên ku gel karibe yekser û di as-
tek berfireh de pê re eleqeder bibin û tê de bi bandor bibin bîn
sazîkirin. Li herêmên Kurdan jî, em wek pêdiviyêke hem siyaseta
me ya hundirîn û hem jî siyaseta me ya derveyî lê mêze dikin ku
gav bi gav îdareyek xwecih bê sazîkirin.”

Di xala duyemîn a fermanê de jî tê xwestin ku li gor mafê tayîn-
kirina qedera gelan, Kurd ragihînin ku dixwazin di îdareya Tirkî-
yeyê de bijîn û îdareyên xwe yê herêmî sergihayî bikin.

Di xala sêyemîn de jî tê xwestin ku “Li Kurdistanê Kurd li dijî
Fransiyan û li sînorê Iraqê jî li dijî Îngilîzan sewqî şerê çekdarî

bên kirin.” Wek wezîfe tê diyarkirin ku dijminahiya Kurdan a li dijî Fransiyayê û bi taybet jî Îngilîzan, “bigihêje asteke jêneveger û lihevkarîna Kurd û biyaniyan bê astengkirin.” Bi berdewamî vê fermanê didin Kurdan: “sedemên avakirina îdareyên xwecih gav bi gav bên îzahkirin û wisa bibe ku bi dil û can bi me girêdayî bibin.”

Hincet: Wek Pêdiviya Siyaseta Hundir û Derve

Tiştê ku bi siyaseta hundir behsa wê tê kirin, mafên Kurdan e. Jixwe wê dema ku Atatürk vê fermanê dinivîse, roja 1'ê Adara 1922'yan wisa diaxive, “rêzgirtina ji bo hiqûqa nîjadî, hiqûqa civakî û şertên havîrdorê ji esas nuqteyên siyaseta hundir in.”

Di beşên fermanê de ku ji bo herêmên Kurdan hatiye nivîsandin, li şûna îfadeya “îdareyên xwecih”, îfadeya “îdareyek xwecih” hatiye bikaranîn. Eger em bînin bîra xwe ku ji bo tayînkirina qedera van herêman hatiye qebûlkirin ku referandûm bê kirin jî, tê tespîtîkirin ku ji bo sazîkirina rêveberiyek xweser gav hatine avêtin.

Di fermanê de tê gotin ku li herêmên Kurdan sazîkirina îdareyên xwecih di heman demê de wek pêdiviyek ji siyaseta derveyîn e jî. Di wê demê de dewletên mezin, bi taybet jî Îngilîstan ji bo Kurdan ji xweseriyê heta serxwebûnê sozên cur bi cur didan. Em ji Belgeyên Cemiyeta Hiqûqa Mudafaa û Protokola Amasyayê dizanin ku Tevgera Neteweyî ji bo vê xebatê bêbandor bike, biryara ‘pêkanîna serbestiya pêşketina Kurdan’ daye. Pêdiviya ku ‘ji dil û can’ girêdana Kurdan sedema esasî ya polîtîkaya ‘îdareyên xwecih’ îzah dike.

Li gor biryara hikûmetê, li gel Rêxistinên şoreşger ên Kurd ên li Mûsil û Iraqê xebatên hevpar hatine kirin. Nihat Paşa, li dijî kontrola Îngilîz û Fransiyayê a li herêmê, çek li ser Eşîrên Kurdan belav kirine, heta hiştîye ku Kurd li Necefê hikûmet û Meclîsek demkî jî saz bikin.

Hikûmeta BMM'ê li ser vî esasî ji Fermendarên Kuvayî Milliye ya Dîlokê Albayê Milîs Ozdemîr Beg di bihara 1922'yan de şandîye herêma Rewanduzê.

Her wiha heyetek di serokatiya Waliyê Mûsilê Haydar Beg de hatiye wezîfedarkirin ku Lîderên Kurdan Simko û Şêx Taha bibînin. Hevdiştin di 15'ê Hezîranan 1922'yan pêk tê. Piştî vê hevdiştinê, Simko Eşîrên Kurdan ên girîng li herêmê kom dike û biryara berxwedanek hê mezintir digire.

Di Raporên Îngilîzan de jî heye ku ji destpêka sala 1922'yan ve li Mûsilê meyla alîgirtiya Tirkîyeyê zêde bûye û Eşîrên Kurdan bi veşartî pêwendîyan li cem Mûstafa Kemal Paşa datînin.

Rêbertiya Têkoşîna Neteweyî, bi awayekî serkeftî li dijî Îngilîzan eşîrên Kurdan xistine nav liv û tevgerê. Rojek piştî serkeftina 30'ê Tebaxa 1922'yan, serkeftinek jî li Eniya Iraqê tê bi-destxistin. Hêzên Kurd ên di bin Fermandariya Ozdemîr Beg de, hêzên Îngilîzan di Şerê Derbendê de têk dibin û roja 18'ê Îlona 1922'yan de Navçeya Şeqlewa dagir dikin."

Orjînala mesaja ku ji Fermandarê El Cezîrê Tuggeneral Nîhat Paşa re hatiye şandin, wiha ye:

"Bi taybet ji bo takekes e.

Ji bo Fermandarê Eniya El Cezîrê Tuggeneral Hezretî Nîhat Paşa,

1- Ji pêdiviya siyaseta me ya hundir û derve ye ku gav bi gav li giştî welat îdareyên xwecih ên ku gel karibe yekser û di astek berfireh de pê re eleqeder bibin û tê de bi bandor bibin bîn sazkin. Li herêmên Kurdan jî, em wek pêdiviyeke hem siyaseta me ya hundir û hem jî siyaseta me ya derve lê mêze dikin ku gav bi gav îdareyek xwecih bê sazkin."

2- Rayeya xwerêveberiya neteweyan, rêgezek wisa ye ku li tevahî cîhanê hatiye qebûlkin. Em jî vê rêgezê qebûl dikin. Divê bê weşandin ku Kurdan heta vê demê têkildarî rêveberiyên xwe yên xwecih rêxistinên xwe saz kiribin û tevî serokên xwe bi dîtina me ji bo vê armancê rayeyên xwe bi dest anîbin û di dema dengdayinê de daxwaza wan a jiyana di bin fermandariya BMM (Meclîsa Milletê Mezin) de bê ragihandin ku bi rastî jî xwedî qedera xwe ne.

3- Li Kurdistanê dijminahiya Kurdan a li dijî Fransîyan û li sînorê Iraqê jî li dijî Îngilîzan bi şerê çekdarî bigihêje asteke jênevêger û lihevkirîna Kurd û biyaniyan bê astengkirin, gav bi gav bingehe damezrandina rêveberiyên xwecih bê amadekirin û wisa

bibe ku bi dil û can bi me girêdayî bibin, Rêveberên Kurd bi wezîfeyên sîvîl û leşkerî bên erkdarkirin û girêdana wan bê peyitandin.

4-Polîtîkaya hundirîn a Kurdistanê wê ji aliyê Femandariya Eniya El-Cezîre bê diyarkirin û rêvebirin. Femandariya Eniyê di vê mijarê de ji Serokatiya Meclîsa Miletê Mezin re dinivîse. Ji ber wê rêka ji aliyê bajaran ve bê şopandin rêkûpêk bike, di vê mijarê de rêveberên sîvîl jî girêdayî Femandariya Eniyê ne.

5- Femandariya Eniya El-Cezîre dema di mijarên rêveberî, edalet û darayî de pêdiviyê bi guhertin û sererastkirinê bibîne, pêkanîna vê ji hikumetê re pêşniyar dike.

Serokê BMM

Mûstafa Kemal. “(Zabitnameyên Celseya Veşartî ya Meclîsa Tîrkiye TBMM, Türkiye İş Bankası Weşanên Kultur, Enqere, 1985, Cild: 3, Rûpel: 550)”

Di Tamîma Amasyayê de jî gelê Kurd û Kurdistan bi vî şiklî tê pênasekirin û nasîn:

“BELGE: 12

“CIHÊN KU KURD Ê TIRK LÊ DIMÎNIN”

Xala Yekemîn a Girtoka Protokola Amasyayê bi van hevokan dest pê dike:

“Di xala Yekemîn a danezanê de piştî hat diyarkirin ku sînorên Dewleta Osmaniyan ên ku tîn fikrandin û qebûlkin, ji ber warên Tirk û Kurdan di nav xwe de dihevwîne û bêderfet e ku Kurd ji Koma Osmaniyan veqetin, bi hevparî hat qebûlkin ku ev sînor herî kêr wek daxwazekê bê bidestandin. Li gel vê jî bo pêşî li derewên biyaniyan ên di bin armanca qaşo serxwebûna Kurdistanê de bi pêş dixin bîr girtin, guncav hat dîtin ku ev rewş ji niha û şûn de ji aliyê Kurdan bê zanîn...” (Ansîklopediya Yûrt, Cild: 1, Xala Amasya.)

Fobiya belavbûyîn û parçebûyîn a aliyê Tirk û bi taybet jî hewldanên Îngilîzan ên li Mûsil-Kerkûkê balkêş in. Dema Kurd bi alîgirtiya sultetî û xelîfetiye derketin, bi germahî nêzî komarê nebûn û dewletê hewl da otorîteyên xwecih teng bike, de îcar li ser vê tehrîkên derve jî zêde bûn, wê demê yekîtî her ku çû parçe bû.

Ji ber ku di nav Kurdan de lîdertiyeke ku pêvajoyê bixwîne û li gor wê çareseriyên bi pêş bixe derneket, di nav Tirkên de jî nêzîkatiyek Tirkîst bi pêş ket, wê demê Tirk û Kurd ji hev dûr ketin. Reformên bi rengê rojavayî yê mîna rakirina xîlafetê û wek zimanekî fermî qebûlnekirina zimanê Kurdî, êdî ji bo berxwedanan derî heta dawî vedike.

Berxwedan, Îxanet û Sedemên Nerserketîne

A) Cemiyeta Azadî

Di 1923'yan de li herêma 8. Kolordû (Parleşker) ya ku navenda wê Erzirom e, rêxistinek nû tê avakirin. Dendika vê cemiyeta nû ya bi navê “Azadî”, ji efserên berê yê Alayên Hemîdî û hin efserên Kurdistanî yê di nav Artêşa Tirk de pêk tê. Sedema wê ya damezrandinê jî ew bû ku sozên berê hatibûn dayîn bi cih nehati-ne.

Lîderên Cemiyeta Azadî ji rûsîyên Eşîra Cîbran Xalîd Begê Cîbranî û ji begên Bedlîsê Yûsûf Ziya Beg bûn. Xalîd Beg, di mektebên eşîran de ku Ebdulhemîd ji bo Artêşa Hemîdî ava kiribû, gihabû. Ji ber vê jî gelek lîderên eşîran bi rêzdariyek mezin nêz dibûn. Albayekî artêşa nîzamî bû. Yûsûf Ziya Beg jî li Bedlîsê bi bandor bû. Ji bo Meclîsa Enqereyê ji Bedlîsê wek parlamenter hatibû hîlbijartin. Ji ber vê pozîsyona xwe jî dikaribû bi rehetî tevbigeriya. Xalîd Begê Cîbranî jî dixwest mijara Kurd ji Cemiyeta Miletan re ragihîne. Her wiha di nav rêxistina Azadî de jî efser hebûn. Ew jî ev bûn; ji Bedlîsê Îhsan Nûrî, ji Silêmanî Mulazim Îsmail Hakî Şaveys û Hortûmlû Hûrşîd, Dr. Fûat, hin zarokên Cemîl Paşazade û hwd.



Xalîd Cîbranî

Cemiyeta Azadî di sala 1924'an de kongreya xwe ya yekemîn li dar dixe. Di nav beşdaran de Şêx Seîd ê xizmê Xalîd Beg jî heye. Di vê civînê de biryar hatibûn girtin ku di Gulana 1925'an de Îsyan dest pê bike û heta wê rojê jî li her derê rêxistina Azadî bê pêşxistin û her wiha *'li ba hêzên derve pêwendî bên danîn'*. Wek

hedef Kurdistanek Serbixwe hatibû diyarkirin, lê propagandaya bi rengê olî jî ji aliyê Şêx Seîd hatibû pêşniyarkirin.

Yên di nav Cemiyeta Azadî de cih digirtin, Xalîd Begê Cîbranî (Serokê Şaxa Navendî ya Erziromê), Huseyîn Paşayê Kor (Fermendarê Milisên Haydaranê, Serokê Şaxa Melazgirê), Yûsûf Ziya Beg (Serokê Şaxa Bedlîsê), ji malbata Cemil Paşa Ekrem Beg (Serokê Şaxa Amedê), Seyîd Abdulqadir (Serokê Şaxa Stenbolê) bûn. Li gor lîsteyê, eger îşyan dest pê bike wê yê teqez tevli bibûna jî ev in: Hecî Mûsa Beg (Serokeşîrê Motkî û endamê berê yê Meclîsa Nûneran), ji Garzanê Şêx Selehaddîn, ji Pinciranê Cemilê Çeto (Bedlîs), ji Mîlanê Mahmûd Begê kurê Îbrahîm Paşa, ji Şîrnexê kurên Abdurrahman û Suleyman Axa. Hin navên bi bandor ên li şaxa Amedê jî wiha ne: Kadrî Cemil Paşazade, Dr. Fûad, wekilê dozê Mehmet Efendî Bavê Tûjo, Ekrem Cemil Paşazade û hwd.

Kurdan pêş dîtin ku rewş her ku diçe ber bi tehlûkeyek mezin diçe. Wek nimûne, di 9'ê Adara 1924'an de dema komîsyona destûra bingehîn sedemên destûra nû ya bingehîn amade dike, van hevokên sosret tîne ziman: "...*Dewleta me dewletek neteweyî ye. Ne dewletek pîrmiletî ye. Dewlet, ji bilî Tirkan ti mîletên din nas nake. Hin kesên ji nîjadên din jî hene ku di çarçoveya welêt de divê wekhev bin û xwedî hiqûqê bin. Lê ne caîz e ku li gor rewşa van a nîjadî maf bînin qebûlkin an jî di vî warî de bê axaftin.*" Her wiha, di heman mehê de rakirina Xîlafetê. Halbûkî beriya wê di serî de Ataturk di Îlona 1919'an de gotibû, "*Heta ku mirovên bi rûmet û rêzdar hebûna xwe bidomînin, wê Kurd û Tirk li dor sazîya xelîfetiye jiyana xwe bi biratî bidomînin û li dijî dijminên derve jî wê bircek ji pola ku nayê hejandin ava bikin.*" (**Axaftinên nehatine qeydkirin, Talîmat, Qeydên TBMM**) Bi kurtasî nuqteyên hevpar her ku diçin wînda dibin û devê meqesê vedibû. Divê em bibêjin ku ev giştî piştî Peymana Lozanê bi pêş ketin.

Îsyana Şêx Seîd


Şêx Seîd di sala 1865'an de li gundê Kolhîsar ê girêdayî navçeya Xinis a Erziromê tê dinê. Navê bavê wî Şêx Mehmûd Fevzî ye.

Binemala Şêx Seîd xwedî dîrokek bi kok e, ji malbatên mezin ên xwedî secereya olî ne. Kalîkê wî Şêx Alî, ji xwendevanên Mewlana Xalid bû. Şêx Elî ji 11 ciwanan yek bû ku Mewlana Xalid li dergaha Şamê bi taybet pê re mijûl dibû.

Şêx Seîd, li medreseyê perwerde dîtiye, di perwerdeyên baştirîn ên demê re derbas bûne û li gel Felsefeya Erebi-Îslamê, dersên Felsefeya berê ya Yewnanan û mantixê jî dîtiye. Mîna Kurdî dikarîbû bi Erebi biaxive, bixwîne û binivîse.

Şêx, di temenê xwe yê biçûk de derketiye pêş û bûye kesayetekî navdar. Di kamiltiya xwe de jî bê nîqaş li herêmê bûye kesekî rêzdar û di nav pêşnavên xwe de jî ji Neqşibendîtiyê “Postnîşîn” zêde kiribû. Şêx, di warê madî de jî dewlemend dihat hesabandin.

Wek li jor jî hat îfadekirin, Rêxistina Azadî ji bo îsyaneke berfireh meha Gulanê ya sala 1925’an hilbijartibû. Ji bo vê jî amadekarî dihatin kirin. Yên serkêşiya amadekariyan dikirin jî Xalîd Begê Cîbranî, ji Bedlîsê Yûsûf Ziya, ji Motkiyê Hacı Mûsa û çend rûspiyên din bi xwe bûn. Tê zanîn ku li gelek deverên Kurdistanê geriyane. Em dizanin ku Xalîd Begê Cîbranî pêwendiyên li gel Elewîyên Dêrsimê datîne û daxwaza alîkariyê dike. **Erdal Gezik** di pirtûka xwe ya **Kurdên Elewî** de wiha dibêje; *“Di 1918’an de dema li herêma Pilûrê pîrsgirêk derdikevin, dewlet ji bo pozîsyona rêzdar a b Xalîd Begê Cîbranî kar bîne, bi armanca ji nû ve sazkarîna îdareyê wî dişîne herêmê. Nûrî Dêrsimî di nivîsên xwe de dibêje, eşîrên Pilûrê bi rêzdarî Xalîd pêşwazî dikin û bi baldarî nêzî giraniya wî ya polîtîk û pêşniyarên wî dibûn. Her wiha, piştî 1918’an, li Stenbolê KTC (Cemiyeta Teraqî ya Kurd) –ku pêwendiyên Xalîd li gel wan hebû- pêş dikeve. Xalîd di nav her du koman de jî alîgir çêkiribûn û li herêman ew bi rêxistin kiribûn. Ev diyarde giştî, tevî hemû rewşên neyînî jî cesaret dabûn Xalîd ku tifaqê li ba eşîrên Elewî saz bike.”* Yûsûf Ziya yê ku nasnameya wî ya wekîltiyê hebû jî ji ber dikarîbû hê rehetir bigeriya, wî jî xebatên rêxistinkirinê li eniya xwe bi rê ve dibir.



Rastiyek e ku Dewleta KT ev hewldan ji nêz ve dişopand. Ji ber ku hê di 10'ê Cotmeha 1924'an de Xalîdê Cîbranî, Yûsûf Ziya û Hecî Mûsayê Motkiyî digire, diavêje zindanê. Esas tevî navê Şêx Seîd, navê gelek lîder û endamên rêxistina Azadî di dest dewletê de ne. Em ji gelek belgeyên nivîskî û devkî jî dizanin ku ev rewş ji aliyê Şêx Seîd jî dihat zanîn.

Şêx Seîd vê rastiyê dizane û domahiya sala 1925'an rêxistinbûyîna xwe bi pêş dixê. Heta, birayê xwe di ser Helebê re dişîne

Stenbolê û ji Seyid Abdulqadir re radigihîne ku divê îşyan zûtir dest pê bike. Dewleta KT a ku amadekarî diditin, plan dike ku beriya amadekarî temam bibin tevgerê bitepisînin. Ji ber vê ye ku dema Şêx Seîd li Pîranê li mala birayê xwe bû, mufrezeyek Dewleta KT dikeve nav gund, dibêjin wê çend kesên li gund bi hinceta ku qaşo berê leşkerên Tirk kuştibûn wê bigirin. Şêx Seîd vê na-pejirîne. Dixwaze biçin. Her çiqasî gotibe ku wê dûvre ew kesên ku beşdarî bûyerê bûne bi destê xwe bîne teslîm bike jî, ji ber provokasyonê ji berê ve plana wê hatibû kirin, nêzîkatiya mufrezeyê jî bi bêrêzî û provokatorî dibe. Di encamê de şer rû dide û çend leşker dimirin. Îşyana ku dibêjin Îşyana Şêx Seîd jî ha wisa dest pê dike...

Gule teqiyane. Teqez e ku Dewleta KT wê bi ser Şêx de were. Jixwe domahiya zivistanê amadekarî hatibûn kirin. Di carekê de li her derê belav dibe ku îşyanê dest pê kiriye. Her kes radibe ser piyan. 14'ê Sibatê Darahênê tê girtin. Piştê pêl bi pêl destpêkê Elezîz, dûvre jî Çewlîg, Mûş û gelek cihên din tene desteserkin. Roja 7-8'ê Adarê di pêşengiya Şêx de dor li Amedê tê girtin. Her çiqasî ji bo kontrolkirina Amedê gelek hewldanên Şêx çêbibin jî nikarin Amedê bigirin û piştê tê fêmkirin ku ev şaşıtiyek stratejîk bû.

Di vê navberê de Rejîma Kemalîst a xwediyê provokasyonê ku ji mêj ve amadekarî kiribûn, bi bêrehmî tê ser Kurdistanê. Wek tê zanîn bi fenek nemerdî ve Şêx Seîd û hin hevriyên wî li ser Pira Abdurahman Paşa ji hêla xayinekî di 15'ê Nîsanê 1924'an de dîl tê girtin û radestî Dewleta KT tên kirin.

Îsyana Şêx Seîd ji bo karibe nerazîbûnên serwer û gelê Kurd nîşan bide, gelekî girîng e. Îsyana minakek tîpîk e ku faktorên eşîrî, neteweyî û olî di zik hev de ne. Dema girêdana nîrxên kevnare yên milletgirîya Kurd li ber çavan bê girtin, wê bê fêmkirin ku bê çima serokeşîr wek milliyetgirên Kurd derdikevin pêş. Gelek eşîrên tevî beriya komarê xwedî firsend jî bûn, lê meylên yekgirtina di tevgerê serxwebûnê de zêde bû, di vê îsyana de bûn yek û serî hildan. Ev jî nerazîbûnek etnîk bû.

Serwerên Kurd ên li dijî rêveberiya navendî şer dikirin, ne di karibûn ji gel re projeyek şênber pêşkêş bikin ne jî bi awayekî rast hedefên xwe tespît kiribûn. Di navbera salên 1919-1923'yan de meylên sazkirina Kurdistanê Serbixwe hebû. Di îsyana 1925'an de, her çiqasî gelek sedemên îsyana çîna serwerên Kurda li dijî komara ku xurt dibû û sozên dabû Kurda dîtirikand hebin jî, daxwaza wan a domandina avahiyên berê yên feodal sabit bû. Parastina Kurdistanê Serbixwe hê zêdetir bi nêzîkatiyek nerazî ye, her çiqasî hêmana bîrewerîya kûr lewaz be jî, di hest de xeyalê Kurdistanê zîzindî ye.

Seyid Abdulqadir dikare ji bo vê bibe minakek. Di salên 1920'an de dema Dewleta Osmanî tîk çû, yek ji ew kesên ku herî zêde dijberê fikrê "Kurdistanê Serbixwe" bû jî ew e. Dema ku hikûmeta Padîşah a pêlîstoka Îngilîzan ji aliyê hêzên berxwedêr ên Anatolyayê nedihat naskirin, Seyid Abdulqadir heta dawiyê xwedî lê derketiye. Ji bo fikrê "*Kurdistanê Serbixwe*" gotiye ku "*Di vê demê de ku Osmanî dikeve, derbekirina wê ne laşîqî şîra Kurdîyîne ye.*" Di heman wextê de, li Anatolyayê ruxmî Xelîfe-Padîşah û pêkanînen xeraker ên hikûmeta wê jî hêzên Kuvva-î Milliye li dijî hêzên dagirker şer dikirin. Lê, Seyid Abdulqadir heta dawiyê jî bi Padîşahê Osmanî yê bêiradebûyî girêdayî ma. Di nav Kurda de mimkun e ku şopên vê nêzîkatiya Seyid Abdulqadir di gelek kêliyên dîrokê de bîne dîtin. Her çiqasî bi awayekî polîtîk tê

rexnekirin jî, di warê exlaqî de milên wê yên tên fêmkirin jî zêde ne.

Ji bilî qadên navendî yên ku beşdariya îşyanê bi girseyî çêbûn, têkiliyên eşîran û têkiliyên dewlet-eşîran, wek çawa asta tevlibûna îşyanê diyar dikin, her wiha bûye ûnsûrek esasî ya ku dijberiya îşyanê jî diyar dikin. Li ser vî esasî, hevrikî û şerê eşîran, bûye xwedî girîngiyek diyarker. Li gelek deveran, eşîr li pey serokeşîrên xwe çûne. Li gor vê bûne xwedî helwest. Ev rewşa ku di gelek Îşyan û berxwedanên Kurdan jî wek taybetmendiyeke berbiçav derdikeve pêş, di vê îşyanê de jî xwe dubare kiriye. Rewşa gelek eşîrên ku aliyên xwe guherîne û teksîr nekirine ku li ba hêzên dewletê tevbigerin jî bi vê dikare bê îzahkirin.

Her çiqasî, rêbertiya Şêx Seîd di îşyanê de şer û hevrikiya eşîrî kêmkiribe û bi rolek yekgirtinê rakiribe jî, ev bi temamî serkeftî nebûye. Em ji bîr nekin ku di bin navê sedemên mezhebî de Eşîrên Elewî yên Dêrsimê xwe ji Îşyana Şêx Seîd dûr girtine. Li pey vê jî polîtîkayên Dewleta KT hene ku bi destê gelek hevkarên meşandiye.

Erdal Gezik di pirtûka xwe ya **Kurdên Elewî** de dibêje; “*Di sala 1916’an de dema ku eşîrên Dêrsimî serî hildidin, Osmanî ji vê rewşê sûdê werdigirin, Suniyên li herêmê, bi taybet jî Zazayan ji bo tepisandina serhildanê wek milîs bi kar anîne. Bumke, vê jî xwe re dike bingeş, dibêje di 1925’an de eşîrên Elewî tola vê hildane.*

Wek sedemek duyemîn jî, Enqereyê cudahiyên olî di aleyhê îsyankaran de bi kar aniye. Enqereyê hewl da vê herêmê bi gîştî ji îşyanê dûr bixîne û li cihên ku mimkun e jî li dijî îsyankaran wek milîs bi rêxistin bike. Wek bingeşê polîtîkayan jî soz û diyariyên ji bo serokeşîran û aktîfîkirina cudahiyên olî hebûn. Di berdewama vê de li herêmê sala 1924’an ji Axuçanê Huseyîn Dede (bavê Îzzettîn Dogan) dest bi xebatên xwe yên serkeftî kiribûn. Huseyîn propaganda dikir ku îşyan di lehê şerîatê de û li dijî Elewîyan e û ji ber vê jî divê Elewî destekê bidin komarê. Di êrîşa 1925’an de ku li dijî îsyankaran pêk hat, bi xwe li ser serê eşîrên vê herêmê yên Elewî bû. Xebatên bi vî şiklî tenê bi Rojhilatê Dêrsimê re sînordar nema. Dema îşyanê berdewam dikir, Dedeyê Bektaşî Seyid Mehmed ji Sêwasê hat, li Gimgimê di nav eşîrên Elewîyan de li dijî îsyankaran ket nav xebatan.” Bi van gotinan jî

gewimînan bi awayekî xwerû radixîne ber çavan. Bi vî şiklî jî em dibînin ku di bin gotinên “*Zextên ku dema tu albayê Hemîdî bû te dikir, tu bibî Sultanê Kurdan tê zêdetir biki*” qaşo ku ji Xalîd Begê Cîbranî re tê kirin, xebatên kesayetên wisa hevkar hêna baştir fêm dibe.

Rastiyek eşkere ye ku Şêx Seîd beriya ku Elezîzê kontrol bike, dîsa ji bo lîderên Kurd ên li Dêrsimê agahiyê dişîne. Her çiqasî hin Dêrsimîyan bi erênî bersivandibin jî, wek hat ziman ji ber hin xebatên taybet ên hevkar ev ê di esas de pêk neyê. Di encama vî mantixê serwerên Kurdan de qismek bêalî dimînin, qismek jî ji bo tepeserkirina îsyane bi dildarî yan jî neçarî beşdar dibin. Em li vir dîsa diyar bikin ku îro Îzettîn Dogan ê qaşo Elewî ye, hevkarê navdar e. Wê demê jî bavê wî Huseyîn Dogan, hem ji bo Dêrsimî alîkariyê nedin Şêx Seîd hem jî ji bo Dêrsimî tevî Berxwedanê nebin bi hewldanek gelekî mezin li ser tevahî eşîrên Dêrsimî xebitîne. Em balê bikşînin ku heman kes, li gor çarçoveya konseptê “*Ji bo em Elewîyan bi CHP’ê ve girê bidin, em ji Pîran sûde wergirin*”, pêşî ji CHP’ê, dûvre jî ji Demokrat Partiyê dibe parlamenter. Û helbet em tipên wek M. Şerîf Firat Varto yê ku yek ji giregirên eşîra Hormek e û nivîskarê pirtûka **Bajarên Rojhilat û Dîroka Gimgimê** ye, li vê zêde bikin. Herhal wê ne şaş be ku em bêjin teşîya îxanetê her çiqasî bi rengên cuda be jî li ser vî esasî li ser heman vehûnê her digere.

Dîsa mînakek din a ku wek nimûneyek îxanetê derbasî dîrokê bûye jî îxaneta Bînbaşî (Serdar) Qasim e. Bînbaşî Qasim ku bace-naxê (hevling) Şêx Seîd û zavayê Xalîd Begê Cîbranî ye, li mektebên Eşîran xwendîye û dûvre jî bûye serdarê Artêşa Osmaniyan. Piştî yasaya paşnavan, Bînbaşî Qasim navê xwe kiriye Qasim Ataç. Ew kes e ku Şêx Seîd û hevrêyên wî li Pîra Abdurrahman Paşa dîl girtiye û radestî Dewleta KT kiriye. Beriya vê hin kesan hîs kirine ku ev kes ji bo Dewleta KT dixebite. Ji van yek jî Şêx Seîd bi xwe ye. Bi heman rengî, gelek berxwedêran jî hê ji destpêkê ve baweriya xwe pê neanîne. Lê, çawa ku rastiya “*Fenûfûtên Osmaniyan zêde ne*” rastiyeke e, mixabin dekûdolabên îxanetkar û hevkarên jî zêde ne. Dema Îsyana Şêx Seîd dest pê dike, Qasim poşmanbûyîna xwe tîne ziman. Dibêje ku dixwaze di

nav îsyânê de cih bigire. Her çiqasî Şêx Seîd tevî vê nerînê nebe jî, derfeta beşdariyê tê avakirin.

Bûyera îxaneta Bînbaşi Qasim, ji hêla şahidekî bûyerê, Şêx Feyzûllahê neviyê Şêx Hesên e ku apê Şêx Seîd e, wisa tê vegotin:

“Şêx Seîd Efendî, li ser xeta Mûşê şevê li Gîrbasê dimîne. Helbet li ba Efendî, bacenaxê (hevzava) wî Bînbaşi Qasim heye ku gav bi gav wî dişopîne. Eger ji Çiyayê Şerafettîn, Mergirê, Kovax, ava Mûradê derbas bibûna û bigihîştana milê din wê bi silamet bûya. Li wir ji Şêxên Oxînê Şêx Marûf, tevî eşîra xwe êrîşî Şêx Seîd Efendî dikin, Şêx Seîd Efendî neçar dimîne ku ji wir vegere. Qasim dikeve dewrê û dibêje, ‘Em di Pira Abdurrahman Paşa re bibihurîn, cihê herî aram ew der e.’ Beriya vê jî Bînbaşi Qasim nêzî 40 zilamên xwe dişîne ser pirê. Ji ber ku Şerafettîn Efendî jî ji 300 kesên li ba xwe, 200-250 mirovî belav dike, li gel Şêx Seîd Efendî tenê 50 mirov dimîne. Dema ev digihîjin pirê, zilamên Qasim çekan diteqînin. Li wir Şêx Seîd Efendî digirin.”

Çawa ku di dîrokê de ev helwestên hevkar di encam de bûye sedema tasfiyekirina xwe, dûvre em ê di bûyera Cemilê Çeto de jî bibînin ku wê heman taliya trajedîk rû bide. Rejîma ku hezm nake ku otorîteyên xwecih ên dûvikê wê jî xurt bibin, ji bo vê demê hê zêdetir serî li polîtîkaya lewazkirin û belavkirinê daye. Piştî îsyânê, qismek reîs û şêxên eşîrên ku tevî îsyânê bûne hatin îdamkirin, gelek eşîr û malbatên navdar hatine sirgûnkirin. Polîtîkaya sirgûn û bicihkirinê ku dûvre bi awayekî sistematîk dikeve meriyetê, li ser eşîr û malbatên ku bi tehlûke tên dîtin pêk tê. Ev dibe sedem ku pirsgirêk hê bêhtir kûr bibe.

Wê girîng be ku em gotinên dawî yên 46 Lîderên Kurd ku piştî Îsyana Şêx Seîd hat tepeserkirin di 29’ê Hezîrana 1925’an de hatin îdamkirin, li jêr binivîsin û nîşeyekê ji dîrokê re bihêlin.

ŞÊX SEÎD: *Dawî li jiyana min a dinê hat. Ji ber ku ez ji bo neteweya xwe dibim qurban, ne poşman im. Tenê bila neviyên me li ber çavên dijmin me fedîkar nekin.*

ŞÊX ABDULQADIR (Senator): *Jixwe di mijara şewitandin û hilweşandinê de hûn navdar in. We ev der jî veguherand Kerbelayê. Vê bizanin ku bi mêtîngerîya erjeng û bêînsaf, nav û şeref nabe. Ji Tirkan re mirin!...*

DOKTOR FÛAD (Amedî): *Min her tim dixwest ku ji bo welatê xwe bi egîdî canê xwe feda bikim. Bêguman e ku li ser vê xaka ku em tên daliqandin wê alaya serxwebûnê bê daliqandin.*

PARÊZER TEWFÎQ (Amedî): *Cenazeyê min nîşanî tevahî cîhanê bidin û bila her kes bizane ku ne ji bo mafên takekesî, ji bo mafên neteweyî şer dikim. Bijî Kurdistan!...*

KOÇZADE ELÎ RIZA (Bedlîsî): *Ji ber ku min çeka xwe ne li dijî neteweya xwe, li dijî dijminê me Tirkan bi kar anî, gelekî dilşad im. Ev e niha jî ji bo Kurdbûyîne jiyanê xwe dikim qurbanî.*


HELBESTVAN MELE ABDURRAHMAN (Sêrt): *Nemerdino!... Di bin lingê min de hûn gelekî biçûk û nemerd in. Bizanin, Kurd ne darek e, dimire lê serî natewîne!...*

HANÎZADE HELBESTVAN KEMAL FEVZÎ (Bedlîsî): *Kurdistana bihuşt a me ye. Em in maloban û kî çi dibêje bila bibêje, em ê dîsa bikevin hundir, wê ti hêz nikaribe ji vê re bibe asteng, ji ber ku Ew a me ye.*

Her wiha, beriya wê di 14'ê Nisana 1925'an de yên li Bedlîsê tîn bidarvekirin:

XALÎDE CIBIRÎ: *Li dijî we ne bi tenê me. Li pişt min, Neteweyek bi heybet a Kurd li Îran, Mezopotamya û Tirkîyeyê heye. Îro hûn min dadiliqînin, lê ti gumanên me nîn in ku wê sibehê neviyên me jî qira we bînin.*

YÛSÛF ZIYA (Parlamentê Bedlîsê): *Ez bi fikir bûm ku we yê bi bexşandina pozîsyon û rayeyê me bixapanda. Şikur ji Xwedê re, we bi gule û werîsan em pêşwazî kirin û ji ber vê jî em bi ti awayî ne poşman in. Bi saya vê dersa ku we daye, wê neviyên me tola me hilînin.*



Tevî ku rastî di nav van gotinan de veşartî ne jî, Dewleta KT ji bo berevajîkirina van gotinan, tehrîfkirinê û ev rastî negihêjin roja me, serî li gelek rê û rêbazan dane. Em van bi mînakekê nîşan bidin wê li cih be: “Di tezkeriya nimro 1835/2270 de ku ji Serokatiya Femandariya Giştî bi dîroka 30'ê Nisana 1341'an hatiye, ji ber ku bûyera îşyan û îrtîcaya dawî di çapemeniya me de bi taybet jî

di piraniya çapemeniya Stenbolê de eger wek serhildanek giştî ya Kurdan bê nîşandan, ev ê ji bo dijaminên hundir û derve bibe bingehê propagandayê û ne guncav e ku bûyerên ku esas di qadek sînordar de ji bo armancên cuda xwe daye der bîn mezinkirin, lewma hatiye pêşniyarkirin ku weşan li ser esasê ku ji îşyanek cihêkariyê wîrdetir, encama cahilî û xapandina îrtîcaî pêk hatiyê...” (Avnî Ozgurel, **Rojnameya Radîkal**)

Abdullah Ocalan vê pêvajoyê wilo dinirxîne: “Li ser bingehê avakirina Iraqê Kurdistan hat parçekirin û ev bi awayekî eşkere bînpêkirina Mîsaq-î Millî bû. Vê bûyerê li Parlemanta Tirkîyê û di navbera Kurdan de rê li ber tengezariyeke mezin vekir. Ev peyman di 5’ê Hezîrana 1926’an de bi Ingilîzan re hatiye mohrkirin, gelek aliyên wê yên tarî hene. Şert e ku mirov vê peymanê weke destpêka dîroka qirkirina Kurdan binirxîne. Çawa ku tê zanîn, Mistefa Kemal di vê mijarê de ji gelekî tengav bûye û di warê hesabdayînê de ketiye zehmetiyê. Bi vê peymanê, dinamêt xistine bingehê lihevkarina dîrokî ya Kurd û Tirkan. Ya rastî, isyana sala 1925’an a bi serokatiya Şêx Seîd ji bo sergirtina vê xiyanetê hem hatiye provokekirin, hem jî bi awayekî gelekî bêmane bi xwînrijandin û bêrehm hatiye tepisandin. Di vê çarçoveyê de sala 1925’an, ne bi tenê is—yan, bi awayekî rastî dema destpêkirina komplo, xiyanet û qirkirinê ye. Di vê de dîplomasiya Ingilîz û hêmanên Cihû bi rola diyarker rabûne. Çawa ku tê zanîn, di vê demê de ji ber ku Fethî Okyar gotiye “Ez destê xwe bi tevkujiya Kur—dan nakim” ji serokwezîrtiyê hatiye xistin û li şûna wî Îsmet Înonî hatiye wezîfedarkirin. Fethî Okyar ji zarokatiya xwe ve hevalê Mistefa Kemal bû û herî zêde ji wî piştrast bû. Di dema ceribandina Firqeya Serbest de kengî hat dîtin ku serketiye, dîsa ji aliyê Îsmet Înonî ve hatiye xistin. Eşkere ye ku di van salan de bi tenê hêmanên Çepgir û Îslamî nayên tasfiyekirin, bi awayekî rastî yên weke netewe têne tasfiyekirin Kurd in... Ne ku komareke demokratîk, lê sistemeke dîktator a tasfiyeker derdikeve holê.”

Dema em tespîta Ocalan a “Di vê çarçoveyê de sala 1925’an, ne bi tenê isyan, bi awayekî rastî dema destpêkirina komplo, xiyanet û qirkirinê ye.” li ber çavan digirin, wê demê Plana Is-

lahkirina Şerqê derdikeve pêşberî me. Ev plan di heman demê de belgeyek yekpare ya Qirkirina Kurdan e ku divê ji aliyê her ferdên Kurd ê dibêje ez welatparêz im, her civaknasekî ku kapîtalîzm û modernîteyê lêdikole, çi di warê sedema hebûnê de çi jî di warê objektîf û berpirsiyariya zanistî de divê teqez li ser bixebite.

Beriya ku em bi vê belgeyê dakevin, em diyar bikin; hatiye îspatkirin ku hem Îttîhadî hem jî piştî Kemalîstên ku wê li ser Tirkîyeyê serwer bibin, ji mêj ve li dijî gelan li ser esasê projeyek qetlîama sistematîk xebitîne. Mînak, di 1915'an de Ermenî, di 1921'an de Çerkez, di 1922'yan de Rûm, di 1924'an de Suryanî û ji sala 1925'an û şûn de jî Kurd hatine qetilkirin. Di nav vê salê de **Rojnameya Vakît** dibêje, “... li ti deverên ku nizyên (*singû*) Tirk hene, pirsgirêka Kurd nîne...” û di esas de agahiya qirkirinê dide.

Têkildarî Plana Islahkirina Şerqê Çend Gotin

Plana Islahkirina Şerqê ya ku di 24'ê Îlona 1925'an de hat qebûlîkirin, planek qirkirina zehf berfireh e ku piştî Îsyana Şêx Seîd li dijî Kurdistan û gelê Kurd bi awayekî sistematîk ketiye meriyetê. Heman salê Qanûna Îzale-î Şekavet (Qanûna Tinekirina Eşqiya-yan) û Qanûna Takrîr-î Sukûn (Yasaya Bêdengkirinê) jî derdikevin. Qanûnên têkildarî vê planê wê pey der pey di Meclîsê re derbas bibin û bikevin dewrê. Plana Islahkirina Şerqê di esas de plana înkâr û îmhaya gelê Kurd e, nexşerêyeke yekpare û bi detay e ku helandina Kurdan, wek çandî li vê erdnîgariyê qedandinê û ji rêderxistinê dide ber xwe.

Ji ber vê jî Plana Islahkirina Şerqê herî zêde jî li ser tasfiyekirina zimanê Kurdan rawestiyaye. Ji bo qedexeyên ziman û bişavtinê zehf xebitiye. Li ser qedexekirina nîrxên çandî û terikandina welat pîr sekiniye. Gelekî bala xwe daye rakirina navên otantîk û li şûna wan jî avakirina hişmendiyeke civakî yê nû ku bi Tirkî çêdibe. Xulase, Plana Islahkirina Şerqê planek li ser hîmê bişavtin û qirkirina gelê Kurd e û planek wisa ye ku heta roja me jî di meriyetê de ye.

Dema di sedsalên 19'emîn û 20'emîn de dîroka mîletparêzî û nîjadparezî ya li cîhanê bê lêkolandin, wê bi awayekî êşkere bi ser

avê bikeve ku Plana Islahkirina Şerqê yek ji nimûneyên endazyariya civakî ya herî qirker û faşîzan e û teqez e ku divê bi têgînên nû careke din ji nû ve were pênamekirin.

Abdullah Ocalan ji bo vê pênameya mîna **“berevajî tewandina şivikê”** dike û dibêje, **“ya rast berevajiya gotinên şaristaniya modernîst a kapîtalîst e.”** A ji metelokê ew e ku heta bi çar lepan kok neyê hembêzkerin, ti rê tineye ku qirkirina çandî ya li dijî Kurdan di meriyetê de ye, bê derbaskirin. Divê neyê jibirkirin ku Abdullah Ocalan destpêkê navê **“Parastina Kurdên di Nava Pencê Qirkirina Çandî de** li parêznameya xwe ya dawî kiriye. Ji ber vê jî gelekî girîng e ku bûyîna di nav Pencên Qirkirina Çandî de bê hîskirin û fêmkirin. Jixwe ji bilî vê ti derfet nîne ku em karibin hebûna xwe ya civakî, di çarçoveya dem û mekan de halê xwe yê çêbûnê pêk bînin. Ev hem di warê hebûna me ya ontolojîk a reel û objektîf de wisa ye hem jî di çarçoveya mirov-civak-gerdûn de wek fikrî û felsefîk ji bo em karibin têkiliyên civakbûyîna xwe û gerdûnê pêname bikin û watedar bikin jî wisa ye. Lewma jî divê em karibin têgînên bişavtin û qirkirinê di rastiya xwe de hîs û watedar bikin. Ev neçariyek ruhî û aqlî ye.

Abdullah Ocalan, bişavtinê wisa pêname dike:

“Asîmîlasyon ew çalakî û têkiliya yekalî ye ku di civakên şaristaniyê de yekdestdariyên sermaye û desthilatdariyê li ser komên civakî yên ki-rine statuya koletiyê pêk tînin, ji bo ku van koman bikin dûvik û movikên xwe, bikartînin.

Armanca asîmîlasyonê ew e, ji bo mekanîzma mêtinkarî û desthilatdariyê bi mesrefa herî kêr kole peyda kirin e. Koma tê asîmîlekirin, nasnameya wê bi xwe û hêza wê ya berxwedanê tê şikandin, di nava elîtên serdest de ji bo bibin koleyên kêrhatî tê amadekirin. Li vir fonksiyona bingeîn a koleyê tê asîmîlekirin ew e, ji sedî sed divê bişibe efendiyê xwe, ji bo bibe perçik û dûvikê wî her tiştî dike ji bo xwe bide qebûlkirin û bi vî awayî di nava sistêmê de ji xwe re cihekî çêke. Jixwe çareyekê wî ya din jî tineye. Ji bo karibe bi jî divê nasnameya xwe ya civakî ya berê tavilê biterikîne û bi awayekî herî baş adepteyî çanda efendiyên xwe bibe û ev yek weke alternatîfa bi tenê jêre hatiye pêşkêşkirin... Civaka hatiye asîmîlekirin, ji formên wisa yên mirovan pêk tê ku herî sernerm in, herî zêde baz didin

suxreyan, û bêwijdan, bêexlaq û bêzîhniyet in, di xulamtiyê de dikevin pêşbaziye. Ti biryar û çalakiya wî ya bi awayekî azad bike, tineye. Kirine ku bi tevahiya nîrxên nasnameya xwe ya civakî re xiyanetê bike... Elîta serdest, ji bo ku vê bênasnamebûnê li ser civaka asîmîlasyonê ferz bike du sîlehên bîngehîn bi kar tîne: Ya pêşî, zora fizîkî ya berbiçav e. Di serhildan û serîrakerîneke wî ya herî biçûk de jî şûrê serbirînê li ba dike. Ya diduyan, bi birçîbûn û bêkariyê re hevrû dike.”

Her wiha Abdullah Ocalan têgîna qirkirinê jî bi van gotinên balkêş vedike:

“Qirkirin weke dewama asîmîlasyonê ye, gel, hindikayî, her cure komên dînî, mezhebî û etnîk ên bi asîmîlasyonê nikaribin bi wan, dixwazin bi rêya fizîkî û çandî wan bi temamî tasfiye bikin û wan têk bibin...”

Rêbaza qirkirinê bi awayekî fizîkî bi giştî bi çanda elîta serdest ango li gorî çanda dewleta netewe bi komên çandî yên di rewşa serdest de têne kirin. Mînakî tîpîk a ji bo vê yekê jenosîdên ji bo çanda Cihû û gelê wê ye. Tevahiya dîrokê Cihû hem di qada maddî de û hem jî di qada çanda manewî de beşên herî bi hêz pêkanîn û ji ber vê, li hewldanên tinekirin û derbên fizîkî yên çandên serdest ên dijber rast hatin, timûtim qirkirinên weke pogrom têne binavkirin bi serê wan de hatin.

Rêbaza duyemîn a qirkirinê ceribandîna qirkirinê yên çandî ne, û zêdetir çanda dewleta netewe û elîtên serdest li ser gel, civakên etnîk û komên baweriyê yên qels û pêşneketine tê ferzkirin. Bi qirkirina çandî ya weke mekanîzmaya bîngehîn tê xebitandin armanc ew e, di nava çand û zimanê dewleta netewe û elîta serdest de bi tevahî tasfiyekirina van gelan û koman e... Encamên rê li ber vedike ji ya fizîkî bi zêdetir felaket in; ji bo gel an jî civakekê felaketa herî mezin e ku di jiyana de lê rast bê yan jî bi serî de bê. Gel an jî civak neçar têne hiştin hebûn, nasname, hemû hêmanên çanda maddî û manewî yên xwezaya wan pêk tînin biterikînin û ev bi çarmîxkirina demêke dirêj re wekhev e.”

Piştî van pênaseyan dema em li naveroka Planê dinêrin, ne mimkun e ku mirov pirçûkê nede.



PLANA ISLAHATA ŞERQÊ Û KURD

Çi ye Plana ku wek Plana Islahkirina Şerqê tê binavkirin, nave-roka wê çi ye, hedefên wê çi ne?

Plana Islahkirina Şerqê di 24'ê Îlonan 1925'an de hatiye qebûlkirin û bi giştî ji 27 (28) xalan pêk tê.

Xala Yekemîn: Li Kurdistanê îlankirina îdare-î orfiye (rêveberiya awarte).

Xala Duyemîn: Kurdistan, li gor 5 mufetişiyên gelemperî tê vesazkirin an jî dabeşkirin.

Xala Sêyemîn: Li dadgehên sivil û leşkerî wê dadgerên sivil tine bin.

Xala Pêncemîn: *Li eraziya ku li rojavayê xeta mabeyna bajarê Wanê û Midyadê ji aliyê Ermeniyên hatiye terikandin, wê koçberên Tirk bêne bicihkirin. Ji ber vê jî mal û milkên Ermeniyên ên ku li bajarê mintîqa rêveberiya awarte ye, wê ji aliyê malîyeyê neyên firotin û heta wê jî bo Kurdan neyê kirêkirin jî. Tirk û Arnavûdên ku wê ji Yûgoslavyayê bîn û koçberên ku wê ji Îran û Qafkasyayê werin, destpêkê wê di navbera Elezîz, Erxenî, Diyarbekîr, Palo, Gêxî, Mûşê de li xeta Geliyê Mûrad, rojhilat û başûrê*

Çiyayê Çewligê, Xinis, geliyên Mûrad, Deşta Mûşê, hewzeya Gola Wanê, Diyarbekîr, Garzan, Bedlîsê bêne bicihkirin. Ji bilî van ji bo bicihkirina şênîyên ji wilayetên Rîze, Trabzonê û ji navçeyên bakurrojhilatê wilayeta Erziromê û koçberan wê ji şertên û mercên muttehez sûd were girtin û neqlî Ava Xînûsê û Geliyê Mûradê û mintiqaya li bakurê Gola Wanê bêne kirin.

Heta ku koçber û Tirkên xwecih ên ku wê li şerqê bêne bicihkirin bigihêjin mintiqayên îskanê, lazim e hikûmet bi wesayîten xwe veguhestinê bike û di dema veguhestinê de ji debara wan bike. Gerek e ku hikûmet malên wan ava bike û debara wan a salekê pêk bîne, her wiha divê heywan û amûrên çandîniyê jî ji aliyê hikûmetê bêne helkirin.

Kurdên ku mal û milkên Ermeniyan ku wê koçberên Tirk werin bicihkirin, bêtî nîşandana belgeyek bikaranîne ji ber çi sebebî dibe bila bibe dagir kiribin, wê bîr derxistin, vegerin cihên xwe yan jî li rojava wê li taxên ku hikûmet diyar dike bêne bicihkirin.

Ji bo ku Tirkên hatine bicihkirin ji êrîşên Kurdan bêne parastin wê tevdîrên taybet werin girtin.

Di sala 1341'an de herî zêde wê 50 hezar nifûs were veguhestin û bicihkirin: 1.000.000 mesrefên veguhestinê otomobîl, debarê û ji bo nifûsa din bi hesabê 20 lîrayan. Ango wê mesrefên van koçberan werin pêşwazîkirin.

Bi heman şiklî, ji bo di nav 10 salan de nifûsek 500 hezarî ji Yûgoslavyayê, Bûlgarîstanê, Qafkasyayê û Azerbaycanê li mintiqayê bêne bicihkirin, ji sala 1343'yan û şûn de divê her sal herî kêr 5 mîlyon lîra tahsîsat tevî budçeyê bê kirin."

Xalên 6 û 7'emîn: Têkildarî jimartina mal- milk û nifûsa Kurd û Ermeniyan e.

Xala 8'emîn: Biryarek e ku dixwaze tevahî zerrarên di dema îsyane de çêbûne ji aliyê îsyankaran bîr dayîn.

Xala 9'emîn: "Yên ku îsyana teşwîq û îdare kirine û xizmên wan û ji van ên ku hikûmet hebûna wan a li şerqê rast nabîne wê wek takekes, malbat û xizmên wan li rojava li taxên ku wê hikûmet nîşan bide bimînin. Mal-milkên ku wê biterikînin dê ji aliyê hikûmetê bê kirin, bedela wê wek pereyê nakît an jî wê li taxên ku hatine bicihkirin wê bi heman qîmetî emlaq û erazî bê dayîn."

Ango yên li ber xwe dane wê bêne koçberkirin. Ev koç jî wê ber bi cihên ku ji aliyê dewletê hatine diyarkirin pêk were.

“Neqla kesên ku di dema îsyanê de xizmet û dilsoziya hikûmetê kirine, tevî hikûmetê li dijî îsyanê tevgeriyane, wê bê taloqkirin.”

Ango, yên li rex dewletê cih girtine, hevkarî kirine û li dijî gelê xwe hatine bikaranîn, heta demekê koçberkirina wan tê taloqkirin.

Xala 10'emîn: Biryarek têkildarî betalkirina eşîran e. Lê ji bo pêkanîna vê jî pêdivî bi gelek memûran heye. Pêwîst e jimartin û tespît werin kirin. Memûrên vê dikin jî wê teqez ne Kurd bin.

Memûrên diçin wir wê mûçeyên wan ji sedî 75 zêdetir be. Yên ku sê salan dimînin, dilên wan kû derê bixwaze angû li Tirkîyeyê kû derê bixwazin dikarin terfî bikin. Kesên ku endamên malbatên artêşê ne jî wê erzaqên wan qat û nîvekê zêdetir be.

Xala 11'emîn: Li bajarên mîna Colemêrg û Wanê yên li ser sînor dimînin, wê hejmara eskeriyê bê zêdekirin. Wê tabûr û alay lê bînin zêdekirin.

Xala 12'emîn *“Wê çek bînin komkirin û rakirina çekan bînin qedexekirin, tenê ji bo wesîkayîyan wê destûr hebe. Eger çekên bê wesîqe li malan bin jî wê bînin desteserkirin û xwediyên wan li Dîwanên Rêveberiya Awarte bînin darizandin.”*

Ango wê çek qedexe bin, yên ku bêyî wesîqe çekên wan hebin jî wê derxin pêşberî Dîwana Herbê ya Rêveberiya Awarte.

Xala 13'emîn; *“Li bajar û navçeyên Meletî, Elezîz, Amed, Bedlîs, Wan, Mûş, Riha, Erxênî, Xozat, Erdîş, Elcewaz, Xelat, Palo, Çarsancak, Çemizgezek, Pilûr, Hisnimansûr, Behîsnî, Arga, Hekîmhan, Bîrecûk, Çermûgê ku bi eslê xwe Tirk in, lê li beramberî Kurdîniyê tîk diçin, yên ku li daîreyên hikûmet û şaredariyê û deverên din ên dewletê, li dibistanan, sûkê û bazaran ji bilî Tirkî zimanekî din bi kar bin, wê bi cezayê muxalefet û berxwedana li dijî hikûmet û şaredariyê bînin cezakirin.”*

Ango yên ku Tirkîniya wan her ku diçe lewaz dibin û li beramberî Kurdan tîk diçin, eger Kurdî bi axivîn wê bi cezayê pereyan bêne cezakirin.

Xala 14'emîn: *“Li cihên ku bi eslê xwe Tirk in, lê dişibin Kurdan û li taxên ku mîna Sêrt, Mêrdîn, Stewrê bi Erebi di axivîn, la-*

zim e ku Ocax û dibistanên Tirkan bêne vekirin û bi taybet jî her cure fedakarî bê kîrin û mektebên keçan ên bi taybet bêne avakirin û daxwazên keçan ên ji bo dibistanan bêne zêdekirin.

Bi taybet li Dêrsimê, dibistanên şevînî demildest û bi daxwaz werin vekirin, demildest jî Kurdbûyîne bêne rizgarkirin.”

Ango li cihên ku bi eslê xwe Tirk in, lê ber bi Kurdbûyîne ve tên an jî li cihên ku bi Erebî tên axaftin, vekirina Ocaxên Tirkan, bi taybet jî mektebên keçan bêtir teşwîqkîrin. Ev rewş bi taybet jî li Dêrsimê demildest bikeve meriyetê û pêşî li vê Kurdbûyîna Tirkan bê girtin.

Xala 15'emîn: Li Dêrsimê yê ku dixwazin derkevin, ber bi cihên ku ji aliyê dewletê hatine diyarkirin bêtir şandin.

Xala 16'emîn: *“Axaftina Kurdî pêwîst e li Kurdên ku li hin deverên bajarên me yê li rojavayê Firatê bi şîkile belawela bi cih bûne, teqez bê qedexekirin û girîngî bi dibistanên keçan bêtir dayîn, axaftina jinan a bi Tirkî bê garantîkirin.”*

Divê destûr neyê dayîn ku Kurdên li rojavayê Firatê bi Kurdî biaxivin, giranî li ser Dibistanên Keçan werin dayîn û wisa jî axaftina wan a Tirkî bê misogerîkirin.

Xala 17'emîn: *“Bi bi lezûbez avahiyên hikûmetê, qereqolên jendermeyan û qereqolên leşkerî û sînor bêne avakirin.”*

Xala 18'emîn: *“Rejîm, cihên stratejîk ên girîngiyê pê dide, bike rê.”*

Xala 19'emîn: *“Lazim e ku di demê kurt de hesinrêyên heta Erzînganê, Sêwasê, Elezîz-Amedê, Elezîz-Çapakçûr-Mûşê, heta Gola Wanê bêtir danîn.”*

Ango, ji bo hesinrê zû bigihêjin bajarên navbihurî, divê hewl bide dayîn.

Xala 20'emîn: *“Tevî ku giştî qereqol li gor parastinê tên avakirin jî divê bi telefonan jî bêtir destekkîrin. Li vê mintiqayê çî dibe bila bibe pêwîst e çend stasyonên bêtêlê hebin.”*

Xala 21'emîn: *“Komîserên sînor têkildarî xisûsên mîna kolberiyê (qeçaxçîtî), sîxurtiyê, îstîxbaratê û nuqtayên emnîyetê de ji îdareya rêveberiya awarte (Mufetîşîya Gelemperî) destûrê digirin.”*

Xala 22'yemîn: *"Ji bo astengkirina kolberiyê divê li ser sîno-ran çend wesayîten zîrxî bîn rawestandin."*

Xala 23'yemîn: *"Mûçeyên kesên ku li van qadan tên wezîfedar-kirin bîn zêdekirin."*

Xala 24'emîn: *"Kes û saziyên biyanî bêyî destûra hikûmetê wê nekevin vê mintiqayê."*

Xala 25'emîn: *"Li cihên ku serjimêrî pêk hatin wê bi bayê lezê şaxên leşkerî bîn avakirin. Û şênîyên vir wê eskeriyê li derveyî vê herêmê bikin."*

Xala 26'emîn: *"Li vê mintiqayê pêwîst e hikûmet li tevahî îda-reyê karûbarên gel bêyî navbeynkar û bi xwe kontrol bike û nav-beynkaran jî bi tundî red û qedexe bike."*

Xala 27'emîn: *"Xîsûsên mîna sazûmanîyên têkildarî bajaran, heta ku rêveberiya awarte ya giştî didome dikare bîn taloqkirin."*

Plana Islahkirina Şerqê ya ku me li jor jî daye, bi bayê lezê ke-tiye meriyetê. Di çarçoveya vê planê de Kurdistan gav bi gav hati-ye dagirkirin, komkujî li ser hatine kirin, ji bo bibe qadeke berbe-lavkirina çanda Tirkî, ziman, çand û her cure kevneşopiyên Kurd hatine qedexekirin û ji bo bêqîmet û biçûk bê xistin jî her tişt hati-ne kirin. Her çiqaşî heman pêkanîn li dijî Ermenî û gelên din ên li vir dijîn, ketibe meriyetê jî, ti ji van jî qasî ya Kurdan komplîke û demdirêj najotîye. Ev plan, elbet tenê bi van madeyan re sînodar nemaye, ji wê rojê ve li ser Kurdistanê rêveberiyên statuyên taybet hatine meşandin, bi temamî Sîstemek Şerê Taybet ketiye dewrê.

Kurdistan, di navbera salên 1927-1947'an de di bin navê Rêve-beriya Awarte (Orfî Îdare) de ji aliyê Mufetîşên Gelemperî û ji 1980'î û şûn ve jî ji aliyê Walîtiyên Herêmên Rewşa Awarte, Rêveberiyên Awarte, Qanûnên Têkoşîna Li Dijî Terorê û bi awayekî rojane bi Musteşartiyên Ewlehiyê tê birêvebirin.

Pêvajoya ku Plana Islahkirina Şerqê ket dewrê, her çaxê bi bir-yarên nû hatiye destekkirin, qayimkirin û rojanekirin.

Dema Plana Islahkirina Şerqê tê nirxandin:

"Divê memûrên Kurd tayînî Kurdistanê neyên kirin. Li Dad-gehên Rêveberiya Awarte, divê hakimên xwecih ên esker û sivîl nînbîn. Divê Posta û Telgraf, polîs, zabîten Jendermeyan û asayîş,

memûrên têkildarî gelemperî wê ne ji şêniyan be. Axaftina Kurdî wê qedexe be. Yên diaxivin jî dê werin cezakin.” Bi giştînameyên veşartî jî nêzikatiya, “*Divê bê teşwîqkirin ku keçên Tirk bi gun-diyên ku nikarin Tirkî biaxivin re bêne zewicandin*” bi taybetî li ber çav hatiye girtin.

Di rapora Serokê Meclîsê Abdulhalîk Renda de tê gotin ku, “*Li herêma Kurdistanê, nîfûsa Tirkan ji çaran yek nîfûsa Kurdan hê jî kêmtir e. Li eraziya Tirkîyeyê ya di dest me de maye, ez derfetê ku her du millet bi heman qudret û selametê li ser serwer bin, qet nabînim. Lewma jî ez ferz û neçarî dibînim ku li tevahî welêt nîfûs û bandora Tirkan bê serwerkirin*” û sedemên esasî yên sirgûn û bişavtina Kurdan eşkere îfade kiriye.

Fermanên sansur û sirgûnê yên mîna “*Qanûnên derbarê vegu-hestina hin şexsan ji Mintîqa Şerqê ber bi Wilayetên Xerbê. Qanûnên Îskana Mecbûrî û Tûncelî (Dêrsimê)*” ku di sala 1927’an de hatine derxistin, bi hezaran Kurd ji warên xwe, gund û diyarên xwe bi darê zorê hatin derxistin û sirgûnkirin. Li şûna wan jî penaberên Tirk hatine bicihkirin. Tevahî xercîkirinên vê girseya nû jî ji budçeya dewletê ya salekê hatine dayîn.

Di 14’ê Îlona 2000’î de bi navê Doğu ve Güneydoğu Eylem Planı (DGEP-Plana Çalakiyê ya li Rojhilat û Başûrojhilat) belgeyek li ser çapemeniyê û di nav raya giştî de belav bû. Baskin Oran ê Profesore Zanista Siyasetê û Pisporê Dîroka Tirkîyeyê ye, ji bo vê planê van tîne ziman:

“*Ev Plana ku li gor biryara civîna MGK’ê (Desteya Ewlehiya Neteweyî) ya Kanûna 99’an hatiye amadekirin, ji beşên “diyarkirina rewşê” û “pêşniyar” pêk tê û tenê di vê beşa duyemîn de tam 107 pêşniyar hatine nivîsandin. Dibêjim tê nivîsandin, ji ber ku wek Cengîz jî (Çandar) di Sabahê de bi îsabet diyar kiriye, “tevahî partî bi nêzikatiyek li ser partiyan nêz dibin” ev Plan wê wisa çawa pêk were, jê re “planek çalakiya veşartî” tê gotin. Beşa “diyarkirina rewşê” ya DGEP’ê, 3 tespîtên esasî dike:*

1) *Pirsgirêk, pirsgirêkek civakî ye. Çavkaniyên wê ev in:*

a) *Di rêveberiya gelemperî de kêmasiyên mezin û kadroyên vala. Gel li herêmê dewleteke “xurt, adil, şîrîn” dixwaze û qesta*

dewleta xurt jî çareserkirina kêmahiyên di rêveberiya gelemperî de ne.

b) Pirsgirêkên cidî yên aborî (bicihkirin, ajaldarî, razandina sermayeyê);

c) Valatiya mezin a perwerdeyê;

d) Pirsgirêka mezin a tenduristiyê.

2) *Tevî hemû hewldanên PKK'ê jî, li herêmê hewldanên “ji bo şiyarkirina hestên nasnameyê” nebûye pirsgirêkek berbelav û bingehîn. Ji ber vê jî gel dikare di 3 beşan de bê nirxandin: a) Sempatîzanên PKK'ê; b) Yên protesto dikin; c) Yên xwedî nasnameya PKK'ê. Her du komên destpêkê, dema pirsgirêkên wan ên aborî û civakî bêne çareserkirin wê ji bandora PKK'ê rizgar bibin.*

Çareseriyên (ango tedawî) ku DGEP pêşniyar dike jî, tabî bi temamî bi van teşhîsan re yekgirtî ne:

1) *Rêveberiya gelemperî bê xurtkirin: “ji desta herî baş” walî û qeymeqam bêne tayînkirin, ji bo tevahî memûran mîna leşker û polîsan wezîfeya mecbûrî ya şerqê;*

2) *Di aboriyê de selihîn (onarim): saziya ji bêkaran re kar dibîne, erazî bê berhemdarkirin, hewesandina kooperatîfparêziyê;*

3) *Di perwerdeyê de selihîn: Dibistanên herêmê yên şevînî bên xurtkirin, jin li xwendin-nivîsandinê fêrkirin, weşanên fêrker û hînker ên TRT'ê bêne zêdekirin;*

4) *Di tenduristiyê de selihîn: Bi rotasyona mecbûrî, ji herêmê re şandina personelan.”*

DGEP, plansazî û biryarek e ku di sala 1999'an de ji aliyê Desteya Ewlekariya Millî (MGK)'ê hatiye girtin. Ango plana ku tevî 75 sal di ser re derbas bûne jî dîsa pratîzekirina wê tê xwestin, bi heman şiklî pêkanîna armancên esasyî yên Plana Islahkirina Şerqê ne. Tê armanckirin ku qirkirina çandî ya li ser gelê Kurd bi kûrkirinê ve bê domandin û lewaziyên rêveberiya gelemperî ya encamgiriyê asteng dike jî bên derbaskirin.

Îro jî pêkanînen mîna (YÎBO-Dibistanên Şevînî yên Herêmê) û wek versiyonek vê ya nûjen (PÎO – Dibistanên bi Pansiyon ên Seretayî), êrişên destavêjî û xistina keçên Kurdan, destdirêjî û destavêtinên ku li girtîgehan bi ser zarokên Kurdan de tînin, kam-

panyayên mîna (Heydê Keçino Werin Dibistanê)” û gelek projeyên mîna ÇATOM’an (Navendên Civakî yên Pirarmancî) yên ku zarok û ciwanên Kurd di bişavtina Tirkî û biyanîbûnê re derbas dikin, bi eşkere nîşan didin ku hê jî Plana Islahkirina Şerqê bi temamî di meriyetê de ye.

Wisa ye, hê beriya çend salan piştî zelzeleya Wanê ma qey bi belesebebe dayikên Kurd mecbûrî fêrî Tirkî dikirin! Ma vala vala dixwazin bi zorê zarokên Kurdan desteser bikin, ma belasebebe li malên islahê ji bo hestên poşmaniya Kurdînî çêbibe her cure pêkanînen ketî dixin meriyetê, ma bê sedem e ku ji keçên Kurd re dibêjin “*li şûna derkeve çiyayan bila fahîşetiyê bikin*”, ma bê zanebûn e ku dema dibêjin “*her Tirkek zewaca xwe ya duyem a bi mehra melê ji Kurdan be*”, gelo wisa ketober e ku berê keç û zarokên Kurdan didin spor, huner û fihûşê! Ê qey badil hewa dixwazin ji Colemêrgê zarokan bigirin û li Stenbolan bidin xwendin!

Sedemên van polîtîkayên kirêt ku heta îro jî serî lê didin, di belgeyek bi navê **Projeya Yekparebûna Neteweyî** de ku di pevnivîsên nav dewletê de veşartî dihat kirin, wisa tê formulekirin:

“*Serkeftina PKK’ê ew e, welatîyên ku di çarçoveya “Projeya Temamkirina Neteweyî” de ku ji damezrandina Komarê ve tê domandin, hê bi temamî tevî yekparebûna neteweyî nebûne û qismek ji welatîyên ku yekparebûna neteweyî saz kirine, ji pêvajoya temamkirina neteweyî qut kiriye, xistiye pêvajoya “komikîbûna etnîk” a Kurd. Ji ber ku di serê mirovê herême de tez çêbûye ku ji ber Kurdebûyîna wî/ê nêzîkatîyek cuda lê tê kirin, etnîkbûyîn xurttir bûye. Projeya Temamkirina Neteweyî, di esas de wê di 1980’yan de bi çalakbûna projeya GAP’ê lezgînî bigihîştê encamê û wê yekparebûna neteweyî ya Komara Tirkîyeyê di warê sosyolojîk de temam bibûya. Di vê demê de derketina PKK’ê, “Projeya Temamkirina Neteweyî” sekinandiye û civak li dijî “Projeya Temamkirina Neteweyî” xistiye nav liv û tevgêrê.*

Hewldanên dewletê yên ji bo qezenckirina gel, di astek mezin de amator mane. Hin xebatên pir serkeftî ferdî mane, bi sazî nebûne. Ne hewce ye ku di mijara domandina Polîtîkayên Temamkirina Neteweyî de komplekse herî biçûk jî çêbibe. Ji ber ku tevahî dewletên neteweyî, di nav pêvajoya dîrokî de yekparekirin, bicihkirina neteweyî û bişavtin an jî temamkirina li dor çandek

serwer dane pêş, polîtîkayên ku şer û aloziyan kêr dikin şopandinê.”

Erê, yên li jor hatin ziman bi temamî di çarçoveya planekê de tîn birêvebirin. Navê vê planê jî Plana Islahkirina Şerqê ye. Û ev plan domahiya rejîma komarê, di bin navê cuda de, bi madeyên pêvek û xurtkirinê ve her tim zindî û rojane hatiye hiştin. Hedef jî her tim bûye qirkirina çandî. Hedefa sereke ya qirkirina çandî û garantiya serkeftina wê jî bêguman zimanê zikmakî ye. Mîna filozofê mezin Martîn Heidegger jî dibêje, “*mala hebûnê ziman e*”. Komeke ku ji zimanê xwe yê zikmakî bûye, ne mimkun e ku kari-be hebûn û çêbûna xwe bidomîne.

Abdullah Ocalan belesebeb negotiye, “**Gelekî nikaribe bi zimanê xwe binivîsîne û nikaribe zimanê xwe bi kar bîne heq kiriye biçûk û bê qîmet bê dîtin!**” Û her wiha bi gotina, “**Têgîna ziman têkiliya xwe bi xurtî bi têgîna çandê re heye. Di çarçoveyeke teng de ziman bi awayekî bingeîn têgîna sereke ya qada çandê ye. Di çarçoveyeke teng de mirov dikare ziman weke çandê jî bide naskirin. Ziman daneheva civakî ya zîhnîyet, exlaq, his û fikra estetîk e ku civakekê bi dest xistiye; ziman hebûna nasnameyî û zîhnî ya mane û hisê ya serwestbûyî ye, bûyî xwedî îfadeyê. Civaka xwe gihandibe ziman, bûye xwediyê sedema bi hêz a jiyanê. Asta pêşketinê ya ziman asta pêşketîbûna jiyanê ye. Civakekê zimanê xwe yê dayikê çiqasî pêşde biribe, ew tê wê maneyê ku asta xwe ya jiyanê jî pêşde dibe. Dîsa çiqasî zimanê xwe ji dest dabe û ketibe bin hegemonya zimanên din, ev jî tê wê maneyê, ewqasî hatiye mêtin, qirkirin û asîmîlekirin. Civakên xwediyê vê rastiyê jiyanê wan a manedar a zîhnîyet, exlaq û estetîkê nabe û êşkere ye ku heta ji holê rabin wê weke civakeke nexweş mehkûmê jiyanê trajîk bimînin. Civakên mane, exlaq û estetîka xwe ji dest bidin, nîrxên wan ên civakî jî bi tenê ji bo nîrxên mêtinkaran dibin maddeya xam a bikaranînê”** jî aniye ziman ku cihekî jênerger ê ziman li ser mejî û çêbûna mirovan heye.

Albert Memmî, di planên rejîmên qirker û faşîst de ku dixwazin gelan tine bikin, girîngiya bişavtina ziman û çandê wisa tîne ziman:

“Îcar zimanê zikmakî yê mirovê mêtingeh, zimanê ku bi hest, fikr û xewnên wê li ser piyan maye, ew zimanê ku nermbûyîn û meraqa xwe îfade dikir, ango zimanê ku bandora herî mezin a dilinî dikir, esas ew ziman e ku qîmeta wê herî kêr e. Ti statuyek wê di welêt de an jî yekîtiya gelan de nîne. Eger bixwaze di karekî de bixebite, cihekî ji xwe re çêbike, di nav komê û cîhanê de hebe, destpêkê neçar e ku serî li ber zimanê efendiyên xwe bitewîne. Di têkoşîna ziman de ku di hundirê mirovê mêtingeh de pêk tê, yê dibe bindest zimanê zikmakî ye. Bi xwe hewl dide vî zimanê zeîf li goşeyekê deyne, ji çavên biyaniyan veşêre... Em bihesibînin ku fêrî zimanê xwe bûye ku di xebatên nivîskî de ji nû ve biafirîne, wê ji bo kê binivîse, ji bo kîjan raya giştî? Eger îsrar bike ku bi zimanê xwe binivîse, wê neçar bimîne ku li pêşberî guhdarekî ker biaxive. Pîraniya mirovan bê çand in û di ti zimanî de nikarin bixwînin, lê bûrjîwazî û akademîsyen tenê guh didin zimanê mêtinger. Tenê çareseriyek xwezayî dimîne; nivîsandina bi zimanê mêtinger.”

Rastiya ku Paulo Freire dibêje, *“Divê qebûl bikin ku ziman ne tenê amûrekî ragihandinê ye, her wiha ji bo hebûna neteweyî jî avahiyek fikrînî ye. Ziman, çandek e”* û Serokdewletê Sao Tiago Arístide Pereira jî bi gotinên, *“Me azadiya xwe bi dest anî û mêtinger qewitandin. Niha dem hatiye ku êdî em ji mêtingerî û mêtingehiya mejiyên xwe rizgar bikin”* îfade dike, esas rakirina vê tehakuma li ser ziman e. Ji ber ku *“fikrên me wê li dijî têgînên nû yên di têkoşîna azadiyê de guherîne têbikoşin.”* Heta ev neyê kirin jî wê polîtîkayên ziman û bişavtinê yên mêtingeran nayên derbas-kirin.

Eger em bidomînin; piştî ku Îsyana Şêx Seîd hat tepeserkirin, di sala 1926'an de îdama 12 serokeşîrên Dêrsimê li Xozatê dibe sedema berxwedanê. Heman salê, operasyona leşkerî ya li dijî Mûsa Beg û eşîra wî ku li Sasonê tevlî Îsyana Şêx Seîd bûn û piştî wê jî berxwedana xwe domandin, serkeftin bi dest neanîbû. Komên ku hê li gelek qadên Kurdistanê li dijî dewletê şer dikirin, hebûna xwe diparastin. Heta vê demê hê zêdetir polîtîkayên, tepeserkirin, îmha û sirgûnê pêk dihatin, li gel vê jî polîtîkayên *“aramîkirin, serkeftin, nermkirinê”* ketibûn dewrê.

Bi taybet jî ji bo eşîrên Dêrsimê ev polîtîka wek ûnsûrek dengyê tê nixrandin, her wiha lîderên Bektaşî jî serdanên xwe yên

Dêrsimê zêde dikin. Li milê din jî, wek rêyek din eşîr li dijî hev bi rêxistin dikirin. Di vê navberê de nêzî milyonek Kurd hatibûn sirgûnkirin. Ji ber ku di warê siyasî û ruhî de pîrmilî lewaziyên avahiya Kurd dihatin nasîn, hewldanan “*polîtîkaya şekir*” ku dixwazin hiyerarşiya eşîran û bi taybet jî reîsên wan bikşînin rexên xwe, bi lez û bez dewam kirine.

Mufetîşiyên Giştî yên ku wek rêveberiya awarte ya bi xweseriya Kurdistanê hatine pêşxistin, hewl dida ku bi qirkirinan ve avahiya xwe ya îdarî bi sazî bike û wer bidomîne. Lê, şikandina berxwedanê ne mimkun bû, wek dihat payin jî arambûyîn, rehetî û sekinîn çênedibû. Li ser vê, bi yasayek di sala 1927’an de yên tevlî Îsyana Şêx Seîd bûne hatin efûkirin, li gelek deverên Kurdistanê jî serbestî û rehetiyek îzafî çêbû.

Dewletê, qanûnên mîna Tahrîrî Sukûn bi bêdengî û ji kûrahî bêtî bike rojev pêk dianî, ji bo hin eşîr û reîsan hin mafên xwecih qebûl kir, destûr dabû ku eşîr, reîs û axayên ku girêdana xwe ya dewletê îspat kirine, vegebin Kurdistanê. Ya dihat şopandin, bi awayekî hê pisportir polîtîkayek Ebdulhemîd bû. Her tim bi şikleki beşek girîng a hêza hevkar girêdayî dewletê dihat hiştin. Her wiha, polîtîkaya qatîlhez bû ku li ser serwerên Kurd ên lewaz bûne û îradeya wan hatiye şikandin dihat bikaranîn.

Têkildarî Berxwedanên Piştî Îsyana Şêx Seîd Agahiyên Kurt

Em demildest diyar bikin ku, “29 Îsyaneke Kurda” a ewqasî tê ziman, çîrokek tam sexte, derew û ferazî ye. Ji ber ku li Kurdistanê ji bilî yek-du îsyanan, di sedsala 20’emîn de tevahiyên pêk hatine, berxwedan in ku li dijî qirkirinê bi pêş ketine. Dewleta KT bi armanca tinekirinê êrîş kiriye, Kurda jî li dijî vê xwe parastine. Ya li dijî êrîşan hatine kirin, xweparastin e, hewldanan jiyanê ye. Ji ber îsyana di wateya giştî de wisa tê pênasekirin; “*Bi armançekê serîrakerin, serîhildan, raperîna li dijî sazûmaniya heyî yan jî hêzên dewletê ye*”. Lê, Kurda wisa nekirine. Kurda tenê li dijî qirkirinên ku li dijî hemberî hebûna wan hatine bipêşxistin, ketine nav berxwedanê.

Di nav kategoriya yek-du îsyanan de –bi şertê em karibin têkil-darî pênaseya berxwedanê bikin- em dikarin Berxwedanan Şêx Seîd bijmêrin, bi dehfdanek gelekî mezin jî Berxwedana Agirî ya Îhsan Nûrî Paşa em dikarin bixin nav. Ji bilî van jî yên ku di 1920'an de pêk hatine yek jî nakeve nav kategoriya îsyane.

Berxwedana Elkê (Bêşebab- 3'yê Îlona 1924): Fitîla Berxwedana Şêx Seîd wê li Elkê ji aliyê Îhsan Nûrî Paşa bihata pêxistin. Wê demê bi rutbeya serpel kar dikir. Dema şifreya Yûsûf Ziya ya “*Kar baş diçin*” wek “*dest pê bikin*” fêm dike, starta berxwedanê didin. Piştî bajarok desteser dikin û dinêrin ku ti deng ji ti kesî dernakeve, Îhsan Nûrî Paşa fêm dike ku şaşıyek heye û bi armanca demildest derbasî Sûriyeyê bibe, derbasî Îranê dibe. Berxwedan beriya dest pê bike, bi dawî bibû.

Berxwedana Elkê di esas de plansaziyek rêxistina Azadî bû. Hatibû xwestin ku piştî serhildanên berbelav, stratejiyeke ku li giştî hatiye berbelavkirin bê şopandin, lê bi bûyera li Elkê ev kifş dibe û Dewleta KT hatibû şiyarkirin. Di encama vê de Xalîdê Cîbranî, Yûsûf Ziya û gelek berxwedêrên Kurd ên li ba wan bûn, di meha Cotmehê de tîr girtin û diavêjin zindana Bedlîsê.

Berxwedana Reşkotan û Ramanê (9-12'ê Tebaxa 1925'an): Bi hinceta ku amadekariyên îsyane dikin, li dijî eşîrên Sînkan, Reşkotan û Bukranê; hareketa tedîp ango terbiyekirinê didin destpêkirin. KT di vê harekatê de nakokiyên eşîran jî bi kar tîne û hin eşîran wek yekîneyên pêşeng bi kar tîne.

Berxwedana Guyan (1925)

Berxwedana Nehrî (10 Hezîran 1925)

Berxwedana Dihê (Erûh-1926): Operasyona dewleta KT a ku bi hinceta qaşo şewqe (kumik) qebûl nekirine hat destpêkirin, bi xwînrijîyeke mezin bi dawî dibe.

Berxwedana Berwarî (1926): Dema hat xwestin Şêx Abdurrahman û derdora wî bê sirgûnê kirin, dijdêrketin çêbû, piştî şerê giran ê du hefteyan Şêx Abdurrahman tê qetilkirin, berxwedan bi dawî dibe.

Berxwedana Hezro (21'ê Çileyê 1926)

Berxwedana Konfederasyona Hewerkan û Mala Haco (1926)

Berxwedana Colemêrg (1926)

Li dijî biryara sirgûnê, gelek eşîrên derdora Colemêrgê yên girêdayî Konfederasyona Ertûşî, dest bi berxwedanê dikin, lê ji ber ku berxwedan ne yekpare bû tê tepeserkirin.

Berxwedana Agirî (16'ê Adara 1926'an): Dewleta KT ji bo karibe Îbrahîm Paşa ango Biroyê Heskê Telî bigire, êrîş dike. Biroyê Heskê Telî jî ku ji malbateke Hesesorî ya eşîra Celaliyan e, berê xwe dide çiyayê Agirî. Mîna gelek serokeşîr û serwerên Kurd, Biroyê Heskê Telî jî li rex Osmaniyan li dijî Rûsan şer kiribû, dema mijara Ermenîyan de dîsa li aliyê dewletê cihê xwe girtibû. Piştî Îsyana Şêx Seîd û berxwedanên cuda, ji ber Dewleta KT navên ku li herêmê bi bandor in ji xwe re wek xeteriyekê dît, biryar girt ku wan sirgûnî Rojava bike. Jixwe, yek ji ew kesên ku Dewleta KT dixwest sirgûn bike jî Biroyê Heskê Telî bû.

Di mehên biharê ya sala 1926'an de dema hewl hat dayîn ku biryar li ser wî û malbata wî bikeve meriyetê li dij derketiye, li dijî esker û jendermeyên hatine şer kiriye, derketiye çiyayan û li ber xwe daye. Biroyê Heskê Telî yê dema dest bi berxwedanê kir, gelek şexsên navdar ên mîna serokeşîrê Şemkanê Temîrê Şemkî û birayê wî û serokeşîrê Sakanê Şêx Abdulqadir jî hatin Agiriyê û tevî berxwedanê bûne.

Hey mijar bû sirgûn, em çend xisûsan li vê zêde bikin. Dewleta KT biryarek bi heman rengî, lê ji vê hê berfirehtir jî di sala 1927'an de girtibû. Dewlet ku biryar dabû 1400 malbatên navdar ên Kurd sirgûnî Rojava bike, li gor xwe tevdîrên cidî bi cih dianîn. Gelek kesên bi nav û deng bi vê sirgûnê ve ji Kurdistanê dûr xist. Yek ji van jî Huseyîn Paşayê Kor ê Serhedî û malbata wî bû. Huseyîn Paşayê Kor ku beriya vê bi xwe berpirsiyartiya gelek Alayên Hemîdî kiribû, li dijî Rûsan jî xizmetên pir mezin ji bo Osmaniyan kirine. Wisa ye ku gelek dîroknas dibêjin; *“Rojhilatê Anatolyayê ne Kazim Karabekir Paşa, lê Huseyîn Paşayê Kor ji Rûs û Ermenîyan rizgar kir.”* Her çiqasî xizmetên mezin ji Osmaniyan re kiribe jî, ji ber ku Kurd e divê bê sirgûnkin. Hem jî ji bo her şexsekî malbatê bi goşeyên cuda yên Tirkiyeyê biteriqin çi ji dest wan

hatine kirine jî. Dema rewş wisa bûye, çawa Berxwedana Agiriyê bi pêş dikeve Huseyîn Paşayê Kor jî berê xwe dide welêt. Ji ber ku kesayetekî wisa di şer de xwedî tecrûbeyên mezin in û di nav gel de jî deng vedaye, eger bigihêje Agiriyê wê bibe tehlûkeyek gelekî mezin. Dema ku Huseyîn Paşayê Kor berê xwe dide Kurdistanê, Dewleta KT jî bi eyarek taybet bi destên xizme wî yê nêz Medenî yê kurê Hecî Mûsa li ser nimêjê dide qetilkirin, her du kurên wî jî bi heman şiklî dema ku serên xwe dişon tên kuştin. Wisa jî navekî girîng ê ku dikare qedera gelekî tayîn bike jî bi îxanetek hundir tê qetilkirin.

Berxwedana Sasonê (Qabilcewz, 1925–1937): Artêşa Tirk di pêvajoyên cuda de 4 caran êrîşî Qabilcewzê dike. Hedef, komkiri-na çekên gel bû. Ji gel 430 kes tene kuştin. Herêma ku dijmin berê xwe dayiyê, hildiveşe, kavi dibe.

Piştî ku berxwedan bi temamî tê tepeserkin, vê carê ji bo avakirina serweriyê bi navê “*Bernameya Islahkirina Qabilcewzê*” tevdir tene pêxistin. Ji bo leşker karibin xwe bi lezûbez bigihînin Qabilcewzê, dema ku gihîştinê jî karibin berxwedanê bitepisînin; rê, pir, baregeh û şiklên nû yê îdareyê dikevin dewrê. Em ji serpêhatiyên niha jî dizanin ku bê çima ev rê, pir û baregeh hatine çekirin.

Berxwedana Koçûşagi (7-30’ê Mijdara 1926’an): Waliyê Amedê yê demê Elî Cemal dibêje, “*Seyidxan ê Kor (ji eşîra Koçûşagi) ku tenê 22 kîlometreyan li bakurrojhilatê Çemişgezekê li Kozlucayê bi cih bûye, bi elimandina xwe ya rêbiriyê ve hin mehkûm û bersûcên bûyera Koçgiriye li ba xwe kom kirine, li bereyên Çemişgezek, Arapgir, Kemah, Kemalîyeyê êrîş dike. Ez bawer nakim ku çekên xwe radest bikin û îtaat bikin. Bi alay û siwarên li Çemişgezekê dikarin bîn tinekirin û wê ev zehf baş be jî. Tevgerê wisa dê bandorê li yê din jî bike*” û di demê kurt de jî wê dest bi êrîşê bike. Êrîşa ku ji aliyê Albay Mûstafa Mûglalî tê birêvebirin, wê di 4’ê Cotmehê de bi filoyên balafiran ve ji hewayî û bejahî bidome û her alî tarûmar bibe. Hedefa vê êrîşa wisa diwar ew bû dixwestin nîşan bidin bê dewlet çiqasî xurt e. Bi gotina gel, dixwestin çavtirsî bikin.

Piştî êrîşê, Albay Mûstafa Mûglalî, 28’ê Mijdara 1926’an fermana, “*Di saet 17.30’an de ji aliyê ferdandariya eniya Bakur tê*

ragihandin, dawî li paqijkirina çemê Kilabûz hatiye ku stara dawî ya rêbirên Koçûşagi bû ku ji mêj ve navê eşîra têkneçûyî ya Dêrsimê û lehengên neteweyî lê dihat kirin” dide fermanên Eniyê. Sibetir jî ango 29’ê Mijdara 1926’an encamên êrîşê wisa tî ragihandin: “Roja 29’ê Mijdarê li gor fermana Femandariya Havali tevger çêbûye û di encama lêgerîn-lêkolînê de tevî mêr, jin û zarok miqtarek asî û miqtarek zêde jî heywan hatine desteserkirin...”

Femandariya Eniya Başûr: Ji sihara heman rojê û şûn de divê ti derên şikeft, çalên li her du milên ku çemê Ekrek ê ji Alibogazi bi navê Çemê Tagar ber bi başûr ve dirêj dibe û digihîje Çemê Tagarê, nemîne ku neyên lêgerîn û lêkolandin...

Ji destpêka harekata terbiyekirina Koçûşagi û vir ve, ji yekîneyên eniya bakur (Alayên 10. û 13.) efserek, 31 esker şehîd bûne, efserek, 53 birîndar dane, her wiha 10 esker wînda bûne û li beramberî vê jî asiyan zirarek mezin dîtine û wek xenîmet jî 1084 sewal, 342 dewar hatine desteserkirin...” Em van raporên jî pirtûka bi navê **(Di Belgeyên Femandariya Giştî de Serhildanên Kurdan)** dizanin. Ev reqemên fermî ne, îcar ên rast wê çilo bin gelo?

Berxwedana Motkî (26 Gulan–25 Tebax 1927): Walîtiya Bedlîsê piştî ferman dide ku li 35 gundên 8 eşîran hem çekên gel bînin komkirin hem jî sirgûnî herêmên din bînin kirin, harekat dest pê dike. Gel li dijî vê derdikeve û li ber xwe dide. Bûyerên Motkî jî wisa dest pê dikin. Artêş, di 26’ê Gulana 1927’an de herêma berxwedanê dorpêç dike. Navên mîna Şêx Evdîrehmanê Mele Eliyê Ênis û Zoriklî Selîm rêbertiya berxwedanê dikin. Piştî rêberên berxwedanê tîne qetilkirin, berxwedan tê tepeserkirin. Mînakê a vê plan û fermana qetilkirinê, di pirtûka **“Di Belgeyên Femandariya Giştî de Serhildanên Kurdan”** de fermana 2. Femandariya Tumenê ye ku di 9’ê Hezîrana 1927’an de navenda wê li Sêrtê ye: “Asiyên ku bi awayekî çalak tevî serhildanê bûne û bi çekan ve bûne sedema şehîdbûyîna gelek, eger dextalê bixwazin jî efûkirina wan wê ne rast be; esas dextalê van ne ji dil e, ji ber zexta esker ti çareyên din nabînin vê dikin; lewma jî ji bo ev di demên pêş de bi zerar nebin, neçarî ye ku yê destên wan çek digirin bi temamî bînin tînekirin; jixwe bi giştî dema berxwedana çekdarî de gelek ji eskerên me birîndar û şehîd kirine; lê, yê heta

niha xwe avêtine dextlê me, pêşî li dexaleta wan neyê girtin, yê teslîm hatine girtin radeştî Alaya 18'emîn bên kirin û di dawiya harekatê de dema tîn sewqkirin, yê hewl bidin birevin bên tinekirin."

Îxanet a ku hema hema di tevahî îşyan û berxwedanên Kurdan de wekî qijnikê ji qirika gelê Kurd neqetiya, li vir jî bi awayekî giran pêk tê.

Di dîroka Kurd de her çiqasî navên kesan biguherin jî, navê îxaneta naguhere û vê carê jî dibe Cemîlê Çeto. Derbasî aliyê Dewleta KT dibe, çiya bi çiya li dijî berxwedêrên Motkiyê li ba dijmin cihê xwe digire. Her çiqasî Evdirehmanê Mala Eliyê Ênis hewl dabe bi gotinên , *"Ger em taştê bin, tu yê firavîn bî"* karaktera KT vebêje jî, Cemîlê Çeto li cem KT cihê xwe digire û berxwedanê dîtispîne.

Piştî tepeserkirina berxwedanê, Cemîlê Çeto jî tê îdamkirin. Û dema îdamkirinê jî dibêje, *"min di nav 7 gundan de veşêrin, li ser gora min jî Cemîlê Çeto ji kerê keto binivîsin."*

Li milekî îxanet wisa dibe, li milê din jî em heman kevneşopiya berxwedana Kurd li vir, li rex Evdirehmanê Mala Eliyê Ênis, Rindexanê ya keça birayê wî Mihemedê Elî dibînin. Rindêxan li herême bi eskerî û şerkeriya xwe tê nasîn. Di şerê demdirêj de bira û pismamê xwe şehîd dide. Lê dîsa jî berxwedanê didomîne. Dema Dewleta KT di pêşengiya Cemîlê Çeto de bi êrîşek berfireh diçe ser çiyayê Mereto, Rindêxan bi birîndarî dikeve dest dijmin. Ji şahidên bûyerê Azîzoglû di hevpeyvînekê de dema berxwedanê vedibêje, behsa lehengiyekê jî dike. Azîzoglû wisa bi lêv dike:

"Her kêliya harekatê bandor li min kiriye. Ne mimkun e ku dema mirov ew zilma ji asîman dibariya û qehremantiyên li ser erdê şîn dibûn bibîne û jê bandor nebe. Ne mimkun e ku domahiya jiyanê xwe jî ji bîr bikim. Lê tevî her tiştî jî ez ji bûyera keça Mihemedê Eliyê Ênis gelekî bandor bûm. Navê keçikê Rindêxan bû. Bedew bû, qasî bedewbûna xwe keçeke leheng jî bû. Rindêxan li ba bavê xwe pêşengiya Tevgera Qabilcewzê dike û bi awayekî çalak di nav şer de cih digirt. Dema harekat hat tepeserkirin, bi birîndarî ket dest. Fermandarê artêşê yê ku li beramberî bedewbûna wê şaşomaşo bû, xwest biçe gel wê. Rindêxan a ku li

hemberî destavêtinê bêçare ma, ji fermanîdar re got, ‘Ez girtiyek im. Hûn dikarin her tiştî bi bedena min bikin, lê ne mimkun e ku li ser van xakên malbata min em werin ba hev. Eger di nav van sînoran de tu dest biavêje min, ez ê xwe bikujim.’

Fermanîdar jî dipirse, ‘sînorên serweriya malbata te li kû diqedin?’ Rindêxan dewam dike, ‘Ava Êlihê sînorê me ye. Piştî Pira Malabadî tu çi dixwazî tu dizanî.’ Fermanîdar qebûl dike. Dema digihêjin Pira Malabadî, Rindêxan ji Fermanîdar re dibêje, ‘Cara dawî dixwazim li xakên bavê xwe binêrim’ û destûrê dixwaze ku derkeve ser pirê. Rindêxan a ku hêdî hêdî li ser pirê dimeşe, ji nişka ve dilezîne û xwe ji ava hênîk a Ava Êlihê re berdide. Tiştê dimîne jî şaşwaziya leşkeran û dirûşmeyên Rindêxan e.”



Rindêxan

Dema Rindêxan li ser pirê ye:

“Ez im rinda Rindêxan

Keça mîr û axa û çîyan

Ey tirkê Tacik

Karê we çi ye li van çîyan

Rinda bûye namdar

Ez dimirim, birîndar û bê zar

Teslîm nabim destê neyar”

Wisa ye berxwedêriya Kurd a li dijî Cemîlê Çetoyan digire, ev e Berxwedêriya Jina Kurd...

Duyemîn Berxwedana Agiriyê (13’ê Îlona 1927)

Berxwedana Biçar (7 Cotmeh–17 Mijdar 1927)

Piştî têkçûyina Îsyana Şêx Seîd, tê plankirin ku dersek wisa tundiyê bidin gelê Kurd ku careke din nikaribin piştî xwe rast bikin. Di pirtûka bi navê **“Di Belgeyên Femandariya Giştî de Serhildanên Kurdan”** de ev plansazî bi awayekî baş tê nîşandan:

“Piştî Komarê, çeka tenkîlê (tepeserkirin, dûrxistin); yên li ber deriyên hikûmetê zilamên hikûmetê ji holê radikirin, dikuştin û yên di aleyhê hikûmetê de destavêtinên herî nemerdî bêtirs dikirin û ti tişt jî lê nedihatîn kirin... Hikûmeta ku yek ferd jî nehiştibû, qud-

reta xwe ya bilind bi yê wisa re bi *temamî dabû nasandin*. Lê, lazim *bû* ku *berhemên vê serkeftina* ku li *beramberî derd û azarên mezin û xwîna bêdawî* ya Tirk hatine *bidestandin*, li *goşeya herî dûr jî bê nîşandan...* *Artêşê mîna* li her *deverê kiribû*, li *vir jî wezîfeya xwe* bi *cih anîye û hewl daye pêk bîne*, *serhildan tepeser kiriye*, *mahfa kiryanan rakiriye*, *piraniya şêx û reîsan tine kiriye*. *Êdî rakirina paşdemayiyên van, pelçiqandina ruh û armancên wan ên basit, tinekirin, jî bo hikûmetê, welat sûdmendkirina gel jî deynê memûrên îdareya sîvîl bû.*

*Rewşa yê sirgûnî rojava hatin kirin û li gund û bajarokan kesên ku endamên malbatên wan xeraban e ku li çiyayan rêbirtiyê dikin; ev xerabên bajarok û gundan ku bi kar û xebata xwe mijûl in û bi tamamî xweyiyê malên xwe ne û li her herêmê xwedî hejmarek zêde ne, mirovên wisa ne ku bi taybet malbat û xizmên kesên ku jî bo îdam û cezayên giran sewqî girtîgehên rojava hatine kirin, bi hestên tolhildanê tijî ne, bi rêka propaganda û tevahî hebûna xwe alîgirên asiyan e û bi her awayî alîkariyê didin rêbiran. Wisa ye ku, jî bo selameta welêt lazim *bû* ku ev eşîrên jî rêbirên çiyayan hê hovtir û wek mîkrobek jehrîtir in, bi giştî û lezûbez sirgûnî Rojava bên kirin, bi taybet di bin çavan de bên hiştin.”* Di cihekî din ê heman pirtûkê de têkildarî serpêhatiyên **Berxwedana Biçar** (7-12’ê Cotmeha 1927’an) jî ev tîn gotin:

“*Gundên li vê herêmê ku cihê harekatê ye, warê asiyan e, malbat û zarokên eşqiyayan li vir dimînin û jî ber ku hema piraniya şênîyên gund xizmên hev in, bi vê hêza ku jî xizimtiyê werdigirin ev şênî madî û manewî alîkarî dane asiyan û hatiye fêmkirin ku li van deveran gelek çek û cebilxaneyên eşîran heye û li beramberî ihtîmala serdegirtin û kemîna eşqiya û şênîyan, yekîneyan beşên eraziya ku hate nîzamkirin bi baldarî lêkolandin, zevî, êzing, giya, ka, şikeft, kom bi tamamî hatine lêkolandin, bi awayekî giştî komên ku piraniya wan mêr û bi qismî jî jin û zarok bûn, hatin komkirin, jî nav van kesên girtî jin hatine tecrîdkirin, yê ku hat fêmkirin dikare çekê rabike û li ba eşqiyayan pêwendîyan wan hene, demildest hatin gulebarankirin.”* Eger em jî belgeyên Dewleta KT bi xwe bibêjin, tenê li vê qadê 280 gund hatine şewitandin û valakirin.

Ji bo vê jî gelek leşkeran vediguhezîn sehayên berxwedanê û êrîş dikin. Çiya bi çiya, gir bi gir, çem bi çem, kevir bi kevir li her derê digerin. Ev harekata dişibe ‘Harekata Sel’ê (lehî) ku wê piştî çend salan li Dêrsimê bê pêşxistin, wê bi şewitandina qasî 300 gundî bi dawî bibe. Bi hezaran mirov dê werin qetilkirin. Kiryarên ku bi gotina “*Yên ev îşyan kirin hûn bûn!*”, tam hewldanek tohlildanê ye.

Berxwedana Elî Resûl (22 Gulan–3 Tebax 1929)

Herekata Tendurekê (14 –27’ê Îlona 1929’an): Ev herekatek tam li gor KT li dijî Şêx Abdulqadir û eşira wî di 14’ê Îlonê de êrîş dest pê dike. Ji ber Şêx xwe li Tendurekê bi cih kiribû, bi bayê lezê derbasî Îranê dibe. Wisa jî êrîş encamgir nabe. Lê, Artêşa KT li vir jî karaktera xwe ya talanker nîşan dide, alav û heywanên ku eşirê ji neçarî li pey xwe hiştibûn, desteser dikin.

Herekata Stewrê (20 Gulan–9 Hezîran 1930): Hêzên leşkerî yên KT ji her aliyê ve êrîşî qada Stewrê ya Mêrdînê dikin, bi dehan gundan dişewitînin. Piştî kavilkirin û şewitandinê vedikişin.

Herekata Zîlanê (20 Hezîran–Îlon 1930): Dema berxwedana Agiriyê ku em ê piştî behsê bikin, ji lîderên berxwedanê Huseyînê Kor û zarokên Emîn Paşa bi ser navenda Zîlanê û qereqolê de digirin. Piştî serdegirtina qereqolê jî berxwedanê didin destpêkirin. Ev berxwedan li jiyangehên din ên mîna Panos, Zîlan, Ebex, Erdîş û gundên wê berbelav dibe.

3. Berxwedana Agirî (7’ê Tîrmeha 1930’an)

Herekata Oramarê (16 Tîrmeh–10 Cotmeh 1930)

Berxwedana Oramarê, tevî nerehetiyên li beramberî pêkanînen faşîzan ên Dewleta KT bi armanca destekkirina berxwedana li Agiriyê ji aliyê Xoybûn tê plankirin û rêxistinkirin û yên mîna Şêx Ehmed Barzanî û Mele Huseyîn Şerîf tê de cih digirin.

Herekata Pîlemûrî (8 Cotmeh–14 Mijdar 1930): Di encama çavdêriyên Fevzî Çakmak de li dijî Erzînganê êrîşek tê lidarxistin. Li gor çavdêriya wî, wê Kurdan li Erzînganê serdestiya nifûsa xwe bi kar bianiya, bi avantajên Elewîtiyê dane jî hewl bidana Tirk bikirana Kurd. Yek-du xalên rapora ku Fevzî Çakmak di 18’ê Îlona 1930’an de amade kiribû, wiha ne:

“1- Di çavdêriyên min ên bajarê Erzînganê de min dît ku terbiyekirin û bidûrxistina gundên Aşkîrîk, Gurk, Dagbey, Haryî ku di rêjeyek girîng de zesarê didin aboriyê û di xerakirina asayîşa vî bajarî de kiryarên herî girîng in, neçarî ye... Li ser vî esasî, bi dîtina min divê Wîlayet ji van gundan; dayîna bace û leşkeran, radestkirina çekên wan bixwaze, dema encamek neyînî çêbû jî, ji bo gundên Kurdan ên ku li vê herêmê gelekî bi ser xwe ve çûne bandor bibin û giraniya dewletê bibînin, wê guncav be ku yekîneyek hewayî ya neqlî Erzînganê bê kirin van gundan texrîb bike.

2- Li navçeya navendî ya Erzînganê 10.000 (deh hezar) Kurd hene. Ev, ji Elewîtiyê jî sûdê werdigirin û hewl didin gundên Tirkan ên heyî bikin Kurd, zimanê Kurdî berbelav bikin. Piştî çend salan dikare fikar çêbibin ku wê Kurdîbûn tevahî Erzînganê dagir bike, gelek gundên Tirkan ên ku bi kevneşopî Tirk, lê Elewî ne; bi feraseta ku Elewîti îfadeya Kurdîtiyê ye, zimanê xwe yê zikmakî terikandine û Kurdî diaxivin. Divê gundên Rusaray, Mitini, Şinci-gi, Kurtkendi, Kellarîk ku serkêşiya vî karî dikin, bi awayekî bingeşîn bêne qeydkirin, ji van jî yên pêwîst neqlî Trakyayê bêne kirin û hin reîsên li vê herêmê jî li navenda bajêr û di nezareta polîsan de bêne bicihkirin û wisa jî ewlehî bê sazkin. Ji bo gundên Elewîyên Tirk karibin bi Tirkî biaxivin û zimanê Tirkî li tevahî herêmê berbelav bikin, pêdivî bi tevdîrên bingeşîn hene.” Bi berdewamî Fevzî Çakmak tîne ziman ku eger pêşî li vê neyê girtin, dest lê neyê werdan wê ji bo siberojê bibe sedema encamên sosret. Piştî vê rapora Fevzî Çakmak, li dijî Erzînganê êrîş dest pê dike. Bi sedan gund tîne şewitandin û kavilkirin. Gav bi gav dengê pêkanînen li dijî Dêrsimê tê bihîstin. Lê mixabin, wê ev deng neyê ferqkirin û ji bo Dêrsimê tevdîrên têrker neyên pêşxistin.

Cemiyeta Xoybûn

Cemiyeta Xoybûn ku di nav Kurdan de beriya berxwedanê rêxistinbûyîna herî berfireh e, di 5'ê Îlona 1927'an de li Lubnanê tê damezrandin. Em dizanin ku lîderê wê yê ewil Celadet Elî Bedirxan e. Kurdên çar parçeyên Kurdistanê jî di nav xwe de vedihewîne. Di nav endamên wê de her çiqasî kesayetên pêşeng ji

arîstokrasiya Kurd bin jî, jin, xwendevan, gundî, karker jî cihê xwe tê de digirin. Hin endamên kevn ên Cemiyeta Kurd Tealî, Teşkilatî Îçtîmaiye, Kurd Millet Firkasi jî di damezrandina Xoybûnê de cihê xwe digirin. Di damezrandina Xoybûnê de wek li jor jî hat îfadekirin, Bedîrxanî hene. Celadet Bedîrxan bi xwe diyar dike ku ji bo li Sûriyeyê kovarên Hawar û Ronahî ava bike, piştgiriya herî mezin ji Fransiyayê digirin. Rêxistina Xoybûn, pêwendiyê li ba Cemiyeta Taşnak a Ermenî datîne, ji rayedarên DYA, Îtalya, Îngilîstan, Fransayê re nameyan dişîne. Tê gotin ku Sureyya Bedîrxan wek nûnerê Xoybûnê serdana DYA dike. Xoybûn, yekîtiya neteweyî ya tevahî Kurdan dike hedef. Lê gelekî zehmet e ku em bêjin serkeftî bû.

Ji ber ku Xoybûn di pêvajoyek wisa dîrokî de hatiye avakirin, ji bo Kurdan xwedî girîngiyek zehf mezin e. Dema ku Dewleta KT li dijî gelê Kurd dest bi êrişeke topyekun dike, damezrandina xwe îlan dike. Li ser vî esasî biryardariyeke potansiyela berxwedanê pêşkêş dike û wek xala duyemîn a li jor hat gotin ku *“Di bin serweriya Tirkiyeyê de rizgariya Kurdistan û Kurdan”* jî li ser vî himî hevokên gelekî girîng û dîrokî ne. Wek me bi lêv kir, ev serpêhatî li dijî faşîzmê biryardariyeke sekna cidî ye. Ev sekin bi taybet di pênc xalên destpêkê yên Xoybûnê de jî tê nîşandan.

“ 1- Sala 1927’an meha Îlonê roja 5’an bi biryara Yekemîn Kongreya Kurd û bi navê Xoybûnê, rêxistinek Kurd a neteweyî hatiye damezrandin.

2- Armanca rêxistinê, di bin serweriya Tirkiyeyê de rizgariya Kurdistan û Kurdan û di nav sînorên wê yên xwezayî û neteweyî de damezrandina dewletek Kurdistana serbixwe ye.

3-Ji bo serxistina vê armancê, rêxistin wê tevahî Kurdan li dor xwe kom bike, di çarçoveya berjewendiyên beramber de pêwendiyê li ba her cure ûnsûran deyne.

4- Her Kurdekî ku pêdiviyên sonda neteweyî ya Kurd û vê rêgezê qebûl dikin û pêk tînin, dikarin tevî rêxistina Xoybûnê bibin. Her kes, dema beşdarî rêxistinê dibe wê heqekî (miz) tevlibûyî bide û teahûda mehekê ragihîne.

5- Her kesên ku wê tevî rêxistinê bibin, pêwîst e ku di hizûra heyetek wezîfedar de sonda diyarkirî bixwin.”

Dema ku Abdullah Ocalan, Xoybûnê dinirxîne wiha dibêje: **“Li Sûriyê rejîma manda ya Franseyê heta bi Şerê Cîhanê yê Du-yemîn dewam kir û vê yekê jî kir ku rewşenbîrên Kurd hinekî atmosfereke azad bibînin. Di çapkirina kovaran û avakirina rêxistinan de zêde li astengiyan rast nehatine. Lê nikarîbûne statuyeke qanûnî ya Kurd jî pêk bînin. Kamûran Elî Bedirxan û derdora wî kirinên anti-Kurd şopandine û li dijî vê têkoşîna çekdarî ceribandine (li çiyayên Kolik ceribandina şerekî gerîlayî ji aliyê Osman Sebrî ve), ji bo serîrakerina Agiriyê rêxistina Xoybûnê saz kirine (bi maneya ‘weke xwe mayîn’, ‘xwebûn’ navekî di cih de ye), kovara Hawarê derxistine û ev hemû jî xebatên girîng ên vê demê ne. Gelek hewldanên wan ên dîplomafîk jî çêbûne. Lê di hemûyan de jî serketina li bendê bûn bi dest nexistine. Dema ku mirov hewldanên korkirina bîr û hafizayê li ber çavan bigire, eşkere ye ku ev xebatên hatine kirin girîng in.”** Wê ne şaş be ku li gel Tevgera PKK’ê, Tevgera Xoybûnê jî weke tevgera ku Kurdistanê bi giştî dike armanc û li gor vê nêzîkatiyekê pêşkêş dike, bê nîrxandin. Wek li jor jî hatiye îfadekirin, her çiqaşî serkeftina ku tê xwestin bi dest neanîbe jî, ji bo di dîrokê de bibe nîşeyek jî xalek pir girîng a werçerxê ye.

Berxwedana Agiriyê û Îhsan Nûrî Paşa

Di sala 1927’an de ji bo rawestandina “îsyana” li Agiriyê û di encam de lihevkirinekê saz bike, dewletê 12 parlamenterên xwe ji bo ku berxwedêrên li herêmê bibînin wezîfedar kir. Dewletê beriya vê hewl daye bi hêza leşkerî bitepisîne, lê encamgir nebûye, paşê jî li gor polîtîkaya aramîkirinê jî vê carê ketiye pey rêkên lihevkinê. Xoybûn a ku di 1927’an de hat damezrandin, di pêşengî û ferman-dariya Îhsan Nûrî Paşa de ji bo Bakurê Kurdistanê serxwebûn, ji bo Başûrê Kurdistanê ku di kontrola Îngilîz û Fransiyan de bû, xweserî xwestiye.

Îhsan Nûrî Paşa yê ku ji lîderên Berxwedanê Agiriyê ye, Bedlîsî ye. Femandarek e ku di artêşa Tirk de wezîfe kiriye. Dema bi îlana Komarê ve sozên ku ji bo Kurdan hatibûn dayîn nehatin cih, Îhsan Nûrî dest ji wezîfeyê berdide û ji bo azadiya Kurdistanê

dest bi amadekariyên berxwedanê dike. Îhsan Nûrî di bîranînên xwe de wisa behsa wê demê dike, *“Li şûna jiyaneke êsirtî, çêtir e ku mirin bi şer be.”*

Wextê ku dewleta KT Îsyana di pêşengtiya Şêx Seîd de ditepisîne, wê demê li dijî her deverê Kurdistanê planek êrîşê dixwe. Hedefa yekemîn a van êrîşan ew e ku ji bo qutifandinê çî pêwîst be dê bêne kirin. Ji bo vê jî demildest berê xwe dane qirkirinê. Lîderên îsyanan, her kesên xwedî potansiyela lîdertiye da liqandine, bajar û bejahî topbaran kirine. Bi sed hezaran Kurd, li gor Yasaya Îskana Mecbûrî ku piştî îsyane hat derxistin, ji Kurdistanê sirgûn kirine. Bi awayekî zêde ketine nav hewla planên Tirk-kirinê. Projeyên Tirk-kirinê yên ku di dema Îttîhad Teraqî de dihatin ziman, hatine lezandin, li Erdnîgariya Kurdistanê jî bi deh hezaran Tirk an jî koçber hatine bicihkirin. Kurdistan, wê di van salan de bi pêkanînên zext û zora taybet a herî faşîzan bihata birêvebirin. Ji bo Kurdistanê, Qanûna Takrîr-î Sukûn, Mehkemeyên Îstîklalê, Mufetişiyên Ûmûmî saziyên dewletê yên qutifandinê ne.

Li dijî van êrîşên faşîzan ên dewletê, li her deverê Kurdistanê berxwedan bi pêş ketin. Ji ya biçûk heta ya berfireh, bi dehan berxwedan çêbûn. Li beramberî tabloya heyî ti tiştêkî din jî jixwe nikaribûn bikirana. An wê teslîm bibana- ku bêrûmetî ye- an jî wê li ber xwe bidana, ev jî wê bibûya têkçûnên ku taliyên wan şêlû ne. Dehfikek tîpîk a Kurdan...

Yek ji sehayên ku gelê Kurd li dijî êrîşên KT dest bi liv û tevgerê kir jî, wê Agirî bûya. Rejîma Kemalîst di sala 1927'an meha Îlonê de li dijî çiyayê Agirî bi hêzek mezin a leşkerî ya di fermandariya Salîh Paşa de dest bi êrîşê dike. Di vê êrîşa xwe de Rejîma Kemalîst destvala vedigere. Kurd, li dijî zext û zilmê li ber xwe didin, kelheya ku bi cih bûne, bi dehan eşîran ve diparêzin. Kuştiyên wan çêdibin, lê wê têk neçin. Xoybûn, ku wek Rêxistînek Eniya Kurd a hevpar li Lubnanê beriya vê pêvajoyê tê damezrandin, li beramberî Berxwedana Agirî bêdeng namîne. Piştî ku berxwedan têk naçe, vê gavê Xoybûn li Agiriyê **“Civîna Neteweyî ya Kurd”** li dar dixwe, damezrandina **“Hikûmeta Neteweyî”** radi-gihîne. Wek hedef jî tespîta wê Kurdistanek serbixwe ye.



Xoybûn, ji bo lîdertiya leşkerî ya berxwedanê Îhsan Nûrî, ji bo lîdertiya siyasî jî Îbrahîm Heskê wezîfedar dike. Îhsan Nûrî bi çapxaneyek seretayî ve du rojenameyên bi navê **“Agirî”** û **“Gaziya Welat”** derdixe û propagandayê dike. Danezanek bi serenavê **“Agirî Agir Dîbarîne”** diweşîne, armancên berxwedanê ji gel re radigihîne. Îhsan Nûrî Paşa ji ber ku wek efserekî kevn tarzê şerê dewletê dizane, lewaziyên wê jî dizane. Ji ber vê jî bi têkoşîneke ku em dikarin wek tarzê gerîla bi

nav bikin, hedef dike ku dewletê biperitîne, ji Kurdistanê vekişîne. Li gor stratejiya wî, wê destpêkê dewlet biperite, lêdan bên nermkirin, otorîteya dewletê bê pelixandin, paşê jî bi serhildanek gel ve wê bigihêje hedefa xwe. Dikare bê gotin ku; cih û mekanê ku yekemîn car Ala Kurdistanê bi kar aniye, Berxwedana Çiyayê Agirî ye.

Berxwedan her ku diçe ji bo dewletê hê tehlûketir dibe. Wê li rê û rêbazên din bigerin ku karibin vê berxwedana xwedî rêbertiyek saxlem bitepîşînin. Rejîma Kemalîst a ku kevneşopîya Osmanîyan baş dawerivandiye, dema lê dinêre nikare ti encamê ji qirkirinan bigire, vê carê jî ji bo xapandina gelê Kurd, qanûnek efûyê ji bo berdana ew kesên ku berê sirgûn kiribûn û dîl girtibûn derdixe. Lîdertiya bihîzyar a berxwedanê û rêxistina Xoybûnê, hişyariyê dike ku bi vê efûyê ti kes nexape û nebin amûrê listokê. Dema gel qîma xwe bi vê efûyê nayne, vê carê jî –wek di dîroka me de zehf hene- ji bo kirîna lîdertiya berxwedanê sozan dide. Di sala 1928’an de hevdîtinek pêk tê, li vir Rejîma Kemalîst rutbeyek leşkerî ya payebilind pêşniyarî Îhsan Nûrî Paşa dike. Ev pêşniyarên wisa ne ku dikare bi korgeneraltiya îro re bê qiyaskirin.

Ji bo vê hewldana kirînê, wê bersiva Îhsan Nûrî Paşa bi vî şiklî be, “*Dewleta Tirk bila derhal Kurdistanê vala bike û serweriya Kurdistanê binase.*” Dewleta KT wê teklîfên hemreng ji bo lîderên din ên berxwedanê jî bibe. Yek ji serekeyên ku ji roja yekemîn ve Berxwedana Agirî bi rêxistin kir û dimeşand, Biroyê Heskê Telî bû. Biroyê Heskê Telî, ji milekî ve lîdertiye ji Îhsan Nûrî re dihêle ku ji aliyê Xoybûnê hatiye tayînkirin û li Agiriyê hatiye wezîfedarkirin. Lê, wek me got, yek ji navê herî girîng ê berxwedanê jî Biroyê Heskê Telî ye. Ji ber dewleta KT jî vê dizanî, ji bo wî jî nameyên tijî sozên cur bi cur dişandin. Ji bo yek ji van nameyên dewleta KT wê Biroyê Heskê Telî vê bersivê bide:

“*Waliyê Bazîdê Sureyya Beg,*

Ez nameya we yê No 1360 û bi dîroka 28. 2. 28 dibersivînim. Min bi keyfxweşiyekê ve nameya we xwend. Nameya we radigihîne ku we Teslîmbûyîna me qebûl kiriye. Lê belê, me ji bo ti meqamên fermî behsa teslîmbûna xwe an jî serîtewandîna xwe nekiriye. Eger bi rastî jî efûyek hebe, divê ev bi giştî be û li gor yasayên çaxê me yê şareza be. Eger ku hikûmet dixwaze bi efûyê ve mirovên cahil bixapîne jî ev dibê pîrsgirêkeke din. Nexwe, ne pêwîst e ku hûn ji bo mirovên mîna me tiştên wisa bixwazin. Ji ber ku em mirovên wisa ne ku têra me tecrûbeyên me hene, me têra xwe cihan dîtiye û em dinasin...

Divê hikûmeta Tirk vê qebûl bike. Eger hûn efûyek giştî ya li gor şaristaniya me, çaxa me, nîjad û olê me derxînin, em ê bi keyfxweşî qebûl bikin. Lê, eger ku hûn bi van tevdîran ve qesta mirovên ku hê jî hûn bi çavên hovan lê dinêrin dîkin, ti kesên ku hûn bikaribin bixapînin nîne... Encex piştî ku tevahî sirgûn li welatê xwe vegerin, wê demê em dikarin vegera me jî biaxivin...”
(Kemal Suphandad, Berxwedana **Agirî û Haydaranî**)

Eger em bi mijara xwe dakevin, Berxwedana Kurd a ku naven-da wê Agirî ye, her ku diçe rehên xwe berfireh dike. Sazîbûnên xwe bi pêş dixê. Xoybûn, Agiriyê wek “*wîlayeteke Kurdistana Serbixwe*” îlan dike. Rêveberiya xwecih saz dike, walî û midûran tayîn dike.

Berxwedana Agiriyê tenê bi Agiriyê re sînordar namîne. Di pirtûka “**Îsyana Agirî**” de ku bîranînên Îhsan Nûrî Paşa ye, em

fêm dîkin ku bi tarzê gerîla li her derê rêxistinbûyînên biçûk ava kirine û yekeyên çalakiyan şandine. Wê timên wî biçin Çewligê, Colemêrgê, Wanê, Bedlîsê û heta Dêrsimê. Dema pêşketin di vî warî de bûn, di 19'ê Hezîranan 1930'î de berxwedanek nû rû dide. Yekeyên ku Îhsan Nûrî Paşa şandine, li herêman pêwendîyan li ba şênîyan datînin, hêzên leşkerî yên rejîma Kemalîst dîkin hedef. Berxwedan ji serî heta binî berbelav dibe. Ne wek mîna tê gotin “çend şaqî” ne. A li ber xwe dide, gel bi xwe ye. Li gelek deverên qadên rizgarkirî yên ku hêzên dewletê nikarîbûn biketanê hatibûn avakirin.

Bi sedan –tam 1700- leşker dîl hatine girtin. Ev jî ne di serdegirtinên wisa de ku bi deh hezaran Şervanên Kurd tevî bûne, hatine kirin. Di pirtûka Agri Îsyani de tê gotin ku Berxwedêrên Kurd dema li dora Elbakê ji wezîfeyê vedigerin, rastî tabûrek leşkerên Tirk tî. Kemînê datînin. Bi giştî jî teslîm digirin. Lê, nîzanin ku wê êsîran çawa bibin. Tabûr, hema hema ji 120 leşkeran pêk tê. Hejmara berxwedêran jî 15 in. Rêka wan a çareseriyê ev e; her kes çeka xwe deyne erdê, çend leşkerên herî dawî xwe li erdê dirêj bikin, yên din di rê re biçin Wanê. Ha, ew gotinên mîna “*bi deh hezaran şaqiyên Kurd*” ev berxwedêrên çekdar ên rêxistinkirî ne. Demecek Mûstafa Kemal ku ji çapemeniya derve re diaxive û dibêje, “*eger ev Şerê Kurd hê dirêjtir bike, ez ê bi xwe biçim Kurdistanê û vê serhildanê tepeser bikim*” di vê pêvajoyê de ye. Em lê ser vê çend tiştên din jî zêde bikin, di vê pêvajoya berxwedanê de hevîna Îhsan Nûrî Paşa yê Çerkez, Yaşar Xanim jî bi awayekî çalak cihê xwe digire, wek şervanekê şer dike. Li Agiriyê berxwedan didome, ji bilî kesên ku li qadên din ên Kurdistanê piştgiriya dîkin, bi taybet ji bo zeîfkirina Dewleta KT biçûk bin jî berxwedan rû didin. Wek nimûne, Haco Axa li derdora Nisêbînê çalakî li dar xistine. Her wiha, lîderên Kurd ên navdar ên mîna Şêx Abdurrahîm, Yado û Şêx Tahîr ji Rihayê heta Cizîrê, li xeta Nisêbîn-Cizîr û Mêrdîn-Wêranşarê çalakiyên girîng li dar xistine. Ev çalakiyên ku li gor biryara Xoybûnê tîn pêşxistin, tevî azweriyên mezin jî li gor dihat xwestin bi encam nebûne. Her wiha Şêx Ehmed Barzanî jî li Behdînan erîşan dibe ser hêzên dewleta Tirk yên ku li Oramarê cih bûne.

Weke ku me li jor jî anîbû ziman, Îhsan Nûrî Paşa tevahî hewldanên bertîl û kirîne yên Dewleta Tirk red dike, tekane şertê xwe jî ragihandibû ku divê Artêşa Tirk ji Kurdistanê vekişe. Her çiqasî serkêşê berxwedanê Îhsan Nûrî Paşa jî bû ku xwendî, rewşenbîr û ji eskeriyê fêr dikir; ji ber ku wek nexweşiya dîroki ya Kurd pêşiya xwe nedît, ji ber safîtiyê bi awayekî zêde piştî xwe bi Îranê girê da û tabî ji ber îxaneta hundirîn nehesiband, hêzên leşkerî yên Îran û Tirk –berê xwe dan Îranê- ji di milan ve êrîş kirin û berxwedan bi xwînrijîyek mezin tepeser kirin. Ya piştî qetlîamê hat kirin jî sirgûn û koçberkirin bû.

Rejîma Kemalîst di tevahî êrîşên xwe de ku li dijî Agiriyê li dar xistin, têkçûyî ye. Di wan salan de beşek Çiyayê Agirî di nav xakên Îranê de ye. Dema ku tehde li wan dihat, hêzên Îhsan Nûrî Paşa derbasî milê din dibûn. Rejîma Kemalîst dema ev rewş fêr kir, bi Îranê re rûdinê, dixwaze ku li milê xwe ji binî heta serî li quntarên Agiriyê hêzên Îranê bêne bicihkirin. Dûvre, di encama peymanên din de jî, Agirî bi giştî tevî xakên Tirkiyeyê tê kirin. Li milekî êrîşên hewayî, li milê din topbaran, tam dibe qadek şer Agirî. Dema şer dirêj kir û rêkên îkmalê ji aliyê dewleta Îranê hatin qutkirin, bi demê re wê cebilxaneyê hêzên Îhsan Nûrî Paşa biqede û neçar bimînin ku vekişin.

25'ê Îlonê wê berxwedan bê tepisandin û Îhsan Nûrî Paşa derbasî Îranê bibe. Her çiqasî vekişiyabe Îranê jî, hê bawer nake ku Îranî wê ji pişt ve li Kurdan bidin, *“ji ber ku Îranî jî Arî ne.”* Halbûkî, şahê demê yê Îranê Riza Xan tam 3 mehan li Tirkiyeyê bûye mêvan, li her deverê hatiye gerandin. Dewleta Îranê, sînortênê li Kurdan negirtiye. Di heman demê de li Rojhilatê Kurdistanê berê xwe daye alîgirên berxwedêran jî û gelek mirovên Kurd qetil kirine. Ji van ê herî tê zanîn jî Êsibê Evdal e ku destpêkê tê sînordarkirin, dûvre girtin û herî dawî jî digirin û li girtîgeha Tebrîzê qetil dikin. Bi girtina vê beşê re em diyar bikin ku; Îhsan Nûrî Paşa di 18'ê Adara 1976'an de li Tehranê di encama qezayekê de wê wek şervanekî Kurd ê xemgîn jiyana xwe ji dest bide.

Erê, berxwedan hatiye tepisandin. Wek her tim bûye, vê carî jî ya ku piştî berxwedanê pêş ketiye, hewldanên qirkirinê ne. Wezîrê Dadê yê demê Mahmûd Esat Bozkûrt ku heyranê Naziyan bû, bêtî eyb û fedî bi awayekî êşkere dibêje, bê wê çi were serê kesên ku

ne Tirk in, *“Tirk, yekane efendî, yekane xwediyê vî welatî ye. Yên ku ne ji nîjada saf a Tirk in, li vî welatî tenê xwediyê mafekî ne. Mafê xizmetkariya Tirkan, mafê xulamtiya Tirkan.”* (Milliyet, 19 İlon 1930)

Piştî ku berxwedan têk çû jî gelek berxwedêran têkoşîna xwe domandin. Dewleta Tirk a ku nikarîbû serî bi Biroyê Heskê Telî re derkeve, bi destê cehşekî bi navê Emîrxan ve dixwe kemînê, bi birîndariyek giran digire û qetil dike. Şexsiyetên Kurd ên navdar ên mîna Reşoyê Silo, Şêx Zahir, Seyidxan û Elîcan wê berxwedana xwe bi tarzê gerîla ve çend salên din jî bidomînin.

1400 malbatên Kurd tînin sirgûnkirin, gelek di rêka sirgûnê de tînin qetilkirin. Û li dijî Kurdan yek jî qetlîamên herî hov ên dirokê, Qetlîama Zîlanê dikin. Geliyê ku jî Tendurekê heta Ebexê dûvdirêj dibe û bi dehan jiyangehan di nav xwe de dihevin, jî serî heta binî di bin xwînê de tê hiştin. Ji Tendurekê dadikevin, jî jêr ve jî jî Ebexê dikevin gelî û ti zindiyî sax nahêlin. Li gor hin nivîskarên 45 hezar, li gor hinên din jî hejmarek hê zêdetir Kurd hatine qetilkirin.

Belgeyên dewletê dibêjin ku li vir 44 gund hatine kavilkirin û şewitandin. Her wiha, mîna ku piştî her berxwedanê dikin, li vir jî dewleta talanker tevahî malên gel desteser dike, qaşo rêka bi xwîn a medeniyetê jî bo xwe vedike.

Bi van jî çavên wan têr nabe, de îca di rojnameya Cumhuriyetê ya di 2'yê Tîrmeha 1930'î de wisa tê gotin: *“Eşqiya bi tîştî tînin tinekirin. Hêzên me, dora Çiyayê Ararat bi temamî girtibûn. Hikûmetê biryar da ku vê carê mijara Şerqê (Rojhilat) jî kokê hel bike.*

...Hikûmet îmhayê dicehdîne (hewl dide)... Ev hûrmêşa ku heywanên gel didizî, gund kaviyê dikir, êdî dike jî kokê bê birîn... Ev fîsadên ku ne tenê jî bo dizîtiyek adî, li welat bi hêrsa hemleyek îrtîcayê êrîştî sînorên me kirine, vê carê eşkere ye ku tevdirên jî bo fetisandina teqez hatine girtin. (Kemal Suphandag, **Berxwedana Agirî û Haydaranî**)

Helbet, ev jî têrî wan nake, rojnameya Vakitê di 13'ê Tîrmeha 1930'î de dibêje, *“Asî, di nav 5 rojan de hatin tinekirin. Yên li çemê Zeylanê bi temamî hatin tinekirin. Ji van tenê kesek jî rizgar*

nebûne. Li Agiriyê tevger didome. Ji duh ve li sehaya hareketê nemane. Hêzên me yê mezîn, yê li çiyayên asê û bilind jî mahf kirine. Çemê Zeylanê bi sedan cenazeyî tijî ye...

Her wiha, rojnameya Cumhuriyetê di 14'ê Tîrmeha 1930'î de vê dinivîse; *"Ji bo vê derdora hoveber a ku li gel heywanan li ser ban radizên, nizanin biçin tualetê jî û ser malên xwe û çolter giştî veguherandine sergoyan; artêşa me di heman demê de medeniyet jî aniye. Fêrî jiyana mirovî kiriye."* (Faîk Bûlût, **Di Çapemeniya Tirk de Kurd**)

Herî dawî ji bo kûrahiya fikrên nijadperestî û faşistî nîşan bide jî:

"Li girên çiyayê Agiriyê, qasî 1500 eşqiyayî hene ku ketine qulan. Balafrîrên me bi dijwarî bombeyan li ser eşqiyayan dibarînin. Çiyayê Agirî, timî di nav teqîn û lêdanê de dinale. Bazên hesin ên Tirk, hesabê asiyan paqij dikin. Gundên ku eşqiya çûyinê, bi temamî tên hilweşandin. Yê di herekata Zîlanê de hatin îmhakirin, nêzî 15 hezaran e. Çemê Zîlanê heta ber dev tijî cenaze bûye... Di nav vê hefteyê de wê harekata paqijkirina çiyayê Agirî dest pê bike. Fermanîdar Salih Paşa bi xwe wê li Agiriyê harekata lêkolîn-lêgerînê bide destpêkirin. Bi xewnên şevan jî rizgariya ji vê nabe." (16 Tîrmeh 1930, **Rojnameya Cumhuriyet**)



Piştî salan jî li Geliyê Zîlanê hê di şikeftan de û di bin tehtan de hestiyên mirovan tên dîtîn. Ev jî asta hovîtiyê radixe ber çavan.

Wisa hesibandine ku her kes pelçiqande, îcar jî di sala 1933'yan de şîara bi navê “Andimiz (Sonda me)” di serî de Kurd, li serê bi dehan gel û baweriyên kirine bela. *"Tirk im, rast im, zîrek im/ rêgeza min/parastina biçûkan, rêzdariya mezinan/ ji cewherê xwe hê zêdetir hezkirina welat, mîletê xwe ye./ Armanca min; bilindbûn, bi pêş ve çûyîn e./Ey Ataturkê Mezin!/Ez sond dixwim ku li ser rêka te vekirî, heta hedefa te nîşandayî, bêyî rawestandî bimeşim./* **Hebûna min, diyarî hebûna Tirk bibe./** *Çi Bextewer e ku yê dibêje ez Tirk im!* " Her hal li dinê ti kesî sondek an jî şîarek wisa faşîzan nenivîsandiye. Ev sond bi serê xwe jî mînakek gelekî balkêş e ku bê dixwazîna Qirkirina Çandîni heta kû derê bibin nîşan dide.

Berxwedana Dêrsimê, Rapora Kurdan a Înonu, Îxanet û Qirkirin

Herêma Dêrsimê di dîroka Kurdistanê de xwedî cihekî xweser e. Dikare bê gotin ku; bi salan ti leşkerên dijmin lingê xwe navêtin ser xaka wê. Dêrsim wek herêmek Elewîyan ji aliyê eşîran tê birêvebirin. Ji ber têkiliyên olî helbet ji hev jî ne qut in.

Em bi bîr bixin ku ji pêvajoya Împaratoriya Osmaniyan û şûn de li ser Dêrsimê bi dehan caran êrîş pêk hatine. Mînak, di sala 1797'an de fermanîyê Gurcu yê Osmaniyan ku navê wî Yûsûf Ziyaeddîn Paşayê Kor e, dema dibe Begêbegan ê Kurdistanê, wek karê xwe yê yekem li Dêrsimê bang li 150 rûspiyên eşîran dike û li Erzînganê qetil dike. Her çiqasî bûyerên mîna vê her rû dabin jî, Dêrsim ti carî teslimî Osmaniyan nebûye û ti carî jî serweriya Osmaniyan qebûl nekiriye. Ji rewşenbîrên Osmaniyan ê Tirkparêz Naşît Hakî dibêje li dijî Dêrsimê 108 caran êrîş hatine lidarxistin û wiha lê zêde dike, *"Dewletê çûye ser Dêrsimê, lê serkeftin bi dest neaniye!"*



Piştî bi salan, wê cara yekem di sala 1938'an de leşkerên biyanî pê li xaka Dêrsimê bikirana. Dema gelek deverên Kurdistanê hatin bédengkirin, wê dor bihata Dêrsimê jî. Rejîma Kemalîst a ku beriya vê pêwendiyên taybet li ba Dêrsimîyan danîbû û di Berxwedanên Kurdan de béalî dihişt, gav bi gav amadekariyên êrişê li dijî Dêrsimê dike. Destpêkê wê di 25'ê Kanûna 1935'an de bi navê **"Qanûna Tûncelî"** yasaya hejmar 2884'an derbixistana. Wê navê Dêrsimê bihata guhertin. Li gor xwe wê *"deriyê zîv"* bi Destê Tûnc fetih bikirana. Ji ber vê jî wê navê Dêrsimê bikiranan Tûncelî. Piştî berxwedana li Kurdistanê, li gelek deveran Mufetişiyên Giştî tên avakirin. Dêrsim li gel çend bajaran (Elezîz, Erzîngan, Çewlig) wê cihê xwe di nav Yekemîn Mufetişiya Giştî de bigirta. Lê, ji bo êrişên siberojê hê bi saxlemî navendî bibin jî wê

Çaremîn Walîtiya Giştî bihata avakirin. Mehkemeya Îstîklalê wê bê avakirin. Wê Abdûllah Alpdogan jî bianiyana ser wê. Alpdogan, zavayê Sakalli Nûrettîn Paşa ye ku di Îsyana Koçgîrî û dûvre jî li Îzmîrê di qetilkirina Yewnaniyan de rolek sereke listiye. Alpdogan, hem waliyê Dêrsimê ye hem jî fermandarê wê yê leşkerî ye.

Her çiqasî nivîsa Abdûllah Alpdogan a ku bê Dêrsim çawa kirine Tûncelî vedibêje, dirêj be jî, lazim e em li vir bidin û avahiya zihniyeta mêtîngeriye li ber çavan raxînin.

“Bapîrên me hê dema li Asyaya Navîn dijiyan, fêrî bikaranîna tûncê bibûn. Parzemîna Ewrûpayê ya ku îro serkêşîya medeniyetê dike, hê di serdema keviran de bû, Tirên li Rojhilata Navîn jî zû ve derbasî serdema tûncê bibûn. Û vê medeniyeta tûncê jî gelekî bi pêş de biribûn. Bi hunerekî zehf zêde maden bi kar anîne. Mis (sifir) û qela (pîl) têkilî hev kirine, tiştên hê xurttir û hê qayimtir ava kirine. Û heta karûbarên jê re hunera nexşan (çîn) tê gotin û amûrên nazik ava kirine. Lê, dema ew zîwayiya mezin a ku êdî ji hêla tevahî cihanê tê zanîn, behrên mezin ên li nîveka parzemîna Asyayê jî zîwa kirin, jiyanê medenî li çolê nema domayîye û koça mezin dest pê kirîye...

Ha, ew Tirkên ku di rojên koç û êrîşên mezin de ketin rêka çiyayên Asyayê, ev rê şopandine, digihêjin çiyayên Toroson ku em îro dibêjin çiyayên Dêrsimê û lê dewama çiyayên Asyayê ne. Niha ji ber li herêma ku jê re Dêrsim tê gotin, şertên xwezayî gelekî guncav dîtine, li vir bi cih bûne. Zilamên ku pir baş dizanin maden bi kar bînin, mêze dikin ku li Dêrsimê madenên mis û qelayê li rex hev û zehf zêde ne. Li vir jî bi cih dibin. Yên ku li Dêrsimê û li van çiyayan bi cih bûne, demildest li wir medeniyeta xwe ava dikin û bi têkilhevîkirina mis û qelayê ve dest bi çekirina tûncê dikin. Li vir ew madenên ku ji wan rojan mane hê jî tên dîtin. Ji bo van cihên bedew û heta niha bi rêka hesibandin û texmînan wek Dêrsim dihat binavkirin, navê Tûncelî hatiye diyarkirin ku navê herî guncav e û ji cewherê dîrokê hatiye derxistin. Qasî mis û qela, kevir û xaka vê herêmê, şênîyên wê jî Tirk in. Hem jî Tirkên wisa saf in ku nîjada wan têkilî ti nîjadên din nebûye, li ser xwe ne.”

(Altan, hejmar: 15 taksîm 1936)

Helbet, kiryarên mêtingeran ne tenê ji bo Dêrsimê ye. Biryar-nameyên xwesarî Dêrsimê, tenê ne ji bo navenda Dêrsimê ye. Ev biryarname, jiyangehên Elewî yên cîranê Dêrsimê ne jî dixê nav çarçoveya xwe. Wek li jor jî hat ziman, ji Dêrsimiyan tê xwestin ku çekên xwe radest bikin. Ji bo bêçekkirinê qanûn tê derxistin. Dema Dêrsimî jî çekên xwe nadin, dor lê tê pêçan û *“Herêma Qedexekirî”* tê îlankirin. Li gel dorpêç û îlankirina herêma qedexekirî, li dora Dêrsimê baregehên leşkerî tên avakirin. Qereqol tên avakirin. Gundê Mamekî ango Manikan –berê gundekî girêdayî Mazgêrdê bû- wek navenda rêveberiya Dêrsimê tê bikanîn.

Em ji bîr nekin ku kesê bi navê Îsmet Înonu ku bi eslê xwe Bedlîsî ye û ji malbatek qaşo Kurd a Kurumoglû hatiye, hê di sala 1930’î de dema Serokwezîrê demê bû, vê demecê dide Rojnameya Milliyetê: *“Tenê milletê Tirk dikare li vî welatî mafên etnîkî an jî nijadî bixwaze. Mafê ti kesên din jî ji bo vê nîne...”* (**Rojnameya Milliyet 31.8.1930**) Kesayetekî xwedî zîhnijeteke ewqasî nijadperest û faşîst e.

Di heman salan de wê hin mezinên din ên Dewleta Tirk heman gotinên faşîzan bi kar bînin.

Serokê Serkana Giştî ya Leşkerî Fevzî Çakmak jî di 1931’ê de raporekê dide hikûmetê û wisa dibêje: *“Dêrsimî bi mizdayinê nayên qezenckirin. Destwerdanan hêzên çekdarî wê hê zêdetir bandorê li Dêrsimiyan bike û bingehe îslaha wan e. Dêrsim, divê beriya her tiştî wek mêtingehêkê bê dîtin. Di nav civata Tirk de divê Kurdbûyîn bê helandin, dûvre jî tevî hîqûqa esasî ya Tirk bê kirin.”* Tê gotin ku heman Fevzî Paşayî vê jî aniye ziman; *“Hê em nikarin serî bi cahilên wan re derkevin, îcar xwendevanên wan, em ê nikaribin xwe li ber bigirin.”*

Di 1931’an de Yekemîn Mufetişê Ûmûmî Îbrahîm Talî (Ongoren) jî bo rêbaza bê şopandin van rêz dike: *“A. Tevahî pêwendiyên derve yên Dêrsimê bêne qutkirin, wisa jî pêşî li êrîş û bazirganiyên wan bêne girtin, gelê ku birçî maye, bi demê re neçarî koçberiyê bê kirin û ji bo niha jî neçê ji Dêrsimê bêne tehliyekirin. B. Piştî ku her der bi awayekî esasî hat girtin, dorpêç bê tengkirin û yên ji ber neçetiyên hatine girtin jî demildest ji Dêrsimê bêne derxistin, avêtin û belavkirina li Rojava.”* Faşîstekî wisa yê Naziyan e.

Di 1932'yan de jî Wezîrê Karên Hundirîn Şukru Kaya raporekê dide hikûmetê û dibêje, "*Lazim e em fêrî Dêrsimîyan bikin ku ew bi eslê xwe Tirk in. Divê gelê Bakurê Dêrsimê koçberî rojava bê kirin. Beriya ku harekata leşkerî dest pê bike, divê tevahî çek bêne komkirin.*"

1935'an Îsmet Înonu di raporeke xwe ya din de jî dibêje, "*Xwedî girîngiyek mezin e ku cihên nêzî sînor û navendên mezin ên mîna Elezîz, Erzîngan û Erziromê bêne Tirkkirin.*"

"*Bernameya Islahkirina Dêrsimê*" ya Îsmet Înonu, amadekariya êrîşa mezin e. Wê rayeyên berfireh bide Yekemîn Mufetîşê Ûmûmî Abdîn Ozmen ku li Dêrsimê wezîfedar e, Abdûllah Alp-dogan ê Korgeneral jî wê bi rayeyên bêdawî were erkdarkirin. Plana Islahê ya planek ji 3 merheleyan e; bi şiklê amadekarî, tecrîdkirina ji çekê û ji nû ve îskankirin hatiye amadekirin.

Mehmet Bayrak van 3 merheleyan wisa diyar dike:

"*Amadekarî û bêçekirin wê di 3 salan de bibe.*" (Bi rastî jî di nav 3 salan de amadekarî hatine kirin, çekên mirovan hatine komkirin û qetlîamê dest pê kiriye. MB)

"*Em ê Wilayeta Dêrsimê bi ûsûlê nû saz bikin. Femandarekî Kolorodûyê, walî û zabîten bi unîforma wê bibin qeymeqamê navçeyê. Memûr jî, wê ne ji herêmê bin. Her ku bêne dîtin jî wê efsêrên teqawîdkirî wê bi memûrbûyînek talî bêne tayînkirin.*"

Rejîma Kemalîst gav bi gav bi pêşengiya Îsmet Înonu ji bo têkbirina Dêrsimê plansaziyên cidî dike. Qanûna ku me li jor anî ziman û di esas de wek Qanûna Tûncelî tê zanîn, raporek wisa ye ku piştî êrîşek li ser Kurdistanê hatiye nixxandin û pêşxistin.

Piştî salan, di sala 2007'an de, cara pêşîn nivîskarê bi navê Saygî Ozturk wê **Rapora Kurdan a Îsmet Înonu** – di 1935'an de ji aliyê Îsmet Înonu wek Rapora Kurdan hatibû amadekirin- ji raya giştî re radigihîne.

Em xalên herî berbiçav li vir bidin, diyar bikin ku bê Înonu dixwest çî bike. Ev jî wê bi rehetî nîşanî me bide ku dûvre bê çî karesat bi serê Dêrsimê de tên.

"*Li Agiriyê Kurd medenî bibin, bédeng bibin jî qezenc e. Karakose, bajarekî Kurdan e ku girêdayî hikûmetê ye.*"

“Li Îdirê ne lazim ne jî îmkân hene ku Kurd ji cihên xwe bêne kirin.”

“Divê em li Wan û Erzînganê bilezûbez, li Deşta Mûşê hêdî hêdî û li Deşta Elezîzê girseyên xurt ên Tirk saz bikin.”

“Amed, ji bo bibe navendek xurt a Tirkîtiyê, xwedî wê kamilbûyîne ye ku em dikarin tevdirên xwe bi rehetî bi kar bînin.”

“Rêxistina ku di nav ûnsûrên dijmin de êrîşkar e, reîs û zilamên Kurd in. Endamên îstîxbarata Fransiyân kengî bixwazin dikarin mîna çeteyan reîsên Kurd êrîşî welatê me bidin kirin.”

“Dewsî Xirîstîyan û Ereben ku wê ji wîlayeta Mêrdînê bêne derxistin, wê ji aliyê Kurdan der hal bêne tijîkirin. Ev hal ji bo me zehf bi zerar e.”

“Sêrt, bajarekî Ereban e ku gelekî hewesdarê Tirkbûnê ye. Gelekî wê yê wisa heye ku nêzî hikûmetê ye û îtaatkar e. Sêrt a hewaya wê pir baş e, navendekê pîs a çavêşê (trahom) ye. Li wîlayeta Sêrtê hêzên me yên sereke; navendên me yên îdareyê, memûrên me û zabîten (efser) me ne. Divê navendên me yên îdareyê pir xurt bin. Divê rejîma edliyeya taybet bê sazîkirin ku dema pêwîst bû karibe bikeve meriyetê û karibe bê rakirin.”

“Bedlîs, di navbera Xîzan û Motkiyê de navendek Tirkan e ku bi awayekî sînî bi hêzên domdar ên dewletê hatiye pêkanîn. Eger Bedlîs nebûya, diviyabû ku em wê biafirînin.”

“Deşta Mûşê dê demdirêjî vala nemîne, her hal wê ji aliyê Kurdan hêdî hêdî bê tijîkirin.”

“Gelê Wanê gelekî berhevkerî ye. Hêviya tevahiya gel, eleqeya dewletê ye. Li Şerqa xwedî binyeya xurt, wê bibe bingehekî gelekî girîng ê Komarê. Bingehekî wisa ji bo serweriya Tirk bi her awayî lazim e.”

“Cihekî mîna Melazgirê jîhalketî û neçê bi zorê dikare bê xeyalkirin. Halbûkî wê pir qîymetdar be ku ev der wek Bajarekî Tirkan ê nû, Navendek Tirk bê sazîkirin.”

“Em ê Kurdan ji xakên berhemdar bişînin kû derê? Cihên li ser sînor wê demildest bi Kurdan tijî bibin. Kurdên ku bi demkî ji Agiriyê hatine jî em nikarin bişînin ti deveran. Arambûyîna wan jî qezencek têrker e.”

“Piştî niha bi 10 salan, ez difikirim ku wê bi awayekî leşkerî pêdiviya me bi baregeha Qamûşanê çêbibe.”

“Divê em hundir û derve teqez bidin bawerkirin ku fikrê me ne demildest texrîbkirina Qers û Artvînê ye, em bi biryar in ku tevahiya hêzên xwe heta kêliya dawî biparêzin.”

“Eger di demek kurt de em pêşketina Erziromê pêk bînin, em ê karibin li bakur li dijî sînor û li hundir jî li dijî Kurdîtiyê navendek saxlem a Tirkan ji nû ve saz bikin.”

“Wê fikarek li cih be ku eger di demek Kurd de Erzîngan bibe navendek Kurd wê esas Kurdistanê metirsîdar pêk were.”

“Ne sûdmend e ku Tirk û Kurd cuda bixwînin. Divê tehsîla yekemîn pevra bikin. Ev, ji bo Tirkkirina Kurdan wê bi bandor be.”

“Lazim e ku bi sazkirina Wîlayeta Dêrsimê îdareyek leşkerî bê rêxistinkirin û Islahkirina Dêrsimê jî li gor bernameyekê be.”

“Saziyên mezin ên dikarin memûran bigihînin, li başûr tinene. Eger ji kesên ku ji bo bikevin mekteba navîn Kurd jî serlêdanê bikin, divê em wan red nekin.”

Dema ku dijmin bi veşartî dora Dêrsimê dipêçe, ji liderên Dêrsimê Seyid Riza jî ji bo rejîma Kemalîst vê rewşê biterikîne nameyekê dinivîse. Tê xwestin ku avahiyên leşkerî neyên çêkirin û tevahî xebatên veguhestina leşkerî jî bên terikandin. Her wiha, dixwaze ku Rejîma Kemalîst biryara xwe ya komkirina çekan jî vekîşîne. Lê, hêna di Sibata 1926'an de Mufetîşê Mulkiye Hamdî Beg raporekê pêşkêşî hikûmetê dike û dibêje, ***“Dêrsim, ji bo hikûmeta Komarê serê kînorê ye. Ji bo selameta welat teqez lazîm e ku ev kînor bê emeliyatkirin û pêşî li îhtîmalên sosret bêne girtin.”*** Ji ber vê jî wê guh nedin gotinên Seyid Riza û xebatên xwe bidomînin. Piştî ku rewş krîtîk dibe, êdî Dêrsimî jî dest bi berxwedanê dikan.

Li Kurdistanê berxwedana herî dawî ya salên 1930'î, Dêrsim e. Beriya Hareketa Dêrsimê, li Meclîsê amadekariyên pêwîst hatine kirin. Ji şênîyên herêmê tê xwestin ku 200 hezar çek bêne teslimkirin. Di vê navberê de mafên xweser ên ji bo Dêrsimê hatibûn qebûlkirin, hatin betalkirin. Ev tehrîka ku bi zanebûn hat kirin, plan e ku bi teşwîqkirina îsyana ku derbikeve bipelçiqînin. Jixwe

piştire derdikeve holê ku “Hareketa Selê (Lehî)” ji mêj ve hatiye plankirin.

Tevî ku amadekariyên êrîşa giştî ya Dewletê jî, hê jî yekgirtin nayê sazkin, gelek eşîr aligirtiya dewletê dikin û hin jî li ser navê bêalîtiyê jî li cihê xwe radiwestin. “*Roja 20-21’ê Adara 1937’an dema pira textîn ya li ser Çemê Harçikê ku Aliyê Pah û Aliyê Kahmût bi hev ve girê dide, ji aliyê Demenan û Haydaraniyan tê hilweşandin û torên telefonê tên qutkirin, dewlet hinceta xwe dibîne*” û êrîşa li ser Dêrsimê ku bi salan amadekariyên wê dikir, dide destpêkirin. “*Beriya Harekata Leşkerî, ji balafiran bi dîroka 4’ê Gulana 1937’an belavok tên avêtin û banga teslîmbûyîne li gelê herêmê tê kirin, hişyarî dihat kirin ku ‘yên werin teslîmkirin an jî bi xwe teslîm bibin wê ji bilî nêzîkatiya adil a Komarê bi tiştekî din hevrû nebin. Berevajî, ango hûn gotinên me bi cih neînin, me we dorpêç kiriye. Wê artêşên qehar ên Komarê mehfa we rabike.*” Piştî van belavokan, hevkarên ku me berê behsa wan kiribû dikevin nav liv û tevgerê, gelek eşîran pasîfîze dikin û çekan bi wan didin danîn. Eşîrên ku biryara Berxwedan girtibûn jî eşîrên Abbasan, Haydaran, Demenan, Yûsûfan û Kûreyşan in. Halbûkî gelek belge nîşanî me didin ku li Dêrsimê bi dehan eşîr û nifûseke zêdetirî sed hezarî heye.

Beriya biryara berxwedanê bê dayîn, di civînekê de ku li Şaneyên Mûnzûrê Seyid û serokeşîr tevî dibin, Seyid Riza dibêje: “*Axano, Begino! Êdî hatiye fêmkirin ku Gazî Paşa bi hezaran belayên xwe ve kemîn daniye. Ji bo hilweşandina Dêrsimê, ji bo qira wê bînin, her cure amadekarî tên kirin. Nebêjin ku niyeta wan xerac e. Ji bo Elezîzê paşayekî wisa danîne ku bikuje dikuje. Dêrsima Şah Xizir, bi navê Tûncelî kirin bajar û bi ser Enqereyê de hesibandin. Li her dora Dêrsimê leşker bi cih kirin. Êdî her kes fêr bûye ku wê di biharê de êrîş were li ser Dêrsimê. Evdên me ketine fikara can û malan. Cotkarên me li rêyan, gundan digirin, di însa-etên rê, pir û dibistanê de dixebitînin. Kî li dij derkeve jî lê didin, xeberan jê re didin. Kevir-axê bi evdên me didin kişandin. Armanca wan êşkere ye. Wê li her aliyê Dêrsimê belav bikin û perperîşan bikin. Nêzîkatiya ku li Cebraîl kirine, şeqamek e ku li Dêrsimê ketiye. Ji ber vê sedemê ye ku rêyan, piran ava dikin. Çima cotkarên me li bazarê digirin û ji ber nikarin bi Tirkî bi axivin li wan*

didin, dijûnan dikin. Hedefa wan ji kokê ve guhertina Dêrsimê ye.” Ev gotin bi gelek belgeyên devkî gihîştine heta roja me ya îro.

Piştî berxwedanek bi keys, di sala 1937’an de wê berxwedanek ku ti carî ji hafizayan neçe, tê tepeserkirin.

Di biryara veşartî ya Desteya Wezîran de jî ku di heman pêvajoyê de ye, wiha dihat gotin: “*Tenê qîm bi harekata êrîşê bê anîn, wê ocaxên îsyane li cihên xwe domdarî bimînin. Ji ber vê ye ku lazim hatiye dîtin, divê yên çek bi kar anîne û bi kar tînin bîn wê astê ku heta dawiyê nikaribe zerarê bide, gundên wan bi temamî bêne texrîbkirin û malbatên wan bêne dûrxistin.*”

“3 yekeyên balafiran ku l’ê Gulanê ji Amedê rabûn, bombe bi ser herêmê de barandin. Yek ji van balafiran jî ji aliyê keça mawewî ya Mûstafa Kemal û ‘pîlota yekem a jin’ Sabîha Gökçen dihat bikaranîn. Domahiya mehên Hezîran-Tîrmehê gund hatin şewitandin, hilweşandin, li gel jin û zarokan, hejmarek bêdawî jî di bin gulebarana tivingên otomatîk de hatin hiştin.”

Ji bo fêmkirina hovîtiya pêkhatî, eger bîranînên Fermandarê Hêzên Hewayî Mûhsîn Batûr bîn xwendin, ku wê demê di 19. Alaya Piyade de stajyer bû, dûvre dibe yek ji wan kesên ku îmze li Mûxtiraya (bîrname) 12’ê Adarê dane, wê têrker be. Di pirtûka **Bîranîn û Nêrînan** de wiha tê gotin: “*Hinekî dûrî Elezîzê, li qûntarên Xarpûtê me artêşgehek bi konan danî û piştî demekê, bi şeweyê ku rawestgeha me ya yekemîn bibe Pêrtag, em ketin nav liv û tevgerê û zêdetirî du mehan me wezîfeyeke taybet bi cih anî. Ez ji xwendevanên me lêborînê dixwazim û naxwazim vê bêşa jiyana xwe vebêjim...*” û asta hovîtiyê ji me re radigihîne.

Li gor hin şahidan, Mûnzûr bi rojan sor diherike. Di berxwedanê de ku bi hovîtiyek mezin tê tepeserkirin, hevkarî û îxanet jî kêr namînin. Elîşêr ê ku wek fermandarê berxwedanê tê zanîn, di 9’ê Tîrmeha 1937’an de roja Înê dema li şkeftêk (Palaxîne) nêzî gundê Kafat (Axdat) dimînin, ji aliyê kesên bi navê Zeynel, Rehber û Efendî tê qetilkirin. Zeynel, serê Elîşêr jê dike û radestî Albay Nazmî Sevgen dike. Elîşêr, mîna ku ew rewş ji mêj ve dîtiye, dike helbest:

“Fikrê Yezîd li Dêrsimê dide

Çek komkirin û berî dan çolan Zalimino nebêjin ev ê li ba we bimîne

Înşeleh wê egîdek derkeve meydanê

Di rêka Heq de tolê hilîne...”

Rayber û Zeynelên ku serê Elişêr jê kirin û ji artêşa Tirk re birin, careke din dîrok dubare kirin. Yên ketine nav îxanetê ne tenê ev in. Li Dêrsimê yek ji berxwedêran jî Şahan Axa ye. Yê ku wî qetil dike jî sîxurê Dewleta KT Xidir e. Yên ku kurê Seyid Riza Bra Îbrahîm qetil kirin jî ji eşîra Kirgan bûn. Piştî jî wek nêçîrvanê seriyan şkeft bi şkeft digerin, di bedela serê Berxwedêrên Kurd de jî zêran distînin. Tabî, ev kurmikên ku ewqasî pelos (kerax) û biyaniyên gelê xwe bûne, piştî kar biqede ew ê werin paqijkirin jî. Zeynel wê dûvre ji aliyê Tirkên bê îdamkirin. Rayber jî wê li milê Tişanê (Deş) li gel kurê xwe ji aliyê dewleta KT bê gulebarandin. Wisa jî wê wek her tim nîşan bidin ku bê xayinek ji bo wan tê çî maneyê.

Mîna Rayber, Cemîlê Çeto, Bînbaşi Qasim... Her yekî jî piştî rola xwe lîstin hatin tasfiyekirin.

Berxwedana Dêrsimê wê li her derê berbelav bibe. Wê dijmin negihîje daxwazên xwe. Tevî ku bi hezaran leşker, bi sedan topan û her wiha balafiran jî êrîş dike, gelekî dûrî encamgiriya ye. Ew erdnîgariya bi heybet a Dêrsimê, emanê nade artêşa Kemalîst. Dijminên ku vê fêhmî dikin jî wê serî li lîstokên xwe yên dîrokî bidin. Pêşniyara aştiyê, daxwaza hevdîtînê...

Waliyê Erzînganê agahiyê ji Seyid Riza re dişîne, radigihîne ku dewlet dê daxwazên Dêrsimiyan qebûl bike. Mirov û fermandarê mezin ê Seyid Riza, Elî şêr jiyana xwe ji dest daye. Dr. Nûrî Dêrsimî jî ji bo karibe qetlîamên li Dêrsimê ji cîhanê re ragihîne, ji Dêrsimê veqetiyaye. Û weke ku me li jor jî anî ziman, kurê wî yê mezin Bra Îbrahîm û bi çendan berxwedêrên din bi komployan hatine qetilkirin. Bi gotinek din, baskên Seyid Riza hatine şikandin. Di nav van şertan de Seyid Riza û çend hevalên wî di 1937'an de ji bo biçin Erzînganê dikevin rê. Li ser rê dema rastî yekîneyek leşkerî tê, jê re daxwaza walî ya hevdîtînê radigihîne. Leşker, dê wî û hevrêyên wî bînin ba walî. Seyid Riza û hevrêyên wî dê bigi-

rin. Seyid Riza wê bi giştî li gel 58 kesan bê darizandin. Bi bayê lezê dadgeh dikin. Dadgeh biryara darvekirina 11 kesan digire. Lê listokek wisa tê kirin ku di dîroka mirovahiyê de kêmtir dîtin. Bi mehkemeyek derewîn, nîvê şevê derdorê ronîkirin, bi rengê ku roj e, 7 kes tên îdamkirin. 4 kes ji ber kalî, hikmê îdamê vediguhêrin 30 sal cezayê hepsê. Seyid Riza jî di 18'ê Mijdara 1937'an de ku ew li hin deveran wek 15'ê Mijdarê derbas dibe, li Meydana Genim a Elezîzê tê înfazkirin. Seyid Riza bi serbilindî diçe sêdarê û dehfê dide celad, ben dixê stûyê xwe. Lingê xwe li kursiyê dide û înfaza xwe jî bi xwe pêk tîne. Navên 6 berxwedêrên Kurd ên hatin înfazkirin jî wiha ne: Resîk Huseyîn, Seyd Wûşên, Findik Axa, Hesên Axa, Elî Axa. Dikare ecêb were, lê yê ku dibêje Seyid Riza lingê xwe li kursiyê da û bi ser mirinê de çû, Sabrî Çagla-yangîl e ku bi xwe yek ji amadekarên vê senaryoya qirêj e.

“Me Seyid Riza derxist meydanê. Li derdorê ti kes nînbûn. Lê, mîna ku tijî mirov in, Seyid Riza qir da bédengiyê û valatîyê: ‘Em zarokên Kerbelayê ne. Şaş e. Eyb e. Zilm e. Cinayet e.’ Pîrçûkên min hîlanîn. Ev zilamê kal, rap-rap meşîya. Cengene def da, ben xist stûyê xwe, lingê xwe li kursiyê da û xwe daliqand. Ji bo li tîr-beyê neyê veşartin jî cenazeyê wî jî hat şewitandin...” Ev gotinên Sabrî Çagla-yangîl bi xwe ne.

Navekî din ê şahidê Qetlîama Dêrsimê, Hûlûsî Yahyagîl e ku wek Albay di Qetlîama Dêrsimê de wezîfedar bû: *“Di 1938'an de ji bo pêşîgirtin û tepeserkirina Îsyana Dêrsimê em hatibûn wezîfedarkirin. Tiştê ku digotin îsyana jî, hin gundên çiyayî wê salê baceyên xwe nedabûn. Fermana ku ji me re hatibû jî yek peyv bû: Îmha. Tinekirin, ji bo bace nedane... Kî dikare vê fikrê, pêkanîne bixê meriyetê? Yê zorbe, sûcê mirovahiyê kirine. Helbet, bace milekî vî karî ye; sedema rastîn Tirkkirina Dêrsimê bû. Ez ferman-darê yekîneyê bûm, fermana ji me re hatibû ew bû ku ti tiştêkî zindî nehêlin...”*

Û helbet em gotinên pîlota şer a Qetlîama Dêrsimê Sabîha Gokçen jî li vir bidin: ***“Di dema bomberdûmanê de ji bo min mirov ne girîng bûn, her tiştên ku tevdigeriya ji bo min hedef bû.”***

Bi qasî gotinên Seyid Riza ku dema diçe îdamê dibêje, *“Em zarokên Kerbelayê ne. Şaş e. Eyb e. Zilm e. Cinayet e”*, gotinên ***“Ez bi derew û fenên we re ser neketim. Ev ji bo min bûye dersek.***

Min jî serî li beramberî we netewand, bila ev jî ji we re bibe dersek” hê di mejiyê Kurdan de taze ye.

Piştî ku lîderên berxwedanê tîn qetilkirin, berxwedan bi giranî bi dawî bûye. Lê, heta sala 1938’an jî li cihên cuda berxwedanê dewam kiriye. Armanca KT ne tepisandina berxwedanekê bû. Jixwe, ji îsyaneke wîrdetir, li dijî êrîşên KT Dêrsimê bi awayekî giştî li sehayek berfireh li ber xwe daye. Tenê parastina rewa hatiye kirin. Wek me got, berxwedanên parçe bi parçe wê piştî îdamkirina Seyid Riza jî bidomin.

KT ji bo karibe rewşeke îbret (zende) ava bike, wê lezê bide êrîşên xwe. Gotinên Celal Bayar ku wê piştî bibe serokkomarê dewleta KT nîşan dide ku bê wê li Dêrsimê çi bêne kirin, di çarçoveya planên hê veşartîtir de wê ev pêvajoyê domandin. Bayar dibêje; *“Îsal, ji bo karê ku wek Dêrsimê tê binavkirin teqez bê tasfiyekirin, tevdierek din a dewletê heye û artêşa me wê li Dêrsimê erkdar bibe û bi operasyoneke lêgerîna giştî wê hêzên me yên terbiyekirinê vî karî ji kokê qut bikin û biavêjin.”* Di pirtûkên bi navê **Di Belgeyên Femandariya Giştî de Serhildanên Kurd** wiha tê gotin: *“Di navbera 10’ê Hezîranê-29’ê Hezîrana 1928’an de 60 gund hatin şewitandin.”* Di navbera 1’ê Tîrmeha 1938’an û Îlona 1938’an de qetlîamên hê erjengtir tîne kirin. Û tenê ji bo 17 rojên ewil ên Îlonê wê wiha bê gotin, *“Di nav herêma lêgerînê de mirî û zindî 7954 kes hatin derxistin.”*

Xulase, bi hezaran mirov tîne qetilkirin. Mal tîne şewitandin, kavilkirin. Wisa ye ku, wê careke din li ser navê berxwedanê li van deran pel jî nelebite. Hedef ev e. Qetlîaman digihînin wê astê ku; ji bo kesekî bi hezaran mirovî derdixin operasyonan. Her keçek Kurd dema tê girtin, bi sedan leşkerên devgirêz ên artêşa Kemalîst dest diavêjênê. Xwîn ji Dêrsimê dihat. Bi hezaran keçên Kurd ji bo nekevin dest Rûmiyan –Kurd ji leşkerên Osmanî û Tirkî re dibêjin Rûmî- xwe ji zinaran diavêjin hembêza mirînê. Ya wê pêşengiya van bike jî Besê ye. Bi hezaran jî xwe li goşeyên herî veşartî, di şikeftan de vedişêrin, hewl didin rêyek jiyanê bibînin. Lê bi hezaran nêçîrvanên seriyên ên devgirêz wê şikeft bi şikeft bigerin, li gel leşkerên KT wê bi pereyan seriyê mirovan bifiroşin. Yê ku pir caran vê hovîtiyê dîkin, dijmînen xwefiroş ên hundîrin in ku bi tarzê Rayber tevdiğerin. Bi deh hezaran Dêrsimî wê bêne

qetilkirin. Ev jî çavên wan têr nakin; devên bi sedan şkeftî tîn betonkîrin û bi hezaran Dêrsimiyên ku xwe tê de distrandin, bi saxî tîn veşartin û bi awayekî nemerdî mehkûmî mirinê hatin kîrin.

Çawa ku di sala 1988'an de ji aliyê Saddam li dijî Kurdan 8 Enfal pêk hatibin, ji ya Saddam qat bi qat mezintir, berfirehtir di sala 1938'an de tam li 13 deveran wek qetlîam û qirkirinên komî pêk hatine. Di pirtûka **“Îsyana Dîrokê”** de ku ji aliyê **Osman Akbaş** hatiye nivîsandin, ev dever wisa tîn îfadekîrin:

“1- Li jêra Halborê milê Degirman (Abbasanan)

2- Cihên ku li çep û rastê Çemê Xarçik di mesafeya 60 kîlometreyan de.

6- Li herêma mabeyna Kûtûderesî, gundê Gomemîş- kaniya sogut (Dedemanî)

7- Li nahiyya Pox Çemê Zûzûr (Haydaranî)

8- Li Çemê Marçik (Yûsûfan û Haydaranan)

9- Pira Pax, gundikê Sandal

10- Herêma Daîreya Daristanê ya Tûncelî, li Çemê Şogek

8- Mazgêrd (eşîra Alan)

11- Li Nazmiye-Derovan (Kûreyşanî)

12- Li qeraxê bajarokê Nazmiyeyê (binemala Mirîçik)

13- Herêma Çiyayê Zel

14- Xeta Nozat-Pilûrê

13-Li herêma Îksor-Axfanosê.

Bê ev qetlîam, jenosîda nemerdî çawa çêbûye, çawa hatiye plankirin, em bi du mînakên şênber bidin wê baştir bibe.

Kesê bi navê Kiliçdaroglû ku wê paşê bibe serokê CHP'ê, li gel Midûrê Emniyeta demê ya Meletiyê Sabrî Çaglayanî hevpeyvînekê dike. Di hevpeyvînê de Sabrî Çaglayanî dibêje; *“...Ez encamê dibêjim. Van qebûl nekirin, derbasî şkeftan bûn. Artêşê gaza jehrî bi kar anî. Ji deriyê şkeftan ev mîna mişkan hatin jehrîkirin. Û ji heft heta heftê salî ew Kurdên Dêrsimî birin. Harekatek xwînî bû. Otorîteya hikûmetê jî ket nav gund û Dêrsimê. Îro*

hûn dikarin bi rehetî biçin Dêrsimê. Jenderme jî dikare bikevinê, hûn jî dikarin bikevinê.”

Di nivîsek berfireh a Rojnameya Radîkalê de jî kiryarên demê gelekî sosret in. Bê qetlîam gav bi gav çawa û ji bo kîjan armancan tê amadekirin, radixe ber çavan: “*Her çiqasî hatibe gotin ku harekate li Dêrsimê ji bo tepeserkirina îsyane ye jî, belge û wêneyên ku me weşandin, nîşan dide ku ev harekata leşkerî esas ji mêj ve hatiye plankirin. Ji van belgeyan a herî girîng jî plana çalakiya ‘veşartî’ ye ku ji harekata 1938’an tam 5 sal berê di 1933’yan de ji aliyê Femandariya Ûmûm a Jendermeyan hatiye amadekirin. Di vê pirtûkçeyê de ku tenê 100 lib hatin çapkirin û li ser wê ‘veşartî û taybet e’ dinivîsî, ji bilî dîrok, erdnîgarî û demografiya Dêrsimê, agahiyên têkildarî ‘tinebûna asayîşê’ jî agahî cih digirtin. Her wiha 6 raporên têkildarî Dêrsimê hatibûn amadekirin jî tê de hene. Li gor rapora Mufetîşê Mulkiye Hamdî Beg, “Gelê Dêrsimê zehf jîr, kurnaz û hîlekar e. Di heman demê de serê kînore ye...” Di pirtûkçeyê de ku pîrsgirêkên asayîşa Dêrsimê yek bi yek tînin jimartin, behsa bêîtîatiya herêmê jî tê kirin. Pirtûkçe ji du beşên esasi pêk tê. Danasîna Dêrsimê û rewşa asayîşa Dêrsimê.*

Di beşa yekemîn de, rewşa erdnîgariya Dêrsimê, rewşên rê, av, nîfûsê, rewşên nîjadî, aborî, çandinî, îdarî, darayî, leşkerî û eşîrî tînin vegotin. Di beşa duyemîn de jî tinebûna asayîşa li Dêrsimê tê vegotin, di vê rewşê de behsa esasên îslahê û merheleyên vê xebatê tînin kirin. Wê kîjan eşîr ji Dêrsimê bîne derxistin jî hatine plankirin.” Hin îfadeyên balkêş ên di plana amadekirî de wiha ne:

“Şêniyên parzemîna Dêrsimê, ji ber ku piraniya kirinên wan ên li ba wan ma, ji vê cesaret girtine, serî li ber hikûmetê natewînin, bace û leşkeran nadin...”

Ji bo bi cidî îslahkirina Dêrsimiyên jî tevdira hejmaran wiha vedibêje;

“Bi hesabkirina tevahî berxwedanan, ji bo şikandina van ji artêşa 4’emîn (Tabûra 20’emîn) texsîskirina hêzê...”

Di pirtûkçê de hin rapor jî cih digirin. Yek ji van jî rapora Mufetîşê Mulkiye Hamdî Beg e. Hin beşên wê raporê wiha ne:

“Teyî û belgeya keyfî ya behsa ihtîmala ku wê Seyid Riza ji tevahî eşîran tifaqê saz bike û di Sibatê de bikevin nav liv û tevgerê,

mimkun nebûye. Mîna encam û agahiya ku ez ê ji hevdîtinek nêz bidim ev e; her ku diçe Dêrsim dibe Kurd, dibe xwedî armanc û îdeal, xeterî mezin dibe..."

Pîştî raporê, tew îcar pirtûkçeyek encamnameyê jî lê hatiye zêdekirin: "*Dêrsim, ji bo Tirkiyeyê kînorek xeternak e ku xwe bi cehaletê, kêmasiyên debarê, reşkirinên hundirîn û derveyî û meyla Kurdinî kirine. Lazim e ku ev kînor teqez bê emeliyatkirin...*" Pêşniyara tê kirin jî di beşê de wiha dest pê dike, "*Gelê Dêrsimê cahil e. Li gel vê jî esas serok bûye sedema rêbiriye, tecawizê, dizîtiyê*" û merheleyên xebatên islahkirinê di dawiya beşê de wiha tînen vegotin: "*Avakirina rêkên mezin, komkirina çekan, reîs, beg û axa, seyid bi şertê careke din venegerin naqlî Rojavayê Anatolyayê bînin kirin...*" **(Rojnameya Radîkal)**

Belgeyeke sala 1935'an hatiye amadekirin jî rapora Îsmet Îno-nu ye ku her tim li serê Kurdan bûye belayek mezin: "*Li Erzînganê, gundên Tirkên ên ku di dema xwe de li beramberî Kurdan dibûn bend bi demê re parçe û zêf bûn û Ermenî jî bi temamî ji holê rabûn, niha li beramberî dagirkeriya Dêrsimîyan meydana bi temamî vala maye. Gund ji aliyê gelê qelewê Dêrsimê ve tînen dagirkirin. Ev gund ji bo baskên talankerên Dêrsimê di hundir de berbelav bibin bi roleke qonax û menzîlê radibin...* Lazim e ku Wilayeta Dêrsimê were vesazkirin, îdareyek leşkerî bê rêxistinkirin û islahkirin li gor bernameyekê be. Di 1935 û 1936'an de wê rê, qereqolên wê werin avakirin. Eger heta bihara 1937'an amade bibe, wê di bihara 1937'an de radeştî fermana Walîtiya 2. Hêza Tumenê ya nîzamî û seferber bê kirin."

Pîştî ev qetlîam pêk tê, Konsolê Îngilîzan ê demê yê li Trabzonê di dawiya raporek xwe de ku ji bo Sefîrxaneya Îngilîz a li Enqereyê dişîne, dibêje ku "*Êdî ya tê gotin ev e; Li Tirkiyeyê Pîrs-girêka Kurd, bi dawî bûye*" û alîgirtiya xwe ya Kemalîzmê nîşan dide.

Di encam de; zêdetirî 200 gundan tînen şewitandin, bi hezaran mal tîne texrîbkirin. Bi deh hezaran bi darê zorê tînen koçberkirin. Ya ecêb jî ew e ku yê di tepisandina berxwedanê de qaşo li rex KT'ê cih digirtin jî hatin sirgûnkirin. Ya hatiye kirin jî li gor pêna-seyên hiqûqa navneteweyî, qirkirin e. Hewldana tinekirina sîstematîk e. Eger jenosîd ango qirkirin, bi zanebûn an jî bi awayekî bi

sîstematîk tinekirina komek nîjadî, olî, siyasî yan jî etnîkî be, ya hatiye kirin bavê jenosîdê ye. Dema ku Qirkirina Dêrsimê pêk dihat, Hikûmeta Nazî ya Elman jî di pêşengtiya Hîtler de li dijî Cihûyan bi qetlîamên hemreng re mijûl dibû. Û sala 1945'an dema 2'yemîn Şerê Cîhanê qediya, bi peyman-nîqaş-protokol-şert-lihevkirinan ve ev cureyê qetlîamê wek "qirkirin" hatiye binavkirin û cihê xwe di nav kategoriya sûc-cezayên gerdûnî-navneteweyî de girtiye.

Piştî berxwedan tê tepeserkirin, domahiya 10 salan Dêrsim wek "Herêma Qedexekirî" tê îlankirin. Piştî qetilkirina sîstematîk a wek Qetlîama Sor tê zanîn, KT ya Kemalîst vê carê jî Qetlîama Spî ango qirkirina çandî wê bixe dewrê. Destpêkê wê li Dêrsimê ji serî heta binî dibistanên şevînî ava bike. Wek avahiyên herî mezin û bi heybet wê baregehên leşkerî bêne avakirin. Ji bo pitikan wê destpêkê navên mîna Kemal, Kazim, Îsmet bêne hilbijartin. Bernameyek Tirkkirinê ya taybet wê bikeve dewrê. Jixwe kampanyayek Tirkkirinê ya ku li vir serkeftî bibe jî, wê pêl bi pêl li tevahî Kurdistanê were berbelavkirin.

Ji vegotinên şahidan em pê dihesin ku heta îro jî hê li Çemê Laçê, Çemê Kûtû, Derbenda Alî (Alî Bogazi) hestiyên mirovên ku hatine gulebarandin, ji zinarên Îksorê hatine avêtin hene.

Helbesta "Întîkam (Tolhildan)" a Nûrî Dêrsimî, esas asta hovîtiyê pêkhatî radixîne ber çavan. Dema ku Nûrî Dêrsimî yê Baytar dîtinên xwe li helbestê rêz dike, xîtabî Ciwanên Kurd jî dike:

"Ey siberoj û hêviya nîjada min Ciwanê Kurd! Ez vê xebata nacîz diyarî te dikim.

...Guh bide hawara zarokekî Kurd ê Dêrsimî, tenê arasteyî te ye û hêviya meşêra tolhildana Kurdekî derbeder ê ji welatê xwe pir dûr e, li diyarên xeribiyê dilên wî bi êşên neteweyî ditevize, ruhê wî minêkarê avabûna siberoj û azadiya Kurd e ku ji zîperên te yên natewe dike!

Ez bi feryada bi hezaran bûk û keçên me ku ji bo namûs û şerefa te nekevin nav lingan, xwe ji tehtên asê, zinarên erjeng ên welêt avêtin hembêza mirina xelaskar, bi ser te dinalim.

Ez bi feryada kûr a Kurdên kolekirî ku hê îro jî, li ber deriyê dijminên nemerd bi êsirtî dijî, her roj, her kêlî dilop bi dilop dimire, nîjad, ziman û nîrxên wê tîr biçûkkirin, bi ser te de digirîm...

Dema ku çavên xwişk û birayên me bi kuştinê dihatin girtin, ji çiyayên zimrûd ên Kurdistanê, zozanên tavîn hatin sirgûnkirin, li erdên bejî yê Anatolyayê ji birçîna mirin, bi nizeya dijminê qehpe, bi guleya wî hatin îmhakirin û gunehên wan tenê Kurdbûyîna wan bû, tu mîna rojekê li asoyên hêviyên wan diyar bû...

Wesyetek wan a amir û qehar ji bo te heye ku tenê peyvek e:

TOLHILDAN!

Tolhildan!

Ji bo paqijkirina namûsa Kurd.

Tolhildan!

Ji bo şakirina bi sed hezaran zarokên Kurd ên hatin nizekirin.

Tolhildan!

Ji bo haşkirina veqîrînên li asoyên Kurdistanê yê bûk û keçên me, yê avêtin girdavan, di agiran de şewitandin.



SEYID RIZA

Tolhildan!

Ji bo pêkanîna armancên bi hezaran qurbaniyên welêt, di bin sêdarê de bi qehremanî silav dan mirinê û bi gotina “Bijî Kurdistanê Azad û Serbixwe!” taca şehadetê dan serê xwe.

Tolhildan...

ELÎŞÊR Û ZARÎFE



Nûrî Dêrsimî

Ev pêvajoya ku bi xwînrijiyeke mezin derbas bû, îfadeya beşek dîrokî ya tijî qehremantî û qasî wê jî îxanetê ye. Nirxandina nerast a dîrokê, pêşnedîtin, lewaziya pêwendiyên li cem derve, zeîftiya di yekgirtina hundir de sedemên esasî yên têkçûnê ne. Her wiha wek sedemên têkçûnê, îxaneta hundir û kêmasiyên rêbertiyê; di dema

derketinên mezin de bi dîsîplînek layiqî wê pêşwazînekirin dikarin bêne rêzkirin. Mînak, dema Berxwedana Şêx Seîd de piştî bajar tî desteserkirin, -hem jî bajarên Kurdistanê- talan, bîzîzî, eşqiyatî û çetegerî wek ûrekê dibe sedem ku ev berxwedan bi paş de bide. Şêx Seîd her çiqasî mudaxeleyî vê rewşê kiribe jî ev wek rastiyeke derbasî dîrokê bûye. Em bûyerên mîna vê hema hema di her berxwedanê de dibînin. Rewşek hemreng jî wê li Rojhilatê Kurdistanê di îşyana Îsmail Simko de bê dîtin.

Dema tê gotin ku “*Şer, çandek e*” yan jî “*neynika çanda gelekî ye*” ev rastî tê ziman. Çanda bi şiklê eşîran, ji hev qut, keyfî, her bi ya xwe dike, talanker, di îşyanan de xwe dubare dike.

Têkildarî Tîpên Îxanetê Hewl Daye Biafirîne Mînakên Balkêş; Enkîdû, Mattîzawa, Harpagos

Pêvajoya ku li Kurdistanê piştî tepeserkirina her berxwedan û îxanetê pêş dikeve, rewşek teslîmîyet û îxanetê ye. Dema ku wisa bê nîrxandin, berxwedan her çiqasî bi heybet dibe bila bibe, tabloyê ku derdikeve holê ew e ku eger berxwedan bi serkeftinê neyên tacîdarkirin, berteng dibin, tengav dibin û gelek caran jî dipirnisin û wek kesayet pişirandin (hilweşandin) çêdibe.

Piştî ku li Dêrsimê kelheya dawî tê tepisandin, Dewleta Tirk tevahî polîtîkayên Osmaniyan dîterikîne. Her çiqasî ev rewş ji 1924'an û şûn de bi merhele, plan û di nav nepeniyekê de hatibe meşandin jî, esas piştî tepisandina berxwedana dawî, îmhî û înkîr dibe polîtîkayek eşkere û sistematîk. Bi gotina wan, “*Kurdistan Xeyalî*” di kûrahiya heft qatan a Çiyayê Agiriyê de meftûn e. Kurd û Kurdistan nîne. Hevoka Serokwezîrê demê yê Tirkîyeyê Tayîp Erdogan ku piştî salan bi eşkere dibêje “*tu nefikîrî, nîne*” di esas de tê wê wateyê ku ser Kurdistanê hatiye betonkirin.

Otorîteyên otonom, nîv serbixwe û xwecih ên Kurdistanê ku bi sedan salan dewam kirine, kirin bin zept û rebtê, dewleta navendî xurtîr kirine. Bi qanûnên ku piştî derxistin jî wê avahiya civakî ya Kurd bi temamî parçe bibe.

Her çiqasî qanûn bi retorîkên pêşverû û şoreşger hatibin xemilandin jî heqîqet ne wisa ye. Berevajîya wê rast e. Nîjadperest e,

faşîzan e, dermirovahî ye! Nîşaneya herî girîng a hebûna civakbûyîna Kurd avahiya eşîrî ye. Dema ku saziyên mîna eşîr tên belavkirin, wê demê avahiyeke ku kêr mayî û bîr-mejiyê wê teslîm hatiye girtin derdikeve holê. Pêşketina civakî çênabe. Wê demê sosreteke ku ji xwe direve, çî dike nediyar e, şêlû ye ku nîzane bê çima û xizmeta kê dike, diafire. Dewlet bi vê ve jî sînordar namîne. *“Ji bo ew ên ku zimanê wan ê zikmakî ne Tirkî ne, qedexe ye ku bi awayekî komî li peravan, taxan komên karker û hunermendan ava bikin an jî kesên mîna van gundekî, taxekê, karekî yan jî hunerekê ji bo nîjada xwe veqetînin.”* Ev hevokên ku ji biryarnameyên îskana mecbûrî hatine girtin, bi awayekî eşkere datîne holê ku bê hewl didin Kurdan çawa tine bikin û çawa bikin Tirk. Li gor van polîtîkayan, li Kurdistanê di bin taldeya bargehan de hewla bi bişavtina bi darê zorê xwe dide der. Wisa jî wê êdî jehra bi navê Kemalîzmê bera nav laşê Kurdistanê bidana.

Albert Memmî beriya bi salan di xebata xwe ya **“Portreya Mêtînger, Portreya Mêtîngehê”** de bi çend hevokan ve tîne ziman ku bê dagirker dixwazin çî biafirînin, *“Heta ku bi xweşbînî nêzî mêtîngehîbûnê bibe, tekane alternatîfên mirovê mêtîngeh bişavtin an jî mîna kevir qerisîn e.”*

“Wekî din bi kîjan rêyê mîras ji gelekî re tê hiştin? Bi perwerde û zimanê bide zarokên xwe, bi wê depoya muhteşem a timî bi ezmûnên nû re dewlemend dibe. Kevneşopî, tecrûbeyên hatine bidestxistin, fêrbûn, fetîh, karên hatine kirin û çalakiyên nîşên peşerojê bi vî awayî mîras tên hiştin û di dîrokê de tên qeydkirin.”

Lê, mêtînger her tim dibêjin, *“Wê her tişt bê qisûr bûna... eger şênî nebûna.”* Ji bo vê, *“Her neteweyeke mêtînger, tovên meyla faşîst di binyeya xwe de dihewîne.”* Bi awayekî hê balkêştir jî, *“Mêtînger, dizane ku heta kesên mêtîngeh nînbîn wê ti wateya mêtîngehê nînbê. Ji bo ev rewatî çêbibe, tenê hebûna mirovê kole ne bes e, divê vê rolê jî qebûl bike. Têkiliya mabeyna mêtîngar û mêtîngehê ji ber vê wêranker û afirîner e. Îcar zimanê zikmakî yê mirovê mêtîngeh, zimanê ku bi hest, fikr û xewnên wê li ser piyan maye, ew zimanê ku nermbûyî û meraqa xwe îfade dikir, ango zimanê ku bandora herî mezin a dilinî dikir, esas ew ziman e ku qîmeta wê herî kêr e. Ti statuyek wê di welêt de an jî yekîtiya gelan de nîne. Eger bixwaze di karekî de bixebite, cihekî ji xwe re*

çêbike, di nav komê û cîhanê de hebe, destpêkê neçar e ku serî li ber zimanê efendiyên xwe bitewîne. Di têkoşîna ziman de ku di hundirê mirovê mêtîngeh de pêk tê, yê dibe bindest zimanê zîkmakî ye. Bi xwe hewl dide vî zimanê zeîf li goşeyekê deyne, ji çavên biyaniyan veşêre. Xulase, duzîmanîya mêtîngehê ne rewşa du zîmanî ye ku zîmanê şênîyekî li ba zîmanê purîstekî dijî (her du jî aîdî heman cîhana hîsî ne), ne jî dewlemendiya pîrzîmanîya xwerû ye ku sûdê hê bêtir lê îzafî ji alfabeyek nû werdigire: dramek zîmanzaniyê ye.”

Frantz Fanon di xebata xwe ya bi navê **“Çermê Reş, Maskeya Spî”** de têkildarî mêtîngerîya ku li jor hatî zîman dibêje, *“Qayîl e ku li ser milên xwe serê hinên din hilgire.”* Û ji bo ev rewş bê derbaskirin jî dibêje, *“Mêtîngeh fêrî rewşa xwe nabe; mîna berstûka hesin tenê dikare bişkê.”*

Ekîbek nû ya hevkar wê li ser vê bîngehê teşe bigire. Wê xwe red bike, qatîlhez bibe, bixwaze bişibe wê û wisa bigihîje. Mîna ji qral hê qralparêztir wê li her derê Kemal û Îsmet berbelav bibin. Yên ku li dibistanên baregehan mezin bûne, wê çanda nû- hem jî bi dildarî, bi daxwaz- li her goşeyên welêt belav bikin. Wek tê zanîn, dagirkerîya herî xeter, dagirkerîya mejiyan e.

Mamostayeke mîsyoner a jin Sidika Avar a şandine Kurdistanê di bîranînên yên di pirtûka bi navê **“Kulîlkên Min ên Çiyê”** tiştên anîne zimên ji vê re mînaka herî baş e. Di vê xebatê de Avar wiha dibêje: *“Ataturk tiliya xwe dirêjî jina ciwan a mîsyoner kir - Biçe... Biçe gundên çiyê... Cemiyetek bi rêya jin û dayikê tê fethîkirin. Keçên tu ji wir bigirî perwerde bike... Paşê wan cardin bişîne cihê wan. Tiştên te fêrî kirine wê bi xwe re bibin, wê bidin fêrkirin...’ Kêm maye şîreta wî bê cih. Avar jî, Avarên biçûk ên wê ew perwerde kirin jî di têkoşîna xwe de bi ser ketine.”*

Avar yanî Sidika Avar yek ji mîsyonereka ku şandine Kurdistanê ye. Hem jî di asta herî pêş de, li Kurdistanê ji bo keçên Kurd bîn asîmîlekirin, ji çanda xwe birevin û xerîb bikevin ku ji dil dixebitî yek ji mamosteya Tirk e, mîsyonerek e, êrîşkarek e. Ji bo keçên Kurd bike Tirk zor û zehmetiyeke nede ber çavan nîne.

Sehneyeke pirtûkê pir balkêş e. Keçên ku Sidika Avar perwerde dike, qatîlê Kurdan Îsmet Înonu li Elezîzê diçe serdana wan. Li cem Înonu parlamenterek jî heye.

Sehne wiha ye, keç destpêkê merhebayê nade kesên hatine serdanê. Sedema vê jî Sidika Avar wiha tîne zimên:

“Ji ber, min ji wan re gotibû ‘Heta mezin destê xwe dirêj neke biçûk nikare dirêj bike. Paşa, Walî jî bê, eger ew destê xwe dirêj nekin, ez ê bi serê xwe silav bikim, destê xwe dirêj nakim.’ Înonu şîrîn şîrîn kenîya, dema bi gotina - Ez destê xwe didim, destê dirêj kir, Elmas beziya, çokên xwe danî erdê li ser her du destên xwe ew destê mezin bi hurmet maç kir û danî ser eniya xwe.

Her kes xemgîn bibû, çavên wê tijî rondik bibûn. Înonu bi milên Elmas girt û rakir. Xîtabî mebûsê me kir, - ‘Vaye berhem ev e; KURD.’ Li ser vê gotinê parlamenterê rabû ser piyan, Elmas ji milê wê yê rastê girt û li hewayê hejand, got – ‘Ev dest. Çek nagire, ev dest şûr nagire, ev destê dost e, ev dil dilê dost e! – Pênûs digire, derziyê digire...’ û nitûqek da.” Pirtûk vê jî me re dibêje.

Mîna ku Amin Maalouf, di romana xwe ya *“Leo yê Afrîkayî”* de dibêje, *“Her kî bi dayika min re bizewice, dibe zirbavê min”*, kî dagir bike, çûyîna ba wî ye. Hem jî *“bi serbilindî!”* Di dîroka mirovên din de ev rewş wek bêrûmetî û nemerdî tê hesibandin, lê di dîroka tijî îxanet a Kurdan de berevajiya van têgînan derbasdar e. Hê îro jî helwestên dewletparêz ên zarok û neviyên kesên ku di berxwedanan de hatine qetilkirin bi îbret têne şopandin û mirovan ecêbmayî dihêlin. Qatîlhezî encex di vê astê de dikare bibe wek nexweşiyekê. Navê partiya ku qetlîama Kurdan pêk aniye, CHP’ê ye. Plankerê qetlîamê, Şefê Neteweyî yê CHP’ê ye ku navê wî Îsmet Înonu ye. Yê ku Dêrsim bi erdê re kir yek dîsa ev partî û Şefên wê yên Neteweyî ne. Lê çi heye ku, piştî salan, paşdemayiyekî şûr ê Dêrsimî, Elewî û Kurd tê ser vê Partiya Sosyal Faşîst a bi navê CHP’ê. Hem wê qetîl bike hem jî wê van mirovên ku qetîl kirine, bike evîndarên xwe. Ya em dibêjin *“Qatîlhezî encex wisa dibe”* û zanistên tibî jî wek Sendroma Stockholmê bi nav dikin, ev rastî bi xwe ye.

Dewleta Tirk tenê bi ve sînordar namîne. Piştî pelçiqandina dijwar û afirandina tîpek li gor xwe, paşdemayiyên şûran jî bi kar

anîne. Zarokên malbatên ku di berxwedanan de rol lîstîne, çawa ku Osmaniyan li Babialiyê gihandiye û bi kar aniye, KT bi awayekî hê pisportir ev kiriye.

Ji ber ku gelek navên bi awayekî bêperwa tevdigerin tên nasîn, em pêwîst nabînin ku navên wan li vir bidin. Çawa ku dema Osmanî tengav dibû eşîr mîna Alayên Hemîdiyê bi rêxistin fikir, hem li dijî serîhildanên Kurd hem Ermenî, Suryanî û hem jî serîhildanên gelên din bi kar dianî, nêzîkatiyek hemreng ji aliyê Dewleta Komara Tirkiyeyê piştî 1940'an û şûn de bi awayekî hê kûrtir hatiye bikaranîn. Piştî ku li tevahiya Kurdistanê serwer dibe, axayên eşîran û komprodoran gav bi gav dikşîne nav Dewleta Tirk, tebeqeyek tewtewî ya hevkarên ava dike û ji bo li dijî liv û tevgera Kurdan bi kar bîne jî amade kiriye. Jixwe em ê dûvre jî bibînin, li dijî Tevgera Azadiya Kurd, eşîr mîna cerdevan û çeteyan bi kar aniye.

Di encam de Kurdistan ji serî heta binî dagir kiriye û hewl daye tevahiya şopên jiyanê tine bike. Ji bo karibe şopên dawî yên jiyanê tine bikin jî, mîna di bûyera qetilkirina 33 gundiyan Kurd de hat dîtin ku di sala 1943'yan de bi fermana Orgeneral Mûstafa Mûglali bi hinceta qeçaxiya li sînor dikin pêk hatibû, armanc dikin ku bi behaneyan ve berxwedanên herî dawî bitepîşînin û civakeke bê ziman, heta ji xwe direve biafirînin. Û ev planên xwe yên zexelî (bibinî) jî di astek girîng de bi ser xistine.

Ahmet Arîf di cihekî helbesta xwe ya **33 Kurşun (33 Gule)** de bêçarebûna gelê Kurd wiha îfade dike:

*“...Yek ji 33'yan nihêrî
Di zîkê wî de valatiya giran a birçîbûnê
Por û rih bihostek
Di berstûyê wî de spî,
Nihêrî milên wî derb xwarine,
Egîdekî xwedî dilekî mîna dojhê,
Hişê wî çû ser kergoşkeke reben,
Rabirdûyan.
Rinda wî ya bi naz,
Balîfa wî di bin de xeyidî ye,
Cehniya ji deşta Harranê anîbû ket
Mihîna wî ya*

*Perçema wê bi morîkên şîn,
Li ser eniyê heyderî
Sê pehniyên wê spî,
Bi meş, tolaz, melebeza,
qemer.
Çawa firiyabûn ber bi Xozatê ve!*

*Niha wer bêçare û girêdayî,
Wer li pişt wî lûleyeke sar
Nebûya,
Dikarîbû xwe bispêre bilindahiyên...
Ev çiya, bira ne, wê qedrî wî bigirin,
Bi izna Xwedê ev diyar mirov naxin nav şermê
Ariya cigareya dişewite,
Zimanê maregîsk
Ê di tavan de mîna çetel çirîsk dide,
Di cara yekê de
Destên hoste yê difirîne...
Ev çav carekê jî nehatin xapandin
Qiyameta derbendên li benda aşûtê
Xiyaneta bi berf, nermikî
Çavên kendalan ê ji berê de
dizanîbûn...
Bêçare
Wê lê dabana
Ferman teqez bû,
Êdî ji bo mar û mûran çavên wî
Çûkên laşxur dilê wî xwaribana..."*

Piştî vê bûyerê, hestên welatparêz ên mayî jî hatine îpotekkirin. Gel hatiye qutifandin. Ev hilbijartin jî her hal ne tesaduf e. Sal 1943 ye. Li Rojhilatê Kurdistanê, serhildaneke gelê Kurd heye. Cara yekem, Partiyek Kurd a modern dike were damezrandin. J. K. ango Komalaye Jiyanavey Kurdistan hatiye damezrandin û her ku diçe li Mahabadê salên damezrandina Partiya Demokrat a Kurdistan û Komala ye. Rêxistinên ku hatine damezrandin jî hene. Kurd gav bi gav xwe bi rêxistinê dikin. Divê ev bi şiklekî bê rawestandî. Divê Kurd dersek wisa bibînin ku careke din bi ser xwe ve neyên.

Û bûyera 33 Guleyan wisa hatiye plankirin. Herî dawî jî cihekî wek Qerqelî û derdora wê ku bi salan ji têkoşîna welatparêzî dûr ma, derket holê! Lê belê, ne ji ber ku ev derdor ne welatparêz bû, berevajî ji ber ku welatparêziya wê zehf xurt bû, bûyereke wisa hatiye amadekirin. Û demek dirêj li wan deran pel jî naleqe. Dema ku Tevgera Azadiya Kurd rabû, diviyabû ku tevlibûn destpêkê ji van deran bibûya, lê wisa nebû. Lê di demên pêş ên şoreşê de, her ku dîwarê tirsê hilweşiya û qereqolên di mejiyan de hejiya, ciwanên van deran jî ber bi çiyayan ve dibezin û cesaret dikin ku hesabê paşerojê bipirsin.

Û yên “*Destên Hosta*
Yên zimanê maregîsk,
Di derba yekê de firandin...
Ev çav carekê jî
Neketin faqê
Çavên ku
Qiyameta derbendên li benda aşûtê
Kendalên xiyaneta bi berf û hêdî
Ji berê de dizanîbûn...” wê rabin ser piyan.

Me di xebata xwe de cih bi cih rastiya îxanetê ya ku li Kurdistanê pêk hatiye îşaret kir. Em kevanekekê vekin, ji bo hê bêhtir avahiya îxaneta Kurd fêhm bikin jî em careke din binirxînin. Eger em vê avahiya xweseriya Kurd binirxînin wê sûdmend be. Ew ê kêrî me bê ku eger em ji kûrahiya dîroka Kurdan bûyerekekê li vir bidin û pê de biçin.

Di **Destana Gilgamêş** de pêwendiya Enkîdû û Gilgamêş bi pîrozî tê nirxandin. Mîtolojiyê wisa analîz dike, lê dema zimanê mîtolojiyê bê fêmkirin û nirxandin, wê demê tê fêmkirin ku tenê ne efsane ye û rastiyên girîng jî di nav xwe de dihewîne. Di destanê de destpêkê Enkîdu, bi destê jinekê ku ji daristanan hatiye, ji “*cîhana heywanan*” tê bajar. Piştî tê perwerdekirin û kedî dibe, wek şûrê dagirker û wek dostê wî li cihê ku mezin bûye vedigere. Hûvava yê ku di destanê de wek xwediyê daristanan tê dîtin, birîndar dike û digire. Hûvavayê ku efûyê dixwaze her çiqasî dike ji aliyê Gilgamêş bê efûkirin jî, Enkîdû dixwaze bê kuştin.

Encam, qetilkirina Hûvava ye. Helwesta Enkîdû ji qral hê zêdetir qralparêzî ye. Enkîdû beriya ku bikeve daristanê şaneyên cîrifandin û tîrsê nîşan dide, ew jî diyar dike ku di ferqa helwesta xwe ya îxanetkar de ye. Lê çî heye ku; ev helwest û tevgera îxanetkarhevkar dema ji dîrokê tê heta roja me, êdî hestên şermê û tîrsê jî ku îşaretên qebûlkirina îxanetê ne, ji holê rabûne. Li beramberî îxanetê ava rû yan hatiye birîn yan jî çûye. Îxanet gelekî kûr û qatqat bûye.

Wê sûdmend be ku eger em li îro binêrin û bi îro re qîyas bikin. Çetegeriya ku ewqasî kûr çûye, mîna li Botanê û li ba Bûcakan hat dîtîn, êrîşê dibe ser cewherê xwe, nîşan dide ku bê çiqasî ji kevneşopiya Enkîdû hatine. Ev hevkarên ku gelek caran nikarin zîmanê dagirkeran jî biaxivin, eger her roj dilsoziya xwe nîşanî dagirkeran nekin, kurm dikeve canê wan. Gotinên, “*Îdrîsî Bedlîsî li Vir e! Yavûz Sultan Selîm li ku ye?*” jî bilî hevkarî û îxaneta tewtewe, ma ti maneya xwe heye?

Em mînakek hemreng jî di nav Mîtanniyan de dibînin ku pêşiyên Kurdan e. Ev bûyera ku wek Îxaneta Mattîzawa di dîrokê de derbas dibe, ji ber ku bandora xwe li kûrahiyên dîrokê dike, girîng e. Di vê pêvajoyê de ku Mîtannî gelekî zehmetiyan dibînin – B.Z. 1300- dibin du parçe. Li bakur, Tûşratta ku nûnertiya qraltiya navendî dike û ji aliyê Misriyan tê destekkirin, li başûr jî Artatamayê Duyemîn e. Hîtît û Asûrî jî piştgiriya didin Artatamayê Duyemîn. Her hêz li gor xwe dixwaze Mîtanniyan lewaz bike û xwe bi bandor bikin. Heta, Artatamayê Duyemîn piştî xwe dispêre Hîtîtan û xwe wek Horrît ango Qralê Hûrriyan îlan dike. Paşê bi kişkişandina hêzên derve jî êrîşî navenda Mîtanniyan a li bakur dike. Piştî B.Z. 1360’î êdî Mîtannî dikevin nav pêvajoya belavbûyînê. Di heman pêvajoyê de Mattîzawayê kurê Tûşratta, li dijî bavê xwe bi dizî diçe ba Hîtîtiyan û peymanekê îmze dîkin. Ev belge, di lêkolînên Hattûşaşê de derketiye ser rûyê erdê. Mattîzawa, dibe mîna piyonek Hîtîtiyan.

Hîtît wê êrîşî Mîtanniyan bikin û Mattîzawa bikin qral! Mattîzawa jî wê wek qralekî girêdayî Hîtîtiyan bixebite. Hesab ev e! Îxanet di vê astê de kûr e. Serwerekî ku dema pêwîst dibîne li dijî bavê xwe jî bi çavsorî xencera îxanetê ba dide, de îcar tiştê ku dikare ji bo desthilatdariyê bike mejî jî ranagirin. Ya ecêb jî ew e

ku Artatamayê Duyem jixwe li dijî qralê Mîtanniyên Tûşratta ketiye nav liv û tevgerê. Hîtîti wisa hûr lê didin ku ti tesadufan tê de nahêlin. Dema Artatamayê Duyemîn êrîşên xwe giran dike, Mattîzawa xwe diavêje dextlê Kassîdan. Lê, Kassîdiyên ku bi eslê xwe Aryen in û Proto-Kurd in, ji ber îxaneta Mattîzawa dizanin, vê daxwaza starê red dikin. Li ser vê jî Mattîzawa xwe diavêje parastina Hîtîtiyan. Qralê Hîtîtiyan Suppiluliuma, ji bo karibe îxaneta Mattîzawa hê tewtewe bike, vê carê jî bi keça xwe re dizewicîne. Ha, wisa jî îxanetker bi singekî hê saxlemtir girê dide. Mîtanniyên ku parçe dibin, wê dabeşî gelek dewletan bibe. Ji bo serkêşiyên van dewletan yekê –ku ya herî biçûk- Mattîzawa tê diyarkirin. Dibe ku formê herî kevnar ê *“polîtîkaya parçe bike- bi rê ve bibe”* ev be. Di pêşengiya Artatamayê Duyemîn de wê Mîtannî bi dijêrîşan bêne zeîfkirin, li ser welatê lewazbûyî jî kê dixwazin dê wî bi cih bikin û pîlangeriya xwe sergîhayî bikin. Jixwe dema sal digihîjin salên 1340’an, wê demê Mîtannî lewaz bûne û di demên pêş de jî bi temami hildiweşin. Avahiyên parçe parçe, dûvre wê bi navên cur bi cur bêne binavkirin. Yek ji van navan jî wê dûvre bibe Hanîgalbat, Maranî, Sûbarû yan jî Sûbartû. Di dîrokê de hêzên ku ji yekîtiya Kurdan û pêşiyên Kurdan ditirsiyan, her tim destpêkê hesabê parçekirina Kurdan kirine. Jixwe eger Kurd bibin yek, wê demê jixweber hêzek mezin derdikeve holê. Ji bo vê jî divê parçe bikin. Lê çi ecêb e ku hê jî heman listok bi rêka heman avahiya û tewna Kurd dubare dubare tê listin. Tew îcar ev listoka modern, pêkanînên herî mezin û dijmîrovî yên serdema kapîtalîzmê li ber çavên her kesî û bi rehetî plan dike. Dema ku em dibêjin **“Teşîya Kurd hê jî digere”**, qesta me ev rastî bi xwe ye.

Herî dawî em behsa pirtûkên **“Bîra Qederê”** û **“Sîya Evînê”** yên wêjevanê navdar ê Kurd Mehmet Êzûn bikin, karakterên Kurd ên li vir hatine ziman binirxînin, tîpên heman avahiya Kurd a bêbawer, aîdî serweran, li vir baştir bibînin.

Mehmet Êzûn, di **“Bîra Qederê”** de behsa serpehatiya Celadet Bedirxan dike ku kurê Mîr Emîn Bedirxan e û ji neviyên Bedirxan e. Tabî dema vê dike jî bi îfadeyên herî bedew û tijî hest Bedirxaniyan tîne ziman. Êşên sirgûnê ya li Stenbolê û sehayên din ku piştî Îsyane pêk hatin, bi detay radigihîne. Endamên malbata Mîr Bedirxan ên ku ji welêt dûr û bi eşqa welêt mezin bûne, berbi-

çav dibin. Taybetmendiyê wan ê herî diyar jî eşqa Kurd û Kurdistanê ye. Neviyên gihayî, hewl didin ji bo Kurdistanê tiştêkî bikin. Mîthath Beg, di sala 1898'an de li Kahîreyê Rojnameya Kurd a yekemîn derdixîne. Di asta pêşengtiyê de hewl dide li Stenbolê xebatên mîna avakirina komaleyan bike.

Lê, ev rastî jî berbiçav derdikeve holê. Bedirxanên ku bi eşqa Kurd dihelin, berê xwe nadin çalakiyekê jî. Kamûran û Saffet li Ewrûpayê dijîn. Saffet li wir dizewice û jiyana xwe didomîne. Celadet li Şamê dijî. Keyfa wan a vexwarina alkoholê dewam dike. Em her ji hozanên Kurd dibihîzin ku çawa li “zêmaran” guhdar dike û di çi şert û mercên zor û zehmet de dijî. Lê rêxistinbûyîn nîne! Hewldanê çalakiyê nîne! Tew îcar seknên ku wê ji bo rizgarkirina welat, ji bo welat û gel xwe feda bikin, nabe mijara gotinê jî! Rewşenbîr in, welatparêz in, dilinî ne. Lê çalakiya polîtîk nîne. Helwest û tevgera ku wê canê xwe ji bo welatekî feda bike tineye. Dema tundî bi pêş dikeve, pîrnîsîn çêdibe, vekîşandin çêdibe, meydanhiştin çêdibe. Ev trajediyek e. Esas di dema herî sincirî yê nijadperezîyê de û wextên ku şertên objektîf ên rêxistinbûyîna rizgariya neteweyî herî guncav in, ev bi awayekî eşkere qebûlkirina pîrnîsîn û qedera xedar e ku ji bijartiyên Kurd ên arîstokratîk mane.

Mînakek din a hê berbiçavtir û balkêştir jî karaktera Memdûh Selîm e ku di “**Siya Evînê**” de cih digire. Ev bi xwe piştî Meşrûtiyeta Duyemîn di nav Tevgera Kurd de navekî rêzdar e. Dostekî Celadet e. Tevlî Tevgera Xoybûnê jî bûye. Ji bo karibe hesreta welat derbas bike jî, li Sûriyeyê li cihekî nêzî Antakyayê bi cih dibe. Rewşenbîrekî baş, paqij, durist û welatparêz e. Di 1930'î de rêxistina Xoybûnê dixwaze rêveberekî Xoybûnê an jî rewşenbîrekî ji bo alîkariyê bide Îhsan Nûrî Paşa, bişîne Agiriyê. Li Helebê civîn tê lidarxistin. Celadet jî amade ye. Di encama nîqaşê de ji ber ezêb (nezewicî) e, Memdûh Selîm Beg bi armanca destekdayînê dişînin Agiriyê ba Îhsan Nûrî Paşa. Ji bo çend mehan wê biçe û vegere. Lê çi heye ku Memdûh Selîm Beg evîndarê keçek Çerkez e û bi dizî jî hevdu mehr kirine. Hayê Endamên Xoybûnê jî ji vê tineye...

Memdûh Selîm Beg diçe Agiriyê. Yek meh, du meh derbas di-be, bi neçarî heta çend salan li wir dimîne. Her çawa be jî,

rewşenbîrek e ku xwedî namûs û anora Kurd e. Piştî çend sal derbas dibin, çaxa ku têkçûyî vedigere, dinêre ku bedewa Çerkezan jî çûye. Di encam de Memdûh Selîm Begekî hilweşiyayî diafire.

Rastiya dilpêşewat a rewşenbîrên paqij û welatparêz ên ku hewl didin qedera gelekî biguherînin, wisa ye. Bi awayekî objektîf wê ji bo van kesayetên, kesayetên îxanetkar bê gotin, an jî kesayetên kilîtîkirî bê gotin? Ev pirseke zehf tehde ye. Halbûkî, ew hestên paqij, çalakiyek wisa nebes an jî bêçalakîtiyê heq nake...

Jixwe ev rastî jî ji avahiyekê bi bingeh dibe. Behsa çînek serwerên Kurd dike ku bi perwerdeya dagirkeran hatiye bêqîmetkirin. Di nav gelên din de dema ku welatên wan hatibe dagirkirin, her roj destavêjî li ser gel çêbibe, herî kêr ji bo rizgarkirina rûmeta xwe jî be xwe diavêjin ortê. Hewl dide xwe hê zêdetir bi rêk û pêk bike, bibe hêz, xwe bi rêxistin bike, her tiştê xwe deyne holê û xwe feda bike. Ev pêdiviyek mirovbûyînê ye. Eger welat hatibe dagirkirin, her roj rûmet û namûsa gel di bin lîngan de tê hiştin, eger li beramberî vê berxwedan nebe, têkoşîn nebe, ev bi yek gotinê bêrûmetî ye. Îfadeya derketina ji mirovahiyê ye. Watedarkirin û têngkirineke din wê tenê bibe xerabkirina rastiyan. Jean Jacques Rousseau dibêje, *“Maneya mirovek dest ji azadiya xwe berde, tê maneya ji hemû wesfên ji ber mirov e xwedî wan heqan e dest berdide.”* Ya ku xwe di avahiya serwerên Kurd de dide der tam jî ev e: daqurtandina kiryarane, li ser maseyên alkolê qîrewîre û ji kûr ve guhdarkirina dengbêjên Kurde, xwe bi romantîzmek neteweyî ya saxte ve aşkirine.

Yên herî baş wer in, de îcar beşek jî heye; ji bo statuya xwe, ji bo jiyana xwe her tiştên gelê Kurd bi kar tînin, bazar dikin û pêşkêş dikin û di ser de jî vê pir xwezayî dibînin. Ji ber ku wisa teşe girtine. Ji ber vê jî ew kesên ku van rastiyan teşhîr dikin û rastiyan wan didin ber çavan, ji bo xwe dikin hedef û bêtî şerm û fedî bi çavsorî jî êriş dikin.

Êrişên kesayetên wisa yên li dijî fedaiyan welatê xwe ku ji bo welatê xwe, tenê ji bo xatirê welatê xwe can û malên xwe feda dikin, êdî di dîroka Teverga Azadiya Kurd de bûye tişteki ji rêzê.

Ji bo van “welatparêzên” saxte yên ku li Ewrûpayê di nav keyf û xweşiyê de dijîn û tenê zarokekî xwe jî naşînin welêt, çi bê go-

tin? Û ev kesayetên ku serkêşiya dijminahiya Tevgera Azadiya Kurd dikin, gelo çawa bêne binavkirin? Tiştê ku ji bo van bê gotin, dibe ku wiha be, “*Xwedêyo tu van efû bikî, ji ber ku nizanin bê çi dikin.*” (Di Încîlê de bersiva dîrokî ya Îsa ye ku dema li Golgathayê hatibû çarmîxkirin û ji aliyê Cihûyan kevir pê dihatin werkirin dibêje.) Ji ber ku îxanet û hevkarî carekê ketiye nav genên wan. Û ev ketîbûn û ev halê îxanetê, di kesayetên van tîpan de bûye şiklê karakterê.

BEŞA HEFTEMÎN: KURDISTANA PIŞTÎ BERXWEDANÊN HATIN TEPISANDIN

Piştî Berxwedanan li Beramberî Rewşa Cîhanê Rastiya Kurdan

Berxwedanên Kurdan, dema ku cîhan ber bi hevsengiyên nû ve diçû, hatin tepeserkirin. Dibe ku berxwedanên di salên 1930'î de ji ber rastî demek bextreş hatibûn hatin pelçiqandin. Ji ber ku li El-manyayê Hitler û li Îtalyayê jî faşîzma Mûsolînî di rojevê de bû, dibe ku bi awayekî hovane tepisandina berxwedanan ji hêla ti kesî “*nehatibe bihîstin*”. Piştî, êşên Şerê Cîhanê yê Duyemîn, bihîstina awazên Kurdên ku hatine pelçiqandin û wêrankirin, sînordar kiriye yan jî asteng kiriye.

Wek rewşek cudatir, piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn her çiqasî eleqeya emperyalîstan a ji bo petrolê ji bo demekê li Rojhilata Navîn Kurd derxistibin pêş jî, piştî demek biçûk bûne mijara bazaran. Yek ji şexsiyetên Kurd ê ku Emperyalîstan berê xwe danê jî, Şêx Mahmût Berzencî ye.

“Şêx Seîd Berzencî, hê dema ku Başûrê Kurdistanê di bin serweriya Osmaniyan de bû, bi hatina Îttîhatîyan ve di sala 1908'an de li dijî rêveberiya nû serî hildaye. Kurê wî Şêx Mahmût jî destekê dide serhildanê. Serhildan ji aliyê Jon Tirkan tê tepeserkirin, paşê Şêx Seîd, Şêx Mahmût û qismek beşdarên serhildanê sirgûnî Mûsilê tên kirin. Îttîhatî hedef dikin ku malbata Berzencî yê li sirgûnê ye, bi temamî jî holê rabikin. Li ser vî esasî jî dest bi kampanyaya rêşkirina malbata Berzencî dikin. Li vir di encama sûîqestekê de ku bi ser malbata Berzencî pêk tê, Şêx Seîd Berzencî û kurê wî Şêx Ehmed tên qetilkirin. Piştî vê qetlîamê, Şêx Mahmût dixin bin venêrinê û nahêlin ji Mûsilê derkeve. Bûyer li Kurdistanê

deng vedidin û eşîrên Kurdan dixwazin Şêx Mahmût bê berdan, diyar dikin ku yan jî wê êrîşî Mûsilê bikin, tola Şêx Seîd û Şêx Ehmed hilînin. Li ser vê jî Şêx Mahmût tê berdan û destûr tê dayîn ku biçe Silêmanî.

Ji ber Şêx Mahmût vegeyriyaye Silêmaniyê, Îttîhadî dikevin nav fikaran. Şêx Mahmût, di 1918'an de ji bo serfermandarê Îngilîzan ê li Kerkûkê û Wilson nameyê dişîne. Di nameyê de dixwaze ku ji bo li Kurdistanê avakirina hikûmetek serbixwe garantî bê dayîn. Di nameya xwe de îfade dike ku dixwaze bibe serê hikûmeta Kurd. Di vê demê de ku Îngilîz xwe ji herêmê vedikişînin, rêveberiya Îttîhad Teraqî Şêx Mahmût digirin û ji ber vê nameya wî dadgeh dikin. Dadgeh biryara darvekirina Şêx Mahmût dide. Lê, ji ber fikarên ku wê îdama Şêx Mahmût di nav gel de bibe sedema serhildanek mezin, biryara îdamê tê betalkirin.

Piştî nameya Şêx Mahmût a ji Wilson re şandibû, li gel Serdar Noel, heyetek Îngilîzan ji bo Şêx Mahmût bibînin tên Silêmaniyê. Di encama hevdiîtinan de tê ragihandin ku Şêx Mahmût ji hêla hikûmdarê giştî yê li Iraqê wek "Rêveberê Kurdistanê" hatiye tayînkirin. Şêx Mahmût di vê pêvajoyê de ji bo Konferansa Aştiyê ya Parîsê nameyek muzakereyê amade dike û bi rêka Reşîd Kaban û Seyid Ehmed Berzencî dişîne Parîsê.

Di pêvajoya hikumdariya Şêx Mahmût de ji ber di qada îdarî de hin valatî çêdibin; Îngilîz li hin daîreyên îdarî zilamên xwe bi cih dikin, hewl didin di rêveberiyê de Kurdan bê bandor bikin. Îngilîz her hewl didin bandora Şêx Mahmût bişkînin û bi xapandinê ve gel bikîşînin cem xwe. Li beramberî siyaseta nebawer a Îngilîzan, Şêx Mahmût bi eşîrên Kurdan re dicive, dest bi amadekariyên serhildanê dike. Ji lîderê Eşîra Dizlî Mahmût Xan dixwaze ku Silêmaniyê bigire. Li ser vê jî Mahmût Xan bi hêzên xwe yên çekdar di 21'ê Gulana 1919'an de Silêmaniyê desteser dike. Di heman demê de gelek eşîrên Kurdan ên li Kurdistanê Îranê jî li dijî hikûmetê radibin, daxwaza dikin ku Kurdên Îran û Iraqê bibin yek û di pêşengiya Şêx Mahmût de Kurdistanek mezin bê avakirin. Serhildana ku li Silêmaniyê dest pê kir, di demek kurt de li gelek herêmên Kurdistanê belav dibe.


Şêx Mahmût jî li gel artêşa xwe li Derbendî Baziyan bi cih dibe. Bolukek leşkerên Îngilîz, di 17'ê Hezîranê de li Çemçemalê ji bo

êrîşî hêzên Şêx Mahmût bikin rawestiyane. Hêzên Îngilîzan ji pişt ve dorê li Derbendî Baziyan digirin, hêzên Kurd bomberdûman dikin û di vê demê de Şêx Mahmût jî birîndar dibe. Bi birîndarbûna Şêx Mahmût ve, hêzên Kurd ên bê lîder mane, belav dibin. Îngilîz, Şêx Mahmût û zavayê wî Şêx Hama Garîb bi birîndarî digirin û dişînin Bexdayê. Li Bexdayê dadgehek leşkerî ava dikin û Şêx Mahmût ji ber sûcên,

1- *Li dijî Dewleta Brîtanyaya Mezin îsyan kiriye û bûye sedema xwînrijiyê.*

2- *Alaya Brîtanyayê daxistiye, li şûna alaya Kurdistanê daliqandiye, tê darizandin.*

Şêx Mahmût van tewanbariyan qebûl nake, îfade dike Îngilîzan sozên xwe pêk neanîne û ji vê xwîna herikiye jî Îngilîz berpîrs in. Dadgeh biryarê dide ku Şêx Mahmût were daliqandin. Piştî ev ceza vediguhere hepsa 10 salan û sirgûna Hindistanê. Wîlson, diyar dike ku ev biryara dadgehê xeter e û van tîne ziman; “Jiyana Şêx Mahmût ji bo dostên wî hêviyek mezin e. Ji bo dijminên wî jî xeteriyek mezin e. Dostên Şêx Mahmût bi hêviya ku wê vegere, wê helwestên xwe yê berê bîdomînînin. Dijminên wî jî bi tîrsa ku wê vegere, wê jiyanek bi rehetî nebînin. Ango bi kurtasî, heta ku Şêx Mahmût bijî, wê li Kurdistanê îstîqrar tinebe.”



ŞÊX MAHMÛDÊ BERZENCÎ

Xulase, Kurdên ku wê mîna amûrekî tengavkirina Tirkî bihatana bikaranîn, wek mînak Şêx Mahmût Berzencî, dema nehatin vê lîstokê û berevajî, polîtîkayek bi aliyê Tirkî de şopandin; vê carê berê xwe didin Mahmût Berzencî yê ku berê bi xwe destek dikirin û derdixistin pêş, dîl digirin û di sala 1919'an de jî wek me got sirgûnî Hindis-

tanê kirine.

Li beramberî rastiya ku “*Di raporên Îngilîzan de xuyaye ku ji destpêka salên 1922’yan ve li Mûsilê meyla alîgirtiya Tirkîyeyê berbelav bûye û eşîrên Kurdan bi awayekî veşartî têkiliyan li cem Mûstafa Kemal Paşa datînin.*”

Rêbertiya Têkoşîna Neteweyî, li dijî Îngilîzan bi awayekî serkeftî eşîrên Kurdan kirine nav liv û tevgerê. Rojek piştî serkeftina 30’ê Tebaxa 1922’yan, serkeftinek jî li eniya Iraqê dibe. Hêzên Kurd ên di femandariya Ozdemîr Beg de, di Şerê Derbendê de hêzên Îngilîzan têk dibin û roja 18’ê Îlona 1922’yan navçeya Şaqlewa dagir dikin” jî dîsa Îngilîz xwe diavêjin fenûfûtên tên zanîn. Ji bo karibin Şêx Mahmût Berzencî bi kar bînin, di sala 1922’yan de careke din gazî dikinê, ji bo li Silêmaniyê bi awayekî girêdayî wan bixebite jî dikevin nav hewldanên nû. Armanca wan a esasî ew e ku naxwazin Kurd biherikin ba Tirkan. Eger Kurd û Tirk xwe bidin cem hev û hevpar tevbigerin, wê Plana Mûsilê ya Îngilîstanê bi temamî bikeve avê, lewma jî Îngilîz di “Polîtîkaya Kurdan” de guhertinê dike. Sixurê Îngilîzan Noel, sozan dide Şêx ku wê qada wî ya bandorkirinê berfirehtir bibe û bibin xwedî “otonomî”. Wisa jî dikşîne cem xwe. Şêx, li ser garantiyên ku dide Îngilîzan, li vir tê ragirtin. Ev garantî;

1-Şêx, wê li Mûsil, Kerkûk, Silêmanî û Hewlêrê ku xwedî bandorek mezin e, wê dijberiya Îngilîzan neke.

2-Bi ti awayî wê pêwendiyên li gel rêveberiya Tirk daneyne.

Li ser vê di Cotmeha 1922’yan de Şêx Mahmût Berzencî li Silêmanî ji hêla Îngilîzan ve wek serokê desteya hîlbijartinê tê wezîfedarkirin û li Bexdayê bi aliyên Îngilîz û Iraqê re lihevkerinêk çêdibe. Dema soz tê dayîn ku wê sînorên “Herêma Xweser” herêma Silêmanî jî di nav xwe de vehewîne, wê demê li ba efserên Iraqê û Serdar Noel diçin Silêmanî.

Şêx Mehmût Berzencî, dema ku xwe li Silêmanî bêyî xebera Îngilîzan wek Qralê Hikûmeta Kurd a Serbixwe îlan dike, wê demê tevlîhevî çêdibin. Komîsertiya Bilind a Îngilîzan ji Şêx dixwaze ku dest ji vê biryara xwe berde. Dema hevdîtin bê encam dimînin, 3’yê Adara 1923’yan Balafirên Şer ên Îngilîzan (RAF-Royal Air Force –**Hêzên Hewayî yên Qraliyetê**) êrîşî bîryargeha Şêx dikin. Şêx Mahmût Berzencî berxwedana xwe didomîne. Her

çiqasî **“Banga Heq”** ango îlana Cîhadê kiribe jî, di sala 1924’an de wê Îngilîstan bi temamî li ser Silêmanî serwer bibin.

Piştî hovîtiya Îngilîzan, Mahmût Berzencî heta demekê li sînorê Iraq-Îranê dimîne, dûvre xwe diavêje Îranê. Sala 1927’an soza “girêdanê” dide Îngilîzan, destpêkê sirgûnî Iraqê tê kirin. Sala 1930-31’ê jî bi qismî dikeve nav liv û tevgerê lê encamgir nabe, dûvre dîsa li Başûrê Irakê bi cih dibe û heta dawiya emrê xwe li vir dimîne. 9’ê Cotmeha 1956’an li Bexdayê diçe ser dilovaniya xwe. Gotinên wî yên rastiya Kurd herî baş îfade dikin, **“Hawar dikim hawara me Kurdan dûr e, he hey Kurdo xayino!”** hê jî di warê nîşandana rastiya Kurd de derbasdar e.

Ji bo yektatiya “bextreşîya” Kurd bê nîşandan, em li vir nîşe-yekê deynin. Beriya bombardûmana Silêmanî, Berzencî ji rêveberîya Sovyetan re nameyek nivisiye. Ev nameya bi dîroka 20’ê Çi-leya 1923’yan, ji bo bi qenala Konsolosxaneyê Yekîtiya Sovyetan a li Tebrîzê bigihêje Lenîn hatiye nivîsandin:

“... sala 1917’an, mirov ji tevahî cîhanê re radigihînin ku ji pençeyên tîranan rizgar bûne, xwe gihandine serxwebûn û azadiya rast. Tevahî gel û neteweyên bindest, bi coşek mezin silav li vî dengî û şerê serxwebûnê dan destpêkirin. Ev gel ji bo armancên wan pêk werin, piştî xwe bi destekên erênî û dostanî yên Yekîtiya Sovyetan girêdidin. Dema em behsa gelê me bikin, wek di piraniya rojnameyan de tê dîtin, tê zanîn ku Îngilîzên xwînmij bêyî cudahiya jin û zarok bikin, bi bombe û çekan ve bi bêrehmî êrîşî gelê Kurd dikin. Ev beriya çar salan, di sala 1919’an de qewimî...” Wisa dixuye ku; an destê Kurdan li hewa dimîne an jî berjewendiyên navdewletî dîsa Kurdan li derve dihêlin.

Gelekî ecêb e ku yên welat bombardûman kirine balafirên Îngilîzan e ku ji milê din ên cîhanê rabûne û dixwazin Kurdistanê dagir bikin. Milekî din ê vê hîleyê jî ew e ku dema Îngilîz bi karta xwe ya Kurdan dilîzin, karta xwe ya Tirkan jî ji bîr nekirine. Em-peryalîzm, li gor rêgeza xwe ti carî bi tekane kartekê, tenê hespekê nalîze, her tim bi alternatîf dixebite. Kurdan wek amûrê parçekirin û zeîfkirina Tirkan bi kar tînin; ji Tirkan re jî her tim dibêjin bê Kurd çiqasî xeter in, her kêlî dikarin berê xwe bidin Tirkan û Tir-kan parçe bikin û wisa jî wan tehrîk dikin. Ji bo van gotinên xwe

xurt bikin jî naverok û belgeyên hevdiştinên xwe yên li cem Kurdan parve kirine.

Encam: Dijminahiya Kurd û Tirkan!

Encam, Kerkûk û Mûsil ji Îngilîzan re ma! Li beramberî bi hovane tepisandina Îsyana Şêx Seîd û berxwedanên din, mûhek jî di canê ti kesî de nalerize! Û ji aliyê dewletên emperyalîst ve di 5'ê Hezîrana 1926'an de bi Peymana Enqereyê Kurdistan dibe 4 parçe.

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji vê polîtîkayê re **Berîhevdanê “Kîroşk bireve, tajî bigire”** dibêje. Bi têgînek din polîtîkaya “parçe bike, bi rê ve bibe”. Ji bo me Kurdan jî ev “Xefîka Kurd” an jî “Dafîka Kurd” e.

Rewşek din a trajîk ku di vê demê de pêk tê, avahiyên olî û etnîkî ji hêla mîsyonerên Îngilîz, Fransî û Amerîkî têne tehrîkkirin. Di destpêka 1920'î de li Colemêrgê li dijî Kurdan Asûrî û Suryanî tên kişîşandin; Tirk û Osmanî bi gotinên “*ol û welat ji dest diçe*” feodal û şêxên Kurdan tehrîk dikin, gelên Kurd, Asûrî û Ermenî dikin dijminên hev û bi hev didin şikandin. Gelên ku bi hezaran salan li ser heman xakê bi xweşbînî, hezkirin û piştevaniyê jiyane; di encama nexweşiya nijperestîya emperyalîstan û îstîsmara dîn, li hev didin. Û di encama van kiryanan de, helbet wê qetlîamên li dijî Kurdan jî li rojava deng venedin.

Nêzîkatîyek cudatir jî nêzîkatîya Tevgera Sosyalîst e ku xwe wek ‘çepgir’ pênase dike. Li Kurdistanê bi rê û rêbazên faşîzan ve gelê Kurd tê qetilkirin, ji warê xwe, çanda û nasnameya xwe tên kîrin, lê “Sosyalîst” li beramberî vê bêdeng mane û ev trajedî erê kirine. TKP, li Sosyalîst Enternasyonalê bandora xwe bi kar tîne, dibêje berxwedan xwedî karakterên paşverû û feodal in û wisa jî Qirkirin û Qetlîamên Kurd ên ku KT pêk tîne, kamûflaj dike. Ji bilî hin dengên ne diyar, ji bo berjewendiyên polîtîk koçberkirina gelekî û qetlîamên erjeng hatine paşguhkirin. Mixabin, yên li ser navê mirovahiyê ketine rêya têkoşînê; bi nêzîkatîya xwe ya Pirs-girêka Kurd tenê girêkek din li ser vê Xefîka Kurd zêde kirine.

Pîştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn, cîhan ketiye pey lêgerînek nû. Ev şer, wek serkeftina “Eniya Demokratîk” derbasî dîrokî bûye. Pîştî vî şerî, cîhanê li gelek deveran vekirinên demokratîk ên bi

rastî kirine û wer jî peresîna xwe domandiye. Piraniya gelan azadiya xwe bi vê pêla demokratîkkirinê ve bi dest anîne.

Hewldanên tayînkirina xwe an jî qederên xwe yên mîna Şerên Rizgariya Gelan tê zanîn, bi giranî piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn bi vî bayê demokrasiyê ve lezandiye. Şoreşên Çîn, Vîetnam û Hindistanê û şoreşên rizgariya pir gelan jî vê rewşa konjonktûrel hêz girtine.

Lê çi heye ku gelê Kurd, şens nedîtiye ku vê konjonktûra nû ya di lehê gelan de bi kar bîne. Nuqteyên berxwedanê yên Kurd, hê beriya Şerê Cîhanê yê Duyemîn bi şiklekî erjeng hatiye pelçiqandî û tepisandin. Li Bakur, Komara Tirkiyeyê bi qirkirina Kurd vê kir, li Başûr emperyalîstan –bi taybet jî emperyalîzma Îngilîz- ji bo berjewendiyên xwe yên aborî û jeo-stratejîk, Kurd pêşkêşî Ereban kirine. Ji vê hê xerabtir jî, bi bombeyên balafiran ve hewl dane bêbandor bikin. Dûvre jî bi Qral Faysalê ku ji Urdunê anîn, Kurd dehft dane derveyî dika dîrokê.

Rewşek bi heman rengî, bi destê Fransiyan li Sûriyeyê bi serê Rojavayê Kurdistanê tê, li Rojhilat jî Kurdên ku piştî xwe dabûn Artêşa Sor, di demek kurt de ji darê dikevin. Kurdên Rojhilat, di salên 1945-46'an de bi destekekê ve Komara Demokratîk a Kurdistanê ragihandibûn. Lê, Yekîtiya Sovyetan bi armanca ku karibin qayîşê hê xurttir bi emperyalîstan re bike, li Îranê kir, li gor berjewendiyên xwe jî desteka xwe ji piştî Kurdan kişand, ti pirsgerêk nedît ku dawî li Komara Demokratîk a Kurdistan a Kurdan were.

Di encam de; ji bo her gelî, bidawîbûna faşîzmê, berxwedan li gor mafên bingeîn û demokrasiyê dane qebûlkirin gihîştîye asta herî jor, lê ji bo Kurdan, piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn, ji azadiyê bêparbûnê wîrdetir, Lozan hê bêhtir hatiye kûrkirin. Di siyaseta cîhanê de tinekirina Kurdan hê zêdetir hatiye rewakirin û fermîkirin. Wek encameke polîtîkayên Anglosakson, rastiya Kurd bi awayekî serbetonkirî dikeve pêvajoyeke nû.

Meyl û Tevgerên Curbicur ên li Bakurê Kurdistanê Derketin Holê

Rewşa piştî 1950, parçeyê Bakurê Kurdistanê ji mêtina kapîtalîst re vekir. Eger em li ser rastiya *“Kapîtalîzm ew sîstem e ku herî zêde ferd dîl digire”*, tespîta *“Kapîtalîzm, serwerî û desthilatdariya herî gihîştî ye”* zêde bikin, wê demê net derdikeve holê ku kapîtalîzm bikeve nav kîjan qad û civakê, wê ber bi hilweşîn û bidawîbûnê bibe. Dema mijar tê ser Kurdan, têkiliyên kapîtalîst li Kurdistanê tinebûna neteweyî jî dilezîne. Mîna ku hin dibêjin, kapîtalîzm pêvajoya neteweyîbûnê pêş naxe, berovajî wek me li jor jî got, tersa wê pêş dixê. Bi desthilatdariya Partiya Demokrat, sîstema serweriya Tirk, tebeqeyên hakim ên Kurd jî digire binyeya xwe, li ser hebûna Kurd û çînên kedkar ên Tirk zext û mêtinek mezin ferz dike.

Partiya Demokrat, li gel pîrsgirêkên komara otorîter û bi giştî jî pîrsgirêkên Şerê Cîhanê yê Duyemîn, “fîrtûneyek demokrasiyê” ava kiriye û bûye desthilatdar. Bi gotinek din, li ser avahiya xwe ya desthilatdariya giştî, avahiya jorîn a bazirgan û xakê jî zêde dike, karaktera komarê ber bi oligarşiyê hilpekandîye. Bi rastî jî bi taybet giregirên feodalîteya rojhilat ên hatî tepisandin û pêşaneyên yekem ên bûrjûvaziya xakê û beşa bazirgan ên rojavayî, navê xwe li pêvajoyek dîroka komarê nivîsandine.

Abdullah Ocalan vê pêvajoyê wisa dinirxîne: **“Pîrsgirêka Kurdan a vê demê, ji pêvajoya serhildanên tepeserkirî, vegera ji sirgûnan, pêçana birînan û bi îdeolojiya Kurdparêziyek pîr zêf xwe nîşan dide. Ev, Kurdparêziyek zehf lewaz a bûrjûva ye. Her wiha, rewşenbîrên wê hene, lê xebatên wan îdeolojiyê nabihure. Ne xwedî hêzek partîbûyîna xurt in, nikarin bibin tevger. Xebatên wan ên îdeolojîk jî dûrî zanist û berfirehiyê ne. Li gor rewşa di destpêka sedsalê de jî gelekî paşdemayî ne. Bi hewldana ku dixwazin sûdê ji rêbertiya Barzanî û bandora ji çepgirên Tirkan bigirin jî, li vir jî nikarin avahiyek rûniştî derxînin. Bi kurtasî, nikarin ew helwesta çîna klasîk a serwer ku zehf li paş hêzên serhildanên serdema feodal dimînin, li gel hevkarîyê bi şiklê cudaxwaziyê ye, derbas bikin. Qasî pênaseya**

rast a komarê, nikarin nêzîkatiya li beramberî wê jî diyar bikin. Rexneya bizdonek û pûç, pir kesayetên seqet derdixîne holê. Dema zexta li ser vê mijarê ya demê jî lê zêde dibe, tevgerê neteweyî ya bûrjûvaya Kurd bi tendurist bi pêş nakeve...

Netewperestiya pir zêde ya Tirk jî, dema di sûcdarkirinê de zêdegaviyan dike, pîrsgirêka Kurd a di esas de pîrsgirêkek herî demokratîk e, piranî nikare xwe ji provokebûyîna xelas bike. Dema daxwazek demokratîk a herî biçûk jî wek cudaxwazî û îxaneta li welêt tê pênasekirin, antî demokratîzm ji pîrsgirêkê hêz wergirt, rê vekir ku şovenîzm û faşîzm xwedî bibin. Vê şovenîzmê li ser çepgirên Tirk jî qasî vê bandora xwe kir. Kurdiyetiya ku piştî serhildanan bi tasfiyeya fîzîkî re hevrû ma, di vê demê de nikarîbû xwe ji rewşa felca îdeolojîk û siyasî rizgar bikira. ” (Manîfestoya Demokrasî û Aştîyê)


Wek li jor jî hat ziman, rastiya Kurd a ku dihat xwestin çend tebeqan di bin axê de bê veşartin, mîna Bûyera 33 Guleyan, bi hewldanên qetlîama hov û bi meqsed dihat xwestin ku bi temamî bê tepisandin. Bi ensturmanên çanda populer ên mîna sînema û muzîkê Kurd wek hov dihatin pêşkêşkirin, tevahî nîrxên wê yê hunerî û çandî hatin dizîn û desteserkirin. Wek çawa zimanê Kurd bi temamî hat qedexekirin, her wiha avahiya cografîk û navên mirovan li Kurdistanê ji serî heta binî bi yê Tirkî hatine guhertin. Bi polîtîkayên herî berfireh ên tinekirinê ve hewl hatiye dayîn ku Kurd bî helandin. Kurdistan, mîna qadeke ku Tirkî di warê siyasî, çandî de xwe berfireh û berbelav dike dihat nîrxandin. Dema ku Hitler dixwest li dijî Rojhilatê Ewropayê bi polîtîkaya ‘*Drang nach Osten*’ yê ekspansiyonîst ango berfireh kirina xaka bike; Komara Tirkiyeyê li ser vê nêzîkatiyê Berfirehiya Çandî jî zêde kirine, pêkanînek hê faşîzantir pêk aniye. Li dijî van hin rewşên bîrên Kurd hewl dane dengê xwe rakin, lê lewaz e û jê wîrêdetir jî nîne.

Apê Mûsa, di 31’ê Tebaxa 1959’an de di kovara “**Îlerî Yurt/Welatê li Pêş**” de helbesteke Kurdî ya bi navê QIMIL diniwîse. “Qimil”, li gel “sînê” buxikeke xurekan e ku dibe bela seriyê. Mijara helbestê wiha ye: Keçeke Siwêregî, kîsek genimê ku ji aliyê buxika bi navê qimilê êdî bûye ka, ji etar re dibe. Dema etar dibîne ku genim bêkêr e, dibêje ku nikare li beramberî vî genimî ti

tiştî bide. Ew keç jî xemgîniya xwe bi stranekê tîne ziman: “*Bi çiya ketim lo apo, çiya melûlbûn rebeno/ Ceh seridî lo apo, genim hûrbûn evdalo/ Qimil hatî lo apo, bi refaye rebeno/ Xwar genimî lo apo, hişte kaye rebeno*” Apê Mûsa di dawiya nivîsê de ji bo keça ku helwest gotiye wiha dibêje; “*Xemê nexwe xwişkê, êdî birayên te digihêjin ku wê te ji zerara qimil, sin û mêtingeran rizgar bike.*”

Di Rojnameya Cumhuriyetê ya 6’ê Îlona 1959’an de li dijî vê helbestê gelek nivîsên dijber tîn weşandin. Wek tê payîn jî di aleyhê Ilerî Yurt û Mûsa Anter de doz tê vekirin. Ji ber ku wê ji milekî ev doz pêk were û li milê din jî hin rewşenbîrên ku vê helbestê diparêzin hene, Enqere gelekî aciz dibe. Serokkomarê demê Celal Bayar telefonî Waliyê Amedê dike, dixwaze “*serê Mûsa Anter bê pelçiqandin.*”

MÎT, “Rapora Kurdan” amade dike. Di raporê de tê pêşniyarkirin ku di navbera 1.000 û 2.500’î de Kurd bêne “tenkîlkin (bidûrxistin).” Tê îfadekirin ku ew gotina navdar a Celal Bayar ku dibêje “*em hezar kesî bi dar vekin*”, li ser vê pêşniyarê hatiye gotin. Serokwezîrê demê Adnan Menderes ê ku wek prensîb ne li dijî karê “*bidarvekirinê*” ye, bi hişyariya Wezîrê Karên Derve Fatîh Ruştî Zorlû, qîma xwe bi listeyek îdamê tîne ku ji 50 kesan pêk tê. Girtinên li çar aliyên Tirkiyeyê, di 17’ê Kanûna 1959’an de dest pê dike.



MÎT’ê her kê pêşniyar dikir, navên wan li listeya 50 kesî dihat nivîsandin û ew dihatin girtin. Ji ber ku li Harbiye-Stenbolê tenê 40 hucre (şane) hebûn, ji 50 kesên ku girtina wan dihat pêşdîtin, 10

kes berdayî tèn darizandin. Dema ku Mehmet Emîn Batû ji ber xwîn ji madeya wî diçe û jiyana xwe ji dest dide, 49 kes dimînin. Piştî her çiqasî 2 kesên din li dozê hatibin zêdekirin jî, wê ev doz di nava raya giştî de wek “Doza 49’an” bê zanîn.

Doza 49’an a ku di 1959’an de dest pê kir, di 1965’an de li Enqereyê bi dawî dibe. Hin rewşenbîrên Kurd ên mîna Apê Mûsa kovar derxistine. Kovarên mîna Rêya Nû û Deng, rewşa 49’an û Mîtingên Rojhilat, kêm be jî li dijî rastiya betonkirî nîşaneyên dengê Kurd e. Lê çi heye ku mîna Abdullah Ocalan jî tîne ziman, yên ku diviyabû ku pêşeng û rewşenbîr bûna, çawa dilinî û niyeta paqij nebihurandine, li hemberî tevgerên radîkal ên ku dikarîbûn bi pêş biketana jî hewldanên bendkirinê –ji ber karakterên xwe yên feodal- raber kirine û xwe jî xistine nav vê.

Bûyerek din jî “Bûyera 400’an” e. Piştî darbeya 27’ê Gulana 1960’î bi 4 rojan, li Kurdistanê 485 kes tèn binçavkirin, li bajarokê Kabakyazi yê Sêwasê li kampekê tèn komkirin. Wek li jor jî hat ziman, hê Bûyera 49’an bi encam nebûye. Ji wan kesên ku li kampê hatine komkirin, hin kesayetên navdar û axa û şêx jî hene. Rayedar, sûcên van kesên ku li kampê girtine jî wek, “*Propagandaya Kurdparêziyê dikin û amadekariyên îsyana li dijî dewletê dikin*” tînin ziman. Piştî ku 9 mehan li kampê têne ragirtin, ji van 55 kesên ji malbatên navdar sirgûnî cihên cur bi cur ên Tirkiyeyê tèn kirin. Ecêb e, lê kesên ku ji aliyê dewletê ji ber di Şerê Rizgariyê de bûne xwedî rolên erênî û hatine xelatkirin, piştî çil salan wê li kampên dîlgirtiyan ên Sêwasê bêne ragirtin.

Ev bûyer piştî salan ji hêla Husamettîn Cîndorûk wiha tê îfadekirin û li gor xwe darbeya 27’ê Gulanê rexne dike; “*Darbeya 27’ê Gulanê di politîkaya Rojhilat de du şaşitî kirine: Yek, lîderên siyasî û rûspiyên herêmên rojhilat li kampa ku wek Kampa Sêwasê tê binavkirin, kom kirine. Îdeolojiya Kurdparêziyê wek dibistanekê xwe li wir daye der. We zîlamê ku girêdayî dewleta xwe ye jî zîlamê ku dijber e jî birin wê derê û beşa dijber gotina, ‘Tu girêdayî dewletê be çi ye? Ka binêre tu jî li ba me li vir e!’ parastin. Şaşitiya duyemîn a 27’ê Gulanê jî ew e ku 55 axayên ku li herêmên rojhilat hatine tespîtîkirin, sirgûnî herêmên rojava hatine kirin. Tabloya diyar bû çi ye? Li milekê rûspî li Kampa Sêwasê ne, li milê din jî 55 axa li herêmên rojava sirgûnîkirî ne.*” Lê em dizanin ku


esasên van kiryanan cuda ne. Dixwestin pozan bifirkînin û wer jî li dijî şiyarbûnek Kurd ji mêj ve tevdîran bigirin. Dixwestin ê ku wê pêş bikeve beriya rû bide bipelçiqînin.

Bûyera hem 400'an hem jî 49'an dema em karibin bi çavê wê rojê lê binêrin, wê kiryar hê bastir bê fêmkirin. Şoreşa Abdulkarîm Qasim ku 14'ê Tîrmeha 1958'an qraltiya li Iraqê hilweşand, esas gelek maf dane Kurdan û Kurd anîne pozîsyonek mîna şîrîkatiya hikûmetê. Ev hem di sehaya objektîf hem jî subjektîf de ji bo zîh-niyeta faşîzan a KT ku ji bo tinekirin û qedandina Kurdan hatiye damezrandin, tehlûkeyek mezin e. Dewleta KT ji bo pêşiya vê tehlûkeyê bigire jî, wek li jor hatiye gotin, ketiye nav pratîkan.

Eger em bidomînin; fikrê ku li Bakurê Kurdistanê damezrandina PDK Tirkîyeyê aîdî Fehmî Bîlal ê Licê ye. Kesayetekî xwedî tecrûbeya jiyanî ye, tevî Berxwedana Şêx Seîd jî bûye. Armanc dike ku mîna PDK-I ya li Başûr li Bakur jî ava bike û alîkariyê ji Başûr bigire, avahiyeke ku dikare bi pêş bikeve saz bike. Wê van nêrînên xwe ji Saît Elçî re ku di Bûyera 49'an de cih digire, bibêje. Wê demê wextê ku Faîk Bûcak ê ku bi welatparêziya xwe dihat zanîn jî avahiyek wisa bi erênî pêşwazî kir, amadekarî dest pê di-kin. Dûvre, wê Hîkmet Bûlûttekîn, Hasan Yikmiş, Muhterem Bîçîmlî û paşê jî welatparêz mezin Necmettîn Buyukkaya yê li Amedê tê qetilkirin, tevî vê avayiyê dibin. Di 1965'an de PDK-T bi awayekî fermî tê damezrandin. Wek tê zanîn, Necmettîn Buyukkaya dûvre dibe serokê DDKO (Oxaxên Şoreşger ên Çanda Rojhilat) ku di 1969'an de tê damezrandin.



Faîk Bûcak



NECMETTÎN BUYUKKAYA

PDK Tîrkiye piştî damezrandinê wê ji rêxistinên din re jî behsa armancên xwe bike. Yên destpêkê jî TÎP û PDK-I ye. Armancên wan bi kurtasî ev in: *“Têkoşîna Neteweya Kurd tenê bi şerê çekdarî dikare pêş bikeve, pêdivî bi rêxistinbûyînek wisa heye ku tevahî Kurdên li çar parçeyên Kurdistanê di nav xwe vehewîne û ev giştî jî tenê bi xetek M-L (Marksîst-Lenînîst) mimkun e.”*

Îro bi her aliyê xwe derketiye holê ku; ji ber têkiliyên PDK-I û MÎT’a Tîrkan, hê beriya zayinê tê tasfiyekirin. Ewil, li Bakur welatparêzê bi qîmet Faîk Bûcak, piştî nîqaşa devkî ya li gel fermanzarekî Tîrk, pîr dem di ser re nebihure, qaşo ev fermanzar jî nîqaşê nerazî bûye, tê qetilkirin. Lê, serpêhatiya rast ne ev e. Komploya ku tê serê gelek Teverên Kurd ku wek zayina pêşwext tê binavkirin, di şexsê Faîk Bûcak de li dijî PDK-T bi kar tînin û dixwazin ku beriya ev rêxistin rehê xwe belav bike were tasfiyekirin. Li milekî ev kirine, li milê din jî gav bi gav bi destê Derwêşê Sado ve PDK-T xistine bin kontrola MÎT’a Tîrkan.

Lê, beriya derbasî vê gavê bibin, Dr. Şivan-Saît Kirmizitoprak û Saît Elçî yên ku di nav vê tevgerê de gelekî rêzdar bûn, dema ji Başûrê Kurdistanê ji bo alîkariya şoreşa bakur tîr, di demek pîr kurt de tîr qetilkirin. Ev giştî bi destê PDK-I’ê û navbeynkariya wê pêk hatiye. Ev her du milîtanên kurt ên gelekî bi qîmet, dema tîr Zaxoyê, li Metînayê nêzî Kelha Kumrî bi dest PDK-I’ê tîr qetilkirin. Destpêkê yek ji aliyê PDK-I’ê tê qetilkirin, dûvre dibêjin *“hevîrê wê qetil kir”* û yê din jî ji aliyê PDK-I’ê tê kuştin. Du milîtanên pêşeng ên ku dikarin li Bakur rêzdar in û di karîbûn pêşketinan bi dest bînin, wisa jî ji holê tîr rakirin. Her çawa bibe jî hincetên wan di bîrîka wan de ye; Nêrînên Dr. Şivan ji bo avahiyek milliyetgiriya berê zehf sosyalîstî bûn. Ê wek me got, piştî şhadeta her duyan êdî PDK-T wê heta astek girîng bikeve bin kontrola MÎT’ê.

Eger em vê bûyerê ji pirtûka bi navê **(Li Kurdistanê Dîroka Serweran)** ragihînin; *“Dr. Şivan dema li Zaxoyê bû, li vir bîr-yargehê datîne û hin milîtanên xwe perwerde dike. Îsa Suvarî yê ku li Zaxoyê berpîrsê pêşmergeyan bû û zîlamê sereke yê Îdrîs Barzanî bû, berê Saît Elçî jî dide başûr û planên tasfiyeyê amade dikin. Hin nakokiyên ku berê jî hebûn bi kar tîne, Saît Elçî dike û*

vê bûyerê diavêje stûyê Dr. Şivan. Wek merheleya duyemîn jî bi îdiaya ku Dr. Şivan, Saîd Elçî kuştiye, Dr. Şivan jî ji holê tê rakirin. Piştî kuştina Dr. Şivan, wê pêşî li partiyeke şoreşger a ku wê li Bakur bikeve pêşîya wan tê girtin. Ev bûyera komployê, plana taybet a “pevşikandinê” ye ku hêzên serwer li dijî Kurdan bi kar tînin...


Weke ku me li jor jî anî ziman, piştî şehadeta Seîdan wê Derwêşê Sado bihata ser PDK-T. Ev kes wek kesê ku di navbera PDK-I û MÎT’ê de têkiliyê saz dike tê nasîn.”

Ji bo em karibin qetilkirina Dr. Şivan hê baştir fêhm bikin, wê girîng be ku em peymanek veşartî ya di navbera PDK-I’ê û DYA de li vir bidin. “Beriya hewldana sûîqesta serneketî ya ku di 29’ê Îlona 1971’an de pêk hat, Mele Mûstafa Zeyd Osmanê 47 salî wezîfedar kiribû ku têkiliyan li ba Amerîkayîyan deyne. Belgeya arşîva Amerîkan a bi dîroka 16’ê Tîrmeha 1969’an de ji Sefîrxaneyê Amerîkan a li Beyrûdê ji bo navendê (Departmana Karên Derve ya DYA) hatibû şandin. Sohbeta li ba Zeyd Osman ê ku qasidê Mele Mûstafa bû, dianî ziman: ‘Osman ragihand ku xewna Barzanî ew e ku li ba DYA pêwendî bîne girêdan. Dixwaze ji aliyê rayedarên Amerîkayî bê zanîn ku pêşniyara Hikûmeta Iraqê ya ji bo êrişê bibin li ser Îranê ji aliyê Kurdan hatiye redkirin. Her wiha, Tevgera Kurd a Iraqî, Kurdên li Tirkîyeyê ji bo serî li hemberî hikûmeta xwe rabikin ti carî teşwîq nekiriye û ti carî dest li karên hundir ê vî welatî wernedane. Barzanî, têkildarî mijarên mîna pêkanîna politikaya Amerîkan û tevahî ûnsûrên dijminên li qadên ku di bin bandora DYA de ne, bînin tînekirin, dixwaze li ba rêveberiya Amerîkan pêwendiyên deyne. Mele Mûstafa, bi armanca pêkanîna çalakiya şoreşgerî ya li dijî rejîma Bexdayê ji bo şîretên pêwîst guhdar bike dixwaze li cem DYA têkiliyek veşartî deyne... (Airgram 222 from the Embassy in Lebanon to the Department of the State, 16 Temmuz 1971) (Eyyup Barzanî, **Têkoşîna Tevgera Azadiyê ya Kurd û Hêzên Herêmî û Navneteweyî**)

Piştî van gotinan, bi berdewamî zîhniyeta ku Dr. Şivan û tevgera wî tasfiye dike jî bi êşkera datîne holê; “Barzanî yê 68 salî tîne ziman ku eger beriya azadiya Iraqê wefat bike, bi fikar e ku Tevgera Azadiya Kurd radîkal bibe û koma Kurd a li Tirkîyeyê jî ji he-man radîkalîzmê bi bandor bibe.”



DR. ŞIVAN-ŞAÎT KIRMIZITOPRAK



Saît Elçî

Em ji bîr nekin ku Dr. Şivan amadekarî dikirin ku gav bi gav têkoşîna gerîla li Bakurê Kurdistanê bi pêş bixe. Dizane ku bê PDK-I'ê jî çî hevkarêkî yeman e û alîkariyan jî ji KT werdigire. Dema plan û amadekariyan dike ku ji bandora PDK-I'ê xwe rizgar bike û rêka xwe xet bike, li Tirkîyeyê bi erêkirin û plansaziya DYA ve di 12'ê Adara 1971'an de darbeya ku wê Nihat Erîm bibe desthilat pêk tê. Dema bi bîr were ku bê darbeya 12'ê Adara 1971'an çawa Çepgirên Şoreşger ên Tirkîyeyê dan ber xwe, wê demê gotina Barzanî ya, *“amade ye ku li herêma xwe jî ûnsûrên dijberî Amerîkayê paqij bike”* wê bêtir were fêmkirin.

Dewleta KT her dema ku Kurd bi pêş dikevin, hewl daye Kurdan teqez çavtirsî bike. Ji bo vê mînakek baş jî Bûyera Wêranşarê ye.

11'ê Kanûna 1974'an, vê carê jî li Wêranşarê 20 mirovên Kurd ên kolberiyê (qexaxçîtî) dikin ji aliyê jendermeyeran ve tîn girtin, li cihekî ku her kes dizane û dibîne înfaz kirin. Di wan salan de ango di salên 1974'an de li Başûrê Kurdistanê di pêşengiya Mele Mûstafa Barzanî de Kurdan statuyeke ku otonomiyê dibihure bi dest anîbûn. Ev ceribandina jî îro hê bêtir tê fêmkirin ku bi rê û rêbazên cuda dixwestin Kurdan rawestînin û çavtirsî bikin.


Beriya ku em vê beşê bi dawî bikin, em navên hin nivîskar, hovan û helbestvanên ku di vê sedsalê de li Bakurê Kurdistanê rolên girîng li xwe girtine û her wiha navên hin berxwedêrên jin ên navdar ku bi kesayetên xwe yê berxwedêr li Bakurê Kurdistanê deng vedane, li vir bidin:

Sey Qajî (1871-1936) bi Zazakî nivîsî û gotiye, Aşîk Veysel gotinên xwe bi Tirkî ragihandiye, Apê Mûsa, Vîranî, Şakiro, Mehemed Arîfê Cizrawî, Elîşêr, Nûrî Dêrsimî, Feqî Huseyîn Sagnîç, Torî, Yilmaz Guney...


Di vê sedsalê de Zarîfe, Besê, Rindêxan û mîna van ti carî kêr nebûne. Di cîhana hunerê de jî Ayşe Şan, Meryem Xan û hwd...



Ayşe Şan



Mehemed Arîfê Cizrawî



Yilmaz Guney

Li Rojhilatê Kurdistanê Rewşa Pêşketin û Têkoşînê

Piştî ku Cewher birayê Îsmail Simko di 1907'an de ji aliyê Îranê tê kuştin, serokeşîrê nû yê Şikakan dibe Îsmail Simko. Ev bûyer dibe sedem ku Simko hê bêhtir li dijî Rejîma Îranê tijî hêrs bibe. Her wiha, di van salan de polîtîkayên navendbûnê yê şahîtiyê di rojevê de ne. Tiştên ku li Tirkiyeyê ji aliyê Ataturk hatine kirin, li Îranê jî Riza Xan ê ku xwe wek şahê nû tayînî Îranê kiriye, hewl dide pêk bîne. Di 1925'an de jî ev rejîma şahîtiyê, wê dûvre wek Xanedaniya Pehlewî di dîrokê de derbas bibe. Ev wek çawa li pir derdoran nerehetiyê ava dike, ji aliyê Kurdan jî dibe sedema nerazîbûnên cidî. Riza Xan dixwaze netew dewletekê ava bike û pêwendiyên li ba Ataturk danîne baş tê zanîn. Gelek qedexeyên ku Ataturk li Bakurê Kurdistanê xistine dewrê, Riza Xan jî wê hewl bide li Îranê bixe meriyetê. Mînak; wê zimanên herêmî qedexe bike, cilên herêmî qedexe bike. Li şûna vê wê cilên bi tarzê Ewropayî ferz bike. Wê turbanê qedexe bike. Xulase, gav bi gav hewl dide mîlîtarîzm û netewe dewletê bi pêş bixe, gelên cur bi cur derveyî vê bihêle, bipelçiqîne û li gor hêza xwe jî hewl bide asîmîle bike. Ev jî li erdnîgariyeke mîna Îranê rengîn, ji bilî xwînrijîyê wê ti encamên din bi xwe neîne.

Piştî Şerê Cîhanê jî hê pergala ewqasî serwer nebibû. Herêmen wek Êrmiye, Mahabadê di pêşengtiya Simkoyê Şikak de hikumeta xwe ava kiribûn. Li mintiqaya Loristan, rêveberiya wê hêremê ruxmî ku lewaz jî bibû, di vê demê de dîsa îzafî xwe xurt kiribû. Mîrîtiya Loristan berfireh dibû. Hêrema Lek, her çendî ne weke hikumetekê jî be, di destên Lekan de bû. Mintiqaya Ciwanro, xelk û eşîrên wir xwe bi xwe bi rê ve dibirin. Dîsa, li hêremên wek Hewreman, Merîwan kesên wek Cafer San hikum dikirin. Dîsa malbata Hamêreş li hêremên xwe hikum dikirin.

Em dikarin bi rehetî bêjin ku netewe dewleta ku Riza Xan di bin navê Şahîtiyê ango Şah Pehlewîtiyê radigihîne hê nihatiyê avakirin, gelên cuda cuda xwe bi rengên xwe ve bi rê ve dibirin. Bêguman, ev rewş ne tenê ji bo Kurdan derbasdar bû, ev rewş ji bo giştî Îranê rastiyeke bû.

Em dizanin ku rejîma Kacaran pir lewaz bibû. Her wiha çepgir ango sosyalîst bi taybet jî li herêma Tebrîzê gelekî xurt bibûn. Şoreşa ku paşê tê tepisandin, îlan kiribûn. Her wiha di Şerê Cîhanê yê Yekemîn de hêzên navdewletî ango dewletên emperyalîst, Îran dagir kiribûn. Di encamên van rewşan de êdî Îran ne dewleteke wisa bû ku tenê ji navendekê ve bikarîbûya bihata meşandin.

Tam di rewşeke wiha de êl, eşîr, konfederasyonên ku bi salan fêrî xwerêveberiyê bibûn careke din rabibûn ser piyan û gav bi gav hikme xwe îlan dikirin.

Dema ku Riza Xan bi alîkariya hêzên navdewletî yên mîna Îngîlistanê îlana Şahîtiya xwe kir, gav bi gav avakirina netewe dewletekê jî da destpêkirin. Wekî ku li jor jî hatibû ziman, Riza Xan hewl dide tiştên ku Ataturkê Tirkan li Tirkîyeyê kiribû bi heman şeweyî li Îranê pêk bîne. Ev jî bi şiklekî xwezayî şer û pevçûnên giran anîn.

Jixwe em ê bi berfirehtir behsê bikin bê ka êrîşên çawa dibin ser Simko ango çawa êrîşî herêma Rojhilatê Kurdistanê dikin. Paşê jî berê xwe didin herêma Loristanê. Li van hêreman şer bi pêş dikeve. Piştî 1926-1927'an, êdî rêveberiya Lekan dibe qada êrîşê. 3-4 salan wê şer li van herêman devam bike.

Di vî şerî de gelek fêlbazî hene. Li milekî şer, li milê din jî dekûdolab, hewl dide ku gav bi gav li ser Kurdistanê hikmê xwe ava bike. Siyaseteke wî ya bi nav û deng ew e ku; Qûranê dişîne êlan û ji wan re dibêje ku “bila ew Qûran bibe navbeynkarê me û êdî em jî li hev bikin.” Dema ku ew êlana vê rewşê dipejirînin û ji bo hevdiîna rejîmê tîn, ji aliyê rejîme ve tîn girtin û yekser ji hêla rejîmê tîn zindankirin. Wek nimûne em dikarin bêjin ku bi vî awayî mîrên Lekan, mîrê Loristan tîn hepskirin. Mîrê wê demê yê Loristanê Riza Qolîxan e. Ew jî di şer de tîk diçin. Piştî vê tîkçûnê hinek ji wan radest dibin, hinek jî berê xwe didin Başûr. Dema ku Mîrê Lekan ji hêla Riza Xan tê girtin, wê demê hevjiîna wî Qedemxêr li dewsa wî Lekîyan bi rê ve dibe. Qedemxêr nêzî 3 salan li hember Riza Xan şer dike.

Em dizanin ku yek ji navên berxwedêr a ku di nav Loran de tê nasîn jî Cîhan Xan e. Ew jî bi berxwedana xwe ya li hemberî Riza Şah deng vedide.

Lê dema ku em xwe digihînin salên 1928'an, em dibînin ku Şahîtî wê xwe bi piştgiriyan ve û bi taybet jî bi ya Îngîlistanê xurt dike. Em jî bîr nekin ku di 5'ê Hezîrana 1926'an de di navbera Enqere û Îngîlistan de peyman çêbûye, jî ber vê jî êdî rê hatiye dayîn ku Kurd bi serbestî werin kuştin û tepisandin. Êdî Kurd tine tînin hesabandin. Lewma jî ji aliyekî wê Loristan bikeve bin serweriya Îranê jî aliyê din jî wê Hewreman bikeve bin hikmê dewleta Îranê.

Di encamê de ev herêma piştî ku tînin tepisandin, neçar dimînin ku şertên Riza Xan qebûl bikin. Her çendî wê Qedemxêr demek dirêj li ber xwe bide jî bi riya Qûran û navbeynkaran ve hikmê Riza Xan tê qebûlkirin. Û piştî vê jî Qedemxêr dibin zindana Teheranê û wê Qedemxêr jiyanê xwe li vir jî dest bide.

Riza Xan, weke ku me li jor jî bi lêv kiribû, pîranî bi hîle û fêlbazîyan ve hêrema Loristan, hêrema Lekê, hêrema Hewremanê dixê bin kontrola xwe. Li vir, Mahmutxanê Dîzî û her wiha Mahmutxanê Sanenî û têkoşîna Reşîdxanê Baneyî kontrol dike û yekdestiya xwe jî saz dike.

Berîya ku em derbasî mijarên din bibin, pêwîstî pê heye ku em hinekî bi firehî li ser têkoşîna Simko rawestin.

Di 1922'yan de Simko, tevî ku li Êrmiye û derdora wê jî bo îşyanê amadekariyên mezin dike, piştî Rûsya dikeve dewrê, Simko û Îran dest bi hevdiştinê dîkin. Ji ber lihevkiyên çêbûne, di 1922'yan de îşyan dest pê dike. Di vê hewldana yekemîn de Simko bi awayekî giran têk diçe û neçar dimîne ku bireve Başûrê Kurdistanê. Dema îşyan dest pê dike, Simko herî zêde li benda alîkariyên Tirkiyeyê ne. Lê Tirkiye sînorên xwe digire û destekê nade. Di 1922'yan de dema Simko derbasî Başûr dibe, di astek mezin de tîkiliyên wê yên li ba Tirkiyeyê xera bûne. Her wiha Îngilîz jî dema ku îşyan dest pê dike, ruxmî hemû sozên xwe jî Simko bi tenê dihêlin.

Di 1923'yan de dema Simko girêdana xwe ya Îranê radigihîne tî efûkirin û vedigere Îranê. Di 1926'an de dîsa hewl dide îşyanê geş bike, lê têk diçe û cara duyemîn jî xwe diavêje Iraqê. Salekê li Iraqê dimîne, dûvre di 1928'an de tevî hêzên xwe li sînorê sêgoşeya Iraq-Îran-Tirkiyeyê bi cih dibe û dîsa hevdiştinê li ba Îranê

dike. Îran, diyar dike ku ew efû kirine, dema vegere Îranê jî wê walîtîyê bidinê û daxwaz hevdîtînê ji Simko dike. Di sala 1930'î de dema Simko diçe vê hevdîtînê, wî dixin kemînê û 30'ê (28) Tîrmehê jî tê qetilkirin. Em ji bîr nekin ku di bin vê qetilkirinê de jî dîsa listokên Îngilîstanê hene. Di xebata R. Olson, **Pirsgirêka Kurd û Têkiliyên Tirk-Îran** de wiha tê gotin; *“Tevgerêk Neteweyî ya Kurd a ku li Îranê xurt bibe, wê yekser siyaseta Îngilîzan a li Iraqê bandor kiriba.”* Nivîskar Robbyn Michelle Usherwood jî dibêje, *“Kuştina wî, ji bo bêhnvedana siyaseta derve ya Îngilîzan bû.”*

Simko, wek kesayet bi wêrekiya xwe tê zanîn. Her wiha, li ba parçeyên din jî têkiliyan datîne, hewl dide pîrsgirêka heyî derbas bike û çareser bike. Lê bi giştî Simko, serokeşîrêkî tîpîk e. Gelek caran berjewendiyên wî li pêş her tiştî ye. Ev berjewendiyên ku ne malê giştî ne, zirarê dide hem wî hem jî gelên din ên li Kurdistanê. Xwezayî ye ku seknek wisa her tim –niyet çi dibe bila bibe– dikare bê bikaranîn. Di navbera Tirk, Îngilîz û Rûsan de gelek caran hatiye bikaranîn, xapandin û herî dawî jî bi kemînê hatiye qetilkirin. Ev giştî girêdayî van rastiyan e.

Piştî ku rewşa berxwedana giştî ya di şexsê Şikakan û Simko de wiha hat kurtasîkirin, em agahî û detayên derketine, li cem bûyeran deynin holê.

Serokeşîrê Şikakan Îsmail Axa (Simko), di sala 1921'an de li Rojhilatê Kurdistanê serhildanek mezin dabû destpêkirin. Beriya vê, ber bi dawîya Şerê Cîhanê yê Yekemîn, di 18'ê Adara 1918'an de li dijî Asûriyan şer kiribû, lîderên wan ê olî Mar Şam (Samcun) Benjamîn dukuje. Li gel wî, bi dehan şervanên Asûrî jî tîn qetilkirin. Her çiqasî hevdîtîna ji aliyê Îngilîzan hatibe eyarkirin jî, qetilkirina Mar Samcun û şervanên Asûrî ihtîmaleke gelekî mezin ji aliyê dewleta Tirk bi kişîşandinê hatiye kirin.

Têkildarî vê mijarê xwişka Mar Samcun, Surma Xane di pirtûka **“Hawara Nînova** de bi berfirehî vedibêje. Her wiha gelek bûyerên ku di wan salan de pêk tên û pêk hatine jî dinirxîne. Kişîşandina Kurdan a li dijî Suryaniyan jî wiha tîne ziman: *“Dijberiya me ya Tirkan, ne ji ber ku Misilman in an jî em nikaribin di bin rêveberîya wan de bijîn, ji ber ku rêveberên xerab in. Li ser gelê me ji kiryarên xwe yê li dijî Kurdan hê zêdetir zilm û zext pêk*

anîne. Ji ber ku dikarîbûn hê bêhtir berê xwe bidanan me, lê yên din jî bi mafdarî hema hema qasî me bû dijminên wan...



SIMKO ŞÎKAK

Pozîsyona Kurdan cuda ye di serê me de... Ew cîranên me yên kevn in û eger bi entrikayên Tirkan li dijî me nehatibûna kişkişandin, ji bilî fikarên me yên demkî ez dibêjim ku wê ti tiştêkî ku kari-be dostaniya me xera bikira, tinebûya. Eger Kurd jî mîna Ermeniya ji Tirkîyeyê qut bibûna û propagandaya Tirkîtiyê ya ku bû sedema mirîna çend efserên Îngilîz di navbera wan de bisekinîya, ha wê demê Kurd jî wê bi meylek aramî bûna, wek berê bi me re bijiyana.” Ev gotinên Surma Xanem ku yek ji zarokên gelekî êşkêş e, êşkere ye ku gotinên miroveke gihayî ye.

Lê çi heye ku; her çiqasî li gor xwe hincetên wî hebin jî, li erdnîgariya Kurdistanê ti carî îzaha mafdar û exlaqî ya van hewldanan nabe. Dûvre bi hêza eşîra xwe û hêzên tevli vê eşîrê bûne êrîş dike, Êrmiye û beşek Tebrîzê kontrol dike. Ji ber ku serhildan li sînorê îro yê Tirkîye-Îranê bûye, Tirk destpêkê ditirsîn ku serhildan li sînorên wan jî dest pê bikin. Dewleta Tirkîyeyê ji ber ku di wan salan de li beramberî Yewnanan xwedî pîrsgirêkên cidî ne, nabin xwedî helwest. Ya dikin hev-sengî ye. Ji ber ku dema Simko serî li ber Dewleta Îranê radike, li Bakurê Kurdistanê jî berxwedanên rû didin hene. Tê fêmkirin ku Dewleta Tirk dixwaze bandorên vê yên li Bakurê Kurdistanê asteng bike û bi zerarên herî kêr rizgar bibe. Piştî ku Îranê bi artêşek mezin berê xwe da hêzên Kurd, Simko neçar dimîne ku xwe bide milê sînorê Tirkîyeyê.

Simko di vê demê de li dijî Îranê berxwedana xwe didomîne û hedef dike ku Mahabadê desteser bike. Taha yê Bûrayê Simko, di 6'ê Cotmeha 1921'an de berê xwe dide Mahabadê. Bi desteka Simko jî piştî demek kurt bajêr kontrol dike. Piştî Mahabadê tê desteserkirin, Artêşa Îranê ya ku li Azerbaycanê bi cih bûye, êrîştî hêzên Simko dike. Dûvre li Ezdîkan û Toppahê hêzên hikûmetê têk diçin û hêzên berxwedanê van deveran jî bi dest tîne. Cihên ku hêzên Simko desteser kirine, ji bereyê rojavayê Gola Êrmiyê heta Bakurê Xoyê, li başûr heta Banê û ji herêma Zibar heta Bira-Kaprayê berfireh dibe.

Piştî ku hêzên berxwedanê li qadek berfireh berbelav dibe û serkeftinên mezin bi dest tîne, çî hikûmeta Îranê çî jî hikûmeta Tirk bi fikar dibin.

Berxwedana Simko watedar e. Gotinên mîna, *“Hûn dibînin ku neteweyên biçûk ên cîhanê ku ne çaryeka eşîrên Kurdan e jî, mîna hikûmeta Elman ji hikûmetên mezin xweseriya xwe bi dest tînin. Eger ev Neteweya mezin a Kurd ji Îranê mafên xwe wernegire, li şûna wisa bijî bimire çêtir e. Jixwe hikûmeta Îranê mafên me bide nede jî em ê Kurdistan xweser ava bikin”* xwedî wê hêzê ne ku dikare gelek hêzan nerehet bikin.

Lê ji bo em karibin berxwedana Simko hê baştir bibînin, em li nivîsyarên fermî yên Dewleta KT binêrin wê sûdmendtir be:

“Ji bo Qeymeqam Ozdemîr Beg

14.6.338

Îstîxbarat No.1745

1-Simko zilamekî jîr e. Bi saya jîrbûna xwe, xencera li ber piştî xwe ji bo demeke guncav hilaniye. Di serê vî zilamî de fikrê serxwebûnê heye. Armanca wî ew e ku heta li Îranê bandora wî zêde bibe û heta bigihêje hedefa xwe, ji me dûr nekeve.

2- Bandora Simko di nav eşîrên Kurd de zêde bibe, wê tersî Hikûmeta me ya Neteweyî be. Lê, niha têkiliyên me li gel Simko xera bibin, ne li gor berjewendiyên me ne jî. Eger hûn karibin hûn ê Simko û eşîrên Kurdan bikin dijminên hev. Ji ber ku ew jî bo hikûmetê bibe xizmetek mezin. Di aleyhê Simko de propagandayê bikin. Di nav gel de berbelav bikin ku ew bi pereyên Îngilîzan vê

tevgera xwe didomîne û ji bo berjewendiyên şexsê xwe û berjewendiyên Îngilîzan ev tevger daye destpêkirin.

Bi navê Fermandarê Eniyê Serokê Serkantiya Herbê Basrî''

Simko yê ku demekê li Tirkiyeyê ma, di 1924'an de ji bo biçê Îranê bibe ji Tirkiyeyê direve. Hikûmeta Îranê; piştî ku soza girêdanê jê digire, destûr didiyê ku li Şerîkê rûnê. Lê, pir dûvdirej nake, di 1925'an de Simko tevî hin eşîrên Kurdan Geliyê Şahpûrê (Salmasê) desteser dike. Ji aliyê hêzên leşkerî yên Îranê dîsa tê şikandin û dema xwe nêzî sînore Tirkiyeyê dike jî ji aliyê leşkerên Tirk tê dorpêçkirin û girtin. Heta 1928'an li Iraq û Tirkiyeyê dimîne. Bi hevdiştinên neyekser ve wê careke din têkilîyan li ba Îranê deyne. Di vê navberê de em bibêjin ku Simko, tevî leşkerên xwe li herêma ku îro wek Xakûrkê tê binavkirin, bi cih bûye. Di 1929'an de dîsa destûr tê dayîn ku li Îranê bi cih bibe û tê gotin ku wek walî tayînî Şîno (Eşnewî) hatiye kirin. Dema ber bi cihê xwe yê wezîfeyê diçe, di 30'ê (li hin deveran 28 e) Tîrmeha 1930'î de ji aliyê hêzên leşkerî yên Îranê ve bi hovîtî tê qetilkirin.

Simko Şîkak, li Rojhilatê Kurdistanê çend salan –bi navber be jî- li ber xwe daye. Serokeşîrekî wisa ye ku karakterên serwerên li Kurdistanê herî baş pêşkêş dike. Her çiqasî bi wêrektiya xwe ve derketibe pêş jî; piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn li qada navneteweyî Kurd tine hatin hesabandin û hatin paşguhkirin, lewma ev jî bûye yek ji wan sedeman ku berxwedana Simko bê encam bimîne. Lê, sedema esas jî rastiyeke e ku pîrsgirêkek têkildarî mejî û rêxistinbûyîna hêzên têkoşer in. Sekna ku nikare qalibên eşîrtiyê derbas bike û her cure têkilîyên li ba dewletên serwer têkilî dihesibîne û piştî xwe pê germ dike, di encam de dibe sedem ku têkçûyînek mezin bibînin. Û tabî wek em ê piştî salan di gotinên Qazî Muhammed de bibînin, hezar fenûfûtên Dewleta Îranê ye ku nehesibandine.

Piştî ku têkilîyên Tirkiye û Îranê, bi gotineke hê rasttir têkilîyên Atatürk û Rîza Xan zêde dibin, di 1937'an de Pakta Sadabadê tê sazîkirin. Li gor hin çavkaniyan ev Pakt di 9'ê Tîrmehê de ye, li gor hinan jî di 8'ê Tîrmehê de ye û li paytexta Îranê Tehranê; mabeyna Îran-Tirkiye-Afganîstanê hatiye îmzekirin. Beriya vê pakta ku di 1937'an de hatiye îmzekirin, di nav welatên îmzekar de her çiqasî bi qismî jî be nakokî û pîrsgirêkên berjewendiyan hebin jî, bingeha

navneteweyî di yekgirtina van welatan de xwedî rola diyarker e. Ji ber Tirkiyeyê Rejîma Kemalîst wek modeleke pêşkêşî her du welatên din kiriye, di esas de vê jî rê li ber avakirina tifaqa antî-Kurd vekirîye.

Şahîtiya Îranê ya ku ji Şerê Cîhanê yê Yekemîn bi hejandinên mezin derketiye, weke ku me li jor jî behs kir, yekgirtina xwe ya siyasî encex di 1925'an de karîbûye saz bike. Ji bilî hin tevgerên bêbandor ên ku ji pêşketina otorîteya navendî nerehet dibûn, li Rojhilatê Kurdistanê heta 1946'an ti tevgerê cidî derneketiye.

Tenê dema ku em tîsalên 1940'î li hinek herêmên Kurdistanê di şert û mercên Yekemîn Şerê Cîhanê de careke din li hemer Şahîtiya Îran serîrakirina hin Kurdan heye. Mînak di navbera salên 1941 û 1944'an de li herêma Banê di rêveberiya Hama Reşîdxan de careke din liv û tevgera Kurdan dest pê dike. Li vê herêmê, ji bo xwe hikumetêkê ava dîkin, heta tê gotin ku radyoyeke herêmî jî vedîkin. Careke din peywendiyên navdewletî dibin sedem ku Îngîlistan piştgiriya bide rejîma Îranê û lewre jî ew berxwedan têk biçe.

Heman tişt li Cîwanro û herêma Hewremanê jî rû dide. Kurd careke din hewl didin herêmên xwe bi xwe kontrol bikin. Lê mixabin, bi alîkariya Îngîlîzan ve carekê din ev hewldan jî tîsalên pûçkirin.

Eger em pêşketina Komara Demokratîk a Kurdistanê ango Mahabadê binirxînin; ji ber Rejîma Şahîtiyê di Şerê Cîhanê yê Du-yemîn de bi awayekî veşartî polîtîkayên alîgiriya Elmanyayê şopandin, hêzên Sovyet û Îngîlîzan ketin Îranê. Partiya Demokrat a Kurdistanê, bi rêveberiya Qazî Muhammed ve ji meha dehan heya meha donzdehan kar û xebatan dike û di 17'ê Kanûna 1945'an de jî ala Komara xwe bilind dike. Di dawiya Duyemîn Şerê Parvekirina Cîhanê de jî Kurdan jî vê rewşê sîd wergirtin, di 22'yê Çileyê 1946'an de bi piştgiriya Artêşa Sor, Komara Demokratîk a Kurdistanê damezrandin.


Navê Komarê ne mîna li gelek deveran tîsal ser ziman Komara Mahabadê ye; navê wê **Komara Demokratîk a Kurdistanê ye.**



Lîderê Komara Demokratîk a Kurdistanê Qazî Muhammed ji malbateke navdar e. Malbat xwedî kevneşopiyek berxwedanê ye. Dema rewş wisa jî bûye, ji aliyê gel ve jî zû hatiye qebûlkirin. Bapirê wî Şêx El Meşayîh, di 1930'î de li dijî Îngilîzan eşîrên Kurdan li hev ci-vandiye û lîdertiya îsyanê kiriye. Apê wî Qazî Fettah, ji bo karibe bajarê Mahabadê li dijî Tirk û Rûsan biparêze, di 1916'an de berxwedan bi rêxistin kiriye. Bi kurtasî ji malbateke welatparêz e.

Di dema Şerê Cîhanê yê Duyemîn de û piştî wê, mîna gelên din, hatibû hesibandin ku ji bo Kurdan jî firsendek e. Di dema şer de -25'ê Tebaxa 1941'an- wextê Îngilîstan û Sovyet beşek mezin a Rojhilatê Kurdistanê dagir dikin, ev firsend jî xwe berbiçav dike. Her du dewlet jî hewl didin bandora xwe ya li ser Îranê zêde bikin. Her çawa be jî Rojhilata Navîn qadek girîng a jeo-stratejîk e. Ji bilî kanên mezin ên petrolê, ji ber deriyekî Asyayê ye, balê dikşîne. Wek rastiyeke şênber jî; her du hêz jî ji bo berjewendiyên xwe bi Kurdan û etnîsîteyên din re eleqedar dibin.

Kurd, her ku diçe bi çavekî hê germtir li Yekîtiya Sovyetan dinêrin. Diyar e ku ev têkildarî bûyerên dîrokê ne jî. Di sed- sed û pêncî salên dawî de Îngilîzan ji bo Kurdan ne tenê karên xêrê nekirine, li pêşiya tayînkirina qedera wan jî bûye asteng. Dibe ku ji ber vê jî be, wê Kurd xwe nêzî "*dostê gelên mêtîngeh*" Sovyetan bike. Dema Îran lewaz dibe, hevdiya li ba Sovyetan dest pê dikin. Di 4'ê Îlona 1942'yan de civînek berfireh a ku tevahî rêxistinên Kurd ên li Îranê tevlî dibin, bi navê Komala Jiyanavey Kurdistan, bi kurtenav J. K. tê lidarxistin. Di vê navberê de Komala tê damezrandin. Komala ya ku berê îllegal bû, di demê kurt de legal dibe. Wek tê zanîn dema Komala derbasî qada legal dibe, navê xwe wek "Partiya Demokratî Kurdistan" radigihîne. Di nav vê têkoşînê de gelek helbestvanên navdar ên gelê Kurd jî cih digirin. Mamosta Hêmin, Mamosta Hejar, Abdûrahman Şerefkendî, Mamosta Qanê çendek ji van e ne.



Em bi xulase jî be ragihînin ku di avakirina Komara Demokratîk a Kurdistanê de para tevahî rexistinên demê yên Kurdan heye. Bi şiklekî hê diyartir em dikarin wisa destnîşan

bikin: Di navbera Hizba Komaleya Jiyanevey Kurdistan a Nûneriya Rojhilat, Hizba Hîwa ya Nûneriya Başûr û Komaleya Xoybûn a wek Nûneriya Bakur û Rojavayê Kurdistanê de jî Peymana Sê Sînor tê mohrkirin.

Rejîma Sovyetê ji bo karibe deriyê Rojhilata Navîn ji xwe re veke, hewl dide mîna “Partiya Demokrat a Azerbaycanê” ku li Azerbaycanê hatiye damezrandin, li vir jî ava bike. Ewîl, di sala 1943’yan de li Îranê hewl dide partiyek wisa saz bike. Di heman rotayê de Mele Mûstafa Barzanî di 1945’an ji PDK îlhâmê digire, û 16 tebaxa 1946 de PDK-I ava dike. Lîderê PDK ya li Îranê wê Qazî Muhammed be. Her çiqasî Qazî Muhammed ji malbatek rêzdar hatibe jî ji ber nasnameyeke wî ya wek serokeşîr nîne, destpêkê hin derdor îtfîraz dikan. Lê, Qazî Muhammed bi zanebûn û danehevên xwe ve vê rewşê derbas dike. Têkiliyên germ li ba Sovyetan datîne. Piştgiriye digire. Têkildarî van pêşketinan jî, di sala 1946’an de damezrandina Komara Demokratîk a Kurdistanê tê îlankirin. “Di pêşengiya Qazî Muhammed de rêxirawî jinan çêdibe û perwerdeya jinan li Kurdistanê bi pêş dikeve.”

Lê beriya demekê, Sovyetê lîderên Komala yên ku pêşengên PDK’ê ne, qebûl nekirine. Lê em ê li vir jî bibînin ku berjewendî her tim çareseriyên herî baş in. Di damezrandina PDK’ê de jî Sovyetan ji bo karibin navên ku nêzî wan in li pozîsyonên serwer bi cih bikin, çi ji destên wan hatibe kirine. Ev jî Kirnî Axa- serokeşîrê Mameş, Omerhan Şerîf- serokeşîrê Şîkak û Emîr Esad Dêhbokrî ne.

Li gor peymanên piştî şer, Artêşa Sor vedikişê. Ev vekişîn esas parvekirinek e. Rojhilatê Ewrûpayê ji bo Sovyetan hatiye vekirin, Rojhilata Navîn jî ji Îngilîz û Fransiyan re hatiye berdan. Hêzên Şahîtiyê bi destekek zêde ya Îngilîstanê ve beriya sala 1947’an, di

17'ê Kanûna 1946'an de dawiyê li vê Komara yekemîn a Kurd tînin.

Em bînin bîra xwe, di 17'ê Kanûna 1945'an de li Rojhilatê Kurdistanê ala Komara Demokratîk a Kurdistanê hatibû li ba rakin. Lê, ji bo ku ev roj ji bo Kurdan nebe rojeke keyfxweşî û şahiyê, tam di vê rojê de hêzên leşkerî yên Îranê dikevin bajarê Mahabadê, dikevin cihê ku Şoreşa Kurdan ango Komara Demokratîk a Kurdistanê lê hatibû îlankirin. Navê Generalê Îranê yê ku erîşê dibe ser Mahabadê, Hûmeyon e. Em dizanin ku ev Hûmeyonê hanê 2-3 rojan zûtir digihêje hedefa xwe ango digêhêje ber Mahabadê. Lê tevî vê jî nakeve nav bajêr. Tevî ku êdî bajarê Mahabadê bêparastin jî maye, lê dîsa nakeviyê. Dema ku hinek fermanدارên wî jê re dibêjin “Çima em nakevin bajêr, êdî ti astengî nemane?” Hûmeyon bersiva xwe wiha dide: “Wan di 17'ê meha 12'an de alaya me anîne xwar û ala xwe hildane. Ji bo ku ev roj ji bo wan nebe roja bîranîneke xweş, em ê jî di 17'ê meha 12'an de bikevin Mahabadê, di vê rojê de alaya wan bînin xwar û ala xwe bilind bikin.”

Erê, dagirker-mêtinger bi hizrên wiha ziravî li ser Kurdistanê diponijin. Ango ewqasî dijminê Kurdan in.

Pêwîstî pê heye ku herî kêr Kurd jî karibin bi qasî mêtingeran be jî mejiyên xwe, dilên xwe li ser Kurdistanê biêşînin da ku karibin xwe ji vê mêtingeriya bêhempa xelas bikin!

Tê gotin ku ji ber Mele Mûstafa Barzanî hêzên xwe yên leşkerî zû kişandine ev rewş derketiye holê. Li Mahabadê fermanدارê yekemîn ê leşkerî e eşîran Mele Mûstafa Barzanî ye. Lê ya hê rasttir ev e ku Komara ji bingehekî civakî yê pêşverû û têgihîştî bêpar maye, lewma jî li şûna rêxistinbûyînek xurt bi neçarî xwe spartiyê Sovyetan û xwe li ber hêzên Şahîtiyê ya bi desteka Îngilîstanê ranegirtiye. Li gorî vê tifaqê, Îran mafê bikaranîna petrola xwe dide Rûsyayê ango Rûsya ji petrola Îranê îstîfade dike.

Dîsa tê gotin ku yek jî mijara ku hiştiye Komar lewaz bikeve pir girîngî dayîna hêzên eşîran e. Tê zanîn ji bo gelek ji wan eşîrreîsan payeya generaltiyê hatiye dayîn. Li gor hejmara şerkerên eşîran paye hatiye belavkirin.

Mijara generaltiyê hejmara leşkerên eşîran ên ku di têkoşîna Komarê de cihê xwe girtine îfade dike. “Li gori vê: yek Mustafa Barzanî ye. Yek Hame Reşîdxanê Banê ye, yek Omerxanê Şikak e, yek jî Seyfî Qazî ye. Yek jî bûye mareşal, ew jî serokê hozê Herkî Zero Behadîrî ye”.

Eşîrên Mameş, Mengûr û Dêhbokrî li beramberî komara bi mesafe sekinîne û muxalefet kirine. Ji sedemên vê ya herî girîng jî ew e ku bêguman ji ber Qazî Muhammed ê liderê komarê û li ser PDK bû, hinekî din rewşenbîr û modern bû. Di serî de Qazî Muhammed, Sadrî Qazî û Seyfî Qazî, gelek liderên Kurd diavêjin hepsê. Paşê, birayê Qazî Muhammed jî tê girtin, diavêjin hepsê û hersê jî bi

îdamê tên cezakirin. Li cihê ku komar tê îlankirin, li qada Çarçirayê tên îdamkirin. Dîrok, 31’ê Adara 1947 e.



Beriya ku Qazî Muhammed bê bidarvekirin, ji bo tevahî Kurdan bang û şîretek li pey xwe hişt. Em dixwazin bi giştî li vir bidin. Qazî Muhammed wisa bang li gelê Kurd dike:

“GELÊ KURD! XWIŞK Û BIRAYÊN MIN ÊN XOŞEWÎST!

Birayên ku malên we talan bûyn û di bin zext û zorê de ne! Ez ê di dawîya demên jiyana xwe de çend şîret û amojgariyan pêşkêşî we bikim.

Ji bo xatirê Xwedê êdî dijminahiya hev nekin! Bibin yek, li hember dijminê zordar li piyan bin û ti carî xwe nefiroşin wan! Dijmin hinga ji were diloan e, ku ji we sûd wergire. Eger na, ti carî dilê wan bi we nasojê. Di her fersendê de ji bo berjewendiyên xwe yên qirêj, xwe digihînin we û bi navgîniya we digihin armancên xwe.

Dijminên gelê Kurd gelek zalim û bêrehm in. Nîşana pîroziya her neteweyê, yekîtî û hevkarî ye. Ev nîşana pêşiyên we ne, ji bilî vê rewşê ev gel tine dibe û di bin destê biyaniyan de dîl dimîne.

Ey gelê Kurd! Hîç tiştêkê we ji yê gelên cîhanê kêmtir nîne. Belkî dilêrî û xîreta we ji yê gelek gelên ku ghiştine azadiya xwe zêdetir e. Ew jî ku niha ji penceyên dijmin rizgar bûne, rojekê wek we bûn. Lê ew bûn yek û ghiştin azadiya xwe. Ji vê û pê de êdî ji destê wan tiştêkê negirin û nebin dijminên yek û hûn jî wek gelên cîhanê bigihin azadiya xwe. Dema hûn li hember hev dijminî û çavnebarî nekin, hûn ê bikaribin azadiya xwe bixin destê xwe.

Gelî biraderan! Êdî bi fend û fêlên dijmin nexapin. Dijminê Kurd ji kîjan nijad û neteweyê be dîsa dijmin e. Bêrehm û bê wijdan e. Ti carî dilê wî bi Kurdan naşewite. Wan bi hev dide qirkirin û kuştin. Ti dijmin ji dijminê Kurdan bêrehmtir û ji Xwedê netirstir nîne. Hemû bêdadî û nemirovahiyê li hember Kurdan rewa dibîne. Di kûrahiya dirokê di li hember Kurdan tim bi kîn û dijminî tevgeriyaye û tevdigere. Ti carî li hember Kurdan durist nebûye, çend soz û peyman daye hemû ji bo lêp û xapandinê bûne.

Ez wek birakî we yê biçûk ji were dibêjim: ji bo xatirê Xwedê pişta hev bigrin. Dema dijmin ji were qencî bike ew baş bizanin ku ew dê jehrê bi we bide vexwarin. Ger hezar carî jî, bi Quranê sond jî bixwe dîsa wê ew we bixapîne.

Ez di dawiya jiyana xwe de şîretê li we dikim. Bila di bîra we de be ku ji bo bexteweriya we çi ji destê min hat min dirêx (texsîr) nekir. Disa dibêim bila hûn bi lêpên dijmin nexapin. Ji ber ku bi Xwedê, Pêxember û bi roja heşrê ne bawer in.

Di çavên wan de çend Kurd hene, eger çi Misilman jî bin, tewanbar û sucdar in. Kuştin û tinekirina wan rewa ye. Me, ji bo xwe xenîmet dihesibînin. Ger çi sozên me ew nebû ku ez biçim we di nav pencên dijmin de bihêlim, lê min gelek caran ji we re got: dijminê fêlbaz gelek mezinên me bi dek û lêp dîl girtine û kuştine. Ji ber ku di qada şer de bi we nikarin, fend û fêlan bi kar tînin.

Ez wan baş nas dikim. Şah û rayedarên wî, bi şandina navber û mirovên xwe peyman dan ku em nahêlin dilopek xwîna ti kesî birêje û rencîde be. Lê hûn niha vê encamê dibînin.

Eger serokê eşîran xiyamet nekiribûna û xwe nefirotiba hikûmeta Şah, hûn û komara me bi vê çarenûsê re hevrû nedihatîn. Niha gotina min ji we re ew e ku bila ciwanên we bixwînin. Ji ber ku ji

bilî paşdemayîna perwedehiyê ti tiştê me Kurdan ji yên din kêmtir nîne. Di vê cîhanê de çekê zanistê ji hemû çekan bihatir e.

Baş bizanin ku dema hûn yekreng û hînkirî bin, hûn ê ciwan û li ser dijmîn serkeftî bin. Divê hûn ji kuştina min, bira û kurmamê min netirsîn. Dibe ku di vê rêyê de hêj gelek kes şehîd bibin ta bigihijîn mirazên xwe. Bawer im ku piştî min jî wê gelek bêne kuştin.

Ez bawer im ku gelek kesên ji min xwendatir jî wê bikevin dava wan. Lê kuştina min bila ji we re bibe darsa îbretê. Ji Xwedê alîkarî bixwazin, dibe ku hûn ji min bipirsin û bibêjin: tu ji bo çi bi ser neketî. Di bersivê de dibêjim: Ez bi Xwedê sond dixwim ku ez serkeftî me. Çi ji wê qenctir û hêjatir e ku mirov di rêya gelê xwe de ser, mal û canê xwe gorî bike? Min her tim dixwest ku ez dema bimirim li hember Xwedê, pêxember û gelê xwe rûspî bim. Ev mirin ji bo min serkeftin û pîrozî ye.

Kurdistan mala hemû Kurdan e. Çawa ku her endamê malê ji bo parastina wê berpirsyar e û yek ji yekê çavnebarî nake, Kurdistan jî wisa ye. Eger we dît kesekî berpirsariyekê hilda ser xwe bihêlin, bila encam bide. Kevir navêjin karê wî, pêçewanê wî destek bikin. Bila ji bo vî karî serperiştî bike. Bizanin ku birayê we yê Kurd ji her kesî dilsojtir e. Eger min berpirsariya mezin hilneda ba ser xwe, ez niha li ber piyê sêdarê nedibûm. Ji bo vê yekê divê ez tengbîn nebim. Ew kesên ku bi gotina me nekirin û li hemberî me rabûn, niha li mala xwe û di nav nivînên xwe yên germ de bi hêsayî radizin. Lê em ji bo xizmeta gel niha li ber piyê sêdarê ne. Eger min jî ev berpirsariya giran nedaba ser xwe, ez jî niha wek wan di xewa şîrin de bûm. Ev şîreta ku ez niha ji we re bibêjim jî, ji bo ayîndeyê we xwe berpirsyar dibînim ji ber hindê ye. Ji ber ku eger hevalekî din ev berpirsariya daba ser milên xwe, niha di cihê min de ew li ber piyê sêdarê bû. Ji ber hindê ez bextewar û kêfxweş im.

Niha, ez ê wek Kurdekî dilsoj û xizmetbexşê gel çend amojgariyan ji bo we bibêjim. Li hemû gotinên min baş guhdar bin. Umîdwar im ku di pêşerojê de ev gotinên min pêşiya we rewşen bike û hûn serbikevin.

Bawerî bi Xwedê bi pêxember û bi pirtûkên wî bînin. Hem ji bo peywirên olî têbikoşin û paydar bin.

Yekitî û hevkarîya xwe biparêzin. Karên naşayiste nekin. Li hember hev tengbîn nebin. Nemaze li hember berpirsiyarî û xizmeta gel.

Radeya zanist û têgihîna xwe zêdetir bikin da ku hûn ji aliyê dijminan ve kêmtir bîn xapandin.

Qîma xwe li dijmin neynin. Ji ber ku dîrok, guwah (şahid) e ku ew bi gelek delîl û burhanan dijminê we, ola we, gelê we û welatê we ye. Ew li hember we li pey bahaneyan e û bi kêmtirîn tometan dikarin cezayên mezintirîn li ser we biryar bide.

Ji bo çend roj jiyana vê cîhana bê dom nebin patexwirên dijmin. Ji ber ku dijmin, dijmin e, cihê baweriyê lê nîne.

Li hember hevdu di hêla siyaseta, can û mal de xiyametê nekin. Ji ber ku xiyanetkar li ba Xwedê û gel sik û bê nîrx e. Bizanin ku xiyaneta xayînî vedigere ser xwediyê xwe.

Eger kesekê bê xiyanet alîkarîya we kir ji wî re bibin alîkar. Nebe hûn bibin asteng û sîxurên biyaniyan.

Hûn ti carê ji serhildan û têkoşînê paş nemînin! Ta wek hemû gelên din hûn jî ji kolekî û dîlîtiyê rizgar bibin. Malê dinê bê nîrx e eger hûn bikaribin welatekî serbixwe û azad bixin destê xwe û mal û axa wî bibe yê we, hingê wê her tiştê we hebe.

Ez ji bilî mafê Xwedê ji ti kesî re qerdar nînim. Lê eger kesekê doz kir ku mafekê wî kêmtir an zêde di stûyê min de maye, min têra vê yekê li pey xwe serwet hiştiye, bila ji mîratxwarên min wergire.

Ta hûn nebin yek hûn serkeftî û pîroz nabin. Li hember hevdu zordarî û zorê rewa nebînin! Xwedê gelek zû zordarî û zordaran tine dike. Ev mizgîniya ku Xwedê gotî: “Xwedê tolê ji zalim û zordarê werdigire” bê çawan û çîre ye.

Ez umîdwar im ku hûn ê van xalan bidin ber çav. Xwedê we li ser dijminan pîroz û serkeftî bike.

*Her wekî Şêx Sedî gotî:
‘Mebesta me amojgarî bû û me got
Me hûn spartin Xwedê û em çûn.’
Xizmet bexşî Gel û Welêt”*

Gotinên Qazî Muhammed fêrker in.

Diyar e ku her çiqasî dîroka Komara Demokratîk a Kurdistan kurt be jî mîrateyek girîng li pey xwe ji bo Kurdan hiştiye. Mînak wê bi dehan helbestvan, nivîskar, dîroknas ji çar parçeyên Kurdistanê ber bi Mahabadê biherikin. Di demek gelek kurt de gelek xebatên mîna rojnameya Kurdistan, kovara Nîştîman, dibistanên bêpere, avakirina komaleyên jinê wê bihatana kirin.

Her wiha belgeyeke ku naveroka demokratîk a Komara Demokratîk a Kurdistan nîşan dide jî, tifaqa bingehîn a li gel Azerbaycana Îranê ye ku îlana Xweseriyê di 12'ê Kanûna 1945'an de kir.

Chris Kutschera di xebata xwe ya “**(Tevgera Neteweyî ya Kurd)**” de têkildarî lihevkirina Hikûmeta Neteweyî ya Azerbaycana Sosyalîst û Komara Demokratîk a Kurdistan, agahiyên qîmetdar dide.

“Dema ku Dewleta Mahabadê hatibû damezrandin, Azeriyên Îranê jî dewleta xwe ya Sosyalîst ava kiribûn. Xweserîya Komara Azerbaycana Sosyalîst a Îranê ya li jor dîroka wê ya damezrandinê hat dayîn, bi hewldana Sovyetan jî pevketin danîn milekî û Azerî û Kurdan peymanek îmze kirin. Ev peyman ku di 3'yê Gulana 1946'an de hat îmzekirin:

1. *Ji bo xakên her du aliyan jî, her aliyek wê nûneran bişîne,*
2. *Li xaka Azerbaycanê cihê ku Kurd lê zêde ne, wê rêveberîya Kurd nûnerên xwe, li xaka Kurd a ku Azerî lê zêde ne jî wê Azerî nûnerên xwe bişînin,*
3. *Her du hikûmet jî ji bo bi pirsgirêkên aboriyê mijûl bibe wê Komîteya Aboriya Yekgirtî ava bikin.*
4. *Dema pêwîst kir wê beramberî alîkariyên leşkerî bêne kirin.*
5. *Her cure hevdiîtinên li ba hikûmeta Îranê, piştî destûra her du hikûmetan hat girtin wê bê meşandin.*
6. *Hikûmeta Azerbaycanê ji bo Kurdên ku li ser xaka wê dijîn, bi armanca rêxistinkirina hewldanên qada perwerdeyê tevdiîrên pêwîst li xwe digire. Hikûmeta Kurd jî ji aliyê xwe ji bo*

Azerbaycaniyên li ser xaka Kurdistana Îranê sozên heman hewldanan daye.

7. *Her kî hewl bide têkiliyên dostanî û hevkarîyê yên mabeyna her du gelan de xera bike an jî berê xwe bide yekîtiya wan a neteweyî wê ji aliyê her du gelan jî bê cezakin. .”(Çavkanî: Tevgera Neteweyî ya **Kurd**, Chris Kutschera, r. 208, Weşanên Avesta.)*

Li Rojhilatê Kurdistanê di demên cur bi cur de her tim bi şiklekî di çarçoveyek teng de be jî li dijî Rejîma Îranê nerehetî çêbûne. Yek ji van jî berxwedanek li qada Mako ye ku ji aliyê Saner Mamedî tê birêvebirin. Lê demdirêj nabe û tê tepisandin. Her wiha, li dijî eşîra Cawanrûdî ya ku li Cîwanroyê her xweser jiyaye, Dewleta Îranê dikeve nav liv û tevgerê. Her çiqasî Cîwanroyîyan têkoşîna xwe bi salan jî meşandibin, di 4'ê Sibata 1956'an de berxwedan tê tepeserkirin û dawî li xweserîya wan tê anîn.

Pêkanînen zextker ên ku bi hilweşîna Komarê dest pê kirin, Kurd hinekî din jî ji şahîtiyê dûr xistine. Bûrjûvaziya neteweyî ya Fars, hêzê ji vê digire û di 1951'an de desthilatdariyê bi dest tîne. Rejîma Şahîtiyê ya ku bi desteka CIA ve di 1953'yan de hikûmeta Mûsaddîk hilweşand, mîna hêzên din ên muxalefetê, Kurdan jî dixe bin zextê. Ev sekantiya ji ber vê, heta 1978'an Şoreşa Îslamê ya Îranê diçe. Rojhilatê Kurdistanê ya ku komên cur bi cur ên dijberî şahîtiyê lê ne, zêde derfetê nade ku têkiliyên kapîtalîst pir bi pêş ve bikevin. Civaka Kurd ji ber vê ye ku nikare kontrola zîlamên oldar ên dûvikê kompradorên nîv feodal, bûrjûvaziya bazirganî û dewletê ne, derbas bike. Lê, gel bi awayekî pratîkî xwedî xweseriyekê dimîne.

Hebûna PDK-Î —ev nav di kongreya 1954'an hatibû danîn- her ku diçe lewaztir dibe. Barzanî, ji ber ku li gel rejîma Îranê xwedî pêwendiyên germ in, gelek endamên PDK-Î an dide girtin an jî bi rêkekê tasfiye dike. Barzanî, bi demê re her ku têkiliyên li ba otorîteyên Pehlewî bi pêş ve dibe, endamên ciwan ên PDK-Î hêdî hêdî ji Barzanî qut dibin. Li ser vê jî, Duyemîn Civata PDK-Î ya di lîdertiya Ebdullah Îshaq bi nasnav Ehmed Tevfîq de sala 1964'an kom bû, hin guhertinên nerm pêk tîne. Di 1964'an de di nav refên PDK-Î de fraksiyonek wisa derdikeve holê ku bernameya nû ya

polîtîk rexne dikin. Wek agahiyekê din jî em bêjin ku navê PDK di salên 1954 di kongreyekê de bibû PDK-Î.

Kurdên ku xwe wek “Komîteya Şoreşger” bi rêxistin kirine, ji neçarî di 1967’an de dest bi berxwedana çekdarî dikin. Di vê demê de Barzanî yê ku li dijî PDK-Î dibe xwedî helwesteke bi temamî dijber, piştgiriye dide Şah. Gelek pêşengên Kurd ên ku berxwedana çekdarî dane destpêkirin tên girtin û îdamkirin. Ji lîderên PDK-Î Suleyman Muînî, Mela Aware û Îsmayil Şahzade bi dest Barzaniyan bi xwe li ba gelek hevrêyên wan tên tasfiyekirin. Pir balkêş e ku hem Suleyman Muînî bi xwe qetil dikin hem jî cenazeyê wî radestî SAVAK’a Îranê dikin.


Piştê jî dorê tînin ser Ehmed Tewfîq. *“Îranê ji Mele Mûstafa xwest ku wî teslîm wan bike. Tewfîq Ehmed, destpêkê ji herêma Berwarî sirgûnî herêma Behdînanê hat kirin û dûvre jî xebatên PDK-Î hatin qedexekirin.*

Tewfîq Ehmed dibêje, “Wê min jî radestî îstîxbarata Îranê biki-rana. Ez ji te rîca dikim ku tu yê vê ji Mele Mûstafa re bibêjî; ‘Eger Îran 10 tankan bide Tevergera Kurd, ez razî me ku min teslîmî SAVAK’ê bike! Ez bawer im ku qasî 10 tankan qîmetê min heye; ez, hêjayî vê me. Rewş ev bibe ez ji bo teslîmbûyîna amade me, ew bi xwe jî çi dike di kiryarên xwe de serbest e!” (E. B:)

Ev nêzîkbûnên Mele Mûstafa, Ehmed Tewfîq neçar dihêle ku xwe bispêre Saddam. Rejîma faşîst a Saddam jî di sala 1972’yan de Ehmed Tewfîq qetil dike.



Mela Aware



SILÊMAN MÛÎNÎ

Di 1969'an de Komaleyî Zahmetkêşan tê damezrandin. Damezrînerê wê Dr. Fûad Mûstafa Sûltanî ye. Tevgerêk sosyalîst e. Dûvre wê Fûad Mûstafa li Saqiz bê jehrîkirin û qetilkirin.

peymana ku di 11'ê Adara 1970'î de mabeyna Hikûmeta Iraqê û Rêveberiya Kurd a Iraqê hat îmzekirin, di navbera Îran û Kurdistan de heta astekê rewşek erênî derdixê holê. Li ser vê jî PDK-Î Konferansa xwe ya Sêyemîn di bin navê **“Ji Îranê re Demokrasi, ji Kurdistanê re Xweserî”** li dar dixê. Abdûrrahman Qasimlo dibê serokê Partiyê. Sal 1971-72 ye. di vê demê de sîxurên desthilatdariya BAAS'ê, di sala 1972'yan de li Bexdayê Ehmed Tewfîq qetil dikin. Qasimlo bi alîkariya Bexdayê ve hebûna xwe didomîne. Abdûrrahman Qasimlo û Îzzettîn Huseyîn xwe vedikişînin qadên çiyayî. Di vê demê de gelek Kurd tene qetilkirin. Dûvre Qasimlo yê ku wê li Parîsê bijî, di daxuyaniya xwe de diyar dike ku *“heta mafê otonomiyê bi dest binin”* wê têkoşîna xwe geş bikin.


Di 1978'an de Kurd jî mîna tevahî gelên Îranê radibin ser piyan, li Rojhilatê Kurdistanê otorîteya Şahîtiyê hilweşandin. Her çiqasî hewl dane lihevîkirinekê bi rejîma mele ya ku di demê kurt de şoreş bi dest anî ava bikin jî, nehatin qebûlkirin. Tiştê hat spartî jî ew bû ku li beramberî otorîteya navendî bêdeng bin. Li dijî vê berxwedana ku serkêşiya wê Doktor Qasimlo dikir, heta 1982'yan dewam kir. Lê, di sala 1984'an de Dewleta Îranê dawiyê li serweriya PDK-Î tîne. Dema ev tevger tê tepisandin ku bi pêncî hezar pêşmergeyên xwe ve (50.000, li gor hin çavkaniyan tê gotin ku ji 70 hezarî zêdetir e) hêviyê dide gel, li ji ber şiklê xwe yê têkoşînê ve nikarîbû pêşmergeparêziyê derbas bike; welatparêziyeke ku ser wê hatiye betonkirin, careke din hêviyên wê hatine bînpêkirin û dilsoj li pey xwe dihêlê.

Di vê pêvajoyê de PDK-Î di lîdertiya Qasimlo de kongreya xwe li dar dixê. Di vê kongreyê de parçebûyînek mezin- bi hinceta ku Qasimlo ji sosyalîzmê dûr ketiye- pêk tê. Bi dehan endamên navendî ji PDK-Î vediqetin, PDK-Î-RL ango PDK-Î-Rêbertiya Şoreşgerî ava dikin.

Wek me hewl da li jor jî em behsê bikin, di gelek berxwedanan de destê îxanetê heye. Helwestên apolîtîk ên ku ji ber pêşnebîniya

Kurdîtiyê rû didin, wê zehf bîn dîtin. Gelek helwest û tevgerên ku bêtî tifaqek rast ava bike û xwe bispêre hêza xwe, tîkiliyê li ba hêzên din wek hunerweriyê dihesibînin, bi Kurdan her daye windakirin.

Ya herî berbiçav jî, tevî ku Şoreşa Îslamê ya Îranê tetîk kirine jî hatine tasfiyekirin. Ev rastiyeke wisa ye ku divê bi lêkolînên cidî bi awayekî taybet bê lêkolandin. Piştî ku hêzên şoreşê zêf bûn, Dr. Qasimlo yê Sekreterê Giştî yê PDK-Î, lîderê leşkerî, dîplomat, mirovê mezin ê ku bi ezmûna xwe pêşbînî, di sala 1989'an de li Vîyanayê jî aliyê hêzên îstîxbarata Îranê tê qetilkirin. Bi heman şiklî, wê di sala 1992'yan de jî Şerefkendî li Berlînê bi destê hêzên îstîxbarata Îranê şehîd bibe.



DR. QASIMLO



ŞEREFKENDÎ

Li Başûrê Kurdistanê Rewşa Pêşketin û Têkoşînê

Piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn, Îngilîzên ku Iraq dagir kirin, nîkarîbûn bi rehetî Başûrê Kurdistanê kontrol bikin.

Berîya em bala xwe bidin rewşa giştî, em behsa paşaroja malbata Barzanî bikin, wê sûdmend be. Her çawa bibe jî wek hêzeke bibandor a ku demek dirêj jî rojeva Kurdistanê nayê xwar, cih girtine.

“PDK-I, partiyeke malbata xanedan e. Ango ne partiyeke ku îdeolojiya çînekê yan jî beşekê ye, lê şênber bûye ku nûnerê berjewendiyên Barzanî û malbata wî ye. Bi rêketina jî vê rastiye ve, pêwîst e ku em di nav pêvajoya avakirina vê partiyê de li pêşketin

û îsyânên vê malbatê binêrin. Berevajî, hewldanan fêmkirina PDK-I'ê wê veguhere tenê mijûlbûyîna bi encamên kar.

Tevahiya şexsiyetên ku di Miliyetparêziya Kurd de cih girtine, ji malbatên kevneşop û diyar dihatin. Hatibû diyarkirin ku ji van malbatan ên ku herî berbiçav in jî malbatên Baban, Bedirxan û Şêx Ubeydullah in. Dema avahiya civaka Kurd li ber çav bê girtin, ne mimkun e ku ti malbatên di sedsala 19'emîn de binemaleke wê ya dirêj nîbe, pêşengiya Milliyetgiriya Kurd bikin. Ev ne têkildarî taybetmendiyên şexsan e, encamek mecbûrî ya teşegirtina civakê ye. Eger malbata Barzanî li derveyî vê bê girtin, heta wê demê mînakek wisa di dîroka Kurd de nehatiye dîtin. Wek tê fêmkirin, li naverastê malbateke bi hîle heye. Hê nehatiye ronîkirin ku bê ev hîle çawa pêk hatiye. Têkildarî kokên malbata Barzanî, nêrînên ji hev gelekî cuda, cur bi cur hene.

Tê zanîn ku di destpêka sedsala 19'emîn de bi rêka şêxîtiyê li herêmê ji nişka ve derdikevin. Beriya wê nayê zanîn. Û di demek kurt de li herêma ku gelek eşîrên xurt serwer in, di carekê de dibin hêz. Pîr eşkere ye ku piştgiriya ji cihekî digirin. Eger ev destek bê zanîn, wê demê perdeya sirê ya malbata Barzanî jî hinekî tê vekirin.

Yekemîn Şêxê Barzan, ji malbata Sadate Nehrî destûrê digire. Ji ber fêrbûyînen xwe ji malbata Nehrî ne, têkiliyên wan her dewam kiriye. Lê, dem bi dem ev pêwendî xera jî bûne. Yekemîn Şêxê Barzan Tacedîn, piştî ji Abdurrahman Nehrî perwerdeya olî dibîne, li gundê Barzanê bi cih dibe. Binemala vê kesî, bê ji kû ve hatiye nayê zanîn. Piştî tê herêmê jî, gundiyên ku ji zexta eşîrên xurt reviyane li dor xwe kom dike û bû guzîdeya van. Îhtîmalek gelekî mezin jî van gundiyan dendika eşîr-malbata Barzanî pêk anîne. Binemala Şêx jî ji destpêkê ve xwedî pozîsyonek jorî eşîran bû. Ev îmtiyaz di roja me de jî tê parastin. Ev di heman demê de dibe konfederasyona Barzaniyan. Di nav vê konfederasyonê de; Mizorî, Şervanî, Dolamêrî û Ertûşî jî cih digirin. (Di hin çavkaniyan de jî tê gotin ku Barzanî berê ji gundê Were yê Zebariyan bûn, ji wir jî derbasî gundê Barzan bûne. Pêveka nivîskar.)

Piştî Tacedîn, vê carê bira an jî kurê wî Abdulsalam dibe Şêx. Abdulsalam bêyî erêkirina şêx bipirse, xwe wek şêx îlan kiribû. Li gor fêrkirinên terîqetê, ev rewşek bi hîle ye. Şêx Abdulsalamê Ye-

kemîn ji ber vê helwesta xwe ya derveyî rêgezan, dijminatîya Şêx Ubeydullah ava kiribû. Ji ber zexta Şêx Ubeydullah jî neçar dimîne bireve. Kurê wî Şêx Muhammed ji bo şêxîtiyê îcazeyê digire. Li ba Şêx Ubeydullah pêwendiyên baş danîn.

Sê kurên Şêx Muhammed di pêşketina malbata Barzanî de xwedî rolek girîng in, her wiha di Milliyetgiriya Kurd de jî şexsiyetên bi bandor bûn. Ev jî Şêx Abdulselamê Duyemîn, Şêx Ehmed û Mele Mûstafa Barzanî ne. Ev şexsiyet bi îşyanên xwe tîn bibîranîn. Malbata Barzanî derbasî merheleyek nû dibe. Ev merheleya nû, destpêka pêvajoyek îşyanan e ku heta roja me didome. Bi gotinek din jî, Barzaniyan hewl dan li herême serweriya xwe bidin qebûlkin.

Dema li herême serweriya Barzaniyan xurt dibe, Dewleta Osmanî ya ku di tepeserkirina Bêgîtiyên Kurdan de zehf bi pêş ve çûbû, nerehet dike. Tevî ku tîkiliyên Tirk û Barzaniyan ji mêj ve nebaş bûn jî, gelek sedemên cur bi cur bûne çavkaniya îşyanê. Xisûsa herî girîng jî ew e ku Barzaniyî her ku diçûn li herême serwer dibûn û hêzên Tirk jî ji vê nerehet dibûn. Di îşyanê de Barzanî tîk diçûn. Piştî tîkçûnê, Şêx Abdulselamê Duyemîn neçar dimîne ku herême biterikîne. Di sala 1914'an de Şêxê ku ji bo serdana serokeşîrê Şikakan Simko Axa bike li sînorê Îranê tevdigeriya- di dema vegeêrê de-, ji aliyê komek endamên eşîra Şikak tê girtin û radeştî rayedarên Osmaniyan tê kirin. (Ti eleqeya Simko Axa bi vê bûyerê nîne. Ji bo karibin xelata ji girtina wî re tê dayîn bigirin, komek endamên eşîrê pêk tînin.) Paşê, bi tevdîrên ewlehiya zêde ji Wanê dibin Mûsilê. Di sala 1914'an de li Mûsilê tê îdamkirin. (Li Kurdistanê Eşîretî û Milliyetgerî)

Di 1922'yan de hêzên Kurd di lîdertiya Mahmût Berzencî de li dijî Îngilîzan li ber xwe didin. Tevgera Berzencî ya ku ji valatiya otorîteyê ya li herême sûdê werdigire, li beramberî êrişên hevpar ên hêzên Îngilîz û hevkarên Erebb, tîk diçe. Hêzên Berzencî yên ku navenda wan Silêmanî bû, xwe didin çiyayan. Îşyanê li van qadan dem bi dem bi şer heta sala 1924'an dewam kiriye.

Îngilîz ji bo karibin hebûna xwe ya li Iraqê hê zêdetir garantî bikin, wê biryar bidana ku Dewletek serbixwe ya Iraqê bê damezrandin. Lê ev serxwebûn, wê serxwebûnek wisa bûya ku rejîma mada derbas nekiriba. Di vê peymanê Îngilîz û Erebban de Kurdan

cih negirtin. Di vê navberê de, Şêx Ehmed li dijî derdorê êrîşên xwe domandin, eşîrên Zebarî û Bradostî jî tevî van êrîşên nû kirin. Barzaniyan berê xwe dan Lolanê, cihê liderê eşîra Bradostê Şêx Reşîd ku li ba Îngilîzan têkiliyên wî yên germ hebûn. Li ser vê jî Îngilîz êrîşî Şêx Ehmed dikin. Mîna nakokiyên Barzanî û Bradostan, li gel Berwariyan jî bi heman şiklî nakokiyên ava dikin. Bêguman e ku ev nakokî û şer mijarek têkildarî serweriyê ye. Jixwe Barzanî jî ji roja ewil ve hewl dane li her derê berbelav bibin.


Di salên 1930'î de ji ber ku dewleta Iraqê li Kurdistanê qereqol ava dikirin, du birayên Barzanî- Mele Mûstafa û Şêx Ehmed- dest bi berxwedanê dikin. Lê berxwedan têk diçe. Li ser vê jî Mûstafa û Sidik Barzanî sirgûnî Nasiriye ya li başûrê Iraqê tên kirin.

Her berxwedan û îsyaneke ku bi têkçûnê diqede, li ba xwe gelek texrîbatan jî tîne. Piştî ku Kurdistan bûye qada şer, çawa ku piştî her wêrankirinê pêşketina avahiya civakê berbend dibe; di vê pêvajoyê de jî her 'Harekatên Selê' yên ku piştî têkçûnê bi pêş dikeve, Kurdistan tarûmar kirine. Her têkçûn li ba xwe; xwîn, rondik, sirgûn û qetlîam hê girantir kirine. Ev jî bûye sedem ku berteng bibe, biqutife, bitirse û bêbawer bibe. Dikare bê pirsîn ku gelo ev berxwedan û îsyaneke –tevî hemû têkçûnan jî- ma qey ti tiştek bi dest neanîne? Eger li tiştekî pozîtîf bi îsrar bê gerîn, em dikarin bêjin ku kevneşopiyek berxwedanê ji Kurdan re hiştine. Lê, milê wê yê li pêş jî avahiyek tirsonek, tepisandî û bintûte (kesê ku hebûn û nebûna wî nayê hîskirin) ye. Em ti carî ji bîr nekin ku ev mîrate û kevneşopî jî bi bedelên giranbiha pêk hatiye...

Barzanî, heta sala 1937'an jî sirgûnkirî ne. Di sala 1937'an de li Barzanê dîsa berxwedanek bi pêş dikeve. Armanca îsyaneke jî ew e ku Barzanî ji sirgûnê vegerin. Li ser vê Dewleta Iraqê wê yên ku li Nasiriye sirgûnkirî ne, bibe qada Silêmanî.

Silêmanî qadek wisa ye ku berxwedêrî û ronakbîriya Kurd li pêş e. Di sala 1937'an de Komala Darker tê damezrandin. Damezrînerê wî Dildar e. Dildar, di heman demê de nivîskarê Sirûda Ey Raqîp e jî. Navên girîng ên Kurd Refîk Hîlmî û Hamza Abdûllah jî wê cihê xwe di vê rêxistinê de bigirin. Di sala 1939'an de rêxistina Hîwa tê damezrandin. Serokê wê Refîk Hîlmî ye. Rêxistina Hîwa heta sala 1945'an hem li Rojhilatê Kurdistanê hem jî li

Başûrê Kurdistanê gelekî bi bandor e. Wisa ye ku; dema Komara Demokratîk a Kurdistanê tê damezrandin, wê kadroyên ku hem di asta perwerdekar hem di asta hunermend hem jî di asta efseran de bişîne. Tevgera Hîwa ya ku tevahî taybetmendiye tevgera modern nîşan dide, li Kurdistanê nîşaneyê merheleyek girîng e.



Barzaniyî, bi taybet jî Mûstafa Barzanî wê têkiliyê li ba Tevgera Hîwa deyne û jê bandor bibe. Hêza herî bingeşîn a bandorker ku dûvre Barzanî dişîne Mahabadê jî, Tevgera Hîwa bi xwe ye. Tevgera Hîwa, li gor gelek hêzên di dema xwe de xwedî aliyên pêşketî ne. Tevgera Hîwa ya ku nêzîkatiyek zanistî ya lêdikole û dipirse esas werdigire û xwedî xetek diyar a îdeolojîk e, di destpêkê de wek tevgera xwendevanan e, paşê jî wek me got wê jî bo tevgerên li Rojhilat û Başûr bibe çavkaniya îlhamê.

Di vê salê de hin rêxistinên mina Hizbî Rizgarî, Hizbî Şoreş jî tîn damezrandin. Ev rêxistin giraniyê didin ser xebatên ronakbîrî. Lê, nikarin xwe jî bertengiyê rizgar bikin.

Di 1943'yan de Mûstafa Barzanî li Herêma Barzan a Başûrê Kurdistanê îsyaneke dide destpêkirin. Îsyana ku artêşa Iraqê jî Hewlêr û Herêmen Behdînanê dide vekişandin, di 1945'an de jî aliyê Hêzên Hewayî yê Îngilîzan tê tepeserkirin. Barzanî û pêşmergeyên wî xwe vedikişînin Îranê. Mîna li jor jî hat gotin, Barzanî di damezrandina Komara Demokratîk a Kurdistanê de cih digire. Dema Komar hildiweşe jî li ba pêşmergeyên xwe diçe Yekîtiya Sovyetan.

Yê ku serkêşiya damezrandina PDK-Iraqê dike Mele Mûstafa Barzanî ye. Ji ber li Sovyetê ye, li şûna xwe Hamza Abdûllah wezîfedar dike. Hamza Abdûllah tevgera ku li jor hat ziman û gelek tevgerên mina vê tîne ba hev.

Navekî din ê di wê demê de bi bandor e jî Îbrahîm Ehmed e. M. Barzanî vê dizane, dixwaze ku Îbrahîm Ehmed jî di partiya wî de cih bigire. Teqez e ku jî PDK-Îranê bandor bûye. Lê, faktora din a girîngtir jî ew e ku Barzanî li Sovyetê ye. Ji bo karibe destekê jî

Sovyetan bibîne jî pêwîst e hinekî gotinên çepgir bi kar bîne. Eşke-
re ye ku wê nikaribe bi milliyetgiriya berê ti destekê bibîne. Îspata
rastiyên li jor jî ew e ku PDK-I ya ku zûzûka hat damezrandin bêyî
plan û bername bû. Halbûkî her partî xwedî bernameyek cidî ya
siyasî ye. Ti amadekariyên cidî yê PDK-I nînbûn. Em vê jî ji
nêzikatiya li beramberî Pirsgirêka Kurdistanê dibînin. Dibe ku ji
ber vê ye; hin şexsiyetên girîng di damezrandina partiyê de cih
negirtine, tevî Partiya Komunîst a Iraqê bûne. Tevî hin êş û nere-
hetîyan jî, PDK-I bi awayekî fermî di 16'ê Tebaxa 1946'an de bi
pêşengiya Hamza Abdûllah tê damezrandin. Wê ne şaş be ku eger
em bêjin Hamza Abdûllah damezrînerê herî girîng ê PDK-I'ê ye.
Îbrahîm Ehmed jî di partiyê de xwedî cihekî girîng e. Her wiha
divê Nûrî Ehmed Taha jî ji ber rola xwe ya girîng a di damezran-
dina vê partiyê de were bibîranîn. Lê, ji ber ku PDK-I tenê ji bo
Iraqê fikirîne, di esas de destpêkek ji bo parçekirinê jî kirine. Û ev
parçebûyîn bê di demên pêş de çiqasî bi tehlûke dibe, wê ji aliyê
her kesî ve bê dîtin. Em ji bîr nekin ku PDK-I, yekemîn partî ye ku
tenê ji bo parçeyekî Kurdistanê hatiye damezrandin. Şemitînek din
a mezin jî ew e ku gelek tevgerên mîna Hîwa, Rizgarî, Şoreş, Dar-
ker girîngî didan pêşketina zihnî û nêrînê, lê PDK-I ya tevî ku bi
desteka van partiyan navbihurî hatiye damezrandin, - wê demê
Mele Mûstafa Barzanî yê li Mahabadê wek serokê xwe hildibijêre-
dibe partiyê ku tenê serokeşîran ango feodalan esas werdigire.
Şêx Latîf, kurê Şêx Mahmût Berzencî, Kak Ziyad Axa ji van kesan
tenê çendek in. Her çiqasî sedema esasî ya vê nêzikatiyê ew bû ku
tevahî eşîran bi rêka serokeşîran bikşîne nav têkoşînê be jî, wê
piştîrê bê dîtin ku çanda feodal hatiye bikokkirin. *“Konferansa
Seyemîn, di Çileyê 1953'yan de li bajarê Kerkûkê hat lidarxistin.
PDK'ê, fêrkirin û bernameyek çepgir qebûl kir. Ji raya giştî re
ragihand ku ew bi xwe “partiyek Marksîst Lenînist e.”* (E. B) Her
çiqasî navê wê partiya demokrat be jî wê xeta wê naverokek eşîr-
parêzî û Başûrparêziyê nebihure. Bi gotina Abdullah Ocalan xwedî
avahiyek **“milliyetgiriya berê”** ye. Mele Mûstafa Barzanî sero-
keşîrek e. Ev rewş bi xwezayî nîşan dide ku bê wê PDK-I çawa bê
birêvebirin. Jixwe di nav PDK-I'ê de jî navên bi bandor ên mîna
Hamza Abdûllah, Elî Abdûllah, Doktor C. Abdulkerîm wê nûner-
tiya rêveberiya jorîn bikin. Di bin wan re jî navên mîna Îzzet Azîz,
Mûstafa Xoşnav, Nûrî Ehmed Taha tên. Di rêveçûna PDK-I'ê de

her çiqasî Barzanî amade nebe jî, wê navên nêzî wî Barzanî û xeta wî serwer bikin. PDK-I'ê ya bê Barzanî, heta 1958'an dewam dike. Kovarek bi navê Rizgarî tê derxistin. Lê piştî damezrandinê her ku diçe Îbrahîm Ehmed bi bandor dibe. Di Duyemîn Kongreya (Konferansa adarê) PDK-I'ê de ku sala 1951'an de tê lidarxistin, Îbrahîm Ehmed, Hamza Abdûllah ji desteya jorîn tîne xwar û derbasî şûna wî dibe. Ji damezrînerên PDK-I'ê navê ku divê herî zêde bê bibîranîn jî dibe ku Îbrahîm Ehmed be. Bi xwe, ji sala 1951'an heta 1964'an partiyê bi rê ve dibe. Wezîfeya sekreteriya giştî ya partiyê dike. Di sala 1955'an de qayîşkêşiya Hamza Abdûllah û Îbrahîm Ehmed tê nuqteya qutbûyînê. Heta: *"Di 1956'an de du meyl bûn yek û navê 'Partiya Demokrat a Yekbûyî ya Kurdistanê' (PDYK) li xwe kir. Sekreterê wê yê Giştî Hamza Abdullah bû. Rojnameya bi navê Xebatî Kurdistan weşand."* (E. B) Wisa dixuye ku wê demê Hamza Abdûllah hê bêhtir bi meyla çepgirî ye, Îbrahîm Ehmed jî hê zêdetir di xeta milliyetgiriye de ye. Her çiqasî PDK-I dibe du parçe jî, dûvre yên ku ji Mele Mûstafa Barzanî veqetiyane, di bin partiyê de ji nû ve li hev dicivin. Wek me got, Hamza Abdûllahê ku xwe demekê wek PDK-I-Taybet bi nav dikir, di sala 1958'an de piştî ku Barzanî tê Iraqê ji vê diqere û pirsgirêk jî di astekê de "tên derbaskirin".



ÎBRAHÎM EHMED

Beriya ku em pê de biçin, em berê xwe bidin Paktên ku di van salan de li dijî Kurdan hatine bipêşxistin:

Piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn, Îngilîstanê desthilatdariya siyasî ji hevkarên xwe Kompradorên Erebb re hişt û vekîşiya welatê xwe. Vê rewşê nakokiyên mabeyna serwerên Kurd ên ku dixwestin bi pêş kevin û serwerên Erebb ku dixwestin serweriya xwe ava bikin, zêde kir. Li dijî kompradorên hevkar ên Erebb, ne tenê Kurd, her wiha bûrjûvaziya

biçûk û navîn a Ereban jî têdikoşiya. Van, bi hêza ku ji tifaqa Kurdan girtî, di 1958'an de darbeyek pêk anîn.


DYA, ya ku di 1950'î de ji ewlehiya Rojhilata Navîn bi fikar bû, ango ditirsiya ku bandora Sovyetê û komunîzm derbasî welatên Rojhilata Navîn bibe, hikûmetên vê herêmê teşwîq kir ku di nav xwe de rêxistî bin. Ewil, mabeyna Tîrkiye û Iraqê de li Bexdayê peymanek hevkarîyê da îmzekirin (26'ê Sibata 1955'an). Li gor peymanê, wê her du welat ji bo parastina hevpar hevkarî bikin; peyman ji bo dewletên ku endamên Yekîtiya Ereban e û Dewletên Rojhilata Navîn ên ku dixwestin hevkarîyê bikin, vekirî bû. Bi saya vê jî destpêkê Îngilîstan tevli peymanê bû (1955). Di nav heman salê de Pakîstan û Îran tevli bûn. Bi vê ve jî hejmara welatên endam gihîşt 5'an û di asta wezîran de konseyek daîmî hat damezrandin. **Pakta Bexdayê**, ji Sovyetan zêdetir, li ba Ereban bû sedema nerazîbûnên hê geştir. Bi taybet jî Misrê ev pakt mîna derbeya herî giran a li Yekîtiya Ereban ketiye, bi nav kir. Ji ber vê jî ji bilî Iraqê ti dewletên din ên Erebiyê tevli vê peymanê nebûn.

Şoreşa ku di 1958'an de li Iraqê rû da, li cem Qraltiya Iraqê, rêveberên ku Pakta Bexdayê ava kiribûn jî tine kir. Hikûmeta nû ya Iraqê di 1959'an de ji Pakta Bexdayê vekîşiya. Ji bo li gor şert û mercan be jî navenda Paktê ji Bexdayê veguhestin Enqereyê û navê wê jî wek **CENTO**, (Central Treaty Organization- Rêxistina Peymana Navendî) hat guhertin. Li gel vê, her çiqasî pêşniyara tevlibûna Paktê li DYA hatibe kirin jî DYA vê guncav nedît, lê li gel 3 dewletên Rojhilata Navîn ên ku endamên Paktê bûn, peymanên heman bi şiklekî dualî îmze kir. Ev rêxistina ku navê wê ewil Pakta Bexdayê bû, lê dûvre wek CENTO guhert, xwedî wezîfeyek din a girîng bû. Ew jî wê xebatên yekîtiya Kurdan asteng bikira û nehêle ku ti tevgerên Kurd ên dikarin bi pêş bikevin, li ser piyan bimînin. Li ser vî esasî jî êşkere ye ku Paktek antî-Kurd e ku bi desteka hêzên navdewletî hatiye avakirin. Em ji bîr nekin ku hê jî peyman, paktên heman ji bo dijbertiya Kurd di rojevê de tên girtin.

Abdulkerîm Qasim ê ku 14'ê Tîrmeha 1958'an desthilatî bi dest xist, monarşî hilweşand û îlana komarê kir. Şoreşek pêk anî. Hikûmeta Qasim di 28'ê Tîrmehê de destûrek bingehîn a demkî weşand, hebûna Kurdan a di nav sînorên Dewleta Iraqê de û mafên

Kurdan ên neteweyî qebûl kir. PDK-I yasayî bû û di heman salê de jî Mele Mûstafa Barzanî ji Yekîtiya Sovyetan vegeriya.

Em kevanekekê vekin û bi kurtasî be jî behsa serpêhatiya Abdulkerîm Qasim bikin. Qasim, ji aliyê dayikê ve ji Kurdên Fehîlî tê, ji roja destpêka desthilatdariyê nêzî Kurdan sekiniye. Gelek nêzîkatiyên şaş ên li dijî Kurdan terikandine. Milliyetgirîya Ereb a ku Cemal Abdulnasir li Misrê bi pêş xist, li gelek deverên ku Kurd û Ereb li cem hev dijîn bûye sedema zerarên mezin. Weke ku em ê dûvre jî bibînin, mînak polîtîkayên antî-Kurd ên ku wê Sûriye li dijî Kurdan bi pêş bixe, têkildarî vê milliyetgirîya Ereb e.



Her çiqaşî Qasim di 1958'an de desthilatdarî bi darbeyek leşkerî jî bi dest anîbe, mohra xwe li gelek pêkanînen nû dide. Wek ji karên wî yên yekem jî, Mûstafa Barzanî yê bi awayekî ji neçarî li Sovyetan e, dawetî Iraqê dike. Tenê bi vexwendinê jî sînordar nemaye, bi xwe li balafirgehê pêşwazî kiriye û di tevahî biryarên xwe de çawa hayê Barzanî jê çêkiriye, her wiha heta amadekirina destûrek bingehîn a hevpar jî çûye. Di xala sêyemîn a vê destûra bingehîn de jî destnîşan kiriye ku Kurd û Ereb şîrikên Iraqê ne. Lê mixabin, *“Di xala duyemîn de tê gotin ku ‘Wek dewletekê Iraq, parçeyekî neteweya Ereb a mezin e’”*. Ev jî piştî dibe sedema pîrsgirêkên cuda.

Biryarên qedexekirinê yên li ser gelek partiyên çepgir-sosyalîst radike. Reforma Zevîyan çêdike. Di nav van de PKI (Partiya Komunîst a Iraqê) jî ku di 1934'an de hatibû damezrandin, serbest kiriye. Axaî rakiriye. Ji bo tevahî weşanan serbestî aniye. Li şûna

bi awayekî hişk giraniyê bide ser hiqûq, hê bêhtir rêgezên exlaqê derxistine pêş. Piştî tarzekî siyaseta nû dide pêş, CENTO jî bi Qasim re têk diçe.

Qasim hedef kiriye ku Iraqê gav bi gav ji bin kontrola Îngilistanê rizgar bike û nehêle wek “Komara Mûzê” bimîne. Wek gava yekemîn jî Petrolên Iraqê neteweyî dike.

Dirûşmeya ku mimkun e Qasim herî baş îfade dike, ev dirûşme ye; *“Rehmet li ser qanûnê ye. Şefafbûn li ser qanûnê ye. Xwedê, rûdanan efû dike.”* Li cem edalet û şefafiyê, efûkirina her rûdanan bi rastî jî ji fezîletên mirovatiya mezin e. Lê belê, her tişt tenê ji gotinên xweş û niyetên baş pêk nayê. Ji ber vê jî gelek rewşenbîrên Erebb, zayina Abdulkerîm Qasim wek zayinek di çaxekî şaş de nixandine.

Tevlî Komara Yekbûyî ya Ereban (KYE) ku Cemal Abdulnasir li cem Sûriyeyê bi pêş xist, nebûye. Wek sedema vê jî dibêje ku Iraq ne xwedî avahiyek homojen e, ji bilî Ereban gelên cur bi cur dijîn. Fîkr û pratîkên Qasim ên ku li gor desthilatdariyên herêmê û sîstema navdewletî zehf li pêş in, wê gelek derdorên nerehet bike. Ewîlî, BAAS’iyên ku xwe li Iraqê gav bi gav bi rêxistin dikin, wê li dijî vê sekna Qasim rabin. Yê milliyetgirî jî nerehetiyên xwe bi lêv dikin. Reforma Zevîyan jî wê serokeşîrên Kurdan nerehet bike. Qasim ê ku berê xwe dide derdorên ku reforma zevîyan qebûl nakin, wê bi gelek kesan li dijî xwe bibîne. Di vê pêvajoyê de Abdulvahap Şahap di sala 1959’an de li Mûsilê li dijî Qasim darbeyekê bi pêş dixê, lê serkeftî nabe. Divê em destnîşan bikin ku li pey vê hewldana darbeyê destê Îngilîzan û kişkişandina wê heye.

Xulase, ji ber gelek pêkanînan, li dijî Qasim eniyek berfireh tê avakirin. Barzanî jî di sala 1960’î de tevî vê eniyê dibe. Di 1961’an de li ba hemû aloziyan dema dezgeha weşana PDK-I’ê ya bi navê Xebat tê girtin jî, êdî mabeyna PDK-I’ê û Rejîma Iraqê de şerê dijwar dest pê dike. Qasim ew xeta ku em dikarin bêjin nerm û cih bi cih demokratîk bû, terikandin û ber bi îstîqametêk otorîter ve diçe. Ji bo vê jî mînak herî baş ev e; di sala 1962’yan de Qasim bi hinceta ku alîkarî dane PDK-I’ê, berê cehşên Kurdan û Zebariyan dide ser gelê Suryanî. PDK-I’e, di vê navberê de di 11’ê Îlona 1961’an de harekata ku piştê wek “Şoreşa Êlûnê” bi nav dikin, didin destpêkirin. Piştî demek kurt, di 9’ê Sibata 1963’yan

de li Iraqê BAAS'ê û milliyetgirî bi darbeyek leşkerî ve Qasim ji desthilatdariyê tînin xwarê. Li şûna wî General Abdulselîm Arîf rûdinê. Abdulkerîm Qasim tê îdamkirin. Balkêş e ku Abdulselîm Arîf ê ku xwestibû di 1958'an de li dijî Abdulkerîm Qasim darbeyê pêk bîne, paşê ji aliyê Abdulkerîm Qasim piştî sala 1961'an hatibû berdan.

Her wiha em diyar bikin ku tetîkkêş Saddam Huseyîn ê ku berê li dijî Abdulkerîm Qasim ketibû nav hewldanan sûîqestê, lê xwe bi bela zorê bi birîndarî xelas kiribû, ji Misrê vedigere. Saddam ê ku wê demê di BAAS'ê de pozîsyoneke wî ya girîng nînbû, bi desteka xizmê wî General Ehmed Hesên Bekir ve gav bi gav di nav BAAS'ê de pozîsyona xwe xurt dike û heta destpêka salên 1970'yan bilind dibe.

Rejîma BAAS'ê ya ku dibe desthilat, Iraqê mîna *“dewleteke ku ji du neteweyan pêk tê”* pênase dike. Soz didin ku careke din têkiliyên xwe yên li ba Kurdan di ber çavan re derbas bikin. Barzanî yê ku li derveyî agahiya Partiyê, li cem derdorên milliyetgirî ên ku desthilatdarî bi dest anîne pêwendiyên datîne. Îbrahîm Ehmed ku sekreterê yekemîn ê partiyê ye û Celal Talabanî ku endamê polît-buroyê ye, vê peymanê qebûl nakin û bi Mele Mûstafa re nakokiyên wan çêdibin.

“BAAS'îyan ku di 9'ê Adara 1963'yan de bi awayekî eşkere diyar kiribûn ku “mafên neteweyî yên gelê Kurd li ser esasê ademî merkezî qebûl dikin.” Lê em jî dizanin ku: *“Hikûmeta BAAS'ê ji bo nîşan bide ku General Qasim di mijara Kurd de ‘dikare ji çareseriyê bêhtir tiştan bike’ di nav 5 mehan de 3000 gundên Kurdan bi erdê re kir yek, bi sedan şênîyên gundan koçber kir û sirgûnî herêmen başûr ên ku piraniya Ereban lê ne kir.*

9-10'ê Îlona 1963'yan, Hikûmeta Bexdayê dest bi êrîşê kir û ji gelê Silêmaniyê qetil kirin. 176 mêr, jin û zarok bi guleyên ji patîkê ve hatin kuştin. Beriya kuştinê jî bi zorê gorên komî bi mirovan dane kolandin û dûvre jî di wan gorên komî de yên hatî qetilkirin hatine veşartin. Sala din ji şênîyên heman bajarî 100 kesên din ji aliyê milîsên BAAS'ê hatin kuştin. Silêmanî yek ji qadên girîng ên berxwedana Kurd e.” Tê gotin ku seknên mînak yên bi lehengî berbiçav dibin. Wek nimûne, *“Li beramberî berxwedan û*

tehamula Salih el Yûsûfî ya li hemberî êşkenceyê, celadê wî bi xwe jî nikarîbû rondikên xwe rawestîne.” (E. B.)

Em destnîşan bikin ku, *“Operasyona leşkerî ya desthilatdariya BAAS’ê ku di 10’ê Hezîrana 1963’yan de dest pê kir, di navbera Tehran, Enqere û Şamê de bi şiklekî koordîne start dabû: Êrîşa ku di sala 1963’yan de bi ser Kurdistanê de hatibû, êrîşa herî hov û dijwar a di dîroka wê de bû.”*

Dîsa em ragihînin ku dewleta Sûriyeyê, li ba rejîma BAAS’ê ya Iraqê bi 6000 eskerî tevî şerê li dijî Kurdan bûye. Her çendî ev demek dirêj hatibû înkarkirin jî, *“Ji aliyê rojnameyên demê hatibû nivîsandin ku di 21’ê Cotmeha 1963’yan de Serokkomarê Iraqê Mareşal Abdulselam Arîf, yekîneyên Sûriyeyê yên li mintiqeya Xaxoyê ziyaret kiriye.”*

Erîşên wê demê ewqasî giran in ku di rûniştinên NY de dibin mijara nîqaşan. Ser meselê, *“Komara Gel a Moxolîstanê, di 3’yê Tîrmeha 1963’yan de ji bo ‘siyaseta îmhaya komî ya ku hikûmeta Iraqê li dijî gelê Kurd pêk tanî’ bikeve rojeva Xebatên Pêvajoya 18’emîn a Desteya Giştî ya NY, serlêdana fermî kiribû. Li ser vê jî hikûmeta Iraqê nûnertiya xwe ya dîplomatîk a li paytexta Moxolîstanê Ûlanbatûrê betal kiribû.”*

Em devam bikin. Barzanî, di sala 1964’an de Celal Talabânî, Elî Asker û endamên navendî ji partiyê îxrac dike. Hewl dide li şûna van ên nêzî xwe bi cih bike. Di 4’ê Nîsana 1964’an de komîteya navendî li Mawetê kom dibe, hem têkilî û diyalogên li ba hikûmeta Iraqê red dike hem jî wezîfeya Barzanî disekinînin. Êdî rê ji hev cuda bûne. Her çiqasî cih bi cih hewldanên lihevkerî jî derketibin êdî nakokî kûrtir bûne. Di meha Tîrmeha heman salê de Barzanî ji bo endamên komîteya navendî bigirin, pêşmergeyan dişîne. Wê demê Îbrahîm Ehmed û Celal Talabânî derbasî Îranê dibin û nêzî salekê li Hamedanê dimînin. Ji ber Îran û PDK-I’ê li hev kirine, wê Îbrahîm Ehmed û Celal Talabânî zehmetiyên mezin bibînin. Helbet di van tevahî bûyeran de divê aliyên kê, şaş û bêbawer ên Îbrahîm Ehmed û Celal Talabânî jî bêne dîtin. Îbrahîm Ehmed dest ji siyaseta berdide û li Îngilîstanê bi cih dibe. Îran jî Celal Talabânî li gel 300 kesî li Dola Reqayê di bin venêrinê de digire. Talabânî îltîcayî Iraqê dike. Û dûvre jî di 1966’an de Celal Talabânî demekê li ba hikûmeta Iraqê li dijî PDK-I tevdigere. Her

çiqasî gotina “Caşê Saddam” a ku ji bo Celal Talabanî tê gotin ji van salan mabe jî, Talabanî PDK-Şoreşger di vê demê de ava dike, li dijî PDK-I jî vê dîrokê û şûn de şerê xwe xurttir dike.

Em wek agahiyekê diyar bikin. Dema ku Barzanî hewl da li cem rejîma BAAS’ê pirsgirêka Kurd bi rê û rêbazên hevdişînê çareser bike, gelek kesên ku di nav siyaseta cîhana Ereban de navdar in, piştgiya xwe ragihandibûn. Wek mînak, “*Di dema Civîna Ereban de ku wê di Çîleya 1964’an de li Kahîreyê biciviyana, meyleke ku dixwaze mijara Kurd bi çareseriyeyeke aşîxwaz bê helkirin derdikeve. Lîderê Misrê Cemal Abdulnasir û Serokê Cezayîrê Ehmed Bîn Bella û serokên din ên Ereb ji bo çareseriyaya aşîyane cesaret dan Mareşal Abdulselam Arîf û piştgirî kirin.* (Saad Jawad, **Iraq and the Kurdish Question 1958-1970**, s. 156, Ithaca Press, London 1981)” (E. B.)

Piştî ku welatên Ereban di 1967’an de dema Şerê Şeş Rojan li dijî Îsraîlê têk diçin, wê demê desteka ji bo Tevgera BAAS’ê ya li Iraqê zêdetir dibe. Dema ku BAAS’îyan li dijî Kurdan şer dikirin, dixwestin ku mezinên Şîa jî tevî vî şerî bibin. “*Desthilatdariya BAAS’ê ji oldarê herî mezin ê welêt Mûhsîn El Hekîm ku xwedî nasnavê Ayetullah-ul Ūzma (Ayetullahê Herî Mezin) bû, xwest ku “li dijî Tevgera Kurd ji bo ragihandina cîhadê fetwayekê bide.” Lê berevajîya daxwaza hikûmeta BAAS’ê, Ayetullah di Çîleya 1969’an de fetwayek wisa dide ku şerê li dijî Kurdan gunehkî mezin dihesibîne.*” (E. B.)

Di 17’ê Tîrmeha 1968’an de bêtî ku xwîn birije, darbeyek pêk tê û desthilatdarî bi temamî dikeve dest BAAS’îyan. Li ser bernamaya hikûmetê lihevkin çênabin. Li ser vê jî komek efserên ku Saddam Huseyîn lîdertiya wan dike û alîgirên BAAS’ê ne, di dawîya meha Tîrmehê de hizbên din ên darbekar tîn tasfiyekirin. El-Bekîr dibe serokdewlet û serokwezîr, di heman demê de wek Serokê Konseya Femandariya Şoreşgerî û Femandariya Herêmî ya Partiya BAAS’ê jî kontrolê xurt pêk tîne. Partiya BAAS’ê ya ku di nav hikûmetê de berbiçav dibe, bi avahiya xwe ya rêxistî ve hema hema tevahî saziyan bi dest tîne. BAAS a ku dixwest girseya xwe jî zêde bike, di 1970’yan de şerê li dijî Kurdan bi dawî dike, li cem Partiya Komunîst a Iraqê (PK-I) û hin partiyên din ên milliyetgirî û çepgir hewl dide hevkarîyê bike. Dikare ecêb be, lê hêza

ku dîsa Talabanî û Barzanî tîne ba hev, dîsa Dewleta Iraqê ye, bi gotinek hê rasttir Saddam bi xwe ye. Saddam di nameyeke xwe de ji Mele Mûstafa Barzanî re wiha dinivîsîne: *“Birayê Ebû Îdrîs (Mele Mûstafa)... Hem di dema muzakereyan de hem piştî îlana Danezana 11’ê Adarê hem ji bo we yekser hem jî ji birayên rayedar ên PDK’î re min ev daxwaza xwe ya bi biryar bi taybet destnîşan kir: Hûn Kurd, pêwîst e kî û nefreta navxweyî derbas bikin. Pêwîst e tevahî Kurd di bin rêbertiya we de kom bibin ku xalên di Danezana 11’ê Adarê de jî karibin bikevin meriyetê.”* (E. B.)

Di 1970’yan de di rejîma BAAS’ê de guhertina hin navan dikeve rojevê. Rêveberiya nû bi deklarasyonekê ve lihevkirina Kurdan radigihîne. Hin mûxalîfên ku berê ji PDK-I’ê qut bibûn, vedigerin. Nîqaşên otonomiyê zêde dibin. Di 11’ê Adara 1970’yan de peymana otonomiyê tê îmzekirin. Li gor biryarên hepar:

- “1. Zimanê Kurdî wê bibe zimanê fermî.
2. Di tevahî qedemeyên rêveberiyê de wê wekheviya heqê Kurd û Ereban pêk were.
3. Li Herêma Kurd a paşdemayî wê li dijî paşverûtiyên aborî, çandî têkoşîn bê meşandin.
4. Li herêmên ku Kurd zêde ne, wê avahiyên xwe yên rêxistinî pêk bînin. Serjimêriya 1957’an wê esas be.
5. Ji bo Kurdan wê her cure azadiya rêxistinbûyîne çêbibe.
6. Li Kurdistanê wê budçeyek taybet bê amadekirin.
7. Kurd û Ereban wê vegerin warên xwe yên kevn. (Pênabertî û bicihkirinên bi zorê)
8. Wê efîyek giştî bê ragihandin.
9. Wê reforma zeviyan pêk were.
10. Di destûra bingeîn de wê bi şiklê ku Iraq ji Kurd û Ereban pêk tê, mafên gelên din jî li ber çavan tê girtin, bê sererastkirin.
11. Çek û Radyo wê dewrî dewletê werin kirin.
12. Yek ji cîgirên Serok wê Kurd be.
13. Komîteya Bilind berpirs e ku van pêk bîne.

14. Kurd li gor rêjeya xwe ya nifûsê di dezgehên qanûnsaziyê de bêne temsîlkin.

Her wiha:

-Diyarkirina sînoran

-Hebûn-nebûna Pêşmerge

-Diyarkirina Budçeyê

Piştî 4 salan wê dîsa bi civînê biryarên hevpar bêne girtin.

Domahiya 4 salan, mîna piştî sala 2003'yan, PDK-I dîsa li ser desthilatdariyê ye. Nelirêti û dewlemendbûna şexsan digihêje heta kabokê. Têkiliyên PDK-I'ê û Îsrailê wê di van salan de hê zêdetir bi pêş bikeve. Dîsa ji têkiliyên PDK-I û DYA dixuye ku Şah Riza Pehlewî bi israr xwestiye werin bipêşxistin ku karibin Kurdan li dijî Iraqê derbixin. Dîsa em dizanin ku di van salan de têkiliyên PDK-I û Sovyetê jî zehf xurt in. *“Yekîtiya Sovyetan, yekemîn welat e ku alikariya malî daye Tevgera Kurd. Di dawîya sala 1961'an de salane 360 hezar dolar (nêzî 120 hezar Dînarê Iraqê) hatibû dayîn. Ev diravdanî sal bi sal zêde bûn û di 1969'an de gihîşt nîv mîlyon dînarî. Alîkariyan heta sala 1972'yan dewam kir. (Mesud Barzani, age., s. 395.)”* Sovyet wê demek dirêj piştgiriye bidin tevgera Kurd. Lê, dema ku Barzanî têkiliyên xwe li ba Îran, Îsrail û DYA xurt dike û di dawî de jî li dijî Iraqê şer dike, wê demê pilotên Sovyetê di salên 1974 û 1975'an de beşdarî şerê li dijî Kurdan dibin. Û bi balafirên Tupolev-22 ve Kurdistanê bombebaran dikin.

Ji ber di sala 1972-73'yan de hikûmeta Iraqê petrolê neteweyî dike û di heman salan de krîza petrolê ya navneteweyî ya OPEC'ê çêdibe, dewletên rojavayî zehf aciz dibin. Ji ber vê yekê, hêdî hêdî PDK-I'ê li dijî dewleta Iraqê tehrîk dikin. Axaftinên ku Şahê Îranê û H. Kissinger ji hev re dikin bi rastî jî pir balkêş in: *“Şahê Îranê ji H. Kissinger re dibêje: “Em, tifaqa BAAS'îyan, komunîstan û Kurdan asteng dikin.” Kissinger ji Şah re dipirse: “Ew hêza we heye ku hûn karibin pêşî li tifaqê bigirin?” Şah dibersivîne: “Erê...” (Qeyda hevdîtînê ya di Tîrmeha 1973'yan de)”*

Hên sosret gotinên ku em li jêr bînin ser ziman in: *“Serokwezîrê Cezayîrê Bumedî ji devê Şah vê îfadeyê radigihîne: “Tevgera Kurd a li Bakurê Iraqê, mîna wanaya li ber destê min e;*

kengî dixwazim vedikim, çawa bixwazim jî digirim!’ Biryar li gor keyfa me ye; ya ez ê bi temamî vekim an jî bi temamî bigirim...” (Axaftina Hamed El Cebburî ya di bernameya “Şahidiya Demê” ya televîzyona El Cezîre)” (E. B.)

Wer dixuye ku Saddam van rastiyan dibîne û dixwaze Mele Mûstafa jî şiyar bike.

“Birayê min ê rêzdar Ebû Îdrîs (Mele Mûstafa),

*...Ez ji te rîca dikim ku tu yê vê baş û zêde bifikirî: Dema ku armancên demkî yê Amerîkayîyan, Îngilîzan û Hikûmeta Îranê bi te re qedîyan, gelo wê çi bi te, bi me û bi taybet jî bi şexsê te bikin? Ya ku ew dixwazin ne li gor berjewendiyên gelê Kurd e. Ji ber ku ew bi şerekî ku Kurd cewaz bibin (ji Iraqê veqetin) têr nabin; berrevajî şerekî bêdawî dixwazin. Azweriyên wan, weke ku em her tim diyar dikin, qedandina gelê Kurd û dûvre xistina hikûmeta Bexdayê, piştî wê ûnsûrên nêzî xwe bînin ser desthilatdariyê û herî dawî jî di encama lihevkirinek mezin û berfireh wê we heta ku bi erdê re bikin yek bipelçiqînin. Em difikirin ku wê rêveçûn bi vî şiklî be. Ev tesawûr û pêşdîtinên min ne tiştên razber in; ez difikirim ku hûn ê jî bi mejiyekî vala wê tevli hesabê xwe nekin. Lê belê, di vê nameyê de tiştê ku ez dixwazim îfade bikim ev e: destûrê nedin ku xeyal û faktorên dilinî yê nerast we ji rastiye dûr bixin...” (Mesûd Barzanî, **Barzanî û Tevgera Azadiyê ya Kurd, Çapa Erebi, r. 835.**)” (E. B.)*

*“Rastî ev e ku; hem DYA hem jî Îran, di esas de naxwazin bi ti şiklî pirsgerêka Kurd bê çareserkerin. Ji ber ku Kurd tenê bi miş-tixulandina artêşa Iraqê hatibû wezîfedarkirin. Wisa jî wê ev miş-tixulandin (taktîk) faydaya xwe nîşanî Şah û Kissinger bida.” (Emile Guikovaty, **Comment les Kurdes ont ete trahis-Çawa Xiyanet li Kurdan Hat Kirin-**, Fransîz L’Express dergisi, 8-14 Mart 1976.)”*

Di sala 1974’an de plana herî berfireh a otonomiyê ya hikûmeta Iraqê (Mintakat-ül hükm-ül tahti) tê weşandin. Di vê planê de Kerkûk nîne. PDK-I’ê wê yasayê red dike û li ser navê PDK-I’ê wê plana xwe ya otonomiyê ya wek Rastaqîn bi nav dikin, biweşînin. Li ser vê jî şerê BAAS û PDK-I’ê dîsa dest pê dike.

Nêzî 120 hezar pêşmergeyên PDK-I'ê hebûn. Îran bi awayekî eşkere destek dike. DYA radigihîne ku wê bi rêka Îranê alîkariyê bike û bi devê Nixon îfade dike ku li ba Kurdan in. Di encam de wek me li jor jî îfade kir, bi tehrîkên mîna van dikevin nav pêvajoyek şer.

Nêzîkatiya BAAS'ê ew bû ku heta muxalefeta din a civakî jî holê rabike, wê Kurdan bêbandor bike û karibe bikşîne cem xwe. Desthilatdariya BAAS'ê bi bayê lezê hewl dida Hegemonyaya Erebiyê bike. Rejîma BAAS'ê ya ku li gel nakokiyên navxweyî, li cem Îranê pirsirêkên wê yên sînor jî çêbûn, hewl dide li dijî tifaqa Îran û DYA, hevsengiyê bi nêzîkbûna Yekîtiya Sovyetan ava bike. Ev rewş dibe sedem ku eleqeya DYA û hevalbendên li herêmê jî bo Tevgera Kurd a bi karaktera komprador çêbibe.

Mele Mûstafa Barzanî, di 9'ê Sibata 1972'yan de ji bo nûnerên DYA re nameyê dinivîse, sîtemên xwe tîne ziman ku tevî li rexên wan e jî lê nikare li beramberî vê heman nêzîkatiyê nabîne û dibêje; *"Wek Kurd me baweriya xwe bi soza şerefê ya DYA û Îranê anî û me li dijî dijmin serî rakir û şer kir (Iraq)... Ka xweseriya ku soza wê hatibû dayîn? Birêz serok, Kurd ji min dixwazin ku ew soz pêk were. Ez jî, birêz serok, bendewariyê ji we dikim. Gelê min tevahî bawerî û hêviya xwe bi min girêdayî ye, niha ez jî vê hêviyê bi we girêdidim."* Pêwîst e ev gotin baş werin fêmkirin, gotinên beriya vê jî bi navbeynkariya sefirên DYA hatibûn şandin û tasfiyekirina tevgerên alternatîf ên li Kurdistanê radigihîne divê neyê jibîrkirin: *"Barzanî, têkildarî mijarên mîna pêkanîna polîtîkaya Amerîkan û tevahî ûnsûrên dijmin ên li qadên ku di bin bandora DYA de ne, bînin tînekirin, dixwaze li ba rêveberiya Amerîkan pêwendîyan dayne."* Her wiha, di sala 1973'yan de Jonathan C. Randal pê re hevpeyvînekê dike û li gor vê ragihandinê Barzanî dibêje, *"Ez bi Amerîkayê bawer im. Amerîka hêzek wisa mezin e ku îxanetê li Kurdan nake."* Eger ev gotin neyên fêmkirin, wek çawa wê neyê fêmkirin bê PDK-I'ê çawa bûye maşîkek hêzên derveyî, her wiha wê karaktera PDK-I'ê jî baş neyê fêmkirin. Her wiha pêwîst e ku nivîsên Mele Mûstafa Barzanî yên ku di salên 1940'î de ji bo Îngilîstanê hatine şandin neyên jibîrkirin: *"Di nameyek de ku ji bo Serpel Hevlet dişîne, 'Eger hûn fermanê bidin, ez ê agir dadim û xwe biavêjimê jî...' (E. B.)"*



CELAL TALABANÎ



MELE MUSTAFA BARZANÎ Û SADDAM HUSEYÎN

PDK-I, ya ku li şûna hêza xwe pişt a xwe bi hêzên hegemonîk ên navdewletî girê dide, pêvajoyek hilweşîner bi gelê Kurd dide jiyandin. Aloziya ku di 1972'yan de zêde dibe, di 1974'an de vediguhere şer.

24'ê Nisana 1974'an, Rejîma BAAS'ê ya Iraqê, Qeladizê bombe dike. Gelek mirovên Kurd tên qetilkirin. Ciwanên Kurd ên welatparêz ên li Bexdayê li dijî vê bûyerê ji bo bersivdayînê amadekariyên çalakiyan dikin. Di nav van xwendevanan de endama ciwanên PDK-I'ê Leyla Qasim jî heye. Lê hê di dema amadekariyên çalakiyan de tên girtin. Leyla Qasim û hevalên wê ku tevî êşkenceyên mezin jî ser didin lê sirê nadin, di 13'ê Gulana 1974'an de tên îdamkirin.

Şer dewam dike. Lê di 6'ê Adara 1975'an de Peymana Cezayîrê çêdibe, pirsgrîkên Îran û Iraqê tên helkirin- Iraq hin giravan ji Îranê re dihêle-, Îran jî piştevaniya ku daye PDK-I'ê qut dike. *“Bi Şoreşa Kurdan re ku 11'ê Adara 1974'an pêk hat, têkiliyên bi hikûmeta Iraqê re bi temamî qut bûn. Di 16'ê Nisanê de Mele Mûstafa biryar da ku êrîşî yekîneyên Iraqê yên li mintîqa Spîlekê bike. Dema dijoperasyonên leşkerî dest pê kirin jî, êrîşa ku ji bo kontrolkirina Spîlekê hatibû lidarxistin bêencam ma... Navbera Îran û Iraqê di 6'ê Nisana 1975'an de peyman hat îmzekirin ku ev jî bû sedema hilweşîna Şoreşa Kurdan.” (Aqrawî)“*

Tevgera bi pêşengiya PDK-I'ê ku li şûna hêza xwe pişt a xwe dide hêzên derve û bi taybet jî Îranê, têk diçe. Di vê bûyerê de ku

wek **“Aş Betal”** tê zanîn, bi hezaran pêşmergeyên Kurd li ba çekên xwe an jî bi şikandina çekên xwe neçarî teslîmbûyîna tîn hiştin. Qismek pêşmergeyan jî vê teslîmbûyîna bêrûmet napejirînin û dawiyê li jiyana xwe tînin.

Mîna di dîroka Kurd de zehf tê dîtîn, rewşa têkoşîna li gor ûsula eşîrî, jî malê qut nabe û hê girîngtir jî hewl dide xwe bispêre hêzên derveyî û wisa li ser piyan bisekine, rastiya ku dema desteka derveyî zeîf dibe an jî xwe vedikişîne di têkoşîna de bêbawerî çêdibe, herî zelal di sala 1975’an Bûyera **“Aş Betal”** de dubare dibe. Di wan salan de berpirsê PDK-I’ê yê li Ewrûpayê Îsmet Şerîf Vanlî jî bo rastiya Aş Betal dibêje, **“Tasfiyekirina şoreşê bi destê lîdertiya xwe.”** Û her wiha gotîna wek, **“Min ti carî mîna wek nedîtiye ku şerê gel bi şiklekî wisa trajîk bi dawî dibe. Mîna wîlo ye; gelekî ku xwedî azweriya têkoşîna ye û jî bo domandina têkoşîna jî xwedî derfetên tîrker e, lê serê xwe tenê li ber rêbertiyê dîtewîne û şer diqedîne!..”** dibêje.

Pîştî Peymana Cezayîrê, PDK di carekê de tasfiye dibe. Ev jî nîşan dide ku bi çiqasî û di çî astê de xwe spartîye hêzên derve. Dema em jî milekî din jî lê dinêrin, em ê karibin bibînin ku bê li beramberî hêza xwe çiqasî bêbawer e. Tarz û seknên ku xwe naspêrin dînamîkên xwe, her tim xwe li gor hinan rêxistî dikin û bendewariyê jê dikin, wê dawîya dawî nikaribin xwe jî tasfiyebûyîna rizgar bikin. Hewldana ku xwe dispêre hinekan û xwe bi rêxistin dike, jî bilî hevkarîyê ne tiştekî din e. Helbet dikare bi her hêzê re têkilî bîn danîn. Lê, dema tenê bi tîkiliyan re sînordar namîne û mîna ku xwe bi hinan dike pîneyek, dibe piyona wan, jî bilî trajediyekê rê li ber tiştekî din venake, wê nikaribe veke!

Li nik vê, wê li Başûrê Kurdistanê gav bi gav bizavên cuda bi pêş kevin. Yek jî van bizavan jî Komeleyî Marksî Lenînî ye ku li Silêmanî û Bexdayê jî aliyê Tevgera Xwendevanên Kurd hatiye damezrandin. Di esas de ev di 1970’yan de tê damezrandin. Tevgera sosyalîst e ku têkoşîna jî bo çar parçeyan esas werdigire, nêzî gel e, di nav ciwanên ronakbîr de bi awayekî zêde cih digirin, perwerdeya kadro jî dibînin. Sekreterên wê Şehab Şêx Nûrî ye ku nasnavê xwe Xalê Şehab e. Şehab Şêx Nûrî û çend hevriyên wî piştî ku jî aliyê Dewleta Îranê tîn girtin, radestî Iraqê tîn kirin. Iraq jî van ciwanên Kurd ên şoreşger û ronakbîr îdam dike. Beriya

darvekirinê, Xalê Şehab û hevrêyên wî sloganên mîna **“Kêm Bijî û Kêl Bijî”** berz dikin. Ev dirûşme di wan salan de gelek derdoran bandor dikin. Piştî Xalê Şehab, wê Şaşuwar Celal bi nasnav Aram, bibe lîderê Tevgera Komala û di 31’ê Çileyê 1978’an de li Karadagê tevî karwanên şehîdan dibe. Paşê jî, Lîderê îro yê Tevgera Goranê Newşîrwan Mistefa wê bibe lîderê vê tevgerê angî Komaleyê. Tevgera Komala di sala 1979’an de konferansê li dar dixe, navê xwe diguherîne û dike **“Komeleyî Rençderanî Kurdistan”**. Heta şehadeta Şehîd Aram, tevgera bi navê Komala di nav xwe de bi awayekî rêkûpêk perwerdeyên kadroyên xwe domandine, lê piştî şehadeta Aram ev rewş her ku diçe lewaz dibe û di sala 1983’yan de zêrî dibe û di sala 1992’yan de jî di nav YNK’ê de diqedin.

Em di dawiya vê beşê de behsa harekatên Helepçe û Enfalê bikin û wisa dawiyê li vê beşê binin.

Beriya ku em gotinên xwe yê têkildarî Başûrê Kurdistanê biqedînin, yek ji pêkanînan herî hov û dijmirovî ya sedsala bihurî di asta qirkirinê de bi serê gelê me yê Başûrê Kurdistanê de hat.

Em hemû ji Helepçeyan dizanin. Dema ku bi dilnexwazî ji berjewendiyên dewletên mêtînger û hêzên emperyalîst digihêjin hev, bûyerên li Helepçeyê hatin fêmkirin. Li Helepçeyê di 16’ê Adara 1988’an de bi hezaran Kurd bi çekên kîmyewî hatin qetilkirin, bi hezaran jî bi giranî birîndar bûn. Helepçe, di nav trajediyên Başûrê Kurdistanê de tenê **“bûyere”** e.



Wênekek ji Qirkirina Helepçe

Di dema şerê Iraq û Îranê de herî kêm 1400 gundên Kurdan hatine valakirin, piraniya wan hatine şewitandin, bi mîlyonan şênî hatine sirgûnkirin, neçarî koçberiyê hatine kirin.

Rejîma Saddam ji pêvajoya qirkirinê re Enfal dibêje ku ji Siba-

ta sala 1988'an dest pê kir û heta Îlonê dewam kir, herî kê 182 hezar mirov hatin qetilkirin û bi hezaran hatin windakirin.

Enfal, di Sûreyek Quranê de bi wateya “**xenîmetên şerê pîroz**” tê bikaranîn. Enfal cureyekî çalakiya wisa ye ku malên kesên ji kafir jî xerabtir in tî desteserkirin û ji bo destavêjin jî helal e.

Wek li jor jî hat îfadekirin, di Enfalan de 182 000 kes hatine qetilkirin. Û çend hatine windakirin, firotine kê, avêtine kîjan çalê hê jî ne diyar e.

Bi giştî 8 Enfal pêk hati ne. Her Enfalekê rehm li ya din daye xwendin. Tê îfadekirin ku 1,5 mîlyon kes ji cihên xwe hatine kirin. Li şûna gundên hatine tinekirin, Kurdên mane bi darê zorê li gundên navendî yê stratejîk ên bi navê “**Mucemmat**” hatine bicihkirin.

Rejîma BAAS'ê harekata yekemîn a Enfalê di sala 1988'an li geliyê Cafatî daye destpêkirin, paşê jî bi heman tundiyê û bêrehmîyê ve berê xwe daye gelek deverên din û çekên kîmyewî bi kar anîne. Dûvre jî Qirkirina Helepçeyê ya li jor hatî îfadekirin, pêk anîne. Enfala duyemîn di Adara 1988'an de li dijî gundê Seyf Senanê pêk hatiye. Yek ji Enfalên herî tund jî li dijî Germiyanê pêk hatiye. Tê zanîn ku herî kê 182 hezar mirov ji holê hatine rakirin. Bi rêzê jî harekatên Enfalê yê çaremîn, pêncemîn, şeşemîn, heftemîn û herî dawî jî heştemîn li dijî Kurdên Behdînanê di 25'ê Tebaxa 1988'an de pêk hatine.

Rejîma BAAS'ê, di 6'ê Îlona 1988'an de “**efûyek giştî û berfi-reh**” ragihand û “bi gotina devan” dawî li harekata Enfalê anî. Lê, em jî dizanin ku heta sala 1991'an gelek caran bi hezaran Kurd ji cih û warên xwe bi darê zorê hatine koçberkirin.

Kerîm Yildiz ê ku di qada navneteweyî de xebatên mafên mirovan dike, di pirtûka xwe ya **Kurdên Iraqê** de wiha dinivîse, “*Piştî ku du sal di ser Harekatên Enfalê re derbas bûn, ji sisiyan dudu yê Kurdistanê bi temamî hatibû bêmirovkirin, bi sed hezaran mirov ji cih û warên xwe hatibûn kirin.*”

Heman nivîskar bi mafdarî vê jî li ser zêde dike, “*Heta qirkirina Helepçeyê, wîjdanê cihanê li beramberî trajediya Kurdistanê kor, lal û ker bû. Rizgarkirina balînayekê ku li Alaskayê di nav cemê de asê mabû, dibû rondikê “medeniyeta dilrehm”. Televîz-*

yonan, çapemeniyê kêlî bi kêlî halê balînaya asêbûyî ji me re radi-
gihandin.

*Lê li vê goşeya cihanê, hayê ti kesî jê nînbû ku gelek tê qirkirin.
Ji ber ku li ser bîrên petrolê yên qirkeriyê rûdiniştin. Ji bo “cîhana
medenî” enerjî hildiberandin.*

Li gor berjewendiyên wan, wijdanên xwe şandibûn betlaneyê.”

Dema tim bi tim tê gotin, mêtîngehek navneteweyî yan jî
navdewletî Kurdistan an jî welatê ku nikare bibe mêtîngeh jî, beh-
sa vê rastiyê tê kirin.

Komek din jî Tevgera Demokrat Sosyalîst a Kurdistanê ye. Ke-
sayetên şoreşger ên mîna Elî Asker, Tahîr Walî Beg, Dr. Xalid
Seîd, Omer Mistefa, Elî Hejar, Kardo Gelalî, Ednan Muftî, Seyda
Salih Yûsûf, her wiha paşê Resûl Mamend ê ku di 1981'an de
Partiya Sosyalîst ava dike, Dr. Mahmût Osman, Seyda cihê xwe di
vê tevgerê de digirin. Yên ku Hêlî Giştî jî ava dikin, Celal Tala-
banî, Fûad Muhammed û hevrêyên wan in.

Di encam de tevgerên ku li jor hatin îfadekirin ango Komala, Tev-
gera Demokrat Sosyalîst a Kurdistanê û Hêlî Giştî, di 1'ê Hezîrana
1975'an de wek eniyekê Yekîtiya Nîştîmanî Kurdistanê (YNK)
îlan dikin. Di salên 1976'an de Elî Asker wê di nav YNK'ê de
navê herî bi bandor be. Şehîd Aram ji ber ku YNK'ê bi karaktera
bûrjûvaya biçûk pênase dike, tevlî nabe. Piştî şêhadeta Aram, wê
Newşîrwan ê ku dûvre dibe lîderê tevgerê, wek me li jor jî anîbû
ser ziman paşê tevlî YNK'ê bibe.




MAMÊ RIŞÊ



LEYLA QASIM



ELÎ ASKER



Elî Asker û hevrêyên wî lê dinêrin ku li Başûrê Kurdistanê ji ber şerê navxweî bingeha xebatê nîne, bi hêzek 1000 pêşmergeyên hîlbijartî ve dixwaze derbasî Bakurê Kurdistanê bibin û berxwedanê bidin destpêkirin. Lê çi heye ku beriya bigihêjin Oremarê jî, di encama rêxistinkirina PDK-I'ê şênîyên herêmê êrîşî Elî Asker û hevalên wî dikin. Li ser vê jî Elî Asker hêzên xwe derbasî Botanê dike.

Hunera PDK-I'ê ya tasfiyekirina rêxistinên Kurd encam digire. Lê mixabin ev pêvajoyê bi tasfiyekirina Elî Asker û hevrêyên wî diqedin. PDK-I'ê jî gelê herêmê re dibêje ku sîxurên Saddam, bi gotinek dîtin sîxurên BAAS'ê li herêmê digerin û berê şênîyan dide Elî Asker û hevrêyên wî. Di 1978'an de li Taştamergê – zozanên Elkê- dor li Elî Asker û hevrêyên wî tê girtin. Di vî şerî de nêzî 700 pêşmerge tene qetilkirin. 300 jî dîl tene girtin. Elî Asker, Tahîr Walî Beg, Huseyîn Baba Şêx (Êzîdî) û Dr. Xalid piştî dîlgirtinê ten qetilkirin.

Li gor vegotinên şahidên bûyerê; di dema şer de Elî Asker nehiştiye pêşmergeyek guleyekê jî biavêje. Ji ber ku her guleyek pêşmergeyan wê mirovekî gelê Kurd bike hedef. Elî Asker jî bi vî bireweriyê ve destûrê nade. Îxanet dîsa serberdayî ye û careke din bi şehadeta bi sedan ciwanên Kurd ên fedaî bi encam bûye.

Di 26'ê Gulana 1976'an de, Mesûd Barzanî, Îdrîs Barzanî û Samî Abdurrahman, Kerîm Sîncarî, Azad Berwarî PDK-I Qiyadî

Mûwakat (Femandariya Demkî) ava dikin. PDK-I ji pêvajoya piştî vê re dibêje Şoreşa Gulanê. Piştî vê dîrokê, Samî Abdûrrahman li ba Îsrailê têkiliyên xurt datîne. Jixwe partiyek hevkar a Kurd a di nav cîhana Ereban de bi wê ve girêdayî, li gor hesabê Îsrailê ye jî.

Her çiqasî bi awayekî fermî di 1'ê Adara 1979'an de piştî mirina Mele Mûstafa Barzanî, lîderê PDK-I'ê Mesûd Barzanî be jî, Îdrîs Barzanî heta 31'ê Çîleya 1987'an ku wefat dike, dibe navê li pêş.

Li Başûrê Kurdistanê helbet rêxistin û partiyên din jî tîn damezrandin. Eger em navên hinan li vir bibêjin; Partî Gel, PASOK-Partiya Sosyalîst a Kurd, Hizbî Zehmetkêşanî Kurdistan, Tevgera Îslamî ya Kurdistanê, Alayî Şoreş-AŞ, Yekgirtûyî Îslamî, Komaleyî Îslamî, Tevgera Goran û hwd.

Her wiha, di demên cuda de eniyên ku partiyên cur bi cur tê de cihê xwe girtine jî hatine damezrandin. CUD (Eniya Welat a Demokrat), CUQD (Eniya Welatê Neteweyî ya Demokratîk).

Em derheqê Barzaniyan de çend gotinan bibêjin û vê beşê bi dawî bikin: Hê nivîskar hene ku di nivîsên xwe de dibêjin bê li Mahabadê Barzanî çawa Qazî Muhammed terikandiye. Di dema nîrxandina parçeyê Bakur de me gotibû bê çawa her du Saît bi kompoyan hatine tasfîyekirin. Tê zanîn bê pêşmergeyên PDK-I'ê çawa bi destê PDK-I'ê radestî Îranê hatine kirin. Li her parçeyên Kurdistanê PDK-I'ê yên ku ji bo karibin rêxistinên Kurd bixin bin kontrola rêxistinên îstîxbaratan êdî ne sir e.

Di sa sosyaliştên Iraqê çawa qetil kirine jî tê zanîn; *“Berpîrsê Partiya Komunîst a Iraqê (PKI) Ecîne ji bo 12 komunîstên ku li Zaxoyê ji aliyê PDK'ê hatin qetilkirin, pênaseya “karesata mezin a ku têkiliyên PDK û PKI tehrîb kir”, Dr. Mahmûd Osman jî (şexsiyetê sereke yê PDK'ê) wiha gotibû: “Di salên dawî de li dijî gel û bi heman şiklî li dijî endamên hêzên welatparêz ên Iraqê yên ku li Kurdistanê bûn, teror pêk hat. Ser meselê, 12 komunîstên ku endamên rêxistina girêdayî Komîteya Navendî ku 2 ji van ji rêbertiya navendî ne, ji aliyê fermanîdarê Hêza Zaxo Îsa Savûr hatin kuştin. Hayê rêbertiya Barzanî jî vê hebû. Bûyerên mîna vê ne di*

çarçoveya berjewendiyên gelê Kurd de ne. (Taayim Mesirat-il Sawra., s. 24.)” (E. B.)

Ji vê wîrdetir, êdî pêwendiyên Barzaniyan ên li gel Dewleta Îsraîlê ne sir e. Dema Dewleta Îsraîlê tê damezrandin, yek ji serkêşên ku têkilî li gel daniye û çend caran serdana Îsraîlê kirine, Barzanî tên. Wê ev keveşopî ji bav derbasî kur bibe. Wisa bûye ku, PDK-I'ê û malbata Barzanî ti carî li beramberî sûcên mirovahiye yên ku Dewleta Îsraîlê pêk anîne, rexneyek jî nehatiye kirin. Di sala 2009'an de dema Dewleta Îsraîlê bi xwînxwarî Filistin bombardûman dikir ji aliyê tevahiya cihanê hat şermezarkirin, lê PDK-I'ê û Barzaniyan rexneyek jî nekirine. Di roja me de hêza ku li Başûrê Kurdistanê herî bi hêz e, Îsraîl e. Hêza din jî Cemaata Fethûllah Gulen e. Têkiliyên Fethûllah Gulen û Evangelîstan ne sir e. Bê li ser navê kê tevdigere, her roj hê bêhtir tê dîtin û tê fêmkirin jî. Wek hêza bibandor a Evangelîzmê, yek ji cihên ku lê herî bi bandor in jî Başûrê Kurdistanê ye. Her wiha tişteki balkêş jî ew e ku xwişka Îsmail Cem ê Sabetayîst zewaca Sefîn Dîzaî ye ku ji malbata Barzanî ye. Ji ber ku Sabetayîst tenê keçan didin Sabetayîstan. Gelek nivîskar û lêkolîner, dibêjin ku malbata Barzanî bi koka xwe Cihû ne. Me berê jî nivîsîbû ku Sabetayîst yekîtiya Kurdan naxwazin û heta serkêşên Tirkparêziya li Tirkiyeyê ne. Me diyar kiribû ku ji Tirkan hê Tirkparêztir in, ji Tirkan hê nijadperesttir in, ji Tirkan hê şoventir in. Ev giştî bixwazî nexwazî jî di seriyên de dibe pirsnişan. Jixwe, bi salan PDK-I'ê her tim hewldanên avakirina yekîtiya Kurdan vala derxistiye û di plansaziyên Konferansa Neteweyî yan jî Kongreya Neteweyî de her xwe daye rexekî, li beramberî firsenda dîrokî ya li Rojavayê Kurdistanê bi şikil û tarzekî ku ti kes nikare watedar bike dij derketiye. Ev rewşên wisa ne ku divê li ser bê rawestandî û baş bê lêkolandin.

Li Başûrê Kurdistanê di sedsala 20'emîn de wek çawa gelek helbestvanên bi qîmet ên Kurd gihayî ne, her wiha gelek pêşengên jin jî bi afirandina gelek nirxan derketine pêş.

Pîremêrd (1867-1950) ku yek ji helbestvanên herî mezin ê Kurd tê qebûlkirin, wek rewşenbîrekî tê zanîn ku Newroz jî nû ve xistiye rojeva Kurdan. Her wiha navên mîna; Qedrican (1916-1972), Mamosta Guran (1903-1962), Şêx Nûrî, Şêx Salih (1896-1958), Îsmail Hakî Şarez, Mustafa Bamefî dikarin werin rêzkirin. Di qada

dîrokê de jî divê em şexsiyetên girîng ên wek M. Emîn Zekî, Huseyîn Huznî Mukriyanî, Mele Mahmûd Beyazidî, Tevfîk Vehbî, Salih Kaftan, Refîk Hilmî, Elî Seydo Goranî, Cemîl Bendî Rojbeyanî bi bîr bînin.


Siyasetmedarên rojavayî ku wan salan li Kurdistanê mane, di nivîsên xwe de dibêjin ku Adîle Xan a ku di destpêka sedsala 20'ê de jiyaye û Cafî ye, xwedî nasnameyek siyasî ye û li kîjan mekanî be jî zehf bi bandor bûye. Hefsa Xan Neqîb jinek wisa xurt e ku di salên 1920'î de li Silêmanî ji bo keçan dibistana yekem a Kurdî vekirîye. Her wiha, Hepsa Xana Neqîb berê jî yek ji damezrînerên Cemiyeta Jinê ya Kurd Tealî bû. Rabîa Xan, Encum Xan jî heman rol lîstîne. Sediye Xan jî serokê Komaleya Jinê ye ku di sala 1942'yan de tê damezrandin. Gozîde Xan jî endameke Cemiyeta Kurd Tealî ye. Fatme Mihîelden, tam 35 salan ji bo keçên Kurd mamostetiye hema hema belaş dike. Û wek tê zanîn, mîlîtanek mezin a mîna Leyla Qasim jî li ser vê xakê bi berxwedanek bi heybet gihiştîye şehadetê.



HAPSA XANÊ NAQIB



Pîremêrd



Huseyin Mukriyani

Li Rojavayê Kurdistanê Rewşa Kurdan



Adûle Xanim

Rojavayê Kurdistanê ku wek parçeyê herî biçûk ê Kurdistanê tê zanîn, mîna maketêk biçûk a Kurdistanê ye. Piştî berxwedanên ku di 1920'an de pêşketî û paşê hatin tepisandin, zehf Kurdan ji Bakur berê xwe dane Rojavayê Kurdistanê. Bi heman şiklî, pir malbatên ji Başûrê Kurdistanê jî li Rojavayê Kurdistanê bi cih bûne. Di dema Osmaniyan de, ji bilî beşa di bin serweriya Îranê de, Kurdistanê yekpare bû, wextê Şerê Cîhanê yê Yekemîn de li gor hesabên parvekirinê yên emperyalîstan sînor hatin diyarkirin û dûvre jî bi afirandina Sûriye û Iraqê jî dabeşî çar parçeyan hate kirin. Di sala 1921'an de, Dewleta Fransa bi Tirkiyeyê re peymanê dafîne, Rojavayê Kurdistanê ji Kurdistanê qut dike. Di salên 1937-39'an de mabeyna Sûriye û Tirkiyeyê de pirsgirêk li ser Hatayê çêdibe û bi pêvajoyê re di encama dekûdolaban de Hatay ji Dewleta Tirk re tê hiştin. Sûriyeya demê hê jî neketiye pozîsyona dewletek tam. Hilbijartina yekemîn di sala 1943'yan de pêk tê. Û yekemîn serokkomarê Dewleta Sûriyeyê dibe Şukru El Kuwwetlî.



Gelek rewşenbîr û hunermendên ku ji parçeyên din ên Kurdistanê hatine Rojavayê Kurdistanê ji bo pêşxistina çanda Kurd, parastina yên heyî û kirina malê dîrokê, dikevin nav hewldanên mezin. Mînak, Celadet Bedirxan, di zimanê Kurdî de alfabeya Latîn bi kar tîne û gawek mezin diavêje. Li gel vê jî bi kovarên Hawar û Ronahî jî hafîzeyek girîng a çandî diafirîne. Her wiha, Osman Sabrî jî hem di warê dîrok hem jî wêje de xebatên girîng dane. Bi heman rengî, divê em Seydayê Cîgerxwîn bi wêjeya wî bi bîr bin. Li Amûdê dîsa di pêşengiya Seydayê Cîgerxwîn de sala 1930'î dibistanek Kurdî tê vekirin. Bêguman eger em qala Kamûran Bedirxan û her wiha Nûreddin Zaza jî bikin wê li cih be.

Em kevanekekê vekin û bêjin; ruxmî ku ev jî bo Kurdan dibe gezencek jî lê mixabin terkandina alfabeya aramî bû sedem ku di serî de li Bakurê Kurdistanê, ji agahî û materyalên Kurdî qutbûyînek çêbibe. Lewma vê jî parçebûyîna Kurdan îcar di hundîrîn de hê kûrtîr kir.

Di wan salan de partiyên ku bi dest Kurdan tîn avakirin hene. Yek ji van; Partiya Demokratîk a Kurdistan li Sûriyeyê ye. Her wiha, Hozanê mezin ê gelê Ermenî Aram Tîgrîs wê li Rojavayê Kurdistanê demek dirêj hunera xwe bidomanda. Pirtûka “Xatirata

Min” û xîtabeya “Ey Ciwanên Kurd” ên Nûrî Dêrsimî jî li Rojavayê Kurdistanê hatine nivîsandin.

Dikare hinekî ecêb were, lê em bînin ziman wê sûdmend be. Dema Sûriye di bin mandaya Fransayê de bû, tê gotin, destûr hatibû dayîn ku rewşenbîrên Kurd xebatên xwe yên çandî, dîrokî û ziman bikin, kovaran derbixînin û heta di sala 1927’an de li Lubnanê Tevgera Xoybûn damezrînin. Lê, em jî ji bîranînên Osman Sabrî dizanin ku, tenê Osman Sabrî ji aliyê Rêveberiya Manda ya Fransiyayê 11 caran hatiye sirgûnkirin. Sedema wê eşkere ye; Osman Sabrî têkildarî Bakurê Kurdistanê xebatên siyasî dikirin. Her wiha, Fransa di wan salan de tevî ku ji bo kêmteweyên olî xweserî jî da, lê di 23’yê Hezîrana 1928’an de serlêdana Kurdan a ji bo Xweseriya Meclîsa Damezrîner a Sûriyeyê qebûl nekir. Eşkere ye ku divê ev nêzikatî jî bi awayekî cidî karibe bê nîrxandin. Halbûkî, daxwazên li vir jî dişibîyan daxwazên li Wîlayeta Mûsilê ya li Başûrê Kurdistanê.

“PKDS, daxwaz dike ku bi awayekî fermî Kurd bêne nasîn, mafên wan ên çandî bêne dayîn, li şûna hikûmetek netewperestên Erebb, dewletek Sûriyeyê demokratîk a ku dikare her kesî hembêz bike bê vesazkirin; ji bo paşdemayîna aborî ya Kurdan bê derbas-kirin jî dixwaze ku tevdîrên aborî yên pêwîst bi cih werin.

Partiya Komunîst a Sûriyeyê ji hêla Halîd Bektaşê jî ku Kurd bi sêmpatî nêz dibûn, dihat birêvebirin. PKS, diparast ku Kurd ji ber gelek in, divê xwedî van mafan bin. Ev jî dibû sedem ku Kurd bi awayekî zêde li dor PKS bicivin, heta hişt ku partiya komunîst wek partiya Kurdan bê nasîn. Kurdan di tevahî qademyên vê partiyê de cihên girîng girtin.” (Osman Akbaş-Îsyana Dîrokê)


Em bi bendekê diyar bikin ku: dibe ku pêwîstî bi nîrxandinekê hefirehtir jî hebe. Ew jî: Wê li cih be ku eger em bibêjin li cem Fransa û Îngilîstanê, dewletên sereke yên welatên rojavayî ji bo Kurd azadiya xwe bi dest neînin, peymanên taybet ên veşartî kirine. Ji ber ku tam 90 sal in, di serî de ew dewletên emperyalîst ên ku em navên wan bi îstîqrarî didin, gelek dewletên emperyalîst ji bo Kurd azadiya xwe bi dest neînin, çî jî destên wan hatine kirine û hê jî dikin.

Bi navê wê yê dirêj BAAS, Partiya Sosyalîst a Ereban, bi Erebi tê wateya “wejîn” an jî Ronesansê”. BAAS ji mêj ve partiyek sekuler e û şîara wê jî wiha ye, “*Ji Bo Yekîtiya Ereban, Rizgarbûyîna Ji Mêtinkariyê û Sosyalizmê Têkoşîn*”. Partî, di 1930’an de ji aliyê perwerdekarên çîna navîn ên bi navê Zekî El Arsûzî, Selahaddîn El Bîtar û Mîşel Eflak hatiye damezrandin. Hersê kes jî bi tarzê perwerdeya Rojava gihane, ewil jî li Sûriyeyê dest bi xebatan kirine. Dema sal dibe 1945 jî, gotina BAAS’ê êdî ji tevgerekê wirde-tir, mîna partiyekê tê fêmkirin. Damezrandina fermî ya partiyê di 7’ê Nîsana 1947’an de piştî kongreyê li Şamê hatiye ragihandin.

Li Sûriyeyê, ji ber ku di warê serjimêrî de Kurd kêmtir in, zêde berbiçav nabin. Li herêmên ku sînoren Başûr û Bakurê Kurdistanê ne, beriya desthilatdariya BAAS’ê nifûsek Kurd hebû. Lê, piştî BAAS bi bandor bû, li qadên Kurdan Ereb bi cih kirin, hewldanên bişavtinê zêde kirin. Ev di çarçoveya projeyekê de hatiye kirin.

Dewleta Sûriyeyê, di sala 1963’yan de wê Projeya Kembera Ereban ku Plana Islehkirina Şerqê ya Dewleta KT ye ku sala 1925’an kirin biryar û wek Hareketek Qirkirina Çandî xistin dewrê, bixistana meriyetê.

Wek tê zanîn, sala 1956’an Serokdewletê Misrê Cemal Abdulnasir piştî Krîza Qenala Suweyşê, li dijî hêzên Îsraîl, Fransa û Îngilîstanê derdikeve û dibe xwedî helwest. Bi vê ve jî di nav cîhana Ereban de bi lezûbez derdikeve pêş. Li ser vî esasî jî bibû navêkî sembol ê Netewperestiya Ereban. Ev, di sala 1958’an de xwe gihand heta avakirina dewletek bi navê Komara Ereban a Yekbûyî ku Sûriye û Misrê wek yek dewlet xwe îlan kirin.



Peykerê Sînemeyê Amûdê

Netewperestiya Ereb a ku li Sûriyeyê bi pêş diket, gav bi gav Kurd li derve dihiştin. Siyaseta înkâr û îmhayê dihat pêşxistin. Sala 1958’an bi awayekî fermî muzîk û weşana Kurdî hat qedexekirin. Li sînemayek Amûdê di 13’ê Mijdara 1960’an de bi sedan zarokên Kurd bi şewitandinê hatin qetilkirin.

Ev ne bûyerek tesadufî bû. Bi plan hatiye kirin. Polîtîkayên nîjadperest-înkarker û asîmîlasyonîst ên li dijî Kurdan, di sala 1961'an de piştî darbeya ji aliyê efserên BAAS'ê, hê xerabtir bûn. Wek nimûne, Kurdên li qada Qamişlo û Dêrikê, di statuya **Muhacir** ango Ecnebî de dihatin nasîn û mafên wan ên ji destûra bingehîn tên dihatin înkarkirin. Newroz ku cejna çandî ya Kurdan e, hatibû qedexekirin. Statuyek hê kêmtir **"Maktumîn"** e ku tê wateya **"Qeçaxên Bêqeyd"**. Ev jî Kurd in ku bi temamî tine tên hesibandin, wek hemwelatî nayên hesabkirin, kengî bê xwestin jî mal û milkên wan dikare bên desteserkirin.

"Dema ku Rejîma BAAS'ê bi darbeyê desthilatdarî bi dest anî, li Tirkîyeyê jî artêşê bi navê Komîteya Yekîtiya Neteweyî (Millî Birlik Komitesi-MBK) darbe pêk anî û rêveberî desteser kiribû. Sedema rast a darbeyên li Sûriye û Tirkîyeyê jî ew bû ku li Rojhilatê Kurdistanê sala 1946'an Komara Kurd a Mahabadê hatibû damezrandin û bandorek vê hebû, dûvre jî sala 1961'an PDK-I'ê li dijî rejîma BAAS a Iraqê biryara têkoşîna çedarî girt û gelek pêşketinên mîna vê dibûn sedem ku li parçeyên din ên Kurdistanê jî îradeya Kurd dîsa zindî bibe. Efserên artêşên dewletên Sûriye û Tirkîyeyê bi darbeyên leşkerî ve dixwestin ku şiyarbûna Kurd asteng bikin.

Armanca esas a van polîtîkayan ku Kurd dikirin hedef, "netewe dewleteke" bi yek zimanî, yek nasname û yek baweriyê ango "netewe dewleteke" tenê ji Erebb û tenê ji Tirkan pêk tê damezrîn. Li Tirkîyeyê rejîma MBK'ê li Kurdistanê polîtîkaya Tirkîkirinê dabû destpêkirin, li Sûriyeyê rejîma BAAS'ê jî li dijî Başûrrojawayê Kurdistanê projeya "Erebîkirinê û Kembera Ereban" dabû destpêkirin. Navê wê yê Erebb jî "Xizama Erebb" an go "Kembera Erebb" ye. Dema ku nû ket meriyetê jî wek "xeta dehane" jî tê zanîn. Bi polîtîkaya Kembera Ereban ve esas guhertina avahiya demografîk a li Kurdistanê hatiye xwestin, bi vî şiklî jî hatibû plankirin ku li navbera Bakurê Kurdistanê û Başûrrojawayê Kurdistanê Erebb bîcîhkirin û "şerîda ewlehiyê" bê sazîkirin. Armançek din a vê polîtîkaya jî ku pêşdîdît li xakên Kurdistanê Erebban bîcîh bike, gelê Kurd înkâr û îmha bike; herêma Cizîrê ya Başûrrojawayê Kurdistanê xwedî rezervên dewlemend ên petrolê bû.

Sala 1961'an ji hêla Serdar Muhammed Hîlal ku li Kurdistanê wezîfedar bû, berpîrsê herêma Cizîrê yê Serokatiya Şaxa Îstîxbarata Siyasî (Muhaberat Emîn Siyasî) û di heman demê de jî nijadperestekî tûj ê Ereba bû, bi navê **“Di Warê Neteweyî, Cîvaki û Siyasî de Xebata Kurdistanê”** ji rejîma BAAS'ê re raporek hatibû amadekirin. Rapora ku berpîrsê Muhabarata Cizîrê amade kiribû heman rapora koma Rojhilat a Komîteya Yekîtiya Neteweyî (Millî Birlik Komitesi) ye ku li Tirkiyeyê darbeya 27'ê Gulanê pêk anîbûn û ji bo Kurdistanê wek “bernameya Tirkîkirinê” amade kiribûn, li Başûrrojavayê Kurdistanê ketibû meriyetê.

Di raporê de planek çalakîyê ya ji 12 xalan pêk tê, pêşkêşî rejîma BAAS'ê hat kirin. Di vê planê de, pêşniyarên mîna Erebkirina Başûrrojavayê Kurdistanê, li herêmên din belavkirina Kurdan, nav û cihên Kurdî bi navên Erebi guhertin, berbelavkirina ziman û çanda Ereban, li herêmên Kurdan ranezandina sermayeyê, vegeandina Kurdên ku ji Tirkiyeyê hatine, qedexekirina dengdayina Kurdên ku Erebi nizanin cih digirtin.

Ji bo tehcîr û bişavtina ku dixwestin li Başûrrojavayê Kurdistanê pêk bînin, her wiha pêşniyara pêkanîna Rewşa Awarte jî di raporê de hatibû nivîsandin.

Di hin xalên raporê de ku ji bo polîtîkaya tehcîr û asîmîlasyonê hatibûn pêşniyarkirin, ev nêrîn hatibûn bicihkirin:

-Ji bo bişavtina Kurdên ku Erebi nizanin bê lezandin, divê dibistanên Erebi bêne vekirin û ji bo biçin dibistanan bîrî teşwîqkirin, pêwîst bike jî bê ferzkirin.

-Divê li Kurdistanê derfetên xebitandinê bîrî rakirin. Ji bo çandîniyê divê tevahî xak ji dest Kurdan bê girtin. Di heman demê de divê destûr neyê dayîn ku Kurd van xakan kirê bikin an jî bikirin.

-Di nav Ereban de dijberiya Kurd bê kirin, destnîşana ku Kurd xeter in bê xurtkirin û her wiha bi kişîşandina Ereban ve li ser Kurdan zext bê avakirin.

-Li bajarên ku Kurd zêde ne, hişmendiya Kurd xurt e, nîfûsa Ereba were bicihkirin, nîfûsa Kurd bê parçekirin.

-Yekîtiya Kurdan bê xerabkirin, eşîrên Kurdan bîrî dijberî hev, nakokiyên navxweyî û şer bê afirandin.

-Li herêma Cizîrê qadên ku rezervên petrolê ne, di nav herêmên leşkerî de bên hesabkirin, ewlehiya wan bê sazkirin, li dor van herêman Erebbên bicihkirin.


-Ji bo Erebbên ku li van deran bên bicihkirin, divê gund bên avakirin û Erebbên li vir li qada leşkerî bên perwerdekirin û biçekkirin.

-Di serî de herêma Cizîrê, li herêmên ku hişmendiya neteweyî ya Kurd heye, divê teqez mafê hemwelatîbûnê neyê dayîn, bê nasname bên hiştin.

Yên di raporê de hatine diyarkirin piştî ku ji aliyê rejîma BAAS'ê hatin qebûlkirin û yasakirin, vê carê jî ji bo bikevin meriyetê di Adara 1963'yan de yasaya Rewşa Awarte hatibû derxistin. Rêxistinên dendik ên Rejîma BAAS'ê, El Cewiye û Emîn Siyasî, rêxistinên îstîxbaratê yê Emîn Eskerî (Mûhaberat), bi vê yasayê ve bibûn xwedî rayeyên berfireh." (lekolin.org Ji Duh Heta Îro Polîtîkaya Dewleta Sûriyeyê ya Têkildarî Kurdistan)

Yên li jor hatine nivîsandin, bi awayekî gelekî eşkere polîtîkaya fermî ya dewleta Sûriyeyê tînin ziman. Ev pêvajoyê, dema sala 1973'yan Hafîz Esad tê ser desthilatdariyê hinekî "nerm" dibe, lê bi awayekî nixumandî dîsa hatiye domandin. Her çiqasî sîstem di pêkanîna de bi rengê nerm xuyabe jî, piştî sala 2004'an de wê rûyê faşîst ê Rejîma BAAS'ê xwe bi awayekî herî berbiçav bida der.





CÎGERXWÎN



OSMAN SABRÎ

Li Qafkasyayê Rewşa Kurdan



Kurdên ku li dewletên cîranê Kurdistanê jiyane, bi giranî jî piştî berxwedanên li parçeyên Bakurroj-hilat û Başûrê Kurdistanê hatine. Bi taybet piştî Berxwedana Agiriyê, gelek Kurdên ji Serhedê derbasî milê Ermenîstanê bûne. Bi avabûna sînoran re jî Kurd ji xakên xwe hatine qutkirin. Helbet, hê ji mêj ve Kurdên ku koç kirine an jî bi neçarî reviyane û çûne Qafkasyayê jî hene. Wek nimûne, Sallahaddîn Eyyubî yê wek Şûrê Îslamê derbasî dirokê dibe, esas wê wek zarokê malbateke ku neçar maye ji xakên îro wek Azerbaijan tê zanîn koçber bûye, li Tîkrîtê were dinê. Ev tenê jî nîşane

ye ku Kurd hê ji mêj ve li Qafkasyayê jiyane. Heta di salên B.Z. 600'î de tê zanîn ku Med, Manai û Alanî jiyane. Li ser vî esasî, hebûna Kurdan a li Qafkasyayê xwedî dirokek kevn e.

Li gel atmosfera pozîtîf a Şoreşa Cotmehê, gel bûn xwedî şans ku karibin xwe bînin ziman. Di vê atmosfera erênî de li herêma Laçîn a mabeyna Azerbaycan û Ermenîstanê de ku Kurd lê zêde ne, di 7'ê Tîrmeha 1923'yan de statuya Kurdistanê otonom a wek **Kurdistanê Sor-Kurdistanê Uyezdi** tê zanîn, tê bidestandin.

Kurdistanê Sor heta sala 1929'an jî hebûna xwe didomîne. Her çiqasî sedema wê zêde nehatibe fêmkirin jî, piştî vê pêvajoyê Kurd bi awayekî sistematîk bi darê zorê bi ser tevahî erdnîgariya Sovyetê ve tîn ajotin. Tê gotin ku ji ber têkiliyên Stalîn û Tirkîyeyê ne. Jixwe piştî Berxwedana Agiriyê jî, Kurd li çar aliyên Yekîtiya Sovyetê hatin belavkirin û zext li wan hat kirin. Ev jî van gotinan piştrast dike. Dîsa wê pêlên koçberiyê çend caran dubare bibin. Em dizanin ku di salên 1937 û 1947'an de pêlên wisa yên koçberiya bi darê zorê pêk hatine. Ev koç wek tê zanîn ne ber bi jiyangehan e. Di van koçberkirinan de ku di orta zivistanê de bi vagonên trenên bar û heywanan pêk tê, bi hezaran Kurd mirine, li cihê ku tu dibêji qey ji bo mirinê hatine şandin, Kurd bi zehmetiyên cidî re hevrû bûne.

Wisa jî Sovyetên ku ti danûstandinên wê bi Kurdan re nîne, dikeve nav wan sepînerên polîtîkayên helandinê. Hebûna xwe ya çandî domandine. Lê ji welatê xwe dûr, xakên xwe dûr û bi bîrîkirinê Kurdistan jiyane, li milê din jî roj bi roj bi xeteriya helandinê re hevrû mane. Ji bo ev nebe jî, Kurdên li Sovyetê giranî dane li ser xebatên ziman, dîrok û çandê. Bi vê nêzikatiya bihîzîyar ve çiqasî tevkarî bi Kurdistan û gelê Kurd kirine, piştî bi salan tê fêmkirin. Bi dehan dîroknas, wêjevan, hunermend û lêkolînerê ku folklorê Kurd berhev kirine, li vê erdnîgariyê ji bo bîreweriya neteweyî ya li Kurdistanê tinenebe, tevkariyên mezin kirine. Kurdo-yev (Qanadê Kurdo), Celîlê Celîl, Casmê Celîl, Ordixanê Celîl, Şakiro Mîgoyan, Halît Mûrad Çeto ji van çendek in. Bi bandora vê bihîzîyariya çandî jî, wê ji Qafkasyayê, wek me got, piştî bi salan jî bi sedan ciwanên Kurd biherikin refên berxwedanê yên çiyayên azad.



Pêşketina Îxaneta li Hemberî Xwe û Welatê Xwe

Gelê Kurd, li her çar parçeyan çawa ku li ser xaka xwe miamelêk biyaniyan dibîne, her wiha li xwe jî biyanî dibe. Li her parçeyî jî asta vê cuda ye. Dab û nêrîtên (rêûresm)Kurdan çawa kêmtê dîtîn; çanda serwerên dagirker jî bi zorê empozeyî gel tê kirin. Ji vê hê xerabtir jî nixên çandî yên ku li ser vê xakê bi hezaran salan dewam kirine û rafîne bûne, wek sehaya pêşketin û berbelavbûyîna Tirkîtiyê tê dîtîn û tê mêtin. Pêkanîna şerê taybet a li Şiliyê wek *“bîst derew dibin rastiyeke”* tê zanîn, li Kurdistanê bi awayekî tewtewe wê bikeve meriyetê. Dewlemendiyeke çandî yên ku di esasê xwe de Kurd e, lê şiklê pêşkêşkirinê, piyasayê Tirk e, wê ewqasî bibe male Tirkîtiyê ku tew wê Kurd ferq jî neke.

Dema tê gotin, *“Diyardeya ku mirov dike mirov, zanist e”* rêka derketina ji cehaletê di pirtûka pîroz Quranê de *“îqra”* ye. Ango, *“bixwîni”*. Lê li Kurdistanê ev *“îqra”*, deriyê dûrketina ji cewherê xwe ye, li ser vê esasî jî ketina nav cehaletê ye. Piştî tepeserkirina berxwedanan, gelek mirov, malbat û eşîr ji cih û warên xwe tên kirin, sirgûnî naverastên Tirkiyeyê tên kirin. Ji bo paşdemayîyan jî hewl hatiye dayîn ku li dibistanên şevînî bi Tirkîtiyê ji nasname û çanda Kurd bîrê dîrxistin. Heta ku mejî neyên qezençkirin, ti destkeftî mayînde nabin. Ji ber ku wê tehlûkeya potansiyel her li ber derî be. Qişle (leşkergeh) qadên pêşxistina leşkeran e. Lê belê, ji bo Kurdan dibistan bûne qişle. Deh bendên Sirûda Îstîklalê bi zarokên ku Tirkî nizanin-fêr nakin didin jiberkirin. Gelek ciwan, bêyî bizanin çi diaxivin, çi dixwînin çûne dibistanan. Li milekî zarok bi vê çanda nû tên perwerdekirin, ji bo mezinan jî ji bin ebyayê çê hatiye nîşandan. Her tim gund bi gund, gundik bi gundik

bot û nizeyên leşkeran hatine nîşandan. Bi zorê girtine leşkertiye, desteserkirina malan, li meydana avêtina nav feleqeyan hin rastî ne ku di mejîyan de bi cih bûne. Pêdiviyek dewletbûyîna jî ew e ku divê xurtbûyîna xwe pê bide hesandin. Dewleta KT ev bi awayekî “xurt” pêk aniye.

Dewlet a ku ji bilî vê polîtîkaya esasî, li ba kompradorên feodal jî pêwendiyên xwe bi xurtî danîne, amûra ku wê bikaribe bandora xwe li goşeyên herî dûr ên Kurdistanê jî bike dîtiye. Şêx, reîs, axa û heta digihêje karaktera hevkar a çîna serwerên Kurd jî bi kar aniye û heta dawiyê rê li ber xwe vekirîye ku hikmekî tam li Kurd bike. Wê çîna hevkar a xwefiroş derxe pêş û giştî tevgerên ku dikarin bi pêş bikevin hê beriya ava bibin, bidin fetisandin. Dewlet a ku “*bi modela dewleta laîk, civaka bêîmtiyaz*” derketiye holê, destên şêxan maç kiriye, qîmetê axayan jî girtiye.

Çîna serwer a Kurdan a hevkar li ser piyan girtiye, her wiha zarokên hin malbatên ku li Kurdistanê bi bandor bûne jî mîna Osmanîyan li Babialîyan gihandîne. Li gor planên xwe perwerde kirine, xistiye pozîsyonek xizmetkarê dilsoz, hem jî li dijî tevgerên azadiyê wek kontra amade kirine.

Dewleta Tirk a ku ji bilî feraseta yekperest a dirûşmeya “*Tek ziman, tek millet, tek al, tek dewlet*” nizane, yên li derveyî vê qebûl nake. Eger bixwaze di nav de cih bigire, wê destpêkê îxanetê li dijî rastiya xwe bike. Ewîl wê nasnameya xwe red bike. Wê ji qral hê bêhtir qralparêz be ku were qebûlkin. Çîna serwer a hevkar a Kurd, çiqasî ketibe nav çirava îxanetê, ewqasî hatiye qebûlkin. Her wiha, her ku îxanet hat qebûlkin û bicihkin, ferdê Kurd ê ji xwebûnê dûr ketiye, hê zêdetir li xwe biyanî bûye û gihayiye binê îxanetê. Ev ketinek wisa ye ku, ferd an jî ferdên ku ketine nav vê çirava îxanetê, dihesibînin ku karekî gelekî bi rûmet kirine. Sepînerê sereke yê ku gelê Kurd jehrî dîkin mamosta ne. De îcar mamosteyên Kurd ên ku Tirkî fêrî zarokên Kurd dîkin, Kurdî didin jîbîrkin û qedexekirin jî ewqasî li xwe biyanî bûne ku pişeyê xwe pişeyê herî rêzdar dibînin û ji vê jî bêguman in!

Ev diyardeya îxanetê ewqasî hatiye kûrkin ku înkareke ti kes nikare qebûl bike bi ferdan dane qebûlkin. Mînakek baş jî helbesta hozanekî Kurd, Elewî, Bazarcixê ye ku borîjena (borazanî) Tirkî û Tirkparêziyê dike.

Wisa dinivîse,

“Yên ku destpêkê ji Asyaya Navîn xwe dane der,

Em Tirk in ku me êrîşî çar aliyan kirine

Yên dergûşa medeniyetê ava kirine,

Em Tirk in ku me dîrok li cîhanê berbelav kirine”

Eger em tevahiya helbestê li vir bidin, kesekî ku piçekî jî hestên wî yên mirovahiyê hebin wê ji şermê serê xwe bera ber xwe bide. Lê diyar e ku helbestvanê vê helbestê, hem jî helbestvanê Elewî-Kurd, dibe ku ne di ferqa vê rewşê de be jî. Rejîma bişavtin û qir-kirina çandî ewqasî kûr çûye! Helbet ev rewş jî ber xwe pêk nehatiye. Sedemên kûr hene ku gelekî ewqasî ji cewherê wê dûr dixê, ewqasî qatilhez dike. Divê sedemên vê bîrzanî.

Dîroknasê Kurd ê bi navê Mehmet Bayrak, sedemên vê rewşê baş analîz dike. Projeya T a Hesên Reşîd Tankût ku dîroknasê sereke yê Atatürk e, bi berfirehî vedibêje. Mehmet Bayrak, projeya T wisa dinirxîne:

“Kurdistan, bi esasgirtina ava Firatê divê bi şiklê (T) bibe 3 parçe û li ser vê (T) yê jî “Bendek Tirkîtiyê” bê avakirin. Li rojavayê (T) yê hê zêdetir Kurmancên Qizilbaş-Elewî, li rojhilat hê bêhtir Kurmancên Şafîî, li bakur jî hê zêdetir Zazayên Qizilbaş dijîn. Lewma jî divê destpêkê di navbera Zazayên Qizilbaş û Zazayên Şafîî de, dûvre jî di navbera Kurmancên Qizilbaş û Kurmancên Şafîî de “Benda Tirkîtiyê” bê avakirin. Bi taybet jî ji ber nasnameya wan a Elewî, “Tirkkirina” Zazayên Qizilbaş û Kurmancên Qizilbaş hê rehetir e.”

Pişî sala 1925’an wê projeya T’yê gav bi gav bikeve meriyetê. Heft T’yên ku li jêr hatine nivîsandin jî, ji bo li Kurdistanê projeya T pêk were, T’yên ewil in.

Te’dîb; terbiyekirin, biedepkirin.

Tenkîl; cezakirin.

Taqîl; qetilkirin.

Tehcîr; koçberkirin.

Temsîl; bişavtin.

Temdîn; medenîkirin.

Tasfiye; qedandin, bêbandorkirin.

Wek nimûne, qada Başûrojawa ya îro ku Dewleta KT ev “T” bi şiklekî bi bandor pêk anîne, eşkere ye ku encamên mezin bi dest anîne. Rastiya ku heta îro jî di bişavtinê de ewqasî bandorker e, plan û projeyên van “T”yan e. Halbûkî hê heta beriya sed salan jî li van deveran Kurdînî gelekî xurt û zindî ye. Ev rewş ji aliyê **Serdar Noel** ku di salên 1919’an de li Kurdistanê geriyaye û hewl dide di Şerê Rizgariya Neteweyî de Kurdan li gor berjewendiyên Îngilîzan bi kar bîne, wek bîranîn di xebata **1919 Kurdistan** de hatiye îfadekirin:

“Ji bilî 50-60 kilometreyên ewil ên Dîlokê, nifûsa ku ez lê rast hatim bi giranî (nêzî %70-80) Kurd bûn. Li hema hema her cihê ku min serdan kir, min dît ku hestên xurt ên milliyetgiriya Kurd hene, min dît ku li dijî Tirkan antîpatî û nefreta li dijî rêveberiyê heye. Kurd bi giştî li dijî rêveberiyê xwedî hestên îsyane ne, lê niha ev hest, ji ber mirovê Kurd ê ji rêzê hatiye tepisandin, ne zindî ye. Lê dîsa jî ji bo destpêkirina îsyaneke pêdivî bi çîrûskek derveyîn nîne.”

Erê; em jî careke din bibêjin ku ji bo ferdek, civakek li dijî xwe bikeve nav îxanetê û ji rastiya xwe dûr bikevin, “T” bi tundiyeke mezin hatine bikaranîn.

Di nivîsekê de li beramberî pîrsa ku îxanet çi ye, ev bersiv hebû; *“Jiyan, ji bo îxanetkaran komediyek; ji bo yên îxanet li wan hatiye kirin jî trajediyek e.”* Dema îxanet tê gotin, yek ji navên sereke yên tîn bîra mirov sîxurê navdar ê Îngilîz Kim Philby ye. Philby ê li Hindistanê ji dayik bûye, li Cambridgê perwerde dîtiye û ji bo dualî bixebite jî di sala 1940’î de tevî MI-6 (Serwîsa Sîxurtiya Derve ya Îngilîzan) tê kirin. Philby, heta sala 1963’yan bêtî tîştêkî bide hesandin, ji Rûsan re dixebite. Dema deşîfre dibe jî xwe diavêje dextlê Rûsan. Ha ev Philby îxaneta xwe wisa di-parêze: *“Ji bo îxanet neyê kirin, divê mirov aîdî cihekî be. Lê, ez ne aîdî ti derê me.”* Yê ne aîdî derekê ne, dema li cihekî dijîn, hinên din dijîn û mîna hinên din difikirin herî dawî digihêjin îxanetê. Mînakek hê xweştir jî îxaneta li dijî Sezar e.

“Îxanet, di kêliyêk jiyane de an jî di demek zehf girîng a pêdiviya piştgiriya de dikare xwe bide der. Mînak, wek gotinên Sezar ku

piştî di bin peykerê Pompeius de darbeya bi dehan xencerên ji piştî xwar, beriya bimore dibêje û dike malê dîrokê “Ma tu jî lo Brûtûs”. Ew qêrîna ku dibîne yekê din ê xencerê lê dide jî Brûtûs e û şaşwaziya xwe ya li beramberî vê îxaneta ku ji dostê wî yê herî nêz hatiye tîne ziman, domahiya dîrokê wek nîşaneyê îbretê di mejîyan de hatiye neqşandin...”

Bi kurtasî, îxanet avabûnek wisa ye ku jiyanê bi şiklekî radiwestîne, mîna wezîfeyek şokkirinê dibîne! Rev e ji xwe! Dirûv-guherîn e! Dûrketina ji mirovahiyê ye! Ew, bi gotina Immanuel Kant, “*sosret in ku bi asîmanên tijî stêrk ên li ser hinan, tercîh dikin ku ji yasayên xwe yên exlaqî dûr bikevin.*” Kesekî ku ji xwebûnê dûr e, xwe nanase û bi çanda xwe nagihêje, diyar e ku wê xêra wî destpêkê li wî nebe. Wek çawa wê li ba gelên din jî têkiliyek bi tendurist daneyne, eşkere ye ku wê silek (agresîf) û nexweş be.

BEŞA HEYŞTEMÎN: HIŞYARBÛYÎNA NETEWYÎ Û ŞERT Û MERCÊN AVABÛNA PKK'Ê

Ezmûnên Rizgariya Neteweyî

Di 1970'yan de gelek şertên derve ên girîng hebûn ku îstîqamet dan tevgera Apoyî. Du sîstemên cîhanê yên ku li ser esasê Şoreşa Cotmeha pêş ketiye, piştî Şerê Parvekirinê yê Duyemîn bi dijiwartir derdikeve. Di navbera sîstema sosyalîzma pêkhatî û sîstema kapîtalîzma emperyalîst têkoşînek cidî heye. Sîstema sosyalîzma pêkhatî bi pênaseya wê rojê ve hikmê xwe li ser ji sisiyan yekê cîhanê dikir. Yekîtiya Sovyetan, Çîn û Kuba û her wiha hin welatên Asya û Afrîkayê jî di nav vê sîstemê de dihatin nirxandin. Ji bilî van jî gelek welatên ku têkoşîna rizgariya neteweyî meşandine – mîna Cezayîrê- xwe nêzî vê blokê didîtin. Her wiha bloka sêyemîn (welatên bêblok) a ku jî welatên cîhana sêyemîn ên wek Hindistanê pêk dihat jî zêde ne biyanîyên bloka sosyalîst bûn. Wek nakokîya herî girîng a mabeyna sîstema sosyalîzma pêkhatî û kampa emperyalîst mohra xwe li pêvajoyê dide.

Di şertên derketina tevgera Apoyî de, li cîhanê tevgerên zehf xurt ên rizgariya neteweyî hene. Vîetnam, di nav van de xwedî pozîsyonek wisa ye ku herî zêde hêviyê û deng dide. Gelê Erîtreyê têdikoşe. Li Gîneyê di pêşengiya Amîlcar Cabral de di destpêka 1970'yan de serkeftin bi dest tê. Angola di 1974'an, Mozambîk jî di 1975'an de ber bi zaferê ve diçin. Her wiha li gelek deverên cîhanê Şerê rizgariya Neteweyî hêviyên nû diagîrînin. Li Laos, Kamboçya, Nîkaragua dengê lingên şoreşê tînin bihîstin, li Şîliyê jî di lîdertiya Sosyalîst Allende de desthilatdariyên gelparêz dibin hikûmet. Salên 70'yan bi giştî wek salên ku gel li dijî emperyalîzmê radibe ser piyan û serkeftinan, zaferan bi dest tîne derbasî dîrokê dibin.

'Nîfşa Ciwanên 68'an', herî zêde jî vê pêlê bandor bûne û mîna hejandina cîhanê li her bereyê têdikoşin. Ciwan, li seranserê cîhanê li dijî nîzama kapîtalîst, bi taybet jî li dijî karaktera wê ya mezextinê (xerckirin) têkoşînek mezin dimeşîne. Serhildanek e Tev-

gera 68'an ku li dijî karaktera mezextinê ye, li dijî gefa nukleerê ya li ser jiyane ye, li dijî bêedaletê ye. Tevgera 68'an ku ne homojen e, ji femînîstan heta ekolojîstan, ji homoseksuelan heta hîppîyan, ji çepgirî heta demokratî, heta anarşîstan qadek berfireh di nav xwe de dihevine. Ji bajarên mezin rev hene û jiyane li gundewaran tê pêşxistin. Helwestekî li dijî çanda emperyalîst derdikeve pêş. Avahiyên radîkal ên mîna Fraksiyona Artêşa Sor a Elman, Tûgayên Sor ên Îtalyayê ku ji Tevgera Ciwanên 68'an bandor dibin jî ava dibin. Ji bo nêzîkatîya li beramberî jinê, ekolojîyê û civakê dengê lingên zîhnîyeta nû ye Tevgera 68'an!

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan di xebata xwe ya **Parastina Gelekê** de wiha dibêje; **“Salên 1970 di dîroka sîstema kapîtalîzmê de destpêka pêvajoya şikestîneke girîng bû. Sîstem ji Şerê Cîhanê yê Duyemîn bi ser xwe ve hatî derketîye, pêşengiya DYA zelal bûye, Ewropa jî nû ve rabûye ser piyan, Japoniya wek dêwê Rojhilata Dûr hişyar bûye. Sîstema Sosyalîzma Reel ber bi lûtkeyê ve hildikişê, tevgerên rizgariya neteweyî di çaxa xwe ya herî bi hêz de ne. Tam di vê nuqteyê de tevgera ciwanên 1968'ê şoreşeke nû ya zîhnîyetê didan destpêkirin.”**

Abdullah Ocalan, têkildarî salên 1968'an de nîrxandînek hê berfirehtir jî di parêznameya **Pirsgirêka Kurd û Çareserîya Neteweya Demokratîk** de wiha radigihîne:

“Şoreşa 1968'an bi awayekî bingeîn wek şoreşa îdeolojîk di qada çanda manewî de teqîya. Li ber çanda modern, li ber tevahiya şaxên wê yên lîberal, rastgir û çepgir radibû. Di vê çarçoveyê de şoreşeke girîng bû. Bi kêmanî bi qasî Şoreşên Polîtîk ên Franse û Rûsyayê şoreşeke îdeolojîk bû. Hegemonya îdeolojîk a modernîteyê ji dema ku hatibû avakirin û vir ve cara pêşî şikest xwaribû. Ji sedan salan ve li ser navê homojenkirina civakê gelek hemanên civakî yên çandî, cinsî, dînî û xwecihî hatibûn girtin, asîmîlekirin û heta qira wan hatibû anîn ji bo şerên nasnameyê rabûn. Ji vê serîrakerîne re ciwanan pêşengî kir û ev jî bi serê xwe manedar bû. Ji ber ku ciwan beşê civakê yê modernîteyê herî kêmandor lêkirî bû. Şoreşa îdeolojîk bi tenê li dijî lîberalîzma kapîtalîst nedihat meşandin, bi qasî dewleta netewe ya lîberal bi dewleta netewe ya sos-

yalızma pêkhatî re jî têkiliyên xwe birîbûn. Li beramberî îndustriyalîzmê dijberiya îdeolojîk cara pêşî bû ku bi vegotinên bi hêz ên teorîk xwe îfade dikir. Femînîzmê bi kêmanî bi qasî teoriyên çînî xwe gihandibû argumanên girîng ên teorîk. Nasnameyên çandî yên ji rêûresmê îspat kiribûn ku bi qasî nasnameyên modern hêja ne, û dest ji wan nabe. Hatibû fêhmkirin ku teoriya neteweparêziya modern rewakirina etnîsîteya serdest e û ne tişteki din e. Derketibû holê ku ji îdeolojiyên wê demê ya herî populer û muteber fikra rizgariya neteweyî ya modern û pratîka wê bi qasî tê gotin ne antî-kapîtalîst û rizgarîxwaz e. Dîsa mirovan gelekî guftûgo dikir ku sosyalîzma pêkhatî ji modernîteya kapîtalîst nabihure, berevajî sistêmê bi hêz dike. Demokratbûna sosyal demokrasîyê ji zû ve kiribûn pelê mêmê yê ku eybên kapîtalîzmê vedişêre, dinixumîne.”

Zimanê demê, çalakî bûn. Ne axaftina zêde, vegotina zêde bû. Karaktera demê pêkanîna gotin û axaftinên xwe bûn. Ji bo vê wek nimûne nirxandina Che ya bi navê **“Tenêtiya Vîetnamiyan”** heye. Her kes destekê dide Têkoşîna Rizgariya Neteweya Vîetnamê. Ji lîderên Sosyalîst Enternasyonal ên li Ewrûpayê Olaf Palme li ba ciwanan tevî pêşandanên protestoyî dibe. Her wiha, Bill Clinton ê ku wê dûvre bibe Serokê DYA jî wê demê tevî van pêşandanan dibe. Che Guevara dibêje ku, mirovahiya pêşverû radgihîne ku piştî gelê Vîetnamê digirin, ev dişibe helwesta pleban ku li arenayên Romyê çepikan ji bo gladyadorên lê didin û diyar dike ku ev jî îfadeya bûyerekê ye: *“Her du gladyatorên ku li arenayên Romyê li hev didin jî kole ne. Pleb jî çepikan ji bo egîdiya van lê didin. Lê belê, li wir koleyên hevdu tine dikirin. Ev şiklekî tinazê ye. Pleb, îfadeya bûrjûvayê biçûk ên roja me ne.”* Dûvre jî Che wisa dewam dike: *“Piştigiriya esasî jî meşa mil bi mil e ku yan ber bi serkeftinê yan jî mirinê ye. Eger tu bi gelê Vîetnamê re mil bi mil bî, li cem şer dikî, wê demê dikarî bibêjî ku tu destek dikî. Ev bi çî mimkun e? Divê tu li welatê xwe berxwedanê bi pêş bixî.”* Ruhê 1970’yan, di van gotinên tijî coş ên Che de bi zelalî xwe nîşan dide.

Tevgera Şoreşgerî ya Tirkiyeyê

Gotinên tijî coş û kelecana Che, bi şiklên cuda be jî di nav Tevgera Ciwanên Tirkiyeyê de rû dida. Ciwan, di 70'yan de tevahî qad tijî dikirin. Dengê wê geş û bêters bû.

Piştî darbeya 1960'î, her ku çû li Tirkiyeyê pêlek çepgir serwer bû. Ewîl, partî û tevgerên bi şiklê TÎP'ê (Türkiye İşçi Partisi-Partiya Karkeran a Tirkiyeyê) li ser hîmê legal, lê hê zêdetir lîberal dikir bi pêş ket, piştî dawîya salên 1960'an jî rêxistinên şoreşger ên hê radîkaltir ên mîna THKO, THKP-C û TİKKO hatin avakirin. Êdî rojev ew e ku bi rejîma heyî re nameşe û li ser vî esasî jî pêdivî pê heye ku bi şoreşekê destwerdan çêbibe. Li milekî ciwanên çepgir radîkal ronî didan gel, li milê din jî sosyal demokrat hene ku hê nermtir in û karê wan her tim taloqkirin bû û dixwestin hem di nav dewletê de cih bigirin hem jî wisa bi pêş ve biçin. Bizavên sosyal şovenîst jî di wê demê de têra xwe hene. Gelek rêxistin û kesên mîna Dogu Perînçek vê nêzîkatî dipejirandin, her wiha yên wisa jî hebûn; *“Ewîl rizgariya Tirkiyeyê, dûvre mafên Kurdan.”*



DENİZ GEZMİŞ



Mahîr Çayan û Şehîdên Kizildere



İBRAHİM KAYPAKKAYA



SÎNAN CEMGÎL

Gelek rêxistin jî xwedî helwestên wisa ne ku hê paşverûtir in û tu dibêjî qey vê pîrsgirêkê nabînin- ji nedîtî ve tîn. Lê, nêzîkatiya Mahîran, Denîzan, Îbrahîman, Sînanan, Huseyînan û Yûsûfan ku wek lîderên demê yên ciwanan derdikevin pêş û bi berxwedanên xwe yên bi heybet ve dibin abîde, li beramberî pîrsgirêka Kurd erênî bûye. Abdullah Ocalan, bîranînek xwe ya Mahîr Çayan wiha vedibêje:

“Bîranîna min a dawî ya li Stenbolê derbarê civînekê de ye. Civîn li Maçkayê li salona Zanîngeha Teknîkê ya Stenbolê pêk hatibû. Nizanim çawa çêbû, ez jî li salonê bûm. Salon gelekî qelebalix bû. Yek ji civînên herî krîtîk ên Dev-Gencê bû. Ji nişkê ve Mahîr Çayan, Yusuf Kupelî û Munîr Remezan Aktolga (Aktolga dibe ku navê şaş be, dibe ku navê rast Sînan Kazim Ozudogru) ketin hundir. Pêşeng Mahîr bû. Bi şeweyekî şoreşgerî dest danî ser mîkrofonê û axaftineke dirêj kir. Ji axaftina wî tiştên di bîra min de mane ev in: “Revîzyonîzm tehlûkeyeke ciddî ye, xwe li Marksîzmê alandiye; weke ku di her meseleyê de kirî, di meseleya Kurd de jî (ez cara pêşî dibihîsim ku nav li meseleyê tê kirin) oportunist tevgeriaye. Netewe bi xwe çarenûsa xwe diyar dikin û meseleya Kurd jî ev mesele ye. Eger Kurd bixwazin dikarin mafê xwe yê avakirina dewleteke serbixwe bi kar bînin. Li vir erka dikeve stûyê me

Marksîstan ew e, ji bo Kurd bigihîjin vî mafê xwe divê em destekê bidin têkoşîna wan.” Bi awayekî vebirî bandor li min kiribû. Tîmsalê şoreşgertiyê bû. Şoreşgerek bû ku ji serî heta binî gotin û çalakiyên wî hevdu digirtin. Eşkere ye ku yek ji wan kesayetên e, gelekî bandor li min kiribû.”

Dema Denîz diçe sêdarê, wê bibêje, **“Bijî Tirkîyeya tam serbixwe! Bijî biratiya gelên Tirk û Kurd!”** Ev nêzîkatiyên nû ne ku di nav Çepên Tirkîyeyê de xwe didin der. Derketinên diyarker in ku dijberî û reda nêzîkatiya şovenîst îfade dikin.

Şoreşgerên Kurdistanê, bi taybet jî Abdullah Ocalan, ji ber ji Mahîr û Denîzan bandor bûye, hê zêdetir xwe nêzî THKO û THKP-C dibîne. Ji ber vê jî ti lêgerînên rêxistinbûyînek cuda çênabin. Ji ber ku azadiya gelê Tirk, di azadiya gelê Kurd de ye. Tersê wê jî bi heman şiklî rast e. Lê çi heye ku; ji lîderên Tevgera Çepgir ên Tirkîyeyê piştî ku Mahîr Çayan û hevrêyên wî di 30’ê Adara 1972’yan de li Kizildereyê hatin qetilkirin; Denîz, Yûsûf û Huseyîn di 6’ê Gulana 1972’yan de hatin îdamkirin; Îbrahîm Kaypakkaya yê ku li zindanên Amedê ser da, lê sir neda bi êşkenceyan hat qetilkirin; Sînan Cemgîl li Golbaşı-Îneklî hatin qetilkirin, wê demê di nav Tevgera Çepgir a Tirk de krîza lîderiyê çêbûye.

Tevgerên Çepgir û Reformîst ên Kurd

Di atmosfera îzafî demokratîk de ku piştî darbeya 1960’î ava bû, pêvajoya bi TÎP’ê re dest pê dike û bi Doğu Mitingleri (Mîtingên Rojhilat) dewam dike. Piştî 1960’î û di destpêka 1970’yan de mîna DDKO, rêxistinên cur bi cur ên Kurdan tîr damezrandin û li gel van jî kovar tîne derxistin.

Piştî ku di sedsala 19’emîn de berxwedanên neçarî yên Kurdan hatin tepeserkirin û dûvre jî tepisandin, li gel bişavtina zêde jî di sedsala 20’emîn de atmosferek zihnî ya bêbawer ava kiriye. Têkçûn bûne sedem ku Kurd hem bi xwe hem jî li beramberî derveyî xwe bêbawer bibin û her ku çû jî bû sebeb terikandina nasnameya xwe. Ev rewşa ku derketiye holê, bûye problemên zehf cidî ku Kurd nikaribin daxwazên xwe yên azadiyê ji nû ve biafirînin û van bang bikin. Ewil, avahiyên nû yên ku pêşengtiya wê

kesên bi çanda serwerên Kurd dagirtî dikin, çêdibin. Ev, xetên ku dikarin mîna milliyetgirên berê û teslimkarên reformîst ên li gor PDK-I'ê bîn pênasekirin, ava dikin. Di esas de jî ne meşeke wisa ye ku Kurd li ser piyên xwe bin. Hem di destpêkê de hem jî di encam de xwedî xetêke wisa ye ku xwe dispêre hêzên derve. Hewldana ku çareserîya pîrsgirêka nasnameya Kurd di nêzîkatiyên teng, milliyetgirî yan jî reformîst de dibînin, meylên azadiyê di nav sînorên milliyetgiriya teng de heps dikin.

Di esas de, têkildarî nasnameya Kurd daxwazek nêzî statuya Osmaniyan hebû. Ji ber vê ye ku rêxistinên Kurd li milekî hewl didan cêwazbûyîn û nefreta mabeyna gelan pêş bixin li milê din jî wek polîtîkayek esasî xwe nêzî dewletên emperyalîst dikirin. Ev meylên ku ji hêzek din bendewariyê dikin û xwe dispêrên hêzeke din, hê ji serî ve diyar bû ku nikarîbûn bibûna bersîva pîrsgirêka azadiya Kurdan. Yekî dixwest di nav burokasiya hêzên biyanî de cihê xwe qayim bike û bibe xwedî par, yekî din jî li ser hîmê hevkarîya hêzên biyanî pêşengtî dikir armanc. Yekî, li ser esasê hevkarîyê dixwest ji bo karaktera xwe yê çîna serwer statuyekê derxe pêş, yê din digot wê pîrsgirêk bi daxwazên mîna rê-dibistan-av-elektrîkê bîn çareser kirin. Lê belê, problema azadiya Kurdan gelekî kûr û berfireh bû. Her wiha hema hema her kesî jî dikarîbû bi hêsanî li ser polîtîka û berjewendiyên xwe jî pêk bînin. Ewqasî jî rojane û nazenîn bû. Dema pîrsgirêk wisa seranser, bêtîr bîrewerîya dîrokî û li gor berjewendîyan hat nîrxandin, bêtîr wê demê jî ancax tevgerê Kurdperest a ku van bes dibîne dikare bê avakirin. Lê mixabin, birînen gelê Kurd ewqasî kûr bûn ku bi van nikarîbû bihatana pêçan. Jixwe, daxwaza rê û dibistanê jî di warê dîrokî de bi temamî xefletek e ku ne di ferqê de ye bê ka çi daxwaz dike. Ev daxwaza ku dixwaze li Kurdistanê avahiyek faşîst a ji bo qirkirina çandî ya Kurdan sondxwarî ye saziyên bişavtinê ava bike, eger em bi kurtasî îfade bikin; bêtîr mayîna ji têgihiştina dîrokî ye.

Rewşa Li Parçeyên Din Ên Kurdistanê

Di salên 1970'yan de parçeyê ku li Kurdistanê derdikeve pêş, Başûrê Kurdistanê ye. Me behsa tevgera Komeleya Marksîst Lenînîst kiribû ku di 1970'yan de li Silêmaniyê hatibû damezrandin. Lîderên vê tevgerê ciwanên xwendekar in. Xalê Şehab, Aram,

Elî Asker, Dr. Xalid û gelek şoreşgerên ciwan ên wisa rêzdar; wê ji Tevgera Şoreşgerî ya 1968'an bandor bibin. Lê di wan salan de hêza çekdar a ku li Başûrê Kurdistanê bi bandor e, Barzanî ne. PDK-I'ê ye.

Tevgera PDK-I'ê ya bi pêşengtiya Barzaniyan, bi taybetmendî û polîtîkayên feodal ve li şûna ku bi tarzekî pêşverû, bi çaxê re yekgirtî û li ser vî esasî jî tevî pêla demokratîkbûyîne ku bi Tevgera Ciwanan a 68'an tê li giştî cihanê tê lezandin, bibe û kûr bike, berevajî tarzê hevkar feodal ê ku jixwe li Kurdistanê heye û bi sedan salan li serê gelê Kurd bûye bela, hê bêhtir kûr kiriye. Her çiqasî li ser esasê milliyetgiriya berê temsîla Kurdbûyîne hatibe kirin jî, ji ber polîtîkayên meşandî û zîhniyeta paşverû zehf zerar daye.

Feodalîzm, li gor karaktera xwe hevkar e. Eger mijar jî bijartiyên feodal serwer bin, ev tê wateya ku têkoşîneke xwe hê bêhtir dispêre derve, ev jî yan îşyan e yan jî teslîmbûyîn e. Tew îcar bijartiyên serwer feodal ên navbihurî li Rojhilata Navîn kokdar bin û erdnîgariya wan jî Kurdistan be, vehûna hevkar a di dîrokê de dixebitî, wê bi awayekî hê kokdar xwe bide der.

Her çiqasî li Başûrê Kurdistanê cih bi cih berxwedanên bi heybet rû dabin û hêvî dabin gel jî, ji ber ku tevgera bi lîdertiya feodal û şêx xwe negihandiye sistemek fikrîne ya bi çaxê re yekpare, bûye qurbanê listokên pir biçûk.

Serwer, baweriya xwe bi gelan naynin. Serwer bi serweran bawer dikin. Kê zeîf dibîne dipelçiqîne, nikaribe pê jî destan diramûse. Ev kevneşopiyek feodal e. Ev kevneşopiya ku bi sedan salan di genan de bi cih bûye, di siyasê de xwe hê eşkeretir dike. Arenaya siyasê wek sifreya guran tê nirxandin. Yê ku li ser vê sifreyê ne gur be, wê mîna mihê can bide. Feodalîzm, li dijî gundîtîyê gur e. Feodalîzm, li gor mantixa xwe gur e. Lê belê, mantixê fikrîna feodal çawa ku di çaxa kapîtalîst de mehkûmî têkçûnê ye, her wiha ji bo xapandinê jî vekirîne. Ji ber ku sistema kapîtalîst sistemek wisa ye ku di warê exlaqî de civakbûyîn herî zêde belav kiriye.

Abdullah Ocalan dibêje, **“Civaka kapîtalîst kengî civaka ji rêûresmê û civaka kedkaran bike dûvikê xwe yê kole, dikare**

xwe pêk bîne. Civakên bibin dûvik jî bi tenê dikarin weke obje û alav hebin. Ew bi serê xwe zêde heqîqetekê îfade nakin. Ango rastiyeke pir qels temsîl dikin. Civaka îndîsturiyel bi tenê li ser bingehê mêtîngehkirina civaka cotkar û zenaetkar û bi heqdestê kolekirina wan pêk tê. Civaka dewleta netewe jî di berdêla kirina mîna moriyên û helandina civaka sîvîl a demokratîk û civaka li derveyî dewletê de pêk tê.” Di cihekî din ê heman pirtûkê de jî vê tespîtê dike: “Jixwe ferdperestiya kapîtalîst li ser bingehê înkara civakê bi gewde bûye. Bawer dike ku çiqasî rêûresm û çanda civaka dîrokî înkare bike wê karibe xwe pêk bîne, bi gewde bike. Berevajîkirina herî mezin a îdeolojiya lîberal jî ev e. Slogana wê ya sereke jî bi vî rengî ye, “Ferd heye, civak tineye.” Kapîtalîzm sîstemek e ku bi nexweşî û şewbê ye, û li ser bingehê qedandin û nehiştina civakê heye.”

Ji ber vê jî hema hema ti hêz nîne ku nikaribe bi îdeolojiya xwe ya lîberal bandor bike. Ev rewş jî bo çînên feodal ên serwerên Kurd, têkçûna rojane ye. Ji ber bi xwe ne bawer in, baweriya xwe bi gel jî nînin. Kesayet an jî saziyên ku bi gel bêbawer in, dikarin her tim her tiştî bifiroşin. Pîrsgirêk jî niyetan jî wîrdetir, rewşek objektîf e.

Jixwe ev rastî, di salên 1946’an de ji aliyê PDK-I’ê ve bi zelalî tê nîşandan. Dema sal dibin 1970, PDK-I’ê piştî xwe dide Îranê û wisa hewl dide li ser lingan bimîne û sûdê ji tîkiliyên Iraq û Sovyetan digire û wiha jî hebûna xwe garantî dike. Di roja me de jî xwe dispêre DYA û Îsraîlê û wer jî li ser piyan dimîne.

Di polîtîkayê de helbet sûd jî dijminê dijminan tê wergirtin. Her wiha jî bo berjewendiyên gel li cem her hêzan dikare tîkiliyên taktîk ên ku zerarê nadin berjewendiyên gel bîne pêşxistin. Lê, tîkiliyên di 70’yan de ne li ser vî esasî ne, di astek stratejîk de ne. Bi temamî piştî xwe pê girê dide. Xwe dispêre Îranê û li dijî Iraqê disekine. Wek wê dûvre jî bê dîtin, wê bigihêje wê astê ku çeka yekî bigirin, heta bibin leşkerên wî. Dema rewş wisa jî dibe ev tîkilî jî tîkiliyên taktîk an jî stratejîk wîrdetir, wek hevkarîyê xwe pêşkêş dike. Piştî, wê çekên DYA bên girtin û li dijî Ereban bikevin nav êrîşê. Ev girêdayî vê kevneşopiyê ye. Ev rewş jî di dîrokê

de wek rewşek îxanet û xwefiroşiyê derdikeve holê ku ji aliyê ti gelî ve ti carî nehatiye efûkirin.

Îran û Iraq di sala 1975'an de bi navbeynkariya Dewleta Amerîkayê li Cezayîrê li hev dikan. Ev rewş ji bo gelê Kurd tam karesatek e. Eger siyaseta hevkar bê domandin, rojekê tu yê jî bi siyaseta hevkar bê derbaskirin. Ji bo berjewendiyên hê mezintir, yên biçûk dikarin werin berdan. Jixwe Mele Mûstafa Barzanî dûvre nameyan ji Serokê DYA Nixon re dinivîse û rewşa trajîk a Kurdistan bi zelalî îfade dike. Her çiqasî wisa piştî xwe pê germ kiribe û sozên şênber jî hatibin girtin, wek çawa ti ji van nayên cih, her wiha Kurd jî bi bo berjewendiyên tîn pêşkêşkirin û bi karesatan tîn ajotin. Dibe ku ji ber vê êşê be, Mele Mûstafa Barzanî di 1'ê Adara 1979'an de bi qehrek mezin wefat dike.

Rûyê din ê madalyano hê trajîktir e. Têkoşîna li Başûr, bandora xwe li Kurdên din jî dike. PDK-I'ê hewl dide xwe li tevahî parçeyan bi rêxistin bike. Lîdertiya wê lîdertiya feodal e. Wek çawa eznavendî ye, her wiha xwedî perpektîfêk îdeolojîk a paşdemayî ye. Ji ber têkoşîna çekdarî dimeşîne, bandorek pozîtîf li parçeyên dike û tê qebûlîkirin. Dema navê "*Partiya Demokrat*" jî li vê zêde dibe, tesîra wê hê zêdetir dibe. Ji ber vê jî gelek rewşên bîr û ciwanên Kurd hatine Başûr, daxwaza alîkariyê ji PDK-I'ê kirine. Ji ber pêla sosyalîst û tabî cudabûyîna sosyokulturî ya li Kurdistanê, tevgerên ku cêwaziyên çînî di nav xwe de dihewînin, tîn avakirin. Ev tevger jî wê li Kurdistanê tevgera bi lîdertiya feodal a ku li Kurdistanê serwer e, bike du beş.

Damezrandina tevgerên bi lîdertiya gundî, kedkar û proleter, piştî salên 1970'yan e. Tevgera bi lîdertiya feodal, pêşketina gelê Kurd asteng dike, nahêle xwe bigihîne demê, meylên nû dixê bin kontrola xwe yan jî tasfiye dike. Wek nimûne jî bi kompoyan ve tasfiyekirina Rewşên bîr şoreşger û sosyalîst ê ji Bakurê Kurdistanê Dr. Şivan (Saît Kirmizitoprak), Saît Elçî, Çeko-Hîkmet Bûlûttekîn, Brûsk-Hasan Yikmiş, Sorove, Rewşên bîr Şoreşger ê ji Rojhilatê Kurdistanê Suleyman Muini, Mela Aware û Îsmayîl Şahzade dikarin bî nîşandan. Feodalîzm wek pêdiviya karaktera xwe, destûrê nade ku ji bilî wê ti hêzên din pêş bikeve. Beg û şêxên feodal wisa hîs dikan ku kes û hêzên wek alternatîfên xwe dibînin tasfiye bikin.

Tekane rêya jiyana wan ev e. Ya ku ji dîroka hevkarîyê fêr bûne, ev amentu ye.

Nêzîkatiyek din jî ew e ku xwe li çar parçeyan bi rêxistin kiriye, tevgerên li xwecih frên kirine. Ji ber rola PDK-I'ê bi girêdana hêzên derve bi pêş dikeve, PDK-I'e li parçeyên din ji mêj ve li dijî tevgerên neteweyî wek dûvikên rêxistinên cur bi cur ên sîxurtiyê derketine holê. Mînaka herî berbiçav ew e ku Dervîşê Sado yê wek sîxur tê zanîn, bû lîderê PDK-T. Li Rojavayê Kurdistanê ku wek parçeyê biçûk tê zanîn, wê rêxistinên din di pozîsyonek ji xwe zeîftir de bihêlin, li Rojhilat jî wê li dijî rêxistinên Kurdan vê rewşê heta têkoşînê bibin. Wek em ê dûvre jî behsê bikin, ev karaktera komploger, wê qismekî derbasî nav xwîna YNK'ê ya ku bi karaktera bûrjûvaya biçûk e, jî bibe –ku koka xwe kevneşopiya PDK-I'ê ye- û ev jî li ser navê Dewleta Îranê şoreşgerên Kurd qetil dikan, ji bo her keleyekî pereyan distînin. Vê jî herî baş gelê me yê Rojhilatê Kurdistanê dizane.

Li Rojavayê Kurdistanê jî rewşa giştî hê bêhtir mîna makêtek Başûrê Mezin e. Her çiqasî li her nuqtayê hin rewşenbîr kom bibin jî, rolên ku li xwe girtine hê bêhtir şopdarî ye. Her wiha, ji ber karaktera asîmilasyonîst û îmhakar a Rejîma BAAS'ê jî rastiya pasîfîzmê derdikeve pêş. Wek me berê jî ragihandibû ku qetlîama sînemayê ya li Amûdê çavtirsandinek e. Her wiha, hilweşandina bajarê Hamayê ku Birayên Misilman serwer bûn, ji bo Kurdan peyamek pir êşkere bû.

Ji ber perspektîfa îdeolojîk a bi xwe ne bawer, bê piştgirî û ne bi tendurist, Tevgera Kurdan li vir lewaz maye; ji lewazbûyîna jî wîrdetir gelek kesên ku namzetên rewşenbîrî û şoreşgeriyê ne, direvin derveyî welat û penabertî hilibijartine.

Li Rojhilatê Kurdistanê, piştî tepisandina Komara Demokratîk a Kurdistanê zêde pêşketin çênabin, rejîma Şahîtiyê jî mîna şûrê Demokles xwe daye ber pozên Kurdan. Tevgera li Başûrê Kurdistanê bandora xwe li vî parçeyî jî kiriye, tevgera li Rojhilat demak dirêj wek şopdar û temaşevanê başûr maye. PDK-I'ê ya li vir wê esas di 1979'an de çalak bibe û li Kurdistanê bê bihîstin. Di dema Şoreşa Îslamê ya Îranê de wê PDK Îran a di lîdertiya Dr. Qasimlo de bi zêdetirî 50 hezar pêşmergeyên xwe ve deng vede.

Hewcedariya Bi Tevgera Neteweya Demokratîk

Di salên 1970'yan de li tevahî cîhanê pêlek mezin a azadiyê hebû. Tevgerên Rizgariya Neteweyî yek bi yek serkeftî dibûn. Têkoşîna Rizgariya Neteweyî ya Vîetnamê wek nimûneyek bi coş di mejiyan de wisa bi cih dibû ku bê dema gel bi rêxistin dibin û li ber xwe didin çawa dikarin bigihêjin zaferê û vê îlhama xwe li çar aliyan belav dikir. Ev hewayî ku gihişt Tevgera Ciwanan a 68'an, bandora xwe li Tirkiyeyê jî kiriye û di encam de gelek tevgerên şoreşger û kesayetên lîder derketine holê. Bloka sosyalîzma pêkhatî bi rengê xwe ve nîşaneyên pêşketinê dida ber çav, kampa emperyalîst jî bi krîza petrolê ya 1970'yan ve di nav aloziyekê de bû.

Di nav Tevgera Şoreşger a Tirkiyeyê de lîderên şoreşger ên ku bi dilgermî nêzî xwişk û biratiya gelan dibûn û di vê oxirê de li sêdaran gotinên *"Bijî biratiya gelên Kurd û Tirk"* berz dikirin dihatin qetilkirin; li Kurdistanê jî tevgerên mîna PDK-T ên ku mirov nikare bêje reformîst e jî û bi karakterek bûrjûvaya biçûk e û bi giranî jî zarokên axa û hevkarên pêk tên, ji bilî bêhêvîtiyê ti tiştêkî din nedan Kurdistanê. Tevgera Apoyî, nêzî Mahîran, Denîzan e û hewl dide tevî Tevgera Çepgir a Tirkiyeyê têkoşîna hevpar bimeşîne. Lê, ev wê jî ber nêzîkatiyên sosyal şoven û ne-bihîzîyar ên Tevgerên Çepgir ên Tirk wê bêencam bimîne. Bi he-man rengî, wê hewldanên pêwendiyên li ba Tevgerên Kurd ên Reformîst û hewldanan meşandina li ser xeta şoreşger, wê bi nêzîkatiyên mîna, *"hûn çi dikin, hûn bi agir dilîzin"* hevrû bibe û mîna tecrîdkirî bibe.

Lewma, ji bo rewşa serberjêr a li Kurdistanê bê rawestandî û îmhaya neteweyî bê sekinandin, rêxistinbûyîn û çalakkûyîna tev-gerek neteweyî ya şoreşger wek pêdivî û neçariyek jiyanî xwe ferz dikir. Abdullah Ocalan, vê rewşê hê zelaltir îfade dike: **"Ti tevgera fikrê û mirov ji formên maddî yên di navê de serbixwe nikare pêk bê. Ya girîng ew e, ka fikir kîjan formên maddî nîşan dide. Dema ku mijar dibe rastiya civakî, hingê formên maddî bi xwe jî ew rewşa formên fikrê yên ava kirî û bi sazî kirî ne.**

Ziman jî di navê de, divê mirov formên civakî weke xwezayên nerm yên rêjeyên wan ên fikir û zîhniyetê pirr, binirxîne. Xwezayên nerm bi timûtim veguherîna enerjîyê û form bi-destxistina wê, pêk tên.”

Wek Parastina Rewa ya Gelekî Avabûna PKK'ê

Di çaxekî wisa de ku gelên cîhanê li pey hev serxwebûna xwe bi dest tînin û civak ber bi azadiyê ve dimeşin, êdî ev bar û şerma bi sedan salan nema dihat hilgirtin. Derketina PKK'ê jî encamek yekser a qebûlnekirina vê rewşê ye. Dema biryara pêşengtiya PKK'ê hat dayîn, bîrewerî, wêrektî, fedakarî û asta derfetan çi dibe bila bibe, divê ev gav bê avêtin. Atmosfer çiqasî nedestdayî bin û şert çiqasî zor dibin bila bibin, eger daxwaza xwedîderketina taybetmendiyên herî biçûk a mirovahiyê hebe, diviyabû ku ev gav bihata avêtin.

Wê demê pêşengtiya PKK'ê tenê destwerdanek mutewazî ye ku ji bo karibe tevahî nakokiyên li ba demê û qutbûyîna ji dîrokê derbas bike li beramberî şertên Kurdistanê ji aliyê bîreweriya mirov hatiye kirin. Mezinbûn û zorbûyîna wê jî li vir e. Ew li ser bingehê wisa derketiye holê ku rastî hatibû tarîkirin, dilên ku wê xwedî lê derketiban hatibûn bêdengkirin, mejî hatibûn kilskirin û biyanîbûn di warê teorî û pratîkê de gihiştibû lûtkeyê. Li nuqteyekê ku ewqasî ketîbûn heye, mîna gavek biçûk be jî fikr û çalakiyên ku li ser esasê berjewendiyên gel wê xwedî wateyek mezin be. Ewil, gavên ku tînin avêtin ji aliyê gelekî ve nayên fêmkirin û tehlûkeyên vê berxwedanê tînin bilêvkirin, ev jî wek maceraparêzî û provokasyon tê nirxandin. Di dema avêtina gavên yekem de hê hêviyên gel zehf lewaz bû. Ev pirs dikirin, *“Tiştên ku Şêx Seîd, Seyid Riza û hê gelekî nikarîbû bikira, ma wê komek mirovên ciwan çawa bikin?”*

Rexneyên ku di vê demê de bi tîgihîştinek zehf lewaz û şaş tînin kirin, tînin zanîn. Salên wisa ne ku tê destnîşankirin, êdî wek gel em qediya ne û ne mimkun e ku em karibin careke din rabin ser piyan. Bêhêvîti, li lûtkeyê ye. Ha ev rewş wek çawa sedemên serweriya alîgirên mêtîngerî û teslîmkariyê nîşan dide, her wiha kêmbûyîna

hejmara û pileya lewaztiya têgihîştina berxwedêran jî îzah dike. Rêbertiya PKK'ê, di serî de neçar bû ku van zoriyan bibihure, xwe ava bike û bi hejmarek kêr mirovan re bimeşe. Di nav wan şertan de, ji bo gel dest ji berde çekê, dayîna hêviyek ji rêzê jî bi serê xwe pîrsgirêkek pîr mezin bû. Beriya her tiştî jî diviyabû ku ev bîreweriya pêşeng hebûya.

Abdullah Ocalan, di pirtûka **Welatparêziya Kurdistan û Eniya Rizgariya Neteweyî** de têkildarî rastiye van tespîten dîrokî û balkêş radigihîne: “Mirovên me rewşenbîr jî bin ne ewqasî wêrek in ku berê xwe bidin rastiye xwe. Piranî jî înkarakî li pêş e. Tew îcar şûrê Demokles ê ku li ser seriyan digere jî li vê zêde dibe, sedemên qebûlkirina pozîsyona heyî jî temam dibe. Li ser bingehekî wisa bi rastî jî ne karekî hêsan e ku berxwedêriyeke ji berjewendiyên şexsî dûr, li gor armancên bilind bê qebûlkirin. Ji ber vê yekê, pêwîst dibû ku rêbertiyê kariba berxwedêriyek xweserî xwe ava bikira. Ewîl, şensê jiyane nade kesî û her çiqasî bi gelek navan hatibe pênasekirin jî, berxwedaneke destanî ya kêmdîtî lê girêdayî rastiya Kurdistanê, alîgirên wê çiqasî kêr bin jî bila bibin, vê bi înad spartina dil û mejîyan û dana qebûlkirin pîrsgirêk bû. Dema Engels behsa ‘bêhnketina neteweya Elman a ji ber koletiya ku di encama şerên 30 salan de bi pêş ketiye’ dike, dibêje ku eger pêwîst bike divê bi darê zorê şer li neteweya Elman bê ferzkirin. Ya me ne tenê têkçûnek piştî şerekî 30 salan e. Barê koletiya bi sedan salan û heta hezaran salan hatiye hilgirtin. Li dijî atmosfereke ku her cure dagirkeriyê, paşverûtiyê mîna ziftê dil rapêçabûn û tiptarî kiribûn, şaneyên civakî bi çendan caran hatibûn qepatkirin, mirov bi sosretî hatibûn guhertin, ji ber vê jî jirêderketî, heredayî, xewger, tiral, belave bûn, her cure şoretî serwer bû, ti rêgezên exlaqî di astek pêşverû de rol nedilîstin, pîrikan bi çendan caran tevnên xwe li mejîyan gerandibûn, diviyabû ku bi înad şerek bê ferzkirin...

Erê pêdivî bi pêşengekî ku dikare wisa şer bike hebû. Ev pêşeng, wê bîrewerî û hêviya windabûyî ji nû ve biafirîne, taybetmendiyên dîrokê û çaxê vebêje û îstîqameta polîtîk nîşan bide, lê bi vê jî qayil nebe û bi pratîka xwe jî îspat bike...

Taybetmendiye herî berbiçav ê gelê me ew e zêde îtîbarê bi axaftinan nake. Gelekî wisa ye ku heta mînakên zindî yên berxwedana herî xurt û bîyardarbûna di dozê de nebîne, bawer nake. Ji bo li rêya îxaneta borî karwanekî din ê nû zêde nebe, wek çawa mirovê yekem bi qirika cinewarê herî hov girtibû, neçarî bû ku şerekî mîna di nav vê atmosferê de jî bê meşandin. Li Kurdistanê wê pêşeng wisa bibûya, wisa têbikoşiya, pêbaweriya xwe îspat bikira û bi vê ve jî hinceta bîyardarbûyîna berxwedana dîrokî ya gelê me biafiranda.”

Rastiya ku li jor bi awayekî zelal hatiye ziman, perspektîfên yekemîn ên Tevgera Apoyî ne ku serpêhatiya gelekî ku ber bi tinebûnê ve diçe û şiklê rawestandina vê ketina serberjêr vedibêje. Li xwezayê mafê jiyanê yê her heyînê pîroz e. Mirovatî jî wisa dipejirîne. Tê qebûlîkirin ku her mirov ji bûyînê û şûn de azad e. Dest jê berde zayina wek mirovekî azad, dest jê berde mîna her heyînekê xwedî mafê jiyanê be; rastiya Kurd di halekî wisa de ye ku navê wê jî nayê bilêvkirin. Bi xwe heye, lê tine tê hesibandin. Zimanê wê tê qedexekirin. Ev jî bes nayê dîtin û li ba tevahî dewlemendiya wê her tiştên wê tên dizîn. Dewlemendiye wê yên binerd û sererd tên talankirin; dab û nêrîtên wê dibe malzemeyên sînemayan, muzîkê û çanda wê dibe malzemeyê hunermendan, lê ti kes behsa navê wê jî nake. Ji ber ku Kurdîti diyardeyek wisa ye ku, ewqasî hatiye mêtin ku navê mêtîngehê nikare lê were kirin û layiqî vê statuyê jî nayê dîtin. Diyardeyek wisa ye ku *“li gorê hatiye veşartin û ser hatiye betonkirin”*. Ji bo diyardeyek wisa ne zanistên civakî ne jî zanistên siyasî dikarin îzahan bi pêş bixin. Heta îzahkirina diyardeya Kurd bi psîkolojîk, sosyolojîk, çandî, siyasî, felsefî, hiqûqî û bi şaxên din ên zanistê ve jî zor e. Gotina *“Kurdistana xeyalî li vir meftûn e”* ku piştî tepeserkirina Berxwedana Agiriyê wek slogana zaferê ya desthilatdariya faşîst manşet xemilandin, esas di mejiyê gelê Kurd de bi cih bûye. Hin, vê rewşê mîna *“qereqola di mejiyan de”* bi nav dikin. Mejî, bi qereqolan hatine dagîrkirin û êdî rawestiyane. Mêtînger, ji bo xak û gelên ku dimêjin gotina, *“wê her tişt bê qisûr bibûya... eger şênî nînbûna”* bi kar tînin û ji bo kesayeta wan pûç bikin jî serî li her rê û rêbazan didin. KT her bûye celad, Kurd jî bûne qurbanên herî baş. Bêbaweriya ku ewqasî bi kûr çûye, tenê bi afirandina tevgerê gelekî xurt û bi îrade dikarîbû bihata derbaskirin. Vê jî Tevgera

Azadiyê kir ku xwe wek PKK'ê bi nav kiriye. Ji bo gelê Kurd ê ku bi tinebûnê re hevrû hatibû hiştin, bê zindîkirin, bê rakirin, bê onûrekirin û herî girîng jî bibe xwedî mafê jiyana xwe, têkoşînek parastina rewşa ya herî pîroz lazim bû. Refleksa parastina jiyana li gîştî gerdûnê heye û xwezayî ye, mafekî rewşa ye. Li ser vî esasî, pêvajoya ku gelê Kurd li ba Tevera Azadiyê ket nav; pêvajoya têkoşîna parastina rewşa ye ku herî xwezayî, herî mirovî, herî rûmetdar û aşîxwaz e.

Li Kurdistanê Parastina Rewşa angî Şertê Hebûnê

Li Kurdistanê Kevneşopîya Berxwedanê

Rojhilata Navîn, li ser erdnîgariya cîhanê xwedî cihêkî stratejîk e. Cografya, rûyê dîrokê ye. Kurdistan jî li naverasta 3 parzemînên dîrokî ye ku navenda jîngeha herî kevnar a mirovahiyê ye. Dema dewlemendiya cografyayê jî li ser vî taybetmendiya wê zêde dibe, wê demê jî pêkanînen tundî û zorê yê bi şiklê dagirkerî û mêtîngeriyê zûka dinase. Pêkanînen B.Z. 3000'î dest pê dikin -mîna di Destana Gilgamêş de tê ziman- bi şewazê zora leşkerî û siyasî her ku çû berfirehtir bû û heta roja me hatiye. Ji pêkanînen tundî û zorê yê mîna talan, dagirkerî, koçberkirin û qetlîamê berbiçav heta polîtîkayên parçe bike- bi rê ve bibe, domahiya 5000 salî di bin pêkanînek zora sistematîk de mayîn, di dîroka Kurd de bûye mîna çerxekê. Hêzên ku dixwestin bibin serwerê cîhanê an jî "cîhana" ku wê demê dihat zanîn, Kurdistan ji ber pozîsyona erdnîgariya wê ya stratejîk û navendî her tim wek qada şer bi kar anîne. Kurdistan wek çawa her tim bûye warê trajedîya wêranê û xirbeyan, her wiha bûye şahidê beşa serwer a ku ji bo jiyana xwe gelê xwe firotiye. Rastiya ku wek tevna Kurd a klasîk tê zanîn ku ji bo xwe bide jiyandin û xurttir bibe gel û welatê xwe pêşkêşî hêzên derve dike, bi serê xwe trajediyek cudatir e. Li ser vî esasî jî qasî dagirkirinan, îxanetê jî – wek mînak a yekem Enkîdû ye ku di Destana Gilgamêş de cih digire- pir zêdeyî tê dîtin.

Li Kurdistanê çerxek din a dîrokî jî rastiya berxwedan û îsyana e ku li dijî her dagirkeriyê bi pêş ketiye. Huvava an jî Hûmbaba, mînak a yekem a vî rastiyê ye. Bê bedelê berxwedanê jî çiqasî

giran dide, di Destana Gilgamişê de bi awayekî balkêş tê vegotin. Şertên erdnîgariyê bûye sebeb ku ji pêvajoya Sumeran ku şaristanîya çînî ya yekem e û şûn de her tim berxwedan di rojevê de bimînin. Milê esas ên van berxwedan û îşyanan jî ew e ku sînoren xwe yên parastinê derbas nekirine. Li vir jî erdnîgariya çiyayî ku ji bo civaka Kurd bûye çandek civakî ya bingehîn, di astek diyarker de xwedî cihekî girîng e. Ji ber ku di çand û avahiya Kurdî de nîrxên neolîtîkê jî xurt in, wê demê nebûne ew ên ku zorê bi pêş dixin, beravajî bi armanca xweparastinê di demên neçariyê de serî li zorê didin û ti carî dest ji vê pozîsyona xwe bernedane.

Abdullah Ocalan vê rastiye wiha vedibêje; **“Cureyekî mîna mirov û civaka wê narîn ku hebûnên ji bo talûkeyan vekirî ne, ne xwediyê xweparastineke bi hêz be nikare hebûna xwe dimeke dirêj li ser piyan bigire. Li cem cinsê mirov, parastin qasî ku biyolojîk e, ewqasî jî civakî ye. Parastina biyolojîk li cem her hebûna zindî ji aliyê xerîzeyên parastinê ve pêk tînin. Parastina civakî jî bi hevparîyeke tevahiya ferdên komê tê bicihanîn. Heta li gorî derfetên parastinê hejmara komê û şeweyê rêxistinîya wê timî diguhêre. Parastin yek ji fonksiyonên bingehîn ê komê ye û ev jî komê dimeşîne. Jiyan bêtî parastinê ti carî nameşe. Tê zanîn, xwe xwedîkirin û xwe zêdekirin jî du fonksiyonên din ên bingehîn in. Çawa ku xwe xwedîkirin û xwe zêdekirin nebe zindî û ruhber nikarin jiyan xwe bidomînin, bêtî xweparastinê jî nikarin jiyan xwe dewam bikin. Encameke din a girîng ku mirov dikare ji cîhana xweparastinê ya zindiyan bigire ew e, ev xweparastin bi tenê ji bo parastina hebûnê ye. Li ser cureyên xwe, heta li ser hebûna cureyên din sistemen mêtinkarî û serdestiyê ava nake.”**

Pergala xwe dispêre edalet û wekheviyê ya ku li dor xwedavenda Neolîtîkê teşe girtiye, di sistemen fikrî de ku berhemên cewherî yên gelê Kurd e, xwedî cihekî berbiçav e. Di van sisteman de ne pejiwandina zor û pêkanînan wê, lê li dij derketin heye. Rêbazên têkoşînê jî xwe dispêrin parastina mafê jiyanê. Baweriyên mîna Zerdeştî, Elewîtî, Êzidîtî, Yarsanî û Kakîtî yên di nav Kurdan de çalak in, piranî jî têkildarî vê rastiye ne. Gelek komên berxwedêr ên mîna Mazdekî, Ebû Muslîmiyî, Sunbadî, Mukanayî, Cavîdanî, Babekî, Zencî, Ebu'l Wefayî, Hallacê Mensûrî,

Karmatiyî, Hurremî, Îsmâîlî, Baba Îshakî, Temannayî, Pîr Sultan Abdal û Seyyîd Nesîmî ku yek ji navên herî girîng ê wejeya Elewî ye, her ji van kokan û kevneşopiyan xwe xwedî kirine. Ev tevger, sîstemên felsefî ne ku bi çavekî rewa li zorê mêze nekirine û ew bi sazî nekirine. Lewma jî bi awayekî pir zelal dikare ev tespît were kirin; gelê Kurd domahiya dîrokê nebûye xwediyê îdeolojiyên ku hedef dike saziyên zorê ava bikin.

Ev avahiya fikrînê ya ku kokên wê digihêjin Neolîtîkê, li beramberî dagirkirinan têkoşîna azadiyê jî bi teşe kiriye. Kurdan, di ti demên dîrokê de nebûne xwedî argumanên ku wê zorek sîstematîk bimeşîne. Sîstema parastinê ya xwe dispêre parastina mafê jiyanê ya Neolîtîkê, cewherê berxwedanan temsîl dike. Di dîroka Kurd de nayê dîtin ku avahiyek hêza dagirkirinê ya xwe dispêre parastina pergalê û pişeyê endamên wê leşkertî ye, hatibe avakirin. Wezîfeya parastinê, dilsoziya yekem a tevahî endamên komê ne. Berevajî, wê bi tinebûnê re hevrû bibin. Jixwe her dagirkirinê li ba xwe êşên mezin jî anîne. Ji bo li dijî vê têkoşîna hebûnê bê dayîn, koman weke tevdîr çek rakirine. Li ser esasê ku karibe li dijî êrîşan her kêlî bikevin nav pozîsyona şer, rêxistinbûyîna civakî bi şiklê eşîran çêbûye. Wisa jî girêdayî şêweyê rêxistinbûyîna; bingeheên objektîf ên îsyane çêbûne ku tevî jin û zarokan giştî kom tevî dibin. Ev rewşa ku heta roja me jî hatiye, kevneşopiya îsyana topyekun her tim zindî hiştiye. Lewma jî li ser vî esasî berxwedan kevneşopiyek e ji bo Kurdan. Kurd, tevî ku îxanetkar û teslîmkarên xwe zêde ne jî, di heman demê de gelekî wisa ye ku heta dawiyê li pey azadiya xwe ye. Ev her du rastî jî her di zikê hev de, li ba hev û li dijberî hev di nav dîroka şaristaniyê re heta roja me ya îro hatine.

Kurd, serî natewîne. Serhişk e. Kurd, ji ber ku ji bo parastina xwe berê xwe dane erazyên herî asê yên cografayê, bi awayekî berbiçav xwedî hestên xwebaweriyê ne. Bindestî, dilî qebûl nekirine. Dema pênaseyên oryantalîstan û mîsyoneran li ber çavan bînin girtin ku di bîranînê xwe de dibêjin Kurd serhişk û asî ne, wê bibe alîkar ku em karibin milekî rastiye fêm bikin.

Wek nimûne, di pirtûka **Şerefname** de ku ji bo Kurdan belgeyek zehf girîng a dîrokî ye, Şerefxan ji bo vê karaktera Kurdan wiha dibêje; *“Li gor tê fêmkirin, navê Kurd ji ber wêrekiya wê*

mîna çawahiyek, pêşnavêkî hatiye lêkirin. Îspata wê jî ew e ku piraniya leheng û egîtên navdar ji nav vê neteweya qehreman derketine. Lehengê navdar Rustemê kurê Zal ku di dema Keykûbad de jiyaye, yek ji van e. Ji ber ku ev leheng li herêma Sîstanê (Sicistan) ji dayik dibe, mîna Rustamê Zablî deng vedaye. Fîrdewsî yê nivîskarê Şehnameyê jî ew wek Rustemê Kurd daye nasandin. Her wiha, Behram Çupîn jî ku di dema Hurmuzê kurê Qralê Îranê Nuşîrevan de fermandarê artêşê bû, Kurd e; bi xwe li Tirkîstan û Xorasanê gihaye û di şerê van deveran de deng vedaye. Kurtî û di dema Îslamê de sultanên Gûrî ji binemala vî ne. Girgîn Mîlad ê ku dengê wêrektîya wî li asoyan belav bibû jî Kurd e.” Endezyarê rê yê Îngilîzan Hamilton jî têkildarî hunera şer a Kurdan vê dibêje; “Ev mirovên ku mîna pezkovîyan çalak in û nakevin dest, di nav van mekanên wehşî de her rêkê û her kuna ku dikarin xwe tê de veşêrin dizanin û cilên wan ên gewr tam li gor tehtan e. Ji bûyîne ve nêçîrvan in û çekê mukemel bi kar tînin, kêman caran li hedefê nadin. Kurd, şervanên wehşî û serhişk in. Di taktîkên çiya de, li dijî leşkerên ku ne mîna wan çiyayî bin û çiya nizanibin, serkeftî ne.” Mewlana Sadettîn ê ku dersdarê Sultan Mûrad Xan e, têkildarî karaktera Kurdan vê dibêje, “Kurd, guh nadin gotinên hev; di nav wan de hevalbendî û hevkarî çênabe. Her yek ji wan, li lûtkeya çiyayan û kûrahiyên geliyan bi tenê serê xwe û azad dijîn, ala jiyana keyfê û cihêtiyê li ba didin.” Moltke, ku di salên 1830’î de li Kurdistanê li ba Osmaniyan leşkerî kiriye û dûvre jî wê bibe Serokê Serkana Giştî ya Leşkerî ya Prûsyayê, bi tespîta xwe ve diyar dike ku bê çima Kurd heta dawiyê girêdayî xweparastinê ne; “Li beramberî vê, Kurd ji ber pêdiviyên xwe cotkar in, ji ber meylên xwe jî şerker in. Ji ber vê jî gund û zevî li geliyan, kelhe jî li çiyayan e. Bi peyatî şer dikin, dîwar û çiya çeperên wê, tîfing jî çeka wan e. Kurd, nîşangirekî mukemel e, tîfinga bi dewlemendî hatiye kolandin û bi telkarî hatiye neqşandin ji bav ji bo kur wek mîrate dimîne û Kurd wê mîna hevalê xwe yê zarokatî yê herî kevn dinase.” Ji ber ku Kurd wek gelekî ku ji afirînerên herî girîng ên neolîtîkê ne, jiyana azad ji dil û can hîs dikin.

Îro jî Kurd dixwazin bi tenê serê xwe bin, li jiyaneke ku ji dewletê dûr e digerin û li dijî zeptûreptê di asta refleksê de xwedî avahiyên psîkolojîk in. Di bin vê de qasî azweriya azadiyê, her

wiha bandorek mezin a rêxistinbûyîna civakî jî heye ku bi hezaran salan wek formê eşîrê hatiye parastin.

Em kîjan rûpelên dîroka Kurdistanê vekin, em ê bibînin ku kevneşopiya berxwedanê heye ku bi tîpên zêrîn li rûpelên lehengtiyê hatine neqşandin. Tevî ku ewqasî bi hewldanên zext, zilm û îmhayê û her wiha polîtîkayên helandinê yên înkarker û asîmîlasyonîst hevrû mane jî, Kurd li ser piyan mane û eger îro jî hê bi ruhekî taze dikarin têkoşînek bêeman bimeşînin, ev encamek vê kevneşopiya berxwedanê ye. Helbet, avahiya civakî û kûrahiya kulturî ya Kurdan bûne faktorên esas ên ku vê seknê xurttir dikin. Lê, tenê bi vê jî nikare were îzahkirin. Ji ber ku di dîrokê de gelên xwedî rêxistinbûyînen heman rengî hebûn, lê îro navên wan jî nayên ser zar û zimanan. Em ji Etruskan û Iyonyayîyan bigirin heta gelên ku li ser erdnîgariya me hatin tinekirin, dikarin ji bo vê rastiyê bibin mînak. Lê mixabin, di dîroka nêz de jî hejmarek zêde gelên ku hatine tinekirin hene. Gelek çand û gelên mîna Maya, Înka, Aztek, Amerîkiyên Resen (Çermsork), Laz, Asûr dikarin di nav vê çarçoveyê de bêne jimartin. Lê dîsa jî gelê Kurd, gelekî wisa ye ku bi polîtîkayên zext, sirgûn, koçberkirin, tinekirin û helandin ên ku di dîrokê de bêhempa tên dîtin, hevrû maye. Li cem van polîtîkayên, bi motifên olî jî wek rêbaz hewl hatiye dayîn ku bişîbîne xwe û di nav xwe de bihelîne, bike biyanî. Xulase, ji ya herî nazenîn heta ya herî qeba, ji ya herî hov heta ya ku manewyatê herî zêde tine dike, her cure rêbaz hatine bikaranîn. Lê, gelê Kurd hê jî li ser piyan e.

Avantaja cografîk, rêxistinbûyîna civakî ya bi şîklê eşîrî û nîrxên azadîxwaz ên çanda neolîtîkê li gel xwe çandek berxwedêr jî afirandiye. Li ser vî esasî dîroka Kurd an jî Kurdistanê di heman demê de bûye xwediyê kevneşopiyek berxwedanê jî. Li dijî dagirkeriya Êrûkê em ji Huvavayê bigirin, li dijî Nemrûdan heta pêşengiya Îbrahîm, gelek berxwedan û îşyanên Kurd ên ku heta îro wek xelekek esasî hatiye hûnandin heye. Ya herî girîng jî ew e ku beşek mezin a van îşyanan çavkaniya nîrxên demokratîk komunal e ku îro hêjahiya wan hê bêhtir tên zanîn. Ya ku berxwedan û berxwedêriya gelê Kurd û tevgera azadiyê saz dike jî dîsa ev nîrxên neolîtîkê ne.

Abdullah Ocalan di parêznameya xwe ya **Parastina Gelekî** de van taybetmendiyên dîrokî civakî wiha analîz dike: “Şêwazê hebûnê yê etnîsîteyê, eger winda nekiribe, em dikarin wek nîv-demokrasiyê bi nav bikin. Pêwîst e, em sîfetê “seretayî” jî li vê rastiye zêde bikin. Etnîsîte demokrasiya seretayî ye. Di hundur de girêdana bi nîrxên komîn, li der ve jî berxwedana li dijî dewletên tehekumkar, li ser komên gel, têkiliyên azad, wekhev û demokratîk ferz dike. Eger ev karektera têkiliyan nebe ti maneya berxwedanê namîne...

Komên hiyarersîyê yên li dora nîrxên maddî û manewî mezin dibin, ji bo ji hev belav nebin bi çavnebarî, timî otorîteyê pîroz dikin û ji bo mafdariya mulkiyetê nîşan bidin, dikevin nav hewldanan...

Lê klan û qebîleyên bindest, wê karibin bi koçeriya xwe ya domdar hebûna xwe ya azad biparêzin. Koçer ne tenê ji bo nêçîr û berhevkirina pel û pincaran, zêdetir ji bo parastina nîrxên komîn bi meşeke dîrokî daketine çolan, derketine çîyan û xwe berdane zîkê daristanên kûr. Ev meş ku timî di hinav û dilê xwe de evîna azadiyê werdigire, yek ji liv û tevgera girîng a dîrokê ye. Hewcebûna bi parastinê, klan û qebîleyê neçar dihêle ji bo bibe eşîr. Eşîrî tenê mezinbûneke biyolojîk îfade nake. Li dijî hiyarersîyê awayekî formasyona berxwedanê ye. Di qonaxa destpêkê de otorîte di nav eşîrê de erênî ye, ji aliyê exlaqî ve jî bi destanan û muzîkê pesnê vê otorîteyê tê dayîn.

Civaka xwezayî ti car neqediya. Tevî ku dijberên xwe xwedî kir xilas nebû. Karîbû her tim xwe dewam bike. Wek sparteya serf, kole û etnîsîteyan, li dawî hiştina çînayetiya karkeran û wek zemînê civaka nû ya bilind dibe, wek civaka koçber a li daristan û çolan, wek malbata dayîkê û gundiye azad, tevî hemû ziraran, civaka xwezayî wek exlaqê zindî yê civakê ti car kêmbû. Berovajî texmînan, motora pêşdebirinê ya civakê, ne têkoşîna çînî ya teng e, berxwedana mezin a nîrxên civaka komînî ye. Mîrov têkoşîna çînî înkâr bike rast nîne. Ew tenê yek ji dînamîkên dîrokî ye. Ya rola sereke listiye, her koçerê gerok ê daristanan, çîyan û çolan bû. Wek form a jiyaye tevgera etnîsîteyê -eşîr, gel qebîle- ye. Ew hêz e ku etnîsîteyê karîbû bi hezarê salan, li dijî hemû êrîşên bêrehm û zehmetiyên

xwezayî li ber xwe bide. Destan, ziman, nişmîti, nirxên resen ên mirovatîyê û çanda berxwedanê, exlaqên wê ne."

Koka kevneşopiya berxwedana Kurd divê di nav van gotinên Abdullah Ocalan de bîn lêkolandin. Formê etnîsîteya Kurd a ku demek dûvdîrê bi nirxên neolîtîkê têr û tijî bûye, dagirtî ye; tevî ew qas zext, zilm, bişavtin, pelçiqandin, koçberkirin û tinekirinê jî li ser piyan maye. Qesta gotina weciz a "*Berxwedan kevneşopî ye*" jî ev e. An na, rastiya ku wek "*gelekî ku xayînên wê pir in*" tê zanîn, heta niha bi dehan caran ji pelên dîrokê ketibû, winda bibû!

Em rastiya trajîk a gelekî dişibe Kurdan jî, di nav Berberîyan de dibînin ku bi giranî debara xwe bi ajaldariyê dîkin. Gula bêmîraz (gulberfînk) çawa ku di atmosfera seqemê de berfê kun dike û zîl dide, gelê Berberî jî mîna vê li waheyên çolan bi cih bûne û heta roja me jî hatine. Êdî teqez bûye koka wan ji yekparebûna jîyan û nirxên neolîtîkê hatiye. Em bi kurtasî dîrokçeya Berberîyan li vir bidin û ji nêz ve bibînin ku çiqasî nêzî Kurdan e û heta roja me çawa hatine.

"Berberî: Gelê her kevnare yê Bakurê Afrîkayê. Li Fas, Cezayîr, Tûnis, Libya û Misrê bi şiklê qebîleyan berbelav bûne. Tevî ku girêdana wan a zimanekî teqez heye jî, taybetmendiyên wan ên fizîkî û çandî ji hev gelekî cêwaz in. Berberî ku tê texmînkirin ji nijadên çaxên Paleolîtîk û neolîtîkê hatin, ji şaristaniyên serwer ên Fenîke, Kartaca, Roma, Xirîstîyan û Îslamê di astek jor de bandor bûne. Di dema dagirkeriya Ereban de ku di sedsala 7'emîn de dest pê kir, qebûlîkirina wan a Îslamê herî kêr sedsalekê dewam kiriye. Ji ber ku dagirkerên destpêkê yên Ereba wek hejmar kêr jî bûn, di warê etnîk û olî de bandora xwe zêde li Berberîyan nekirine. Qebîleyên Berberî yên li çolteran, heta dagirkeriya Bedewîyan a di sedsala 12'emîn de, avahiyên xwe yên xweser parastine. Ereben Bedewî, aboriya gundiyan a Berberîyan hilweşandin, bûn sedem ku gelek qebîleyên bicihbûyî bibin koçer. Xeleka dagirkirinê ya ji Fenîkeyîyan heta Ereban û herî dawî jî heta Fransîyan diçe, nehişt ku Berberî û ev civak tam li hev werin. Di roja me de wek çawa qebîleyên Berberî yên bûne Ereba hene, her wiha li weha û çiyayan jî qebîleyên Berberî hene ku zarava û kevneşopiyên xwe diparêzin."

Berberî, weke ku me got, ji ber mîna Kurdistan neolîtîk ji kûrahî ve jiyane, ruxmî bi dehan êrîş û qetlîaman jî heta roja me ya îro hatine. Lê, civakên ku di vê astê de neolîtîk nejiyane; bi polîtîkayên asîmîlasyonîst ên tijî zor û tundiyê ji cîhana me hatine tasfiyekirin. Nirxên komunal ên neolîtîkê, wek mîrateya lehengtiyê ya Kurd, em anîne heta vê rojê.

Li Kurdistanê Karaktera Serweriyê

Me got, “*Dîroka Kurdistanê, dîrokek wisa ye ku lehengtî û îxanet di zikê hev de, li ba hev û li dijberî hev rû didin.*” Weke ku me gelek carî anî ziman, ji ber ku Kurdistan li naverasta sê parzemînan e û li sêgoşeya derbasbûnê ye, her bi dagirkirinê re hevrû bûye. Dîsa weke ku me pir caran diyar kir, avahiya civakî ya Kurdistanê xwe dispêre nirxên neolîtîk û di dema derbasbûyîna sîstema baviksalarî de jî rêxistinbûyîna wê li ser esasê eşîran e. Ev eşîrên koçber, her çiqasî li cihên xwe çandiniyê dikin jî, ji ber dagirkirinan piranî jî bi ajaldariyê mijûl dibin. Wek tê zanîn, ji bo ajaldariyê pêdivî bi sehayên mezin ên çêrê hene. Çiqasî çêre hebe, wê ewqasî jî heywan bêne xwedîkirin. Lewma jî wê ewqasî xweş-halî û parvekirinê bi xwe re bîne. Her çiqasî rêxistinbûyîna eşîran, bi awayekî zêde cêwaziya çînî neafirîne jî, lê di nav eşîrê bi xwe de tebeqebûyînek çêdibe. Ev rewş, ji ber ku rêxistinbûyîna eşîrê ya ku di esasê xwe de li dijî koletiyê wek formekî berxwedanê derketiye, wextê bi demê re ji şaristaniya dewletparêz bandor dibe, ji aliyê kesayetên eznavendî, berjewendîperest û li gor xwe, angû bi perspektîfa teng hatiye afirandin. Azadîxwaziya Kurd her tim ne di warê pozîtîf de ye. Azadîxwazî, eger hevsengiyek herî guncav bi giştî civakê re nede avakirin, angû li ser xakê nikaribe têkiliyek bi tendurist li ba koman daye, wê ev daxwaza azadiyê lê bifitile. Wê karakterên biserêxwe, bêdîsîplîn, nerêxistî û takekes biafirîne. Û tabî ev kesayet dikarin cîhana xwe ya teng wek navenda cîhanê bizanin, xwe jî herî baş, herî mezin û herî pîroz bibînin.

Ev nêrîn û kesayet, bi awayekî hê eşkeretir di feodalên Kurd û tevgerên di pêşengtiya feodal de tê dîtin û jiyîn. Ev kesayetên ku zehf teng in, hayê wan ji cîhanê tineye, asta têgihîştina wan kêmtir e,

zîhniyeta wan paşmayî ye û di pîvanên civaka feodal de mane, îro jî nikarin li beramberî rexneyek sererastkirinê tehamul bikin, ji bo karibin bedelan bidin dayîn jî dikevin nav her cure bêxêriyê. Gelek zarokên Kurdistan ên mîna Saîd Kirmizitoprak (Dr. Şivan) bi vî şiklî hatine tasfiyekirin.

Karaktera ku bi şiklekî objektîf xulîqiye, di vê astê de teng û tîjî xeterî ne. Di lîteratura siyasî de ev wek komplogerî û dolapgerî tê binavkirin, bi gotinek gelemperî jî dekbazî ye, danîna xefikan e. Dîroka Kurdistanê karakterên wisa tenê nafirîne. Beşa ku wek tebeqeya jorîn, çîna jorîn an jî serwer tê binavkirin, ji serê dîroka Kurdistanê heta îro xwe ji rola xwe ya bêxer neanîne xwar. Ev tebeqeya ku diçe rex hêzên dagirker, ji bo tasfiyeya biraxweyê xwe rê nîşan didiyê û piranî jî di tasfiyekirinê de bi xwe rolê hildigire, zehf tê dîtîn. Ev mîna ruhekî “genetîk” lê hatiye. Her wiha, beşên ku jiyangehên xwe neterikandine jî çawa serî li ber dagirkeran tewandine, ziman û çanda dagirker qebûl kirine, bûne hilgirên vê çanda biyanî û ne tenê ji rastiya xwe dûr ketine, her wiha bûne dijminê wê jî.

Rastiyek zehf trajîk a dîroka Kurd jî ev karakter a serwer e. Wek me ji romana “**Leoyê Afrîkayî**” ya Amin Maalouf ragihandibû, mîna “*Kî bi dayika min re bizewice dibe zirbavê min*”, ev beşan jî kîjan hêzî Kurdistan dagir kiribin, derbasî refên wan bûne û ev jî bes nedîtine, li dijî gelê xwe şer kirine, nasname û zimanê xwe ji bîr kirine, wek rêyek esasî ya hebûnê jî xwe şibandine serweran.

Îro, eger ewqasî destanên bi devkî ghiştibin me û mîrateyek çandî bi şiklekî zipzindî ghiştibê heta roja me, bêguman ev ne bi saya vê çîna serwerên Kurd e. Berevajî, ev mîrateyek wisa muthîş e ku giranbiha ye, ji gelê Kurd ê girêdayî nîrxên neolîtîkê maye.

Dibêjin ku “*Vehûna dîrokî li ser heman tevnê tê honandin.*” Û tê gotin ku “*destpêk çawa hatibe honandin, dawî jî eynî dibe.*” Ev rastî di nav Kurdistana îro de bi çav jî dikare were dîtîn. Li Kurdistana, îro jî yên ku ziman û çanda Kurdî dijî û bi cil û bergên wê xwe dixemilînin, di serî de gel e. Lê, yên ku bi zimanê serwer û dagirkeran diaxivin, dab û nêrîtên wan dewr digirin û wek xebatek sîxurtî jî li Kurdistanê belav dikin, cil û bergên wan li ber xwe dikin, ev tebeqeya komprador feodal a Kurd e. Yên ku herî zêde di nav partiyên sîxur ên mêtînger de cih digirin û heta di nav

hikûmetên wan de dibin wezîr, bi vê ve jî têr nabin û Kurdîtiya xwe red dikin û îdîa dikin ku “*Yên xwe Kurd bihesibînin, parçeker in, terorîst in û ji Ermeniyên hatine*” dîsa ev beş e.

Bi kurtasî, diyardeya ku di salên 70’yan de li ber çavan e avahiyeke wisa ye ku bi temamî îxanetê li xwe dike, li xwe biyanî bûye û bûye sîxur. Avahiya komprador feodal û hêza mêtînger dagirker, xwe li Kurdistanê bi sazî kirine. Di salên 1930’î de berê xwe da serwerên feodal ên Kurd, piştî 1940’î - bi taybet jî di dema Demokratîk Partî (DP) de - ew li ba xwe girtin û Kurdistan ji serî heta binî û bi kûrahî dagir kiriye. Ji bo karibe hêvî û tevgerê azadiyê her kontrol bike û nikaribe vê bike jî yekser bipelçiqîne, her tim wek mifteyek ewlehiyê ev ûnsûr amade kirine. Kurdistan cihekî wisa ye ku gelek caran ev jî lazim nabin. Pariyek berjewendiyên ku diavêjin ber vê çîna komprador feodal jî, dibe sedem ku wek tê xwestin çalak bibin.

Saziya Axatiyê ya ku ji salên 1800’î û şûn de ji aliyê Osmanîyan bi awayekî sistematîk hatiye bipêşxistin û terîqeta Nexşîtiyê ya ku destûra pêşketina wê hat dayîn û rolek parçeker lîst, mîna heşt pêyekî (ahtepot) Kurdistan rapêçaye. Ya ku divê were kirin jî rawestandina pêyên vê ahte potê ne. Jixwe, wek di dîrokê de jî zehf caran hatiye dîtin, ahte pot her amade ye ku ji bo hinan bibe maşîk. Rawestandin, wê bi şiklekî ku hedefê di nav xwe de digire pêk were, daxwazên xwe bi destên wî an jî wan pêk bîne, bide pêkanîn. Jixwe di salên 70’yan de ev bi ser xistine. Dema ku Tevgera Azadiyê dixwaze li Kurdistanê vebe, wê demê jî ev avahiya komprador feodal dibe astengî û benda herî mezin.

Dema ku nû bi nû xebatên hizirî hewl dide xwe bigihîne ciwanan û gel û hê embriyon e, wê demê yên ku êrîşê tîne ser şoreşgerên ciwan ên Tevgera Azadiyê, ev kompradorên feodal in. Û hê beriya ku berê xwe bidin Kurdistanê, li ser navê wan tehdîd dibarandin, bûne zarokên wan ên bi paşnavê “...oğlu(kurê).” Dema ku derbasbûyîna Kurdistanê pêk tê jî, yên ku li ser navê dewletê yan jî beriya jenderme û polîsên dewletê êrîşî Tevgera Azadiyê kirine, dîsa ev avahiyên sîxur bûn. Divê ev rewş tenê wek tîkîleyek subjektîf an jî ajantîyek jî neyê fêmkirin. Ji ber ku sîxurtî saziyek e û di nav rehên çîna komprador serwer a Kurd de ev rastî bi bandor bûye û bi cih bûye.

Heqeten, dema ku Têkoşîna Rizgariya Neteweya Demokratîk gerîla bi pêş dixê, wek dijber jî avahiya ajan û hevkar a bi şiklê cerdevantî tê pêşxistin. Ev bi spartin û pêşengtiya serokeşîrên komprador feodal pêk hatiye. Ji ber ku hêza dagirker û mêtînger dizane bêtî ev avahiya sîxur, wê nikaribe bi kûrahî bandorê li civakê û erdnîgariyê bike, lewma jî ji navikê bi xwe ve girêdane. Heta ku ev beşa komprador feodal û girêdayî vê jî ev îdeolojî û nêzîkatîyên paşverû feodal neyên derbaskirin wê nîrxên komunal, demokratîk ên gel ji nû ve neyên afirandin û zindîkirin. Ji ber vê jî Şoreşgerên Kurdistanê bi mafdarî li dijî vê avahiya ku wek ûrekê di mejiyê civakê de bi cih bûye, têkoşînek bi biryardarî meşandine.

Mafdarî û Neçariya Hebûnê

Jean Jacques Rousseau (1712–1778) ku yek ji filozofên pêşeng ê diyardeya neteweya demokratîk û pêvajoya ronakbûnê ye, di pirtûka xwe ya **(Peymana Civakî) de** wiha dibêje, “*Eger min tenê hêz û tesîra wê ya ji hêzê çêdibe li ber çavan girtiba, min ê gotiba ku heke gelek mecbûr e serî bitewîne û serî ditewîne baş dike. Lê eger hema çawa bigihêje rewşa ku karibe bindestiya xwe biavêje û ji holê rake, rabe biavêje û ji holê rake hê baştir dike. Ji ber kesê azadiya wî ji dest hatibe derxistin, ev li ser kîjan heqî hatibe kirin li ser heman heqan mafê wî heye paşde bistîne. Maneya mirovek dest ji azadiya xwe berde, tê maneya ji hemû wêşên ji ber mirov e xwedî wan heqan e dest berdide. Destberdaneke wiha ne li gor xwezaya mirov e. Ji ber azadî tê bidestxistin, lê dema tê windakirin careke din nayê qezenckirin.*”

Ya ku Rousseau tîne ziman, esas her mirovek ji bûyînê ve azad e, azad tê dinê. Bindestkirin an jî kolekirin –hem jî ev di lehê hinan de kirin- wek çawa ne hiqûqî ye, her wiha nayê qebûlkirin jî. Gotinên Rousseau, bi peymanên navneteweyî hatine destekkirin û di peymanên NY (Neteweyên Yekbûyî) de wiha tê gotin, “*Tevahî gel, mafdar in ku qedera xwe tayîn bikin. Gel, bi saya vî heqî dikarin bi serbestî statuyên xwe yê siyasî tayîn bikin, pêşketinên xwe yê aborî, civakî û siyasî bi serbestî bidomînin.*”

Mijara ku li vir tê ziman ev e; eger mafên civakî, aborî, siyasî û çandî yên gelekî tînin bînpêkirin –bi mafdarî- ev gel dibe xwedî maf ku qedera xwe tayîn bike. Ji ber ku rûmeta mirov hatiye bînpêkirin, “*rêgeza azad tê dinê*” ya ji bo her mirovî yan jî rêgeza “*azad dijî*” ya ji bo her gelî, hatiye bînpêkirin.

Li ser vî hîmî, parastina rewşa ji bo parastina maf û azadiyên bîngêhîn ên mirov mafekî derbasdar e. Lewma jî rewabûna çalakiyên ku ji bo parastina maf û azadiyên bîngêhîn ên mirov tînin kirin, çavkaniya xwe ji vî qebûlê digire ku êrîş li dijî cewherê mirov, lewre jî li dijî mirovahiyê hatiye kirin. Ji ber ku dijdêrketina van êrîşan jî xwedîdêrketina li cewherê mirovahiyê û parastina rûmeta mirov e, ji aliyê hiqûqa xwezayî tînin qebûl kirin û mafdar e. Li gor feraseta hiqûqa xwezayî, ji ber ku ev maf beriya hebûna dewletê jî hebûn, ji aliyê dewletê nehatine dayîn. Ji ber vî yekê, dewlet jî nikare têkilî van mafan bibe. Li ser vî esasî jî tevahî mirovên li ser rûyê erdê tenê ji ber însan in jî li beramberî hev xwedî wezîfe ne.

Tevahî heyîn yekta ne. Her tişt, her heyîna vî gerdûnê yê mîna mirov, heywan, riwek (nebat), yekta ne. Her heyîn xwedî mafê jiyanê ye. Dema ku destwerdanek li mafê jiyanê jî çêbibe, bi mafdarî li dijî vî refleksê nîşan dide. Mînak, dema şemaqek li zarokekî dikeve, an wê serî bitewîne an jî wê bi hêrîstir bibe û nerazîbûnê nîşan bide. An jî refleksek hevşib û xwedî heman naverokê ye. Ev refleks, di esas de li dijî kiryarê helwest û nêzîkatî ye. Ev helwest û nêzîkatî, di encam de ji mekanîzmaya parastinê tînin. Koleyê ku hatiye bindestkirin, dema bi vî bindestiya xwe dihesê û tîdîgihîje, an xwe dikeve an jî nerazîbûnê mîna zêdebûna pîranyî, hişkbûyîn an jî hilweşandin, bêdengmayînê nîşan dide. Bertekên mîna vî ji refleksa parastinê tînin. Ajoyê xweparastinê ye. Mîna ku dema heqaretek herî biçûk li jinekê tînin kirin, di dilê xwe de nerazîbûnek veşartî nîşan dide. Heta, wek çendan caran li Kurdistanê tînin dîtin, ji ber ku tiştêk ji dest nayê, agir berdide bedena xwe û xwe dişewitîne...

“Di cîhana zindî û ruhberan de her cure û celeb li gorî xwe xwedî sistemeke parastinê ne. Cureyekî bi tenê yê zindîyan tîneye ku bîparastin be. Heta mirov dikare li gerdûnê berxwedana her elementî û her perçikî ji bo parastina hebûna

xwe weke xweparastinê şîrove bike. Berxwedana li dijî deformebûn û derketina ji xwebûnê eşkere bi têgînên xweparastinê tê îfadekirin. Kengî ev berxwedan têk biçe, ew element an perçik berepaş diçe, ji xwebûnê derdikeve, vediguhere hêmaneke din. Di cîhana zindîyan de kengî berxwedana xweparastinê bişkê, hingê ew zindî yan ji bo zindiyên din dibe xwarin an jî dimire.”

Kesê ku hatibe bindestkirin, biçûkkirin û tepisandin, dawîya dawî wê li ew kesê ku serdestî kiriye, biçûk xistiye û tepisandiye mîna bûmerangê vegere. Ji ber ku tevna parastinê bi vî şiklî hatiye hûnandin. Ev vehûna parastinê jî rast e û mafdar e. Bi kurtasî, her heyî bi şiklekî xwedî mekanîzmaya parastinê ye.

Kurdistan; welatê mêtîngehê xwedî statuya bêhempa ku bi her alî veguheriye xirbeyan, gelê wê ji mirovan nayên hesibandin, dewlemendiyên wê yên sererd û binerd her roj tîna talankirin û tecawizî xakên wê tîna kirin. Heta li gor xweseriya xwe mînakî yekta ye ku statuya wê ya mêtîngehê jî nayê qebûlkirin. Welatekî wisa ye ku; navê wê jî nayê ser ziman, mirovên wê li ser xaka xwe ya bûyîne û kamilbûyîne bi zimanê xwe jî nikarin biaxivin! Eger devê gel hatibûya dirûtin, bi zîncîran û qeydan hatibe bêdengkirin, wê wateyek xwe hebûya. Dikarîbû xwedî wateyek siyasî, civakî yan jî çandî bûya. Herî kêr dikarîbû bihata gotin ku “*ez netewe dewleta serwer im û tu jî tehlûke ye, lewma ez jî te qetîl dikim!*” û ev jî heta astekê wê bihata fêmkirin. Lê na, Kurdistan an jî gelê Kurd layiqî vê jî nehatine dîtin. Ew hîç tîna hatiye hesibandin, wisa hatiye tinekirin ku ti kesên jê re lîlahî fatîha bixwîne nîne. Ne zindî ye ne jî mirî. Mîna “*Yaşar ne jiyan dike ne jî jiyan neke*” (Yaşar ne yaşar ne yaşamaz) Her di halê sîkratê de tê hiştin. Bi nêzîkatîya herî baş jê re “*Tirkê çiyayî yê ku Tirkî jî bîr kiriye!*” tê gotin. Di astek wisa de mêtîngeha tewtewqî (qatqatî) ye ku hin kes neçar mane jê re “*Mêtîngeha Navdewletî Kurdistan*” bêjin. Mîna erd û asîman gihiştine hev, dost û dijmin dest dane yek, di tinehesibandina Kurd de li hev kirine. De îcar em zanista pozîtîf a ku xwe dispêre diyardeyan de jî bi ser vê vekin. Zanistparêziya ku li gor mantixê “*Diyarde nînbe, rastî jî nîne*” diçe, îdîa dike ku diyardeya Kurdîniyê nîne, li ser navê zanistê jî Kurd tîna hesibandi-

ye. Ango, dibêje “*dîroka wê ya nivîskî tine, belgeya wê tine, wê demê Kurd jî tineye*” û tine hesibandîye.

Wisa bûye ku di cîhana salên 70’yan de, li navenda “medeniyetê” Ewrûpayê, di nav ti belgeyên hiqûqî de Kurdekî jî bi awayekî fermî cih negirtiye. Navê wê jî nîne. Ji ber ku ew rastiyeke tineye, jê wîrdetir jî xeyaletek (reşe) e!

Li vê cîhana salên 70’yan, dema ku Kurdekî xwest xwe bîne ziman, wê demê herî kêrvebîjêrka zindanê li ber pozê wî ye. Bûyera 33 Guleyan, serpehatiya qetilkirina wê ye. Gotinên, “*Li pişt min lûleyek sar nînbûya*” qîrîna Kurd e ku hatiye xistin û bi her cure rêbazên pelçiqandinê hevrû bûye. Her tişt, li ser esasê înkare li rûyê mirovên vê xakê dikevin. Înkarkerî ewqasî zêde, ewqasî kûr, ewqasî li qirikê ye ku Kurd nema dikare înkara li ser xwe jî bibîne. Di nava Kurd de avakirina lêqîniyek herî biçûk a hêviyê û tê de şînkirina vê pir zehmet e. Di bin vê rewşê de ku Kurd bi xwe jî pejirandiye, li ser çand, nasname û îradeya Kurd ji zû de hatiye betonkirin.

Çavên yekem ên ku di salên 70’yan de hatin avêtin, mîna erd û asîman hejand, mafê xwedîderketina li nasnameya xwe ya neteweyî-kulturî-sosyal ku mafê herî rewşa mirovî ye, bi bîr xistiye. Li dijî vê wek çawa destûra rêxistinbûyîna siyasî nedihat dayîn, hê di dema embriyon de jî destûr ji bo Tevgera Azadiyê nînbû ku bikeve Kurdistanê. Mafê dîtina civaka xwe û xwedîderketina li nasnameya xwe ku mafê herî mirovî û xwezayî ye, dihat tepisandin. Di 76’an de qetilkirina Aydın Gul, di 77’an de nava rojê qetilkirina sosyalîstê şoreşger ê enternasyonalîst Hakî Karer nîşan daye ku; ev der ne welatekî din ê cîhanê ye. Hêza li dijî Kurdistan û gelê Kurd ne hêzek ji rêzê ye. Eger wê pêdiviya hebûnê û mirovbûyîna were cih; wê demê wek pêdiviyek mirovbûyîna eger pêwîst bike wê ji bo maf û azadiyên xwe kuştinê bide ber çavê xwe û têbikoşe. Yek çiqasî navê ketîbûnê, bêqîmetbûnê û bêkorkbûnê be, ya din jî ewqasî navê mezinbûyîna, esalete û rûmetê ye. Ev jî bêguman tercîhek e ku mabeyna hebûn û tinebûnê de tê kirin.

Abdullah Ocalan vê rewşê di parêznameyên **DMME** de bi şiklekî harîqulade formule dike: “*Nexwestin, bikarneanîna hiqûqê, bêhiqûqiya herî mezin e. Li cihê ku bêhiqûqî hebe jî qanûnên daristanê derbasdar in. Lewma jî tevahî takekes, civat û gelên ku*

xwedî maf in, ji ber ku li beramberî neheqîyan bêdeng dimînin, hiqûqê bin pê dikin. Daxwaza maf û serîhildana dema ku bi darê zorê maf hatibe desteserkirin, mafê pîroz ê berxwedanê ye. Cewherê avabûna hiqûq û edaletê jî ev e.”

Bingeh û Ferasetên Civakî yên li dijî Têkoşîna Azadiyê tên Danîn

Abdullah Ocalan di parêznameya **DMME** de dibêje, “...Diyardeya civakî, bi awayekî giştî daneheva bîrewerî û îfadeyê ye. Çalakî jî ûnsûrê çalak di nav xwe de dihevine ku xwe dispêre vê danehevê, hê netefiyaye, veneguheriye danehevê. Yên ku serekeyên ûnsûrên çalak in jî mirovên wê demê ne. Ji bo tevgera civakî du amûrên îdeolojîk bi rola bingehîn radibin. Îdeolojî ku em dikarin bêjin dogma, rêgez, yasa ne, diyar dike ku bê wê hebûna civaka heyî di çi çarçoveyê de bilive , ji qaîdeyên têkildarî paşerojê û xeyalên têkildarî siberojê yên rakêşer pêk tê, enerjiya tevgerandinê ye. Şert, têkilî, saziyên civakî, siyasî û leşkerî yên hilberînê jî atmosfera madî ya bikaranînê saz dikin.” Li ser hîmê van nirxandinan, em di salên 70-80 de li rewşa Kurdistanê binêrin, li gor vê jî seknên beş û çînên civakî, karakter û ferasetên wan ragihînin, ew ê di warê şertên avahiya heyî û objektîf de ravekar be.

Feraset û Kesayetên Feodal Komprador

Li Kurdistanê pêşketina têkiliyên kapîtalîst û mêtîngerî, rê li ber lêgerîn û tevgerandinên nû vekiriye. Ji ber ku bûrjûvabûyîn lewaz bû, bi giranî jî avahiya civakbûyîna Kurd li ser hîmê eşîrî bi rêxistin bibû û giraniya çanda axa- beg, ji milliyetgiriya tê zanîn hê wîrdetir, rê li ber ferasetek qebileparêz a hê paşverûtir, teng û sere-tayî vekiriye. Ji ber ku gelek caran eşîrê ew sînorên malbatê nebi-huriye, pênaseya milliyetgiriya berê li cih e. Ev milliyetgiriya ku di wateyek teng de ava bûye, ji ber taybetmendiya vehûna civakî ya Kurd û karakterên beşên ku vê temsîl dikin, xwedî çawahiyeke nerazî, dilînî û jixweber e. Xwe naspêre bingehê xurt ê zihnî, bernameyek rasyonel û rêxistinbûyînek civakî. Dema ku hewl hat

dayîn tevgerek li ser navê Kurd an jî Kurdistanê çêbibe, wê demê jî motîfên herêmi û olî derdikevin pêş. Ev jî dibe sedem ku beş û çînên navbihurî her tim xwedî potansiyelek bikaranînê bin. Tebeqeya jorîn a ku wek çîna serwerên Kurd tê binavkirin, xwedî vehûnek dîrokî ye ku li ser esasê berjewendiyên biçûk xwedî meyla hevkarîyê ne û ji bo berjewendiyên xwe dikare her tiştî û her kesî pêşkêş bike- ev dibe birayê wî jî be. Ev beşa ku ji ber karaktera xwe nikare di wateyek modern de siyasî bibin, tenê tarzekî siyasî setê dizanin. Ew jî komplogeriya feodal e. Ji bo karibin berjewendiyên xwe yên teng û biçûk biparêzin, di nav xwe de ti carî rêya muxalefetê nadin, eger tiştekî wisa jî bibe, derhal dipelçiqînin. Dema vê dikin jî, hikmên wan ên rewakar pêşdaraziyên herî paşverû, dab û nêrîtên herî paşverû yên civakê bi kar tînin. Ji bo nîşan bidin ku bi Kurdîniyê girêdayî ne jî, nêzîkatîyên herî paşverû yên mîna xwedîderketina li rêbazên wek xwindariyê, şerê eşîran, berdêl û hwd. derdixin pêş. Fîkr û rêxistinbûyînen siyasî yên nûjen, pêwîst e karibe xwe bigihîne herêm û cîhanê û karibe berjewendiyên teng ên çînan bibihurin. Nêrîna serweriya feodal a nikare vê bike, ji nîrxandinek rewşa objektîf bêpar e. Wek çawa nikare dost-dijmin bi awayekî rast ji hev cuda bike, ji ya pêşîn û paşîn, heta eyarkirina dema tevgerandinê jî nikarîbûne tek tespîtek rast jî bikin. Têgihînek bi vî tarzî paşverû, di dîroka Kurdistanê de her tim bi gelê berxwedêr daye windakirin. Her çiqasî berxwedan bi heybetî dest pê kiribin û li sehayên berfireh berbelav bûne jî, ji ber van zîhniyet, lîder û rêxistinbûyînen paşverû û teng her bi dilêşî bi encam bûne.

Berxwedan û îsyane Kurd ên ku di sedsala 19'emîn de bi Babanzadeyan dest pê kir û bi Şêx Ubeydullah Nehrî bi dawî bûn, ji bo vê rastiyê mînakek sosret e. Ji bo berxwedanên sedsala 20'emîn jî heman tişt dikarin werin gotin. Di pêvajoya berxwedanan de ku bi Berzencî, Îsmail Simko û Şêx Seîd dewam kir, bi êş û qetlîamên mezin qediyar, Kurdan mezin wînda kirine. Her çiqasî rê li ber şiyarbûyînek neteweyî vekiribin û bîranînen tijî hest li pey xwe hiştibin jî, bûne pêvajoyên ku vehûna berxwedêr a Kurd herî zêde texrîb bûne û şikestine. Piştî pêvajoya îsyane û berxwedanan a di sedsalên 19'emîn û 20'emîn de, hêzên mêtînger malbatên tebeqeyên jorîn ên Kurd ku pêşengtiya îsyanan dikirin li ba xwe digirin, kedi dikin û di kontrol û pelçiqandina gel de wek amûrekî

bi kar anîne. Ji malbata Babanzade heta Bedirxanan, malbatên tevahî reîsên ku îsyân û berxwedan bi pêş xistine, bûne beşên ku herî zêde xwe li hevkarîyê kirine xwedî û ji bo kontrolkirina têkoşînên li ser navên gelê Kurd xwe dane bikaranîn.

Zarokên wan malbatên ku di sedsala 19'emîn de pêşengtiya berxwedanên Kurd dikirin, li dibistanên Babialî mîna tebeqeya hevkar a siberojê dihatin gihandin, wê li beramberî berxwedan û îsyanan jî bi rola kilîda ewlehiyê rabin. Heman tişt, jî bo malbatên ku di sedsala 20'emîn de pêşengtiya berxwedanan Kurd kirine jî derbasdar e. Di serî de malbata Şêx Seîd, jî bo tevahî malbatên ku xwedî cewherek berxwedêr in, ev siyaseta bi pisporî hatiye birêvebirin. Dewletên emperyal û mêtînger, jî bo karibin li welatên mêtîngeh serweriya xwe ava bikin, beşên ku ketina nav hewldanên îsyane û yên ku bi tepeserkirinê hatin teslîmgirtin, dûvre wek hevkarên herî baş gihandine û bi kar anîne. Wek amûrekî kontrolê bikaranîna kesên lewaz û têkçûyî, polîtîkaya herî berbelav a mêtîngeriyê ye. Ev polîtîkaya ku li ser Kurdan tê bikaranîn, jî têgihiştina wê wirdetir, jî ber di astek jor de dawerivandine û fêr bûne, jî aliyê tebeqeyên wan ên elît bi dildarî pêk tên. Ev polîtîka, polîtîkaya "*parçe bike- bi rê ve bibe*" bi xwe ye. Bi gotinek gelemperî, polîtîkaya "*pevşikandinê*" ye. Ev dehfikek e. Lingê herî xerab ê xefka Kurd jî, kesayet, feraseta û çanda van beşên komprador feodal in.

Beşa ku di çaxê modern de vê polîtîkayê didomîne û kiriye partî, PDK-I ye. Ji bo emperyalîzmê, hîzakirina Rojhilata Navîn, ewil hîzakirina Kurdistanê gerek dike. Ji bo Kurdistan bê hîzayê jî, piyona herî baş milliyetgiriya begên feodal in ku wek milliyetgiriya berê tê binavkirin, teng e, nikare sînorên herêmê derbas bike û xafil e. Ji ber karakterên xwe dikarin werin bikaranîn. Û polîtîkaya herî berbiçav a emperyalîstan e ku li Rojhilata Navîn wan mîna Hespa Trûvayê bi kar tînin an jî rolê didin wan. Di vê çaxê de jî ber ku pêşketina têkilî û amûrên hilberînê bingeên wan hejandine û lewaz kirine, li dijî hêzên cewherî yên gel rolên herî xeter li xwe girtine. Ji bo karibin elimandinên xwe yên jiyanî û dewlemendiyên xwe yên madî û jiyanî xwe ya arîstokrak bidomînin, wek tekane çeka wan, xwe li dijî tevgerên azadiyê didin bikaranîn. Ji bo berjewendiyên xwe yên biçûk û teng, hewl didin her roj pêwendiyê li

ba hêzek din deynin û jiyana xwe bidomînin. Li vir rêgeza di meriyetê de ye wiha ye, *“ji bo berjewendiyên xwe yên biçûk, her tiştî bifîroşe”*. Ya ku ji bo berjewendiyên biçûk ên malbatê, li dijî welêt û gel îxanetek eşkere ye. Ya girîng li vir berjewendiyên malbatî û eşîrî ne. Ji ber vê jî kirinên xwe wek îxanet jî nabîne, berevajî vê di nav dilrehetiyek mezin de pêk tîne.

Dema ku PDK-I’ê xwe li çar parçeyên Kurdistanê bi rêxistin dike, xwe dispêre serokeşîr û began. Ji ber bisazî bûne û bavên pereyan e, ji tehlûkeya potansiyel wîrdetir, bûne tehlûkeyek sûbjektîf. Di siberojê de jî wê li rex dewletên mêtînger cih bigirin û berê xwe bidin tevgerên azadiyê. Wisa bûye ku ji ber qurnazî û komplogeriyê jî baş dizanin, gelek rewşenbîr, welatparêz û şoreşgerên bi qîmet bi çavreşî qetil kirine. Di salên 1970’yan de dema ku li Bakurê Kurdistanê tovên Tevgera Azadiyê dihatin avêtin, zarokên gelek axa, şêx û began ku li metropolên Tirkiyeyê dixwendin û paşnavên wan bi “...oğlu” diqede, wek çawa xwe ji vê dûr girtine, her wiha êrîş jî kirine. Jixwe, dema ku Tevgera Azadiyê dixwaze li Kurdistanê berbelav bibe jî ev beg û kompradorên feodal dibin astengiyên herî mezin. Neteweyek heye ku heta atomên xwe hatine parçekirin û li rexê tinebûyîne disekine û ji bo qedandinê jî her tişt tînin kirin, hê jî zarokatî ve li dibistanên şevînî dikevin nav çerxên qirkirina çandî. Di van şertan de tiştê ku tê payîn serhildana hestên neteweyî ne. Lê mixabin, beg û kompradorên feodal ên Kurd, ji bo berjewendî û têkiliyên xwe yên malbatî wînda nekin, seknek wisa nîşan dane ku vê rêveçûyîna serberjêr hê bêhtir kûr û parçe kirine. Ji ber ku tevger an jî tevgerên azadiyê wê bîreweriya neteweyî bi pêş bixe û bingeheên wan ên bêyom teng bike, ev beşên komprador feodal-hevkar, ji serî ve êrîşî tevgera azadiyê kirine. Tevî ku 20-30 sal jî derbas bûne, hê ev tebeqeya sîxur-hevkar, li dijî Têkoşîna Rizgariya Neteweyî ya Kurdistanê di serî de wek cerdevantî, bi şiklên cur bi cur tînin bikaranîn.

Feraset û Kesayetên Tevgerên Reformîst û Teslîmkar

Reformîzm û teslîmkarî, taybetmendiyek esasî ya avahiyên bûrjûvaya biçûk e ku li ser destê milliyetgiriya berê pêş dikeve. Ji

ber ku li Kurdistanê çîna jorîn an jî tebeqeya feodal têkiliyên kapîtalîst danîne, bi demê re avayiyên bi formê bûrjûvaya biçûk çêbûne. Ji ber ku bûrjûvabûn bi temamî bi patentî çîna serwer a bûrjûva ya mêtîngeran bi pêş ketiye, helwest û taybetmendiyên cidî yên şoreşgerî wek mîna di gelek têkoşînê û tevgerên rizgariya neteweyî de tê dîtin, li Kurdistanê zêde nayê dîtin. Bûrjûvaziya ku li Kurdistanê ji rêveçûna objektîf afiriye, ji bo bazara xwe bi xwe jî tînaqoşe, nikare tîbîkoşe. Ji ber ku ji navîkê ve girêdayî têkiliyên aborî yên mêtîngerîyê ne. Bi destûra wê ve hene. Mîna dest û lingê veşartî yên hêza mêtînger, li Kurdistanê ne. Ji ber ku tekane rêya ku wê li Kurdistanê dewlemend bike, bike bûrjûva û di warê ekonomî de bi pêş bixe yan jî bi şîklekî bike hêz, divê şîrkatiya polîtîkayên înkâr û îmhaya mêtîngerîyê bike. Ji înkarkirina xwe jî wîrdetir, li ba mêtîngerîyê di qirkirina Kurd de xwedî par be. Ji bilî vê jî rêyek din nîne. Bedelê bajarên mezinbûyî û têkiliyên kapîtalîst, bûye kûrkirina înkâr û qirkirina Kurdan. Û ev rewş jî bûye sedem ku bûrjûvaziya Kurd di nav civakê de li dijî gelê xwe wek hêzek îmhayê rolê bilîze.

Li Kurdistanê, piştî nivê sedsala 20'emîn û şûn de, bi giştî rewşek wisa derketiye holê. Têvî ku bi şîklekî sînordar bûrjûvayek bi pêş ketiye jî, li qadên bajar û çolteran meyla bûrjûvaya biçûk hê leztir bi pêş ketiye. Li bajarên li ser esasê xizmeta burokrasiya dewletê bi pêş ketiye, li çolteran jî mîna bûrjûvaya biçûk a gund tîna dîtin. Ev beşa ku hevkarîya çîna serwer a Kurd a hevkar, ango beşên komprador feodal dike û xwe dispêre burokrasiya dewletê û bi alûdetiyê wê bi pêş dikeve, hê bêhtir xwedî karakterî neteweya serwer a mêtînger e. Wek çawa xwedî li nîrxên neteweyî dernakevin, her wiha bi nêzîkatîyên xwe jî biçûk dixin. Ji ber ku xwedî seknê navîn in, nikarin qut jî bibin. Berevajî, di rewşek kopyaya hê xerabtir de ne. Û pir caran jî rolek hê paşverûtir dilîzin. Zêra ji ber karakterên xwe xapînok in û hêviyê belav dikin. Lê çî heye ku, dema pê hesiyên ku tehlûke yan jî zoriyek biçûk heye, hema zûzûka gel li ortê dihêlin û pê li wan hêviyên belavkirî dikin. Pêvajoya pêkhatî bi temamî wisa bûye. Ev rewş jî bûye sedem ku gelê Kurd hê bêhtir bêhêvî bibe, li beramberî tevgerên bi rastî jî şoreşger, durîst û dilsoziyên gel jî bi tevdir nêz bibe. Lewma jî dema em bêjin ku rola herê bîyom a dîroka Kurdistanê li xwe girtine, wê ji bo civaknasiya me ya dîrokî bibe tespîtek girîng.

Abdullah Ocalan di parêznameyên xwe de taybetmendiyên bingehîn ê vê çînê wiha rêz dike: *“Rêbertiya van avahiyên ku xwedî taybetmendiyên çînî yên mîna bizonek, bintûte (tune), ji rastiyan dûr û zehf teslîmkar e, kengî fersend dîtî bi meylek milliyetgiriya reformîst tevdişî. Pêşketîna milliyetgiriyeke bi vî tarzê heye. Rastiya objektîf bi vê ve dehf dide. Ji ber li pey wê feodalîzm, li çar aliyên wê hêzên dewletên neteweyên serwer, li pêşîya wê jî gel heye, ev meyla bûye xwedî taybetmendiyên kêmtir dîtî. Wek taybetmendiyên îdeolojîk, siyasî, çandî û pratîk ên meyla vê çînê, qurnazî, keysperestî, komplogerî, durûtî, îxaneta jî nişka ve, her cure şemetokbûn, beriya her tiştî fikrandina berjewendiyên xwe, bêrêgezî, nêzîkatiyên tawîzdêr, mîna bûqelemûnê (margîse) guhertîna rengên xwe, bi qasî ku jî nişka ve dibe şoreşger ewqasî dibe dij şoreşger, bêbawerîya li beramberî gel, her tim daxwaza efendiyan ku dikare piştî xwe pê germ bike, dilîni an jî bêxemiya zehf zêde, qasî ku jî îdeolojiyê bêpar e heta jê tê demagog e, jî nîrxên moral bêpar e, qasî îsyankariya lezûbez teslîmkariya zû, bi qasî avakirina xetê û hembêzkirina îdeolojiyekê bi hemrengî dest jê berdan û bêxetî, bi reng tevgerî, lê di bin de sekanî û tirafî, têkildarî paşarojê qasî agahiyên bêbingeh û dogmatîk ewqasî korî, têkildarî siberojê qasî bêhêvîtiyê ewqasî jî xeyalên vala derdikevin pêşberî me. ”*

Piştî nivê sedsalê 20'ê emîn, jî ber tevgerên rizgariya neteweyî, tevgerên ciwanan û welatên sosyalîzma pêkhatî di rewacê de bûn, li her çar parçeyên Kurdistanê jî bûye sebeb ku tevgerên xwedî karakterên bûrjûvaya biçûk bi pêş bikevin. Ev meylên ku terîma çepgir jî devê xwe nedixistin, jî ber karakterên xwe li ba hêzên emperyalîst gelek têkiliyên bê rêgez danîne. Li ser vî esasî jî hem gotina şoreşger û sosyalîst bi kar anîne hem jî li dijî meylên şoreşger jî bûne xencerê jî piştê. Li Kurdistanê piranî di nav PDK-I'ê de an jî wek dûvikê wê bi pêş ketine, mîna li gelek parçeyan hat dîtî, wek tevgerên sosyalîzma pêkhatî yên di yêdeka partiyên komunist de ketine dewrê. Ji ber seknên bêrêgez, zehf caran rola wan jî ya hêzên bi lîdertiya feodal, milliyetgiriya berê he xerabtir bûye. Ji ber ku wek li jor jî hat ziman, dema naveroka gotinê çepgir û sosyalîst be, wê demê li beramberî tevgerên azadiyê jî bêbawerî tê afirandin.

Ji ber ku tevgerên teslîmkar reformîst ên bi karaktera bûrjûvaya biçûk, ji derxistina kovarê, ji daxwaza rê-avê wirdetir neçûn û mîna ji pîrebokan direvin ji têkoşîna şoreşgerî revîyan û tabî ji ber vê kesayet û feraseta bêyî ku ji Faşîzma 12'ê Îlonê şeqamekê jî bixwin teslîm bûn, bêhêvîtiyek erjeng berbelav bûye. Ev hêz tenê bi têkçûn û tasfîyebûnê têr nebûne, her wiha lîstina bi hêviyên gel jî bes nedîtine, di heman demê de ji bo karibin xwe bidin jiyandin ji tetîkkêşîya yekser û neyekser a hêzên mêtînger bigire, heta berdevktiya wê kirine û heta êrîş birine li ser tevgera azadiyê, ango xwe ji ti cureyên xebatên ajantiyê nedane paş. Wek nûnerên sereke yên vê meylê rêxistinên mîna Rêya Azadiyê (PSK) ya ku li Bakurê Kurdistanê serîkêşîya wê Kemal Bûrkay dike, li Başûr jî rêxistinên mîna YNK'ê dikarin werin nirxandin.

Rêxistinên Dijber ên Fêrî Îxanetê Bûne

Tevgera Azadiyê ya ku ewil li Enqereyê mîna komek xwendekaran bi pêş ket, di sala 1976'an de berê xwe dide Kurdistanê. Pêvajoya di navbera salên 1973-1975'an de, ji bo Tevgera Apoyî mîna pêvajoya lêkolîna teorîk dikare were binavkirin. Pêvajoya di navbera salên 1975-1977'an de jî dema têkoşîna birdozî ye. Piştî sala 1977'an jî wek dema têkoşîna polîtîk dikare were binavkirin. Her çiqasî di navbera pêvajoyan de sînoren hişk nînbîn jî, ji bo dewreyên guhertina avahiya dîrokî ya pêşketina Tevgerê, ev pênasayên demê girîng in. Her demek nû ji nav ya din derketiye û wisa bi pêş ketiye, lewma jî şert û taybetmendiya esas ên demekê di nav şert û taybetmendiya dema din de çêbûne. Ji ber vê jî bi xetên sînoren hişk nikarin werin cudakirin. Pêvajoya têkoşîna îdeolojîk a mabeyna salên 1975-1978'an de pêvajoyek wisa ye ku wê fikr bibin malên girseyan, bi taybet jî ciwanan û kadro bîn afirandin. Ji bo gel veguhezandina îdeolojiyê, li ser esasê vê îdeolojiyê rêxistinkirina gel û ew çalakirin, îşaret in ku Tevgerê ketiye nav dema xwe ya siyasî.

Tevgera Apoyî, di salên ewil de li ba gelek rêxistinên Kurdistanî û Tirkiyeyî pêwendî danîne, xwestiya rêxistinbûyîn û têkoşînek hevpar were meşandin; demek dirêj çavê xwe bernedaye

plana avayiyek cuda û nû. Xwestiye di nav Tevgerên Çepgir ên Şoreşger ên Tirkiyeyî de cih bigire û nêzî wan, ev wek gerekê rêgeza xwişk û biratiya gelan hatiye dîtin û di vê helwestê de israr kiriye. Di avabûyînê de hebûna 2 mîlîtanên Tirk ên ji Deryarêş wek çawa îşaretê bi vê rastiye dike her wiha bûye xerca avabûna Apoyîtiyê jî. Wek çawa dûrî Çepgirên Kurd nesekiniye, her wiha her tim xwestiye bi hev re xebatê bimeşînin. Lê, derdora çepgir an jî rewşenbîr a ku wek Çepgirên Kurd tê binavkirin, ji ber ku bi giranî ji zarokên serokeşîran û kompradorên dewlemend pêk dihat, cêwaziyên zehf bingeşîn jî hene. Her çiqasî di gotinan de çepgir û sosyalist jî bin, pratîkên wan nêzîkatiyên çîna jorîn derbas nekiriye. Gotinên Kurd an jî Kurdistan hatibin nirxandin jî, yan ev spartine Başûr an jî daxwazên ku em dikarin bêjin ne pariyek e jî derbas nekirine. Tevgera Apoyî, ji 1973'yan dest pê kiriye, nêrîna sosyalist a ku xwe dispêre gundîtiya xizan û her wiha çîna karker û kedkar a ku li Kurdistanê nû bi pêş diket dikir hîmê xwe, ji xwe re esas girtiye. Feraseta sosyalîzmê, ji serî ve ne tenê li gor welatên sosyalîzma pêkhatî bû. Her çiqasî ne zehf berfireh û kûr bin jî, hewldanên pêşxistina nêzîkatiyên xweser çêbûne. Ji pêkanîna fikrekê û şablonekê zêdetir, bersivdayina mafê hebûna gelekî û daxwaza azadiyê hatiye esasgirtin. Ji ber vê jî hê di dema lêkolîna teorîk de jî nakokî bi hin beşên çepgir û Kurd re çêbûne. Ji ber nêrînên xwe yê radîkal, îdîaya ku têkoşînê dispêre gel û gotinên *“Kurdistan mêtîngeh e”* yan jî *“Li Tirkiyeyê du netewe hene”* bûye hedefa gelek tevgeran.

Di dema têkoşîna îdeolojîk de, xebatên ku wê nêrînên xwe rêkûpêk bike û van veguhezîne, bi awayekî otomatîk dihat wateya teşhîra objektîf a gelek derdoran. Lewma jî pêşketina Tevgera Azadiyê wê bibûya derbaskirina derdorên reformîst û hevkar, derdorên sosyal şoven. Nêzîkatiyên mîna *“Ji bo rojhilat rê, av, elektrîk”* an jî *“Pirsgirêka Kurd; dema Şoreşa Tirkiyeyê çêbibe wê bê nirxandin”*, di demek nêz de wê li beramberî projeya Tevgera Azadiyê ya ku ferdê azad, gelê azad û welatê azad diafirîne, biçûba ber golikan.

Abdullah Ocalan vê rastiye bi awayekî harîqulade wisa tîne ziman: *“Îdîaya me ev bû: Çepgirên Tirk ên di bin serweriya şovenîzma sosyal de tenê dikarin bi pêşketina Tevgera Rizgariya*

Neteweyî ya Kurdistanê bi ser xwe ve werin. Vê gotina Kemal Pîr rewşê baş xulase dike: ‘Rizgariya gelê Tirk di rizgariya gelê Kurd de ye.’ Dîrokê jî rastiya vê nêrînê peyîtandiye.’

Li ser vî esasî, dema ku nû bi nû li Kurdistanê xebatên îdeolojîk dest pê kirin, komên ku wek sosyal şoven, milliyetgirên berê û reformîst tîn pênasekirin ku gel mehkûmî halê heyî, bêrêxistinî û jixweberiyê kiribûn, diranên xwe nîşan dan. Di sala 1976’an de Aydın Gul ji aliyê rêxistina bi navê Halkın Kurtuluşu (HK) ku wê demê wek sosyal şoven dihat zanîn, hat qetilkirin. Hakî Karer, heman salê dema li Êlihê xebat dimeşandin ji aliyê hêzên milliyetgirên berê hat teşhîrkirin û di 18’ê Gulana 1977’an de ji aliyê avayiyek sîxur a bi navê Stêrka Sor (Beş Parçacılar) bi komployekê hat şêhîdkirin. Van jî nîşan didan ku bê bedela têkoşîna şoreşê ya li Kurdistanê çi ye. Hê beriya xebatên siyasî dest pê bikin, êrîşên li dijî Tevgera Azadiyê pir dijwar bûne. Ji ber ku pêşketina Tevgera Azadiyê wê ji bo van tevahî hêzan bibe hejandinek mîna zelzeleyê û ev komên ku gotin û kirinên wan li hev nayên wê bihatana derbaskirin. Apoyiyên ku gotin û çalakiyên wan yek in, bi cewherê xwe ve nêzî gel disekinin, dema pêwîst dibe jî bêtî çavê xwe bi-

niqînî mîna ku silavê li mirinê dîkin dimeşin, di demek kurt de wê ji kûrahî bandorê li gel bikin.

“Meşa bi ser rastiya esas de tişteki din e, zanebûna bê meşek çawa gerek e jî tişteki hê cudatir e.” Tevgera Apoyî li beramberî vê rastiye hem yekgirtina gotin û ahengê ava kiriye hem bi ser rastiya esasî de meşiyaye hem jî ji bo meşek çawa bersivên saxlem afirandine. Kemal Bûrkay ê ku piştî salên dûvdirêj ji bo li dijî Tevgera Azadiyê cara dawî bê bikaranîn anîn Tirkiyeyê, her çiqasî qewimînên wan salan li gor dilê xwe berevajî bike jî, esas ev e.



HAKÎ KARER

Tevgera Azadiyê pêlek bû, pêlek azadiyê! Di dîroka Kurdistanê de cara yekem wek pêlek nû ya ji binî ve tê bibû deng û pêşengên kesên ku dengên wan nedihat bihîstin, biçûk dihatin dîtin, hatibûn bêqîmetkirin, ne xweyîyê tiştêkî bûn, li milê din ê avê û derveyî dîrokê hatibûn hiştin, çîprût bûn. Vê meşa, serwer diqutifandin. Lê, di astek muthîş de hêvî û coş dida gel. Ji ber Tevgera Azadiyê digot dema pêwîst bû wê xwe û gel bi çek bikin, ziravê van beşan diteqiya. Hin koman digotin, *“hûn me ber bi mirinê ve dibin”*, hinên din jî bi şiklê *“hûn provokatortiyê dikin, hûn ê komaleyên me bidin girtin”* tewanbarî dikirin. Diyardeya ku bi gotina *“hûn me ber bi mirinê ve dibin”* îfade dikirin, bi vî şiklî ve eşkerekirina cewherê faşîzan ê KT bû. Avayiyek faşîzan a înkarker û îmhaker ku esasê wê diyar bûye, helbet her kî li ser navê Kurd rabûye wê berê xwe bidîyayê. Ji bo vê jî her cure êrîş heqê xwe didîtin û wisa jî pêk tanîn. Ev antî-propaganda di nav gel de kiribûn şano û didomandin. Lê çi heye ku ev propagandayên qirêj giştî li hesabên wan nedihat û hê bêhtir Tevger û gel pev kilît dikirin. Ji ber ku gel, şoreşgerên rast baş dinasî. Lê belê, tevî ku rastî ev in jî, yên ku berê dest ji doza azadiyê berdabûn û ev xak terikandibûn, li dijî yên ku di doza azadiyê de bi ruh û can têdikoşin hê heta îro jî, lê belê vê carê li rex avahiya dewletê ya faşîst cihê xwe digirin, ji bo têkoşîna azadiyê û şervanên wê bi awayekî pir kirêt derewên dîrokê hem dubare dikin hem jî heqaretê lê dikin. Yên dîrokê dizanin vê baş dizanin ku li gelek welatên cîhanê li dijî şervanên azadiyê li heman xakê – qaşo hinên ku carina ji bo doza gelê xwe dikevin rê, diçin ba dewletên mêtînger û emperyalist, li dijî şerê azadiyê tên sorkirin- giştî jî xwe diavêjin hêmbêza hincet û argumanên hemreng. Rastiya ku dibêjin îroniya dîrokê her hal ev e.

“Li cihekî herêma Serhedê, komên Kurd ên reformîst civîn li dar dixistin, aktîvîteyên şevê amade dikirin û gazî gel dikirin. Skêçên ku behsa hevalan dikirin, dilîstin. Di lîstokê de ji her komê mirov hene. Nûnerên ji DDKD, Rêya Azadiyê, Rizgarî, Çepgirên Tirkên li dor maseyekê rûniştibûn û nîqaş dikirin. Di vê kêliyê de Apoyîyek tê û ew jî li dor masê rûdinê. Her kes mafê axaftinê werdigire û nêrînên xwe tîne ziman. Dûvre ji Apoyî dipirsin, ‘kêkê min gelo tu dibêjî çi?’ Li ser vê ew jî çeka xwe dikşîne û dibêje ‘ez ê neaxivim, li ser navê min ev ê biaxe.’ Li ser vê jî girse çepikek

muthîş lê dide. Propagandayên di aleyhê Apoyîtiyê de jî lê vedigere, ji ber ku gel xwedî aqlê selîm e.” (Ji Bîranînên Gerîla)

Piştî nîva ewil a 1970'yan, Tevgera Azadiyê bi lezûbez li Kurdistanê bi pêş dikeve. Li beramberî statukoyên dihejin, feraset û komên kevn û paşdemayî wek tê payîn ji bo pozîsyona xwe ji dest nedin, êrîş dikin.

Piştî têkçûna Başûr a 1975'an, milliyetgiriya berê dikeve bin bandora hêzên emperyalîst. Samî Abdûrrahman ê ku ewil berpîrsê karên derve yê PDK-I ye û dûvre wê bibe sekreterê giştî, piştî qetilkirina Dr. Şivan û hevalên wî, bi MÎT'ê re rêveberiya PDK-T desteser dikin. Derwîşê Sado yê ku wek sîxurê MÎT'ê tê zanîn, dikin berpîrsiyar. Wek wezîfeya xwe ya yekem jî li Kurdistanê astengkirina berbelavbûyîna tevgerên Marksîst-Lenînîst destnîşan dikin. Van tevgeran, wek şûrê Demokles ê li ser serê Kurdan dinirxînin. Ji bo karibin hilgirên van ramanan tine bikin, bi taybet tîna birêxistinê dikin.

Wê demê Derwîşê Sado, ji bo Alaattîn Kapan ku li cem KÛK, KÛK-SE (Meyla Sosyalîst) xwedî pêwendî ne, -ev kes di çapemeniya Tirk de wek amadekarê qetlîma 1'ê Gulana 1977'an hat teşhîrkirin- li Elezîzê bi navê “Stêrka Sor” rêxistinek ajan ava dike. Ev rêxistina ku di esas de paravan e, hin gotinên Apoyîtiyê bi kar tîne, rengê rêxistinek sosyalîst, modern û neteweparêziya Kurd dide xwe, li ser bingehê dijberiya Apoyîtiyê tê damezrandin. Jixwe, Hakî Karer ku kadroyê lîder şoreşger ê herî rêzdar ê Tevgera Apoyî ye, ji aliyê ajanê bi navê Alaattîn Kapan ê ku endamê vê tevgera sîxurî ye, di 18'ê Gulana 1977'an de tê qetilkirin. Tevgera Azadiyê ya ku wek tevgerê gotin û çalakiya wê yekgirtî ava dibe, di serî de kujerê Hakî Karer, hin kesên din ên di vê kompoyê de hevkarî kirine bi înad dişopîne û ceza dike.

Ji bo li Kurdistanê pêşî li têkoşînê bê girtin, tenê bi vê jî sînorê namînin. Dema Tevger xwe li dijî çeteyên mîlîs ên faşîst di-parêze, beşên serwer feodal ên ku bi van re şîrîkatiyê dikin jî hevkarîyê bi dewlet û çeteyên faşîst re dikin, ji bo girseyî nebe jî berê xwe didin Tevgera Apoyî. Vê carê jî di 19'ê Gulana 1978'an de li Hîlwanê (Curnê Reş) lîderekî rêzdar ê gel Halîl Çavgûn tê qetilkirin. Nêzîkatiya di vê bûyerê de ew bû ku wê Tevgera Azadiyê bikişandana nav şerê navxweyî û bi vê ve mijûl bikirana, wisa jî

hebûna kadroyan ji holê rabikirana. Bi vê yekê ve jî xwestin îdeolojiya şoreşgerî nebe malê ciwan û gelê Kurdistanê, hedef kirin ku çavkaniya şoreşgeriya herî esasî ya dîroka Kurdistanê zûka ziwa bikin.

Dema ku Tevger hê bi vê ve mijûl dibû, komployek din jî tê avakirin. Komploya ku li sêgoşeya Dîlok, Dêrsim û Enqereyê hat amadekirin, vê carê jî bi rêka rêxistina paravan a bi navê “Têkoşîn” dikeve meriyetê. Komploya ku hewl hat dayîn bi Stêrka Sor bê kirin û nivco ma, vê carê jî wê hewl bidin ku bi destê Têkoşînê bigihînin encamê. Ev rêxistina paravan a ku bi temamî ramanên Apoyî tîne ziman, heta vê jî bes nabîne û Apoyîtiyê bi pasîfbûn û reformîzmê sûcdar dike, qaşo wek xwedî li hevrê Hakî Karer derdikeve wê di nav rêxistinê de nîqaşa Hakiyî û Apoyî ava bikin, wisa jî wê Rêbertiya Tevgerê hedef bikin. Wek li jor jî hat ziman, wê ji milekî çeteyên feodal, ji milê din rêxistinên mîlîsên faşîst berê xwe bidin Tevgera Azadiyê û li gel vê wê jî hundir jî ev rewş pêş bikeve, lîderên tevgerê bîn qetilkirin û wisa jî beriya dest bi hereketê bike wê Tevgera Apoyî bê tasfiyekirin. Plan ev e. Yê ku komplo amade kirine, bi xwe qetilkirina hevrê Hakî Karer plan kirine û ev pêk anîne. Tê zanîn ku komplo ji aliye MÎT’ê hatiye amadekirin. Têkiliyên Alaattîn Kapan û MÎT’ê eşkere ne. Hê di ser şehadeta Hakî Karer re salek jî derbas nebûye. (18’ê Gulan- 3’yê Hezîran 1978) Rêxistinbûyîna sîxur a bi navê Têkoşîn, hewl dide bi xêra heman navendê bi bandor bibe. Li Dîlokê di hejmarek girîng de hêza kadro tê qutkirin û bandorkirin. Mejî tîn tevlihevkirin, bi taybet jî bi navê Hakîparêziyê, bi hestên kadroyan tê lîstin. Piştî ev rewş tê ferqkirin, kadroyên lîder ên Tevgerê bi pêşengtiya Abdullah Ocalan tîn Dîlokê, pêvajoyek nîqaşên kûr didin destpêkirin, komployek bi giştî aliyan ronî dikan. Gelek kadro jî vê pozîsyona şêlû xwe rizgar dikan û dîsa li refan vedigerin.

Hin milîtanên ku di vê demê de qut dibin jî, mîna rexnegiriyekê tevli berxwedana zindanê dibin û dîsa digihêjin Tevgera Azadiyê. Yek ji van milîtanên jî hevrê Alî Ereke e ku şehîdê yekemîn ê Amedê ye û wek Cin Alî tê zanîn.

Yek ji taybetmendiyên karakterîstîk ê vê pêvajoyê jî ew bû ku hikûmeta bi pêşengtiya Cumhuriyet Halk Partisi (CHP) ya di serokatîya Bulent Ecevit de, hevkarî xist dewrê. Bi gotinek din, hewl

da milliyetgiriya reformîst û milliyetgiriya berê ya Kurd bike yek û li dijî Tevgera Apoyî derxe. Hikûmeta Ecevît a ku di desthilatdariyê de kêmhêjmar man, ji bo karîbûya ji nû ve bibe hikûmet pêdivî bi dengê 11 wekîlan didît. Dema ku 11 wekîlan ji Adalet Partisi (AP) îstîfa kirin û derbasî CHP'ê bûn, hikûmet ji nû ve hat damezrandin. Hikûmeta nû di wan salan de KUK, ALA RIZGARÎ, Rêya Azadiyê û komên din li hev civandin û bi navê Yekîtiya Hêza Demokratîk a Neteweyî bi navê kurtkirî UDG an jî UDGB derxist holê. UDG, li ser vî esasî wek rêxistinbûyînek eniyê yekser li dijî Tevgera Apoyî hat damezrandin. Lîdertiya vê ya îdeolojîk di pêşengtiya Kemal Bûrkay de li ser milên Rêya Azadiyê bû. Hêza wê ya çekdar jî KUK bû ku ji kevneşopiya PDK-I'ê dihat û dûvikê wê yê li Bakur bû. Hêzek din a ku piştgiya van dikir jî Partiya Komunîst a Tîrkiye (TKP) bû. Hêzên sosyal şovenîst ên ku li eniya Tîrkiyeyê cih digirtin wê helwesteke wisa bişopandana. Ji bo vê avahiyê mirov dikare bêje tifaqa milliyetgiriya berê û milliyetgiriya bûrjûvaya biçûk. Ev avahî, wê libek gule jî neavêta mêtîngeran û hema şemaqek jî li wan nedabana. Lê, di serî de Mêrdîn, wê li gelek qadan li dijî Tevgera Azadiyê bi tevahî hêza xwe êrîş bikirana. Di van êrîşan de wê zêdetirî heftê (70) kadro û welatparêz bihatana qetilkirin ku gundiyên hejar jî di nav de ne. Herêma Mêrdînê veguherîbû mîna qadek şer. Eger PKK'ê bihata tasfiyekirin, qaşo wê Ecevît ew bikirana muxatab û ji bo bazarê li hev rûniştibana. Tevgera Apoyî, nikarîbû pêşî li van êrîş û vî şerî bianiya, tevî ku xwîn jê çû jî, lê dîsa xwe parast û UGD negihîşt daxwazên xwe. Abdullah Ocalan ji bo **Yekemîn Konferansa PKK'ê** ku di sala 1981'an de li Lubnanê hat lidarxistin, Rapora Polîtîk pêşkêş dike û vê pêvajoyê wisa tîne ziman:

“...Têkoşînên li dijî milîsên faşîst, li dijî nûnerên har ên mêtîngeran û polîsan, li dijî xayinan, ajanan û axayan rast bûn. Û ji bo gel dengê girîng veda. Her wiha têkoşîna îdeolojîk a li dijî şovenîzma sosyalê û milliyetgiriya bûrjûvaya biçûk a reformîst jî rast bû, li cihê bû û rê li ber pêşketinên girîng vekir. Lê, di têkoşînê de ku li dijî sosyal şovenan, milliyetgirên bûrjûvaya biçûk a reformîst hat meşandin, tevî ku wan tifaqên pîroz ava kirin û li ser esasê tundiyê êrîşî me kirin, di vê mijarê de her cure tehrîk bi pêş xistin, rêbazên şoreşgerî bi temamî li derve hiştin, diviyabû ku em nehatibana listokên wan û me têkoşîna îdeolojîk

ji rêka wê dernexistiba, nekiriba têkoşînek li ser esasê tundiyê. Ji bilî parastinên mecbûrî, divê rê li ber ferasetên bi şiklê bersiv-dayînê jî bihata girtin û me karîbûya pêşî li van ferasetên ku li hin herêman bi pêş ket bigirta. Her çiqasî bi giştî tespîtek wisa ya Tevgerê tine be jî, ev ferasetên ku xwecih bi pêş ketin, zerar dane têkoşîna me.

Li beramberî provokasyonên sosyal şovenan li Dêrsimê, li beramberî êrîşên UDG'ê li Mêrdînê, tevî ku tersî xeta partiye jî bû, li ser esasê tundiyê bersiv hatiye dayîn. Ev, her çiqasî têkoşînên parastinê yên mecbûrî jî bin, divê me ji serî de derfetê pêkhatina van rewşan nedabana, têkoşîna li ser esasê tundiyê bisekinanda, di vê mijarê de serî li her cure çareseriyê bida û me karîbûya têkoşîn li ser esasê îdeolojiyê bigirta. Ev wê hê bêhtir li gor berjewendiyên tevgera me û Têkoşîna me ya Rizgariya Neteweyî bûya. Di vê mijarê de êrîşkarên esas ew kes in ku bi têkoşîna îdeolojîk qayil nabin û dixwazin wê li ser esasê tundiyê bi-domînin. Tevî ku yên tundî bi pêş xistin beşên sosyal şoven, feodal komprador û bûrjûvaya biçûk bû, diviyabû ku em hê zêdetir bi hişyarî tevbigeriya û me îtîbarî rêbazên wisa nekiribûya.”

Ev tespît, xwedî nîrxên dîrokî ne. Tespîtên wisa ne ku analîz dike bê wek dîrokî Kurd çilo dikare zû bikeve nav îxanet û hevkarîyê. Wê demê ya ku divê bê kirin ew e, bêtî kûrkirina vê rewşê lazim e yên xwedî potansiyela îxanet û hevkarîyê ber bi xeta rast ve werin kişandin.

Berxwedana Hîlwan-Siwêregê û Şemaqa Yekemîn a li Feodalîzma Hevkar hat Xistin

Dîroka Kurdistanê, dîroka têkoşînan e. Wek encama şertên objektîf û avahiya civakî ya li ser esasê eşîrî, her tim bûne xwedî dîrokek şerî. Dema pozîsyona jeo-stratejîk a Kurdistanê jî li vê zêde dibe, di domahiya dîrokê de nikare xwe ji şer û dagirkirinan xelas bike. Civaka Kurd a ku li dijî van dagirkirinan jî her di berxwedanê de bû, wek komek şerker teşe girtiye. Lê, berxwedêrî û şerkeriya di dîrokê de ku hê bêhtir wek pevçûn tê zanîn, ji ber ne rêkûpêk û rêxistî bû, nikaribû tarzê şer ê çeteyan jî bibihure. Dema

pêdivî bi parastinê bûye, qewmê xwe parastiye û dûvre jî li xakên xwe vegeyriyaye. Kurd, di dîroka xwe de ti carî neketine pozîsyonek dagirkeriyê. Her tim bi armanca parastinê refleks nîşan dane. Ev berxwedêriya ku şerkeriya qebîle û eşîrê derbas nekiriye, bi şiklekî bînîzam, bêdîsîplîn, dubare, nişkav, piranî jî bêplan û bêbername bi pêş ketiye. Di şerkeriya Kurd de merdbûn û wêrektiya takekesî li pêş e. Yek ji du cureyên cesaretê yên ku Clausewitz behsê dike, hema hema di nav Kurdan de nîne. Ya heyî, tenê çavreşî ye. Cesareta medenî, bi gotinek din cesareta ku xwe dispêre aqil û zanistê, lewma jî nîzam û disîplînê divê, an tineye yan jî di rewşên gelekî îstîsna de bi şiklekî sînordar derketiye. Eger wê behsa vê cureyê bê kirin, Şêrgo yan jî Şîrkuh dikare di warê dîrokî de bibe mînak. Dema Kurd tê gotin, yê ku bêtî çavên xwe biniqîne bi ser mirinê de diçe, çavsor, merd û wêrek tê bîra mirov. Kurd ê ku Ehmed Arîf bi şiklê, “*Ev çav qet neketin faqê, di pevçûnê yek bi yek de têkneçûn (...)*” pênase dike, ev Kurd bi xwe ye.

Çanda şerê civakî û psîkolojîk a Kurd jî ew qas e. Kurd, şerê ku ne yek bi yek wek nemerdî dinirxîne, revîna ji şer an jî manewrayê wek bêkokî û bêrûmetî bi nav dike. Halbûkî şer, hunerek wisa ye ku li ser xapandin û tevgerandinê hatiye rûniştandin û hedef dike ku bi kuştîyên herî kêr zafera mezin dike hedef. Ji hêza qeba zêdetir, xwe dispêre hêza mejî. Li gel Kurd jî şerê dil serwer e. Şerê dilê Kurd zehf destanî ye. Çûyîna ser mirinê ya ku bêtî çavê xwe dîniqîne pêk tîne, gelekî bi heybet e. Tenê ev dikare di destanên mîtolojîk, wêje û romanên lehengtiyê de xwedî nîrxekî bin. Di rewşek wek şer de ku pir bêrehm, bêceman û bêwijdan e, ev tenê mirinên bêdawî û qetlîamên erjeng bi xwe re tîne. Mirin, tenê bi vî aliyê ve sînordar namîne. Civak û gelê ku bi şiklekî berfireh bi giştî rabûye ser piyan û li ber xwe dide, ji bo careke din azadî û zaferê bi dest nîne, ber bi bêhêvîtiyê û bêbaweriyê ve dehf dide.

Di vê navberê de, şerê bi tarzê Kurd, li cihên ku feodalîzm hê nû bi pêş dikeve, teknîka nûjen hê pêş neketiye, hêz û wêrektiya qeba li pêş e, dikare serkeftî bibe. Jixwe, di sedsalên 9. û 11. de gelek Begîtî û dewletên Kurdan ava bûne. Ev awayî, di nav şertên wê demê de encama çanda şerkeriya çavreşî ye. Wek mînak, Şîrkuh fermanîdarek e ku efsane afirandine. Lê bi demê re teknîk û hunera şer hê ziraftir bû. Lê, şerkeriya bi tarzê Kurd li cihê xwe

maye. Ev jî encamên ji trajediyê hê xerabtir bi xwe re anîne. Dema li ser vê jî karakterên hevkarî, pêşnedîtî, bêplan û programî, çaxê naşopîne, berjewendîperest, malbatperestî û hwd. ên feodalên Kurd zêde bûn, şerkeriya Kurd di demek kin de wisa bûye ku veguheriya şerê navxweyî û li dijî gelên din ên Kurdistanê hatine bikaranîn, hatine kişîşandin û teşwîqî îsyane hatine kirin û di encam de bi rehetî hatine tepisandin.

Abdullah Ocalan dema vê rastiye bi şiklê, **“Eger ku Kurd serî hildin û li mafên xwe bigerin, dibe encameke bi êş, eger ku negere û li cihê xwe raweste jî, tiştê hê nebaştir tê seran. Dema em dibêjin ketina dafik an jî xefkê, em vê rastiye vedibêjin”** îfade dike, ya behsê dike ev Faqa Kurd bi xwe ye.

Qadên ku di Têkoşîna Demokratîk a Neteweyî ya Kurdistanê de gerîlatî hatiye ceribandin, qadên Hîlwan-Siwêregê ne.

Wek tê zanîn, PKK’ê di sala 1978’an de li gundê Fîsê yê Amedê hatiye damezrandin. Di Kongreya wê ya Damezrandinê de 23 mîlîtan amade ne. Yên tevlîbûyî di tevgerê de xwedî rolek pêşengtiyê ne û di asta navendî de cih digirin. Di vê demê de ji bo Tevgera Apoyî nekeve nav Kurdistanê serî li her rêyê tê dayîn. Di 19’ê Gulana 1978’an de Halîl Çavgûn ê ku li Hîlwanê wek rêberê xwezayî yê gel derketiye pêş, ji aliyê çeteyên eşîra Silêmanîyan tê qetilkirin. Şehadeta Halîl Çavgûn, asta tundiyê nîşan dide. An vekîşîn e yan jî tolhildan e. Eger daxwaz bicihbûna di nav civaka Kurd de be, wê demê divê ji gotinê wirdetir, pratîk derkeve pêş. Ya ku li Kurdistanê derbasdar e ne gotin e, çalakî ye, emel e. Tê gotin ku Kurd, *“ne bi gotinan, bi dîtinan bawer dibin”*. Abdullah Ocalan ji ber vê jî dibêje, **“Gel, ne bi gotinan, bi jiyana Apoyîyan bandor bû û hat girêdan.”** Li Hîlwanê eger daxwaza qezençkirina gel hebe, wê demê neçariya şerê li dijî kompradorên feodal diyar bûye. Li Kurdistanê gel wisa bawer dike ku mirovên bêsêr, ji rêzê nikarin şemaqekê jî li axayekî bidin. Ji ber ku piştê axa û şexan qayîm e, piştê wan li dewletê ye û çeteyên wan hene. Herî girîng jî, ji aliyê hêzên gelemperî û ewlehiyê yên dewletê ve mîna hêzek paramîlîter tînin destekkirin. Jixwe weke ku me di beşên beriya niha de jî diyar kir ku ya ku avabûyîna wan saz dike, van derfetan pêşkêş dike û van xakan didiyê, dewlet bi xwe ye. Rastiya ku ji navîkê ve girêdayî dewletê ye jî ev e. Ji ber vê jî, yên ku

şeqamekê jî li van beşan bidin an mehkûmî çiyayan dibin –ku piranî bi husranê diqede- yan jî demildest tên cezakirin.

PKK'ê, li navenda Hîlwanê bi bandor li çeteyên Silêmanîyan didin, hin çete li cihê bûyerê dimirin, hinên ku bi birîndarî digîhêjin nexweşxaneyê Dîlokê jî li vir tînin kuştin. Her çiqasî ne zêde berfireh be jî, peyama ku wê Apoyî li her derê li dijî hevkarên komprador feodal tîbikoşe bi awayekî wêrek tê dayîn. Gel ê ku piştî wê bûyerê moralê digire, li Hîlwanê jî tevîzandîna dîrokî şîyar dibe û radibe ser piyan. Serokeşîr, gava xwe bi şûn de diavêjin. Şaredarî dikeve destê gel. Ezmûna ewil a xwerêveberiya gel ku wek *“Sovyetî Yekem”* tê binavkirin dest pê dike. Îstîfaya serokê şaredariyê tê xwestin, li navçeyê polîs û jenderme nikarin ji qereqolên xwe derkevin. Ev aktîvîte, pêl bi pêl li Êlih û Mêrdînê jî bi pêş dikeve. Dûvre jî gelek hîlbijartinên şaredariyê bi tarzê berxwedana Hîlwanê bi ser dikevin. Ev rêbaza ku li Hîlwanê tê bipêşxistin, ne têkoşîna berfireh a çekdarî ye, têkoşînek hê tengtir û bi refleksê parastinê ye.

Damezrandina PKK'ê nayê eşkerekirin. Îlana fermî demildest nayê kirin. Ji ber ku divê îlan bi çalakiyek bi heybet bibe. Çalakiya ku ji bo wê jî hatiye plankirin, cezakirina serokeşîrê Bûcakan ê Siwêregê Celal Bûcak e ku bi dewletê re dixebite û di heman demê de parlamenter e. Bêbandorkirina Bûcakan ku lîdertiya rêxistinbûyîna çeteyên herî har û êrîşkar dikin wek çawa wê mohrekê li dîrokê bide, her wiha wê li Kurdistanê jî bibe destpêka têkoşîna çekdarî. Li vir wê bingehekî xurt bê qezençkirin û wê gerîlatî dest pê bike, ji wir jî wê derbasî Botanê û çiyayên Colemêrgê bibin. Wê bi deh hezaran gundiyên serîrakiyê û bi hezaran mirovên Kurdên ên li metropolan wê rûpelek dîrokî bê vekirin. Çalakiyek polîtîk wê bibe wesîleya derbasbûyîna gerîla. Ya tê plankirin û hizirandin, ev e. Ji bo wê jî rêzîknameyek pir biçûk a gerîla jî tê amadekirin.

Lê, çalakî sabote dibe. Celal Bûcak sivik birîndar dibe. Ji koma çalakiyê, Salîh Kandal ji ber ku zêde xwîn jê diçe, şehîd dibe. Çeteyên Bûcakan dûvre har dibin û êrîş dikin. Gundiyên ku roja yekem dibihîzin ku Celal Bûcak miriye, serê qurbanan jê dikin, dema pê dihesin ku nemiriye jî diçin sersaxiyê. Ji ber ku li Kurdistanê, *“li jor xwedê, li jêr serokeşîr, li Siwêregê jî Bûcak hene.”* Gel

diqufite. Tevgera Apoyî dihesiband ku wê ji vir derketinekê bi dest bîne û xwe bigihîne çiyayan, lê rewşek berevajî rû dide. Ji Qersê, ji Mêrdînê, ji Amedê û ji Mereşê bi dehan milîtan diherikin Siwêregê. Çi dibe bila bibe, di encam de mijar namûsa rêxistinê ye. Ji bo neyê windakirin jî çî yê Tevgera Apoyî hebe ew tên bikaranîn. Mîna bîrek bêbinî, bi deh hezaran gule tên avêtin. Bi dehan milîtan û welatparêzên wek zêr şehîd dibin, zerar digihêje ew qas nîrxên madî jî. Her çiqasî ya bûye di warê leşkerî de ne zafer be jî, meydanxwestina yekem a bi egîdîyek mezin e ku li ser navê gel di şexsê çeteyên paramîlîter de li dijî dewletê bûye.

Guleya ku Frantz Fanon wek **“Guleya Yekem”** dinirxîne û ewilî bera kesayeta xwe ya mêtîngeh dide, Kurdistan xistiye bin tesîra xwe. Di çapemeniya dewletê de mîna *“Rojhilat di bin dagirkeriya Apoyîyan de ye”* manşet tên nivîsandin. Di warê siyasî de girseyek zehf mezin çêbûye. Lê, mimkun nebûye ku ev pêşketin veguhere rêxistinê, bi gerîla re bibe yek û mîna ku di sala 1994'an de Zapatîstayan li eyaleta Chiapas a Meksîkayê kirin, veguherîne serhildanek bi heybet a gel. Li ser vî esasî dikare bê gotin ku ezmûna yekemîn a derbasbûyîna gerîlayê modern, bi ser neketiye. Ruxmî vê jî di warê siyasî de pêşketinê zehf mezin pêk hatine. Hîlwan-Siwêreg, ceribandinek bû. Pir caran hatiye nivîsandin, bûye mijara nîrxandinê berfireh û ders jê hatine derxistin. Wek çawa pesnên wê hatine dayîn, her wiha gelek caran hatiye rexnekirin jî. Di dîroka PKK'ê de wek *“Şerê Kozikan”* cih girtiye.

Şerê Kozîkê, tarzekî şer e ku dest ji çeperê bernade. Cureyekî şerê wisa ye ku ti afirîneriya wê nîne, bê taktîk e, dûz û hema hema ti hîleyên wê tinene. Li erdnîgariya Kurdistanê –bi taybet jî li ser xeta Botan û Zagrosan- çeperên dêw ên kevir hene ku heta îro jî li ser piyan mane. Ev latên ku bi taybet jî li derbend û xetên veguhestinê ne, çeper in ku ji bo destûra derbasbûyîna endamên eşîrên dijber neyê dayîn hatine avakirin. Di şerê çeperê de vekişandin, ji pişt ve lê dayîn, manewra zêde cihê xwe nagirin. Hebe hebe, hîleyên biçûk û qurnaztiyên feodal in. Jê wîrdetir jî nabe. Jixwe, ji ber ku ev hîleyan her xwe dubare kirine, ne gelekî zehmet e ku di demek kurt de jî werin fêmkirin. Tarzê şer ê mîna *“Pêşmergertî”* tê zanîn jî di esas de ev tarzê şer e.

“Asta kulturî ya civakekê, çanda wê ya şer jî diyar dike.” Mi-rovê Kurd ê ku her tim bi formê eşîrî û nêzî lûtkeyên çiyayan jiya-ye, di warê asoyî de teng e, xwedî perspektîfek zehf sînordar a mêzekirinê ye. Li ser vî esasî ya ku Kurd diyar dike jî, çanda ji-yanê ye. Çanda jiyana Kurd, li ser esasê deqerûtîyê (dobratîyê) hatiye sazîkirin, wêrektîyê dide pêş û pênaseya kesayetekî *“egîd”* ê li şûna mejî, dil esas werdigire jî derdixe pêş. Vehûna li Hîlwan-Siwêregê, şopên mezin ên vê nêrînê nîşan dide. Ji bilî van sebeban, sedemên din ê ku derbasbûyîna gerîlatîyê asteng kirin dikarin wisa bêne rêzîkirin; bêezmûnî û bêperwerdehî, her çiqasî tecrûbeyên cîhanî hatibin lêkolandin jî li beramberî zorî û şertên pratîkî bi ya xwe ya berê kirin, *“Şerê kozikan”* wek qehremantî û merdî hesabîkirin û Hîlwan-Siwêreg mîna tenê lingekî vebûna gerîlatîyê nedîtî.

Abdullah ocalan di **Yekemîn Konferansa PKK’ê** de şaşî û kêmasiyên berxwedana Hîlwan-Siwêregê wer dinirxîne:

“Tevî ku xet û feraseta me ya têkoşîna çekdarî rast e jî, ev nîrx bi pratîkî bi awayekî têrker nehatine pêkanîn û rêxistinîkirin. Tevî ku diyar e bê xet û çalakiya taktîk çawa tê kirin jî, rêxistinîkirin û rêvebirina têkoşîna çekdarî ya ku dê vê di pratîkî de pêk bianiya, bi ser neket.

Carna hewla çalakiyên ji hedefê mezintir hat dayîn û ev bê rêveberî, bê rêxistinbûyîn hat pêşxistin. Bi şiklekî tersî rêgezên têkoşînê ya ku divê li dijî ajanekî bi pêş bikeve, hat pêşxistin. Wek nimûne, mîna di pratîka Siwêregê de bi awayekî eşkere hat dîtin, têkoşîna ku divê li dijî sîxurekî bê dayîn tam veguhe-randina *“şerekî gundiyan”*. Di vê merheleyê de di nav şertên Siwêregê de şerekî gerîla jî nikarîbû bihata kirin. Şertên vê têkoşînê jî ne guncav bûn. Li vir jî tenê çalakiyên sînordar ên çekdarî dikarîbûn bihatana kirin ku wê ji aliyê komên zehf veşartî û pir teng pêk bihata. Her wiha, divê ne bi giştî eşîrekê yan jî tevahî avahiya ku ji aliyê feodalekî hatiye birêxistinîki-rin, hê zêdetir berê xwe bidana hin ûnsûrên diyar. Lê çi hedefa têkoşînê çi rêyên têkoşînê yên li dijî hedefê û şiklê rêxistinîkiri-na vê, têkoşînek çawa tê dayîn, kîjan hedef sereke ne, bi awayekî zelal nehatin diyarkirin. Û bêçaretî jî esas di vê nuqteyê de xwe da der. An na, di nav şertên Kurdistanê de li

kû dibe bila bibe, têkoşînek li dijî nûnerekî feodal ê har, ne mimkun e ku rê li ber pêşketînek girîng a polîtîk veneke. Lê eger ev têkoşîn bibe şerekî gundiyan ê beramber, li Kurdistanê veguhere şerê navxweyî yên eşîrên xurt, helbet wê li vir eşîr-parêzî, mêtîngerî sûdê wergire. Rêya ku ber bi vir ve nabe jî wiha ye; divê negihêje vê astê, hedef bi awayekî zelal û rast bêne tespîtkirin, eger hêzên ji derveyî vê êrîşê jî bikin, divê berê xwe nediye û hedefê berfireh neke, li dijî hedefa diyarkirî, ne bi komên çekdar ên ku bi awayekî êşkere li ortê digere, bi komên teng, veşartî û rêxistî pêkanîna çalakiyek plankirî ye.

Ji bo li cihekî têkoşîna çekdarî bi pêş bikeve, neçarî ye ku mîsoger bingehekî polîtîk bê avakirin û xwe bispêre wê. Ev bingehe polîtîk, qasî ku divê li seranserê welêt be, her wiha pêwîst e bi şiklekî xweser li qada têkoşînê be jî. Êşkere ye ku têkoşînek çekdarî ya ku şertên polîtîk li ber çavan nagire şaş e û li Siwêregê jî têkoşînek wisa şaş bi pêş ketiye.”

Berxwedana Hîlwan-Siwêregê hiştiye ku Tevgera Apoyî li Kurdistanê bi kok bibe, berbelav û bi cih bibe. Heta wê demê her çiqasî di astek diyar de xebatek meşandibe jî, bi vê berxwedanê ve li Kurdistanê bûyek tekane hêza ku pêbawer, hêvî dide û tê qebûlkirin. Dema ku li Kurdistanê li dijî beg, axa û şêxan pelek jî nedileqiya, berxwedana Hîlwan-Siwêregê di dîroka Kurdistanê de rûpelek nû vekirîye. Di atmosferek herî zextker de bûye qîrîna civaka dîrokî ya ku ji kokên dîrokê tê angî civaka jêrîn a ku afirîner û domderê nîrxên komunal demokratîk e. Vê berxwedanê wek serîhildanek gundîtiya hejar û bîxêrîbûyîna yan jî bi wateyek giştî serîhildanek Kurmancan di nav civaka Kurd de dengê mezin vedaye û cihê xwe girtiye. Angî, di wateya polîtîkbûyîna de PKK’ê bi saya vê berxwedanê ve polîtîk bûye, êdî ne hêzek razber e, bûye hêzek şênber.

Zêra ev berxwedan, bûye banga rawestandina îxanet û hevkarîyê. Seknek wilo dijber a li dijî îxanet û hevkarîya li Kurdistanê, zehf kêr hatîye dîtin. Ji bo cezakirina îxanetê ketina rê, bi tenê serê xwe jî gavên pêşîn ên afirandina berxwedan û destanekê ne. Di dîroka Kurdistanê de ku ji aliyê serweran hatîye nivîsandin, îxanet û hevkarî her tim hatîne xwestin. Pûan kom kirine. Diyar-deya pêşxistina berxwedana birûmet jî her tim hatîye teşhîrkirin,

wek aliye têkçûyî jî hatiye reşkirin. Serwerên Kurd ji bilî berjewendiyên malbata ti carî bi berxwedanek bi rûmet nefikirîne. Her çiqasî cih bi cih hilbûna îşyanên gundiyan mîna dilopa baranê ya li ser xaka ziwa ji bo gel bibe peyama jî, çemê esasî seknên serweran e ku xwe bi mêtîngeran xweş dikin. Tenê derd û kulên van ew e ku di nav dewletê de bibin xwedî pozîsyon û xwedî nîrxên madî. Lewma jî serwerên Kurd her tim di dîrokê de bi şiklekî objektîf ji îxanet û hevkarîyê re vekirî bûne.

Berxwedane Hilwan-Siwêregê lêdanek ewqasî bi bandor e ku mîna berêya pêşîn a Pêngava 15'ê Tebaxê ye ku dibe mijara teoriya guleya yekem û wek amadekariya wê ya pêşîn dikare were nîrxandin. Dibe ku encamê dihat xwestin di vê merheleyê de derneketibe holê. Lê ya girîng ew e ku li ser navê berxwedêriya Kurd, de îcar partiyeke ku ciwanan Kurd damezrandiye, xwe lê rakişandibe. Û lewre jî dikare bê gotin ku berxwedana Hilwan-Siwêregê ji bo hêzên ku hevkarîya dagirkeran dike bersiv û peyamek herî baş e. Cara yekem bi awayekî eşkere peyama, *“em ê li pêşîya dîwana gelan we dadgeh bikin!”* hatiye dayîn.

Paşdevekişîn, Faşîzma 12'ê Îlonê, Amadekariyên li Derveyî Welat û Biryara Vegera Welêt

Berxwedana Hilwan-Siwêregê wê bibe têkoşîna ji bo derbasbûyîna gerîlatiyê û berbelavbûna li tevahî sathê welêt. Bi vî şiklî ve wê ji Siwêregê ber bi xeta Çêrmûg û Erxeniyê, li “Başûr-rojhilat” jî li Mêrdîn, Botan û Colemêrgê vebin. Siwêreg û Hilwan her çiqasî di warê cografîk de ji bo gerîlatiyê ne cihekî pir guncav be jî bi berxwedanê re wê rolek texteyê çindikdanê (çengkirinê) bilîsta. Bi vê boneyê, Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan ji bo têkoşîna Siwêregê talîmnameyek kurt û cewherî ya gerîla dide. Li vir wê bi têkoşînê encamekî serkeftî bê bidestanîn û bi hezaran ciwan wê xwe bidin çiyayan, bi awayekî fermî jî wê derbasbûyîna gerîlatiyê pêk bihata. Li çiyayên herî asê wê bihatana bicihkirin û têkoşîn bihata domandin. Weke ku dûvre jî derdikeve holê, Dewleta KT li beramberî têkoşînek wisa ya gerîla ne amade bû. Jixwe ev

rewş jî di çalakiya sala 1984 a 15'ê Tebaxê de û piştî wê derdikeve holê.

Lê çî heye ku; têkoşîna çekdarî ya li Hîlwan-Siwêregê, “*şerê kozikan*” nebihuriye, merdîniya takekesî û cesareta kor a aîdî çanda berê ya Kurd derketiye pêş, tarzê gerîla ya ku rêxistinbûyîn û nermbûn û zûbînê pêwîst dike jî talî maye. Di wê demê de ku PKK’e hê bi pîrsgirêka Hîlwan-Siwêregê mijûl e, girtinên li Elezîzê dest pê dikin. Li dijî tevgera PKK’ê ev hewldana herî sistematîk a girtin û operasyonê ye. Beriya vê jî li Qersê girtinên komî çêbibûn, lê ji ber ne operasyonek wisa bû ku rêxistinê yekser dike hedef û dixwe rojeva xwe, zêde jî bi bandor nebûye. Helbet, beriya vê jî dewletê operasyonên çavtirsandinê li dar xistine. Mînakê ya herî berbiçav jî Qetlîama Mereşê (Gurgum) ye ku di 24’ê Kanûna 1978’an de pêk hatiye. PKK’e bi awayekî fermî di 27’ê Mîjdarê de tê avakirin û beriya ku di ser vê re mehek jî bibihure, bi destê dewlet û milîsên faşîst sîvîl ve qetlîamek pîr sistematîk ketiye meriyetê.

Li gor wê demê, Mereş – bi taybet jî navçeya Markazê (Pazarcık)- cihekî pêşketî yê welat e û ji bo tevgera PKK’ê jî yek ji sehayên sereke ye ku li vir zehf bi bandor e. Ev qetlîam di heman demê de peyama, “*Pêyê xwe bixşînin ber xwe*” bû. Li milê din jî dewletê dixwest ku potansiyela welatparêziyê ya herêmê bi Qetlîama Mereşê biqutifîne û bide revandin. Mixabin, dema em rewşa Mereş û derdora wê ya îro dinirxînin, em dibînin ku bê di çî astê de gihiştîye vê armanca xwe. Jixwe ji bo kontrolkirina Tevgera Apoyî, dewletê pêkanînen rêveberiya awarte bi taybet jî li van qadan zûka xistiye dewrê. Êdî dewletê daxuyaniyên mîna “*Apoyîyan Rojhilat di ser hev re derbas kirine*” dida, maseya xwe ya PKK’ê jî ji zû de ava kiribû.

Abdullah Ocalan, ji bo **Qetlîama Mereşê** dahûrandinên hê kûrtir dike û van tespîtan radigihîne: :**“Qetlîama Mereşê ya ku di dawiya 1978’an de pêk hat, li dijî koma ku li wê herêmê bi lezûbez pêş diket dikare wek duyemîn çalakiya mezin a Gladiyoyê bê nîrxandin. Mereş, ji berê ve navendek e ku bi rêbazên yekser û neyekser tasfiyekirina Kurdan tê plankirin. Heman xisûs ji bo tevahî Kurdên li rojavayê Firatê jî derbasdar e. Di Plana Islahkirina Şerqê ya 1925’an de tê pêşdîtin ku li herêma rojavayê Firatê**

ti Kurdên ku Kurdî dizanin neyên hiştin, tevahî di serî de asîmîlasyon bi rêbazên cur bi cur bêne tasfîyekirin. Divê Qetliama Mereşê jî di çarçoveya vê planê de ku hê jî di meriyetê de ye, bê dîtin. Bi taybet jî pêwîst e asîmîlasyon û çalakiyên Gladio yên ku li dijî Kurdên li Meletî, Semsûr, Elezîz, Dêrsim, Sêwas, Erzîngan û Dîlokê ne, li ser vî esasî bîn fikrandin. ”

Sala 1979'an wisa dest pê dike, de îcar pîrsgirêkên leşkerî yên pratîkî û girtina endamê Komîteya Navendî ya PKK'ê Şahîn Donmez pêvajoyek aloz jî bi xwe re aniye. Ji ber ku Şahîn Donmez bêtî şemaqekê jî bixwe diaxive, teslîm dibe û dibe îtîrafkar. Ji ber ku Şahîn Donmez di rêxistinbûyîna teng a PKK'ê de di asta jor de cihê xwe digirt, têkildarî rêxistinê jî hema hema her tişt dizanî. Ev kesayeta ku milîtan, deverên bicihbûyî û heta malbatên wan her tişt dizanî, cihê Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan jî dizane. Di pêvajoyeke wisa de ku li pey hev girtin çêdibin, cara pêşîn e ku dewlet di derheqê PKK'ê de her tiştî dizane. Di vê pêvajoyê de ku dengê lingê darbeyek leşkerî dike gurmegurm, li dijî tevgerê operasyonên berfireh ên girtinê hatine destpêkkirin, ya çiya yan jî derveyî welat wê bihatana hîlbijartin. Eger bijartin di warê çiyayan de bûya, dikaribû heta demekê li ser piyan bimaya, lê berxwedana Hîlwan-Siwêregê nîşan daye ku avahiya heyî ji ber kêmahî û bêtêcrûbetiyên xwe nikare vê pêk bîne. Wek berpirsiyariya li beramberî gel û dîrokê mîna rêya tekane rêka derveyî welat dibe vebijêrka yekane. Lê, vebijêrka derveyî welat jî ji ber karaktera xwe ya dumend, xwedî taybetmendiyeke ceribandina her kesî ye. Vebijêrka kişîner ber bi Ewrûpayê bû ku xwedî gelek derfetên jiyanê ye, ya din jî wek qada şerê germ û sehaya berxwedanê Rojhilata Navîn bû. Derketina Ewrûpayê; wek çawa wê ji welêt dûr bixe, bike penaber, bibe sedema entegrebûnê û di encam de radestiyê, potansiyelên wê yên pîrsgirêkên esasî jî hatine hizirandin û lewma jî nehatiye pejirandin. Sehaya Rojhilata Navîn, her çiqasî zor û xeteriyên wê gelekî mezin bin jî xwedî tecrûbeyek gerîla ye û bandora şoreşa Filistinê li ser e. Wek armanca esasî jî hatiye diyarkirin ku di demek kurt de li vir amadekarî bêne kirin, piştî wextekî kin vegera welêt çêbibe û şoreş bê lezandin.

Rêxistin bi krîzek zehf cidî re hevrû dimîne. Li Rojhilata Navîn mayin, wek tekane çareserîya derbaskirina vê derbenda teng xwedî

girîngiyek pir mezin e. Di van şertan de dibe ku tekane vebijêrk demildest bi serkeftî vekişandin e. Lê çi heye ku wê vekişîn jî mîna tê xwestin- bi gotinek hê rasttir mîna Rêbertiya PKK'ê dixwaze- pêk neyê. Dewlet bi tevahiya hêza xwe dest bi êrîşê kiriye. Li Siwêregê windahiyan cidî yên rêxistinê çêbûne. Hêzên milîyetgiriya berê û reformîst bûne hevalbend û dest bi êrîşê kirine. Her wiha hêza milîsên faşîst ên sîvîl û sosyal şoven jî li cem e. Gel, li ser hîmê berxwedana li Hîlwanê, bi hewayek şoreşa mezin xwe li dor Apoyîyan kilît kiriye û wek hêviya dawiyê dibîne. Bi gotinek din, gewde her roj hê bêhtir mezin dibe, lê serî bi êrîşên herî berfireh ê dîrokê re hevrû ye û amadekariyên wê ne tamam e.

Di nav welêt de mayin, dibe ku di çarçoveya Kurdîniya klasîk de tê wateya rizgarkirina rûmetê, lê bi vê rêkê ve wek çawa wê ji bo hesretên gel bersivdayînek çênebe, pir êşkere ye ku wê di demek kurt de tasfiyebûn xwe bide ber derî. Ji ber ku hêza kadro têra vê nake. Di wateya milîtantîya tevgerek şoreşger a profesyonel û modern de di wateyek giştî de dikare behsa bêtêcrûbetiyekê bê kirin, lê sedema esas kesayeta Kurd e ku mêtîngiriyê bi polîtîkayên îmhî û înkare bi pelaxtinê pelçiqandine û gelekî dûrî serkeftinê ye. Avahiya kesayeta sosyal wê nikaribe çerxa bêsûd bibihure, bi berxwedanek bi heybet wê bikaribe navê xwe li dîrokê bide nivîsandin, lê di encam de wê mîna Qazî Muhammed li Çarçî-rayê û mîna Şêx Seîd li Amedê, li sêdaran bêne daliqandin. Teqez pêwîst e ku ev rewş êdî nebe qeder û bê derbaskirin. Ji ber vê jî derketina derveyî welat û li vir xwe amadekirin – bi taybet jî di kesayetê de- dûvre jî vegera welêt wek tekane vebijêrk hatiye dîtin.

Abdullah Ocalan, têkildarî vê pêvajoyê rewşa şênber û kiryanan wiha radigihîne: **“Di vê pêvajoyê de dewlet bi ser me de hat, lê jixwe di vê demê de bi giştî bi ser Kurdîtî û çepgiriyê de diçû. Wek parçeyekî vê êrîşê bi ser me de jî dihat. Jixwe rewşeke statuya cuda bixwaze nebû. Fikir nedihat kirin ku ev tevger bibe navendeke berxwedanê ya xweser û demdirêj. Hemû nîşaneyan bi serê tîrên xwe hatina darbeyeke leşkerî îşaret dikirin. Du helwest hebûn bihatana nîşandan: Yan derketina serê çiyê, yan jî derketina derveyî welat, xwe vekişandina Rojhilata Navîn. Ya esas, bi ser her du helwestan de jî hatin. Di**

dawiya sala 1979 de tevger xwedî derfet û îmkana bû ku bêyî windahî bide dikarîbû di her du cihan re biherike. Xwe vekişandin û herikandina di van cihokan re pir hêdî dimeşiya. Ji bilî hin girtinên bêsens ên mîna Mazlûm Dogan û Mehmed Xêrî Dûrmûş windahiyeke cidî nebû. Tevger çêbibû, partî hatibû îlankirin û bibû xwedî statu ji bo karibe hebûna xwe demeke dirêj bide meşandin. Ji lewra darbeya 12 Îlonê bi pêşbîniyeke mezin hat pêşwazîkirin û darbeya eskerî ya sala 1980 hînê nebûyî, hemû pêdiviyên hewce bi cih hatin anîn.”


Ji ber ku wek pêşdîtîna derbasbûyîna Rojhilata Navîn pêk nehat, ji aliyê Abdullah Ocalan ve her tim bûye mijara rexneyê. Taybetmendiyê kesayeta nebes a ku ji aliyê avahiya civaka Kurd a parçebûyî hatiye lewazkirin, di vê pêvajoyê de jî mohra xwe li pêşketinan xistiye.

Nakokiya Abdullah Ocalan ê ku bi xebata xwe ya hizirînê ve xwe gihandiye diyalektîka xebata pratîk û rastiya milîtanê ku di nav pratîka teng û hemal de difetise, wê wek nebesiya bingeîn a Tevgera Azadiya Kurd di tevahî dem û xebatan de derkeve ber çavan.

Domahiya dîrokê, hewl hatiye dayîn ku mejiyê Kurd bi awayekî sistematîk bê tasfiyekirin, Kurdekî ku nikare bihizire bê afirandin. Ji ber dagirkeriya bênavber a li ser Kurdistanê, firsend çênebûye ku Kurd karibin xwe komî ser hev bikin. Sedemên din ê ku vê kesayeta dûrî serkeftinê afirandiye jî hevkarîya çînen serwer ên Kurd û dagirkeran e ku wek rêkek bingeîn a hebûnê ji bo xwe diyar kirine. Wek sedemek din jî hişkbûn û asêbûna erdnîgariya Kurdistanê dikare bê destnîşankirin.

Silsîleya Zagrosan, li erdnîgariya Kurdistanê derbasbûyîna Rojhilat û Başûrê Kurdistanê zehmet dike û bi çend parçeyan dabêş dike. Li Kurdistanê her wiha, çemên mezin qad ji hev qut kirine. Li Kurdistanê rewşa hişkbûn û asêbûna cografîk, teşegirtinên cuda jî afirandine. Bûye sedem ku çand, zarava û komên cur bi cur ava bibin. Wek mînak; çend agahiyên sînordar ên ku em ê di derheqê zaravayên Kurdistanê de bidin jî wê nîşan bide ku bê gotinên me çiqasî rast in.

Kurdî, zimanekî Aryenî ye. Hin wek zimanê Aryen hin jî wek zimanê Hind-Ewrûpa bi nav dikan. Zimanzan, zimanê Kurdî li vê koma ziman di nav komên Bakurrojawayê Îranê de dinirxînin. Di nav zimanên Bakurrojawayê Îranê de zimanên mîna Belûcî, Tabarî û Fehlewî her wiha weke ku me diyar kir, Kurdî jî heye. Zimanê Kurdî, wek 5 zaravayên esasî tê dabeşkirin. Kurmancî, Soranî, Loranî, Goranî û Kurmanckî ango Dimilî. Ji bo zaravayê Soranî, li gelek deveran gotina Kurmanciya Jêrîn, ji bo zaravayê Kurmancî jî Kurmanciya Jorîn tê gotin. Mînak, zimanê Soranî dibe du beş ango wek Soranî û Kelhorî tê dabeşkirin. Jixwe Soranî jî wek Soranî, Germiyanî, Babanî, Mukriyanî û Erdalanî tê dabeşkirin. Zaravayê Goranî jî wek Leqî û Hewremî cuda dibe. Hewremî jî wek zaravayên Leon, Jawero, Gewero, Hewreman Taxt û Hêzil ji hev vediqetin. Em bala xwe bidinê, ya heyî dewlemendiyek muthîş a dirokî, çandî ye.



Ev avahiya civakî, li gor rêgezên esasî yên paradiğmaya neteweyîbûna modern a ku wê demê dihat qebûlkin, di pêşketa teşegirtina ruhekî hevpar de rolek astengker lîstîye. Bi têgînek din, bûye sebeb ku bîreweriya millet, bîreweriya neteweyê zeîf bimîne.

Lewma jî rê li ber seknên parçeyî, tevgerên ne hevpar, cêwaz-bûyîna berjewendiyan û cudabûna karakteran vekiriye ku rewşeke civakî ya ku dikare her tim bê bikaranîn xuliqandiye. Dema li dor çandekê yegirtinek çênebe, yekbûyînek nebe, wê demê siberojek hevpar jî nayê parvekirin. Bi gotinek din, tevî ku li ser heman xakê dijîn wê fêmkirina dîrokê cur bi cur be. Bîreweriya dîrokî dê lewaz bimîne.

Di vê pêvajoya dîrokî de wek xebata esasî ya ku xwe ferz dike, derbaskirina vê kesayeta Kurd a ku ji serkeftinê dûr e, wê ji nû ve biafirîne. Lezgîniyek e ku mejiyekî hevpar, teşegirtina ruhî dibe yek û li dor dîrokekê kilît dibe bê afirandin. Ev pêvajo ku wê mejiyê korkirî bixe îstîqameta rast û tenê berê wê bide pêvajoya xwebûnê, li ser vî esasî karekî cidî ye. Dema xwebûn pêş bikeve, wê girêdanên bi dagirkeran re jî qut bibe û pêvajoya dûvikiya dijmin jî raweste. Eger bi têgînek din bê îfadekirin, wê pêvajoya ku dibe malê hinên din biqede û êdî Kurdîniyeke nû ya ku wê xwe nefiroşe dijmin rabe ser piyan. Her ku ev pêk hatin jî wê li ser Kurdistanê hevparî û yegirtina çandî saz bibe. Ha wê ev jî genên îxanetê yên ku rehên xwe berdane bide derbaskirin, pêvajoya Medbûyîne ya dîrokê li ser van xakan ji nû ve şîn bike.

Em ji bîr nekin ku, **“Hemwelatîbûna civaka yek tîp bûyî, miri-na mirov e.”** Dema ku em li vir behsa şînkirina Medbûyînekê di-kin, divê wisa neyê fêmkirin ku ew qas dewlemendiya li Kurdis-tanê wê li cihekî bê helandin. Ev modela netewe dewletan e ku gelan dike yek tîp û tine dike.

Heçku ya tê ziman ev e: **“Her çiqasî terîfên modelên avakiri-na neteweyan li guherên berfireh hebin jî mirov dikare da-nasîneke giştî ya hemûyan bîne cem hev bike; ew jî danasîna netewe ya têkildarî zîhniyet, bîr û baweriyê ye. Di vê rewşê de mirov dikare bibêje, netewe ji koma mirovan a xwedî zîhniyeta hevpar pêk tê. Di vê danasîna netewe de ziman, dîn, çand, ba-zar, dîrok û sînorên siyasî diyarker nînin, ew bi rola gewde radibin. Bi awayekî bingeîn divê mirov netewe weke rewşeke zîhniyetê bide nasîn û ev xwedî karektereke dînamîk e. Di ne-teweya dewlet de milliyetgirî mohra xwe li zîhniyeta hevpar dide, lê di neteweya demokratîk de bîreweriya piştgirî û aza-diyê mohra xwe li zîhniyeta hevpar dide. Lê netewe bi tenê bi**

rewşên xwe yên zîhnî bêne terîfkirin ev danasîn wê kême be. Çawa ku zîhnîyet bê gewde nabin, netewe jî bê gewde nabin. Neteweyên xwedî zîhnîyeta millîyetgir gewde û bedena wan saziyên dewletê ne. Jixwe ji ber vê gewdeyê wan jî van neteweyan re dewleta netewe tê gotin. Dema ku saziyên huqûq û ekonomiyê derkevin pêş û bibin xwedî giranî, mirov dikare neteweyên bi vê rengî weke neteweyên huqûq yan jî neteweyên bazarê destnîşan bike. Gewdeyê neteweyên xwedî zîhnîyeta azadî û piştgiriya xweseriya demokratîk e. Bi awayekî bingeîn xweseriya demokratîk ew e, kom û ferdên zîhnîyetên weke hev parve dikin xwe bi îradeyên xwe bi rê ve dibin. Mirov dikare jî vê re rêveberiya demokratîk an otorîteya demokratîk jî bibêje. Danasîn û terîfeke deriyên wê li gerdûnîtiyê vekirî ne.”

Vebûna li Rojhilata Navîn, bêtir ku têkiliyek jî hebe pêk hatiye. Di wan deman de Rêxistina Rizgariya Filistinê (El Fetîh) li Lubnanê serwer e. Her wiha, Rojhilata Navîn jî bo tevgerên şoreşger jî çavkaniya îlhamê ne. Bi deha rêxistinên şoreşger hatine vî sehayê, xwe amade kirine û perwerde dîtin. Lê, gelek rêxistin û milîtan ewil bi rêkê cur bi cur li ba El Fetîhê pêwendiyê datînin, dûvre jî diçin wir. Li ser vî esasî, her çiqasî dezavantajên biyanîbûyîne hebin jî, ev piştî demekê tene derbaskirin. Tevgera Apoyî, bêtir xwedî têkiliyekê jî be bi neçarî û ji nîska ve berê xwe dide derveyî welat ango li Lubnanê vedibe. Çawa digihêje Lubnanê, tevgerên millîyetgiriya berê û reformîst û partiyên komunîst ên welatên dagirker derheqê Apoyîyan de gelek îdiayên bêbingeh belav dikin. Wek pêdiviyek karaktera wan, jî bo karibin bijîn pêwîst e yên ku divê bijîn, bimirin. Tekane rêya hebûna îxanet û hevkarîyê jî tasfiyekirina hêzên azadîxwaz re derbas dibe.

Dema ku li ser bêderfetiyan nêzîkatîyên wisa subjektîf jî zêde dibin, wê demê ketina Lubnanê zehf zor dibe. Mîna bi nepikan didî hev, pêwendiyên li ba rêxistinên şoreşger jî bi tarzekî gelekî hasas û ziravî tînin danîn. Bi taybet jî li cem Eniya Rizgariya Demokratîk a Filistinê, Eniya Rizgariya Gel a Filistinê, Eniya Têkoşîna Filistinê û hin rêxistinên din ên ku di nav Berxwedana Filistinê de hê radîkaltir dixuyî, têkilî tînin danîn. Tevgera El Fetîh a ku di nav Rêxistina Rizgariya Filistinê de cih digirt û lîderê wê Yaser Arafat bû, di nav Tevgerên Filistinê de rêxistina herî bi bandor e. Weke

ku wê dûvre jî eşkere bibe, her ku PKK'ê xwe li Rojhilata Navîn bi cih kir û bû hêz, wê KT jî di astek nûnertiye de li Tirkîyeyê cih bide Rêxistina Rizgariya Filistinê û vê ragihîne ku vê rêxistinê qebûl dike. Ev jî îşaret dike ku wê têkiliyên li gel Rêxistina Rizgariya Filistinê zehf sînordar bimîne; li milê din jî dibe nîşane ku PKK'ê di demek kurt de di nav hevsengiyên polîtîka û dîplomasiya Rojhilata Navîn de bûye aktorekî mayinde û bi bandor.

Mîna ketina Kurdistanê, di derbasbûyîna qada Rojhilata Navîn de jî zor û astengiyên ku di aqilan de naçe derdikevin. Milê ku gav bi gav têkiliyan diyar dike jî di şexsê Abdullah Ocalan de sekna milîtanan e. Nêzikatiyên ku berê li beramberî xwe tijî pêşdarazî bûn, bi demê re têne terikandin. Pîvanên şaşnebar ên milîtantîyê yên mîna sekna di jiyanê de, tevlibûn, biryardarî, samimiyet û dîsîplîn, rêxistinên Filistinê bandor dikin. Her roj jî hejmara milîtanên ji welêt tên zêde dibe. Rêxistinên Filistinê, milîtanên tên ji bi însiyatîfa xwe ve li qadan diyarkirî bi cih dikin. Dema wisa dibe jî Apoyiyên heyî nikarin li cem hev bin. Li her qada ku lê ne bi awayekî çalak tevli jiyanê dibin, xwe perwerde dikin, rêgezên rêxistinê herf bi herf pêk tînin û herî girîng jî di warê sekna jiyanê de rêzdarî û hezkirina hevrêtiyê, li ser van rêxistinan bandorek mezin dike û dihêle ku cihekî baş bigirin. Ji ber ku yekgirtina gotin û pratîkê, rêzdariyê ava dike. Dema li ser van, li dijî êrîşa Îsrailê ya sala 1982'yan berxwedana bi heybet a milîtanên Tevera Apoyî û 8 şehîd û gelek dîlgirtî zêde dibin, êdî wê tevahî deriyên li Rojhilata Navîn ji bo Tevera PKK'ê vebe û bibe xercê bicîhbûna bi kok.

Lubnan, her wiha bûye sehayek wisa ku xebatên têkiliyên derve-dîplomasi jî tînin meşandin. Gav bi gav pêwendî li ba tevgerên şoreşger ên welatên din jî hatine pêşxistin. Peywendiyên li cem Teverên Çepgir ên Tirkîyeyê –amadekariyên avakirina Faşîzme Karşî Birleşik Direniş Cephesi (FKBDC- Eniya Berxwedana Yekbûyî ya Li Dijî Faşîzmê) ku di 1981-1982'yan de tê avakirin- her di vê pêvajoyê de hatine girêdan. Her tim daxwaz ew bû ku piştî hin amadekariyên li Rojhilata Navîn, derbasî welêt bibin, tevgera şoreşê bidin destpêkirin û vê jî di nav eniyek yekbûyî de bimeşînin. Bawerî ew bû ku tenê bi rêka eniyek şoreşger a wisa xurtbûyî dikare li dijî faşîzma Tirkîyeyê ku bi darbeya leşkerî xwe baş bi cih kiribû û bi sazî bibû, dikare sekn bê raberkirin û pêşketin

çêbibin. Hewl hat dayîn ku heman xebat li gel Çepgirên Kurd jî bê meşandin. Her çiqasî li cem rêxistinên mîna Rêya Azadiyê, Ala Rizgarî, Rizgarî derbarê yekgirtina têkoşînê nîqaş hatibin kirin jî daxwaza wan ew bû ku demek beriya ya din têkoşînê biterikînin û ti carî serî li têkoşîna çekdarî nedin. Heta, carekê Abdullah Ocalan bi dîlnizmiyek wisa mezin ji Kemal Bûrkay re gotibû, **“Ka werin hûn derbasî ser vî karî bibin, em jî di pêşengtiya we de pêk bînin!”** Wisa jî derfet pêşkêşî rêxistinên Kurd ên ku qaşo têkoşîna Kurdistanê dimeşandin dikir. Ji ber ku ya esas û armanc, xizmeta ji bo gel e. Lê, “Çepgirên Kurd” wê tew bi siya vê armanca esîl jî nekevin û serê xwe hilînin û biçin Ewrûpayê. Ango wê vebijêrka wan penabertî be.

Beriya sed salan çawa ku piştî têkçûna berxwedan û îsyânên Kurdan, zarokên serokeşîr û şêxan revîyan derveyî welat û li wir bûn penaber, paşê jî heliyan, ev careke din bi awayekî trajîkomîk dubare bûye. Piştî ku ji welêt qut bûn û bûn penaber, dîrokê dîsa xwe di şexsê wan de dubare kir. Tekane xemrevîniya wan li ser maseyên alkolê bûye xeyalên wan ên rizgarkirina Kurdistanê û ev jî tam bûye komediyek. Li ser vî halê xwe yê jirêderketî jî devê xwe diavêjin Tevgera Apoyî ya ku xwe ji têkoşînê nade paş û her tim canfeda ye, sûcdariyên mîna ne welatparêz e lê dikin. Li vir wateya tam a vê rewşa ketinê jî tenê pêşkenîbûn e (qirdikîbûn). Wek tê zanîn, di nav civakê de pênasayek kesayetê ya wek pêlewantiya saxte tê ziman heye. Ha piraniya van kesan jî tam pêlewanên saxte ne. Li herêma Başûrrojavayê Kurdistanê ji bo van pêlewanên saxte gotina “pelapiş” tê bikaranîn. Ev bi temamî kesayetên pelapiş in.

Derbasbûyîna Rojhilata Navîn gelek zoriyên mezin jî anîne, lê PKK’ê bi sekna xwe ya li Rojhilata Navîn di wateyek rast de derketiye ser dîka dîrokê. Di nav dîrokê de piştî pelçiqandinên Berxwedan û Îsyânên Kurdan, yê derketine derveyî welat çêbûne. Ev rewş heta astekê tê fêmkirin û rewşek xwezayî ye. Karekî bîaqilî ye ku li beramberî zoriyan xwe vekişandina bi niyetek vegera hê xurttir. Hz. Muhammed jî xwe vekişandiye. Hicreta (koça) Medîneyê jî di esas de vekişandinek e. Lê, wê Apoyî tişteki wisa bikin ku heta wê demê di dîroka Kurdistanê de nehatiye kirin. Ewil, diçin kîjan cihî wê dostaniyên xurt ava bikin. Li ser esasê

xwişkî-biratiya gelan, bi şiklekî dûrî berjewendiyên teng ên malbatî, bi xwedîderketina nasnameya xwe ya Rojhilata Navîn wê têkilî li ba gelan û rêxistinên berxwedanê yên pêşeng danîbûna. Têkilî ne li ba bijartiyên serwer, berevajî li cem gelan tê girêdan û wisa jî bingehê girêdanek saxlem danîne. Ev helwest bi xwe jî teşhîrkirina îxanet û hevkarîyê bû. Bi gotinek din jî ji nû ve afirandina ruhê Konfederasyona Medan bû. Yekgirtina li dijî Dehaqên nû ye, bi meşaleyan ve dorpêçkirina navenda zilmê ye û pêngavên ewil ên ronakbûna mezin in. Tevahî xebatên li Rojhilata Navîn bi kurtasî wisa were formulkirin, wê tespîteke hê bêhtir nêzî rastiya dirokî be.

Sehaya Lubnanê, di heman demê de dibe cihe ewil a ku perwerdeya gerîla lê tê dayîn. Ji sala 1979'an û şûn de li qadên cur bi cur ên Kurdistanê êdî komên çekdar belav dibin. Ev komên milîtan cih bi cih ji deh kesan zêdetir bûne û pevde geriyane. Tecrûbeyên Vîetnamê, Şerên Rizgariya Neteweyî ya Afrîkayê, şerên gerîla yên Amerîkaya Latîn, bi taybet jî bîranînên Che Guevara ku ji berê ve hatibûn xwedî, jixwe ruhê romantîzm û rastiya şoreşgerî ya di asta gerdûnî de heye beriya demek dirêj dabûn avakirin. Stratejiya Şerê Gel ê Demdirêj ku li Çînê di lîdertiya Mao Zedûng de serkeftî bû, mînakê şoreşê bû ku herî zêde dibû çavkaniya îlhamê. Lewma jî dema wisa bê nîrxandin, Şoreşgerên Kurdistanê “gerîla” dizanîn. Lê, wê dûvre di encama hin ezmûnên dilsoj de bihata dîtin ku, eger bi serê çiya ketin xwe nespêre bingehên pir xurt ên îdeolojîk, wê demê “gerîla” jî dernediketî holê.

Beriya ku berê xwe bide derveyî welêt, pir kêr milîtan xwedî tecrûbeyên eskerî bûn. Tenê mamostayê lîseyê Mehmet Karasûngûr, çar mehan efseriya îhtiyadî kiribû ew qas! Cuda jî ti kesên ewqasî xwedî ezmûn nîn in, ne xwedî tecrûbe û perwerdeyê ne. Ji ber vê yekê jî perwerdeya ewil a cidî ya leşkerî, ezmûn û pîspori wê li kampên Filistinê yên li Lubnanê bêne girtin.

Li kampan, perwerdeyên leşkerî yên PKK'îyan, Filistinî didin. Ji bilî van perwerdeyan, bernamêya wan a perwerdeya xweser jî didome. Komên ku ji serî ve li kampên cur bi cur ên Filistinê hatine belavkirin, ji aliyê kadroyên pêşeng têne ziyaretkirin û bi vî şiklî ve jî xebatên rêkûpêk ên perwerde, lêkolînê tên meşandin. Zêra, wê bi bayê lezê vegera welat çêbibe. Planên wisa nîn in ku

demek dirêj li derveyê welat bimînin. Hê, Cûntaya 12'ê Îlonê darbeya xwe pêk neaniye. Krîzek mezin a rêxistinî pêk hatiye. Eşkere bûye ku ji bo nebesiyên kadro û lewaziyên kesayetê bêne derbaskirin, lazîmî bi perwerdeyê heye. Zelal e ku pêdivî bi perwerdeya leşkerî jî heye. Lê, divê ku demîldest ev kêmasî, nebesî û şaşîtî der hal bêne derbaskirin, hin amadekarî bêne kirin û bikevin rêka welêt.

Jixwe piştî perwerdeyek Kemal Pîr wek berpirsê giştî welêt li ba Mahsûm Korkmaz (Egîd) derbasî Kurdistanê dibe. Li gor plan-saziyê, Kemal Pîr wê kadroyên li Riha, Mêrdîn û Êlihê kom bike û derbasî Dêrsimê bike; Mehmet Karasûngûr û Mahsûm Korkmaz jî wê derbasî Botanê bibin û li vir gerîlatiyê bi pêş bixin. Li gor he-saban wê pêşxistina gerîla ji du xelekên bingehîn pêk were. Li Başûr Mahsûm Korkmaz, li bakur jî Delîl Dogan hatine wezîfe-darkirin ku van xelekên bi pêş bixin. Tevahî kadroyên ku li se-hayên cuda yên welêt belav in wê werin çiyê, perwerdeyên siyasî û leşkerî yên ku li Lubnanê hatine dayîn jî wê li çiyayan ji bo kadro-yan bêne ragihandin. Kemal Pîr, piştî hin xebatên li Riha û Mêrdînê, bi bêşensî dema ku li derdora Sasonê wesayîta wan dike-ve kemînê û xwe jê diavêje, ji ser hişê xwe diçe û dikeve dest. Tevahî belgeyên têkildarî şer jî pê re ne. Egîd –Mahsûm Korkmaz- jî xwe rizgar dike. Plana şerê gerîla ya ku wê li Kurdistanê bê pêşxistin jî wisa dikeve destên dewletê.



EGÎD-MAHSÛM KORKMAZ

Êdî hayê dewletê ji şerê gerîla çêdibe. Di nav şertên îzafî guncav ên Kurdistanê de şensa dawî ya rêxistinbûyîna jî ji dest çûye. Ya bê kirin jî wiha ye; kadroyên çiyê bi lezûbez wê derkevin derveyî welat, di saxlemiyê de bêne perwerdekirin û dûvre jî bi amadekariyên gelekî xurt ve vegevin welat. Ji bo PKK'ê taktîka herî rast ev e û wê hewl bê dayîn ku herf bi herf pêk were.

Êdî ji bo dewletê alarm di astek herî hişk û bilind de lê didin. Rêveberiyên awarte yên ku wesfê amadekariyê hatibûn îlankirin, li tevahî sathê Tîrkiye û Kurdistanê fermî dibin. Ev jî dihat wateya cûntayê yan jî darbeyê.

Darbeya 12'ê Îlona 1980'yan, di dîroka netewe dewleta Tirk de wek destwerdena herî berfireh a cûntayê bi pêş ket. Pêşketinek pir girîng a Tevera Şoreşger li Tîrkiyeyê hebû. Krîzek kûr a aborî rû dida. Bulent Ecevit, wek serokwezîrê hikûmeta koalîsyonê li desthilatdariyê bû. Ji bo bihurandina krîza aborî, pêdivî bi desteka hêzên emperyalîst ên gerdûnî û krediyên ÎMF'ê hebûn.

Li Rojhilata Navîn jî destwerdana di çarçoveya şerê sar ê mabeyna DYA-Yekîtiya Sovyetan de rê li ber rewşên girîng vedikir. Li Îranê di Sibata 1979'an de Şoreşa Îslamê pêk hatiye, Yekîtiya Sovyetan jî Afganîstan dagir kiriye, Tevera Berxwedana Filistinê jî di warê pêşketinê de li lûtkeyê bû. Li dijî emperyalîzmê jî eniyek bi bandor a redkirinê ava bibû. Li Ewropayê bi milyonan mirov tevli mîtingên aştîyê dibûn. Li beramberî van pêşketinan, DYA ya ku pêşengtiya emperyalîzmê dikir jî hemleyên jiyanî bi pêş dixistin. Li Pakîstanê darbe dikir, li milê din jî li Afganîstanê li dijî Sovyetan wek lingekî Projeya Nîfşên Kesk mucahîd dixistin dewrê.

Li Tîrkiyeyê ji bilî yên li jor hatin gotin, têkoşînek Kurdistanî ya bi pêşengtiya sosyalist jî hebû. Amadekariyên şerê gerîla ya PKK'ê ku piştî belgeyên li ser Kemal Pîr hatin desteserkirin kifş bû, bû sebeb ku alarmên dewletê hê leztir û gurtir lê bide. Cûntaya ku ji bo dîrokek hê wirdetir hatibû plankirin, zûtir ket meriyete û 12'ê Îlonê pêk hat. Ji ber ku darbeya 12'ê Îlonê Çepgirên Tirk bi xafilî girt, bi pelaxtinê di ser wan re derbas bû. Her çiqasî yên berxwedêr û hewlên têkoşîna çekdar çêbibe jî, encam hezîn bû. Piştî Qetlîama Mereşê ya di sala 1978'an de pêk hat, li ser esasê nîrxandina *“dibe ku darbeyek çêbibe, Qetlîama Mereşê nişana vê*

ye” daxwaza yekîtiya hêzan çêbûbû. Lê ji ber ku Çepgirên Tirk guhê xwe li vê daxwazê girtin, di nav xafletê de hatin girtin û bi vî şiklî jî darbeye Çepgirên Tirk daye ber xwe û tine kirine. Ji ber ku PKK’ê ji serî ve pêşketin texmîn kir û bere xwe da derveyî welat, her çiqasî di 12’ê Îlonê de pîrsgirêkên cidî rû dabîn jî li ser piyan maye. Abdullah Ocalan, wê dûvre vê rewşê wiha binirxîne; **“Şûrê 12’ê Îlonê bi porê me bû, lê me xwe rizgar kir.”** 12’ê Îlonê teva-hiya Kurdistanê di ser hev re derbas kir. Bi hezaran PKK’î hatin dîlgirtin, bi sed hezaran Kurdistaniyên welatparêz hat êsîrgirtin, birîndar bûn û hatin qetilkirin. Ti mal û gund neman ku neketinê û bi ser de negirtin. Mîna kabûsekî li her deverên Kurdistan û Tirkî-yeyê rû da.

Beriya ku em seyra pêşketina Tevera PKK’ê bidomînin, bê cuntaya faşist a 12’ê Îlona 1980’yan tê çî wateyê, em bi gotinên Abdullah Ocalan binin ziman: **“Darbeya eskerî ya 12’ê Îlona 1980’î bi sedema ku li hundir muxalefeta gelan zêde bû, li der-ve jî bi sedema guhertina konjonktura li Rojhilata Navîn (Şorêşa Îslamî ya Îranê, dagirkirina Afganistanê ji aliyê Yekîtiya Sovyetê ve), li şûna ‘milliyetgiriya Tirkê Spî yê laîk’ ê Komara Pêşî xwe li avakirina Komara Duyemîn a xwe bisipêre ‘milli-yetgiriya Tirkê Kesk ê Îslam Tirk’ rakişand. Di hedefa vê hewldanê de bi awayekî bingeîn muxalifên Tirk ên demok-ratîk û sosyalîst û muxalifên Kurd ên neteweparêz hebûn. Ummetgir, ya rastî Evangelîstên Îslamgir (Îslama Mûsewî terîqeta nûxwaziyê) ji xwe re weke zemînê îdeolojîk hîlbijart. Ya rastî, ji tevera Nûrciyan heta bi tevahiya Neqşî û Qadiri-yan terîqetan xwe bi lez di ber çavan re derbas kirin û vegu-herîn ekola Îslamî-Cihû ya modern ku versiyona Tirkîyê ya Evangelîstên Xiristîyan-Cihû yê li DYA’yê ne. Zemînê rastî yê îdeolojîk ê faşîzma 12’ê Îlonê jî ev ekol e.”**

Tevera PKK’ê, êdî xwe li derve bi temamî amade kiriye, dest bi amadekariyên vegera welêt kir. Ev jî tiştekî cara yekemin e. Bi gotinek hê rasttir, di dîroka Kurdistanê de ji bilî PKK’ê ti hêz nîn in ku ji bo vegerin derdikevin derveyî welat û amadekariyan dikin. Dikare bê gotin ku Xoybûnê bere xwe bi aliye Kurdistanê de daye. Jixwe ev rast e jî! Lê divê neye jibîrkirin ku ji bilî çend rêveberên Xoybûnê ti kesekî din lingên xwe neavêtine ser xaka Kurdistanê.

Pîştî Berxwedana Agiriyê, Tevgera Xoybûnê penaber bûye û bûye rêxistineke ku jiyana xwe li derveyî Kurdistanê didomîne. Esas, rastiya vekişîna ber bi derveyî welat û koçê ewqasî sosret e ku; ji destpêka dîroka Kurdistanê heta îro ti ferd, kom, rêxistin nîn in ku piştî welat terikandine, neçar mane derkevin derveyî welat, hatine sirgûnkirin û bi şiklekî hatine koçberkirin, careke din vegeriya bin Kurdistanê.

Lê çî heye ku yên di dîroka Kurdistanê de neçar mane welat bi-terikînin, wisa hatine qutifandin ku careke din venegeriya ne û li rûyê welatê bûye xirbeyek nenêrîne. Hînan li cihên koçberiyê çî hebe avêtine hundirê xwe û careke din jî deng û rengên wan diyar nebûne. Hin jî mîna rewşenbîrên welatparêz ên rêzdar Mahmûd Baksî û Mehmûd Êzûn ji welêt dûr, bêcare, bi hesret û di nav kul û kesaran de bi nexweşîyan ji nav ve veqetiyan. Hin jî li cihên koçê ewqasî elimîne ku Kurdîniya xwe jî ji bîr kirine. Di nav Ereban de bûne Ereb, di nav Farsan de bûne Fars, di nav Tirkan de Tirk, di nav Ewropayîyan de Ewropî û li Amerîkayê jî bûne Amerîkî.

Lewma jî PKK'ê bi vî mile xwe ve ruhekî nû afirandiye. Dema neçariya derketina derveyî welat diyar bûye, ev tene wek taktîkekê nîrxandiye û ti carî fêrî derveyî welat nebûye, entegre nebûye. Kadroyên PKK'ê, berevajîya komên din ku jiyana li derveyî welat datînin pêşîya xwe, her roj li rêyên nû digerin ku bi şiklekî hê xurttir karibin bi welat re bibin yek. Ev sekn wek çawa di şexsê mêtîngerî û faşîzma Tirk de li dijî sirgûn, koçên ku ber bi hêzên kapîtalîzma gerdûnî pêk tê, di tarzê Kurd nû de bûye bersiv; her wiha ji bo îxanet û hevkarîya Kurd a ku bi rehetî ji welatê xwe diqere cara yekemîn bûye bersiva herî hejîner. Bi gotinekê hê eşkeretir, şimaqek herî hişk a li rûyê serwerên Kurd e ku bi rehetî teslim dibin, asîmîle dibin, ji xwebûnê dûr dikevin û dibin biyanî û bi şibandina hinên din ve jixwe ji bo entegreye razî ne.

Tevgera PKK'ê weke ku me diyar kir, derketina derveyî welat ji bo karibe careke din hê xurttir li welat vegere pêk tîne. Hicret, biryarek wisa ye ku ji bo vegera welêt careke din bi xurtî çêbibe pêk tê. Li ser vî esasî, ji biryara vegera welêt wîrdetir, mirov bibêje ku biryara têkildarî wextê vegerê hatiye girtin, wê hê bêhtir li cih be.

Pêvajoya vekîşandinê ya di navbera 1980-82'yan de, ji bilî xwebikeyskirina rêxistinê, di warê leşkerî de jî derfet afirandin ku xeta gerîla hê berfirehtir bê afirandin. Li sehaya Lubnanê cih bi cih di nava rojê de heta 14 saetan perwerde dihatin dîtin. Ji bilî vê jî tevî Teverga Filistinê rewşa tevgerandinê û têkoşînê, di warê kadroyî de jî xwedanhev û danehevek cidî ya pratîkî ava kir. Di heman deme de têkildarî têkoşîna gerîla jî danehevek berfireh a teorîk saz kir. Di vê pêvajoyê de Abdullah Ocalan bi dahûrandinên xwe yên bi detay, cara yekemîn siyaseta û xeta leşkerî ya Rizgariya Neteweyî ya PKK'ê formulaze kir û bi pirtûkan jî şênber kir. Xebatên bi navê **Li Kurdistanê Rola Zorê, Li Kurdistanê Pirs-girêka Rizgariya Neteweyî û Rêya Çareseriyê û Têkildarî Rêxistinbûnê** amade kir. Broşurên derbarê Pêwendî û Enîbûyîna hatin amadekirin. Dahûrandin û nixxandinê deme ku têkildarî Kurdistan, herêm û cîhanê bi berfirehî hatin amadekirin, di **Rapora Polîtîk** de ku pêşkêşî Yekemîn Konferansa PKK'ê hat kirin, bi berfirehî hatin nixxandin. Esas, xebatên îdeolojîk û teorîk ên têkoşîna li Kurdistanê hatibûn temamkirin. Dûvre jî bi pirtûkên **Li Kurdistanê Pirs-girêka Kesayetî û Jiyanî Partiyê û Taybet-mendiyên Mîltana/ê Şoreşger, Rola Bûrjûvaziya Biçûk a di Şoreşa Kurdistanê de** komple dibe.

PKK'ê li Rojhilata Navîn amadekariyên xwe sergihayî dike, di-be rêxistinek navdar û di astek mînimûm de temam kiribû. Her wiha, seknên kadroyan ên di pêvajoya giştî Lubnanê de û berxwedana ku di 1982'yan de li dijî Îsrailê nişan dane, di serî de Filistinî, bandorek zehf girîng li gelen Rojhilata Navîn kiriye. Kadroyê xwe di warê leşkerî û siyasî de perwerde kiriye, pêbaweriya xwe, berxwedêriya xwe bi şehîdên xwe yên leheng îspat kiriye, xeta xwe ya îdeolojîk-teorîk kûr kiriye û pêşkêşî gel û kadroyan kiriye. Ya maye jî hinek bawerî, hinek wijdan û hinekî jî meşek bi cesaret bû. Ya ku diviyabû bihata kirin jî, fermîkirina vê bû û destpêkirina vegera li welêt bû.

Li ser vî hîmî jî wê Duyemîn Kongreya PKK'ê biryarên dîrokî bidana. Ji bo koça pîroz a dîrokî ku di sala 1979'an de pêk hat, mîna ji Medîneyê ber bi Mekkeyê çêbûbû, êdî biryarên vegera welêt hatibûn girtin û ketibûn meriyete. Berxwedana pîroz a ku kadroyên PKK'ê li Zindanên Amedê raber dikirin, di girtina vê

biryarê de bandorek mezin ava kiriye û ji bo girtina vê biryarê yek ji sedemên sereke ye. Berxwedana derasayî ya ku li zindanê di êşkenceyên erjeng de mirina xwe dan ber çavên xwe û nişan dan, bi pênaseya “*şehidên zindî*” ya ji bo milîtanên zindanê di dîroka têkoşînê de cih girtiye.

Rêxistinên Dijber ên Fêrî Îxanetê Bûne

Rojîya Mirinê ya Mezin a 14'ê Tîrmehê

Xencera li Dilê Îxanetê Ketiye!

Berxwedana Zindanê ya girtiyên PKK'î, bi tenê serê xwe mijarek lêkolînê ye. Têkildarî mijara me jî wê hewl bê dayîn ku bi kurt û cewherî bê nixandin.

Di sala 1979'an de milîtanên li ser navê PKK'ê dîl hatine girtin çêbûne. Di sala 1980'yan de û piştî wê, ev hejmar gihiştiye bi deh hezaran. Ev girtin ji kadroyên navendî heta qedemeya navîn û ji kadroyên nû heta mirovên welatparêz qadek berfireh dide ber xwe. Zêdetirî deh hezaran Kurdên welatparêz, avêtine girtîgehên Kurdistanê. Cihê ku di nav van zindanan de herî girîng e û faşîzmê jî bêhtir bala xwe dayiyê, Amed e.

Zindan wek mewziyên stratejîk ên dîroka dewleta KT tîn zanîn ku tevgerên mûxalîf bi pelçiqandin û qutifandinê tîn qedandin. Mimkun e ku ev di dîroka Osmaniyan de bê dîtin. Heta rizandinê jî mirov di girtîgehan de hatine girtin. Li van deran mîna di demek beriya niha de tê dîtin, wan deman jî wextê ku mûxalîf dîl tîn girtin, li ba her cure êşkenceyên qeba, ji bo teslîm bê girtin û veguhe-re dijberê xwe rêbazên herî zirav ê şerê taybet tê meşandin. Gelek caran jî dema ku asta tê xwestin dernekeve holê, înfaz û îdam di-kevin meriyete. Sêdarkirin ji bo nîfşên nû wek dersa îbretê tê nixandin; yên vediguherin dijberên xwe jî dibin cotkarên tovên bêhêvîtiyê, bêbaweriyê û bêbiryardariyê. Kesayetên mîna Dogû Perînçek, Taner Akçam, Îbrahîm Guçlu û Mumtaz Kotan wek çawa dikarin nimûne werin nişandan, gelekên wek wan jî zehf in.

Li dijî girtiyên PKK'ê, ya hê tewtewetir, hê kirêttir û bêrûmettir dihat kirin. Zindan wek sehaya tinekirina PKK'îyan û PKK'ê dihat

hesibandin, Zindana Amedê jî bûye herêma vê ya Pîlot. Faşîzmê, Şahîn Donmez ê ku li Elezîzê bêyî şemaqekê jî bixwe teslîm dibe, tîne wê astê ku êşkenceyê li şoreşgeran dike, bi keviyekî li çend çivîkan dide. Avahiya îxanetkar û hevkar a di dîroka Kurd de careke din hatiye cebanîkirin, mirov hatine bêbawerîkirin û êdî ji dozdarîya xwe wirdetir, dike halekî ku ji qral hê zêdetir qralparêz û êrîşî heval û gelê xwe kirine. Rêya sereke ya ku ji mirovahiye derdixe, bêrûmetkirin e. Wê piştî demekê Yildirim Merkît jî tevlî yên wek Şahîn Donmez bibe.



Şerê taybet wisa li kesayetîyan dike ku li ser navê mirovahiye ti tiştêkî tê de nahêle û dike mîna heywanekî êrîşkar. Heywan, her ku li cinsê xwe bide wê bijî û li ser piyan bimîne. Ev, bi awayekî hê ziravtir domandina polîtîkaya “*pevşikandinê*” ye. Wisa li Yildirim Merkît dikin ku vê pê didin gotin; “*Jiyana me girêdayî îmhabûyîna PKK’ê ye, divê em PKK’ê niv bi niv hilweşînin ku em karibin bijîn.*” Ev vehûn heman vehûna dîrokî ye ku Enkîdû dixwest Hûvava bi Gilgamêş bide kuştin. Di serî de çawa pêk hati-be, di siberojê de jî wê li ser heman vehûnê bi tarzêkî hemreng pêş bikeve. Eger ev vehûn hûrikûr neyê analîzkirin û ev rewşa bi

nexweşî neyê saxkirin, wê ev diyarde her tim derkeve pêşberî me. Hedîseyek binhişî ye. Yekane rêya derbaskirinê jî ew e divê bi kok û kûrahiyên dîrokê dakeve, xwe bigihîne heta nuqteyên şikestinên ewil, ji wir ve pîrsgirêk bê girtin û çareserkirin. Me hewl da em vê nêzîkatiya esasî tim bi tim di xebata xwe de bidin. Her wiha me hewl da em ragihînin ku rêka vê jî di fêmkirina dîroka Kurdistanê re derbas dibe.

Rêka derbaskirina nexweşîya hevkarî, reformîst, milliyetgiriya berê, teslîmîyetê ya Şahîn Donmezan û Yildirim Merkîtan jî di helkirina vê vehûna dîrokê re derbas dibe. Weqaya herî kevn a ku niha di dest me de heye, îxaneta qatqatî ya Enkîdû ye ku li dijî Hûvava û gelê wî bi pêş dixê. Enkîdû dixwaze bijî, ji bo vê jî divê Hûvava qetil bike an na wê gelê çiyayî tevahî hêrs û kîna xwe di Enkîdû de biteqe. Yildirim Merkîtan jî ji bo bijîn, ketin nav hewldanê ku PKK'ê ne nîvenîv, lê ji kokê ve tine bikin. Vehûna îxanetê ya Philby ku dibêje, *“Ji bo îxanet neyê kirin, divê mirov aîdî cihêkî be. Lê, ez ne aîdî ti derê me”* û vehûna Donmezan û gelekên ku di saziyên mêtîngeran de li dijî Kurdan – bi dizî jî be- hatine derxistin û kiş û mal ên ji heman rengî tî, zehf dişibin hev...

Di tevahî tasfiyegeriya û provokasyonan de vehûn û mantixê ku xwe daye der ev e. Îxanetkarî û tasfiyegeriya Ferhat-Botan a ku wê piştî 24 salan bi pêş bikeve jî bi heman mantixî ye. Diyardeya ku di bin êrîşkariyê de ku li dijî Tevergera PKK'ê, nîrxên wê û rêgezên wê bi awayekî bêperwa pêk tî, ev e.

Li zindanan armanca esasî jî cebanîkirin (xortlak, xeyalet) û serwerkirina vê vehûna îxanetkar a Kurd e. Bi operasyonên pîralî ve hewla teslîmgirtina zindanan tî dayîn. Tevergerê xwe kişandiye derveyî welat, li Bazarcix, Dêrsim, Dep, Çewligê şêhadet çêbûne. Tekane cihê maye jî zindan e. Navenda wê jî Amed e. Eger Amed bikeve, wê PKK'ê jî di astek bilind de hilweşe. Wisa jî wê hebûna PKK'ê ya li Kurdistanê bi dawî bibe. Ev rewş wek çawa wê gel ber bi bêhêvîtiyê ve bajo, her wiha wê ew ên ku derketine derveyî welat jî bi awayekî neyînî bandor bike, bêbawer bike û bi jiyana penabertiya ve dehf bide. Ji ber vê jî dewlet wek armanca yekemîn dixwaze bi awayekî îdeolojîk û îradî teslîm bigire. Piştî îrade şikest, êdî îmhakirina fîzîkî zêde ne girîng e. Armanc bi awayekî îdeolojîk pêkanîna îxaneta girtiyan e. Ya ku li ser gelekî ku ne

xwedî kevneşopiyek berxwedana zindanan e tê ferzkirin, qedandina bi teslîmgirtinê ye. Dixwazin ku îxanet û ketîbûna herî bi tewtewe be. Lewma jî çiqasî ji destên wan were wê berê xwe bidin girtiyên PKK'ê û di vê de jî li ti sînoran ranewestin.

Jixwe bi hatine cûntaya leşkerî ve rêbazên herî zirav ên şerê taybet dixin meriyetê, wek ewil jî yek bi yek şoreşger û welatparêzên bê tecrûbe dixin. Wisa dibe ku ber bi dawiya 1981'an, hema hema ti kesên ku teslîm negirtine namîne. Girtiyên ku berê bê tecrûbe bûn, bi berxwedanên mîna grevên birçîbûnê û rojiyên mirinê ve heta astekê dibin xwedî tecrûbe. Lê, piştî demekê berxwedan dişkê û qaîdeyên tîn spartin tîne qebûlkirin. Û lê her milîtanên ku dikevin nav vê helwestê bêyî îstîsna dibêjin, *“Em teslîm bûn, em ê çawa li rûyê hevalê Abdullah binêrin! Em ê çawa derkevin pêşberî gel!”* û li rêyekê digerin ku çi dibe bila bibe jî vê rewşê rizgar bibin.

“Tu yê mirovan bixe halekî wisa ku bila nikaribe li ber neynikê li rûyê xwe jî binêre.” Hedefa darbekarên 12'ê Îlonê jî ha ev e. An jî, *“tu yê wisa bêrûmet bike ku bila bi sadîstî êrîşî nasnameya xwe bike.”* Yek; sekna mirovê durist û birûmet, lê şikestî ye, ya din jî sekna Şahîn Donmezan, Yildirim Merkîtan, Hidir Akbalikan, Alî Gunduzan û di dîroka Kurd de seknên îxanetkar ên Reyberan, Cemîle Çetoyan, Bînbaşî Qasiman, Mattîzawayan û Harpagosan e. Berxwedana bi heybet û bi rûmet a ku wek Berxwedana Zindana Amedê derbasî dîrokê bû, wê li ser vî bingeşî bi pêş bikeve û di dîrokê de cihê xwe bigire.

Tevgera Apoyî, tevgera ku mîna zindîtiya dîrokê herikbar e. Tevgera Apoyî berxwedan e ku di şertên herî zor de dema ku ji bilî dilekî tazî û hêza îradeyê ti tiştêkî din jî nînbe, dîsa pêk tê. Dema bi dijmin re rû bi rû dibe, bêtirsî û bi lehengtî parastina berjewendiyên gel, şoreş û partiyê ye. Cewherê qehremantiya Apoyî ew e ku di nav bêhevsengiya mezin a hêzê de jî bi serekî natewe û îradeyeke naşkê ve parastina gel, şoreş, nasnameya partiyê, berjewendî û xeta wê ye. Di nav gel de gotinek mîna *“Lehengî jî bi-zonektî jî di demên teng de diyar dibin”* tî ziman. Zêra, qehremantiya ku di demên zor, teng û di nav bêderfetiyan de neyê îspatkirin, ne qehremantî ye.

Girtiyên PKK'î – bi taybet jî kadroyên pêşeng ên mîna Mazlûm, Xeyrî, Kemal, Ferhat- dizanin ku di vê pêvajoya zehmet de wezîfeya bakirina ala şoreşê li ser milên zindanan e.

Mazlûm Dogan dibêje, “*Vekişîn rast e, bila neyê ecelekirin, piştî amadekariyek saxlem a du salan bêyî ku zêde dereng bibe, careke din vegera welêt çêbibe. Heta wê demê em ê vê alê dewr bigirin, wê valatîyê dagirin, şoreşa li derve em ê li zindanan bi-domînin*” û vê berpirsiyariyê li ser milên xwe digire. Xeyrî Dûrmûş diyar kiriye ku di wê demê de tevahî berxwedanên Kurd ên dîrokî bêyî ku li pey xwe belgeyek nivîskî bihêlin hatine tepe-serkirin, lewma jî nebûne mîrateyên malê dîrokê û lewre jî çi dibe bila bibe pêwîst e parastina siyasî bikin. Ev gotin tespît in ku piştî hatiye fêmkirin ku wê dijmin destûra parastina siyasî nede, hatine ziman. Lê tê jibîrkirin ku îradeya ku van gotinan bi lêv dike, îradeya Mazlûman e. Ji bo ev daxwaz û azwerî bê dîtin, em tenê berê xwe bidin helbesta hevalê Mazlûm a bi navê Ulkem (Welatê Min) jî bes e:

*“Bi qasî xaka min,
Dengên min, eşqên min
Ne mezin in îxanet
Ew nikarin bibin
Baskên çivîka beytik jî*

*Divê ez binivîsim
Dilopên baranê,
Dengên zarokan,
Baskên çivîkan,
Perpîtîna wê
Ya welatê xwe*

*Dilên birîndar ên girtiyan,
Tiştên ku di kêliya lêdanê de
Ciwanek dibihîze,
Gotinên dawî yên miriyekî
Divê ez li qaxizan, stêrkan nexş
bikim
Xijikîna bêdeng a marekî û
Li ser axê şopa ku dihêle
Bi qasî dûpişk, qasî heftcarik
Bi qasî tiştên xerab tîn zanîn
Divê zilmê jî binivîsim
Îxanetê jî.”*



MAZLÛM DOGAN

Ev nêzîkatiya bi rêgezî, hiştiye ku girtiyên PKK'î berxwedaneke bêhempa nîşan bidin, girtiyên PKK'î yên ku ji bilî bedenên wan ên tazî û îradeyên wan ti tişteki wan ên din nînbû, canên xwe danîne holê û xwedî li rûmeta mirovahiyê derketine û rastiya berxwedana PKK'ê afirandine.

Dema dikeve zindanê, as-teke xwe ya diyar tine. Di çarçoveya berxwedanên ewil de ku li dijî her cure êşken-ceyên îradeşikandinê yên faşîzmê bi pêş diket, nedihat zanîn ku bê mirovek bê av

dikare çend rojan bijî û di greva birçîbûnê de çiqaşî li ber xwe bide. Rojiya mirinê ya ji Şoreşgerên ÎRA ya Îrlandayê Bobby Sands, kêmtir zêde hatiye bihîstin. Lê, detayên wê nayên zanîn. Cêribandina destpêkê 8 rojan, ya duyem jî 15 rojan dewam kiriye.

Berê av jî nedihat vexwarin, lê her ku çû ya wê derketiba pêş peyama çalakiyê ya siyasî bû. Wê demê av tê vexwarin û cixare tê kişandin. Ji bilî xwendina çend pirtûkan, hiç ezmûn nîne. Rojiya ewil a mirinê ya mezin, 43 rojan dewam dike. Û her ku diçe wê îradeyek polabûyî teşe bigire. Li Kurdistanê wê çandeke nû derkeve holê ku bi dehan rojan tişteki nayê xwarin û ev jî wê ji bo gel, ji bo welat, ji bo şoreşê tê kirin.

Di berxwedan û îsyanên berê de radestî yan jî mirin her li pêş bûye. Lê vê carê li zindanê destanên berxwedanê tên nivîsandin. Dijmin her rêbazî dixwe dewrê û hewl dide teslîm bigire, wê li vir îxaneta hundirîn û tundiya hovane li ser serê girtiyan kêmtir neke. Jixwe wek encama vê jî wê ber bi dawiya 1981'an de hin kes bişkên. Piştî ku berxwedana yekemîn dişkê, wek encama vê jî ji aliyê rêveberiya faşîst her roj û her saet rêzikên nû yên mîlîtarîst tên ferzkirin. Her ku diçe asta êşkenceyê tê zêdekirin. Îtirafkarî tê

lezandin. Yek bi yek, du bi bu ew qawîşên teslîmkaran tijî dibin. Êdî hejmara milîtanên pêşeng, hejmara tiliyên destekî nebihurin. Wek tê zanîn teslîmbûyîn, li atmosferên ku tirs serwer e mîna vîrusê berbelav dibe. Tehlûke mezin e. Li ser vê jî di serî de Mazlûm, Kemal, Xeyrî, Ferhat, kadroyên pêşeng ên PKK'ê dikevin nav liv û tevgerê. Ji bo teslîmbûyîn veneguhêre îxanetê û ji nû ve berxwedanê bi rêxistin bikin, diçin qawîşên teslîmkaran. Ferhat Kûrtay dibêje, *“Her hal ez ji êşkenceyê, mirinê natirsim. Ez îxaneta li Apoyîtiyê jî nahizirim. Ez naxwazim heval jî wisa bifikirin. Lê em di vê berxwedanê de têk çûn, tevahî hevalên me li qawîşan man û qawîş ji bo xebatên sîxurkirinê yên dijmin bûne qadên vekirî. Eger em karibin em ê pêşî lê bigirin”* li şertên pêkanîna mîsyona xwe ya pêşengtiyê digere.

Asta êşkenceyê ya beriya berxwedanê yan jî di pêvajoya berxwedanê de û mercên jiyana li qawîşan, bi qedandina berxwedanê re tam dibe dojeh. Pêkanînen dijmirovahî yên mîna wek kûçikan hewtandin, wek keran zirandin, wek berxan berandin, avêtina çala pîsiyan û dûvre jî bi hev dana alastin, tecawiza bi copan, di hucreyekê de bicihkirina 56 mirovan, di nava zivistanê de her roj avdana cihên ku çend kes dimînin, negirtina şibakeyan, ava şid, di çûyîn û hatina dadgehan de kelepçekirin, li wesayîte zincîrkin û domahiya rê copkirin, bi ser girtiyan de rijandina xwarinên germ, bênavber bi awayekî dubare di meriyetê de ne. Wisa dibe ku dema kadroyên pêşeng li hemberî van sipartinên dermirovî parastinên siyasî amade dikin jî ji bo girtiyan bi şiklê, *“binêrin, rêberên we îtîrafên xwe dinivîsin”* tê ragihandin. Tam jî di atmosferek wisa tarî de slogana ***“Teslîmiyet îxanetê, berxwedan serkeftinê tîne”*** dibe şîara herî girîng. Bi dehan welatparêz û milîtan nema dikarin xwe ragirin û dikevin nav hewldanên xwekujîyê. Destûra mirinê jî nayê dayîn. Mirin, ji bo miriyan mîna teka-ne rêya rizgariyê tê nirxandin. Lê, destûra vê jî nayê dayîn. *“Bêyî destûra Dewleta Tirk, mirin jî qedexe ye!”*

Dema roj dibe 21'ê Adara 1982'yan, yan wê vê rêveçûna serberjer bê rawestandin an jî wê komek biçûk a milîtanên Apoyî heta dawiyê li ber xwe bide, îxanetê têk bibe û bibin şoreşgerên sembolîza zafera îradeyê. Çalakiya Mazlûm Dogan, wê di demek wisa de pêk were ku zext zêde bûne, teslîmbûyîn bi pêş ketiye. Mazlûm

Dogan, li qawîşa kêlekê ji hevalekî xwe re (Mûstafa Karasû) dibêje ew roj Newroz e û dipirse bê wê Newrozê çawa pîroz bike, dûvre jî diyar dike ew ê bi xwe bi sê niftikan Newrozê pêşwazî bike. Roja ku kravat tên komkirin, ji ber ku Mazlûm Dogan li dadgehê ye, karîbûye kravata xwe ji dijmin veşêre. Li qatê çaremîn a Zindana Amedê dimîne û qatê çaremîn jî bi meyl e. Kravatê dike girêk û li waneya avê dialîne. Dûvre jî girêkê diavêje stûyê xwe û lingê xwe radikin jor. Di nav van şert û zirûfan de ji bilî vê çalakiya herî bi rûmet, derfetên pêkanîna ti şiklên din ên çalakiyan nîne. Meydanxwestina herî şoreşger a dîrokê ye ku nahêle dijmin wek qozekî mirinê bi kar bîne û vê jî di roja Newrozê de ku roja xwişk-tî-biratî, azadî û berxwedanê ya Kurd û Rojhilata Navîn e, bi sê niftikan pêk tîne. Wê ev kevneşopiya Kurdê nû be; rojên ku tîrsa mirinê li her derê ye wê mirinê bixe nav pençeyên xwe û qet tune bike û bi ser mirinê de bimeşe. Ruhê Apoyî yê ku ti kes nikare teslîm wergire, wisa tê afirandin û ev pêl bi pêl dibe ruhê nû yê gelê Kurd. Her wiha, ev dibe temsîla li lûtkeyê ya nîrxên herî paqij û exlaqî yên ji dîroka Kurdistanê hatine parzûnandin. Piştî bi çendan salan, li Ewropayê Eser Altinok dibêje, “*Vîrusa PKK’ê ketiye nav damarên min, min radipêçe*” û îşaretê bi vê rastiyê dike.

Piştî çalakiya Mazlûm Dogan; Ferhat Kûrtay, Necmî Oner, Eşref Anyik û Mahmût Zengîn ên li qawîşa 33’yemîn diman, ji bo alên mezin çêbikin, malzemeyên mîna boyax, tîner, firçeyê distînin. Şeva ku 17’ê Gulanê digihîne 18’ê Gulanê, her çar milîtan wê lîsteya nobedê li gor plansaziya çalakiya xwe amade bikin. Nobeda li qawîşan, wek çawa tevdîrek li dijî êrîşên esker û gardiyanan e, her wiha rêzîkek komunê ye jî. Li ser vî esasî ji ber ku her girtiyek jiyana wek gerîlayekî û her qawîş jî jiyana wek yekeyek gerîla esas werdigire, nobedarî jî şert e.

Sibeya 18’ê Gulanê, her çar milîtan jî boyaxan bi ser xwe de dadikin û niftikan pê dixin. Li pey xwe jî nameyek berfireh dihêlin ku sedem, naverok û wateya çalakiya wan îzah dike. Di dema çalakiyê de girtî bi panîkê şiyar dibin û bi cihê bûyerê ve dibezin. Li beramberî wan, çar milîtan mil bi mil in û diqîrin, “*Bijî PKK’e, Bimire dagirkerî!*” Girtî bi panîkê hewl didin agir bitemirînin. Lê ji nav agir dengê bilind dibe û dibêje, “*Na hevalino na, agir venemirînin, agir geş bikin, temirandina agir îxanet e.*” Her çar

milîtan jî di encama vê çalakiyê de şehîd dibin. Ev, dengvedana sê niftikan e. Ruhê berxwedanê her kesî radipêçe. Çalakiya Mazlûm Dogan wek çirûska yekemîn, agirekî mezin daye destpêkirin.

Çalakiya Rojiya Mirinê ya Mezin a dîrokî, piştî van serpêhatîyan pêk tê. Rojekê dema diçin dadgehê Xeyrî Dûrmûş mafê axaftinê werdigire û çalakiya rojiya mirinê radigihîne. Xeyrî Dûrmûşê ku diyar dike wê axaftina wî ne dûvdirêj be, biryara xwe wisa radigihîne: *“Me şertên jiyana mirovî û derfetên parastina fikrên xwe xwestin. Lê, we ti ji van qebûl nekirin û we êşkenceyên xwe yên dermîrovî domandin. Ji ber vê jî li vir ti daxwazê nakim. Ji îro û şûn de ez dest bi çalakiya rojiya mirinê dikim.”* Ev biryarek teqez e.

Piştî Xeyrî Dûrmûş, Alî Çîçek mafê axaftinê werdigire û dibêje, *“PKK’ê ne teslîmbûyîn, berxwedan fêrî me kiriye. Niha bi pozîsyona xwe em hem di nav teslîmîyet hem jî îxanetê de ne. Ya ku ez ji PKK’ê fêr bûm ne ev e. Ji ber vê jî ez rêka berxwedanê hildibijêrim û dest bi rojiya mirinê dikim.”* Alî Çîçek, di nav milîtanên de yê herî ciwan e. Bêyî ku ti îfadeyê bide polîsan û ji wan re gotinekê jî bike, ketiye zindanê.

Dûvre Kemal Mîr diaxive û vê tîne ziman; *“Ez jî tevlî gotinên hevalên xwe Xeyrî û Alî Çîçek dibim, bin gotinên wan îmze dikim. Bila ti kes nebêje ku ji ber ji jiyanê aciz in û ne xwedî hêza jiyanê ne, mirin hildibijartine. Em gelekî ji jiyanê hez dikin. **Em ewqasî ji jiyanê hez dikin ku dikarin di oxira wê de bimirin.**”*

Dûvre milîtanên bi navê Akîf Yılmaz û M. Karasû radigihînin ku wê tevlî rojiya mirinê bibin. Piştre jî wê hejmara tevlîbûnê zêde bibe û tovên berxwedana kokberdayî şîn bibin. Dema ji dadgehê diçin qawîşan, Mehmet Xeyrî Dûrmûş dibêje, *“Me bi ser xist, me bi ser xist, me bi şeş kesan bi ser xist.”* Ev gotin dibin îfadeya berxwedêriyekê ku ji serî ve kilîfî zaferê bûye. Gotinên, **“Kurdistan dibe Vietnam, dengê qîrînan tê we”** jî milîtanîyek heye ku îfadeya pêşbîniya têkoşînê ye û baweriyek mezin e.

Dema ku li zindanê tovên berxwedanê zîl didin, dirûşmeya *“Teslîmîyet bi îxanet, berxwedan bi zaferê ve dibe”* dibe destan. Di vê demê de ku berxwedan û lehengtî radibe pêdarê, wê îxanet jî rehet nesekine. Şahîn Donmez û yên li gel wê bînavber bixebitin,

ji êşkencekirinê heta qenehkirinê wê serî li her rêyê bidin. Teşîya Kurd a bêyom dîsa digere, vehûna Kurd a hevkar û îxanetkar careke din di dewrê de ye. Lê vê carê wê serkeftin a berxwedan û qehremantiyê be.

Kemal Pîr di 7'ê Îlonê de, Mehmet Xeyrî Dûrmûş di 12'ê Îlonê de, Akîf Yilmaz di 15'ê Îlonê de, Alî Çîçek di 17'ê Îlonê de digihêjin şehadetê û demek nû didin destpêkirin. Girtiyên din ên çalakiyê didomînin, piştî ku daxwazên mîna avakirina derfetên parastina nivîskî, rawestandina êşkenceyê, sekinandina zora ji bo îtîrafkariyê û soz hatin dayîn, çalakiya rojîya mirinê bi dawî dikin. Girtiyên PKK'ê wisa jî cara ewil dîrokê ters diqulibînin û serî li dijmin ditewenînin. Ji niha û şûn de, gelê Kurd, dostên wê û mirovatiya pêşverû wê PKK'ê hinekî jî bi berxwedana zindanê binase û bi bîr bîne.

Tovê îxanetê, xwedî vehûnek civakî-dîrokî ye. Eger wê şibandina organîzmayek civakî bê kirin û ev her roj jî wek diyardeyek zanistî derdikevibe pêşberî me, wê demê pêwîst e em qebûl bikin ku civak xwedî genan e. Di honandina vehûna civakî ya Kurd de nûweyên îxanetê yan jî îxanetê dikin hene. Ev vehûnek wisa ye ku her ku dîrok bi pêş ketiye, hê kûrtir bûye û lê hatiye banîn. An na, kesayetekî ku heta duh rengê dozدارêkî biryardar û hişk dida, çawa dibe ku dikare li dijî heman dozê bikeve nav pozîsyonek êrîşa erjeng?

Ev nexweşiyên kesayeta çîna navîn e ku di nav du seriyan de asê maye. Tew de îcar li ser vê jî karaktera mêtîngerî ya ku gelekî tewş dike jî zêde dibe, wê demê mîna weqayek bêçare lê tê. Abdullah Ocalan, pênaseya vê kesayetê bi vî şiklî dike: **“Di vê demê de, milîtanê bijare Şahîn Donmez e. Hewl dida ku bibe alîkarê min. Lê belê di hundir de li hember hevalê xwe, mêrkûjiya herî hovane wî pêk anîbû. Bi vê yekê dixwest ku xwe bi hêz nîşan bide. Kompleksa wî, ji damezraka malbatê dihat. Aliyekî qels ê hilatina serokatîyê bû. Versîna wî ya zûka ya li pirsîyariya polîs, zûka rê li bir sefera min a Rojhilata Navîn vekir. Heger ku verneşiyabana, domandina dîrokê wê bi şeweyekî din bûna. Ji aliyê din ve, bi ser hevalên xwe yên ku şerê rûmetê dikirin neçûbana û rojîya mirinê li wan ferz nekiriba, pêvajoya 15'ê Tebaxê bi wî şeweyî bi pêş nediket. Têmsîla tîpekî di nav Kur-**

dan de ye ku di mercên zor de, bi hêsanî refê xwe diguhere. Di rojên rehetiyê de, ev dixwazên wek ên li herî pêş in xuya bikin.”

Kesayetên mîna Şahîn Donmez, Yildirim Merkît, Hidir Akbali, Alî Gunduz, di nav civaka Kurd de zêde ne. Ev kesayet, her ku şertên atmosferê giran dibin, berbiçav dibin. Dema ku berxwedan bi pêş dikeve û ala têkoşînê bilind radibe, dîsa tevlî Apoyîyan dibin. Ya girîng ew e ku helwesta milîtanîyê di nav şertên zor de pêk were. An na, di nav rehetiyê de tûjbûyîn û xwe dana pêş hêsan e. Di encam de piştî ku çalakiya 14'ê Tîrmehê bi heybet û biryardarî diqede, serî li dijmin tê tewandin. Refên PKK'ê careke din tûj dibin. Beriya ku teslîmîyet bi îxanetê ve dehf bide, bi sedan milîtan careke din tevlî doza şoreşê tîn kirin. Wek xebata yekem jî bêyî ku bertekên zehf mezin bîn nîşandan, bi rêbazên perwerde, qenehkîrî û mijûlbûyînê ve hewl tê dayîn ku yên ji ber vê karaktera vehûna civakî ya Kurd zeiftî kirine, bikevin xizmeta gel.

Bi atmosfer û ruhê ku piştî Rojiya Mirinê ya Mezin a 14'ê Tîrmehê zelal bûne, kesayetên hevkar û kûkle hatin deşîfrekirin û bêbandorkirin, bi hezaran milîtan û welatparêz jî ber bi xeta şoreşê ve hatin kişandin û pêşî li di nav çirava îxanetê de çûyînê hatiye girtin. Yên ku berê mîna Yildirim Merkît bi êşkere îxanet dikirin, êdî xwe mîna Şener bi şûn de dikşînin û îxaneta xwe bi şiklekî hê veşartîtir dimeşînin. Ev girîng e. Îxaneta ku berê dewriye diavêt hat paşxistin, dehfi bînerdê tê dayîn. Encamên ku berxwedanê anîne, ne tenê ev in. Li beramberî ew ên ku hestî û çerm man, lê şerê îradeyê bi ser xistin û bi tîpên zêrîn derbasî rûpelên dîrokê bûn, wê hêzên ewlehiyê yên mêtînger-dagirker jî wê destên xwe li ber xwe girê bidin. Cara yekem wê di dîroka Kurdistanê de pêşî li îxanetê bê girtin û di şexsê milîtanên PKK'ê de ev vehûna îxanetê têk biçe.

Berxwedana PKK'ê, mîna helbestvan jî gotî, **“WEK XENCERÊ LI SINGA ÎXANETÊ KET”**. Êdî wê îxanet bi şiklekî êşkere neyê kirin. Êdî wê hevkarî bi awayekî êşkere neyê kirin. Bi berxwedana Rojiya Mirinê ya Mezin a 14'ê Tîrmehê kifş bûye ku îxanetkar an wê tobe bikin û di nav refên mirovahiyê de ji nû ve cihên xwe bigirin an jî wê bedelê vê îxaneta xwe pir giran bidin. Eger wisa bê nîrxandin, di dîroka Kurdistanê de cara yekem îxanet

û hevkarî gihiştine heqê xwe û hatine avêtin. Berxwedanek dîrokî ye ku di dîroka Kurdistanê de tevahî qehremantiyan tacîdar dike, ji bo tevahî êşan, berxwedan û îşyanên bi heybet dibe bersiv, îxanetan jî diavêje ser sergoyê dîrokê. Ji ber ku teslîmiyet dibe îxanetê, berxwedan jî wê gelê Kurd ê mezlûm bigihîne zaferê. Ev hatiye îspatkirin...

Li Şûna Encamê

Heke civak jî heyînên zindî bin û mîna her zindiyê xwedî genan bin û her wiha eger dîrok di roja me de û em jî di destpêka dîrokê de veşartî bin û dîrok; Niha be, wê demê ji bilî bi zindiyê dîtina dîrokê ti vebijêrk namînin. Di jiyana îro de, bi analîzkirina dîrokê ve bêtî ku şaşî û nebesiyên berê bêne kirin, meşa li ser esasên hê rasttir mimkun e.

Di lêhûrbûna dîrokê de girîng e ku em bizanin organîzmeyek zindî ye û bandora xwe li kûrahiyên ruhî yê mirovahiyê dike, li ser vî esasî jî em karibin serpêhatiyan fêhm û watedar bikin. Ji ber ku; **“Di tevahiya dîroka sistema şaristaniya navendî ya herî kêm pênc hezar salî de belkî jî li mêtinkarî û zilma herî mezin gelê me rast hat. Ev rastiya gelê me şeweyê civakî yê nasnameya min diyar kiriye. Ez heta ji hemû aliyan ve vê nasnameyê ji hev dernexim, eşkere ye ku ez ê nikaribim mijara doza xwe ronî bikim...**

Eger dîroka gerdûnî nebe, dîrokên xwecihî zêde maneyên xwe nînin. Bêguman mirov dikare civakên herî ne xuya û winda jî li ber şewqa dîroka gerdûnî ronî bike.” Eger em karibin mirov ê ku jê re gerdûna biçûk tê gotin, li ser bingehên rast analîz bikin jî wê ev hewldanan fêmkirin û watedarkirinê encamên hê bi qîmettir bide me. Di vê xebata pirtûkê de **–Dîrok, Niha ye** (Bi Nêrînek Cewherî Dîroka Kurdistanê), rê û rêbazên hatine şopandin li gor tespîtên jor hatine diyarkirin.

Ji bo nuqteyên şikestinê yên di hafizaya civakê de çêbûne kifş bibin, hewl hatiye dayîn ku dîroka Kurdistanê bi kûrahî bê analîzkirin. Civakeke ku bûye dergûşa civaka herî qadîm a dîrokê, mirovahiyê, dayikî kiriye û hema hema wek şaneya kokê dikare bê

hesibandin, çima dikeve vî halî? Çima îxanet lê ewqasî zêde ye? Çima îxanetkarên nagihêjin heqên xwe? Ev xayinên ku ji bo tasfiyekirina civakekê her tiştî didin ber çavên xwe, çima ne di ferqa pêkanînên xwe de ne? Çima ku bêyî bizanin îxanet û hevkarîyê jî dikin, bêyî bikaribin berjewendiyên xwe yên eşîrî, malbatî, takekesî jî bi awayekî rast temsîl bikin, bi gotinek gelemperî nikarin bi rêkûpêk *bênamûsiya bênamûsan* jî bikin?

Erê, pirs dikarin li pey hev bêne rêzkin. Çima?

Dema ku em li bersivên van pirsan digeriyan, me ev dît:

Her tê gotin, Kurd ji xapandinê re vekirî ye. Ango, Kurd bi rehetî dikare were xapandin. Xapandin seknek e ku girêdayî rewşa ne polîtîkbûnê ye. Bi gotinek din safik e. Safbûyîn ne tişteki xerab e. Banga hevpar a tevahî olan jiyanek saf û paqij e. Fêrkirinên sosyalîst û komunal jî her tim şîreta paqijî û safiyê kîrine. Her çawa bibe jî cewherê mirov bi safîtiyan tijî ye. Kurd jî safîtiya xwe ji nîrxên neolîtîkê werdigire ku demek dirêj e dawerivandîye. Nîrxên neolîtîkê yên li dor xwedevandê, bi nûweyên ewil ên çînbûyînê ve her ku diçe serekebûna xwe wînda dike, li şûna civaka xwezayî ya ku xwe dispêre kulta (perizîna) dayikê, sîstema serweriya zîlam bi cih dibe. Ji ber ku ev sîstem jî çavkaniya xwe ji dizîtiya zêdebahiyê û mêtina kedê digire, li ser esasê qurnazî, hîle û zorê ye. Li ser vî himî, tevî hemû berxwedanan jî wê bi demê re sîstema koletiyê ya serweriya zîlam û dewletparêz serdest bibe. Saziyeke malbatê ya nû, pênaseyek mulkiyetê ya nû û tarzekî jiyanê yê nû wê serwer bibe. Xulase, wê sîstem bê qirêjkin. Abdullah Ocalan dibêje, **“mulkiyeta taybet, qirêj dike”**. Di sîstema nû de ev diyarde wê cih bigire.

Safmayîna li beramberî sîstemek wisa tijî hîle û qurnazî di warê exlaqî de dibe nîrxekî xwe hebe, lê di warê polîtîk de heta ku sîstemek alternatîf ava neke, wê ti wateyek xwe nînbe. Hestên saf û paqij, dikare her kêlî ji bo armancên qirêj bêne bikaranîn. Her tim jî sûîstîmalê re vekirî ye. Jixwe ev hestên Kurdan jî her hatine sûîstîmalkirin. Her ferdekî Kurd, heta em bi hê berfirehî bibêjin, mirovê mêtîngeh û bi taybet jî mirovên ku li Rojhilata Navîn tînin mêtin, hinekî bala xwe bidin li ser xwe, wê bibînin ku ev gotin çiqasî rast û sosret in. Kîjan Kurd nayê xapandin? Ev derbeya ye-

kem e ku ji ketina jinê ya ku bi koletiyê dest pê kir ketiye para Kurdan.

Em derbaya duyemîn a li Kurdan ketiye jî di bûyera Enkîdû de dibînin. Li daristanên mezin ku ev erdnîgariya Kurdistanê ye û nehatiye zeptkirin, jinekê pêşkêşî Enkîdû dikin û wî teslîm digirin. Dûvre jî gefa mirinê lê tê xwarin û êsîr tê girtin. Dûvre jî ji bo jiyanek “xweş” mal û milk didinê û dikin îxanetkar. Em di vê bûyerê de dibînin ku kes li beramberî civaka xwe çiqasî ne rehet be, ewqasî bi rehetî dikare bibe dijberê civaka xwe û xwe bi xwe. Îhtîmal e ku Enkîdû ji Hûvava ne razî ye û serokeşîrekî bi serê xwe ye. Sumer jî ji ber ku vê dizanin, şerbeta ku wê fêr bike û pê bixape amade dikin, pêşkêşî Enkîdû dikin û wisa jî dikin îxanetkarêkî li dijî xwe û gelê xwe.

Balkêş e, lê di vê nûweya yekemîn a îxanetê de wisa dixuye ku îxanet hê jî bi temamî nehatiye banîn. Enkîdû, beriya ku bikeve daristanê xwêdan dide û dudil dimîne. Ev jî nîşan dide ku di ferqa îxanetê de ye. Zêra dizane ku civak vê îxanetê qebûl nake. Lê, dixwaze ku Hûvava teqez bê kuştin. Îhtîmal e dihesibîne ku eger Hûvava neji wê îxaneta wî ji her kesî re vebêje. Eger Hûvava bijî, wê îxanet nikaribe bijî. Îxanetê were teşhîrkirin û tecrîdkirin. Ji bo vê jî pêwîst e Hûvava were kuştin.

Wek ji van mînakên jî tê fêmkirin, ji bo îxanetkarî çênebe şert e ku her tim têgihiştina pîvanên exlaqî yên civakî di astek mînimûm de hebe. Beriya her tiştî, divê ji êsirtiya ajoyan ku di her heyîna zindî de hene, xelasî bibe. Jiyan wê ji azweriyên ku xwe dispêrên madiyatê dûr be û dema mijar bibe siberoja gelekî, wê demê eger pêwîst bibe canê heyî jî wê ji bo vî gelî bê dayîn.

Di dîroka Kurdan de şiklekî din ê derbexwarinê jî ji jiyana bi formê eşîrî tê. Bêguman e ku eger Kurd hatibe heta van rojan, di vê de cihekî pir girîng a avahiya eşîrê heye. Bêyî vê, zehmet dibû ku Kurdan xwe bigihandana heta vê rojê. Me hewl da vê rewşê di xebata xwe de bi berfirehî binirxînin. Ji ber ku eşîr di dîroka Kurdistanê de li dijî tevahî dagirkeriyan bûye tekane rêya berxwedanê. Her wiha, diyardeya eşîrê ji bo jiyana komunal û hevpar bigihêje îro jî bûye formê civakî yê herî bingeîn. Lê, ji ber ku bi demdirêjî di formê eşîrê de israr çêbûye, ji ber li beramberî şaristaniyan yekgirtin bi pêş neketiye, hem ji derbexwarinê re hem jî ji bikaranînê

re vekirî mane. Hin caran jî hiştiye ku ji nîmetên şaristaniyê sûd were girtin. Ev rewş bi taybet ji bo tebeqeyên jorîn rastiyekek sosret e, her wiha bingehe sekna parçeyî ya Kurd, sekna bêaheng, ne yekgirtî, belave, bêdîsîplîn, keyfî û biserêxwe ava kiriye.

Eger îro, tevî hewldanên perwerdeyên mezin jî Kurd bi israr bêdîsîplîn, bêplan, belave, parçeyî, malbatî, keyfî, teng û ji pêşdîtîne dûr disekinin, di bin vê de civakbûyîna li ser esasê vê çanda eşîrê heye. Avahiya parçekirî ya ku di nav sînorên eşîrê de heps bûye û ji rastiya neteweya demokratîk dûr e, wê xwe bi-domîne.

Şimaqeke din a ku li mejî û dilên Kurdan ketiye jî îxaneta Mattîzawa yê Mîtannî ye. Çîroka Mattîzawa, di heman demê çîrokek wisa ye ku bê ji bo desthilatdariyê gelek çawa tê firotin. Mattîzawayê kurê Tûşratta ku dixwaze ji bavê xwe tacê dewr bigire, dema hêviyên wî pêk nayên, wê ji bo armancên xwe yên qirêj xwe nêzî Hîtîtan bike, Mîtanniyan lewaz bike û bibe sedem ku Mîtannî ji dika dîrokê rabin. Xulase, azweriya desthilatdariyê heta îxanetek bi vî şiklî biriye. Di heman dîrokê de şemaqek din jî, hewldana Hîtî û Asûriyan e ku dixwazin her kê ji milên xwe ve Mîtanniyan parçe bikin. Hêzên emperyal ên demê Hîtî û Asûr, nikarin bi Mîtanniyan û wek çareserî jî hewl didin Mîtanniyan parçe bikin. Lewma, wê ji başûr piştgiriya bidin Artatamayê Dûyemîn û bidin êrîşkirin, li rojava jî wê tevî Mattîzawa êrîş bikin. Di encam de wê Dewletek Mîtannî ya parçebûyî çêbibe.

Lewre jî wek derseke vê bûyerê, ji bo bandora vê şemaqekê bê şikandin, ewil divê yekîti çêbibe, çiqasî hewldanên parçekar hebin bend li pêşiyê bînan, ji bo azweriya desthilatdariya hinan jî wê destûra reşkirina siberoja gelekî neyê dayîn. Me hewl da vê rastiye jî bi dehan mînakên ve di vê xebatê de bidin.

Dema ku Kurd di zîhniyetê de bigihêjin hev, em dibînin ku ne tenê qedera Kurdan, wê qedera tevahiya gelên Rojhilata Navîn bandor bikin. Konfederasyona Medan ji bo tevahî gelan bûye yekbûyînek bi xêr. Wisa ye ku hem konfederasyonbûna navxweyî hem jî tifaqên li ba hêzên demê yên ku ji zilma herêmê ne rehet in, Aştiyek Rojhilata Navîn ya ku demek dirêj li Rojhilata Navîn pêk nehatibû, bi xwe re aniye. Li ser vî esasî, tevgera Medan bi xwe re yekîti, yekgirtin, xwişkî, biratî û azadbûna Rojhilata Navîn aniye.

Ji bo vê jî her ferd û komek li Kurdistanê ji xwe re yekgirtinek li ser hîmekî rast esas wergire, wê çiqasî jiyanî be, ewqasî jî xwedî nîrxê dîrokî be. Me ev rastî di beşên cuda yên dîrokê de jî dîtîn. Mînak, rola Sallahaddîn a li dijî Xaçperestan tê teqdîrkirin. Wek mînakek hemreng jî tifaqa Kurd û Tirkên a di fetlenokên dîrokê de ne. Bi heman şiklî, hevpariyên bi gelên din re jî her tim bi gelên vê cografyayê dane qezençkirin.

Taybetmendiyeke din a me Kurdan jî ku divê di çarçoveya ders û mînakên dîrokî de baldar bin, zû tehrîk dibin, bi nerazîbûnek çavreşî tevdişê û bi rehetî provoke dibin. Me sedemên hilweşîna Konfederasyona Medan bi berfirehî nîrxandibûn. Pir tê gotin, dema Harpagos ji Astiyages nerazî dibe, pêwendiyê li ba Kîros datîne, Astiyag wek êsîrekî dide destên Persan. Ev bûyer, nakokiyên çîna jorîn a di nav Xanedaniya Medan de nîşan dide. Persên ku vê dizanin jî van nakokiyên navxweyî hê kûrtir dikin, bi vî şiklî jî Harpagosê ne rehet çawa dixwazîn wisa dilîskînin. Dibe ku wek bedela van kiryarên xwe gihayîbin rayeyan, mal-milk û dewlemendiyan. Lê, di her halî de teqez e ku nerazîbûn û nerehetiyên takekî rê li ber hilweşîna Medan vekirîye. Ji ber vê jî divê Kurdistanê karibin nerazîbûnên xwe yên takekî kontrol bikin, bizanin bertekên xwe kêmtir bikin û nerehetiyên xwe daneynin pêşîya berjewendiyên neteweyî. Wê li pêşîya têkoşîna neteweya demokratîk a ku îro mîna dêwekê mezin bûye, nerazîbûnên xwe yên ferdî yên ji beriya salan mane, daneynin. Roj, ev roj e ku divê di bin her şert û mercî de li ser bingeheke demokratîk yekgirtinek û hevpariyek çêbibe.

Bûyera ku em dikarin bêjin di dîroka Kurdistanê de darbeyeke din a herî mezin li Kurdan ketî ye, bûyera Magamonî ye ku di sala B.Z. 521'an de pêk hatiye. Herodot di nivîsên xwe de radigihîne ku Med li Rojhilata Navîn wek ronîbûnek çandî navendek kêşandî ye. Bi taybet destnîşan dike ku xwedî rastiya gelekî zehf pêşketî û xwebawer e. Em dizanin ku di warê hizirînê de pir li pêş in. Her çiqasî malbata Akhemenîtan a Persan desthilatdar bin jî, çand a Medan e. Yên sereke Med in. Kompleksên ku wê di warê psîkolojîk de bi hinan re çêbibe, îro hê bêhtir tê fêmkirin. Dibe ku li gor hesabên wan ên ku wek çandî û zihnî serdest bin wê di demên pêş de careke din desthilatdariyê bi dest bixin, malbatên bi

bandor ên Farsan li hev dicivin, bi şiklekî zehf sistematîk û bi plan di şevê de temamî mejiyên ronakbîr ên Medan; Magên oldar, rewşenbîr, pêşengên siberojê û mamosteyan qetil dikin. Pir kêr ji wan xwe gihandine Medyayê. Wisa dixuye ku piştî 2500 salan ev rastî ji aliyê Kemalîstan jî tê ferqkirin ku ji parêzvanên vê îdeolojiyê Fevzî Çakmak valavala negotiye, *“Hê em nikarin bi nezanên van re serî derkevin, tew îcar xwendevanên wan dê mala me bişewitînin.”*

Wisa jî hatiye xwestin ku pêşketina zihnî ya gelekî di carekê de bê qutkirin û ji hiş bêne xistin. Kurdên ku hişên wan tê windakirin, ji bo careke din bihiş nebin, serî li her rêbazê hatiye dayîn. Kurd ew roj ev roj e ji xebatên hizrînê direvin. Amade ye ku bikeve nav her cure karên pratîkî; lê xwe nade ber perwerdeyê, nivîsandinê, xetkîrînê û xwendinê ango xebatên mejî.

Pêwîst e her Kurdistanî di ferqa vê diyardeyê de bin û karibin perwerdeya xwe bi xwe bikin. Tê gotin ku du taybetmendiyên Kurd hene ku mirovan diqutîfin; yek ji van yekîtî ye, ya din jî pênûs e. Yekîtî li dijî dagirkeran seknek hevpar îfade dike; pênûs jî hêza mejî nîşan dide, bi gotinek din jî yekgirtina dil û mejî ye, xebata bi dîsîplîn û berpirsiyariya hundirîn e.

Kurd, piştî vê Magamoniye salên dûvdirêj her tim bi dagirkirinan re hevrû bûye. Kî hatibe ji ber xwe lê daye û derbas bûye. Fars, Yewnanî, Part, Romayî, Sasanî, Ereb, Osmanî, Îngilîz, Rûs û hwd.

Di dîroka Kurdistanê de bûyerek din a ku herî zêde dibe sebeba tepisandinê û dirûvguhertinê jî vebûnên Ereban ên li ser Kurdistanê ne. Dema mirov nasnameya xwe dîtîkîne û hewl dide bi nasnameyeke din xwe îzah bike, ev dibe rewşek dewşîrmetî. Ji xwe direve. Ji xwe şerm dike. Helandin e. Dawî li xwe anîn e.

Erebên ku bi şûrê Îslamê ketin nav Kurdistanê, zehf zêde xwîn rijandine. Dibe ku li hin deveran ev bi xwînrijîyek kêr jî pêk hatibe, heta hin caran jî bi dildarî çêbibe. Lê, ya hê zêdetir berbiçav bi zorê çêbûye. Îslam umetparêzî ye, lê Îslama ku bi rengê Ereban hatiye spartin jî ji bo gelên din şovenîzma Ereban e. Ji bo Kurd bibin Misilman, bi sed hezaran Kurd qetil kirin e. Li milekî qetlîama sor, li milê din jî qetlîama spî; kîmyaya Kurd guherîne.

Dikare bê gotin ku ev rewş bi taybet jî ji bo serwerên Kurd derbasdar e. Erê, di rêjeyek mezin de rast e. Bi giranî ji bo serwerên Kurd derbasdar e. Jixwe, serwerên Kurd, hema hema di tevahî merheleyên dagirkirinê de li rex dagirkeran cihê xwe girtine, piranî jî zimanê dagirker bi kar anîne, bi çanda dagirker jiyane. Kîmyaya civakî ya Kurdan guherîne. Tebeqeyek tirsnaq a hevkar çêbûye. Çanda Kurd di astek erjeng de hatiye texrîbkirin. Zimanê Kurd biçûk hatiye dîtin, navên mirovan jî hatine guhertin. Li şûna kevneşopiya Zerdeştî, karaktera Îslamê ya zilam serwer, otorîter û desthilatparêz-dewletparêz hatiye bicihkirin. Kesê di nav vê de her çiqasî jî xwebûnê dûr ketibe jî tew neketiye vê ferqê jî. Kesayeta kes tê dizîn, bêkesayet tê hiştin. Ti kesê bihistî jî nebûye. Yên ku li gor vê neçûn jî di bin navên cuda de hewl dane rêyeke din bibînin –mîna Elewîyan- û bijîn.

Li dijî rewşên dewşîrmetî û Mangurtkirinê, ji bo takekesên Kurdistanî karibin dîsa li xwebûnê vegerin, şert e ku ji nû ve ronesansek çandî biafirînin.


Em di dîroka dagirkirina Kurdistanê de vê dibînin; eger Kurdistan bi halê xwe de bê berdane, mirovên li ser vê xakê bi lezûbez bi ser xwe ve tînin, dikarin xwe bidin ser hev. Wek nimûne jî em dikarin behsa pêşketina çandinî ya Kurd a di sedsala 10'ê de bikin. Ji bo dema kurt çawa ku talan, qetlîam û dagirkerî kêmtir dibê, li van xakan jî pir xebatên ronakbîriyê dest pê kirine. Di pêvajoya ku êrişên Moxolan diqedin û di destpêka sedsala 15'ê de jî em dikarin rewşek heman rengî bibînin. Wê demê, divê xebata ewil a Kurd xebatek wisa be ku karibe dawî li rewşa dagirkeriyê bîne. Kurdistan, dema ku dagirkerî bê qedandin û rakirin wê demê dê pêş bikeve. Em bi awayekî zelal dikarin vê di dîroka Kurdistanê de bibînin.

Divê em karibin tê bigihîjin ku me di kîjan merheleya dîrokê de û çawa wîda kiriye û li gor vê jî em karibin xwe têr û tijî bikin. Em karibin bi awayekî baş di dîrokê de bigihîjin, em karibin bibînin ku bê me li kû derê, çawa wîda kiriye û li gor vê jî em ê karibin ji bo xwe nexşerêyekê ava bikin. Gelê Kurd, piştî pêşengtiya Abdullah Ocalan û PKK'ê ji bo sekna xwe ya xwedî potansiyela îxanetê, hevkar, ji xwebûnê dûr, xwenebawer, parçebûyî ya ku ji ber taybetmendiyan serweran û spartinên hêzên

mêtinger-dagirker pêk tèn, gotiye raweste û ketine nav pêvajoya xwebûnê, mîna neteweyek demokratîk a azad û bi îrade avabûyîne.

Rêya Kurdistanê Azad Demokratîk a ku civaka Kurd wê dawî li polîtîkayên hêzên dagirker bîne û bi azadî bijî, ji aliyê Abdullah Ocalan û PKK'ê hatiye ronîkirin. Konfederalîzma Demokratîk û Xweseriya Demokratîk wek pratîzekirina Çareseriya Neteweya Demokratîk a ku çareseriya azadiya Kurd e, tê nirxandin û gelê Kurd jî li ser vî hîmê ber bi sîberoja xwe ve dimeşe.

Di vê meşê de xisûsa herî girîng ew e divê seknek wisa ya jiyane bê sazîkirin ku karibe îxanet û hevkarîyê bêbandor bike. Rojîya Mirinê ya 14'ê Tîrmehê, li Kurdistanê cara ewil îxanet û hevkarî deşîfre û teşîr kiriye. Li beramberî vê jî destnîşan kiriye ku bê divê sekn çawa be, kesayetê çawa bê pêşxistin û mirov çawa bijî. Hevoka helbestvan a, **“wek xencerê li singa îxanetê ketiye”** tespîtek dîrokî ye. Li dijî îxanet û hevkarîya ku deşîfrebûyî pêwîst e em karibin sekna jiyana azad a ku li ba Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û şehîdên me yê lehengê temsîlîkirin, nîşan bidin. Me di vê xebata xwe de dît ku bê ev lêgerîna jiyana azad li ser xakên Kurdistanê çawa pêş ketiye. Her wiha me bi êş û xemgîniyek mezîn jî dît ku ev gîştî berxwedan, lehengiyên destanî ku mirovati ronî dikirin, ji aliyê serweran, dagirkeran, mêtîngeran û hêzên hegemonîk ên cuda yê cihanê hatine şikandin, bi pelçiqandinê hatine tasfiyekirin. Helbet a ku divê em bikin wê ne tenê xemgîn be. Ketina nav fikaran û tenê bi qîrîkirinê jî nabe. Bi xeyd xwe dana ber goşeyekê jî nabe. Avêtina nav dilê xwe û xwe li derveyî jiyane hiştin jî nabe. Ya ku dikeve ser milên ev e divê em van rastiyan dîrokî yê bûne girêkên kor bibînin, danehev û destkeftiyên bi heybet ên dîrokê ji bo xwe esas wergerin, feraset û helwestên hevkar û îxanetan deşîfre bikin, li ser bingehe nirxên komunal em karibin sekna xwe bi awayekî vekirî û zelal deynin holê. Ji bo vê jî divê em di warê mejî de lê bihurin û dilên xwe ji nû ve geş bikin.



RÊBERÊ GELÊ KURD ABDULLAH OCALAN

Û, *“Dîrok di roja me de û em jî di destpêka dîrokê de veşartî ne... Dîrok, niha ye.”* Li ser esasê vê rastiyê, bi hêviya ku di dîroka Kurdistanê de baş bê têgihiştin, îxanetên îro û sibehê bêne bêbandorkirin, careke din bi çandek Medbûyînê ya xurt em karibin nîşeyek girîng ji dîrokê re bihêlin.

ÇAVKANÎ

- 1) Dahûrandin, Abdullah Ocalan
- 2) Ji Dewleta Rahip a Sumer ber bi Komara Gel, Abdullah Ocalan
- 3) Parastina Gelekî, Abdullah Ocalan
- 4) Şaristanî, Abdullah Ocalan
- 5) Şaristaniya Kapîtalîst, Abdullah Ocalan
- 6) Sosyolojiya Azadiyê, Abdullah Ocalan
- 7) Li Rojhilata Navîn Krîza Şaristaniyê, Abdullah Ocalan
- 8) Pirsgirêka Kurd û Çareserîya Neteweya Demokratîk, Abdullah Ocalan
- 9) Nexşerê, Abdullah Ocalan
- 10) Ji Sedsala 19. ber bi Roja me Rastiya Kurdistan, Abdullah Ocalan
- 11) Belgeyên Konferans û Kongreyên PKK'ê
- 12) Belgeyên Arşîva PKK'ê
- 13) Neqşîbendîfî Rol û Girîngiya wê ya di Siyaseta Rojhilata Navîn de, Erdal Ergîn
- 14) Dafika Kurd, Çapxaneya Azadî
- 15) Di Kurdan de Eşîretî û Milliyetgerî, Çapxaneya Azadî
- 16) Ketina Dîroka Serwerên Kurd, Çapxaneya Azadî
- 17) Eşîretî û Milliyetgerî, Çapxaneya Azadî
- 18) Diyardeya Îsyânê, Çapxaneya
- 19) Kovarên Komunar
- 20) Têkiliyên Kurd û Ermenîyan, Garo Sasonî
- 21) Dîroka Dîrokê di Kurdan de Dîrok di Dîrokê de Jin, Kemal Mazhar Ehmed
- 22) Li Kurdistanê Baweriyên Olî û Tesîrên wê, Ethem Xemgîn
- 23) Dîroka Kurdistan, Ethem Xemgîn
- 24) Ola Kakayî (Yarsan), Felekeddîn Kakayî

- 25) Nivîsên Ayşe Hur
- 26) Lanetiyên Ser Rûyê Erdê, Frantz Fanon
- 27) Çermê Reş Maskeya Spî, Frantz Fanon
- 28) Portreya Mêtinkar Portreya yê tê Mêtin, Albert Memmî
- 29) Koka Kurdan, Îhsan Nûrî Paşa
- 30) Serhildana Agirî, Îhsan Nûrî Paşa
- 31) Vegera Dehhezaran, Ksenophon
- 32) Dîroka Herodot
- 33) Bîra Qedere, Mehmet Uzun
- 34) Di bin Siya Evîneke Windabûyî de, Mehmet Uzun
- 35) Hawara Dicle, Mehmet Uzun
- 36) Destana Gilgamêş
- 37) Mejuy Mîranî Soran, Mukriyanî Huseyin Huznî
- 38) Bîranînên Min, Hasan Serte
- 39) Rêxistinên Îslamî, Faîk Bûlût
- 40) Di Zabîtnameyên Veşartî yên Meclîsa Tirk (TBMM) de Kurd, Gunerî Civaoglu
- 41) Bîranînên Selîm Sirri Tarcan
- 42) Peymana Civakî, Jean Jacques Rousseau
- 43) Di Dîroka Tirk de Sedsala 19.
- 44) Di Yekemîn Şerê Cîhanê de Kurdistan, Kemal Mazhar Ehmed
- 45) Zarokên Jinbavê yên Xweda, Hans Hauser
- 46) Rûbirûhatina Kalikan, Cemal Reşîd Ehmed
- 47) Sistema Cîhanê, Gunder Frank
- 48) Dîrok û Şaristaniya Kurdan, Bender Cemşîd
- 49) Seyahatname, Evliya Çelebî
- 50) Şerefname Dîroka Kurd, Şeref Han
- 51) Komara Kurd a Mahabad
- 52) Dîroka Kurdistan, Mehmet Şahîn

- 53) Nameyên Tirkiyeyê, Moltke
- 54) Dîroka Nêz a Başûrê Kurdistan, Weşanên PÇDK'ê
- 55) Pedagojiya Bindestan, Paulo Freire
- 56) Bedirxaniyên Cizîra Botan, Malmisanij
- 57) Dîroka Milliyetgiriya Kurd, Jwaideh Waide
- 58) Dîroka Kurdistan, Îsmet Şerîf Vanli
- 59) Mabeda Sîn û Haran, Yuksel...
- 60) Xerabreşk, Klaus Schmidt
- 61) Kurd û Kurdistan, Minoriski
- 62) Kurd, Bazil Nikitin
- 63) Axa, Şêx û Dewlet, Martin Van Bruinessen
- 64) Leoyê Afrîkayî, Amin Maalouf
- 65) Bi Çavên Ereban Seferên Xaçperestan, Amin Maalouf
- 66) Zinarên Tanîos, Amin Maalouf
- 67) Baxçeyên Roniyê, Amin Maalouf
- 68) Dîroka Kurdistan, M.S. Lazeref
- 69) Tevgera Neteweyî ya Kurd, Chris Kutschera
- 70) Dîroka Kurdistan, Mehmet Emîn Bozarslan
- 71) Dîrok bi Sumeran dest pê dike, Samuel Noah Kramer
- 72) Dîroka Siyasî ya Mezopotamya, Suat Gokalp
- 73) Dîrok û Çanda Kurdan a di Serdema Destpêkê de, Torî
- 74) Piştî Medan Kurd, Torî
- 75) Kurd, Mehrdad R. Îzady
- 76) Şîfreyên Tirkiyeya Modern, Fuat Dunder
- 77) Çêbûna Pêxemberekî Bi Çek, Maxime Rodinson
- 78) Efendî, Soner Yalçın
- 79) Osman Sabri Biyografi
- 80) Destana Qehremantiya Kurdan: Dimdimê, Ordîxanê Celîl
- 81) Ansiklopediya Îslamê Beşa Kurdan

- 82) Bîranîna Min, Dr.Nurî Dêrsimî
- 83) Die Sumerer
- 84) Îsyana Dîrokê, Osman Akbaş
- 85) Totem û Tabu, Freud
- 86) Serhildana Sason
- 87) Dîroka Şer, James Keegan
- 88) Di Dîrokê de Çi Çêbû, Gordon Childe
- 89) Mêtîngeha Navneteweyî Kurdistan, Îsmail Beşîkçî
- 90) Kapîtalîzm, Braudel
- 91) Kulîlkên Min ên Çiyê, Sidika Avar
- 92) Di Çapemeniya Tirk de Kurd, Faîk Bulut
- 93) Berxwedana Agirî û Haydaranî, Kemal Suphandag
- 94) Di Belgeyên Fermandariya Giştî de Serhildanên Kurdan
- 95) Konferansa Aştiyê ya Lozan, Hasan Yildiz
- 96) Zabitnameyên Celseya Veşartî ya Meclîsa Tirkîye TBMM
- 97) Kela Dimdimê, Arap Şemo
- 98) Rojaneya Şerê Rizgariyê, Zekî Sarihan
- 99) Nivîsên Baskin Oran
- 100) Nivîsên Lekolin.org
- 101) Hamilton Soane, Nîrxandinên Noel
- 102) Di Belgeyên Sumeran de Gutî
- 103) Pirtûka Tevrat Şirketa Mukaddes
- 104) Di Baxçeyê Kurdoloji de, Martin Van Bruinessen
- 105) Anatolya û Trakyaya Berê, Prof. Dr. Velî Sevîn
- 106) Di Çêbûna Şaristaniyê de Çand û Kurd, Mehmet Saîd Yildirim
- 107) Axaftinên Hatine Qeydkirin, Talîmat, Qeydên Meclîsa Tirkîyeyê TBMM
- 108) Zerdeşt, Sîraç Bîlgîn
- 109) Kurdistan 1919, Bînbaşı Noel

- 110) Hawara Nînova, Surnam Xanem
- 111) Dêrsim-Koçgîrî, Mehmet Bayrak
- 112) Wek Şêweyekî Siyasetê Komkujiyên li Hember Elewîyan, Mehmet Bayrak
- 113) Daneyên Têkildarî Plana Islahata Şerqê, Mehmet Bayrak
- 114) Kurdên Elewî, Erdal Gezîk
- 115) Mafê Netewe Çarenûsa xwe Diyar Bikin: Li Kurdistanê Nêrînek ji Nêz, Robbyn Michelle Usherwood
- 116) Mitannî, Nazim Kok
- 117) Kurdên Iraqê, Kerîm Yıldız
- 118) Pirsgirêka Kurd û Têkiliyên Tirk-Îran, R. Olson
- 119) Têkoşîna Tevgera Azadiyê ya Kurd û Hêzên Herêmî û Navneteweyî, Eyyup Barzanî